
# ABDULAH OCALAN

# PIRSGIRÊKÊN PARTÎBÛNÊ Û PEYWIRÊN ME



*"Heta ku girêdana PKK'ê ya bi kedê û pêwendiya wê bi keda şoreşgerî ve neyê fêmkirin û li ser hemû xebatan serwer nebe, mirov nikare hêjayî partiyê be û nûnertiya wê bike. Xwezayî mirov nikare behsa serkeftinan jî bike. Di vê manê de wisa çeka partiyê hemêzkirin a herî raste."*

**ABDULAH OCALAN**

# PIRSGIRÊKÊN PARTÎBÛN Û PEYWIRÊN ME

**Weşanên Komîteya Rêbertî**

**Werger:** Sozdar Serbilind
**Redekte:** Sozdar Serbilind û Hacer Hilal

**Cihê Çapê:** Çapxana Azadî
**Dîroka Çapê:** Nîsan 2019

**NAVEROK**

**LI SER PIRSGIRÊKÊN PARTÎBÛNÊ**

Rêbertiya PKK'ê Rêbertiya Azadiya Jinê Ye

**PARTÎ KOMBÛNA KEDA ŞOREŞGERÎ YE**

PKK'yîbûn Bi Welatparêzî Destpê Dike

**YÊN DÎROKA PKK'Ê BAŞ NEZANIN**
**NIKARIN BAŞ NÛNERTIYA KESAYETA PKK'Ê BIKIN**

PKK Tevgerek Ronî dike û Hêz Raber Dike Ye

Dîroka PKK'ê Dîroka Rêbertî Ye

**EM JI BO AZADIYA GEL XWE**
**XWE JI NÛ VE AVA DIKIN**

Rêbertiya PKK'ê Gelparêz û Serbixwe Ye

**RÊBERTÎ NAVÊ XWE GIHANDINA JIYANEK BEDEWE**

Helwesta Azadiyê
Helwesta Kar Ji Cihekê Ve Pêşvebirine

Mewkî Cihê Kar Dana Kirin û Xizmetê Ye

**PÊŞBAZIYA MEZIN PÊŞBAZIYA PARTÎBÛNÊ YE**

Tevgera PKK'ê Tevgerek Alternatîfa Pergalê Ye

Heta Ku Partîbûn Pêk Neyê Têkoşîn Jî Ser Nakeve

**ME GIRÊKA KOR A HEZAR SALÎ PARÇE KIR**
**WISA PARTÎBÛN PÊK ANÎ**

Hêza Pêşeng Nebe Civakek Azad Jî Nayê Avakirin

**PKK PARTIYA KEDÊ Û KADKARA NE**

**PARTÎ JI MILETEK DIJBERÎ CEWHERA**
**XWE KETÎ RE RÊYA RAST NÎŞANDANE**

Ji Sondê Fêmkirin Di Şêwaza Sosyalîst û Demokratbûnê De Cewhera Pêşketinê Ye

Me PKK Li Ser Bingeha Qanûna Hezkirinê Ava Kir

Rast Tevlîbûna Partiyê û Li Ser Bingehên Rast Mezinbûn Qanûnek Jiyanê Ye

**ŞOREŞ ÇALEKIYEK AFIRANDINÊ YE**
**Û FEDEKARIYEK BÊ SÎNOR DIXWAZE**

PKK Tevgerek Azadiyê Ye

**MIFTEYA SERKEFTINÊ YA ZÊRÎN**
**PARTÎBÛNE**

Partîbûn Fedekariya Herî Mezin û Berzbûne

**DEMA DI OXIRA JIYANÊ DE TOFAN TÊ RAKIRIN WATEYEKÊ RAVE DIKE**

Milîtanê Herî Hêja Dizane Çawa Bijî

**AZADÎ RASTIYA RÊVEBIRINÊ YE**
**Û AZADÎ DEST BI XWE RÊVEBIRINÊ DIKE**

Partî Warê Yekgirtina Serfermandarî û Rizgarvana Ye

**HÛN DÎROKA PARTÎ DI DIL Û MEJIYÊ XWE DE NEKOLIN**
**NIKARIN BIBIN ENDAMEK PKK'YÎ YÊN RASTEQÎN**

Çîroka Me Çîroka Vejîna Miletekê Ye

Partîbûn Raveya Herî Watedar a Dîroka Gelê Me û Mirovahiyê Ye

**RÊXISTINBÛN HIŞÊ HERÎ PÊŞKETÎ YE**

Rêbertî Rêxistinbûne û Hêza Diyarker a Esasî Ye

Hêza PKK'ê Ya Esasî Rêxistinî Ye û Rast Partîbûna Wê Ye

**SALA 18. SALA DOZA PKK'Ê YA MEZIN**
**A HERÎ ZÊDE NÊZÎ SERKEFTINÊ YE**

Hijde Salên Me Yên Bêhempa Salên Têkoşînê
Yên Dijwar û Ronî Bûn

**ESASÊN PARTÎBÛNÊ**
**PIRA HERÎ SAXLEM A JIYANÊ YE**

PKK'yîbûn Sêlmek Pêkanîna Qonaxên Mezin
a Mirovahiyê Ye

Qonaxa Jiyanê Ya Herî Hêja
Beşa Partîbûnê Ya Rasteqîne

**ŞOREŞ TEVGERÊN BERZBÛNÊ NE**

Pênaseya Azadiyê Ya Herî Rast û Yekane
Bûna Kesayetek Berzbûyî, Dewlemend û Ava Dike

**DÎROKA PKK'Ê DÎROKA TÊKNAÇÊ YE**

Rêxistinkirina Gel Karek Nirxê Zêrîne

Yek Ji Armanca Girîng a Şer Jî Pêkanîna Evînê Ye

**DI PKK'Ê DE HER TIŞT LI GORÎ KESAYETA SERKEFTINÊ**
**HATIYE SAZKIRIN**

Pêwîste Pêşengiya PKK'ê Tovek Ji Pola Be

**AZADÎ JI BO HEMÛ CIVAKÊ YA HEWCE DENGVEDANE**

PKK Hêza Xwe Ji Nirxên Ku Pêwîste Berz Bên Girtin Digire

## PKK RASTIYA YÊN MILÎTANIN

Gerîlayên PKK'ê Bîrdozî, Polîtîk û Rêxistinî Ne

Me Li Ser Van Axan Biharên Hêjayî Mirovê Azad Ava Kir

## YÊN DEWLEMENDIYA WAN A BÎRDOZÎ NEBE DEWLEMENDIYA WAN A PRATÎKÎ JÎ NABE

# PIRSGIRÊKÊN PARTÎBÛNÊ Û PEYWIRÊN ME

## LI SER PIRSGIRÊKA PARTÎBÛNÊ

Her ku şer pêş dikeve bi qasî xurtbûn û zelalbûna di rastiya pêşengtî de, ewqas jî kesayetên qut bûyîn û texrîbatên ku wan rê jê re vekirine jî derdikevin holê. Dê ew jî dema pêşiya me yan ji nû ve partîbûnê bidest bixe, yan jî wê bi xwe re bi komî her tiştî bide windakirin.

Di rastiya Kurdistanê de welatparêzî, netewbûn, heta civakbûn bi dîroka PKK'ê re destpê dike û hêz bidest dixe. Di vê manê de pêşveçûna pêşengtiyê dibe mifteya pêşketinan. Berxwedana li hemberî vê ya rast, welatparêziya ku paşeroja wê nîne, rastiya netewî ya nehatiye jiyîn û weke nêzîkbûna herî şaş rewşa xwe ne birêxistinkirine. An jî bi oportînîstî hinek nêzîkbûn tên pejirandin, dikevin nava helwestên ji rê derdixin, wisa dibe hinek yekser diçin nav refên şoreşa dijber. Hinek diçin xwe bi derdorên hevkar û reformîst ve dijîn, yên ku hêza wan têra vê jî nake, di nava partiyê de weke kesên bi bûhran û bela hewl didin jiyana xwe bidomînin. Hema hema li gelek qadên me rewşên em zêde dijîn, niha me hîn zêdetir ber bi dahûrandina van rewşan ve dibe. Bêguman derfetên çareseriyê jî zêde dibin.

Cardin em dibêjin partîbûn. Ya rastî ev, ji bo kesên dema gavên xwe tavêjin nava partî yekser dibêjin; "Me partîbûn pêk anî" û xwe dixapînin re cardin ew anîna qonaxek destpêkirinekê ye. Hinek dihizirin bi dehî caran ev dubare kirine, lê belê cardin bi rewşên wisa re rûbirû dimînin û nikarin xwe jê rizgar bikin. Ev çima wisa ye? Ji ber ku şaş nêzî rastiya bingehîn bûne. Partî ji yekeya malbatê wêdetir tiştek din nehatiye dîtin. Rastiya Rêbertiyê ji reîstiya eşîretê cewaztir nehatiye fêmkirin, her ku xerîzeyên jiyanê firsend dîtine dane axaftin û ji bilî vê weke tiştek din nehatiye fêmkirin. Kesayetên tîpên wisa nikarin partîbûnê pêk bînin. Dema dibêjin me partîbûn pêk anî, dibe ku rewşek herî xeternak dijîn û ev jî di nava me de berfireh tê jiyîn. Dîroka partiya me hinekê jî dîrokek wisa

ye. Ti carî guman ji duristbûna niyazan nayê kirin û pir vekiriye ku hinek hewldan jî hene. Lê pirsgirêka pêşeng û qadro van tevan derbas dike. Ji mêjve ye em ji bo Kurdistanê pirsgirêka rêbertiya şoreşger nîqaş dikin û ev pêşî ji bo tevlîbûnên nû hêjayî lêkolînê ye.

Rêjeyek mezin avaniya me hêjî ji pêşwazîkirina vê dûre. Ya herî xirab jî her ku derfet zêde dibin bi her cure kesayeta jiyana kevin ve yekser xwe li ser van derfetan dide jiyîn, dibêje; “Min partîbûn pêk aniye” û ji ya berê xetertir rewşek dij partî jiyan dike. Tevî hemû hişyariyên me yên divê partî wisa neyê destgirtin, ev bi rikdar jiyîn bi hinekan re rewşek xeternak derdikeve holê. Nexasim hinek eyalet di vê mijarê de zêde bi pirsgirêkin. Di rabirdû de rewşa Mêrdîn û Dêrsimê ku em li ser rawestiyabûn, niha di demên dawî dorê de xebatên Amed û her tim em nîqaş dikin Botan hene. Ev nirxandin hêjî di hinek dahûrînan de bi wate û girîngiya xwe ve tên ravekirin. Encamên pratîka eyaleta Tolhildanê (Gûney-Bati), pir balkêş derdikevin pêşberî me. Ne tenê di şêweya xweseriya qadan de, bi gelemperî bi qasî koletî, bêbandor û bê eleqe nêzî erkan dibin, ewqas jî bi her cure pîvanên eşîrtî yên paşverû ve nêz dibin. Dema ev nebê jî, bi ferasetên burjuvaziya biçûk ên ji pergalê hatine girtin an jî bi cendirmetiyê dihizirin ku fermandariyê bikin. Heta ku hewldanek ked û xizmetê ya cidî çênebe, wer dihizirin ku dê ji min zêdetir xwedî li partiyê derbikevin û xwe bi vê didin bawerkirin. Dema ev jî nabe, pir koletî bi girêdanek xizmeta hemaltiyê derbas nakê ve yeqîn dikin ku kar qedandine û pêk anîne.

Ev hemû ber bi binkeftinê ve dibin û di navê de şansê ti jiyanê nîne. Divê bi fikra; “Derfetên partiyê zêde bûne û em dijîn” ve xwe xapandin çênebe. Dibe ku ev di rojekê de jî ji destê mirov derkevin û jiyan zêde helak bibe, jixwe wisa jî dibe. Berxwedanên pir rikdar hene. Li gorî rewşa heyî em rojane bi ser qadan de diçin. Me berê jî ev nêzîkbûn rexne kiribûn. Kêmek maye hinek van nêzîkbûnan bi sazî bikin. Kesên van bi sazî dikin dema dikevin destê dijmin de roja duyem dibe kontrayê herî baş. Ev derdikeve holê: Yan em ê partîbûnê tam pêk bînin, pêwîstiyên wê di her astê de jidil bijîn û

bidin jiyîn, an jî dê helwestên heyî bi me bidin windakirin. Rêya vê ya navîn nîne.

Hinek xalên din jî ku em zêde nîqaş dikin, xebatên Rojhilatin. Hinek pratîkên wargehên weke Xakurkê, Zelê û Heftenîn hene. Rexneyên di derheqê van qadan de hêjî neqediyane. Ji ber ku avaniya ku li wan deran teşe girtine didin windakirin. Feraseta rêveberiyên wan û şervantiyên wan li hemberî dijmin bêhenase ne. Yan tim direve, yan jî zêde daxwazkarê vekişîna ber bi Başûr ve ye. Yan zêde xwekujer serde diçe, yan jî qet plan nekiriye û nêzîkbûnek ku qet serkeftinê saz nakê esas digire. Ev rasterast rev û bêçaretiye. Qaşo ev diyar dikin ku şoreşê dixwazin. Yên şoreşê dixwazin divê sedemên pirsgirêkan bi şêwazek rasteqîn ji xwe bipirse. Hewce nake li vir xwe winda bike, rewşên rû didin nênirxîne û hewl bidin pirsgirêkê bi niyazên sûbjektîf paşguh bikin. Kesên canê xwe daniye holê, divê neçariya rasteqînbûnê jî bizane. Nexwe dê ew bi xwe winda bikin. Partî giştî tevdîrên xwe digire. Partî winda nake, lê dê ew kesayet winda bikin. Çavkaniya hemû êşan, heta karesatan jî ev e.

Herî dawî destwerdanek me li ser Zelê çêbû. Jixwe em bi hêzên Başûr re di pevçûnê de ne. Ew hêzên feodal û eşîret ên bi şêweyek pir xeternak xwe dispêrin emperyalîzm û mêtîngeriyê ne. Nirxandinên me yên netewperestiya paşverû piştrast dibe. Em nabêjin pêwendî bi wan re nabe, lê ji bo ev pêwendî pir hişyar û di xizmeta şoreşê de bên bikaranîn, neçare girêdayî rastiya Rêbertiyê bê meşandin. Ger em dixwazin şoreşê pêş bixin, em ê li van rastiyan binêrin. Weke tê zanîn di şerê Başûr ê sala 1992’an de xwe dan milê rastê û derfetên perwerdê yên li Başûr hêjayî nehatin nirxandin. Li gorî gêrîlatiya ku pêwîst bû li Başûr bê ferzkirin vesazbûnek çênebû, gundwarî hat jiyîn. Ji ber têkîliya gundîtiyê dê şêwaza Rêbertiyê jî ji xeniqandinê rizgar nebûya. Dema li ser vê nêvenga gund tê hizirandin, fermandarê wir jî ancex dikare bibe axayê gund. Jixwe yên tên jî bi giranî gundî ne û pir hêsan ahenga jiyana gund raber dikin. Her wiha ji ber dev ji vê jiyanê bernadin hatin dorpêçkirin û îmha bûn. Tevî ku em mafê berxwedêrên pir leheng jî didin, lê ji ber hêza fermande ya heyî nekarî şêwaza

PKK'ê bisepîne ber bi binkeftinê ve diçû. Bêguman Rêbertî erka me ya bingehîne, lewma ne dibû ku em destwerdanê nekin. Me destwerda û pêşî li binkeftina temamî girt. Lê belê ji bo ferasetên wan kesayet wisa hêsan sererast nebûn. Ev ji bo wan jî hêsan nabe, wer dizane ku pir şer dike û heta dibêje; "Min ked daye." Dibe ku wateya çors de wisa be, lê deka encamê binêrin. Gelo ev ked, ev hewldan dibe heta ku derê? Hewl didin bi van berovajî bikin, rikek weke; "Ya rastî min a herî baş kir, hinek kesên din, ji ber sedemên din tişta dihat xwestin nehat kirin, dîsa jî ya herî guncav a mine" xwe dide jiyîn.

Dema em hinek erkan jî ferz dikin û hinek rastiyên partiyê bibîr dixin, ev nikarin weke kaxida turnûsolê destgirtinê rizgar bikin. Mînak me hinek derfetên partiyê pêşkêş kiribûn; dema me ev derfet qut dikir xwe li erdê didan. Hat gotin; "Ger em li Başûr pereyan belav bikin em ê bi bandor bin, pişgiriya Rêbertiya Partî hebe em ê bi bandor bin." Dema min got pişgiriya min nîne û erê nakim pereyên partiyê bên belavkirin, yekser dibêjin; "Pêşketin rawestiyan" an jî "Em tangav bûn." Gava em hîn bi israr ser de diçin vê carê jî bertek raber dikin. Wexta em dibêjin; "Nabe wisa li Başûr bê mayîn, em nikarin jiyanek ji jiyana gêrîla dûr bipejirînin", vêca ew dibêjin; "Nexwe ji bo şer qet nabe." Em ne neçarin wan wisa li Başûr îdare û xwedî bikin. Ancex wê jiyanê hêjayî xwe dibînin. Mixabin tişta ku dijîn tam tasfiyekariye. Êdî di vê qonaxê de me jî nedikariya vale bisekinin û pir jî serde çûn. Hêjî dibêjin; "Em tengav bûne, derûniya me têk çûye. Halê me nîne em rabin ser xwe." Kesên di asta berpirsyar de vê dibêjin. Ma hûn kîne, wan ciwanan dişînin şer û fermandarên weke we xwedî ezmûn hêza meşê bi xwe re nabînin, ma hûn ji vê nêzîkbûnê aciz nabin? Fermandarên ku hezaran şervan di bin fermana wan de hene, ma hûn çima nikarin bi wan re rastiyan bimeşînin? Suc davêjin ser hinek din. Me her cure derfet da wan. Çima hêjî gazincan dikin?

Êdî em nikarin van rewşan bipejirînin. Misoger dê bi ser van pirsgirêkan de çûyîn çêbe, kesayet ji her hêlê ve derbikevin holê. Dibe ku partî jî ji vê zerar bibîne, bes qet nebê dê ji xwe xapandinê re dawî bê anîn. Wê kesên wisa xwe li milê rastê digirin, ji rastiyan

qut dikin û çima tenezilî vê jiyanê dikin werin zelalkirin. Em ê ji nû ve rastiya Rêbertiyê ya partiyê bi bîra wan bînin û polîtîkayên partiyê yên bingehîn vekin. Em ê ji hemû aliyan ve jiyana partî û pêwendiyên hevrêtiyê şanî wan bikin û pir zelal pirsên hûn kîne, çine, we çi kir ji wan bikin. Dibe ku ew xwe di eynika dêwan de dibînin, lê dê şanî wan bê kirin ku ne ecûcin jî. Wê li hember vê rewşê gelek hêcetan bigerin û bêjin; “Ne wisa ye”, bes hinde rastî li ber çavane dê ji neçarî serê xwe jê re bitewînin. Dibe ku destpêkirinek nû bikin an jî xwe bavêjin aliyekê û tasfiye bibin. Dibe ku rewşek tasfiyekariya tasfiyan bijîn. Ev zelalbûn wê ji bo partiyê baştir be.

Hinek rêhevalan li van qadan jiyan kirine, hewl didin pratîkan dahûrînin. Partiya me di vê mijarê de dehê caran dahûrîn pêş xistine. Yên li gorî vê tevnagerin ew bi xwe ne. Pêşî pêwîste ew bizanin diyalektîka dahûrînan bisepînin. Ev dahûrîn ji bo zimandirêjî çêbe yan jî zanyariya wan pêş bikeve nayê kirin, ji bo heta dawî bên pejirandin tên pêşxistin. Ji bo hûn jiyanê li ser vî bingehî veguherînin dahûrîn evqas berfirehî hatine pêşxistin. Pêwîst bû ji destpêkê ve li gorî vê qadrobûn û partîbûna rast wisa çêbûya. Mixabin we ev pêk ne aniye. Lê belê niha jî bi hemû duristbûna xwe ve hûn dibêjin; “Em çiqasî xafil bûn, me çiqas şaşî kirin û em hatin xapandin.” Nexwe ji ber vê hûn ê partiyê rast lêbikolin, her ku têbigihin tevlî bibin û erk girtinê ji xwe re qebûl bikin. Fermandariya erzan û kesayetên partîbûn pêş nexistine dê di encamê de kesayet bi xwe bixetimîne. Bêguman tişta pêwîste bê kirin, partî weke heyî têgihiştine. Nexasim rastiya Rêbertiyê ji hemû aliyan ve çi rave dike hukmê çi dide zanîne. Bes em di rewşên herî tengav de tên bîra hinekan. Lê em her demê hene û şer jî rojane areste dikin. Em ji bo têkoşînê bi qasî av û hewayê hewce ne. Ew bi xwe jî bi vê xêrê dijîn. Lê çima dema tengav dibin em tên bîra wan û di demên din de jî me pêk nayînin? Ev rewşek xwe xapandin û xefletê ye. Kesên ku jiyana xwe evqasî feda dikin, lê mixabin nizanin partîbûnê pêk bînin an jî bizanin kêm pêkanîn pir bi êşe.

Dema Rêbertî hevdîtin û nîqaş dike, divê bê gotin; “Şaşî li kuderê ye, kêmasiya min di ku de ye? Min xwe partiyî hesab dikir, çima wisa bû?” Ji ber ku mînakên derdikevin holê, ji axatiya herî xurt zêdetir feodalî ne. Bi sedan mirov dane revandin, nêzîkbûnên şaş ji hevrêyan re hatiye kirin û nêzîkbûnek cidî ji peywiran re nehatiye kirin. Vêca bila partî çi ji we bike? Ma em ê kesayetê ku her tim ziyanê dide, nikare polîtîkaya pratîkî bafirîne çima li ser serê xwe bigirin û li ser derfetan bidin jiyîn? Ma em ê partiyê înkar bikin? Heta li Başûr tê gotin; “Bila salekê bi hevkaran re nîqaş çênebin.” Wê çima çênebe? Emperyalîzm û mêtîngeriyê ew aresteyî we kirin û êrîşî we kirin. Heta dikarin êrîşî wargeha we jî – jixwe wargehek rehîneye- bikin. Hûn nahizirin rêya pêşîlêgirtina vê çiye, paşê jî dema pêdiviya wan çêdibe em tên bîra wan. Xwe xapandina we, lê li hemberî bibîrxistina partiyê ya cidî acizbûna we nayê pejirandin.

Qaşo avaniya şervan bi temamî ji gêrîlatiyek cidî dûrin, ancex dikarin hemûyan bi rêbazên ku li ser koleyên serdema destpêkê dihatin sepandin tedawî bikin! Kanî perwerdeya sosyalîst, kanî rêgeza dilxwazî? Ma hûn ê bêjin; “Nehat bîra me, me jibîr kir.” Wê dem ê PKK li kure? Ma rastiya Rêbertî gel qane nake û wisa bidest naxe, partî jî li ser vî bingehî ava nake? Di vê rewşê de hewldana we çiye? Nêzîkbûna; “Hêza min têrê nekir, lewra min rêbazên hovane esasgirtin” wê partiyê biqedîne. Weke tê dîtin avaniyek şervan a cidî dernakeve holê. Ger partî nebe, vêca bifikirin dê şerê li welat, rojane di asta bêhempa de meşandina rêbertiyê çawa be? Jixwe ewder ne cihê rehîneyane jî, weke koleyên karê ber lingan bikin li avaniya şervanên wir dinêrin. Ma hûn çima van rastiyan nabînin? Hêjî hinek vê kesayeta axa li ser me ferz dikin û dihizirin ku xwe bidin jiyîn. Na! Em heta qirika xwe bihêrsin. Eleqeya pêwîst li hember gelek hevrêyan nayê raberkirin, naxwazin rastiya şervan a herî biçûk jî berçav bigirin, ew anîne ber rev ê, lê vê jî fêm nakin. Dê ji fermandarê wisa re bêjin; “Tu fermandarê çiyî?” Mixabin em ê jî bi ser kesên wisa de biçin.

Qada min jî heye, ez li vê qadê ji sifirê dafirînim. Li vir qet rev çênabin, baldarî û tevlîbûnek zêde heye. Em ê evqas mirovên ku

jiyana xwe bexşandine amade bixin destê we, lê hûn ê nekarin van xwedî bikin, paşê jî hinek hêcetan bibînin û gelek tiştên weke; “Min nekarî kar bikim, kêmasiya bê baldariyê heye” bidin pêş. Kesê vê dide pêş ne fermandar, nabe weke mirov jî bê hesibandin. Şêwaza baldariya PKK’ê, şêwaza PKK’ê ya bidestxistina mirov, rêvebirin û dana şerkirinê ji roja destpêkê heta îro, çawa karî mirovên me pê bide bawerkirin û ji wê înkara metirsîdar derbixe? Hûn çawa li dijî vê derdikevin? Avaniya şervanên gelek ji we bê eleqe, bê berpirsyarin û serî ditewîne. Elbet tevlîbûn jî wisa ye. Ma şêwaza tevlîbûna PKK’ê wisa ye? Ne gengaze ku mirov di kesayeta we de paşverûtî û nebesiyê nebîne. Derdikeve holê ku em ê bi rêveberî û hemû avaniya şervan ve we ji nû ve bigirin dest. Di vê navberê de xerckirinên madî yên pir zêde tên kirin. Ji ber lewaziya giyanwerî û kêfxweşî rev çêdibin. Lewra dijmin dikare bi bandor li we bide. Ya herî girîng jî tevî ku derfeta bidestxistinên mezin hene, pir sînordar tê bidestxistin. Sedema vê jî heqê rastiya partî, fermandeyî û şer nedayîne. Dibe ku bê gotin; “Me xwe, ferdperestiya xwe, ezezîtiya xwe û axatiya xwe sepand.” Gelo wê ev nêzîkbûn di dîrokê de me ber bi ku ve bibe?

Tê gotin; “Zehmete ku partî bi pîvanên rasteqîn bê sepandin.” Ma we ev wisa hêsan dihesiband? Me dehî caran got rast nêzî rastiya Rêbertiyê bibin. Şêwaza Rêbertiyê ya fikir, baldarî, dilketin û hezkirinê, dîsa feraseta hevrêtî, şer û rêxistinê, di her astê de eleqederbûna bi mirovan ve çawaye? Beramberî vê gelo ya we çawa pêş dikeve? Çiqas raste ku hûn evqasî me înkar bikin û bi girêdanek pir razber a Rêbertiyê ve xwe têr bibînin? Hûn diyar dikin zana ne û heta xwe dixin şûna rewşenbîran de jî. Ma kesê xwe dixe şûna rewşenbîran wisa ye? Ma evqasî têgihiştinek kêm dibe? Ji bo dev ji tevlîbûna rasteqînî nayê berdan van tevan vedibêjim. Em ê pêşengiya partiyê esas bigirin û vê serwer bikin. Dema ev nebe jixwe di şer de jî serkeftin nabe. Wexta rastiya Rêbertiyê neyê pêkanîn, dev ji bidestxistina serkeftinê berdin, nabe mirov bîst û çar demjimêran jî li ser piyan bimîne. Hinek wer dizanin ku xêra derfetên partiyê jiyan dikin. Em ê bi van xafilan bidin hînkirin ku ev ne jiyane. Ger di helwestên xwe yên heyî de

israr bikin, wê partî jî di vê mijarê de tevdîr bigire. Kesên dibêjin; “Ez ji bo doza partiyê heme”, bêguman tengezariyan dernaxin, pir hêsan bi ser van karan de diçin û hêsankirina karan esas digirin.

Her ku hûn partîbûnê pêk bînin pir vekiriye ku hûn ê kesayeta xwe bibînin, hîn zêdetir nêzî bêrî û hêviyên xwe bibin. Hûn nikarin ji bilî vê rêyek rizgariyê bihizirin. Rêya rizgarî, rêya partiye. Rêya partiyê jî bi tevlîbûna rast ve destpê dike. Bê dudilî, bê taloqbûn, beriya her tiştî rê dide rastiyên bingehîn û têgihiştina vê bi jiyînê ve dimeşe. Bila kes girêdana erzan nehizire. Bila ti kes ne hizire ku me bi şêwaza erzan, hestiyar û seresere çawa bixapîne û nedê nîqaşkirin. Rastiya PKK’ê, rastiyek pir berfirehe. Ne tenê Kurdistanê, herêmê û zemîna nav-netewî dihejîne. Hema daketiye rojeva hemû dewletan. Mêtîngeriya Tirk, di pêwendiyên xwe yên bi hemû welatên emperyalîst û herêmê re PKK’ê çawa esas digire. Ev jî wateya ku PKK’ê astek siyasî ya pir girîng çawa di gelemperiya nav-netewî de bidest xistiye. Kêliya ku qadro van tevan hem dibîne hem jî dibersivîne, neçare ku di hundur de jî şerek gêrîla ya bêhempa pêş bixe.

Kesên ku abc’ya hewcedariyên gêrîla pêk nayînin hene. Lê belê li ser navê gêrîla jî her kes daxwazkare. Nexwe lê binêrin rastiya PKK’ê çi rave dike. Gêrîla çiye, ne çiye? Hûn ê heqê vê bidinê, girêdayî sonda xwe bimînin û hevgirtî bin. Dema fermandarî tê gotin, tê fêmkirin ku derfetên heyî desteserkirine. Dema şervantî jî tê gotin, dibêjin; “Bila hinek me li ser milê xwe rake, bila fermandar min bibe heta cihê ku ez ê biçimê.” Ev xisleta fermandar û tevlîbûna gerîla tine dike. Ew wî, ew jî yê din vale derdixe. Li wir jî bi temamî partî winda dike. Em ê fermandar û gêrîlayê ku temamî bi partî dide windakirin ji nû ve bigirin dest. Misoger divê ev bê fêmkirin. Ji ber ku ger hûn fêm nekin, niyazên we jîndar nabin û wê hewldanên we jî vale derbikevin. Gotina min bi taybet ji kesên ku dibêjin; “Ez di vî karî de bi îdîa me, ez ê encam bigirim û baweriya min bi min heye” re ye. Ev kar li gorî quralên wê, rûniştandina tempo û şêwazê dimeşe. Weke din nehizirin ku hûn ê xwe bixapînin û bikarin bidin jiyîn. Hûn ê di dîplomasî, serhildan,

çiya, deşt, bajar û her qada xebatê de, bi têrbûnek diyarker beşdarî xebatan bibin.

Rapor hatine. Encama ku ji van raporan derketî ev in: Tê gotin; "Ger girêdana bi Rêbertî û gel nebûya, wê tişta ku kontrayên herî xurt nekarîn bikin van qadroyan kiriba." Rastî jî wisa ye. Divê hûn xwe ji rewşa qadroyek wisa derbixin. Ger rêbertiya taktîkî ji vê rewşê dernekeve, wê rewşa me diyar kirî bê jiyîn û partî jî wan tasfiye bike. Lewra em carek din partîbûnê, rast tevlîbûna gêrîla û girêdana bi esasên partiyê datînin pêşiya we. Bila ti kes şêwazek tevlîbûn û meşek ji bilî vê nehizire. Ev xalên ku pêwîste ji destpêkê ve wisa bên destgirtinin. Her çendî neyên pêkanîn jî, bingeh û nêzîkbûnên hezar carî xwedî şêwaza raste. Şûna ku şaşiyan bikin û rê ji ziyanê re vekin, em rastiyê tam bigirin dest û bisepînin daku, zerarê nedin û nedin kirin. Ev kar bi ceribandinê, bi yek-du xirabkirinan ve nabe. Ji ber ku ev bi agir lîstine, hûn ê bişewitin û bidin şewitandin. Pişgiriya me jî her tim wisa ji we re çênabe. Gelê Kurd zaroke, yên tên nava me jî zarokên zarokane. Ev pir fêrî jiyanê bûne. Lê êdî bese, hûn jî şer bimeşînin. Berovajî, rastiya Rêbertî, şerkertiya kamil û têk naçê ye. Rastiya Rêbertî raveya şêwaza bi derfetên pir kêm, bêku wextê xwe bi ceribandinan winda bike, reftarên herî di cîh de û encam digirê ye. Lewra hûn ê têgihiştina Rêbertiyê pir bi rasteqînî û têrkar bikin. Divê nîqaşên we yên bi me re û asta biryardariya we bikare vê saz bike û divê hûn weke hevrêyên jin bikarin vê bijîn.

## Rêbertiya PKK'ê Rêbertiya Azadiya Jinê Ye

Nexasim we lêhûrbûnek jiyan kir, konferans lidar xist. Lê belê hêjî di derbarê jiyana azad de biyanîbûnek heye. Hêj we tam dev ji têkîliyên takekesî yên kevin bernedaye an jî ji wan rizgar nebûne. Vê rewşa we wisa dinirxînim. Nêzîkbûna we yan asta têkîliya kevnare, yan înkara ku pêş dikevê ye, yan jî nêzîkbûnek burjuvaziya biçûk a pir seresere ye. Tê dîtin hûn bi nêzîkbûnên ku di xwendevanan de tê dîtin ve rê ketine. Pêwîste bê fêmkirin ev ne rêya pêngavê ye, tevlîbûna ji PKK'ê re li ser bingeha van esasan û derketinan nayê kirin. Asta azadiya ku di PKK'ê de pêş dikeve berfirehe. Di nava PKK'ê de rola ku ji azadiya jinê re hatiye dayîn ji naveroka gelek şoreşan zêdetir berfirehe û xwedî naverokek nûjentiyê ye. Li Kurdistanê ne jiyana jina azad, înkara netewî, aloziya civakî, rizîn û belavbûn heye. Li Kurdistanê bê kesayetî di hemû şaneyan de hatiye rûniştin û jiyan bi temamî ji holê hatiye rakirin. Jiyana partiyek wisa bikare bersivê bide rastiyek objektîf û asta azadiya partiyê, azadiya jinê ye.

Hûn ê van rastiyan tevan berçav bigirin û wate bidin vê. Ji ber vê me zemîna nîqaşek azad da we. Me hewl da we ji hinek ferzkirinan, nexasim bandora nêzîkbûnên zilamê serdest dûr bigirin. Dîsa hem me hewl da ji şer dûr bigirin, hem jî ji bo hûn di şer de hêsan îmha nebin li qadên guncav bicîh kir. Lê mixabin derket holê ku we zêde ji vê sûd wernegirt. Em nikarin jinê ji rêzê bigirin dest. Em jinê ne weke heyî dipejirînin, ne jî wê wisa bi teşeyî dikarin têr bibînin û derbas bikin. Xebatên jinê karên berfirehin. Jina azadbûyî, civaka azadbûyî ye, welatê azadbûyî ye. Ev jî peywirên azadiyê yên mezin dide we û sûd dide ku hûn nasnameya xwe bibînin û derbixin holê. Li gorî we jiyana azad, jiyana ji bo civakê ye. Pêwîste ew bê dîtin û nirxandin. Dê ev jî bi we pêwîstiya feraset, bernameyekê, pêdiviya rêxistinbûnê bide hîskirin û vê neçar bike. Hûn nikarin rave bikin ku rastî ji bo we tên

çi wateyê. Hûn kîne, çine û divê çawa bin? Hûn van pirsan jî ji xwe bikin. Vêca hûn dikarin çi ji jiyanê hêvî bikin? Hûn tenê dikarin bi vê bibin weke jinên ku ji bo zilamê serdest ên gundan hatine amadekirin, li bajaran jî têkîliyên ku pergalê xirab girê dane. Mixabin em jî yeqîn nakin ku ev azadiye û dikare bê jiyîn, ev lenetî ye.

Bi pêdiviya azad jiyînê bawerkirin, nîqaşa wê kirin û xalên xwe qanekirinê min ewqasî berfireh girtin dest ku, li beramberî vê ji cînseltiya jinê -ev ji bo zilam jî derbasdare- nirxandinê bigirin, heta felsefeya xwe pêwîstiya we heye jiyana xwe bi temamî di ber çavan re derbas bikin. Ji ber ku tiştên we jiyan kirine hûn anîne rewşek nenas. Mirov zêde nikare nirx bide ne hestên we, ne hezkirinên we, ne evînên we û ne jî girêdanên we. Ji ber ku ev hemû li gorî civaka mêtînger ji hêla nêzîkbûnên zilamê serdest ve hatine sazkirin û partî jî van napejirîne. Yan hûn ê azad bibin û partîbûnê bijîn, an jî tasfiye bibin. Xeta vê ya navîn nîne.

Rêhevalên me yên jin hinekê jî di vê mijarê de zehmetiyan dijîn. Li şûna zehmetiyan, dahûrîn û pêşketin jiyîn rêya raste. Azadî herî zêde jî ji bo we, ji bo zayenda jinê hewce ye. Ya herî zêde bidest bixe dê ew be, ji ber ku ya herî zêde winda kirî ewe. Hûn ê bi vê bawer bikin, lêgerîna xwe ya hest, hezkirin û evînê jî girêdayî lêgerîna azadiyê saz bikin. Hûn ê yek kêliyê jî paşguh nekin ku azadî jî bi şer tê bidestxistin. Lewra ji bo şer hûn ê baldariyek mezin nêzî pirsgirêkên rêxistinê bibin û ger gengaz be di pêkanîna xeta şer de çi ji destê we tê tevkariyê bikin. Dema ev hemû pêk hatin wê ji bo we qada azadiyê hinek din pêş bikeve. Hûn ê jî vê jidil û can weke nîmetekê pêşwazî bikin. Ji ber cara yekê ye hûn û azadî hev dinasîn. Azadî esîl dike û rê vedike ku hûn bi şeref bikevin nava mirovahiyê. Heta ku ew nebe li evînê negerin, jixwe nîne jî. Ger hûn bigerin di dawiya wê de koletî heye, rezîltî heye. Jixwe hêj we xwe fêm nekiriye. Ez li gorî kîme, ji bo çi me, daxwazên min çine, zilamê li beramberî min kiye, zilamtiya ku tê ferzkirin çi dihewîne? Ev zilam di babetên weke zext, mêtîngerî, kirêtî, xweşikbûn û hestan de çawa ye? Hûn weke zarokekî bi bandorek biçûk tên xapandin û jiyanê jî wisa pêşwazî dikin. Her

wiha, ji vê hêlê ve tê gotin ku jin gêje û kême. Yên di pirsgirêkên xwe yên girîng ên herî jiyanî de wisa bê hesab bin, elbet dê nêzîkbûna zaroktî jê re bê kirin. Hevserê wê jî bixwaze dê lêbide, dujîna bike, bixwaze dê bikar bîne, ti mafek weke kesayet jê re nayê dayîn. Hûn ê jî bibin qurbanê hestên xwe û tine bibin. Ev ne nêzîkbûnek azadiyê ya rasteqîne.

Tişta tê dîtin, pêwîstî bi hizra azadiyê heye. Gelek xalên ku di vê mijarê de hûn bipirsin û bersivên wan tên xwestin hene. Ji ber ku di pratîkên wargehên we jiyan kirine de we nekariye xwe ji hebûnek ku ji vir ber bi wir ve xirikandinê rizgar bikin, heta hûn ji avaniya civakî ya giştî jî wêdetir ketine rewşek paşketîtir. PKK ne ev e; PKK jinê bilind dike, vediguherîne, azad dike û ji mijara bûna mal û milkbûnê derdixe. Hûn ê bi vê bawer bin û tevlî vê bibin. Ger hêj hûn nezanin pirsan bikin û darezînin, hûn ê çawa li dijî rastiya koletî û serîtewandina wê bikarin behsa jiyana azad bikin? Hûn ê çawa bêjin pêwendiyên me yên hezkirinê û pêwendiyên me yên hestewar? Hûn ê qet ne di ferqa quralên jiyanê yên bingehîn û quralên azadiyê de bin, lê dîsa jî hinek tiştan bixwazin. Ev dişibe şêwaza daxwazên zarokan û jixwe ji zarokan re jî nêzîkbûna zaroktî tê kirin. Hûn jî dizanin, ev şêwaz jî ne hêjayî kesên ku li vir gihane bîst û sih saliya xwe. Mirov hinekî ji vê aciz dibe.

Rêbertî di vê mijarê de jî derfetan ava dike. Rêbertiya PKK'ê, rêbertiya azadiyê ye, rêbertiya azadiya jinê ye. Dahûrîn hene, bi qasî Rêbertiyê di gelek mijaran de pirs kirine, ewqas jî bersivan jî diafirîne. Kesayeta jinê ya ku ne jêhatî, kême, nikare biafirîne, çawa niha jêhatiye, têrê dike û dikare biafirîne derxistiye holê. Diyar kiriye ku jin çawa dikare di qadên weke şer, polîtîka, hilberîn û hest de, hema li her qadê hilberîne. Hûn ê jî nirxek mezin bidin vê û wisa beşdarî partiyê bibin. Ger hûn wisa beşdarî Rêbertiyê bibin, hûn ê ser bikevin. Bi qasî bizanin ser bixin jî, hûn ê bikarin azad bijîn, ji kirêtiyê rizgar bibin, her cure rewşên bêhna serîtewandinê jê tên û bêbaweriyê beramberî xwe dide jiyîn derbas bikin. Ev jî ji bo me xisletên kesayetî yên rasteqîn ku pêwîste bên bidestxistinin.

Divê hûn bi xwe di van mijaran de bikarin nîqaş bikin. Dibe ku hûn li her zemînê vê derfetê nebînin. Lê qet nebe di zemînê partiyê de bi alîkariya van dahûrînan paşeroj û jiyana xwe lêpirsînin, ya ku ji bo we û azadiya we guncave bibînin. Di vê mijarê de pêwîstî bi kevneperestiyê nîne. Xwe mehkumî kevneşopiyan kirin herî zêde dê bi we bide windakirin. Têkîliyên erzan ên nav pergalî ti hêviyê nadin. Kesayeta xwe înkar nekin. Ji zayenda xwe û cînseltiya xwe şerim nekin. Berovajî, bi vê serbilind bin. Hûn ê bawer bin ku jin jî esîl û dilpake. Vê jî di nava jiyanê de, bi jiyanê re yek bikin û wisa binirxînin. Lê xwe bi fişal nekin, kesayeta xwe erzan û weke di civakê de pir zêde ye pêşkêşî bazarê nekin. Nexasim dê nêzîkbûnên we yên cînseltî ji xala bazarbûnê dûr bisekine û hûn ê xwe pir xwezayî tevlî bikin. Jibîr nekin, we di van mijaran de hêjî nêzîkbûnên feodal an jî burjuvaziya biçûk derbas nekirine. Hema bêje cînseltiya we di destê we de weke amûrek bazirganiyê ye yan jî bê ku hûn qet di ferqa vê rewşê de bin, bi înkarkirina jiyanê re re rûbirû ne. Kesên wisa durû û şêweya meta nêzî kesayeta xwe dibin qetiyen nikarin bibin xwedî pêwendiyên azad û xwezayî. Exlaqek rast a xwediyên van helwestan jî çênabe. Ev jî tekbirina jiyanê ye. Kesên wisa dijîn ne hezkirina wan, ne jî evîna wan dibe. Ji ber ku pîvanên kesên wisa tine ne, tişta dikin xwe bi xwe xapandine.

Dema pêwendiyên azad û xwezayî nebin, siyasîbûn û leşkertî jî nabe. Ger pêk were jî wê yek alî be û teşeyî be. Di encamê de jî belaya serî be. Weke têkîliyên jin û zilam ên entrîkayên feodalî, komplogeriya feodal ku di dîrokê de gelek mînakên wan hene, dibin çavkaniya gelek neyêniyan û hûn ê jî rê ji têkîliyên wisa re vekin. Ev ne hêjayî milîtanên PKK'ê ye û nayê pejirandin. Ev xal hatine dahûrandin. Hûn ê li ser vî bingehî xwe ji nû ve ber çavan re derbas bikin û di mijara jiyana xwe de bûna xwedî biryarê mafê xwe bibînin. Rastiyên bingehîn hene. Rastiya welat, rastiya rêxistinê, rastiya azadiyê yekser bi vê ve girêdayî ye. Dema ev nebe ti hêza we nabe. Girêdayî van rastiyên bingehîn wê mafên mirovan, mafên jinê û azadiya jinê li ser van bingehan pêş bikevin. Jiyana azad ji bo zilaman jî nêzîkbûna rast û xweşik, dûrbûna ji kirêtî û koletiyê, ronîkirina her cure rastiya hezkirina watedar gengaz dike.

Gengaz be dê hêz bide partiyê, gel û welatparêziyê, şer pêş bixe, derfetên serkeftinan jî biafirîne û veguherîne çavkaniyekê. Jiyana azad wisa bigirin dest. Ji hêla xweser ve jî tişta ji hevalên me yên jin tê payîn ev e. Hûn ê hewldan û serkeftina vê raber bikin.

Asta ku dahûrîn dixwazin we bigihîne wisa ye. Tişta ku pêwîste hûn ji pratîkên we jiyan kirine û avabûna kesayetên xwe derbixin holê, lêpirsînan bikin, hem jî rast nêz bibin û xebatên xwe jî di vê çarçoveyê de berdewam bikin. Di vê mijarê de lêkolînê pêş bixin. Lêkolînên xwe, esasî jî lêhûrbûnên xwe li ser esasê serkeftî ber bi erkên xwe ve biçin pêşve bibin. Dema hûn carek din bi ser erkên xwe de çûn -ev erk her cure erkin, ev pêwendî û jiyan, pêwendî û jiyana li her qadê dibe- bidin têrkirin, divê hûn têra her tiştî bikin û serkeftî bin. Divê hûn bizanin partî jî, Rêbertî jî ev e û ji bilî vê rê nedin ti jiyanên din û serkêşiya vê bikin. Rêgeza ku we heta dawiya jiyana we birêve bibe û serwer be bizanin ku ev e û divê hûn di asta mînak de nûnertiya vê bikin. Ji ber ku hûn ji her kesî zêdetir hewceyî vê ne, hem jî weke şervanên dilxwazên vê bi meşekê re rûbirû ne.

Rastiya Rêbertiyê li ser vî bingehî ji jinê bawer dike. Hem jinê weke rastiyek objektîf, hem jî bi nêzîkbûnek ku hatî îdealîzekirin ve digire dest. Ji ber ku yeqîn dike hem a rast hem jî ya xweşik ev e. Misoger asta we ya baldarî jî li ser vî bingehî pêş ketiye. Vêca ya dimîne hewldane, xwe her tim berçavgirtine û bi şêweyek rikbar bi hêza nêzî serkeftinê bûyînê ve xwe avakirine. Dê ev jî nasname, azadî û jiyana ku bi we daye windakirin li ser vî bingehî cardin bi we bide destxistin. Nexwe kesên ku partîbûn rast û zelal pêk ne anîne, çi ji hêla kesên ku ji partiyê qutbûnek cidî dijîn ve, çi jî rewşên cuda û ji xwebûna xwe dûrketî dijîn dibe, neçarin ku partîbûnê wisa pêk bînin. Ger kêm-zêde girêdana we bi rastiya Rêbertiyê ve hebe yan jî ev ji bo we wateyekê rave dike, êdî divê hûn van rastiyan têbigihijin. Hûn dikarin bi her tiştî bilîzin, lê mixabin hûn qet nikarin bi partîbûn û li ser vî bingehî bi nirxên Rêberbûnê bilîzin. Dibe ku gelek tiştên we yên ji bo we pîroz hebin, lê belê hinek nirxên me hene wisa hêsan dev ji wan nayê berdan û bi wan lîstin nabe. Ez ji ezmûnên jiyana xwe jî baş

dizanim ku, her ku partîbûn rast tê fêmkirin û pêkan dikare bê jiyîn. Em dikarin li dijî dijminê herî hov jî jiyanê ser bixin an jî pêşî li îmhayê bigirin. Em dikarin li ser vî bingehî jî ser bikevin.

**25 Cotmeh 1993**

## PARTÎ KOMBÛNA KEDA ŞOREŞGERÎ YE

Bi PKK'yîbûnek rast, PKK'yîbûna ku bersivê dide hemû pirsgirêkên şoreşa me. Ev bi xwe dana pejirandin, bi vê hemû hêza xwe ve bizanin bibin PKK'yî û ev erka we ya bingehîne. Em jî sedema vê û çawa çêbe bi hemû hêza xwe ve datînin holê. Pîvana rêzdarî, girêdan, duristbûn, her cure cesaret û fedekariyê têgihiştina vê û reftarên xwe yên bingehîn li gorî vê xurtkirine. Şoreşgerî ne hemaltiye. Şoreşgerî hunereke û ziraviyên wê hene. Hewldana vê jî, hewldanek esîl, hilawî û encamgire. Keda şoreş, şoreşger û yeke partiyî keda mezin û dayîka hemû kedên dine. Divê hûn van xalan tevan weke navên xwe hîn bibin. Partî keda şoreşgerî ya lêhûrbûyî ye. Mirov jî dikare bi keda xwe tevkariyê ji keda şoreşger a kombûyî re bike. Nexwe ger hûn li cihê ku mafê we nîne hewl bidin keda lêhûrbûyî desteser bikin, ne bi tevkariya vê kedê, hûn bi rêbazên dizok nêzîk bibin, bi xizmet û xebatek her wiha hinek tişt ne hilberînin û tevlî nekin, an hûn ê di nava şoreşê de mafxwar û beleş bijîn, an jî hûn ê hewl bidin yekê bidin û ji dêvla wê jî dehan bigirin. Dibe ku ev jî we ber bi dizkerî û hîlebaziyê ve bibe. Keda kesên ku, ne li bendê ne partî bersiva keda wan bide û her tiştê ku ji xwe biqedîne bide, keda şoreşgerî ye. Li şûna helwesta ez yek didim deh dixwazim, helwesta ez hezar didim qet naxwazim a herî guncave.

Qadroyek rasteqîn an jî kesek partiyî, kesê dikare bê ku bersivê bixwaze rave dike. Bi vî şêwazî tevlîbûna PKK esasgirtin, li gorî cewhera PKK'ê ye. Ev xisleta herî bingehîn û kûr a PKK partiyek sosyalîste û ew di rastiya Kurdistanê de pêkanîne. Jixwe mijara nîqaşêye ku hûn çiqas vê hêmanê nîqaş dikin. Ji ber ku hinek caran kesên ku qet tiştekî nadin lê pir tiştan dixwazin an jî yekê dide şûna wê dehan dixwaze, yekê dide hezarî dixwaze tên dîtin. Ev hemû helwesta çînayetî ne. Qet nedayîn lê hemû xwestin talangeriye. Ev nêzîkbûnek mêtîngerî û hevkariya wehşî ye. Yek dayîn û deh

xwestin dizîtiye, nêzîkbûna kompradorên hîlebazin. Yek dayîn û yek xwestin jî karê burjuvaziya biçûke. Ji ber ku burjuvaziya biçûk dibêje; “Bi qasî didim bersivê jî dixwazim.” Ango PKK weke partiyek burjuvaziya biçûk hizirîne. Bi hewldanek bê sînor ve dayîn, bi heman şêweyî ev ked parastin û rêvebirin, şoreşgeriya ku herî kûranî sosyalîzmê yan jî bingeha çînayetiya wê girtiye. Ji ber ku ev hem ked dide, hem keda xwe diparêze û raçav dike.

Êdî divê ev xal bên fêmkirin. Hûn jiyana xwe dibexşînin, hebûna mirov a herî dawî bikare bide jî ev e. Ger hûn wê jî neparêzin, neyînin rewşa ku neyê ewlekirin, dê ev jî diyar bike ku hûn çiqasî xafilin. Ji bo vê pêwîste hûn serwextbin û rastiyên bingehîn weke navê xwe fêr bibin. Feraseta fedekariyek we ya cuda heye. Hûn ked didin, lê ne diyare ku dê encama wê çibe. Hûn keda xwe beşdarî şoreşê dikin, lê ne di ferqê de ne ku kî didize û dibe. Sosyalîstiyek wisa nabe. Ev xafiltiye, li hember keda xwe û heta kesayeta xwe bêrêziye. Kesê ku beramberî xwe ne rêzdar be, devjê berdin PKK’yî be, hatiye selmîn ku nabe mirov jî. Sedema bingehîn a derketina PKK’ê rêzdariya pêşî li hember mirove û her çûye li hember jiyana wê ya li ser bingeha sosyalîstiyê ye. Ev çiqas bê pejirandin û li ser vî esasî milîtanî pêş bikeve, mirov jî ewqasî mezin dike.

Me ev pênase ji mêj ve kirine, lê pêkanîna wê hêjî pir sînordar dimîne. Hûn çima qet vê fêr nabin? Di vê cîhanê de tiştek din a we mijûl bike nîne. Şûna ku pêwîste ev jiyana di nirxa zêrîn de her tiştê we be, ramanek, helwestek, kesayetek, şêwaza jiyanekê li pêş we ye, beramberî vê hûn çima xwe mijûl dikin, çima xwe seqet dihêlin û her roj tine dikin? Ma hûn zewq ji xwe tinekirinê digirin?

Êdî em dixwazin yeqîn bikin ku kesên gav avêtine nava PKK’ê ev kar rast fêm kirine. Tişta ku divê bê kirin ne dema ku hema tê xwestin mirine, ev kar di bin her mercî de rêvebirin û serxistine. Ya ku bikare vê bike jî civatên mirovane, di her mercî de kesayetên ku bizanin bibin çare ne. Rewşên ku derdikevin holê bi destê kî, çima û çawa çêbûne bila be, di bin ronahiya vê çarçoveya ku me xêz kirî de encamek derdikeve holê. Gelek tîpên ku berpirsên biryargehê û qadan derxistine holê, didin diyarkirin ku yên diziyê dikin û weke

koleyan kar dikin zêdetirin, li ser vî bingehî partî tê valederxistin û ber bi tasfiyê ve tê birin. Dema mirov baldar nêz dibe, weke ku ti eleqeya vê nêz an jî dûr bi rastiya Rêbertiyê ve nîne, wê bê dîtin berovajî ev valederxistine.

Benîadêm hebûnek dizane xwe terbiye bike. Ger di nava rastiya partiya me de evqas nebesî derdikevin holê û em nakevin ferqa vê ya rastî, dide diyarkirin ku em çiqas xafilin. Perwerde jî zanîna têgihiştina vê rewşê ye û ezmûn jî zanîna derbaskirina vê ye. Xizmeta me ne kêm bû, heta xizmetek ku bikare vî dijminî ji mêj ve têk bibe bû. Her tim hêrs dibim ku çima hêjayî vê nebûn. Me hemû diyarde û derfetên jiyana xweşik derxistin holê. Me xalên ku ji bo we ji nan û avê zêdetir hewce derxistin holê. Hûn ê jî van bi zanebûnek kûr ve ji bo xwe bigirin. Ji ber ku yên nizane û ji pirsgirêkan re nabe çare, karan dixetimîne, hêj nizane baxive û bimeşe hûn in. Qet nebê ya ku çareye ji we re hatî dayîn bigirin. Hûn hem pir birçîne, hem jî nizanin bixwin. Belê rewşa ku tê jiyîn tiştek wisa ye. Ez ji vê re dibêjim nehezimkirin û ev jî nexweşiyek pir xirabe. Girêdana vê bi mêtîngeriyê, rastiya me ya civakî û netewî re heye.

Dikare ev rewş ji gelek aliyan ve bê ravekirin. Hûn ji cewhera kar pir dûrin. Ev rewşa we xefletê rave dike. Her cure xisletên çînî didin axaftin. Nav PKK'yî ye, di navê de jî ji sedî yek PKK heye yan jî qet nîne. Rêjeyek mezin bermahiyên her cure çînê ne. Lewra bijareya hundurîn pir girînge. Ev jî tê wateya xwe neterbiyekirin, helwesta herî bi lenet hêjayî xwe dîtin û domandina vê ye. Em wisa xwe vale di bin fermana gel de amade nagirin? Em dikarin weke we 'aqiltiyê' bikin xwe bidin jiyîn. Lê pîvana me ya rêzdariya li hemberî gel, divê di her astê de û her şertî de ji karên wê yên şoreşê re bersiv bên dayîn. Rêzdarî jî wisa ye. Her tiştên din derewin, sextene û xwe xapandine.

Bi qasî yên ti kesî neyî, azweriyên me yên mezin û reftarên me yên nedihatin kontrolkirin hebûn. Lê dema berjewendiyên bingehîn ên gel dibin mijara gotinê, me jiyanek gav bi gav girt, xist xizmeta miletekî û heta vê rojê hatin. Êdî divê hûn bizanin ku wateyek vê heye. Xizmeta miletekî çiye? Mirov çawa xwe ji şoreşa miletekî re

dibexşîne, mirov çawa xizmeta miletekî û partiyekê dike? Egîdiya li ser vî bingehî çiye, rêbertî û milîtanî tê çi wateyê? Êdî hûn ê van bizanin. Nexwe gotinên weke; "Hinekê jî xwe bijîm, dema firsend çêbû bi şoreşê re jî bijîm û şoreşê jî mijûl bikim" ne egîdî, ne jî milîtanî ye. Lê mixabin ev rewşek pir xeternak a hema hema her kes di navê de dijiye. Li hemberî van tevan bi qasî em rêyek biçûk jî nehêlin neçarin xwe saxlem bigirin.

Me roja destpêkê jî ev nirxandin kirin û niha jî dikin. Pêşketinên mezin çêbûn. Lê helwest û reftarên wisa dij partî û jiyanê, heta kesên xafil nêzî xwe jî bûyîn derketin. Wisa bû, bi qasî di ti dîroka tevgerên cîhanê de neyî, me bi xwe zerar da xwe. Dikariya zerara vê kêmbûya, lê ji ber helwestên me hêjayî xwe dîtîn, em ketin rewşa ku dijmin ferq kirî û dibêje; "Çawa xirabûnê li xwe dikin." Bêguman girêdana vê bi dîroka lenetî ve heye. Kesayetên ku hatine avakirin, hinekê jî xwe neçarî vê dibînin. Bes partîbûn jî ev derbaskirine.

Xalek din jî ev e: Ger tu nikarî partîbûnê ser bixî, tu çima dadikevî qada şer? Ger hûn ê nekarin şer bikin wê demê hûn ê çima derkevin ser dikê? Rewşa gelek şervan an jî milîtanên me dişibe vê. Lewra xwe dijwar perwerde bikin, dema we biryar da derkevin ser dikê, wê demê jî xwe bi şêweyek ku hûn nekevin û bi kulma yekê ve gêj nebin bihêz bigirin. Ev hemû pêwîstiyên quralên şerin.

Me xwest em jiyanê ji hemû aliyan ve dewlemend bikin û bi derfetên bêsînor ve mirovê ku dikare bimeşe biafirînin. Her wiha me selmand ku ev dibe. Mixabin rêjeyek mezin a avaniya me devjê berde van ji hemû aliyan ve têbigihijin, xwe bi fêrbûnek sînordar ve têr dît. Niha jî em hewl didin vê derbas bikin. Ev derket holê: Yan wê tu vî hêştirî bajo, yan jî wê tu ji vî warî derbikevî û biçî! Êdî divê bê zanîn ev bi xwe dana alî, virde û wirde xwe dana paşve nayên derbaskirin. Êdî nabe ku bi fêlbaziyan, çewsandinan û şêweyên cur be cur bi rastiyan lîstinê ve di nava partiyê de bimînin. Hûn çiqasî xwe fêlbaz, çiqas kesên ku rast nabin bihesibînin jî, yan jî çiqas bixwazin di rewşa nahizire û pêşnakeve de bigirin, dixwazim hûn bizanin rikek me jî heye. Êdî divê hûn têbigihin heta ku em hene, ne gengaze ev helwest li hemberî me zêde bi bandor

be. Bi fêlbaziyên gundîtî, demogojî, nesererastbûn, neguhertin û nepêşketinê ve encam hatiba girtin, rewşên heyî wisa li hemberî me nedihatin jiyîn. Vêca bi gelemperî hatiye fêmkirin ku ya derbasdar nêzîkbûna me ye. Rastî pêkanîn ne biçûkbûne, duristbûn û mezinbûne. Ji ber dildariya we ya xwe bi xwe dana jiyînê zêde rêzdarî ava nake. Ti berjewendiya we di vir de nîne û hûn nikarin bêjin ku encameke di dest de jî bigirin. Jixwe ev ne çarenûse jî. Ger hûn hewl bidin dibe ku hinek tişt bibin.

Hûn jî ferq dikin ew koletiya sedî salan hinekê hatiye derbaskirin. Weke mirovên ku çavên wan nû fêrî ronahê dibin bê ku hûn bêjin; “Gelo ez ê bişewitim, an bêm şewitandin” we xwe avêt naverastê. Ev ne nêzîkbûnek azadiyê ya raste. Ji bo we zêde pêwîstî bi perwerde, terbiye û pîvan heye. Dema hûn hinekê wisa jî pêş dikevin yekser xwe tine dikin. Di vê mijarê de hesab û kitêba we nîne. Ev neraste. Ji bo vê terbiya siyasî û perwerdeya partiyê pir girînge. Dema dilketinên hezar salî ji nişkê ve şiyar dibin şaşiyên mezin û bêpîvanî derdikevin holê. Raveya xeteriyan jî wisa ye. Dema em li şoreşa Franse, Şoreşa Îslam’ê û Şoreşa Bolşevîk dinêrin, em dibînin ku ev rastî berfireh di nav wan de hatine jiyîn. Ev rastî di nava me de jî hatin jiyîn. Ger em bi qudretek mezin li ser van ne rawestiyan, me ji mêj ve xwe tine kiribû. Hêviya dijmin jî ev bû û hêjî hinekê ev e. Dijmin dihizire ku dê ev nekarin xwe venêrînin, kontrol bikin û wê bixeniqin. Em jî hewl didin rê li vê bigirin. Dibe ku her kêlî binketinek pir xirab bê serê me. Jixwe kes nîne ji xwe bipirse serkeftin çiye.

Me got em ê hêsan têk neçin û ev hinekê jî ji xwe re kir pirsgirêk. Hêjî gelek heval vê fêm nakin. Ji bo em hêsan têk neçin, hemû hêza xwe datînin holê, lê belê ew li pey axatî û paşatiya karin. Gelek kesên wisa hedê xwe nizanin hene. Gelek ji we naxwazin fêm bikin em heta mirina xwe di nava şerek çawa de ne û ji bo serxistina jiyanê çawa xwe parçe parçe dikin. Hewl didin encaman bikar bînin, berovajî bikin û weke burjuvaziya biçûk, feodal û birokratekî desteser bikin. Ev hemû xefletin. Di navbera mijûlahiyên me û jiyana van de dijberiyek heye û mixabin ev dijberî jî kûre. Gelek hevalên kevin jî di navê de, pir seyr dimînim

ku çima ev rewş fêm nekirine. Min berê jî diyar kiribû: Ger hûn ê bi egîdiya takekesî ve hizban ava bikin derbikevin pêşberî me, lê hewce nake weke bêje herdu destê min di çavên te yên kor de ye bi ser me de werin. Hinek hewl didin gelek erk û yetkiyê ji dizkerê herî zîrek xirabtir bidize yan jî bê ku pêwîstiya terbiyek herî biçûk bibîne xwe rêber îlan dikin. Nikarin du mirovan araste bikin, du helwestan raber bikin, berovajî hemû hunerên ji rê derxistina mirovan raber dikin û vê jî dixin dewsa rêbertiyê. Em ji bo van dibêjin kesayetên sosret.

Her ku Têkoşîna Rizgariya Netewî pêş dikeve, çi bajarî çi jî gundî dibe, meylên çîna burjuvaziya biçûk jî ava dibin. Me ev di nirxandinên xwe de diyar kiribûn. PKK rêxistina çîna herî bindest û herî karkere, pêşengtiya wê jî li ser vî bingehî ye. Bîrdozî, polîtîka û rêxistinbûna wê bi temamî ev esas girtiye. Lê belê me paşê lê nêrî, ev esas tên başçavkirin. Hinek xêra PKK'ê, bi derfetên PKK'ê ve dixwazin dîktaya her cure çînayetî ava bikin. Dema dîtin em jî li hemberî vê li ber xwe didin, vêca her kesî hewl da me dîktator îlan bike. Em li dijî dîkta, dîktaya proleter in. Jixwe dîktaya me rewa ye. Ji ber ku bi ked, bi tevgera çînî hatiye avakirin û otorîteya me jî ji bo vê çînê ye. Camêr qet kar nekiriye, ti encamê jî nagire, lê di bin navê demokrasiyê de tê û dibêje; "Ez ê herêma PKK'ê bigirim û di rojekê de xerc bikim." Feodalên berê jî ne despotên wisa bûn. Di nava me de rewşa gelek kesên nû jî wisa ye. Dema ev li beramberî xwe min dibînin, dibêjin; "Dîktatorî dike." Mirovek paşketî jî wisa na axive. Nabêjin; "Ev Rêbertî bi hewldanek ku benîadem neditiye ve kesek li ser vî karî disekine, ma ji me re dihêle?" Dibêjin; "Ez nûme, dê çawa di rojekê de min berde? Ez ê hemû partiyê serûbin bikim û li gorî keyfa xwe eyar bikim."

Wisa nabe! Ev bi qasî dendika hêjîrê jî mafdar bin nikarin wisa bikin. Kesên wisa hinde di nava bêterbiyek mezin de hatine mezinkirin, ser xwe çûne. Jixwe rastiya me ya civakî her roj van kesayetan dihilberîne. Hûn dibêjin; "Em hatine bibin PKK'yî û em ê bibin sosyalîst jî." Lê aliyên vî karî yên bêhempa ku pêwîste hûn fêm bikin hene. Ne ez van çêdikim. Ev abc'ya vî karî ye. Mixabin ev di nava partiyê de nikarin tevgera çînî jî îdare bikin. Heta ku

pêşengtiya PKK'ê nebe yan jî rastiya PKK'ê ya çînî di rizgariya netewî de neyê pêkan, ev kar bîst û çar demjimêran jî nayên meşandin. Ji bo vê pêşengiya sosyalîstî jiyanî ye û di rizgariya netewî de jî tê pêkan. Jixwe ji bilî vê tinebûna netewî misoger dibe û ev hatiye piştrastkirin.

Li gelek herêman hema bêje gelek kesan got; "Ya esasî dervî partî mayîne." Hema hema ji hemû herêm, qad û bîrîman rapor tên û nêrînên weke; "Pêşengtiya partiyê xirab bûye, pîvanên partiyê nemane, pîvanên ku dijmin dide axaftin, her cure bandorên mêtîngerî û bandorên feodalî serdest bûne" hene. Tevî ku diyare bê xeta çînî em nikarin di rizgariya netewî de yek gavê jî bavêjin û bi hemû hewldana xwe ve pêşengtiya çînayetî esas digirin, çawa çêdibe ev helwest û reftarên dervî çînî, heta meylên dijminatî evqasî bi bandor dibin? Kî berpirsê vê ye? hûn dibêjin; "Em PKK'yî ne." Lê hûn pêwîstiya perwerdeyek ji rêzê jî bicîh nayînin. Ev hevalên me çawa partîbûnê pêk tînin û ji partiyê çi fêm dikin? Pîvan û pêkanên min di holê de ne. Min firsend neda bandorek dijmin a herî biçûk. Her roj hinek tişt ji dijmin qut dikim û gel qezenc dikim. Devjê berdin gel tengav bikim û bidim revandin, di pîvanek awarte de em hêza gel derdixin holê. Ev kesên nû hatine kîne? Çi hedê wane van tiştan dikin? Xwe dispêrin kîjan hêzî û çi wisa didin windakirin? Dema em van pirsan gelek ji wan dikin zimanê wan lihev dikeve. Ger kesayet bi we re nîne hûn çima hatin? Ger hêza we ya bi me re jiyînê nîne, çi karê we li vir heye? Em hesab ji kî dixwazin digirîn, gazinda dike û zimanê wî lihev dikeve. Ev tevgereke. Qural, pîvan û cewherek vî karî heye. Hûn ê jî van binasin û pêk bînin. Dema we dît hûn dikarin bikin bikevin navê, peyre jî bibin milîtanê wê. Ya rast jî ev e.

## PKK'yîbûn Bi Welatparêziyê Destpê Dike

Di roja me de partîbûn, artêşbûn, leşkerbûne, milîtanbûne û ji her pirsgirêkên civakê re bûna çare ye. Pîvanên PKK'ê yên niha wisa ne. PKK'ya di destpêka salên 1970'î de hinekê propagande kirin bû. Dema ber bi salên 1980'î ve hat, hinek hewce dikir PKK çek jî biteqîne. Di nîvê sala 1980'î de PKK'bûn êdî wêrekiya artêşbûnê raberkirin bû. PKK'bûna di salên 1990'î de zanîna destpêkirina serhildanan bû. Di roja me de êdî dewletbûn ji hêla pratîkî ve kirina rojev milîtantiya PKK'ê ya rasteqîne. Ango hûn ê bizanin bibin serdest. Pîvanê partî yê rasteqîn îro vê dixwaze. Ji ber vê xwe amade bikin. Hûn van çekan ji bo desthilatiya gel bikar tînin. Lê mixabin niha lê dinêrim, hûn nikarin du bizina birêve bibin. Ez ê çi ji PKK'yîbûnek wisa bikim? Nikarin rast li derdora xwe binêrin û rewşê binirxînin. Pirsgirêkek siyasî ya herî biçûk û pirsgirêka rêxistinê çareser nakin, hema hatine bibin bela. PKK'yîbûnek wisa nabe. PKK'yîbûnek ku dizane bibe desthilat esase.

Em jî bi salane xwe tengav dikin. Bi vê pratîka heyî û karên me kirîn ve xwe têr nabînin. Her roj hewl didin xwe ji peywirên nû re amade bikin. Li gorî ku ez neçarî vê me, hûn jî neçarin. Lê belê nêzîkbûna we dişibe gotina; "Di nava PKK'ê de şahî heye, em ê jî biçin bireqisin." Ya rastî quralên şahiyê jî hene. Hema ji xweber nabe ku mirov bikeve nava şahiyê û bireqise. PKK tevgerek mantiqe, tevgerek dîsîplîn û pîvanê ye. Tevgerek hişyar, çil carî hesabê her tiştî dike. Tevgera hem afirandin û avakirinê, hem jî parastinê ye. Hevalên me pir paşketî li rastiya PKK'ê dinêrin. Avakirina PKK'ê, avakirina pêşketina civakî û netewî ye. Dema PKK'yîbûn çêdibe civak pêş dikeve û netew pêş dikeve. Di rastiya Kurdistanê de jî navê vê pêşketinê PKK ye. Milîtanên me van tevan paşguh dikin. Erkek kirine devê xwe hema pê daxivin. Ev karê axatiya berê dikirin bû, yan jî axatiya herî kevin wisa destpê kir. Hemû tişta ku van ji otorîteya rêxistinê fêm kiriye weke dê û

bavê xwe, weke mêtîngerî, weke cendirme yan jî birokratan tevgerîne. Wê demê PKK'yîbûna we li ku derê ye?

Weke ku em ê misoger mijara partiyê paşçav nekin, bi vê lîstin jî nabe. Mebesta me ne kese, em naxwazin kesî biçûk bixin, lê êdî em napejirînin ku bi nirxên me bê lîstin. Rêzdariya kesekî ya li hemberî me bi partîbûnê tê pîvan. Bila cureyek din ne kes bê cem me, ne jî ji me daxwazkar be. Pîvanên me yên bingehîn tên fêmkirin û vekirîne. Pîvanên em behs dikin, pîvanên mirovatiyê ne, pîvanên pêşketina civakî ne û ev hatine selmandin. Vêca wê çima hêjî li hemû qadan û bîrîman pêşengtiya partiyê bê tinekirin, xirabkirin û ji rê derxistin? Jirêderketin di vir de ye û zehmete ku ev bê efûkirin. Min heta niha tehemûlî van kir. Lê ev hêz jî bi min re heye. Dema hewce kir derdikevim pêşberî wan dikarim bi şêweyek ku ruhê wan jî nebihîse, qet nezanin û ne hesibînin wan vale derbixim û carek din nekarin bi ser xwe ve werin wan bavêjim. Ev jî erka me ye.

Gelek ferasetên seqet ên weke; "Tevgera azadiyê bedewe, lê her kes dikare bikar bîne" hene. Dibe ku hêza me têra her tiştî neke, lê divê her kes bizane em wisa hêsan xwe terkî van ferasetan nakin. Em li hember her tiştê jiyanê baldarin. Tevahî cîhan bi me ve mijûl dibe, dixwaze me biqedîne, ez di ferqa vê de me. Em hêj li meydanê ne, însiyatîf di destê me de ye, bila neyê fikirîn em ê wisa hêsan dev ji meydana şer berdin. Jixwe şerê ku me bingeha wê avêtiye sedsalan digire nava xwe. Dema wisa be em jî neçarin ji destpêkê ve bi aqil bin. Hinde we ewqas tişt hêjayî xwe dîtine, hûn dibêjin; "Partî bê min nikare, partî dev ji min bernade û partî bi ser min de nayê." Wê çima partî bi ser we de neyê? Vêca li dîrokê û rastiyan binêrin: Di nava me de wisa li hember rastiyan birik, heta berxwedaniyek koranî zêde tê jiyîn. Sedemên van fêm dikim. Bi camêr re dilketin heye, ketîbûna hezar salî heye, xerîzeyên hatine çewsandin û meylên çînayetî hene û dixwaze van har bike. Hûn nikarin harbûna xwe jî bispêrîn me û li hemberî me bidominin. Xwediyên vê tevgerê jî hene. Ne tenê di nava PKK'ê de, di nava hemû refên netewî de, heta dikarin di asta cîhanî de jî bihêz bin û

me biçewsînin, lê nehizirin ku me wisa hêsan radest bigirin, hêsan bînin lîstokan û hêsan me vale derbixin.

Hinek kesayetên di refên me de bi derfetên me û firsendên ku dayîn ve li dijî me bizavan sazûman dikin. Hem li dijî me helwestan raber dikin, hem jî hewl didin vê rizgar bikin. Ev helwest hem rebentiyeke, hem dijminatiyek mezin û xeflete, hem jî bê astbûn û bê exlaqiyek mezine. Ger ev kesayet aqilmend bûna, wê dîtiban ku em ya rast didin her kesî. Mirina di vê rêyê de, ji jiyana pergalê bedewtire. Ma ji bilî vê hûn dikarin çi bixwazin? Ger hûn bêjin; "Ez milîtanê xirabiyê me", em jî we efû nakin. Vêca neqehirin, negirîn, nenalîn û hema jixweber xwe ne avêjin erdê. Hûn weke civata dînanin, lê em jî hewl didin we bi sazûman bikin. Qet nebê hinekê werin ser hişê xwe. Hinek xisletên vê tevgerê hene, pêwîste hûn van cidî bigirin. Jixwe hûn milîtanin û sedî sed di fermana partiyê de tevdigerin. Ma peywira milîtan bi partiyê lîstine? Ma peywira milîtaniyê bi şêweyek herî xeternak, li cih û qonaxek herî xeternak pêşengtiya partiyê valederxistine, şibandine tiştên dine? Hêjî gelek kesên ku hedê xwe nizanin hene. Gelek deman dihizirim ku çi ji van bikim. Dibêjim tiştên ku ev dikin bi çavsoriya wan ve girêdayî ye. Ger hinek hêza van jî hebe, li gorî quralên şer bi me re rast şer bikin dîsa ne xema mine. Ancex rewşek wan a wisa jî nîne. Ev jî me hêrs dike û van bi lenet dike. Em hewl didin van ji vê rewşê rizgar bikin.

Ji dervî me jî gelek rêberên sexte yên ketîne, heta dawî bê îrade, dizanin her cure amûr û zilamê dijmin hene. Em bi van tevan re mijûl dibin. Weke me diyar kirî, heta ku em hebin, dê ev hewldan bidomin û tenê bi me jî sînor nayê diyarkirin. Ev helwest li Kurdistanê, helwestek di dilê gelê me de ye û wê encam bigire. Teqez wê çend kesên aqilmend ji cihekê derbikevin holê, egîdiyê esas bigirin û di dergeha vê tevgera me de her tim kesayetên wisa hene. Lewma divê baş hesab bê kirin. Êdî ev civak weke berê ne bê xwedî ye. Tevgera rizgarî ya ku me pêş xistiye, ne tevgerek wisa ye ku her kes li gorî keyfa xwe şîrove bike. Niha ne qonaxa di nava bêçaretiyê de mayîne. Qaşo di gotin de gelek kes partîbûnê erê dikin, lê dema dor tê pêkanîna pratîkê, rewşa dijî partî hema bêjin li

ser partiyê serwer bûye. Hema bêje jiyana li gorî pîvanên partiyê pir bi sînore. Gelek kes di raporên xwe de dibêjin; “Min ne karî xwe, hatim xapandin, ne ketim ferqê û xafil bûm.” Bi van gotinan diyar dibe çiqas dijmin dide axaftin, çiqas xetimiye û dervî partî û artêşê maye. Mirov van gotinan wisa hêsan ji xwe re napejirîne. Di raporên xwe de vê dinivîsin, tenê bi vê ve jî sînordar namînin, hêjî vê dike. Ma kesê ku evqasî kena xwe bi xwe dike, bi rastiyan evqasî dilîze sererast dibe? Yê xwe terbiye nekirî rêzdariyê jî nabîne. Kes ne van hez dike, ne jî ji van re rêz digire. Yên xwe wisa digirin dest sererast nabin. Suc jî yê wane, bila suc li cihek din negerin.

Di vê babetê de xalek din em serve bikin darazîne. Di rastiya PKK’ê de darazîn, dema ne li gorî cewhera PKK’ê be û rêbaza wê pêk neyîne, bi wê bilîze û dijber bikeve, tevgerek hesab xwestinê ye ku derxistiye holê. Ger hinek nirx û quralên bingehîn yên vê tevgerê rastin û hûn jî di nava vê tevgerê de yan jî li qada tevgera wê ne, li beramberî vê li şûna ku xwe tam li gorî cewher, qural û şêweya vê amade bikin, bi zanebûn an jî bêzanebûn bikevin rewşek dijber, bi israr her cure helwestên şaş û kêmasiyan bidomînin, dê ev rewş ne bi perwerde û rexneyan, bi darazînê, ango bi saziya ku dadgeh bi nav dikin bên çareserkirin.

Bi salane em di rastiya PKK’ê de hewl didin bi rexneyan mirovan sererast bikin, bi salane hewldana ku ti tevgerê nekî em dixwazin karbidestiyê bidin qezenckirin. Yekser vê bêjim, jiyanek bê PKK, bi temamî jiyanek di rewşa dadgehkirinê de ye. Jiyana me ya netewî û civakî ya ji dervî rastiya PKK’ê bi lenete, di rewşa darazînê de ye û weke jiyankirina tawanbarekî ye. Jixwe ji hêla dijmin ve hukmê vê ji mêj ve hatiye dayîn, ango cezayê vê darvekirine. Jiyanek bê PKK, jiyanek ku bandora PKK’ê lê nîne sucek giran dihewîne. Cezayê herî giran ê sucê herî giran jî ji dervî jiyanê mayîne. Gelê Kurd, kêm-zêde bi PKK’ê re ji darvekirinê rizgar dibe, ji rewşa sucê giran ber bi tîmarbûnê ve tê û dema dibe PKK’yîbûnek baş bi temamî rewşa tawanbariyê derbas dike. PKK’yîbûn di heman demê de tevgera derbaskirina rewşa tawanbariyê ye. Xwe ji sucê giran ê dijmin li ser civak û netew

serdest kirî dana efûkirine. Pêşî ji hêla darazîn ve PKK tevgera xwe dana efûkirinê ye û ev raste. Hûn çiqasî PKK'yîbûnê pêk bînin, hûn ê ewqasî ji rewşa tawanbariya giran derbikevin, her wiha hukmê darvekirina li ser we rabe û xwe bigihînin asta mirovê durist ku xwe bê tawan hiştiye, benê darvekirinê qetandiye û di vê wateyê de xwe tevlî jiyanê kiriye. Lewra PKK'yîbûn ne partîbûnek mirovên ji rêzê ye. Partîbûn tevgera kesên ku êdî ji tawanên giran bûhranê dijî, şaşwaz dimîne û dixwaze bê efûkirin, bûna mirove û xwe dana efûkirinê ye. Ger nêzîkbûna we ji PKK'ê re wisa be û we wisa destpê kiribe, tawana xwe ya berê domandin, tê wateya ku tawana heyî du qetî zêdetirîn giran dibe. Me fêm kir hûn di nava civakê de tawanbarin. Sedî salane dijmin hûn kirine xayînê welat û xayînê civakê. Lê hûn bûn PKK'yî, lewra we xwe sererast kir. Cara duyem tawan jiyîn, xwe ji ya berê du qetî zêdetirîn anîna rewşa giran a darazînê ye. Ji ber ku di gotinê de sererast bûye, em jî wî wisa fêm dikin, lê ew rewşa tawanbariyê didomîne. Lewra dikeve rewşa paşketîtir û tawanek girantir dike.

Tawan du carî dubarekirin rewşek girane. Ya herî girîng neketina vê rewşê ye. Ger raste PKK tevgerek mirovahiyê ye, tê fêmkirin PKK'yîbûn jî ji tawanek wisa giran rizgarbûne, vêca ti hêceta du carî pêkanîna tawanê nîne. Ev rastiya jiyana PKK'ê ye. Ji bo wê hûn ê xwe bêhempa tevlî jiyana PKK'ê bikin. Hûn ê xwe bi quralên PKK'ê re bi yek bikin. Hûn ê jiyana xwe veguherînin şêwaza jiyana wê û saziya wê. Ger hûn wisa bikin mafê we yê jiyanê heye. Lê belê dema hûn bi vê re nakok bin û bi zanebûn quralên wê tengav bikin, hûn ê bên darazîn. Ji ber ku jiyanek me jî bi evqas mirin, xwîna şehîdan, îşkenceyê bidestxistî heye. Em destûr nadin îxanet li wê bê kirin. Rexne û rexnedayîn ji bo vê firsende. Perwerde jî, şer jî ji bo vê ye. Lê belê ger hûn wisa nekin û bêjin; "Ez ê ya kevin berdewam bikim", ev jî dijberî partiyê ye. Ev jî rewşek giran rave dike. Ger hûn kesayeta xwe ya kevin biparêzin, ti qural, jiyan û pêşengtiyê pêk neyînin, bikurtasî hûn bêjin; "Ez ê helwesta xwe ferz bikin", hûn ê tawana giran bikin û her cure belayî bînin serê xwe. Berpirsê vê jî ne kesek din, dê hûn bin. Hûn bi perwerdeyê yan jî bi çend xebatên pratîkî hinek tiştan

bigirin, hûn dikarin berdewamiya vê jî bînin. Kes ji we re nabêje destanan ava bikin, lê ger hûn bi zanebûn bêjin; “Ez ê xwe bidim axaftin”, ev xetere. Êdî divê em hemû fêm bikin, tevlî vê partiyê nebûn, dijberî quralên partiyê ketin û bi lenet jiyîne. Ya herî rast jî ev nepejirandine.

Jixwe ji bo vê “Terorîstbûna” PKK’ê di asta cîhanî de bûye pirsgirêk. Gelo “Terorîstbûna” PKK’ê çiye? Hewldana vê rewşa birîna PKK’ê ji holê rakirine. PKK dibêje; “Wisa mirov dibe mirov.” Lê hêzên ku lenetê jî li ser me ferz dikin dibêjin; “Dê weke em dibêjin be, ya hûn disepînin terore.” Ango ew tevgera me ya mirovbûnê “teror” dinirxînin. Ev hat asta pirsgirêkek nav-netewî. Em jî tiştên ku ew li ser me ferz dikin weke îxanet û komkujî dinirxînin. Gelo yê rast kiye? Elbet emin. Ji ber ku îxaneta ew ferz dikin, welatê me ji destê me girt, ruhê me tarî kir û her cure rûxandina civakî heta radeya dawî kir meriyetê. Ya bi lenet ev e û teror jî ev e. Ya PKK’ê jî şerê hevgihîna welatê xwe, ji nû ve sazkirina civakê û bidestxistina mirovahiyê heye. Ev jî mafê PKK’ê yê xwezayî ye. Bi kurtasî ev şerek tunde. Pêwîste di nava vî şerî de mirov cihê xwe baş diyar bike.

Tê dîtin ku, ji bo bi heman devê dijmin neyê axaftin an jî carek din em nekevin nav jiyana lenet a ferz dike, divê bê zanîn heta dawî em li gorî rastiya xwe tevbigerin û ji dil û can tevlî bibin. We dît hûn nikarin vê ser bixin, wê demê bê ku zerar bidin divê hûn cihe bibin. Lê ger hûn seknek dijber raber bikin, yekser hûn ê bibin aliyê ku şer dike û ger hûn di nava rêxistinê de bin hûn ê bên darazîn. Ango feraseta dibêje; “Hem di nava rêxistinê de bim, hem jî li dijî rêxistinê şer bikim” tam sîxurtiye. Ev dişibe rastiya baskê 5. a dijmin ku em behsê dikin û tawana herî xeternake. Hem wê dijminatî bilîze, hem paşverûtiyê bilîze, hem jî wê tu azadiyê bixwazî û paşê jî bêjin xwe nêzî min nekin. Ev tawanek pir girane. Ji derve de, ji eniya beramber yekser lêdan jî ewqas ne girane. Ji ber vê li hember nirxên rêxistinê ketina rewşa darazînê pir xeternake. Di nava rêxistinê de bûyîn û weke ku dijmin bikare bike kirin an jî tişta ku dijmin jî newêre bike kirin tawana herî girane.

Nexasim ketina rewşa dijminek wisa hema bêje berfireh dibe. Dixwazin PKK hema ne ji derve de ji hundur ve, bi navê PKK'ê hem jî bi navê PKK'yîbûna herî baş bi erdê re bikin yek. Ev fêlbaziyek mezine. Ya rastî em ji vê re dibêjin cureya dijminatiyek nû. Ji ber ku cilên PKK li ber xwe kiriye.

Min di televîzyonê de li yekî temaşe kir. Qaşo zilam di girtîgehê de nûnere, cilên milîtan jî li ber xwe kirine, bi navê PKK daxive, lê belê weke nûnerê dewletê yê di nava me de helwest raber dike. Li gorî xwe teorî pêş dixe, şîrove dike û her cure nirxandinê jî hêjayî me dibîne. Ger kesê ku duh di nava me de PKK'yî îro derketiye holê, ev di rastiyê de cewherê nade guhertin. Me ev şaş nasiye. Ger îro li cem dewletê ye, duh jî di nava me de heman tişt bû, an ku hêmanek dijmin bû. Ger wisa vekirî bi dewletê re êrîş dike, ev jî tê wateya ku eşkere bûye. Rewşa wî ya beriya niha jî, wateya dijminê ku eşkere nebûye. Nexwe divê em van baş binasin. Beriya em dijminê eşkere binasin, divê em van dijminan binasin.

Dijmin kiye? Kî di PKK'ê de dijmin dide axaftin? Kesê ku dijminê di nava me de dide axaftin, helwest û tevger çavkaniya xwe ji kî û kur digire? Pêwîste hûn di vê mijarê de pir hosta bin. Hêza daraza partiyê ya rasteqîn bi qasî van rewşan têdigihije, ewqas jî bicîhanîna pêwîstiyên wê jî digire nava xwe. Em ê yê kêm û nebes bi perwerdeyê, şaşiyê dike bi rexneyan sererast bikin û bînin ser hişê wan. Lê belê ger hinek bi zanebûn dijmin didin axaftin, yekser an jî ne yekser di radeyek diyarker de nûnertiya dijmin dikin, em ê bi qirika wan bigirin. Rewşa wan a darazînê ye, ne ya rexne û rexnedanê ye. Em ê li dijî van jî tevgerekê pêş bixin. Ji ber derdikeve holê ku hûn di vê mijarê de hinekê xafil tevdigerin. Hema her cure tevgerên dijminatî asayî dibînin. Hûn tawana herî giran dijîn. Ferdperestî tê ferzkirin, gelek kes kedê desteser dikin û bêmafî ferz dikin. Gelek reftarên ku ne hêjayî hevrêtiyê hene. Heta hinek bê ku tevdîrek herî biçûk jî bigirin, bîrîman ber bi tinebûnê ve birin. Ev dixwazin hîn zêdetir bierk bin. Gelo ev ne dijminatiye çiye? Rexne-rexnedan ji bo van çiqasî derbasdare?

Êdî divê em van rewşên di asta darazîn de yên di nava rastiya me ya partiyê de bê ku taloq bikin derbixin holê. Hema li her qadê,

di nava her bîrîmê de divê ji helwest û reftarên ku dijmin didin axaftin re yek çirkê jî destûr neyê dayîn û wext jê re neyê dayîn. Wê xwediyên van helwest û reftaran an weke heyî di nava pîvanên partiyê de bijîn, an jî em ê hesab ji wan bipirsin. Di nava me de kesên xayîn -di Îslamiyetê de ji van re dibêjin minafiq-, her cure provakatorên ku derdikevin holê, tîpên tasfiyeger û ya herî girîng jî nava çavên me dinêrin û bi me dilîzin hene. Ev hîn girîngtire. Kesên ku vekirî provakatoriyê dikin cuda ne, lê yên heta duh rêveberên partiyê bûn û ji nişkê ve vekirî dijminatî dikin hîn xetertirin. Li gorî min li vir şaşiyek we heye. Ya rastî kesên tevî ku PKK'yîbûn pêk ne aniye xwe weke PKK'yî nîşan daye, gelek derfet desteser kirine, dema firsendê jî dibîne bi dijmin re dibe yek û xwe ferz dike dijminên herî xeternakin. Pêşî divê mirov van çareser bike. Ji bo vê em ê di nava partiyê de darezandinê pêş bixin.

Bêguman di nava refên rizgariya netewî de xayîn û hevkarên dervî xeta partiyê hene. Dijmin jî dixwaze yekser ji van rêxistin an jî tevgerek ava bike. Ev bizav bi navê Kurdewarî, bi navê rizgarvaniya netewî, heta bi navê demokratbûnê me "dîktator" îlan dikin. Qaşo ew bi xwe jî demokrat in. Li hember rastiyê bêrêzî tê kirin, bes ne evqas. Ji dilxwe ve yên sedî sed hevkarin an jî hemalin, sedî sed dijminê ked û gelê xwe ne bizavekî ava bikin û navê wê jî bikin demokratbûn û qaşo li dijî dîktatoriya me jî dê van serdest bikin! Yek ji tawanên herî bênamûs jî ku tê kirin ev e. Yên ku bi mebesta siyasetê di eniyê de şer dikin, evqas ne tawanbarin. Leşker û polîsê dijmin jî evqasî ne tawanbarin. Rewşa wan tawanek pir girane. Lewra ne gengaze ku hinek kesên di refên rizgariya netewî de ne bi rexneyê, heta bi têkoşîna polîtîk bên sererastkirin. Bi temamî divê li gorî pêwîstiya quralên huquqî biryar bê dayîn û ev bên darazîn. Nabê ku di refên rizgariya netewî û refên şoreşê de, dijmin evqasî bidin axaftin. Cezaya vê cezaya herî girane. PKK'ê ev hinekê kir meriyetê, wê hîn zêdetir jî ji vir û şûnde bixe meriyetê.

Ji vê hêlê ve kîne pir xirab bi netewbûn û şoreşgeriyê dilîzin, pir xeter û zirav dilîzin? Ji bo ev pir bênamûsin gelek heq û

huquqên ku hatine bidestxistin binpê dikin û jiyanê jehir dikin. Pêwîste em van bizanin, binasin û dema hewce kir van darazînin û ceza bikin. Ev nayê taloqkirin û erkek pir girînge, pêwîste tiştên hewce di cîh û wextê de werin pêkanîn. Nexwe wê hemû destkeftiyên partiyê ji van re bên pêşkêşkirin. Bêguman li Kurdistanê derfeta darazîn û cezakirin derketiye holê. Tevgera me jî çi di nava partiyê de, çi jî dervî partî bi yekpare amûrek herî baş a darazînê ye. Dema em rê ketin me xwe darazand. Dema li dijberî dijmin jî rê ketin me dijmin û hevkarî darazand. Bi kurtastî her tişt darazand. Di encamê de yên bê tawan derketin holê û rewşa bûna tawanbarî jî ji holê rabû. Lê hêjî ev kar ne qediyaye, berdewam dike.

Bêguman şêweya vê dikare bê fikirîn. Em vê tenê di asta dadgeha partiyê de nagirin dest, bi şêweyek dadgeha serbixwe jî razber nakin. Ev bûyerek berfirehe. Em dikarin vê di tevahî pêvajoya jiyanê de ji pir aliyan ve bimeşînin. Em xwe, derdora xwe, hemû refê xwe, dost û dijminê xwe didarêzin. Heta ku ev kar tam pak bibe û em bigihin pîvanên mirovahiyê dê berdewam bike. Wexta em gihiştin welatparêzî û azadiyê, ji rewşa tawanbarê herî giran derketin, dibe ku darazîn di xala duyem de bimîne yan jî weke berê zêde ne girîng be. Lê heta wê demê dê darazîn bêrehm be. Em bi van helwestan ve di têkoşîna rizgariya xwe de bi rastiya salek pir giran ve dimeşin û bi zanebûna ku divê em bimeşin ve jî em ê şer bikin. PKK'yîbûnek bê darazîn û artêşbûnek bê darazîn nabe. Şûrê darazînê, şûrek pir tûje. Pêwîste teqez ev rast û di cîh de bê bikaranîn, da ku hûn bikarin şerê mirovahiyê ser bixin.

Me di gelek dahûrînên xwe de babeta welatparêzî vegotibû. Ev kar bi welatparêziyê destpê dike. Me ev diyar kiribû: Ger her kes parçeyek axa ku pêwîste xwedî lê derbikeve ji bo carek din berê xwe nediyê her tiştê xwe difiroşe û direve, ew xayînek herî mezine, xayînê welate. PKK her çendî wêran bibe, çiqas di rewşek neyê jiyîn de be, tevgerek bi dildariyek mezin hem hemêzkirina wê parçeya axê ye. Ger hûn vê wêrekiyê raber bikin, dikarin bibin PKK'yî. Waneya yekem ev e. Kesên ku vê hêzê bi xwe re nabînin û dibêjin; "Dilê min dixwaze wisa bijî, ez ê li wêraniyê û serê wan

çiyan çi bikim?" Ti carî ne dibin PKK'yî û ne jî dibin welatparêz. Wê ji gelek aliyan ve li ser welatparêziyê bê sekinandin. Cihê erdnîgariya ku Kurdistan jê re tê gotin di dîrokê de, vebûna wê ya ji mirovahî û şaristaniyê re, pêşketina wê ya çînayetî, firehbûna her cure civatên eşîretên qewmî yên nav-netewî, dê weke rastiyek mezin a dîrokî bê têgihiştin. Ji ber rewşa xwe ya heyî serdema me çima serdemek netewane, serdema her miletek xwediyê welatekî ye? Em çawa bê welat hatin hiştin? Bê welatkirin ji hêla kî ve û çawa hatiye pêşxistin? Di vê mijarê de rastiya me ya netewî çiqas hatiye wêrankirin? Belê vaye dijberê vê tevgerek rizgarî û tevgerek vegera axê ya çawa hewce dike? Çima hewce dike em pir qîmetê bidin vê?

Cîhanê jî bidin me, em ê vê nepejirînin, divê em bên ser parçeya welatê xwe. Pêwîste ev bibe qada jiyanê ya mezin û bi şêweya bê wê nayê jiyîn bibe mafek. Ger hûn pêşî vê pêk bînin û bi vê dest bikar bikin, wê demê hûn welatparêzin û dibin PKK'yî. Ji bilî vê bila PKK'yîbûn nayê fikirîn. Ger bi we re ruh û dildariyek wisa nebe, dê hemû keda we vale biçe û ti wateya têkoşînê jî nebe. Evqas sale tevî ku hema ji we tevan zêdetir derfetên min ên li derve jiyînê heye, ez vê tine dihesibînim an jî ji nidîtî ve têm. Ruh û hişê xwe bi derve girê nadim, cewhera bi navê axên welat tên pênasekirin ve girê didim. Li ser wan deveran dihizirim, jiyîna li wan deveran bi ruhê xwe didim dawerivandin û esas digirim. Li gorî ku em vê dikin, hûn neçarin ji vê zêdetir bikin. Şertê sereke hûn xwe bigihînin feraseta welatparêzî ye. Xwe bi tenê gihandina vê re jî têr nebînin, divê hûn hema hemû rastiya wê ya dîrokî û rojaneyî têbigihijin. Hem jî vê ne bi serwextiyek ji rêzê ve bi azweriyek mezin xeyala ez ê welat çawa veguherînim bihuştekê jiyînê ve bikin. Şertê sereke ya dibêje ez ji bo vî karî heme û ez ê di vî karî de bimeşim ev e. Dê ev dildariya we ya welatparêzî bilind bike. Wê evîndariya we bi çiyan, keviran, deştan, çûk û guran re be. Pêşî zanebûn û xiroşa vê bi xwe re ava bikin. Bila mejiyê we pêş bikeve û hinekê dilê we vebe.

Ev jî tespîtek zanistiye. Nexwe di bin her şert û mercî de bê ku têbikoşe, bi dilê xwe dev ji dîrok û axên xwe berdan ketîbûne. Em

jî ji gund û axê hatin qutkirin, lê ji bo cardin vegerin ketin nava şerekî. Min got; "Gundê min ji te vediqetim, lê teqez ez ê rojekê vegerek azad pêk bînim. Axa min, eserên min ên dîrokî, çiyayên min, gurên min, çûkên min, ez niha ji we diveqetim, lê teqez ez ê rojekê bizanim ku azad li we vegerim." Helwesta me ev bû. Lê hûn cihê ku diçinê yekser dibêjin; "Evder qada jiyanê ye" û xwe dixapînin. Rewşa me ne wisa ye. Sonda min heye, min got dê li ser sonda min dildariya min jî wisa be û ev jî selimand. Yên dibêjin; "Me ev fêm nekir û tênegihiştin", xwe bi xwe dixapînin. Ev jî derket holê, her kes bi qasî silavê nede we ji rêzê dibîne, paşverû dibîne û qet nirx nadê we. Jixwe zêde derfetên ku karekê ser bixe û jiyanê jî saz bike tine ne. Em ê hem aqilmend, hem jî şiyar bin. Em ê çavên xwe baş berdin ser vê parçeya axê, hest û ramanên xwe jî wisa birêxistin bikin û sonda jiyînê bidin.

Me hewl da welatparêziyê pir kûr vebêjin. Lê mixabin gelekan aliyên vê babetê yên pir sînordar fêr bûne. Derdikevin ser çiyayên semyan, lê bê wate dinêrin. Dadikevin geliyan, di kêleka xirbeyên dîrokî re derbas dibin, lê deng ji dilê wan dernakeve. Mirovên serdema destpêkê jî evqas ne hov bûn. Girêdana wan a bi axê re zêdetir bû. Hestên wan ên eşîrtî jî ji ya wan revokên welat ên erzan baştir bû. Welatê ku Kurdistan tê penasekirin, ji warên bingehîn ên yekem car şaristanî lê derketî û destpêkirina pêşveçûna yekem a mirovahiyê ye. Dîroka vê erdnîgariyê hêjayî lêkolînê ye. Rewşa welatê me ya erdnîgarî, pir rakêşwere, dikare li ser her cure hilberîn bê pêşxistin û sazîbûnên civakî bên damezrandin. Çiyayên wê, deşta wê, kanza wê, ava wê û petrola wê jî heye. Bes xwedî lê derbikevin û wê ber bi damezrînek civakî ya nû ve bibin. Em her cure derfetên ku bikarin ji vê herî baştir bikin didin we. Feraseta di bingeha welatparêziyê de jî wisa ye.

**6 Kanûn 1993**

## YÊN DÎROKA PKK'Ê BAŞ NIZANIN NIKARIN BAŞ NÛNERTIYA KESAYETA PKK'Ê BIKIN

Her ku diçe hûn hîn zêdetir nêzî ruh, zanebûn û kesayeta rastiya têkoşîn û şerê me dibin û gav bi gav veguhertinê dijîn. Em paşeroja we ya bi lenet û çiqas bi nexweşîne dizanin. Em dizanin ev ne çarenûseke, ji cihekê destpêkirinek gengaze, lê heta niha weke hûn dihizirin ev pêk nehatiye û rêbaza rêya rast jî cuda ye.

Ji bo gavên destpêkê saxlem pêş bikevin, me hewldanek mezin raber kir. Min her kêlî bawerî û hişmendiya vî karî pêş xist û hewlda pêwîstiyên vê yên pratîkî jî di asta awarte de bikim. Lê belê ji ber pakbûn, xambûn, bêbaldarî, bê eleqebûna kesên ku em bawer dikin hevrê ne, ji bilî her cure nebesiyên ku me hêvî nedikir û nedihat payîn ji gelek neyêniyan re jî rê vekir. Hema me dijmin daniye aliyekê û em bi xwe ve mijûl dibin. Nexwe bi lenetî bûyîn van encaman diafirîne. Ji civakek evqasî eybî û ketî ev derdikevin. Hemû hêviya me dê we di wextê de ev rewş têbigihişta, rê jî bi gavên lezgîn û dijwar esas girtiba. Niha em baştir fêm dikin ku li cem me ya girîng **tempo û şêwaze**. Çareya yekane ya ji vê rewşa lenetî derketin şêwaza rast, helwesta rast û tempoya raste. Heta ku tempoya têrkar nebe, ne gengaze ku mirov sax ji vê rewşê derbikeve. Dîroka îsyan û têkoşîna me vê pir vekirî destnîşan dike.

Ger kesayetên pir dijwar têkçûyî xwe di rastiya Rêbertiyê de bidin der, belaya herî mezin derbikeve holê. Ev di her şoreşê de hinekê tê jiyîn, lê bi qasî ya me ne giran û bi jane. Bi rastî jî zehmete mirov mînakek bi qasî şoreşa me xwe ewqasî dide mijûlkirin bibîne. Di şoreşa Fransa, şoreşa Îslamê û şoreşa Cotmehê de jirêderketin û bi hevdu re şerkirin pir zêde ye. Lê dîsa jî şêwaza wan tê fêmkirin û mirov dikare li cihekê cîh bigire û çi pêwîste rehetî bike. Ev çi di vî refî de, çi jî di wê refê de dibe. Lê di nava me de şêlo ye, tevlîheve û seknên pir şaş hene. Kîjan kes li ser çi dilîze û kî digire ne diyare. Hinde xwe aniye astek tevlîhev, ewqas ji karbidestiyê dûre, bi xwe jî nizane xizmeta çi dike. Ne di

ferqê de ye ku kîjan xetê, kîjan polîtîkayê dimeşîne û vê di pratîkê de çawa diyar dike. Vaye bêçaretî di vir de ye.

Demdirêj berdewamkirina nêzîkbûnên we yên **şêlobûn** û xumam xisleta we ya herî diyarkere. Hûn nabînin bi nêzîkbûnên we yên nebes re hewldana we xizmetê ji çi re dike û rêy ji kî re vedike. Em ji destpêkê ve li hemberî vê pir bi terbiyebûn, me xeta çînek awarte disepand û pir jî hesas bûn. Em ji bo kesê di dana şerkirinê de pêkhînerên pir bêhempa bûn. Mixabin ên herî zêde dibêjin ez proleterim, eslê min xizane, ez girêdayî kedê me jî, kesên ku nizanin çawa ji kî re kar dikin, hema bêje di nava me de hejmarek zêde ye. Tişta seyr jî hûn hewl nadin van rastiyan kêliyekê zûtir bibînin û xwe bigihînin xeta çînayetî. Di encama şêlobûn û tevlîheviya mejî nizanin ji çi re çiqas xizmetê dike, derdikeve holê ku hema sal tên çarçûrkirin. Ev rewşa we hûn dijîn mirov bêhêvî dike yan jî mirov tîne wê astê ku bêje heyfa wan. Hûn bêxemin û zêde gumanên we nînin. Xet jî bibe mijara gotinê, hûn xwe bêçare dihêlin. Em ji bo şerê xetê di wextê û cîh de xebatê dikin. Devjê berde ji bo encamgirtina wê hûn xwe bidin xebatê, hema bêje şerê xetê nayê bîra we. Nexwe em ê bi we re çi bikin? Ger hûn xwe newestînin, şer kûr nekin, em ê çawa we bidin jiyîn, heta ku pêşengtî neyê kirin em ê çawa we bidin şerkirin?

Civaka me heta dawî, civakek xwe ji radestbûnê re razandiye. Hûn jî vê rewşê heman weke teslîmiyeta ku dijmin li ser civakê ferz dike di nava partiyê de dijîn. Hûn nikarin kesayeta berxwedêr û dijber derketinê raber bikin. Rastiya di jiyan û rêxistinbûnê de diyar dibe, nexasim zêdetir rastiya dijmin û kesayeta ku wî aniye asteke nenase. Bi salan tena xwe bi van karan ve mijûl bûm. Min destûr neda bi qasî misqalekê jî xet ji rê bê derxistin. Min derfetên xetê, pêşkêşî çînek din, hêzek din, filan û bêvan nekir. Min ev kesîm hemû jî dan karkirin, hemû jî ji bo berjewendiyên şoreşê bikar anîn. Lê belê we derfetên çar bi çar ên ku me dayîn destê we jî pêşkêşî hinek din kir an jî hema we xwe kir şûna hemalên wan û hişt ku kedxwariyê bikin. Çawa li ser gundiyan, hemalan û cotkaran kedxwarî tê kirin, di nava partiyê de jî bi navê çînên din hûn wisa çavkaniya kedxwariyê ne. Hûn di wateya xetê, di wateya

bikaranîna bîrdozî û polîtîkayê de wisa ne. Burjuvaziyên biçûk û her cure xeta navîn we bikar tîne, lê mixabin hûn ne di ferqa vê jî de ne.

Hemû hal û reftarên kesên ku xwedî li xwe dernakeve û xwedî li keda xwe dernakeve mirovan hêrs dikin. Zêde wate nadim feraseta we ya rêzdarî û girêdanê û vê jî pir paşverû dibînim. Ev feraset nûnertiya esasên xeta proleter -em dikarin ji proleter cudatir navê wê bikin gel an jî mirovahî- nake, nikare bibe hêza azadî û hêza xwe parastinê. Ez ê bi ezmûnên xwe yên jiyanî ve vê tevgerê wisa pêş bixim, lê dê gelek rêveber jî wan qadan û derfetan wisa bikar bînin! Li vir nakokiyek mezin heye. Ji ber vê perwerdeya nava partî û perwerdeya xetê pir girînge. Tevî ku hûn evqasî xwe bêxem û xam dihêlin, bê ku qet şerim bikin, aciz bibin dîsa jî bêjin; "Ez heme, amademe" zêde rêzdariyê ava nake û zêde wateya wê jî nîne.

Diviyabû mirov xwe bi rêkûpêk bike, xwe tevlî rastiya têkoşînê bike û niha rast nêzî vî şerê em didin meşandin kiriba, hêza jê re baniya, bûba hêza meşandinê, çi di asta herî jor de, çi jî di asta herî jêr de tevkarî kiriba û bizanibiya di her astê de bibe xebatkarek wê. Çima ev nabin? Hemû karê hûn dikin tê wateya "me çewsand, em hatin çewsandine." Ji bilî vê tiştek din ji devê we dernakeve. Hûn diyar dikin ku çiqas bê bandor hatine hiştin û çiqas rola xwe ne lîstine. Kesê rêber, kesê milîtan wisa nabe. Rêbertiya PKK'ê di van mijaran de xwedî hewldanek mezine, hûn çawa wisa dikarin xwe bispêrin vê û jiyana erzan hêjayî xwe bibînin ez fêm nakim. Her roj ji xwe dipirsim çiyê te kême û hezar carî bersivê didim. Hem hûn evqasî bi me ve girêdayî ne, hem bi qasî min nekiriye hûn xwe ji pir aliyan ve di vî karî de dibexşînin, nexwe hûn çima di encamgirtinê de û kar ewlekirinê de evqasî nejêhatîne? Gelek ji we dişibînim gundiyan. Agahiya we nîne hûn çawa dijîn. Em dikarin li rewşa we, ji çi û kî re dixebitin, leşker û xizmetkarê kîne binêrin, hîn baştir bersiva vê bidin. Em çima li vê cîhanê dijîn? Em bi temamî ji kî re kar dikin, di bikaranîna kî de û di stratejiya kî de cîh digirin? Rastiya me ku em jê re dibêjin gele, di xizmeta kî de û ji bo kî erzan dixebite? Ciwanên me, mirovên me yên ji her kifletî

malên kîne? Diviya we bikariya di nava partiyê de bi salan lêpirsîn kiriba. We tawanbar nakim ku çima we xwe lêpirsîn nekir û çima we xwe mezin nekiriye. Lê piştî ji cihekê û çend têgehên bingehîn hatin têgihiştin, hûn ê li ser hewcedariya vî karî bihiziriyan. Hûn çima ya hêsan digerin? Heta ku perwerdeyek kûr û xwe mezinkirin çênebe, hûn nikarin di kêleka jiyanê re jî derbas bibin. Evqasî erzan nêzî jiyanê bûyîn, evqas bêberpirs, nêzîkbûna evqasî xafil, tevlîbûna bê ku bizane dibe malê kî û ji çi re şêwaza we ye.

Bê zanebûn hûn bi gelek nexweşiyan ve zerarê didin partiyê. Hûn firsend û derfet didin gelekan, me jî nêvengê jî di nava tevlîheviyê de difetisînin. Piştî ku me evqasî rê û rêbaz şanî we da, ma pir zehmete hûn serkêşiya karekî bikin? Hûn fedekarin, ne tirsonekin, we jiyana xwe jî bexşandiye, lê her tişt bi vê jî pêk nayê. Jixwe, dema ev bi tena xwe tê destgirtin ev xwe kirina qurbane. Li gorî we hinek xwediyên we ne, hûn di wê rewşê de ne xwe ji eşîretê re dikin qurban. Ya rastî sosyalîstek an jî şervanek kedê xwe wisa nade bikaranîn.

Hûn bi sedan perwerdeyan re derbas dibin. Tevî vê jî weke belayekê dibin serkêşê bîrîmeke ji rêzê, kesek jî nikare ji vê rewşê re bêjê raweste. Yek dernakeve di qadek me ya xebatê û bîrîmek me xebatê de vî helwestî raber nake. Çend kesên nesekinî hene ku bi salane dinasim. Ev li serê bîrîman û qadan bûne bela. Hinek jî ferasetek weke ku bê wî ev têkoşîn nameşe dijîn. Lê mixabin ev bela serîne, ger hûn van ji nav xwe bavêjin wê pêşketin çêbe. Lê nêzî hev nabin. Lewma hûn dibêjin; “Me lihev kir.” Di vî halê we de hûn heman weke **koalîsyona paşverûtiyê** ne.

Di nava partiyê de hewldanên hevdu bêbandorkirinê heye. Hûn ê bi vê xwe bigihînin kuderê? Ez hinekê lihev dikim, lê dema lihev dikim tevdîrên xwe yên pêşketina çil cureyî digirim. Elbet nayê payîn ku hûn bi hemû hêza xwe ve şêwaza Rêbertiyê pêk bînin. Nabêjim bi temamî weke min jî bikin. Bes qet nebê, xwe rizgar bikin, xwe bigihînin şêwaz û hêza ku bê gotin endamên partiyê ne. Bila jêhatiyek we hebe, têrbûna we bê sazkirin. Ger peywira we ne ev be, hûn çima beşdarî PKK’ê dibin? Piştî hûn xwe negihînin vî şêwaz û têrkariya PKK’ê, PKK’yîbûn li ku derê dimîne? Tenê

gotina; "Ez ê gazincan bikim, ger nebû xwe bavêjim erdê", ma şêwaza PKK'ê ye? Ger hûn bikarin bibin endamek ji rêzê ew jî başe, lê hûn wê jî nakin. Nexwe wê partî çi ji we bike? Ger hûn jiyana xwe hinekê di ber çavan re derbas bikin, hûn ê bibînin mejiyê we tevlîheve û kesayetên we ji lêhûrbûnê dûrin. Heyfa we ye. Di refên me de kesên xafil pir bi bandorin, hewldan kême, li ser rastiyan serwerî û bûna şopdarek yeman bi qasî em bêjin tineye kême. Dema diçim cihekê dim ji xwe dipirsim ger ez ê nekarim du peyvên rast vebêjim, nekarim du helwestên rast raber bikim, ez ê çima biçim? Ger di rewşa nekarim tiştekî bidim de bim, ez ê çima derkevim pêşberî we? Ger ez ê nekarim di civînekê de helwestek an jî polîtîkayekê diyar bikim, çima ez ê bi van karan ve mijûl bibim? Niha ez biçim kur, bi kîjan kesî re peywendiyê pêş bixim, ez ê wî çar bi çar bixim ber fermana têkoşînê. Rêbertî wisa dibe. Kî dibe bila be, helwesta me ya partiye û encam jî ya partiyê ye.

Bi sedan pêwendiyên we hene, lê belê ne diyare ku ev xizmeta kî û ji çi re dikin, hemû tevlîhevin. Ev têkîlî we ber bi îmhayê ve dibe, lê hûn ne di ferqa vê de ne. Ev helwest ji gelek ferasetên pir xeternak re rê vedikin û hûn vê jî nabînin. Milîtantiya partiyê ya wisa nabe. Min ev diyar kiribû: Çawa hinek fêrbûnên we yên hûn nikarin bê wan bikin hene, hinek şêwaz û xisletên partiyê jî hene, divê hûn bê wan jî nekarin bikin. Şêwaza partiyê beriya hemû fêrbûnên we ye. Fêm dikim ku asta we çiqas ketiye, lê mirov bizane bilind jî bike erka jêvenegere. Ger hûn tev jî vê nekin, teqez di nava we de kesên hinekî aqilmend hene û ew jî dikarin pêşiya vî karî bigirin. Ger hûn dixwazin ser bixin, ji bilî **pêkanîna rastiyan** ti çareya we nîne. Jixwe ne gengaze ku em we cuda jî bidin jiyîn. Gel dana jiyîn û we dana jiyîn pir zehmete. Em ê çawa we rakin? Ji xwarin û vexwarinê, ji cihekî birina cihek din bigirin heta we nêzî bûyera şereke pir cidî bikin, em ê we çawa bidin meşandin? Divê hûn vê hêsan nebînin, ji ber ev karek pir girane. Gelek ji we bûne misqalek û wisa hatine. Lê mirov wisa naçe şer. Hûn kesayetek nikare du gotina bike û her kêlî ji her cure şaşiyan re seknek vekirî raber dikin. Di rastiya jiyanê ya herî cidî a şer de, ji diyardeya ku pêwîste nêzîkbûna herî bi tevdîr bê kirin, hûn ê jî rast nêzîk bibin.

Pêngava 15’ê Tebaxê jî di nav de, min ji kesên diçûn dibûn gêrîla pirsî, dema hûn dikevin nava welat û başdarî çalekiyan dibûn, gelo we hesabê çend roj piştî wê dikir? Digotin; “Me ne dizaniya wê piştî bîst û çar demjimêran çi bibe.” Bifikirin, demek dirêj çalekiyên hemû birîman wisa bûn. Çalekiyê lidar dixe û çek diteqîne, lê nizane dê piştî wê bîst û çar demjimêran çi bibe û ne di xema wan de ye. Bi navê partiyê çek teqandine, bes ewqas. Lê belê berpirsyariyên we yên mezin hene. We leşkerek kuşt, çekdar derketin serê çiyê û artêş bi ser we de tê. Ger hûn nekarin hesabê piştî wê bîst û çar demjimêran bikin, em ê çawa bikarin we bidin jiyîn? Nabe ku hûn di nava partiyê de bêjin; “Ew xal me eleqedar nake.” Ger we eleqedar nake, dê kî vî şerî pêş bixe?

Em çarenûsa hemû komên xwe di ber çavan re derbas dikin. Lê mixabin kesek dernakeve ku bêje; “Me çalekiya çekdarî da destpêkirin, temamkirina pey wê re jî karê me ye.” Li ti welatên cîhanê ji derve de zêdetirî panzdeh hezar gêrîla nehatine avakirin. Dev ji avakirina panzdeh hezar gêrîla berdin, **Mao**, **Lenîn**, **Ho Chî Minh** jî ji pêncî kesî zêdetir perwerde nekirine yan jî perwerdeyên wan jî ji bilî çend semîneran pêşdetir neçûye. Min li vê qadê panzdeh hezar, heta zêdetirîn jî milîtan ava kirin. Hem jî min li welatek derve ji sifirê destpê kir û xwedî kirin. Em ji baweriya wan bigirin heta çek dana milê wan, min ew perwerde kirîn. Lê ew xwedî li peywirek herî ji rêzê jî derneketin, heta hejariyek berpirsyarî ya herî mezin raber kirin. Xwestin herî tiştî bi min bidin kirin. Di cîhanê de mînakek wisa nîne. Ew ji tiştên ku min li vir kirîne ji dehî yek li çiyan bikin, dîsa başe.

Dikare terbiya partiyê, perwerdeya partiyê, bawerî û şêwaza partiyê bê girtin. Hûn nikarin bêjin ji bo vê jî wext nîne. Ji min zêdetir wext û derfetên we heye û we bidest xistiye. Nexwe di vê mijarê de bi we re nêzîkbûna rast, şêwaza kar û berpirsyariya vî karî nîne. Ya rastî ya herî baş li wan çiyan dikare bê pêşxistin. Hûn nikarin bi vê feraseta berpirsyariyê ve welat rizgar bikin. Dev ji rizgarkirina welat berdin, hûn nikarin xwe, heta roja xwe jî rizgar bikin. Rizgarkirina we bi serê xwe hewcedariya rêxistinek rizgarkirinê derdixe holê. Ma em ê gel, an jî we rizgar bikin? Hema

bêje em bi dudiliyek wisa re rûbirû ne. Ji ber ku rewşa gelek ji we dijî ya bê **rizgarkirine**. Rêjeyek mezin ên tên hewl didin xwe rizgar bikin. Bes peywira me rizgarkirina gele. Hûn çima van hemûyan fêm nakin? Hûn ê beramberî vê bêjin; "Fêlbaziya gundîtî yan jî pozbilindiya rewşenbîrî li gorî min baştire." Çima hûn dibêjin; "Çima ez ê hewldanek pir şiyar raber nekim ku, ez ê xwe bi hewldanek ji rêzê têr bikim, tevlîbûnek kislan û keyfa xwe bikim û bijîm, ev li gorî berjewendiyên min guncavtire" û dev ji xwe diberdin. Ev rastiya me ya civakî ku herî bi lenet hatî jiyîne û encama ku bi we re diyar dibê ye.

benîadem her cure hesaban dike. Şêwaza mezinkirinê ew ji her tiştî re amade kiriye. Tu çi bidiyê wê bigire, tu bêjî çi vexwe wê vexwe, tu bêjî çi bike wê bike. Nizane başî, bedewî û rastî li kur û çawa ye. Ji bo xwarina ku dijmin dide dest bixe bi bazdan pêşbaziyê dike. Bi temamî îxanetê pêşkêş dike û ji bo îxanetê pêşbaziyê dike. Em ji civakek wisa hatine. Gelo di nava we de çend kesên ku li dijî îxanetê bertek raber bikin hene? Heta li ser xwe bihizirin: Ma hûn nizanin, dema hûn ji welatparêziyê direvin, pişta xwe didin nerxên bilind ên bingehîn an jî pêwîst nabînin xwe bigihînin wan, dema hinek firdikên parî û derfetên dijmin digirin çawa pêşbaziyê dikin û baz didin? Gelo ji yekî rev û ber bi yeke din ve bazdan çiye? Ev bazdana îxanetê ye. Ger hûn heta hemû şaneyên xwe bi vê jiyane, elbet dê kesayetên we bi nexweşiyek giran, ketîbûnek giran û rizînê re rûbirû be û ev rewş jî tê fêmkirin. Perwerdeya şoreşgerî qet nebê hinekê ji bo dîtina vê û derbaskirinê ye.

Em sedemê netevlîbûna we ya ji xeta fermande û pêşengtiyê re datînin holê. Yeqîn nakim ku zarok jî evqasî xwe dixapînin. Ez jî zarokan dinasim; dema tu yek-du tiştên rast dibêjî bi wê ve girêdayî dimînin. Zaroktiya herî xeternak, zaroktiya we ye. Hûn pir rikbarin, we çavên xwe ji rastiyan re girtiye û vê jî di polîtîkayê de weke rêbazekî bikar tînin. Ev hemû ne tenê karên minin; sererastkirina jiyanê, rast tevlî rêya welat û partiyê bûyîn, zêdetirîn karê we ye. Em ê bi vî halê we ve çi ji we bikin? Ger em we qebûl nekin hûn ê li naverastê bimînin. Dema dervî welat, serê çiyan û girtîgeh dibe

mijara gotinê, mirov darve dikin. Wê dijmin we parçe parçe bike. Gelo hûn dizanin bi vê bê eleqedarî, bêxemî, bêrêbazî, bêuslubî, kurtasî bi vê şêwaza jiyana we ve dê çi bê serê we? Li raporên ku hatine dinêrim, nûçeyên rojane temaşe dikim, neçar dimînim van ji we re vebêjim. Hinde biryarên şaş hene, ji ber vê dijmin her roj mirovên me parçe dike. Em vale vale mirovên xwe yên weke çiya winda dikin. Sedema vê jî ji ber nebûna rêveberiyên saxlemin. Ev ne windahiyên li gorî pêwîstiyên şerin. Dema pêwîstiyên şer hatin sepandin, dê windahî di sifrê de bin. Hûn çiqasî ji rastiyên şer birevin, hûn ê ewqasî windahiyan bijîn.

Em evqasî qiyametê radikin. Hûn nikarin bêjin; "Em nabin mirov" an jî hûn nikarin vê ji min re biselmînin. Pir baş tê bîra min: Dema ez karmendê tabû kadastro bûm çûbûm gundekî. Gundiyekî digot; "Begê min, van gotinan ji me re nebêje, guhên me evqasî dirêjin." Ez wê demê dihizirîm ku ev zilamek çawa ji xwe re dibêjin "em guhdirêjin." Ecêbe lê ew gotin ji min re gotibû. Min wê demê ti wate nedabû vê gotinê. Lê mirovek aqilmend bû. Ev gotina wî dide diyarkirin ku gundiyek aqilmend bû. Ji ber ku ferq kiribû ez dixwazim çi bêjim, rastiya civaka me çiye û dijmin em anîne çi halî.

Di bîra min de ye: Mêzeyek dep hebû, dema ez daxivîm wî destê xwe li qurmê darê da û got; "Ma tu dikarî vî qurmî şîn bikî? Em mirovên wisa hatine ziwakirinin." Li gorî vê teoriyê jiyîn, ji gundiyên ku tiştekî nizanin zêdetir paşverûbûne.

Lewra carina li jiyana we dinêrim û hêrs dibim. Ji ber ku bi jiyanê dilîzin. Hûn ne di ferqê de ne divê jiyan çawa bê meşandin. Tîpên ku di nava PKK'ê de, hem jî di astên herî girîng û bingehîn ên PKK'ê de dijîn hene. Hûn serê wan jêkin, dev ji vê şêwaza jiyana xwe bernadin. Ne kar dike, ne jî dide kirin. Bes navê wan jî bûye 'rêvebir.' Ji van re dibêjim **Komîteya nerêvebirinê**. Gelek komîte û fermande di vê rewşê de ne. Hêjî ji xwe dipirsim ev çawa wisa bûn. Gelo em pir lewazin, an jî ew pir bihêzin? Ya rastî ne pir bihêzin. Çawa ku di nava civakê de kedkar ji aliyê hejmarî ve zêde ne û tevî ku mafdarin tên çewsandin û mêtînkirin, di nava me de jî hinek dixwazin vê bi me bidin kirin.

Dibe ku bi temamî hêza me têra civakê neke; lê di nava partiyê de em dikarin vê çareser bikin. Em dikarin nava partiyê li gorî xet û kedê eyar bikin. Di vê mijarê de kar ji kesê ku dibêje; “Ez PKK’yî me” re dikeve. Em ê çima karê xwe nekin, çi derdek me din heye? Ma we ji bo vî karî her tiştê xwe nebexşand? Vêca hûn ê her tim bêjin; “Hêza me têrê nekir, em hatin lîstokan, hinekan em çewsandin?” Di navbera helwesta gundiyek ji rêzê paşketî yê civakê û xwediyê vê ferasetê de ti ferq heye gelo? Wî cendirmeyek, we jî kariyerîstek diçewsîne. Her du jî heman tiştin. Axa gundî bikar tîne, di nava rêxistinê de jî yên axatiyê dikin we bikar tînin. Hûn wisa hatine û wisa jî diçin. Ev ne rastin. Nabe ku PKK wisa bê nirxandin. Ev vê rave dikin: “Em nikarin bibin mirov, nikarin nûnertiya serfirazî û şerefê bikin, nikarin ser bixin, em neçarin hevdu vale derbixin, hinek karan bixetimînin û kirêt bikin.” Ma mafê we ji vê re heye? Qet nebê di nava partiya me de pêwîste mafê ti kesî ji vê re nebe. Hûn neçarin fêm bikin kesên ku bi israr dixwazin vê biselmînin hewl didin çi bidin axaftin. Hinek ji we qet nebê yên dibêjin; “Ez ji vî karî re amade me”, neçarin ku pir bi bandor bersivê bidin van rewşan û helwestan. Ji ber ku tişta dibe tê serê kesên durist, kedkar, xwediyên kedê ango serê we. Ji ber vê şoreşgeriya xetê pir girînge. Xwe kom bikin.

Polîtîkbûyîn, di vê çarçoveya ku hatî destnîşankirin de xwe komkirin, bûna xwedî feraset, zanebûn û helwestê ye. Kesayeta polîtîk ev e, kesayeta rêxistinê jî ev e. Weke hûn bê nan û avê nikarin, bê kesayeta polîtîk û kesayeta rêxistinê jî nikarin bijîn. Ji ber ku ew hîn zêdetir û kêlî bi kêlî ji we re hewce ye. Ez jî xwendevanim û weke we fêr dibim. Jixwe yê fêrî min jî dike nîne. Ez her roj ji jiyanê fêr dibim. Lê qet nayê bîra min ku min şaşiyek cidî kiriye. Li dîroka têkoşîna me binêrin: Gelo weke we yek rojê şaşiyek min cidî û binkeftinek xebatê rêxistinê çêbûye? Na, di hemû qonaxên jiyana min ên girîng de pêşveçûn û encam her tim bihêz û serkeftîne. Vê lêkolîn û lêgerîn bikin. Hema hesabê her qonaxê û her rojê bikin. Hûn ê bibînin, her tim serxistin, xurtkirin û serwerî heye. Di van mijaran de pêşveçûn û serkeftin misogere. Ev feraseta me ya serwere. Vêca di vê mijarê de li xwe binêrin, gelek

tişt ji destê we hatiye derxistin, heta we xwe winda kiriye, lê ne di ferqa vê de ne. Jiyana we ji destê we diçe, lê belê hûn nikarin li hemberî vê ti tevdîrê jî bigirin.

Ma diyardeya kes ewqasî tine dibe? Tu lê dinêrî ji nişkê ve xwe kiriye qurban. Ez vê naecibînim û xeternak dibînim. Hûn nikarin ruhê xwe wisa tine bikin. Hûn weke hemalan ked didin, lê şoreşgerek nikare weke hemalekî kar bike. Şoreşgerek entellektûel, rêveberî, rêxistinî û siyasî kar dike. Nexwe, qebeheta we ya herî mezin we xwe di wextê de perwerde nekiriye û bê amadekarî nêzî rastiyek cidî ya weke şer bûne. Em jî hewl didin wê sererast bikin. Ji ber vê qet nebê em ji vir û şûn de ji qonaxa herî girîng a pêşiya me re bi partîbûnek têrkar bersivê bidin.

## PKK Tevgerek Ronî Dike û Hêz Ava Dike

Êdî derketiye holê ku fêrbûna dîroka partiyê çiqas girînge. Yên dîroka partiyê baş nizanin, nabin şoreşger, ev ne dikarin nûnertiyek rast a kesayeta PKK'ê, ne jî kesayeta şer bikin. Ji bo me zanîna dîrokî ji ber fêmkirina rojane pir hewce ye, ji bo bidestxistina pêşerojê jî şertê sereke ye. Dîroka partiyê şêwaza hebûna me ye. Heta ku dîroka partiyê neyê zanîn, mirov nabe PKK'yî. Tenê zanîna dîroka PKK'ê jî têrê nake. Heta ku hûn vê hemû di kesayeta xwe de neqiş nekin, tevahî kesayeta xwe li gorî dîroka partiyê ji nû ve ava nekin, ango lêhûrbûna vê bi temamî di cewhera xwe de diyar nekin, hûn nikarin bêjin em PKK'yî ne. Ev hinekî bi dîrokê, têgihiştina rastî û şaşiyên bi navê PKK dibin, xwe gihandina kesayeta ku şaşiyan red dike û rastiyan jî erê dike ve gengaze. Şêwaza jiyana di nava PKK'ê de wisa ev e. Ji vê hêlê ve dîrok ne tenê daneyek zanyarî ye, bi temamî şêwazek jiyanê ye. Dîroka me ya rasteqîn a ku têkil jêhatiyên we dibe yan jî wan zindî dike, dîroka me ya azadî û kesayeta rasteqîne. Misoger divê hûn ecnam ji vê derbixin. Nezanîna dîroka partiyê, ji wê jî wêdetir tênegihiştina vê dîrokê, her wiha li gorî keyfê weke PKK'yî behsa jiyînê kirin, temamî xwe xapandine û bi vegotinên erzan ve jiyana wê kesayeta şêlo ya ku hûn bilêv dikine.

Heta mirov dikare vê dîrokê ji aliyên cur be cur ve jî bibîne. Ya rastî ez ji vê re nabêjim dîrok jî. Ji bo me niha, heta pêşeroj pir girînge. Ji ber me zêde dîrok jiyan nekir, me hêj PKK nekiriye malê tevahî gel, an jî tevahî gel nekiriye malê PKK, da ku bibe dîrok. Di vê wateyê de dîrok ji aliyê serketiyên ku dîroka binketiyan, ji aliyê binketiyên ku dîroka serketiyan ve tê jiyînê. Me tam ne ser xist, ne jî tam bin ketin. Ango me dîrok jiyan nekir an jî zêde nikarin dîrokê biafirînin. Dîrok afirandin, tiştên ku me ji xwe re kirine armanc tam jiyîn û ev jî li paşerojê hiştine. Roja destpêkê em derketin holê me çi gotibe, hêjî dibêjin. Nexwe dîrok hêj tam ne hatiye afirandin.

Her tim pêwîst dike **destpêkirinên nû** pêk werin. Heta di wateyekê de PKK'yîbûn jî ji nû ve tê destgirtin. Dema me got em PKK'yek nû ava bikin, qesta min ev bû. Çima ji nû ve PKK'yîbûn gengaze? Ji ber ku em hêj di nava dîrokek zindî de ne û dîrokê nû dinivîsin. Ji vê hêlê ve jî PKK'yîbûn her kêlî gengaze. Divê dîrok weke daneyek zanyariya girêdayî paşerojê nebîne. Dîrok ev kêlî ye, dîrok hiş û helwesta qonaxa pêşiya me ye. Hûn bal bidinê, hemû nirxandinên me li ser PKK'ê ne. PKK çawa ye, xisletên wê yên şerkerî, terbiya wê û hema di her xalê de ji bo xisletên wê bên ronîkirin em mijûl bûn. Em zêde bi dîrokê re eleqedar nebûn. Ji ber niha ya girîng PKK bi xwe ye. Ger em nekarin xwe bigihînin qanûn û xisletên PKK'ê ya ku rêxistinek pêşenge, em nikarin peyre gav bavêjin. Ger bavêjin jî, -jixwe me evqas windahî dan, evqas ji pêvajoyên tinebûnê re derbas bûn- dibe ku xirabtir bê serê me û wê heyfa hewldanên me be.

Berpirsyariya we jî li hemberî hezaran şehîd heye. Ger em îro tevdîr negirin, dibe ku ji ya ku heta niha bûye zêdetir windahî di sala pêşiya me 1994'an de derbikevin holê. Ji bo pêşî lê girtinê, pêwîste ji her alî ve çeka partiyê bê hemêzkirin. Ez kesek berpirsim, hêsan xwe terkî dijmin nakim. Hûn tên dibêjin; "Tu me dibî kur bibe." Ma tiştek wisa dibe? Hûn ê kesek hêjayî pêşeng û rêber bin. Ez ê çima we bi vî halê we ve rakim? Hûn nikarin bêjin; "Ez ê bi zorê li ser pişta te bimeşim." Hûn ê weke hevrêyekê saxlem bimeşin, em çi bêjin di heman kêliyê de wê fêm bikin û di heman kêliyê de bixin meriyetê. Hevrêbûna PKK'ê wisa dibe. Hinek di raporên xwe de didin diyarkirin ku çawa bûhranê dijîn, çawa xwe kirina bar û avêtine erdê, çawa lîstoka nexweşiyê dikin. Ma di rêhevaltiya PKK'ê de tiştên wisa dibe? Lê belê tişta ku niha dibe ev e. Hema bêje refên me bûye hêlîna nexweşiyan. Bes PKK warê mirovên saxleme. PKK tevgerek ronî dike û hêz ava dikê ye. Ma PKK'yîbûnek wisa qet dibe? Cîhan bi ser min de tê, lê min bi qasî we xwe ne avêtiye erdê, weke we bêçare nehişt. Ev helwestên we yên bi navê PKK'ê nayên pejirandin. Gelo hûn jiyanê giştî, taybet jî jiyana partiyê çawa fêm dikin?

Tevî van hewldanên min tevan, her roj lêpirsîna xwe dikim gelo min meşek saxlem kiriye yan na? Ji ber bi navê miletekê tevdigerim. Çarenûsa milyonan mirov bi me ve hatiye girêdan. Ev, ji bo we jî derbasdare. Hûn ne bi navê xwe, bi navê partiyê dijîn. Bi navê PKK'ê jiyîn jî, -sih-çil milyon Kurd hene, heta ne tenê Kurd jî- tê wateya hûn bi navê mirovahiyê di nava çalekiyek mezin de ne. Ev jî ji we kesayetek çar bi çar dixwaze. Nexwe hûn ê weke kesên pir nesekinî, pir xafil û hedê xwe nezanê derbikevin holê. Hûn bi navê kî tevdigerin? Evqas şehîd hene, rojane berxwedêr hene, şeref û serfirazî heye, bi milyonan mirovên ku bi hebûn û tinebûna xwe ve xwe feda kirin hene, lewra hûn weke nûnerên wan di nava PKK'ê de ne. Hûn ê hêjayî wan bin û mafê wan bidinê. Ma ji bilî vê em dikarin PKK'yîbûna we hêjayî xwe bibînin? Hûn ê çawa hêjayî evqasan bibin? Ger ev hemû rastîne, nexwe ji bilî ku hûn xwe saxlem bikin ti vebijêrka we nîne yan jî ji bilî hûn xwe têrkar û bêhempa bikin zêdetir çi mijûlbûn û fikarek we dibe. Berovajî, ji bo xwe gihandina vê hem pêwîste hûn her tiştê xwe bexşînin, hem jî kêlî bi kêlî xwe bidin vî karî. Di PKK'ê de destpêkirin ev e.

Diviyabû ji roja destpêkê ve ev wisa hatiba fêmkirin. Min yeqîn dikir hûn çawa tevlî refê me bibin, hûn ê wisa fêm bikin. Lê piştre min fêm kir ku, yên hatine bi her cure nexweşiyê ve hatine. Mirov pê yeqîn nake. Çiqas tîpên bela û sosret hene, hemû hatine nav PKK'ê. Ji wan re vê dibêjim: Em fêm dikin ku civakê hûn xistine. Bes êdî hûn hatine nav PKK'ê. Pêwîste di vê mijarê de nebesiya rêveberiyê nebe. Em ji mirovê me yê tê re rast daxivin. Vêca mafê min heye ku ji vir û şûn de ji her kesê ku tê tevlîbûnek rast hêvî bikim û daxwaz bikim heta dawî wisa bimeşin. Em tam bi we re eleqedar dibin. Vêca divê tevlîbûna we jî tam be. Hûn nikarin bêjin; "Min berê hedê xwe ne dizaniya, berê fêrbûnên min hebûn." Hûn ê van fêrbûnên xwe tevan weke bi kêrê jê bikin, bigirin û bavêjin. Hûn hatin bibin leşker. Dîsîplînek vê û şêwazek jiyana vê ya pêwîste her kêlî amade be heye. Her kes dizane tu hatî nav PKK'ê ku rêxistinek şer dike ye. Hûn jî wisa hatin. Ma dibe hûn bêjin; "Min ne dizaniya ku wisa ye?" PKK her roj di çapemenî û

weşanan de derdikeve, êdî diyare ku em li çiyan û çawa şer dikin. Nexwe, hema her kes dizane ku tevlî çi bûye.

Tê gotin ku kesên ji axaftinê fêm nake yan jî bi başiyê terbiye nabe mafê wî lêdana darkutike. Darkutik jî bi pêkanek herî bê rehim ve rûbirû mayîne. Jixwe em nikarin bêjin şoreşger bi darkutikan sererast dibin. Em perwerdeya bi darkutik napejirînin. Di partîbûnê û artêşbûnê de nabê ku bê gotin; “Ez nikarim xwe kontrol bikim, nikarim dîsîplînê pêk bînim, jiyanê ranakim.” Piştî ku hûn tevlî partî û artêşê bûn, nepêkanîna dîsîplîn, zehmetî, eleqedarî, rêvebirin û rêxistinkirinê tawane. Wê pêşî fermande û kesê rêber pêkhînerê herî baş ê vî karî be. Wê fermande di her astê de têrbûna xwe rave bike, da ku şervanê ji rêzê jî bikare xwe bigihîne têrkariyê.

## Dîroka PKK'ê Dîroka Rêbertî Ye

Diyardeya Rêberî diyardeyek pir berfirehe. Hûn hewl didin saziyek ku gelê Kurdistanê di tevahî dîroka xwe de xwe ne gihandiye şêwazek rast û ji ber vê her tiştê xwe winda kirî di nava pêşketina wê ya teorîk û pratîk de fêm bikin, têbigihijin û bipejirînin. PKK **rêxistina rêbere**. Şoreşgeriya PKK'ê, **şoreşgeriya rêbere**. Dîroka PKK'ê, **dîroka rêbertiyê** ye. Nûnertiya vê çawa bi min re pêş dikeve, bi hemû encamên PKK'ê yan jî bi endamek PKK'ê re nûnertiya vê çawa pêş dikeve? Di PKK'yîbûnek baş de, yan jî di PKK'yîbûnek nebes de nûnertiya vê çawa pêş dikeve? Em jibîr nekin me di dîroka xwe ya heta niha de ne zanî ku ji bo xwe bêjin **rêber**. Hêjî rêjeya kesên ku li gorî şêwaza rêbertiyê dijîn ne bi qasî tiliyê destane. Rêberê şerê serxwebûn û azadiyê, hêz, şêwaz û tîpê rêberê jiyana azad çiye, kiye û çawa ye? Vaye hûn nikarin van raber bikin. Niha pirsgirêka herî bingehîn ev e. Ev hewldanên min tev ne ji bo dagirtina valehiya rêbertiya dîrokî ye, hemû îxanet û xefleta ku di bin navê rêbertiyê de tên kirin derxistina holê û mehkumkirine. Min li şûna wê ferasetek rêbertiya rastî bi rêbertiyê asta teorî pêş xist û peyre jî weke pratîk gav bi gav ev danî holê, ne tenê danî holê, meşa wê jî pêk anî. Vaye şêwaza rêbertiya PKK'ê, şêwaza rêbertiya eniyê û şêwaza rêbertiya artêşê ev e. Vê baş lêkolîn bikin. Jixwe van rêberan nekarîne xwe ji rewşa hevkariyê rizgar bikin û nekarîne nêzî serxwebûnê bibin. Tevî wê nekarîne rêbertiyê bikin, helak bûne û xwe ji rewşên xirabtir rizgar nekirine. Berdêla îsyanan bi darvekirina xwe ve dane û ti mîras jî nehiştine. Dema em li Kurdistanê dîroka rêbertiyê dinirxînin, hûn ê bibînin em çiqasî dîrokek tinebûnek xeternak dijîn. Di wateya teqez de rêbertiya dijmin çiqasî di asta leşkerî, siyasî, aborî, çandî û kurtasî di her astê de çiqas xurt û serdeste? Li gel vê hûn ê bibînin ku rêbertiyên heta niha derketine çiqasî hevkarbûne û girêdayî wî mane. Heta ku ev

neyên dîtin, ne gengaze u şêwaza Rêbertiya PKK'ê bê fêmkirin. Bê fêmkirina Rêbertiya PKK'ê li ber xwe dayîn, nexasim berxwedaniya çekdarî dînîtiye. Ji ber ku di serê vê de mirin heye. Heta ku Rêbertiya PKK'ê neyê fêmkirin û hewcedariyê wê pêk neyên, neçin şer, dernekevin serê çiyan û nekevin nav refên gel. Dema we hinekê pêwîstiyên vê fêm kirin, hûn dikarin beşdarî têkoşînê bibin. Nexwe hûn ê çima xwe bikin bela! Fêm bikin û wisa bikevin nava kar. Hûn bi xwe rakin-danin bipîvin, we dît hûn hinekê saxlemin, vêca bi ser kar de biçin.

Dikarim van ji bo xwe jî vebêjim: Ev Rêbertî çawa derket holê, çi esas girt, destpêkirinek çawa kir, çawa xwe heta roja îro anî? Di van mijaran tevan de min baş lêkolîn bikin, pir û pir nîqaş bikin, heta hewce kir rexne bikin. Ev Rêbertiyek gel'e, hewldana dagirtina valehiya mezin a dîroka me ye. Ev nîqaşkirin û têgihiştin, xwe ji rizgariyê re amadekirin û milîtaniya wê kirine. Hinekê jî ber bi jiyan, rêzdarî, pîvan û edebê ve werin. Ev ji bo we firsendek pir girînge. Hûn her tim kesek weke min nabînin. Tenê ez dizanim min çawa di vî karî de bexşandiye, qet nebê ji vê sûd werbigirin. Wexta we pêşketinek rêbertî jiyan kir, xwe weke siûdê bidestxistina xwe û mirovahiyê, hem jî siûdê yekem car ser dixe binirxînin.

Ber bi dijmin û rêbertiya wî ve dibezin û ya herî xirab di xizmeta wî de dijîn. Pir girînge ku ev bê xirabkirin. Ji ber hûn cuda nikarin gava pêşketinê bavêjin. Dê we heta niha ev ji mêj ve fêm kiriba. Bi şêwaza Kurdê berê ve rêbertî nayê kirin. Jixwe ev, ne şêwaza rêbertî ye. Hûn jî baş dizanin axa hevkarên çawa yên herî başin. Hûn dizanin ji bo malbat, nas û kesên we xizmeta dijmin bikin çawa nêzî wî dibin. Ma ev rêberin? Ev ne hevkar û nokerin jî, ji wan jî xirabtirin. Ev xwe difiroşin quruşekê. Ez ji vê re nabêjim nokerî jî. Noker qet nebê di berdêla xizmeta xwe de pereyan digire û bi vê jiyanek wî çêdibe. Tişta ku yên me dikin dîn û hartiye. Rewşek pêş ji pêlê mezintir tê jiyîn. Ma kes welatê xwe evqasî erzan diterikîne, weke mirovek wisa bêhed dijî? Van li aliyekê bihêlin, ma dibe kes di nava partiya me de evqasî bi rastiya Rêbertiyê re nakok be û bi şêweya Rêbertiyê bilîze bikare bijî? Vaye dijîn. Hûn jî dibînin, ev hemû li holê ne. Kêmek maye dê vê

weke ku çarenûse bi min bidin erêkirin. Ger li hember van helwestan hêza xwe ya berxwedanê raber nekim û serî bitewînim, hûn ê bêjin; “Ew gelê tu behsê dikî, ew kesên PKK’yî tu behsê dikî wisa ye, em wisa hatine em ê wisa jî biçin”, an jî “Em bi her tiştê xwe ve tevlîhevin, sazûmaniyê nas nakin; dê her kes ya xwe bike, her kes şêwazek wî heye û wê pêk bîne.” Pergal û terbiyê pêk nayînin û dibêjin; “Em berê jî wisa bûn û dixwazin niha jî wisa bin.” Tişta li ser me tê ferzkirin ev e.

Di van helwestan de **înkar** heye; ne ku rêbertî û siyaset heye. Hûn dibêjin; “Em dixwazin a baş bijîn” û neçar dimînin tên cem me. Hûn ber bi PKK’ê ve dibezin û dibêjin; “Di nav wê de jiyan heye.” Raste di nava PKK’ê de jiyan heye, lê divê hûn bizanin pergal û pîvanên PKK’ê wê jiyanê saz dike. Ji bilî vê kes we nade jiyîn. Hûn serbestin dikarin birevin biçin cem dijmin, lê dijmin we nade jiyîn. Hûn dibêjin; “Em bela ne”, lê ji ber ku hûn belane nayê wê wateyê ku hûn ê min jî helak bikin. Ez kêm-zêde dikarim xwe biparêzim. Ma ez ê çima di bin van belayên we de biperçiqim? Hûn dibêjin; “Em dikarin wisa bikin û wisa jî bijîn.” Belê wisa bi fermande û yetkiyê lîstin destpê kir. Hûn nikarin wisa bijîn.

Ev hemû bi dîroka me ve têkildarin; hûn çiqas ji rastiya Rêbertiyê dûrin û berovajî wî dikevin ve têkildare. Hûn ê xwe sererast bikin. Ji bo we şerte ku hûn şêwaza Rêbertiyê, jiyana partî û artêşê pêk bînin. Hûn ê di plana yekemîn de cîh bidin pergal, cewher û her cure şêweya PKK’ê. Nexwe kes we nade jiyîn. Heta niha min we da jiyîn. Elbet sedemên vê jî hene. Pêwîste hûn bi lêkolînkirina rastiya Rêbertiyê ve van sedeman baş fêm bikin û bêjin; “Rêbertî çima li hember me sebrek wisa raber kir û em anîn vê qonaxê?” Pêwîste hûn weke gel, weke PKK’yî û heta weke gêrîla vê têr û tijî nîqaş bikin. Dijwarbûna hûn anîna heta roja îro tenê ez dizanim. Sedemên vê sebrê hene. Çareyek vê ya din jî nîne. Qet ji bo ji vir û şûnde pêşveçûnek saxlem çêbe, dibe ku hûn vê bikin sedemek. Dibe ku me ji bo vê hûn dabin jiyîn. Ev hinekê jî bi mirovbûna me ve girêdayî ye. Her kes ji cihek we ve li we dida û pehîna xwe li we dida. Lê me hinekê jî xwest weke mirov bi we re

eleqedar bibin. Dibe ku yek sedem jî ev be. Weke vê mirov dikare gelek sedeman rêz bike.

Rastiyek we heye. Belavbûna li cîhanê û welat bi temamî terkandinê ve hûn pêşerojekê ji xwe re nabînin. Hebûna hev tine hesibandin û bi her cure bêrixistinî jiyînê ve hûn nikarin bibin xwediyê hêzê. Tev bê kar û bar û perîşanin. Ji ber vê Rêbertiyek rast ji we re hewce ye. Hûn rojane dibînin ku rêbertiya hevkar a li Başûr -ya rastî mijara nîqaşê ye ku çiqas jî hevkare- gel aniye çi halî. Gelo rêberek wisa çend pere dike? Tiştên ku Komara Tirk ferz dikin, pêk tînin. Jixwe diyare ku ew jî çi dikin. Rêbertiya PKK'ê serbixwe û azad, milîtanên PKK'ê yên rêber ji van tevan re çare ye. Niha em dinêrin ku, ew jî bi xirabkirina sazûmanî û qedemeyên me ve mijûl dibin. Gelo dibe ku ev ji Rêbertiyê re bersivek bin? Nexwasim di nava PKK'ê de mafê kesekî heye ku bi rêbertiyê bilîze? Hûn ê bêjin; "Pergal û dîsîplîn karek zore, em ser beredayî hatina heta îro, wisa fêrî jiyînê bûne." Dijmin wisa li we kiriye. Ev jiyana we, ne jiyanek asayî ya mirovî ye. Vêca yek li pergala xwe binêrin, yek jî pergala artêşa Komara Tirk binêrin, pergala partiyê binêrin. Hûn ê bibînin, bi qasî her tiştî radike-datîne û dipîve. Ya hêjayî me tê dîtin wisa ye. Nexwe em ê pergal û pîvanên xwe bibînin.

Di nava refên me de ew kiye ser beredayîbûnê pêş dixe, xwe dide axaftin û bi her cure quralan lîstinê ferz dike? Zêde rast nabînim ku navên van bêjim. Berovajî, navê van girtina ser devê xwe jî li gorî min tawane. Di nava PKK'ê de pergala PKK'ê, rêziknameya PKK'ê yan jî qanûna PKK'ê derbas dibe. Nexasim dema artêş dibe mijara gotinê, bi temamî pergal hewce dike. Rastiya Rêbertiyê jî van tevan ronî dike. Nîqaşkirina PKK'ê, di wateyekê de nîqaşkirina Rêbertiyê û ew ji her hêlê ve nirxandine. Nîqaşkirina Rêbertiyê jî, xwe birêxistinkirin û xwe gihandina wî ye. Nexasim di rêxistinbûna artêşê de, wê ev bi Rêbertiyê re encam bigire. Wisa tê fêmkirin ku, we hêj wate û girîngiya van babetan fêm nekiriye, ger fêm kiribe jî we di pratîkê de bi cewhera xwe re yek nekiriye. Ji bilî fêmkirina van babetan ti çareyek we ya din

nîne û ev yekane vebijêrka we ya jiyanê ye. Nexwe hûn ê bibin hemalên hinek din.

Kesek bi qasî min zehmete ku zeptûrep bê girtin nebû. Li dijî quralan derdiketim, lê dîsa jî xala dawî ez digihiştimê, xala dîsîplîna herî mezin û pergal bû. Ma hûn ji min zêdetir maceraperestin an jî azadîxwazin? Piştî ku min xwe evqasî bi dîsîplîn û pergalê ve girê da, hûn ê çil carî zêdetir wisa bin. Ger hûn bikarin xefleta ku dijîn derbas bikin, hûn ê wê demê bibînin ku ev wisa ye. Di nava PKK'ê de heta dawî azadiya nîqaşê heye. Kes bi zorê ji we re nabêje; "Werin, tevlî bibin" û ber we nagere. Tevlîbûna ji PKK'ê re li ser bingeha dilxwazî dibe, lê piştî ku tê jî xwe bi pêdiviyên wê ve girêdan jî hewcedariya cewhera vî karî ye. Nêzîkbûna weke; "Ez ê hem werim, hem jî pêwîstiyên vî karî berçav nagirim", bi xwe kenîne. Em nikarin vê bipejirînin. Wisa tê fêmkirin ku, we ev xal fêm nekirine, mafê wê nedayê û ne veguherand jiyanê. Di encamê de jî rewşên li PKK'ê nayên, artêşbûnê pêk nayînin derketin holê. Ji ber van sedeman we xwe çarçur kir û bêhêz hişt. Ji bilî dijmin feydeyakî di vir de heye? Xêra van nebesiyan dijmin, xayînên ku partiyê mijûl dikin û her cure oportînîstî bihêz bû. Ma ne heyfa kesên ku ruh û canê xwe dane vê partiyê ye? Wê kî mafê wan biparêze û nûnertiya wan bike? Ji bo vê Rêbertiya Partî û milîtaniya partiyê pir hewce ye.

Hûn çima partîbûnê pêk nayînin? Hûn çima ber bi artêşbûnek bêhempa ve naçin? Bersiva vê nabînim. Piştî hat gotin; "Hatim nav PKK'ê û her tiştî qebûl dikim", her tişt diqede an jî tê wateya ku destpêkirinek vî karî ya saxlem hatiye kirin. Ya peyre karê **perwerde** û **ezmûnê** ye. Ez jî we perwerde dikim û ezmûnên xwe ji her kesî re radigihînim. Piştî demek kin hedefa me hûn partîbûn û artêşbûnek çar bi çar pêk bînin. Qet nebê serxistina sala 1994'an an jî fetihkirina vê merheleya pêşiya me bila wisa be. Ger wê fetihkirin an jî serkeftin hebe, divê li ser vî bingehîbe. Ji bilî vê çareyek din nîne.

Yên şaşiyan dikin û xwe dixapînin dîroka wan yek bi yek lêkolîn bikin, sedemên van windahiyan tevan jî lêkolîn bikin. Yên erzan winda dikin, herî zêde yên dibêjin; "Ez ê girêdayî gund, bajêr

û erkê rehet bijîme.” Her wiha bi xwe re nirxên weke çiyan bê wext winda dikin. Yên dibêjin; “Ez ê xwe bi fêlbaziyên erzan ve bidim jiyîn”, yên filan û bêvan qedemeyan digirin, ma ne ew kesên ku divê bi erdê re bibin yekin? Xwe erzan û fêlbazî dana jiyîn, rê ji windahiyan re vekirin, nabê şêwaza jiyanê. Kes nikare PKK’ê weke rêxistinek hêsan winda dike û weke rêxistinek erzan jiyan bike binirxîne. Kes nikare Rêbertiyek weke me wisa bigire dest. Min dehî caran we di vê mijarê de şiyar kir. Em hesabê pariyek nan dipirsin û hesabê quruşek pere dikin. Di cîhanê de weke tevgerek kedê ya mezin kêm hatiye dîtin. Em xwedî li hemû nirxên xwe derdikevin. Cewhera vî karî wisa ye. Rastiya Rêbertiyê wisa destpê kiriye, wisa jî dimeşe. Kesê ku dibêje; “Ez ê derfetan desteser bikim pê milyonan bikar bînim, ruhan bikar bînim, her tiştî bikar bînim”, ji xafilek bêhed wêdetir dîn û hareke. Hûn dikarin vê li her derê bikin, lê ev di nava PKK’ê de ne gengaze. Hema bêje dînên wisa bi koman di nava me de hene. Van xwe winda kirine. Hêjî dixwazim yeqîn bikim ku dê ev kesayet sererast bibin an jî dibêjim dê binêrin. Ev ne tenê kesayetên ku pêwîste bên cezakirinin, kesayetên hema bêje erd biqelişe û bikevin navê ne. Ger nikarim mafê hinek karan bidim, bila erd biqelişe û bikevim navê. Ger hinekê min mafê jiyanê daye, nexwe maf û huquqa min jî ew e. Ev hemû rastiya PKK’ê û xisletên Rêbertiyê ne.

Çima evqas belayên serî derketin, van ji kîjan mercan sûd wergirtin? Kîjan zagon binpê kirin? Ev ji rûyê kî wisa bû. Di vê mijarê de kîjan kêmasiyên rêxistina me hene? Ma me xalên rêziknameyê pêk ne anîn? Gelo me rêveberiyek saxlem ne meşand? Ev şaşî çavkaniya xwe ji kî, ji ku derê û çawa digirin? Em dikarin daxin heta asta dîroka partiyê û herêman, van rewşan ji her hêlê ve binirxînin. Çima evqasî bi rastiya Rêbertiyê lîstin û kî lîst? Me çima nekarî li hemberî van peywirên xwe pêk bînin? Pêwîste hûn hesab ji xwe jî bipirsin û bigihin encama saxlem. Ji ber ku ev nebin, nabe mirov bimeşe.

Hûn jî dizanin derfetên me çiqasî sînordarin. Qet nebê van tevan baş têbigihijin. Pêwîste di mercên pir zehmet de jî pêngavek we hebe û dema we destpê kir hûn bikarin nûnertiya hêviyê bikin.

Divê gelê me jî hinekê bi hêvî be. Hêjî PKK dikare we bide jiyîn, lê vê ne ku ji bo hûn dînîtiyê bikin pêk tîne. Ev qedeme, derfet û yetkî ji bo weke ku hûn bikar tînin bikar bînin we nadim jiyîn. Hûn jî dibînin ku şêwaza min a dana jiyînê çawa û bi çi ve girêdayî ye. Ger hûn raye, erk û pere dixwazin û dibêjin; "Em dixwazin derbikevin serê çiyan", hûn ê bi van xalan ve girêdayî bimînin. Nexwe hûn durû û sextekarin. Dê ew jî li her derê û her wextê berdêla tiştên ku kirine zêdetir jî bidin. Jixwe, di hevrêtiyê de sextekarî û xapandin nabe. Her hevrêyek xwediyê sonda xwe ye. Ji bilî vê kes newêre pênaseyek hevrêtiyek din bike.

Di nêvenga me de heta dawî azadiya nîqaşê heye. Ne ji bo pêşxistina tevlîheviya serî ye, ji bo hûn tev hinek tiştan baş fêm bikin tê kirin. Heta qinyata we çêbe û bawer dikin nîqaş bikin, têbigihijin û bidin fêmkirin. Tevlîbûnê li ser vî bingehî tam bikin. Dema we pêk anî jî bila ti kes nekare we li ti cihî û ti wextî bixapîne û bîne lîstokan. Ne bila kes serî bi we bide tewandin, ne jî hûn bi kesî serî bidin tewandin. Berovajî divê şêwaza rêveberiyek û xebatek hevbeş esas bê girtin. piştre jî pêwîste însiyatîfa takekesî xurt bibe, li cih û wextên hewce heta dawî jî bê raberkirin. Pêwîste nêzîkbûnek têrkar ji peywiran re bê kirin û teqez divê bi qasî têrkar û serkeftî be, xwedî li peywiran derbikevin. Dema raye û meqam dibe mijara gotinê, dema hûn ê tam heqê van bidinê divê teqez xwedî lê derbikevin. Berpirsyariya van tevan min eleqedar dike, neçarim ku eleqedar jî bibim. Çi raye û peywirek ji rêzê, çi jî peywir an jî berpirsyariyek di asta herî jor de be, bi qasî hûn bikarin bêjin; "Divê teqez heqê wê bidimê" li ser xwe serwer bin, xwedî li xwe derbikevin û hestê we yê xwe berpirs dîtinê pêşketî be. PKK'yîbûn wisa dibe û tevlîbûna ji artêşê re wisa dibe.

Bi salane hêjî hûn naxwazin van fêm bikin. Devjê berdin ev li gorî hevaltiyê be, rewşek ne li gorî mirovahiyê ye. Wê demê dê zehmetiyên we derbikevin holê û hûn ê helak bibin. Di şêwaza min diyar kirî de ger hûn xwe tevlî rêxistin û rastiya wê ya Rêbertî nekin, jiyanek weke dojehê dev ji we bernade. Li nav PKK'ê, yan jî bi gelemperî li Kurdistanê jiyan hêsankirin, ji her alî ve bi pêkanîna şêwaza rêbertiyê ve gengaze. Dev ji fêlbaziya gundîtî û sosretiya

rewşenbîrî berdin. Jixwe bi van tiştek nayê nirxandin. Sosretê rewşenbîr demogoge û zêde tiştek jî ji dest nayê. Fêlbazê gundî jî her roj xwe dixapîne û ji bilî xwe xapandinê nikare ti kesî bixapîne. Dev ji van şêwazan berdin. Bi şêwaza rast karkirin, bi şêwaza me ve gengaze.

Hûn jî dibînin, me li vî welatî hinek kar kir. Yê xwedî şêwaza di şer de têk naçe, di rêxistinbûnê de her tim pêşve diçe, her wextê û her qonaxê serkeftinê ava dike emin. Hemû cîhan û dijmin jî vê dizane, ma hûn ê nezanin? Nexwe tevlîbûn û ahengê raber bikin. Ger ev bi we dide serxistin, bi qasî dixwazin we madî û manewî mezin dike, ji bilî vê dikarin çi bixwazin? Ger yê herî hejar û birçî hûnin, nexwe ji bilî vê dikarin çi bixwazin? Piştî ku evqas derfet di bin fermana we de, çima hûn nikarin pêşketinan bijîn? Di roja destpêkê de şêwaza tevlîbûn û jiyana rast a diviya hatiba kirin ev bû û wê di roja dawî de jî serkeftina mezin ev şêwaz bide serxistin. Ji bilî serxistinê çi li benda we ye? Ger hûn di vê xetê de ser nexin, ma hûn karesat, îşkence û parçebûna ku bê serê we dihizirin? Encama ku dijmin ji we re rewa dîtî ev e. Dijmin ne tenê milîtanên PKK’ê vê li ser gel jî dimeşîne. Ya ku we li ser lingan bigire û dijmin paşve bixe, pêkanîna vî şêwaz, lêdan û tempoyê ye. Pêwîste em li ser vî bingehî bi egîdî berpirsyariya hevdu rakin. Jixwe êdî gel jî dibêje; “Yekane çare ev e.” Nexwe hûn ê heqê vê bidinê. Hêjî gotinên weke; “Serê min tevlîheve, şêlo me, ne zelalim” axaftin, xirabûna herî mezin hêjayî xwe dîtine. Roj pir bêrehm derbas dibin. Her tim ne wextê min heye û ne jî pêwîste heye ku ez vê partiyê vê tevgerê û vî şerî wisa bimeşînim. Derfetên têkoşînê pirin. Ger hûn vê şêwaza jiyanê dipejirînin, ji bilî pêşwazîkirina têkoşînê û bidestxistina serkeftinê ne ti vebijêrka we heye û ne jî pejirandinek we heye.

Em weke berê ji bêderfetiyan re zehmetiyan najîn. Derfeta me ya serxistinê, deh qetî zêdetir ji derfetên dijmin ên serxistinê zêdetire. Ez behsa nirxandina van derfetan dikim. Dibe berê dijmin bikariya ser bixe, jixwe di wateya teqez de wî jî xwe wisa didît. Dema ku me zanî wan qonaxan tevan dijberî dijmin bigirin, me xizmeta herî mezin pêşkêşî we kir. Niha qonaxek aliyê wê yê

serxistinê zêdetir jî hûn dijîn. Hewldanek sînordar jî dikare hema her kesî bi serkeftinên girîng re rûbirû bihêle. Hûn ê xwedî li vê derbikevin. Ger hûn bêjin; "Derfet zêde ne, keyfa min tê li ser xwe bidim jiyîn", dê ev bibe bêberpirsiyek mezin. Pêşketina hinek derfetan, tenê tê wateya; "Ev derfet pir zehmet hatin bidestxistin, em dikarin bi vê şer ser bixin." Nexwe ji bilî şerkertiya ku berê we nekiriye raberkirinê, kar û barên berê we nekirine dijwar serxistinê zêdetir ti çareyek we nîne. Ev jî, wisa bikaranîna derfetan ve dibe. Ji derfetên heyî re nêzîkbûna rast jî ev e. Nirxan çawa dinirxînin? Ger hûn bêjin; "Hewce nake em xwe tengav bikin, jixwe PKK tevgerek mezine, hinekê jî em xwe bijîn, em westiyan", hûn ê nêzîkbûna herî xeter raber bikin. Dibe ku we berê ev gotiba, lê niha hûn nikarin vê bêjin, ji ber ku rewşa bi qasî hûn dizanin zêdetir cewaze. Ev derfet tenê ji bo serxistina şere. Berovajî vê, ev derfet tenê nayên windakirin, wê hezar qetî zêdetir bi kes bide windakirin û jixwe dide kirin jî. Em van nêzîkbûnên xeter û şaş jî li aliyekê bihêlin.

Ger hûn li jiyana min binêrin, hûn ê bibînin ti carî bi qasî merheleya sala 1993'an lêhûr nebûme. Sala 1993'an, sala derfet herî pêşketîbûn, lê me pir zehmetî jiyan û me herî zêde xwe nefes bi nefesê hiştibû. Salên din jî bêrehim bûn. Hûn hinekê jî dizanin ku rizgarkirina her salê tê çi wateyê. Lê yek ji wan jî bi qasî sala 1993'an nebû. Gelo hûn hinekê vê ji xwe dipirsin? Ev sal, hem salek destkeftiyên girînge, hem jî ger nêzîkbûnek pir baldar çênebe salek wisa ye dijmin dixwaze hemû destkeftiyên bîst salan bide windakirine. Encama ku hûn ji vê derbixin ev e: Ger hinekê derfeta serxistinê zêde bûye û dijmin jî ferz dike hemû destkeftiyan ji destê me bigire, nexwe em ê jî dijwar bi ser vê salê de biçin. Jixwe, em bi vê rêbazê ser hemû salan de çûn û pir vekirî diyar dikim ku divê em bi heman rêbazî ser sala 1994'an de jî biçin. Di vê mijarê de ji min zêdetir divê hûn hinek tiştan bikin. Ji ber ku yê dakeve qada têkoşînê ya germ û ji bo teqez vê salê ser bixe xwe bexşîne hûn in. Min tişta bikim kir, ez ê dîsa jî bikim. Ev karê ez dizanime, lê we pêdiviyên têkoşînê pir kêm pêk anîn û pir kêm mafê jiyanê dayê. Lewra teqez hûn neçarin rast bi ser peywiran de biçin û şerê jiyana

xwe tevê bimeşînin. Ev jî berpirsyariya we ya ku pêwîste hem weke siûd, hem jî weke peywir û şêwazê pêk bînine.

Ger feraseta we hebe hûn ê hinekê hewl bidin van fêm bikin. Di şoreşê de israra bêfêhmiyê, ber bi encamên xeter ve dibe. Di vê xalê de em çiqasî zehmetî dijîn û pir bê wate xwe bi xwe zerar didin ji dîroka partiyê jî tê fêmkirin. Di dîroka partiyê de tasfiyekar, provakator û ji her cure kesên ji rê derixistin tev ne niyaz xirab bûn, dibe ku hinek ji wan jî we zêdetir niyaz baş bûn. Lê di nefêmkirinê de israr kirin, ev çarçoveya me diyar kirî berçav negirtin. Van kesan hewl dan bi fermanan bilîzin û wer zanîn ku dê xwe wisa bidin pejirandin. Me got wisa nekin, lê wan di ya xwe de israr kirin û encamên wê jî xedar bûn. Hinek bûn kujer, hinek bûn provakatorê herî baş, hinek jî ya ku dijmin nekarî bike zêdetir zerar dan û bi xwe jî winda kirin. Rêjeyek mezin ev kes bi erdê re bûn yek. Gelo van feyde bidest xist, an jî di nava refên me de bi qetilkirina hevrêyên me re tiştek baş kirin? Gelo bi windakirina evqas nirx çi bidest xistin? Wê dîrok ji bilî rewşa wan ketîbûn û lenetê wêdetir çawa bibîr bîne? Ma ev bê ferasetî tiştek raste? Van got; “Em ê tişta dizanin bikin”, vêca tişta dizaniyan çend pere kir? Ma we dît ev qet tiştekê rave dike? Yê herî zêde bi dijmin ve mijûl dibe û pê re şer dike jî ez im. Nexwe çima ez guhdar nekirim? Qaşo di asta perestiyê de bi me ve girêdayî bûn. Çima em rast fêm nekirin? Hûn jî dibînin, tiştên em diyar dikin di asta pêş de ne. Dema ev dixwazin ya xwe bikin û bihêz bibin, dixwazin Rêbertiyê û her tiştî desteser bikin, di encama xirab bikaranîna PKK’ê û yetkiyê de, ketin vê rewşê. Ma ev hesab, ne hesaba dijmine? Qaşo kêm maye dê vir desteser bikin! Lê belê li holê tiştek bê desteserkirin tine, kar û barên ku bi kedê bên bidestxistin hene.

Vê dîrokê çawa destpê kir? Vê dîroka ibretê baş berçav bigirin. Van tîpan di bêfêhmiyê de israr kirin, nexwe tîpên wisa sîxurên bi zanebûn an jî niyaz xirab bûn. Dibe ku ji we zêdetir rêzdar û girêdayîbûn, lê guhdar nekirin. Di nava wan de nêzîkbûnên hinek kesan ên weke; “Ez ê çibim” hebû. Şiyarî guhdar nekirin, nirxandinên şaş kirin, bûn hestî û piştre jî wisa li wan hat. Dîroka partiyê ji vê hêlê ve teqez divê baş bê fêmkirin. Çima pêwîste

mirov xwedî feraset be? Çima pêwîste mirov bi nirxan û nexwazim gav bi gav qural û qaîdeyan ve girêdayî be. Ger hûn dibêjin; "Weke ibreta dîrokê divê ders jê bê derxistin", ev di nava PKK'ê de balkêşin. Ev dîrok, di heman demê de dîroka kesên ku xefleta bikaranîna me jiyane. Belê, gelo karîn me bikar bînin? Gelo di nava rêxistinê de yan jî hêzên dervî me karîn min bikar bînin? Kî dikare kî bikar bîne? We di vê mijarê de dît ku şer jî çawa ye. Jixwe hûn ne di wê rewşê de ne ku bikarin me bikar bînin.

Em bi kesên dilxwazî beşdarî PKK'ê bûne re, ji bo bi temamî xeta PKK'ê bijîn, yekîtiya kedê pêk tînin, hewldanên xwe yekpare dikin. Em vê jî ji bo serxistina bidestxistina welat û azadiya xwe dikin. Çi eleqeya vê bikaranîn û çewsandina hevdu heye? Ger ev tiştên ku hatine diyarkirin tev we ber bi ferasetekê ve biriye û heta dawiya temenê we feraseta partiyê dabê we, kêm jî be quralên şer û rêxistinê dabe we, wê demê divê hûn xwe bi siûd bibînin. Meşek li ser vî bingehî, heta ku hûn bijîn dê we bike endamek partî û artêşê yê baş. Hûn ê bibin şervanek gel ê baş, dikarin bibin rêberek gel. Dîsa dibê ku her tim windahî û şehadet bên jiyîn. Lê piştî ku mirov bi ferasetek rast meşiya, mirin ji ku tê bila bê, mirov pê raziye. Cefa û zehmetiyên vê jî ji kuderê tên bila bên, bi dilxwaziyek mezin ve mirov pêşwazî dike. Jixwe her tim mirin, zehmetî û tengezarî li ser me hat ferzkirin. Me bi rehetiyek mezin dest bi vê têkoşînê kir û hêjî didomînin. Di vê riyê de meşa li ser vî bingehî, me bê mirin dike. Weke tê dîtin, rast têgihiştina dîroka PKK'ê, misoger ber bi serkeftinê ve dibe. Rast tênegihiştina dîrokê û nexasim israra di nefêmkirinê de ber bi karesatek mezin ve dibe. Dîsa her cure nêzîkbûna şaş û nebes, ber bi tevliheviya mezin, windakirin û çarçurkirina wext, derfet û heta keda kes bi xwe ve dibe. Ev dîrokek mezine. Ger bi şêwazek rast xwedî li vê dîrokê bê derketin, wê her tiştî bide serxistin.

Hûn ji nava miletek ku neçare bi her tiştê xwe ve xwe ji nû ve bidest bixe tên û parçeyek ji vî miletî ne. Ancex **xwe bidestxistin** dikare me bi her tiştî ve bide jiyîn. Ji bilî vê ji bo me her tişt bêhna lenetê jê tê û ne hêjayî me ye. Xet, şêwaz û feraseta hêjayî me diyare û ev heta şêwaza lêdanê jî her tişt vekirî diyar kiriye. Ger bi

we re hinekê cidiyet heye û hûn dibêjin; “Ez di vî karî de hinekê bi îdîa me”, nexwe ez ê weke di destpêkê û her demê de li ser min serwere cardin bi we bawer bikim. Ez bi mirovê li hember rastiyan hinekê xwedî feraset bawer dikim. Ji ber ku wê ber bi her cure erkên rast ve bimeşe û ser bixe.

**21 Kanûn 1993**

## EM JI BO AZADIYA GEL XWE JI NÛ VE AVA DIKIN

Bi temamkirina sala 1993'ê û bi gava yekem a pêngava sala 1994'an re, em dibînin ku hinek keç û xortên ciwan di pêşengtiya siyaseta partiyê de dixwazin beşdarî Artêşa Gel û di demek kin de jî beşdarî şer bibin. Dema mirov jiyana xwe ya kevin red dike, arasteyî welat dibe û bi baweriyek jidil di rêya azadiyê de dimeşe, heta daxwaza bi evînê meşîn gavek pir girînge. Ev meş, di têkoşîna mirovahiyê de rastiya xwe zanîn û li ser vî bingehî meşa xwe dana jiyîne. Ev xwezayî ye û di cîh de ye. Lê belê şer agire, dijminê beramberî me jî dijminê hezarî salî û wehşî ye. Weke biçe dawetê çûnên welat û tevlîbûna şer heye. Ev nêzîkbûnek sivike. Ne meşeke ku armanc û şêwaza rast a şerkirinê esas digire. Ji ber vê zû dikevin. Bêku xwe û dijmin binase ne gengaze di nava şer de tiştikî bike an jî xwe biparêze.

Ji rojên ku me gavên destpêkê yên partiyê avêtîn heta niha em li ser mirovê Kurd radiwestin. Me pêşî bi navê Kurdistanê çend peyv gotin; diyar kir ku divê mirov bi welat û gel ve çawa girêdayî be. Niha jî em heman tiştan hîn hûrûkûr vedibêjin. Ji ber ku mirovê Kurd lewaze û li ku derê dibe bila be li gorî dijmin hatiye teşekirin. Ango hinek din em li gorî xwe çêkirine. Hûn dibêjin ku Kurdin, lê hûn vê tenê li ser ziman dibêjin. Ya rastî hûn ew kesin ji bo dijmin hatine mezinkirin, ango ji bo hinek din mezin bûne. Dema em dibêjin ji bo xwe û ji bo welat mezin bibin, vêca hûn kor, ker û lal dibin.

Em ê ji bo welat û gelê xwe, çawa xwe ji nû ve ava bikin? pirsgirêka we tevan ev e. Kesek nekare bandora dijmin ji dil û mejiyê xwe bavêje nikare ji bo xwe tiştek baş bike. Pirsgirêka me ya herî mezin, mirovê me ji bo wî bi xwe avakirine. Çima mirovê Kurd bihêz nabe? Mirov çawa di her qada siyaset, bîrdozî û jiyanê de bihêz dibe? Nabe ku hûn ji bo hinek din bihêz bibin. Ger hûn di wateya civakî, aborî, siyasî û leşkerî de xwe ji bo hinek din bikin

leşker, hûn ê bibin xizmetkarek, koleyek û karmendek. Jixwe, karmendî mertebeyek pêşdetire. Ger hûn bibin leşkerek, hemalek û karkerek, çi bidin we, we çawa bimeşînin wê bibe çarenûsa we.

Em li ser xwezaya mirovê Kurd radiwestin. Çima mirovê Kurd wisa ye? Çima ji her hêlê ve bêçare ye, nexweşe û tiştek ji dest nayê? Çima nikare xwe li welatê xwe şîn bike û şerê wê bimeşîne? Çima bi hev re şer dikin û hev dixin? Sedema van çiye? Yek sedema van tevan heye, ew jî dijmin evqasî bi gelê me lîstiye. Li hember van şêwaza PKK'ê, beriya her tiştî naskirina xwe û welatê xwe ye. Heta ku welat, gel û dîrok neyê nasîn, hûn nikarin xwe binasin. Dê û bavên we ji kur hatine, eşîretên wan kîne, li ku dera welat in? Çima evqasî ketine û parçe bûne? Çima hûn evqasî bêçare hiştine? Ger hûn bersiva van pirsan nedin, hûn nikarin xwe binasin.

Ez jî berê weke we bûm. Wexta di temenê we de bûm ditirsiyam ku bêjim Kurdim. Min digot ez ê çawa xwe bikim Tirk û dikarim çawa bibim karmendek baş. Paşê min hêdî hêdî xwend û dît ku nikarim xwe bikim Tirkek baş, ger bikarim karmendiya wî bikim jî, wê ti nirxê min nebe. Yekî xwe înkar bike ne duriste û heta bimire jî sextekare. Ger Kurdim, vêca tişta ku diviya bikim çibû? Weke em bi derziyê birê bikolin û avê derbixin me got Kurd kiye, ji ku derê hatine û ketin pey vî karî. Mirovê Kurd, mirovek bê ziman, bê çav û bê guh bû. Dê me ev rastî çawa bipejiranda? Lê dîsa jî me got em ê xwe înkar nekin. Xwe înkarkirin ji vê rewşê xirabtire. Her çendî em bêçare, lewaz û bi tenê jî bin, me got dîsa jî divê em xwedî li xwe derbikevin. Min wisa dest bi vî karî kir.

Di dawiya sala 1960'an û destpêka sala 1970'î de me dest bilêvkirina pirsgirêka gel kir. Berê min jî dixwest weke we xwe tine û înkar bikim. Lê min biryar da ku ez ê xwe di nava vê pirsgirêkê de bibînim. Me beriya her tiştî got Kurd heye û hêjî em li ser vê pirsgirêkê radiwestin. Bi tena xwe jî bim, ji ku derê çi derfet dîtibe, ji van çend tişt fêr dibûm û roja duyem jî min li derdora xwe belav dikir. Ango min ji tinebûnê diafirand. Ne pirtûkek amade, ne hevalek, ne jî quruşek pere hebû. Di her tişta dihat kirin de pere û jiyan hebû, lê di vî karê min de ev nebûn. Her kesî ji min re digot;

"Ev karê te, karê dîna ye." Her kes ji min direviya, biçim kur bila be, bi tena xwe dimam. Zarokên ku min xwendin û nivîsandin fêrî wan kirî û li dibistanê bicîh kirîn jî ji min direviyan. Ji ber ku dixwestin bibin karmendek biçûk.

Em evqasî hêz didin we, lê ez bi salan bi tena serê xwe bûm. Ji min re digotin; "Rêya te, rêya mirinê ye, rêya te ya xeşîmtiyê ye." Dayîk, bav, hevalên min û hemû gund li dijî min bû. Belê, tam di vir de pêwîst dikir mirovên mezin rola xwe lîstiba. Ji nava kesên ku ji rastiyan pir dûr ketine, xwe înkar kirine û di rêya xirab de ne derketinek hewce dikir. Ger bawerî û mejiyek mezin nebe tu nikarî li ber xwe bidî. Nabe ku mirov bêje; "Her kes çi bike ez jî wisa bikim, her kes xwe çawa dide jiyîn ez jî xwe wisa bidim jiyîn." Hûn tev wisa dikin û hemû wisa dikin. Ev jiyan ne jiyane vê napejirînim, ango min digot; "Pêwîste em tiştek nû bikin." Hinek fikrên nû û pêwendiyên nû hewce dikir. Pêwîstbû ji pêwendî, malbat, gund û şêwaza kevin a derbasdar qutbûnek çêbûya. Ji bo çend ciwanan li derdora xwe kom bikim hewce dikir bi mehan kar bikim. Niha em dikarin di rojekê de sedan kes bînin cem hev. Lê belê wê demê hejmara du salan de bîst û pênc kes hebû-tinebû. Me di sê-çar salan de hejmara xwe kir pêncî, yan jî nebû. Niha ji dervî welat jî di rojekê de em sedan kes derdixin. Ev tiştên ku ez ji we re vedibêjim ên destpêkê ne.

Ez du-sê salan bi tena xwe bûm. Di destpêka karê me kirî de tiştek tinebû. Min ev kar bi sebir, bawerî û xebatên xwe ve pêk anîn. Hûn ê ji vê çi encamê derbixin? Hûn ê bêjin; "Çiqas bi tenê bim, çiqas hejar bim bila be, divê xêrek ji min derbikeve." Li şûna yê amade belavkirin, bi xistinê ve zû windakirinê, hûn ê bêjin divê ez ji tinebûnê tiştekê biafirînim. Belê ev, şêwaza Rêbertiyê û şêwaza PKK'ê ye. Ev hemû cewhera PKK'ê û rastiyên wê ne. Ger hûn bi aqil bin, divê hûn jî ji van hinek encaman derbixin. Destpêka PKK'ê û Rêbertiya wê wisa ye. Hûn wisa dihesibînin ev gel ji xweber wisa bû. Rewş ne wisa bû, ev gel heta duh jî xwe înkar dikir. Em bi şêwazek mezin nêzî rastiya xwe bûn û hûn tev jî nêzîk kirin. Hûn ê li ser vî bingehî dîroka partiyê baş lêkolîn bikin.

Ev hemû ji bo hûn rastiya Rêbertiya PKK'ê baş binasin hewce ne. Hûn Rêbertiyê çi dihesibînin? Yekî Rêbertiyê nenase, ne gengaze ku Kurdistanê û şêwaza PKK'ê binase. Bi xwe jî û me jî nelîzin. Hûn ciwanin, ez bi qasî we ne ciwan jî bûm. Hûn li ser bingeha ruh û derfetên PKK'ê ava dibin, lê belê yên derdora min revok bûn û yek demjimêrî jî bi me re hevaltî nedikirin. Niha bi milyonan rabûne ser piyan û bi navê me tevdigerin.

Ketina rêya dijmin û rev, ji bo welat nebazdan bû. Hûn tev dibeziyan, lê di rêya dijmin de dibeziyan. Ev şaş bû û rêya vê jî nebû. Niha me cîhan rakiriye ser piyan. Ne li bendê me ku heman weke min kirî hûn jî bikin, jixwe ev negengaze û ne jî hewce ye. Lê tiştekî fêr dikim: Rastiya şer şanî we dikim. Ev jî hêz ji we dixwaze, dahûrandin, fikirandin û serxistina partî û şer ji we dixwaze. Ji bo vê jî wextê me nîne em tiştên din ve mijûl bibin. Ger em vî şerî henase bi henase nemeşînin, em nikarin hemû karan ser bixin. Lewra min dev ji karên din tevan berda. Nikarim rehet cixareyekê jî bikêşim, nikarim bi rêkûpêk xwarinekê bixwum, heta nikarim rehet razim. Ji ber pirsgirêk mezine, ger nekarin serde biçin, dibe ku em tasfiye jî bibin.

Çima tiştek ji destê we nayê, çima hûn nikarin bi pirsgirêkan ve mijûl bibin? Ji ber ku hûn xurt li ser pirsgirêkan ranawestin. Dibe ku hûn xwe aqilmend dihesibînin. Hûn cixareyekê pê dixin û dibêjin; "Rehet bûm." Hûn nizanin jiyan çiye, ti agahiya we ji jiyana ku hêjayî mirov çiye nîne. Lê belê em ne wisa ne. Rêbertî hesabê her tiştî dike: Ez ê çawa bim, wê şer çawa be, gel çawa be, çawa bihizirim, ji kî re çi bêjim, çawa li çi binêrim û çawa bibiryar bim? Li gorî gel em kar dikin û karên em dikin jî li gorî dilê gel'e. Şerme ku hûn ji bo gel tiştekê nekin an jî li hemberî gel derewker derbikevin. Divê hûn ji pirsgirêkên tên jiyîn re çare bibînin. Ji bîr nekin, hûn nikarin xwîşk-birayê xwe, yan jî du kesên li derdora xwe îdare bikin. Lê ez bi tena xwe li virim, bêku bikevim nava gel, milet radikim ser piyan û dimeşînim. Bi aqilbin û bihiziran em van çawa dikin. Hûn jî dizanin, ne dê û bavên we ne dikariyan yek gotinî bêjin û bidin meşandin, ne jî we dikariya gotinê bikin û wan bidin meşandin. Bira ne dihat cem bira. Her kes bikarên vale re

mijûl dibû. Lê niha, her çendî ne li gorî tam xwesteka min jî be, mirovên me ji hev razî ne, yekîtî ava dibe û di meşek mezin de yekpare ne.

Em van hemûyan dikin. Çima tiştek ji destê we nayê? Dibe ku bi we re tiştek nebe, zimanê we xweş naxive û hûn xwe tevlî jiyana mezin nakin. We xwe di nava şaşiyê û kêmasiyê de winda kiriye. Nexwe hûn ê çawa karên mezin bikin. Ez kêlî bi kêlî li ser xwe radiwestim. Ji ber ku hûn di xalên ez vedibêjim de tiştekê dibînin, min guhdar dikin. Tevahî gel guhê xwe vekiriye li min guhdar dike. Hemû radyoyên cîhanê, saziyên çapemenî û weşanê weke; "Ev zilam kiye, çi dike" behsa me dikin. Me gelê xwe anî vê rewşê. Vaye ev şêwaza Rêbertiyê ye. Me pêşî xwe anî vê astê, paşê jî gel bi hevgihand û her tim jî şiyar hişt.

Li hinek hevalan dinêrim û dibêjim; "Ev çima xwe di vê rewşê de digirin?" Xwe îhmal kirine, nikarin ya amade jî bixwin, nizanin dê çawa parçe parçe ji dijmin qut bikin. Pêwîste mirov hinekê xwe binase, bibe xwedî hêz û bikare karekê bike. Di vê mijarê de we tevan bê çare dibînim. Ne ku kesî na ecibînim, lê bi we re jî zêde tiştekê nabînim. Gelo hûn dikarin bêjin xwedî hêzim, xwedî şêwazim, xwedî pergalim û xwedî rêxistinim? Ev kar bi gotinên weke; "Min bi rê ve bibe, dehf bide" ve nabe. Weke hemalekî kî çi bide we, çi barî bide ser milê we, bi rakirina wî barî ve ev kar nayên meşandin. Yên wisa dikin ne azadin û xwedî biryarin, ancex ji bo hinek dine. Li jiyana we tevan dinêrim: Jiyana we ne serbixwe ye, zêde biryarên we tine ne. Divê ev jî ne çarenûsa mirov be. Ji ber azadî û serxwebûn vê napejirîne.

Her roj xwe ji nû ve diafirînim. Şêwaza xwe jî, çawa zimanê xwe bikar bînim û gava xwe bavêjim ku derê hemû ez bi xwe diyar dikim û ser dixim. Hinek belengaz diçin welat, hêj şeş meh derbas nebûyîn dikevin. Tawan ne tenê ya van ciwanaye, yê kesên xwe rêber dihesibinine. Dîsa jî divê hûn xwe îhmal nekin û bizanin xwe bi xwe ava bikin. Ez jî xwe ber bi destê yekî ve berdim, bêjim ev dewletin, ev hevalên ciwanin, bila min îdare bikin, ne gengaze ku bikarim rojekê jî bijîm. Ez van xalan ji bo hûn weke PKK çiye, çawa hat damezirandin, di nava PKK'ê de jiyan çawa dimeşe,

Rêbertî çibû û xwe çawa bi rêve bir têbigihijin û ji bo xwe di vî şêwazî de ji nû ve ava bikin vedibêjim. Hûn dixwazin biçin welat û xwe fedayî vê rêyê dikin, lê belê diçin û zû dikevin. Heyfa we ye. Ger agahiya we ji van rastiyan nebe, ti xizmet jî ji destê we nayê. Ger hûn bi zerar bin, bibin pirsgirêk, partî jî we napejirîne. Nabêjim bi zorê tevlî PKK'ê bibin, hûn bi xwe dixwazin tevlî bibin. Pêwîste ne ji bo xwe hinek tiştan bidest bixin, ji bo egîdiyê bikin tevlî nava PKK'ê bibin. Ji bo vê jî divê hûn bêjin; "Ez bi aqilim, xwedî hewldanim, ji bo ya sûdmend bidim gel hatime." Daku hûn bêjin; "Ji ber dijminê vî gelî heye, dixwazim li vî dijminî bidim, ev hêz bi min re heye, bila partî rê ji min re veke", tevlî PKK'ê dibin. Nexwe ne ji bo hûn bêjin; "Ez nexweşekim, bila partî min rizgar bike" tevlî nabin.

Xalên ku me destnîşan kirîn bingehînin. Bila kes şaş xwe tevlî partiyê neke. Divê hûn jî hêz ava bikin. Min xwe bi xwe wisa kir xwedî hêz, hêza xwe da gel, gel bi vê hêzdar bû û bû hêz. Niha jî gel hêza xwe dide min û ez jî bi vê mezin dibim. Min ev derfet bi zorê yan jî lîstokan negirt. Min ev derfet li ser bingeha parastina rastiyên mezin bidest xistin. Ma em we bi zorê didin karkirin, bi zorê dixin ser rêya gel? Na! Vê li ser bingeha rastiyên mezin dikim. Çiqas mirovbûn bi we re heye, dê ev kar jî ewqas bimeşin. Ev jî, hêz dide mirov. Em we çawa dikin hêz? Em tiştên rast û ji bo mirovbûna xwe hewce dibînin. We jî ev dîtin û beşdar bûn. Ya esasî ev e, ji bilî vê hewce nake hûn xwe bixapînin. Ne raste ku hûn bêjin; "Cahilek bûm, min lîstok kir, ne dizaniya." Ev xwe xapandine.

Hevalên pir kevin hene, ji wan re jî dibêjim; "We çima heta niha ev kêmasî domandin?" Hinek bîst salên xwe tijî dikin: Hêjî dibêjin; "Me dît Rêbertî her tiştî dibêje, her tiştî dike, me jî got nexwe hewce nake em xwe tevlî bikin." Bila hinekê wijdana we hebe, ez ê çawa bi tena xwe artêşa gel bi rê ve bibim? Heta hêmana mirov nebe, fermande nebe, ez ê çawa bi tena xwe we bikim artêş û bidim şerkirin? Ev îhmalkariyek mezine. Hinek tên û roja duyem dibin bar. Em ji van re dibêjin; "Hûn çima hatin?" Dibêjin; "Em di bûhranê de bûn, tengav bûn, seresertî heye, divê partî me sererast

bike.” Piranî li ser vî bingehî tên. Qaşo ev li ser navê; “Em heta mirina xwe bi Rêbertî ve girêdayî ne” sond didin. Em jî ji van re dibêjin; “Hûn ne ji bo em partiyê bihêz bikin û gel rizgar bikim tên, ji bo partiyê ji hêz bixin tên.” Rêbertî heta radeyekê dikare bar rake. Ger hûn jî xwe du qetî zêdetir dikin bar, wê Rêbertî çawa we rake? Hûn nizanin hevaltiyê bikin, bi hevaltiyê û heta xwe jî dilîzin, dixwazin bi me jî bilîzin.

## Rêbertiya PKK'ê Gelparêz û Serbixwe Ye

Em carek din dibêjin partîbûnê pêk bênin. Partîbûn çiye? Xalek ku em pir girîng li ser radiwestin jî **Partîbûne**. Di vê mijarê de rastiya Rêbertiyê lêkolîn bikin û encam derbixin. Kes ji min lewaztir û bêçare nebû. Min çawa xwe kir xwedî hêz û çawa bûm çare? Rastiya Rêbertiyê bersivê dide her tiştê ku hûn dixwazin fêr bibin. Hûn çiqas bikarin rastiya Rêbertiyê hîn bibin, dê pirsgirêkên we jî ewqasî çareser bibin. Hûn ê çawa fêrî rastiya Rêbertiyê bibin?

Rêbertî kî bû, çibû û çawa kar dikir? Tevger, ruh, bi heyber û manewiyatê ve her pirsgirêk çawa digirt dest? Tirs, wêrekî, fedekarî û ji her hêlê ve jiyana wî çawa bû? Çawa li ser pirsgirêkên siyasî û leşkerî radiwestiya? Nêrîna Rêbertî ji rêxistinbûn û bîrdoziyê re çawa bû? Rêbertî çiqas zanebûne û çiqas hêvî ye? Ger hûn rastiya Rêbertiyê rast tênegihijin, hinek çawa Kurdê kevinin, hûn ê jî dê evqasî Kurdê kevin bin.

Rastiya Rêbertiyê berî her tiştî ye. Yê ku li Kurdistanê kar dike û serkeftinê tîne ev Rêbertiye. Her kes dizane ku, ev Rêbertî bi Kurdistanê dide serxistin û dikare li dijî dijmin raweste. Vêca li rêberên din ên di dîroka me de binêrin: Nikarin li hember dijmin bîst û çar demjimêran jî li ber xwe bidin. Dema Şahê Îranê alîkariya xwe ya bi Barzanî re qut kir, sed hezar pêşmergeyên Barzanî hebûn. Ji pêşmergeyên xwe re gotibû; “Çekên xwe danin û birevin.” Ji ber ku Şahê Îranê gotibû; “Min alîkariya xwe biriye.” Dîsa di sala 1974’an de artêşa wî ne kêmî sed hezar kes bû. Lê nekarî bîst û çar demjimêran serbixwe bimîne. Me jî xwe ji tinebûnê ava kir û heta niha jî li ser lingane. Rêbertî ne xalek ji rêzê ye. Min çawa wêriya ku ji tinebûnê biafirînim raber kir û xwe anî vê astê? Dijminê Barzanî jî ne dijminek wisa bihêz bû. Lê dijminê me di cîhanê de ji her kesî zêdetir kujere. Me çawa xwe li hember vî dijminî girt? Ger hûn fêr nebin wêrekî, fedekarî û zanebûna me çiye, hûn ê çawa şer bikin û bibin PKK’yîyek rasteqîn?

Bi zorê ji we re nabêjim werin tevlî PKK’ê bibin. Lê ger tu di tevlîbûnê de bi biryarî, nexwe wê li ser xeta rastiyan bî. Hûn bi şêwaza xwe biçin û bêjin; “Em jî xwedî şêwazekî ne” nabe. Hûn nikarin bi şêwaza xwe du gavan bavêjin. Şêwaza partiyên din ên heta niha çibû? Ji bilî sextekariyê tiştek din nedikirin, li hember dijmin yek fîşek ne diteqandin. Yên teqandin jî roja duyem li erdê ketin û mirin. Şêwaza me ne wisa ye. Bila tevlîbûna we ji partiyê, Rêbertî û şer re ne bi xapînok û lîstok be, bila bi şêweyek rast be. Ji duristbûna we çi gumana me nîne. Qusura we, hûn **nîv mirovên** ku zêde tiştek ji dest nayê û zû dikevine. Min jî evqas kar kir, lê hêjî xwe bes nabînim û dibêjim tiştên ku heta niha min kirine destpêke.

Dihizirim ku ez ê ji vir û şûn de çawa darbeyên mezin li dijmin bidim?

Sala 1993'ê diqede. Vêca ji sala 1994'an em çi hêvî dikin? Em ê di sala 1994'an de şer hîn zêdetir xurt bikin. Me hevrê hinekê kirin xwedî ezmûn, biçek kirin û li çiyan bicîh kirin. Me hinekê gel jî beşdarî vê têkoşînê kir. Ev hemû ji bo xurt li dijmin dayînê ye. Em ê di sala 1994'an de ji her demê zêdetir bi ser dijmin de biçin. Xebata ku heta niha min kirî ji ber vê destpêke. Gotinên weke; "Min evqasî rêbertî kir, evqas westiyam, ji vir û şûn de hinekê jî li rehetiya xwe binêrim", qet nayên hişê min. Berovajî, ji xwe re dibêjim; "Ev destpêke, min firsendek mezin bidest xistiye, divê hîn zêdetir bi ser vî dijminî de biçim." Em bi vî şêwazî li ser sala nû radiwestin. Vêca deka li xwe binêrin, hûn weke belengaza nin. Nabêjim ev sucê we ye, hûn nû beşdar dibin, lê bi sekna xwe ve me ditirsînin. Wê siberojê dijmin li we bide, hûn weke berxê di devê dijmin de û çêlika çûkê ya di devê mar de ne. Em dihizirin ku we çawa ji devê mar derbixin. Dema mirov li halê we dinêre, we çilêka çûk dihesibîne. Dijmin dixwaze min jî bixwe, her roj dibêje; "Me kuşt." Ev bîst sale vê dibêje. Lê ez li vir im. Kî hat kuştin, kî derewkere, ev derdikeve holê. Dijmin nikare min daqurtîne. Ji ber ku xebatên di bin têkoşîn û berpirsyariya min de li dijmin didin. Ev karê me ye. Me tedbîr girt, xwe jî li gorî vê amade kir, lewma dijmin nikare me daqurtîne.

Mirin her tim heye û di şer de jî mirin heye. Ya girîng hûn dikarin li hemberî dijmin bi qasî ji destê we tê bi xwe re çi tine bikin, hûn çiqas bikarin şer bikin, ewqasî şerkirine. Wê demê hûn li kur dimirin bimirin, qet ne girînge. Ji ber ku we tiştek bêmirinî kiriye. Ez wisa nêzî xwe dibim. Çi ji destê min bê, min heta dawî kir û darbeyên mezin li dijminê me dan. Hema bêje min hezaran hevalên me ji nû ve ava kirin. Kurdistan bi temamî rabû, serhildan pêş dikevin, gêrîla li çiyane û gav bi gav em ber bi serkeftinê ve dimeşin. Em dibêjin ku, me hinek tiştên derbikevin holê kirin. Ger ne wisa be em hebûn û tinebûna xwe nîqaş nakin. Ji ber ku mirov bi xebatê, bi selmandina xebatê ve xwe ji nû ve diafirîne.

Ma hûn dikarin bêjin; "Êdî bese?" Na! Hûn berxekin, ferxikekin, em jî dibêjin em çawa dikarin van ji bin bêhna dijmin derbêxin? Dijmin dikare we di carekê de daqurtîne. Hûn ê çawa xwe nedin daqurtandin? Hûn dikarin vê bi dil û mejiyek mezin, bi şêwaza milîtanek ku rastiyên şer şev û roj nefes bi nefesê berçav digire ser bixin. Ger hûn biçin bibin parî, wê demê hûn zerar didin min jî, dê û bavên xwe jî. Hûn çima nikarin baş çek bikar bînin, nikarin xwe biparêzin û baş li dijmin bidin? Hûn çûn di roja duyem de ketin, ma ne heyfa we ye? We sond dabû, sonda we li kur ma? Van ji xwe bipirsin û bersiva wê bidin. Ger hûn wisa nekin, hûn ne egîd in. Em naxwazin hûn bi vê şêwazê biçin û hêsan bijîn. Berovajî xwe wisa amade bikin, bila dijmin nekare we daqurtîne, heta dijwar li dijmin bidin. Şoreşgerê rasteqîn wisa ye.

Hûn ê şev û roj li ser xwe rawestin û ji nû ve ava bikin. Ger hûn wisa nekin, nebêjin; "Ez egîd im." Bêjin; "Em ketine, mirîne." Jiyanê jî hêjayî xwe nebînin. Ez evqasî kar dikim, dîsa jî jiyanê hêjayî xwe nabînim. Ji xwe re dibêjim divê baştir lê bidim, karên hîn mezintir ser bixim. Hêj we tiştek nekiriye, lê em we serbest berdin, hûn ê bixwazin hemû partiyê bikin malê xwe. Ne raste hûn axatiyê dikin û ji bo we ne başe. Kesê wisa dike sextekare, bi xwe dikene û piranî jî wisa ne. Divê vê nêzîkbûna xwe bigire û bavêje, misoger bila kes xwe wisa tevlî partî û şer neke. Ji bilî vê jiyan ji bo we mirine. Hûn serê min jî jê bikin nikarin jiyana di xizmeta hinek din de rojekê jî bi min bidin pejirandin. Hêjî jiyana xwe ya heyî napejirînim û dixwazim hîn mezintir bikim. Dibe ku hûn xwe rehet bihesibînin, lê ez ji sedî yek jî weke we xwe rehet nabînim û xwe li gorî têkoşîna bi dijmin re diafirînim. Rojekê dijmin paşguh bikim, bêjim derfet evqasî zêde bûne û pir tiştên min hene ez ê xwe bixapînim. Ger mirovek durist bim, divê ez li çiyan, di dîrokê û li her qadê derfetên şer peyda bikim. Derfet, li hember dijmin li ser piyan mayîne, li hember dijmin berxwedane, bûna hebûne û netefîne. Ger hûn van derfetan nebînin dawiya we mirine. Yan hûn ê bibin xayînek, an dê we bikujin, an jî ji vî welatî bidin revandin. Vêca hûn bimirin jî, xayîn jî bin û birevin jî qîmeta we pênc quruşî nake. Ji bo we tevan ev xeterî heye. Yan hûn ê egîdiyek mezin pêk

bînin û rêya jiyanê vekin, an jî hûn ê tev bimirin, bibin xayîn û birevin. Rêya din, rêya mayîna li welate, rêya berxwedanê ye, rêya şere, rêya egîdiyê ye û rêya mezinbûnê ye. Ev jî xebatek mezin dixwaze û çareyek din jî nîne.

Bi fêlbazî û xapandinê siyaset nabê û nameşe. Şoreş bi hestiyarî, zaroktî, girî û xwe îhmal kirinê ve nameşe. Kesên wisa dikin ne tenê xwe, dibin sedem ku bi derdora xwe jî bidin windakirin. Ev bi ti awayî nayên efûkirin û yên herî xirabin. Yek ji van jî ne rastin. Şêwaza Rêbertiyê bi pratîk û dîroka xwe ve li pêşberî we ye. Me çawa kiribe, hûn ê jî wisa bikin. Ez çi bikim, ji bo Kurdan ji bilî vê çareyek din nîne? Bavên we, pêşiyên we tiştek nedane we. Ji bo welat û şerefa mirov tiştek nîne. Her çendî di destê we de parçeyek welat hebe jî, hûn nekarin bêhnek serbixwe bigirin, hûn bê şerefin. Kesek bê welat, kesek bênamûse. Ti nirxa kesê şev û roj li kolanan, bê war û mal nîne. Kesek bê welat, kesek bê male. Miletek bê welat, weke kesê bê male, wê li sûkan bê firotin. Kurd wisane, her kes wan li sûkan difroşe. Ger yek weke we bibin sûkê û bifroşin, yek bifiroşe yeke din, ew jî bifiroşe yeke din, ma wê ti xêr ji we bimîne? Niha gelê Kurd jî wisa ye. Di destê bazirganan de bi pênc-deh quruşan difiroşin. Yên din difiroşe heşt quruşî, yê din jî belaş dide. Ev bazirganên gelin, xwîna gel difiroşin. Welat wêran kirine, gel jî di destê dijmin de hiştine. Qet ne xema wane ku dijmin dikeve nav welatê wan û wêran dike.

Gel jî dibêje; "Çima wisa li me hatiye?" Hûn li sûkê milkekin û tên firotin. Wê nirxê we çibe? Lê ez xwe ji nav sûkê derdixim. Çavên min li welate, min berê xwe daye welat û dibêjim kes nikare min bifiroşe. Pir kes di derheqê min de biryar digire. Her yek ji aliyekê ve hatiye û dibêje; "Ev li kure û çawa tê firotin?" Destpêkê hinek kesan wisa dikir, niha dewlet jî vê dike. Ez Rêberek gelparêzim, bihêzim û serbixwe me. Ger ev dixwazin min bifiroşin, ez dibêjim; "Ez çawa dikarim xwe ji destê van rizgar bikim, çawa darbe li wan bidim û yên rast dibin jî çawa dikarim bixim ser rêya welat." Derdê min ev e. Ji bilî vê hûn nikarin bêjin di rêya xêrê de me û egîdek im. Pêwîste Rêbertî wisa bike.

Hûn ciwanin, ger hêza we heye xwe tevlî rastiyan bikin, xwe rakin-danin bipîvin, neyêniyan derbas bikin û aliyên xwe yên kêm temam bikin. Şer li pêşiya we ye, ger hûn dikarin bikin bi ser dijmin de biçin. Ger rojekê hûn gihiştin welat, hûn ê xwe bi siûd bihesibînin. Bi çek çûna ser lutkeyên welat ne kême, xwe li ser wan çiyayên berz bicîhkirin siûdek mezine. Ev bîst û sê salin ji bo vê siûdê kar dikim. Bi bêrîkirina ez ê çawa biçim serê wan çiyan dijîm. Min di sala 1970'î de ev pirs ji xwe kir û heta niha jî dipirsim. Panzdeh salin li vê qadê me, dibêjim ez ê çawa xwe bigihînim wan çiyan. Me berê gel da wan çiyan, hûn tev jî gihan çiyan, ez hêjî hewl didim xwe bigihînimê. Min evqas sal çawa sebir kir, çawa rê ji çiyan re vekir, çawa li welat ji we tevan re cîh vekir? Ger mirovek helkehelk li pey armancên xwe be dê wisa bike. Mirovên ku bi dozên mezin dimeşin, wisa li ser xwe radiwestin. Berê behsa terîqat û şerîetan dikiran, niha jî terîqat û şerîeta Kurdan jî ev e.

Yên dihizirin bi rêbazên din dimeşin xwe dixapînin û her roj li aliyekê dikevin. Ev ne raste. Evqas sale meşa me bi helkehelk berdewam dike û di encamê de hûn jî dibînin ku em we tevan dimeşînin. Ya girîng **xwe gihandina esasên jiyanê** ye. Ji bilî vê deh quruş nirx nadim tiştên din. Xweşikbûn û başî bi gotinên; "Min pir xwariye, pir vexwariye, keyfa min li ciye" ve nabe. Hûn çiqas li pey armancin, çiqas di rêya vê de meşiyan, qîmeta em bidin we jî ewqase. Başî, rêzdarî, hezkirin, hestiyarî û bi kurtasî her tiştê we çiqas li ser xeta armance, hûn ewqasin. Xwe wisa binasin, bibin xwedî şeref û nefsa xwe û bimeşin. Rêya rast ev e. Ji bilî vê bila ti kes li bendê nemîne. Bila kes nebêje; "Bila yek bê min dehf bide, serkeftinê bîne pêşiya min." Ev di nava PKK'ê de ne gengazin. Her kes li gorî karê dike şeref digire, serkeftinê bidest dixe. Bi qasî serkeftinê jî jiyanê digire.

Bi ketina nav sala dehemîn a salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê, em salvegera damezrandina partiyê ya 15. Jî dijîn û derbasî salek nû dibin. Sala nû, sala em ê şer xurt bikine. Em ê şerê gêrîla gav bi gav ber bi şerê sazûmankirî ve pêşve bibin. Em ê pêşî şerê nîv gêrîla, nîv sazûmankirî, ango şerê tevgerdar pêş bixin. Şerê

tevgerdar şerê ne tam gêrîla, ne jî tam sazûmankirî ye. Zêdekirina hejmara me, ketina nav her qada welat û şer hîn kûrkirine. Gelek tiştên ku dijmin nekare xwe bigihînê ji nû ve kirine. Pêşengtiya partiyê, şêwaza partiyê û jiyana partiyê esasgirtine, ne burjuvaziya biçûk, axatî û sexte girtine. Pêşengtiya partiyê sedî sed li ser ruhê **Mazlum**, **Kemal** û **Hayrî** pêş dikeve. Divê hûn jî li ser vî bingehî partîbûnê bi xwe re pêş bixin. Hûn ê di sala 1994'an de jî partîbûnê wisa pêk bînin, wisa şer bikin û wisa bibin artêşa gel. Wê di têkoşînê de kevin û nû her kes vê esas bigire. Rêbertî carek din bi kûranî li ser van xalan radiweste. Yên ku heta niha xwe bi temamî tevlî partiyê nekirine, bila xwe rast tevlî partî û şer bikin û ji bo xwe wisa bidin destpêkirin.

Hûn ciwanin, lê ciwantî ne serberedayîbûn, keyfîbûn û bê pergalî ye. Berovajî tevlîbûn ji hedefa mezin, fermiyet, pergal û artêşa gel re ye. Xwe wisa tevlî bikin, xwe nekin bar, zêdetirîn barê hevalên xwe sivik bikin û ji bilî serkeftinê rê nedin ti tiştî. Şev û roj bi hevalên xwe re eleqedar bin, di pêwendiyên xwe yên bi wan re her tim serkeftinê esas bigirin, Rêbertî wisa ye, heta niha jî me wisa kir û ser xist. Niha hûn dibînin ku ji her kesî xurtirim. Ger hûn jî wisa bikin, hûn ê xurt bibin. Şêwaza xurtbûnê ev e, ji bilî vê şêwazek din nîne. Ne gengaze ku bi şêwaza axayan, began û karmendan di nava şoreşê de cîh bê girtin. Ev hemû xwe xapandine û zerar dide. Misoger tenezilî tiştên wisa nekin û firsendê nedin hinek din. Pêwîste her pêwendiya we li ser bingeha hevrêtiyê be. Kesên xwe wisa di nava partiyê de didin jiyîn, endamê partiyê yên rasteqînin. Kesên rasteqîn endamên partî bi ser kîjan pirsgirêkê de biçin bila be, pirsgirêkan çareser dikin, xwe tînin asta hêzbûnê. Dijmin ji holê radikin, xwe digihînin serkeftinê, di rêya serxwebûn û azadiyê de gavên mezin bidest dixin.

Sala 1994'an, ji bo we jî sala di cîh de û bi şêwazek lez a lêdanê ve xwe tevlîkirine. Divê em vê salê bikin, sala partî û Kurdistanê. Bi vê salê re ji we tewan re serkeftinê dixwazim û hemû hevalan silav dikim.

# PIRSGIRÊKÊN PARTÎBÛNÊ Û PEYWIRÊN ME

**29 Kanûn 1993**

## RÊBERTÎ NAVÊ XWE GIHANDINA JIYANEK BEDEWE

Rastiyên me yên şoreşê, aliyên wê yên erk, raye û berpirsyarî, weke hûn teng û şênber yên li ser me tên ferzkirin re, yên pêwîstin em ferz bikin, jêhatiya ku pêwîste bi me re derbikeve holê anîna asta fikrî û reftariya ku têra her cure asta şer bike, li gorî vê wate dayîna jiyana rojane û ya esasî bi ser xwe de çûyînê ya tê payîn derxistina holê, bingeha bi giştî bûna şoreşgerek berpirsyar, taybet jî bûna PKK'yîbûne.

Nirxandinên heta niha me kirine û çi fikrî çi jî reftarî dibe rewşên we yên hêdî hêdî bi têgihiştinê re pêş dikevin, diyar dike ku divê hîn zêdetir bi feraset be. Em ê bizanin bi feraset bin. Di nava me de nexasim a bi bandor rewşa nefêmkirinê ye. Ez vê hinekê jî weke encama rewşa binyata **dînbûnê** ya ku civaka me dijî dibînim. Êdî divê em bizanin wê rewşê derbas bikin, baweriya beramberî xwe zêde dibe bijîn, êdî bi binyatek ruh û mantiq a têrkar ve hêza jiyînê raber bikin. Lewma pêvajoyên şoreşan pir hewcene û ji bo me jî yekane rêya pêşketinê tê dîtin. Ji bilî vê çiqas dixwazin xwe li çep û rast bidin, çiqas dixwazin rûpoşin, ne gengaze ku derketinek bê kirin. Di şoreşê de rastî pir hewce dike vekirî bin an jî cewhera wê wisa ye. Mirov di van pêvajoyan de çiqas bikarin rastiyan ji her alî ve derbixin holê, wê ewqasî rast tevbigerin. Lewaziyên xwe veşartin, cuda dana diyarkirin, arasteyî rêyên rizgariya erzan bûyîn û ji ber vê jî helwestên pir cuda raberkirin xisleta kûr a binyata me ya civakî ya herî bi bandore. Pêwîste em bikarin demogojî, serî li zimandirêjiyê dayîn, bi reftarên pir sosret ve xwe dana qebûlkirinê yan jî xwe dana diyarkirinê ji helwestbûn û exlaqbûnê derbixin.

Mirovê me çima biçûke? Çima nikare li gorî miradê xwe karan ser bixe? Ev bi binyata kesayetê ve girêdayî ye. Tevî hemû hewldanên pak, eşkereyî û encamgir, ji bo hûn rojan di bin tiştên hîs dikin de neperçiqin, neşikin û ger gengaz be bikarin li ser bingeha bikişînin rastiyan bersivekê bidin, bi qasî pêwîste durist nêz bibin ewqas jî em hewl didin têrkar bin. Pirsgirêk ne ku kar bi rêbertiyek erzan ve qedandine. Her çendî derfeta vê hebe jî,

misoger tenezûlê vê nayê kirin. Li gel vê her çendî min jî tengav bike bila bike, hewldanek baş û bihêz a têra pêdiviyên şoreşê dike û ji bo ev jî serkeftî be hemû hêza xwe raberkirin feraseta me ya bingehîne. Her wiha ev ferasetek pêwîste bi we tevan re serwer be.

Mirovên me, ji dervî îradeya xwe di encama rastiya gel û civaka me de hez dike ku bi zaroktî bijî. Serî li reftarên zaroktî dide an jî heyrane ku xwe aqilmend diyar bike. Em dizanin ku ev tev şaşin. Ji bo lêkolînkirina qural û qalibên em behs dikin çiqas bermahiyên bavikane, xelatên dijminin û înkara jiyanê ne, dibe ku pêdivî bi gelek pevxistinên zanistî bê dîtin. Piraniya her cure tasfiyekarî û provakasyonên em ê nekarin jê re bêjin nexweşiyên siyasîne jî, xwe dispêrin niyazên baş. Êdî mînakên gihane astek ku bi peyvên siyasî jî neyên ravekirin hene. Bêguman divê ew bi girêdanên siyasî ve bên destnîşankirin. Ya esasî ev e. Dîsa jî me ev bi rastiya civakî ya ku bingeha wê kûrtire ve ronî kirin.

Hûn xwe nawestînin. Em dibêjin ku, em di bin êrîşa kesên ne diyare çine û çawa kar dikin de ne. Me ji van re tenê negot tasfiyekarî û provakatorî, di heman demê de me got komplogerên di nava partiyê de ne. Êdî rewş gihaye wê astê, mînak jî hene, reftarên ku ji gelek aliyan ve gev li jiyanê dixwun hene. Rewşên li ser xwe ne serwerin, ji zarokekî zêdetir cirnexweş, kelogirî û bi gazin hene. Pîremêriyek îxtiyarê heftî salî derbas dike hene. Bi yek gotinî şerme û ev reftar ne hêjayî mêrxasiyê ne. Lê belê yên van hêjayî xwe dibînin kîne? Ev reftar bi kîjan hêcetan û bi taybet çima di nava me de tên berdewamkirin? Me ev jî got: Di mijarên rastiyên bingehîn ên em neçarin biparêzin de li ber xwe dayîn, di wateya bûna pêgirek netewî û bi navê mirovî ger hebe tiştek bi navê jiyana serfiraz xwe sipartina wê û jêhatiya parastina vê jî raberkirin hewce dike! Em bi vê rê ketin. Ev ji bo we jî derbasdare. Pêwîste bê zanîn pir erzan bi gotina; “Ez PKK’yî me, girêdayî me” mirov hêjayî vî navî nabe. Ev dişibe vê: Hinek di axaftinê de dibêjin; “Ez Misilmanim”, lê ti eleqeya wan bi xisletên Misilmantiyê ve nîne. Berê bi şêweyek pir sexte kesên ku çend pêdiviyên ol’î pêk tanîn, wer dihizirin ku li cem xweda hatine efûkirin, di nav civakê de jî xwe pak didîtin. Li şûna vê qaşo hatine

nava PKK'ê, dibêjin; "Ger ji xwe re bêjim PKK'yî wê welatparêziya min jî bê destnîşankirin, rizgarvaniya min a netewî û qîmeta min cardin bê dayîn" û wisa jî ji nav vî karî derdikevin! Ji aliyê objektîf ve rewşa gelekan wisa ye.

Tevî hemû hewldanên min, ger di mijara çiqas endamê partiyê yê saxlem an jî endamê tevgerê yê saxlem de em lêpirsîna xwe dikin, dizanim ku bi hewldanên rojane ve peywirdarê ew anîna rewşa nûkirinê me û ev jî wê bi hewldan û xebatek ji rêzê ve saz nabe û ger li gorî wê tevdigerim, pêwîste hinek encamên ku her kes jê derbixe hebe. Mirov tenê ji aliyekê ve, heta xwe ji mirinê re amadekirinê nikare xwe ji nav vî karî rizgar bike. Ger dûrbûna ji pêdiviyên berpirsyariya û hêjî pirsgirêkên giran hene, li vir bikar lîstin û erk lîstin heye. Serbest bê hiştin tevî ku ji hev dernaxe kî wê heta ku derê bibe yan jî têk bibe, ji bo em xwe têr bikin gotina; "Em di xetê de ne, endamên partiyê ne", zêde ti eleqeya xwe bi duristbûn û rastiyan ve nîne. Hemû zaroktiyên we û rewşên we yên sosret di vê manê de ne. Pêwîste kar wisa neyên destgirtin.

Me di mijara rêbertîbûnê de hinek nirxandin kirin. Em diyar dikin ku şêwaza çêbûna we di bin bandora dijmin a pir cidî re derbas dibe û kevneşopî jî bi şêweyek giran mohra xwe li vê dide. Min şêwaza xwe jî danî holê. Bêguman we hinek encam ji vê derxistine. Pêdiviya we heye vî şêwazî ji nû ve şîrove bikin û di kesayeta xwe de pêk bînin. Pêdiviya me bi girêdanên zaroktî nîne. Pêdiviya me bi girêdanên li gorî quralên rêxistinê yên li ser gelek rêxistinên şematîk serwerin jî nîne. Pirsgirêkên me, pirsgirêkên mirovîne û ji bo vê jî pêdivî bi nêzîkbûnên pir jidil hene. Êdî divê hûn pir rehet derbixin zanebûnê ku çiqas girînge ku hûn bi ser xwe de biçin. Gelek nirxên ku xatirê kes, xatirê rêxistinê bi şêweyên cur be cur tên dayîn hene. Bi bandora wan an jî di bin navê azadiyê de heta dawî weke kesek ji rê derketî, pêwîste hûn xwe ferz nekin û nedin axafin. Serkeftina van karan ne tenê deynê mine, deynek her kesê ku dibêje ez ji bo vê dozê heme. Rêbertî kirin, ne derbaskirina her cure nebesiyên her kesî yên bi şêweyên zêdegavî û her cure lewaziyane, an jî girêdana we vî mafî nade we. Di encama lewaziya we de pêwîste hûn bi girêdanek nebes û bê wate ve xwe mijûl

nekin. An jî pêwîste dildariya we ya azadiyê û demokratîkbûna we di mijara pêdiviyên girêdanê çine de ber bi koranî û bê pîvaniyê ve nebe.

Siyaset, terbiyekirine. Tê zanîn ku wateya peyva siyaset **terbiye** ye. Ji peyva **Seyîs** derketiye. Seyîstî jî, terbiyekirina hespane. Hesp tên terbiyekirin û wisa didin bazdan. Hûn nikarin paşçav bikin ku terbiya ji bo hespan hewce, çiqasî ji bo me hewce ye. Yeqîn dikim bazdana me ya vî şerî, ji bazdana hespekî rûmetire. Tê zanîn ku pêdiviya vê bazdana şer bi terbiyek mezin heye. Em jî ji vê re dibêjin **perwerde**. Tê zanîn hespê ku lixawên wî ji dest derketî siwarê xwe çawa li erdê dide. Hûn çawa dikarin bi hespek wehşî re bikevin rê? Di pêşbaziyek weke şerê ku mirov dikare dîn û har bibe de, kumanda di dest de girtin, qural berçav girtin, ji her cure şerê taybet ê weke li ser me tê meşandin hêza xwe xurtkirin û bersiva wê dayîn, ji bo meşandina şerê me pir girînge. Hûn ê jî vê hinekê fêm bikin.

Êdî em diyar dikin ku pêwîste ev hemû di mejiyê we de cîh bigirin. Ji ber vê çiqas jêhatiyên ku xwe bidin der hebin, em diyar dikin ku girînge ev bikevin meriyetê. Em bikarên zarokan ve mijûl nabin. Hûn ne di nava lîstokên şer de ne, hûn di nava rastiya şer de ne. Dema van nirxandinan dikim, nêzî germahiya şerê li welat jî nebûm. Her ku min ne yekser bandorên wê hîs dikir, min dizaniya ku pêwîste çiqas hurgulî tevbigerim û her wiha bi qasî qural afirîneriya wê jî domdar bijîm. Hûn ê rastiya vî şerî bijîn, lê di asta herî kêm de jî hêza ahenga pêdiviyên wê pêk neyînin: Vaye ev bi min re xof çêdike. Encama ku min ji vê derxistî, bila serkeftina şerê we li aliyekê bimîne, di wateyekê de hûn pratîka xwe fedakirinê dijîn, an jî di wateyekê de hûn şerê jiyanek mirî dimeşînin. Ne şerek ji bo jiyanê, heba bêje hûn di nava hewldanek bê taqet û îdîa ya jiyanek ji dest çûyî de ne. Ev jî tê vê wateyê: Hûn dibêjin; “Jixwe em mirîne, zêdetir keyfa me ji jiyana wisa re tê.” Ev şêwaz, ne şerek ji bo hêvîparêzên jiyanê yên mezin û afirîneran şerek, li gorî wan û bi şêweya bendawariya wan a ji şer re ye, perpitînên dawî û xalek serfiraziyê ye, jixwe ev jî di nava civaka me de pir

berfirehe. Di kevneşopiya gelê me de xwe fedakirin pir berfirehe. Ji bo nirxek pir erzan bandorên giran ên xwe fedakirinê dijî.

Hûn çima van fêm nakin? Tevî ku bi salane em hewl didin bidin û bi jiyana xwe ve hezar carî biselmînin, hûn çima rastiya şerê me, rastiya jiyana wê û rastiya quralên wê berçav nagirin? Hewce nake hûn nîqaşan ber bi çep û rast ve bikişînin, xwe bikin zarok rewşên pozbilindiyê bijîn û wisa xwe ji rastiya pirsgirêkan veşêrin. Ev ne mezinbûnê çêdike, şanaziyê dide bidestxistin, ne nan û ne jî azadiyê ava dike. Ber bi tiştekî ve û ti derê ve nabe. Êdî hûn ê bizanin hinekê bi feraset bin. Gelo em dikarin bêjin, ji bilî vê rêyek din heye? Bila êdî jêhatiya we ya bikare wêrektî nêzî van kêliyan bibe pêş bikevin. Wê tu heta ku derê birevî, xwe bikujî, xwe biçûk bixî û xwe binepixînî? Ma kes ji we re dibêje; "Hûn pir başin?" Gelo di vê cîhanê de yê li hember we rêz digire heye?

Ya rastî encamên girîng hûn ji min bigirin hene. Hewce nake bêjin ev rêber jî, hûn dikarin bêjin ev hevrê û wisa destpê bikin. Çima hûn pêwîstiya nêzîkbûna wisa dibînin? Çima her tim li ser hinek nirxan an jî hinek xebatan radiwestim? Rewşek weke dubarebûnê dixwuyê yan jî heman tiştî hezar carî dubare dikim derdikeve holê dijîm. Tişta min dixwest li vir destnîşan bikim çibû? Navê hevaltiyê û girêdana bi Rêbertiyê re danin aliyekê, weke mirovek xwedî feraset bi çavek zanyar objektîf nêzî diyardeyê dibim jî hûn min bigirin dest, dikarin gelek tiştan hîn bibin. Pêdiviya me bi vê heye. Deka em bêjin hûn fêr bûn, we pejirand, heta navê partî jî bi ser ve kir û we pejirand ku tevlî xeta Rêbertiyê bibin. Encamên ku dê ew di kesayeta we de ava bike divê mezin bin û xwe wisa jî bide der. Şertê gotina ez di xeta Rêbertiyê de kar dikim evin. Ji bilî vê nabe. Nêzîkbûnek cudatir, bi şêweyên cur be cur valederxistina Rêbertiyê ye.

Hûn jî dibînin, misoger pêdiviya me rastî li ser bingeha esasî diyarkirinê û hinekê jî bi xurtbûnê heye. Min di hemû pratîkên me de ev jî destnîşan kir: Ger li gorî we ye rast xurt bibin û ya hewce jî bi şêweyek rast pêk bînin û wisa beşdar bibin. Di şoreşê de zorî nîne, lê azadiya we ya bi şoreşê lîstinê jî nîne. Ti mafê we nîne ku li gorî keyfa xwe bi şoreşê bilîzin. Ev bi agir lîstine. Hûn nikarin

bêjin; "Civakê em dîn kirin, bûn cûce, me xwe bi nepixandinê ve xapand." Ji ber ku êdî di rastiya PKK'ê de qonaxa hatiye bidestxistin wisa ye, divê hûn li hember rastiyan rêzdar bin. Êdî pêwîste hûn wate bidin rastiya şoreşê.

Agahiyên rojane ji min re tên hene, qaşo rapor hene. Xalên ku hezar carî dibêjim tine dihesibînin, weke ku xwe dixapînin, hewl didin min jî ji xwe re bikin amûr. Çi tişta min ronî nekirî maye? Çi derfetên min ne dayîn hene? Hêjî tu pozbilindiya çi dikî? Her tim lêkolîn dikim, ew jî zêdetir hesabên rûniştina li quncikekê dikin. Bûyera şêwaza çêbûnê ya behsê dikim, hêjî xwe bi kesayet re pir balkêş dide der. Kesên ku difikirin min bikar bînin û wisa quncika xwe fireh bikin û hinek din bi yetkî û xurt bibin hene. Wê ji bo çi vê bikar bînin? Ya rastî tiştek ku zêde dike jî nîne. Ev kesayetên ku serê wan tevlîhev, xerîzeyên wan bê sînor, nehatine pîvan, ti perwerde nedîtine û heta dawî bê kontrolin. Min jî weke çavkaniya hêzê dibînin, ji ber ku mirov bi min re xurt dibin. Dixwazin heman weke fêlbazên gundî, pozbilindên rewşenbîr encam bigirin.

Ev ne şêwazek raste. Ti eleqeya min bi vê şêwazê nîne. Xalên ku min hezar carî dubare kirî hene. Hinek bangên ku weke şerket, milîtan û PKK'yî xîtabî te dikin hene. Hinekê naveroka wan bixwîne! Arjenge, tu bêjî muhafezekar, bêjî kere, kore, çi dibêjî bêje, ne di ferqê de ye. Halê koleyê kevin ê hatî kûrkirine! Qaşo siyasiye, qaşo leşkere, lê şêweyek dervî leşkertî û polîtîkayê ye. Çima wisa li wan tê? Ger mirov hinekê bi xwe re hejandinê nejî, şoreşek ferasetê çêneke û bûyera rêzdarî pêş nexe, vaye encama ku bigihiyê ev dere.

Rojane xebatên dijmin hene. Li hember rastiya PKK'ê, heta weke kes jî li dijî me tiştên ku dixwazin bikin hene. Pir vekirî dibêjin û dinivîsin. Armancên wan ên van kiryaran çine? Ma wê hêj çi bikin? Gelek endamên me yên ji xwe razî weke ku tiştek nîne nêz dibin an jî dema em li bin dinêrin, dibê ku bi bendewariya ku wê nêvengên ku keyfa we bidin axaftin pêş bikevin jî ne kêmin. Ger em hinekê paşve bikevin an jî tasfiye bibin, kesên ku dihizirin rêya wan ronî bibe hene. Dihizirin ku herêmê desteser bike, yetkî

desteser bike û li gorî xwe jî çend rêzan bi hev re derbas bike! Kî dizane wê bibe kesek çiqasî bi bandor!

Me ev jiyan kirin û hêjî hejmarek mirovên ku rewşa wan objektîf wisa hene. Ma wê bendewariyên van bicîh werin? Ne gengaze. Wê li hember dijmin bîst û çar demjimêran an li ber xwe bide yan jî nade. Camêr xafile, lê bendewarî û fişalên wî zêde ne. Bi şêweyek xwe xapandî û çavsor derdikeve holê. Dema dibêjim zaroktî û fişalbûn behsa van dikim. Em dibêjin were rastiyê bibîne, nêzî wê jî nabe. Weke kesek bê şanaz serê xwe ditewîne û dibêje; “Dîktatorî hebû.” Dema firsendê dibîne hêjayî xwe dibîne ku weke lawiran bijî û ji vê re jî dibêje; “Azadî.” Fêrî çend gotina bûye, ya rastî ew jî demogojiyek mezine. Dibêje demokrasî, jê bipirsin wateya peyva demokrasî jî nizane. Tişta ku ji demokrasiyê fêm dike xwe kirina beton û fişalkirine. Tişta ku ji girêdanê jî fêm dike cûcebûne. Çiqasî şelûşeht bibe wer dizane ku ewqasî girêdana xwe raber kiriye.

Em ji van narevin. Hewl didim diyar bikim ku ji heft saliya xwe ve ti eleqeya şêwaza me ya hevaltiyê bi vê nîne. Çima wisa dikin? Civak nexweşe, bi qasî kariye pê lîstiye. Tevî hemû zehmetiyan, ez ê jî li hember van ferzkirinên rojane serî netewînim. Serî tewandin ne tiştek başe. Ez ê çima serî ji paşverûtiyên we re bitewînim. Çima rê bidim nêzîkbûnên ku ne li gorî rêhevaltiyê ne? Qaşo xatirê we şikestiye û girêdana we qediyaye, bila biqede, pêdiviya min bi van nîne.

Em dixwazin beramber jiyanê rêzdariyek mezin raber bikin. Sonda min a mezin ji mirovahiyê re heye. Pêwîste reftarên min ên rêzdariya dost û dijminan bidest bixe hebe. Em nikarin bi xatirê ti kes ji we vê xirab bikin. Ev ji bo me pir hewce ye. Ji ber ku her kes ketîbûn, bêhêzî, bê quralî, xwe xapandi, sextekarî û durûtiyê dilîze. Nabê! Ger ez jî li gorî vê rewşê bim, tenezilî vê bikim, ger çalekiyek me ya cidî jî hebe, yeqîn dikim ku ez ê beramberî vê bikevim nav helwestek qet nayê pejirandin. Bi her tiştî tê lîstin, lê nirxên ku pêwîste pê neyê lîstin jî yên ku behsa wan dikime. Pêwîste hûn fêm bikin ku, tiştên vedibêjim ne vale ne. Êdî fêm bikin ku, xalên vedibêjim ji bo we bangawaziya hinek tiştane. Ji

ber vê jî pêwîste hûn bizanin kesayeta xwe kêlî bi kêlî amade bikin. Temenên me di navbera bîst û sîh de ne, mirov dikare çalekiyek û kesayetek şoreşgerî di van temenan de bide jiyîn. Kesayetek ku hêviya serkeftinê dide, mirov dikare bi amadekariyek wisa ve derbixe holê.

Hûn dikarin min jî li ser vî bingehî rexne bikin. Heta dawî xeta vê û asta pêkana vê çi saz dike û nake nîqaş bikin. Dema van dibêjim hema wisa weke qalib li ser we ferz nakim, di mejiyê xwe de bidin rûniştandin. Ger hêzek we ya nîqaşê hebê, dikarin heta dawî bi min re nîqaş bikin. Bêjin; “Dikare ev kar cudatir bê kirin, ev kar dikare wisa zêdetir serkeftî be.” Bes bila helwesta we ber bi dijmin û radestbûnê ve nebe. Bes me ji biryardariya berxwedanê û helwesta berxwedanê qut nekin, bila hêz bide vê. Hûn ê esasê kar paşguh nekin. Ger hûn ê şûna vê, weke we xwe xapandiye, hewl bidin me jî ji rê derbixin û bi şêweyên cur be cur taktîkan ve rojev bikin, li ser vê bîrîmê bidin pêkan, li ser vê herêmê bidin pêkan, bi vê fêlbaziyê bikin û bi zimandirêjî bikin, jixwe ev qet nabe. Ger girêdana min jî bi rastiya gel tê gotin, şoreş tê gotin, pergala şehîd û nirxan tê gotin ve hebe, pêwîste mafê ti kesî jî nebe ku vê ji me bixwaze.

Çima û ji bo çi van dubare vedibêjim? Ji ber ku kesayetên we wisa hêsan van fêm nake, her tim direve. Kesayeta revok pir kûre. Dîsa fişale, rastiyan berfirehî û weke heyî di dil û mejiyê xwe de nade rûniştandin. Dixwaze di asta nêzîkbûnên xwedayî de bigire dest an jî karîkatûre bike, çeloxwarî dike û ev jî terbiyê xirab dike. Dibêje; “Nêzîkbûna bi perwerdeyî ya ji şoreşê re ji holê rakin.” Peyre nêzîkbûnên keyfî pêş dixe. Encamên ku ev jî di şer de bidin der, pir xeterin.

Wexta van tevan dibêjim, ma xwe dixapînim? Ne bawerim. Ji ber li hember quralan rêzdarim, baweriya min bi rastiyên şoreşê heye, li hember rastiyên şoreşê rêzdarim, behsa hewldanên şoreşê dikim. Ti eleqeya van bi ferzkariyên min an jî şêwaza min a rêbertiyê re nîne. Ev pêdiviyên neçarî ne. Ev gavên hûn davêjin ne cin û firîşteyan avêtine. Hûn davêjin. Hatina we ya nav partî û derketina serê çiyan, gavên ku bi ling û mejiyê we ve derketin holê

ne. Pêwîste hûn bi xwe bawer bin. Hûn bi xwe xwediyê van gavane û bi baweriyek mezin bi xwe bidin hîskirin ku hûn bi xwe tevlî van karan bûne. Dibe ku ger ez bêjim hûn bi lingê kîjan miriyan û mejiyê kîjan bêmejî ve dimeşin hûn bixeyîdin. Ger hûn hinekê bihizirin, hûn ê jî bibînin ku ev ling, lingên hinek dine. Gotinên di devê we de, gotinên hinek dine. Gelo ev dubareya çendê ye, taklîda çendê ye. Nexwe ne gengaze ku ev lingê ku di meşê de evqasî şaşiyan dike lingê te be. Meşên lingê ku dibêje; "Min di vê şêwazê de PKK'yîbûn pêk aniye" wisa nabe. Mejiyên wan evqasî şaşiyan nakin. Destûrê nade evqas paşverûtiyan. Mejiyê paşverû yê ji çend nifşên beriya niha hinek dinin xwe didin der. Mejiyek afirîner, her tim fikir dihilberîne, di rastiya şerê me de evqasî şaşiyan nake. Nikare di mijara gelek peywiran de evkarî komediya şaşiyan û kêmasiyan bijî.

Hêza fikir raberkirin, ev ber bi pêş ve veguhertina hêza reftarî pir girînge. Kesê ku li ser vî bingehî bi xwe ve mijûl nabe û bi xwe re serkeftinê ava neke, bila nehizire ku wê ji bo gel, artêş, rêxistin û bîrîmekê serkeftinê saz bike. Vaye kesek ku saxlem bi xwe re destpê nake, bila nehizire ku wê bikare bi hinek din û bîrîmek din re saxlem destpê bike. Kesê nekare hesab ji xwe bixwaze, bila nehizire ku hesab ji hinek din bixwaze. Kesê ku serkeftinê bi xwe re ava neke, xwe qane neke, bila nehizire ku bi hinek din re hêvî û baweriya serkeftinê saz bike. Hinekê jî şêwaza min wisa ye. Pêşî em xwe dibînin, pêşî hesab didin xwe, pêşî xwe qane dikin, xwe didin karkirin û paşê derfetê pêkanîna vê ji yên din re jî derdikeve holê. Bes camêr serî li peywirek herî biçûk jî nade, serkeftinê ji min dixwaze. Bûyer û kesayetên wisa derketin holê, ger hinekê şiyarbûn hebe, teqez karên ku bên kirin hene, lê wê jî dikin para min. Li beramberî wî rêbertiyek bêhempa ya dixwazê heye! Ev fêlbaziya gundîtî jî derbas dike, pozbilindiya rewşenbîrî jî di rewşek pir cuda de ye, li vir rewşek ku wê jî derbas dike heye. Berovajîkirina rêbertiyê evqasî cidî pêş dikevin. Ji rêderketinên siyasî jî wêdetir, nexweşiyên ruhî yên cidî û rewşên cur be cur – hinek jî ji vê re dibêjin nexweşiyên derûnî- jî derbas dike.

Lê pirsgirêk ne ev e. Ev weke nexweşên derûnî îlankirin û wisa berdan, dibe efûkirina wan an jî rastiya van ji yek alî ve hiştinê. Mirov carekê lê dinêre fêlbazê siyasetê ye, carekê dinêre berjewendparêze, carekê jî dinêre belengazê xwedê ye! Weke margîse dikeve her rengî. Ji destpêka kar ve diyare ku em ê nekarin ji yek alî ve nêzî van bibin. Ev hemû **nexweşiyên Kurdistanê** ne. Di çarçoveya Rêbertiyê de her cure valederxistin û çewsînerî, li qadên hem siyasî, hem leşkerî, ji gelek aliyan ve gef li jiyanê xwarine. Dikare ji vê re şoreşa dijber û oportonîstî jî bê gotin. Ev dikarin pir cure navan jî derbikevin holê. Em vê jî ecêb nabînin. Ji ber ku ji civakek evqas ketî her tişt derdikeve. Li gorî zemînê rastiya me ev e, saziya rêbertiya ku em dixwazin nûnertiya wê bikin û rastiya PKK'ê hêjayî fêmkirinê ye. Êdî hûn ê girîngiya vê fêm bikin.

Rojên dawî bi ser min de tên, hewl didin her roj weke hatime kuştin destnîşan bikin. Heta bendewariya vê gelek derdoran an jî derdorên berjewendiyên cuda jî pêçaye. Ger em pir ferdî bûna, yeqîn dikim wê ev hewce nedîtiban. Ger em di nava helwestek bê aqil de bûna, wê me xwe bi xwe tine kiriba û ji ber vê jî bi me ve eleqedar nedibûn. Nexwe, ez li hember van derdoran tevgerek pir dijberim. Hêza nûnertiya wê û jêhatiya wê raber dikim. Ev ispateke. Çima li ser gelek hevalan hesabê lîstokan tê kirin û ji bo min pir dihizirin? Xirab dipekin, çavên wan tarî dibe, ji bo em çawa dijîn û wisa dikin asteng bikin, kêmek maye dîn û har bibin. Ev jî raveya rastiyekê ye. Ya rastî saziya ku em nûnertiya wê dikin kar dike. Dibe ku hûn bipirsin; "Ma bi yek kesî kar dike?" Na, lê di heman demê de yek kes şerek pir alî dimeşîne. Hêza gotinê, hêza dana kirinê heye, ked heye û bi vê dike. Li ser vî bingehî wateyek wê heye. Ger kesên di nava partiyê de zêde kêmasî jiyane, pir alî û di nava hewldanên cur be cur de kar kirine evqasî şer dikin, hûn nikarin bêjin; "Ev karê her kesî ya şirîke." Li gel vê xwediyên vê helwestê ne hatibûya girtin, dê van ji mêj ve kiryarên ku dijmin dixwaze bike û bi şêweyek ku heta dijmin jî hizirî wê kiriban. Lewra ya girîng fikirandina rola tevkariyê ye. Di van hewldanan de tevkariya kî heye, pêwîste ew baş bê fêmkirin. Kîjan tevkarî

hewldanê saz dikin? Hewldanek heye ku, serbest bê berdan, dê her tiştî diyarî dijmin bike. Wê dijmin gelek tiştên ku ne kariya bi artêşa xwe ve saz bike bi van pêk bîne. Em nikarin ji bo van bêjin xwediyê tevkariyê. Jixwe, gelek kesên ku nebesiyan dijîn hene. Ger em berdin, wê ev bê ku şer bikin rêxistinê tine bikin. Em nikarin ji bo wan jî bêjin xwediyê tevkariyê. Em nikarin bêjin ev jî PKK'yî ne, xebatkarên PKK'ê yên nû yan jî kevnin. Ev bi şêwazek ehmeq ve bi tevahî hebûna xwe ve didin windakirin. Nêzîkbûna van a xwe PKK'yî dîtin û axaftinên weke; "Rola min jî di van serkeftinan de heye" xwe xapandine.

Di van mijaran de çi tevkariya ji serkeftinê re, çi jî pişgiriya encam bidestxistinê, xwe fedakirin, hevbeşbûn û ji armanca civakî û netewî re xizmet kirin çiye? Kî, çawa dike? Ev ronîkirin peywirek devjê nayê berdane. Nexwe tiştek bi navê heq û edaletê namîne. Camêr bi xirabkirinê ve mijûl bûye, camêr tasfiyekare yan jî demogoge, wer dizane ku li ser keda gelek mirovan hesab kirin siyaset, pîvan û kariyer bidestxistine. Ger em van nebînin û pêdiviyên wê dernexin holê, em ê ji bo yên dixebitin û xwe heta mirinê feda dikin xirabiyê bikin û ji bo wan heyf be. Dema em behsa pîvanê nava partî, yetkiya nava partî, heq û berpirsyarî dikin, ya girîng ev rastî dîtin û li gorî vê bi van têgehan ve mafê wê dayîne. Berovajî vê wê di nava me de xizmetê ji dijmin re bikin. Wê yetkî û berpirsyariya vê çibe? Li ber çavan PKK'yî ye, hem jî PKK'yîyê herî bi raye û bandore. Lê çalekî û rastiya wî xizmetê ji kî re dike? Evder girînge. Demogoge, dixapîne, li ber çavan li ser sedan lehengên keda rasteqîn hukum dike.

Derketiye holê, dibe ku ev her kêlî ber bi dijmin ve biçin û xizmeta dijmin bikin. Heta ev dikarin bi wan paşverûtiyên xwe ve wan lehengên keda binirxîn tine bikin. Lewra pêwîste erk, raye û berpirsyariyên nava partî rast bên nirxandin, mafê wan tam bê dayîn. Her çendî pir tevlîhev jî be, yeqîn dikim min ev têgeh baş ronî kiriye û hûn jî hinekê hewl didin têbigihijin. Ev ne têgehên ku neyên derbaskirinin. Hûn wêrekin, fedekariya we heye, bi rehetî dikarin bi van bimeşin. Ev ne tenê peywira mine. Ez peywira xwe pêk tînim, dijmin bi xwe jî dibêje ez peywira xwe baş pêk tînim.

Çiqas dixwazin înkar bikin, lê dijmin bi xwe jî dibêje ez hinek tiştan dikim. Pêwîste heman xal ji bo we jî derbasdar be. Yê kar dike, divê yekî weke min wî erê bike. Ma ji bilî vê rêyek din heye, em dikarin cudatir hev bixapînin? Dema mirov xwedî li erk, raye û berpirsyariyên xwe dernekeve, bi şêwaza ev feydeyê dide kî û çi ve tenê ehmeqiya xwe derdixe holê. Bi avakirina teoriya bûhranê ve yan jî xwe cuda dana diyarkirinê ve, hûn nikarin di nava partiyê de girêdana xwe ya bi erk, raye, heq û huquq an jî bi armancên xwe ve destnîşan bikin. Navê girêdana bi peywiran çalekiya li dijî dijminê xwe ye, li dijî dijmin di her karî de serkeftin bidestxistine. Pêwîste em vê zelal bikin. Pêwîste tevlîbûna me misoger vê bi me û hemû derdora me bi şêwazek qanekirinê xwe bide der.

Vêca rastî ev bin û tevî vê zelaliyê hêjî hinek rastiyan pêk nayînin, divê em wan weke kesên ku hedê xwe nizanin îlan bikin. Ger dilîze, pêwîste em îlan bikin ku ew ne mirove. Çima dê evqasî bi me bilîze? Ma em saziyek ku evqasî bêrêzî li hember bê kirine? Ma PKK rastiyek wisa ye. Hinek her roj bi lîstokên ku dijîn ve gelek pirsgirêkan derdixin. Ma em neçarin wan guhdar bikin? Ez ê li hember keda xwe rêzdar bim. Ez çawa xwedî hewldanek durist bim, wê ew jî wisa be. Ger bi salane dilîze, ez ê jê re bêjim biqewite biçe. Ma wê yetkiyên me bi zorê desteser bike? Ma wê fêlbaziyê bike? Êdî ne bese? Ji ber serkeftinek wî ya cidî nîne, destê wî têkil xwîna gelek hevalan bûye û rast nêzî erkên xwe nabe, rê ji gelek girtinan re vekiriye û gelek mirovên ku bi rehetî dikariya bên rêxistinkirin, bêrêxistin hiştiye. Ez ê çima vî rêber bigirim? Ger her tim nirx berovajî kirine, her tim nirx pêşkêşî çep û rastê kirine, xwe bi ferzkirinê ve mijûl kiriye û xwe weke nexweşekî ferz kiriye ez ê çi bikim ji wî?

Ya rastî heyfa me ye. Çawa çêbû hebûna van heta roja îro hat? Min rave kir. Dema me destpê kir civakek nexweş, kesên nexweş û di rewşa komayê de hebûn. Min ev got: Me bi ketina sala 1994'an ve nexweş ji rewşa komayê derxist. Êdî divê kesek nebêje di rewşa **Komayê** de ye. Pêşketina PKK'ê ya siyasî û leşkerî, dide diyarkirin ku me rewşa heyî ji komabûnê derxistiye. Ger ev rast be, nexwe pêwîste kes di nava refên me de nebêje; "Ez ê dîsa ya berê bikim,

lîstokan bikim, kariyerîstiyê bikim, bi her cure xisletên kesayetên nexweş ve xwe bidim der, erk, yetkî û berpirsyariyan desteser bikim.” Ger wisa bike, ez jî wî mirov nahesibînim, îlan bikim ku hedê xwe nizane û biqewitînim. Navek din li vê nakim û ti carî mafê van tineye ku navê min bigirin ser devê xwe. Yan wê li gorî min gotiye û kiriye bihizire, pêk bîne û bijî, rêzdarî û girdana li hember nirxan dijîm raber bike, yan jî dê min nexapîne. Ger xwe xapandiye bila bixapîne. Ango xwe xapandin, mafê min jî bixapîne nadiyê. Qaşo zaroke û fişale! Ger zaroke, fişale, nayê wê wateyê ku min jî zarok bibîne, yan jî bixe dewsa xwedê. Piştî ku me pîvanên xwe yên rêhevaltiyê evqas dubare kirin, xisletên xwe yên girêdanê evqasî raber kirin, nikare bêje; “Min fêm nekir, guhên min nabihîse û çavên min nabîne.” Ger bêje, vêca derdê wî cuda ye, dengek din derdixe. Bila biçe, wî dengî li cihek din derbixe. Nikare di platforma min û biryargeha min a şer de vê bike! Vêca bêje; “Ez dixwazim hizip ava bikim, PKK’ê parçe bikim û bûyerek din derbixim”, wê demê zagonên vê rêxistinê jî hene, ez ê jî wan zagonan bi bîra wî bînim. Ger tu dikî, nexwe zagonan berçav bigire. Esasên kargeriya partî hene, ger tu pê bilîzî em ê jî wan esasan bidin axaftin. Ma evder zeviya bavê we ye, li gorî keyfa xwe cot bikin? Ev nabe. Êdî hûn ê bizanin ku zagonek vir jî heye. Lê hûn bêjin; “Em ê birevin”, hema birevin! Li gorî wê şêwazek me jî ya dana pey heye. Hûn bêjin; “Ez ê xwe bavêjim erdê, xwe bixim nav çiravê”, hema bavêjin! Me li hember vê jî xwe saxlem kiriye. Hûn bêjin; “Ez ê ser bigirim, lîstokê hîn ziravtir bilîzim”, hema bilîzin! Şêwaza me jî ya we derbixe holê heye, em ê we derbixin holê.

Encamên kesayetên civakê yên nexweş wisa ne. Ya dimîne rêya **mirovbûnê** ye. Nexwe hûn ê bizanin bibin mirov. Weke ku hûn dev ji hewa, nan û ava xwe bernadin, hûn ê dev ji jiyîna serbilind jî bernedin. Hûn ê girêdana wê ya bi şer û partiyê ve bijîn. Ma hûn jiyanek serbilind û weke endamek PKK’yî jiyîn hêsan dibînin? Ger hêsan bûya, gelo kesek weke min çil caran hesabê xebatek herî biçûk dike û ji bo pariyek nan şerek mezin dimeşîne, ji heft saliya xwe ve xwe wisa pêş dixist? Ma dikariya xwe wisa bide

jiyîn û şerkirin? Kesek evqasî di nava jiyanek wisa de cîh girtiye û evqasî gefan dijî, kesek cîhan girtiye bermaberî xwe, ma bermaberî we tê xapandin? Ma bi kelogirî û gazincan xwe bi destê we ve dihêle û dikeve xefka lîstoka we? Hinekê bi feraset bin!

Otorîteya hûn rûbirû ne, sazî çiye û çawa ava bû? Çi erê dike û ji çi re dibêje na? Ger hûn bêjin; "Min ew kiriye şûna xweda", ma ti ferqa vê bi baweriya xweda ya gundiyekê heye? Gelo we karî ji feraseta reîs encamekê bigirin? Jixwe, hezar care em dibêjin ku, em wisa nabin. Ne li gorî keyfa te, dibêjim em ê li gorî rastiya xwe bijîn. Berê digotin; "Her egîdek şêwazek xwe ya mast xwarinê heye." Vêca şêwaza mast ji kur tê? Ew kevçî, kevçiyê kiye? Mast ê mine, kevçî yê mîne û tu jî didizî! Egîdiyek wisa jî, şêwaza xwarina mast jî nabe. Biçe, bi xwe mastê xwe peyda bike, çawa dixwî jî bixwe! Di van mijaran de jî azadî heye. Lê mixabin hinek bê ku bizanin ew mast ji kur hatiye, hejandina kevçî ji xwe re azadî dibînin.

Tê zanîn ku ez ji bo avakirina pariyek nan çawa kar dikim. Ez ê çawa hinek nirxan wisa pêşkêşî dizkeran bikim û vê çawa bipejirînim? Tevî ku heq nekiriye, kî li bendê ye ku zêde bixwe? Kî bê ku heq bike, li bendêye ku yetkî û berpirsyarî bigire? Belê, dizanim ku hêj hûn ciwanin, xam û amatorin, lewma li gorî wê zêde hewce nabînim ku berpirsyariyan jî zêde bibîr bixim. Nexwe dikarim bi her kesî re nîqaş bikim ku nirxê wan çiqase û divê em nîşan jî bikin. Rewşên wisa derketine holê, li ser sedan lehengên kedê fêlbazek derketiye, bê ku qet kar bike, tiştekê bide, heta bikaranîna min ve jî, hewl dide bibandor be. Ev ne tenê burjuvayek û axayek anîna ser serê me ye, ev belayek anîna ser serê me ye.

Em dilnizmin, heta dawî ji bo rêhevaltiyê amadene, dixwazin rêhevalên xwe jî pir pak bibînin. Lê belê ev ewqas jî maf û wêrekiya xwe ferzkirinê nade. Çi bi zanebûn çi jî nezantî reftarên gelek ji we dijîn di vê wateyê de ye. Ev reftarên ku ne hatine perwerdekirin û bi armanc ve nehatine girêdan, bi kedê ve nehatine girêdan û girêdanek wan bi kedê ve nîne. Nexwe dê bibe dizî, ev jî dagirker û biyanî ne. Wê ev jî bibe tevgera wan ku, berovajî **PKK tevgerek kedê** ye. PKK li gel vê, tevgerek xwedî li gelek xisletên

mirovî derdikevê ye. Hûn nikarin bêjin; “Min ne dizaniya” yan jî “Ez cuda fêm dikim.” Hûn ê çawa cuda fêm bikin? Hezar care rastiyan vedibêjim.

Ya rastî nîqaşa dîktatorî û demokrasiyê jî ev e. Alman serkêşiya vê dikin. Qaşo Awrûpa jî hewl dide ji wî re biselmîne ku ez çiqasî dîktatorim. Netewek di qirkirinê re tê derbaskirin, wê tu bi her cure çekên xwe ve pişgiriya vê qirkirinê bikî û wê ev dîktatorî nebe, em ê ji bo hebûna netewekê bi hezar kedî şer pêş bixin, hewl bidin bibin otorîte û em ê weke dîktator bên îlankirin! Ji kerema xwe re em bi aqil bin! Dev ji dîktatoriyê berdin, kî qetlîamger û kî parazvanê mirovahiyê ye?

Yekî MHP’yî digot; “Di nava rêxistinê de Feodaltiyek APO ya pir tund heye.” Em şiyar bin, MHP vê dibêje! Endamek MHP’ê ne tenê ji bo gelê Kurdistanê, ji bo gelê Tirkiyê jî çawa dihizire, em di kiryarên wan de dibînin. Jixwe dema ev dibêjin; “Pêkanên feodalîzmê yên tund”, ji aliyek din ve jî weke; “Komînîstên dawî sax mane û Stalînparêzin”, em tawanbar dikirin. Ev jî karê wane, lê rastiyekê rave dike. Ev feraseta ku heta şaneyan parçekirin û tinekirina miletekê dixe rojeva xwe, nêrînên wan ên nirxên me yên netewî, hêza me ya parastina nirxên jiyana miletekî û di vê mijarê de hêza me ya otorîte weke “dîktatoriyek tund” dinirxîne, pêwîste ji hinek aliyan ve rastiyan ji we re bide diyarkirin. Ji ber ku di nava me de jî gelek kes û yên herî nêzî me derewên wisa dibêjin.

Em faşîstê Alman û faşîstê Tirk muqayese bikin, em ê derbixin holê ku çiqasî dişibin hev. Pir vekiriye ku çalekiya min û otorîteya min bi navê kiye û xizmetê ji çi re dike. Xîtabî mirovên paşverû dikin. Xîtabî kesên tengav bûne, xwe tevlî şoreşê nakin, koleyên ku dihizirin wan bandor bikin, xwediyên berjewendiyan, ketiyan, burjuvayên em dikarin weke her cure reformîst pênase bikin, bê ku ked û hewldanê bidin dixwazin ji rêzgariya netewî par bigirin, nîv burjuva û her cure nûnerên wan dikin.

Sondek ku min dayî ax, kevir û mirovê xwe heye. Nahêlim ev vê sondê binpê bikin. Li cem min bîranîna evqas şehîdan heye, wesiyet hene, nahêlim kes vê binpê bike. Di nava vê partiyê de kî destûrê dide tevî heq nekirine evqasî cîh bigirin? Heta ku em bijîn,

em ê hewcedariya heq, huquq, wesiyet û bîranînan berçav bigirin. Ger hûn jî durist bin, vê fêm bikin. Wesiyeta şehîd çiye, bîranîna şehîd çiye, maf û huquqa berxwedêr çiye, hûn ê van fêm bikin. Hûn nikarin bêjin; "Em ê cudatir bimeşînin." Hûn ê di vê mijarê de hinekê şer fêm bikin. Me çawa ji Almanan re vegot, çawa ji faşîstên Tirk re vegot, em ê ji xirabkarên hundur re jî vebêjin an jî wê yên heman dengî derdixin fêm bikin!

Ez li qada xwe ya lîstokê xurtim. Her roj pir dijwar li ser quralên xwe û şerê xwe, bi şêweyek her cure tevdîran bigirim bi ser de diçim. Heta ku heme jî dê ev wisa be. Hûn ê bizanin ku ev tê çi wateyê. Ger tevlîbûnek we li gorî vê hebe diyar bikin. Dewlet nikare bi dizî û belavkirinê bikar bîne, wê tu çawa ser bixî? Jixwe pêwendiyên min ên ehbap-çawîşî yan jî xwe sipartina pêwendiyên taybet ve ne gengaze ku kar bikim. Pêwîste bê zanîn ez ê ti carî van nêzîkbûnan raber nekim, jixwe ev ji çîroka min a ji heft saliya min ve pêş dikeve tê zanîn. Min bi vê li ku derê û çawa şer kiriye raber kir. Min ne hema ji bo axaftinê ev vegotin. Min ji bo hûn hûrûkûr bihizirin û fêm bikin tê çi wateyê vegotin. Xebatên ku dixwazim li Kurdistan derbixim holê, ferz dike wisa be yan jî ez wisa bûm, wisa diçim û wisa dibînim. Yên baldar bila bi min re bên. Hinek her cure nav û pêvekan bi xwe ve dike, lê dîsa jî israr dikim. Ji ber vê cardin dubare dikim: Qaşo gelek endamên me yên pêş an jî qadroyên me yên di gelek astan de, helwest û reftarên ku hemû rastiyên me tine dihesibînin raberkirinê ji xwe re merîfet dibînin. Hinekê bi ser van de diçim û dixwazim hinekê jî van ber bi rastiyê ve bikişînim.

Me ji kesî re negot derbikeve holê, heta niha jî wisa nêzî kesekî nebûn. Lê ketine nava xeyalên wisa, ger hinekan negirim dê biçin dojehê. Ji bo neçin dojehê, ji bo bi ser xwe ve bên wan dihejînim. Vê jî zêde dibînin û lîstokan ji xwe re polîtîka dihesibînin. Li vir xêra pêk neyê re gotina amîn heye. Hûn nikarin vê bi gotinên weke; "Ez jî tiştekim, ez jî dixwazim mast bixwum" xwe rave bikin. Hûn di nava tevgera artêşê de tişta dixwazin dibêjin. Gelek ciwanên bi navê artêşê bawerî bi PKK'ê û min tînin, we ji ber bêquraliyên xwe şandin mirinê. Ger hesabê van bipirsim, hûn ê çend demjimêran li

ber xwe bidin? We gelek yetkî di belavkirin û parçekirina gel de bikar anî. Min baweriya gel a beramberî rêxistinê pêş xist, ev jî bi navê xwe û bi keda xwe çêkir. Tev jî ji bo belavkirinê bikar anî. Vêca tu dikarî werî hesabê vê bidî? Hêj min ev ne aniye bîra ti kesî. Jixwe ji ber vê di nava keftûlefta tawanbariyê de dijîn. Ez diyar dikim ji heft saliya xwe ve karên perwerdeyê dibînim. Mixabin tu jî mirovên ku bi navê rêbertî û fermandarî hatine perwerdekirin, di carekê de xerc dikî. Jixwe ji ber ku vê dizanin, her cure helwest û nêzîkbûn raber dikin. Tişta weke azadî pênase dikin jî ev e.

Me got ciwanin, zêde terbiye negirtine, em firsendekê bidin. Baldar bin. Hemû tişta dikim, dîsa firsend dayîne. Pêdiviya wan bi perwerdebûnê heye, ezmûnan heye. Hemû hêza xwe ji bo vê bikar tînim û pêşkêş dikim. Nexwe ez dikarim bizanim ku kes çend quruş dikin, ji bo vê çavderiyên min jî hene. Min hinekê xwendiye û feraseta min jî heye. Bi rewşa ku hestên ez dijî ve dikarim başî, bedewî û kirêtiyê ji hev derbixim. Hûn ê van tine bihesibînin, me jî kesek saf bibînin û xwe jî kesek pir aqilmend bihesibînin! Başe, ma ev hêjayî we ye? Dema dibêjim şerme, paşê hûn ê hewayên weke çavsorî û kelogirî bijîn! Kî dikare me bi vê bide bawerkirin? Lê şiyar bin dema van dibêjim, ji bo hûn hinek rastiyên bingehîn bipejirînin, maf û hesabê wê bidin, hesaba wê bipirsin, hewldana wê raber bikin, feraset û nexasim rûniştandina esasên vê diyar dikim. Bang dikim ku hûn tev di vê mijarê de bibin xwediyê kesayet û helwestên ku tên pejirandin. Ev jî nêzîkbûna rast û guncave. Divê li gorî hêza xwe tişta ji we tê payîn hûn bikin, ya li gorî berjewendiya we jî ev e. Hewcedariya gava destpêkê we avêtî nava dozê vê ji we dixwaze. Tişta hêjayî we, yan jî bi navê hewldanê û hewcedariyên ku kesayetên we xwe feda dike, ji bilî vê pêk nayên. Li aliyekê ev jî li hemberî xwe rêzdariya ku hewce dikeye û pêwîstiya ku em li hemberî we rêzdar bine.

### Helwesta Azadiyê Helwestek Kar Ji Cihek Ve Pêşvebirine

Ya ku hêza nîqaşên herî azad raber dike, rêxistina me ye. Heta nîqaşên herî demokratîk, em pêşengtiyê ji pêşketinên qadan re dikin. Di naveroka vê de ev vegotin nirxek mezin rave dike. Ger we heta niha fêm nekiriye, hewl bidin fêm bikin. Misoger wê her kes para xwe bigire û di vê meşê de bibe xwediyê gavekê.

Bi destpêkirina sala 1994'an ve sonda biryardariya ku me pêş xistî, di nava hemû platform û bîrîmên partiyê de watedar kirin, ji bo her kesî eleqedar dike, bi şertê ku her kesê di van mijaran de bibe xwedî pêşketinên teqez van xalan destnîşan dikim. Em hem neçarî vê ne, hem jî asta me dikare vê radeyê rabike. Pêşvebirina xebatê jî ne tenê karê mine, ji cihekê ve siûda pêşvebirina xebatê dayîn jî peywira we tevane. Helwesta azadiyê em behsê dikin jî, ev helweste. Helwesta xebat ji cihekê ve pêşvebirin jî helwesta azadiyê ye. Azadî, ji bo bêxêretî, windakirin û koletiyê ne destûreke. Ne bêferasetiye û xebatê bi şêweyek çawa dibe bila be nahêle. Ferasetek azadiyê ya rast, ronîkirina destpêkirina gavên hêjayî xwe, şansê gavekê dayîn, karê ji bo vê derfetê hewldan û şerekê bidestxistinê ye. Pêwîste em wateyên rast bidin têgehan. Ez xwe di hemû mercên wekhev de weke beşdarvanek hemû nîqaşan û hêjî weke aliyek zindî û baldar ê beşdarvanê jiyana azad dibînim. Weke ku tê zanîn tengavkirinek herî biçûk jî nîne, di asta pêşengtiyê de derfetê bidestxistina rastiyekê jî pêşkêş dikim. Ji bo sazbûna platformek wisa, min bi salan xizmetê dikim. Ji bo meşandina platformek wisa, min jiyanek ku dikarim weke sebir û aqilmendiyek pir mezin pênase bikim raber kir. Madem wisa ye, qet nebê hêjayî vê bin.

Gavek pêşve çawa dikare bê avêtin? Nêzîkbûna; "Pêwîste ez jî ji van firsendan sûd werbigirim, paşverûtî û koletiyên xwe yên pir cidî derbas bikim", helwesta herî raste. Berê hinek komên şêweyên civakî hebûn. Xirabkirina çend pêşketinên me bi zorê ava kirîn, weke azadî ferz dikirin. Me derfeta azadiya bi çend gotinan saz

kiribû, ew ji destê me girtin, hewl didan weke sosyalîzm bi me bidin yeqînkirin. Heta pêşketinek ku teqez me bi keda xwe ava kirî desteserkirin, hewl didan weke pêwîstiyek sosyalîzma Lenînîzmê bidin yeqînkirin. Ev şûnde man, lê hinek tiştan bibîr dixin. Netewperestiya paşverû jî bi navê welatparêzî hemû nirxên netewî pêşkêşî dijmin kirin, weke ku bi navê Kurdewarî dikin ferz dikin, hem jî vê weke bazirganê herî xirab dike, ango bazirganiya xwînê dike. Kîjan ‘demokratbûn” dikare vê şêweya me weke “derketinek xeternak” bide diyarkirin? Nêvenga me, rastiya me ya PKK’ê çiye? Vaye pêwîste em tevgera kedê, xisleta me ya partiya sosyalîst û sosyalîzmê ne tenê di asta teorîk de, wisa şênber fêm bikin. Sosyalîzm hem bûna xwediyê kedê, hem jî yekbûna vê kedê bi kedê re pêk tîne, xurtbûn û encamên wê, ango raveya berhemên wê yên me ne. Pêwîste em bizanin weke gelek dikin sosyalîzm ne zêde axaftin, zêde teorî û zêde vegotina dîrokê ye. Reftarên dilxwaz, sosyalîzme. Bûna xwediyê helwestek keda hevbeş û ev berçavgirtine. Ev bi şêweyek zanebûn parastine. Pênaseya sosyalîzma pratîkî ev e. Te di axaftinê de gotiye ku sosyalîstî, lê belê ger helwesta te ya pratîkî nebe, ew sosyalîzm ne ti tişte. Yeqîn dikim hewce nake sedî mînakan bidim ku ferasetên sosyalîzmên wisa çiqasî îflas kirine.

Asta têgihiştin û nîqaşa bi perwerdeyên pey hev re pêş ketine, li ser pêwîste ew çawa be, nexasim dema pêşiya me bi temamî weke şêwazek PKK’ê hêza nêzîkbûnê raberkirin, hewce bike jiyan ji her hêlê ve ji nû ve nirxandin ji bo sazkirina vê, me di vê çarçoveyê de raberkirina nêzîkbûna bi rêbaz berdewam kir. Ji bo nîqaşkirina van pirsgirêkan, divê heta dawî hûn wêrek bin. Ev hem pêdiviya wê, hem jî ya partiyê ye. Di platformên eleqeder de, di her bîrîmê de weke sosyalîstekê, weke şervanekê, weke rêxistinparêzekê di derbarê xebatan de hestiyarî raberkirin, ne tenê hewcedariyeke, pêwîste hûn bi qasî mafekê weke peywir bê nirxandin û pêdiviyên wê bicîh bînin.

Dixwazim bîranîneke xwe biçûk bêjim. Dibe ku hinek balkêş bê. Dema min dixwest ji bo rêbertiya vê qadê ji dervî me –zêde eleqeya xwe bi rastiya rêxistina me re nîne- hinek tiştan bikin, min

dixwest tenê weke tengezarî û pêwîstiya derbazkirinê binirxînim. Min digot dixwazim şoreşê çêkim, ger dostên şoreşêne bêyî ku tengaviyê ava bikin, bibin asteng bila heta dawî rê vekin an jî nebin asteng. Demek dirêje li vê qadê xebatên xwe dimeşînim. Êdî min xwe di vê xalê de qaneh kiriye: Weke ku bêjim hewcebû mafdar û bêmaf deynim aliyekî û di polîtîkayê de pesnê bidim nedijberî me bû. Dihizirim ku hestên min pir şkestin an jî pir hêrsbûm bi gelek zehmetî û bêferasetiyan re rûbirû hatim, dibê ku wisa jî be. Lê tevî van hemûyan min zanî ev rewş, ne rewşek bê paşgehkirine û min bi xwe da qebûlkirin ku dikarim pêşwazî bikim. Heta ji xwe re dibêjim ku dibe mafdar bim.

Ger em rewşa we hinekê bi nêzîkbûna hinek mînakan ve vebêjin, dibê ku hinek din baş bê fêmkirin. Hûn li qada PKK'ê bi Rêbertiyê re rûbirû ne. Hûn hewl didin Rêbertiyê jidil nîqaş bikin û bipejirînin. Ger hûn dibêjin; "Em ê weke PKK'yî bijîn", ji nan, av û hewayê zêdetir pêdiviya we bi vê heye. Pêwîste hûn vê firsenda hem teorî, hem pratîk, hem heyberî, hem giyanwerî ku hatiye dayîn baş binirxînin. Ez vê ji bo qada PKK'ê dibêjim. Ger ji bilî vê lêgerînek we ya azadiyê hebe, ew vebijêrkek cudaye. Lê ger hûn hatibin vê qadê, pêdiviyê wê jî pêk bînin.

Weke rastiyek objektîf, ger nirxek çeka ku hûn dixwazin bidest bixin heye, daxwazkarin ku bi navê PKK'ê hinek kar bikin, pîvanek we hebe, dibe ku beriya nan û avê pêdiviya we bi hewldanên me heye. Nefêmkirina vê, heta ev ser guhê xwe re avêtin mirine. Ma hûn nirx nadin PKK'ê, li hember bîranîna PKK'ê ne rêzdarin? Nexwe rewşa ji bilî vê mirine. Dikarim vê di pratîkê de pir şênber destnîşan bikim. Dev ji çek girtina dest û derketina serê çiyayên Kurdistanê berdin, hûn nikarin li vir du gavan bavêjin. Ger hûn ji dervî welat hatibin, hûn nikarin bi navê welatê xwe, miletê xwe, du peyvan bigirin ser devê xwe dakevin serê çiyan. Îdîa dikim, hûn nikarin vê bikin. Bila teorî kirin û çalekgerî li aliyekê bimîne, hûn nikarin hebûna xwe jî biparêzin. Vê jî bêjim: Dev ji avaniya me ya hundurîn berdin, niha her kesê ku ji bo hemû qada Kurdistanê kar dikin, dizanin ku bê me nabin tiştek. Dewleta federe ya li Başûrê Kurdistanê jî, em nebin nikare gav bavêje û bijî.

Ti sazî bê me nikare Kurdperweriyê bike. Heta bê min, bê ezmûn haya xwe ji têgeh û saziyên siyasî yên bingehîn neyî tiştek nayê kirin.

Me ji hevalên xwe re da amajekirin ku bi perwerde û ezmûnan dev ji hinek tiştan nayê berdan, ev ji fîzîkî jiyîn an jî ne jiyînê wêdetir jî xwedî wateyek dîrokî ye. Pêwîste ev di nava girêdanek neçarî û azadiyê de bê raberkirin. Teqez hûn ê weke navê xwe hewl bidin fêm bikin an jî wisa bizanin. Jixwe girêdan zêdebûna bare. Lê teqez pêdiviya we heye, weke sazî pêdiviya we heye. Kes, ne girînge, hebûn û tinebûna ewqas ne girînge. Sazîbûn, pêdiviya me ya hezar salî ye.

Pêdiviya kesên ku her roj bi me re şer dikin binavdenge, kesên dibêjin; "Pêdiviya me bi te heye" hene. Kontra û cerdevanên êrîşî me dikin jî mûçeyên xwe bi me ve girê didin. "Bihayê APO" çiye? Ev ne tenê ji bo Kurdistanê derbasdare, hemû hêzên ji Tirkiyê, heta hêzên nav-netewî bihayê xwe di jiyana me de dibînin. Di nava me de jî gelek kes bi nêzîkbûna; "Tu ji me re hewceyî" hewl didin kariyera xwe bidest bixin. Pir baş tê bîra min: Qaşo ji bo bibe hêz pêwîste "min bikar bîne!" Dibêjin; "Ji bo bilindbûna min tu hewce yî." Em kengê ji hewcedarbûnê derbikevin, wê demê bi temamî destkeftiyên xwe di tinekirina me de dibîne. Partiyên li Tirkiyê jî di vê rastiyê de ne. Demîrel, behsa Ozal dikir û digot; "De bila hinekê ev têkoşîn bijî, da ku bikarim raqîbê xwe hilweşînim." Ozal, li Çankayayê ji bo bêbandorkirina xwe asteng bike, bi me re pêwendî pêş xist. Ger ev hemû evqasî balkêşin, hêjî bi nezantiya sazîbûna dîrokî tê jiyîn, tê wateya nezanîna abc'ya polîtîkayê.

Nabêjim di axaftinê de girêdayî bin. Em di vî karî de ji gav avêtinek bi îdîa bigirin, heta serkeftina herî balkêş, çi dijber bin, çi jî pê re bimeşin, bizanin ku ev pir hewceye, weke rastiya zanebûn û objektîf wate bidinê û wisa bimeşin. Ji bo hûn bi tenduristî bin û saxlem kar bikin, ev şertê serkeftinê ye. Di vê mijarê de kêmasiyên we hene. Gotinên weke; "Bê xirabkirin jî dibe", dide diyarkirin ku hûn çiqasî paşketî û bêxemin. Nexwe dê hûn weke mirovên –ancex zarok kesayetên evqasî apolîtîk raber dikin, heta zarok zûtir fêm dikin- dîn û hedê xwe nizanin derbikevin holê.

Îdealkirinê danin aliyekê. Dibe ku îdealîzm ji bo vê sûdmend be: Baweriya xwe bi nirxekê anîn, bê ku bingeha zanistî ya nirxekê bê fêmkirin bi wê bawerkirin, carina sûdmende. Lê belê bi temamî rastî li aliyekê hiştin, îdealîzm kirina şûna her tiştî, tenê bi nêzîkbûna bawer dikim xwe ji nav kar derxistin, wê bibe helwestek fanatîzmê, zanistî û objektîfbûn redkirin. Dev ji sûdmendiya wê berdin, dê bibe ji rêderketinek herî xeter. Di rastiya mirovên me de ev alî heye û wê hemû jî winda bikin. Bê ku xwe bigihîne hestên rastiyê, dema hûn bi îdealekî dest bikar bikin -min jî wisa destpê kir-, tê zanîn em her ku çû em bi zanistî bûn, her ku çû em li hember rastiyê hîn zêdetir baldar bûn. Serkeftina me ya di polîtîkayê de jî, bi qasî îdealîzmê rastî jî bi vî şêweyî destgirtin, tê zanîn cihek ku dev jê nayê berdane. Îdealîzm heta dawî berovajîkirin sûdek wê danin aliyekê, tê dîtin ku çiqas ziyanê dide.

Pêwîste pozîtîvîzm jî neyê kirin, ango mirov nebê dîlê diyardeyan. Bi têgehên weke; “Dijmin evqasî xurte, em evqasî lewazin” ve xwe girêdan bûna dîlê diyardeyane. Encamên zêde nirx dayîna diyardeperestî û îdealîzm danîna aliyekê pir xirabin. Kargerî, şêweyek îdealîzmê ya dine, di wateya felsefî de materyalîzma çorse. Nêzîkbûna; “Tu bi qasî dikarî rojane bijî, her tişt çarenûsa mine”, berjewendîperestiyek pir teng, jiyanek rojaneyî û jiyanek bê vîne. Jixwe tê zanîn ku zêde ti nirxa vê jî nîne, di şoreşê de wisa bi diyardeperestiyê nêzbûn di oportonîzmê de jiyîne. Wê ev jî ber bi li hember her cure ferzkirinên dijmin serî tewandinê bigirin, heta her cure xirabiyên nav rêxistinê û nebesiyan ve bibe.

Nexwe, pêwîste bê ku mirov bikeve nava nêzîkbûnek bê wate ne îdealîzmek pir xeter, ne jî zêde rasteqînî yan jî diyardeperestiyê, ji hêla felsefî û siyasî ve pir girînge. Bêguman hûn ne di ferqê de jî bin, ev we bi ferasetên felsefîk ên li ser we serwerin ve we rûbirû dihêlin. Helwestên wisa di felsefeyê de weke vebijêrk nabînim. Ev bûyerên ku bi we re jixweber tên jiyîne.

Hûn ê jî van bi perwerdeyê, zanebûna xwe ya siyasî ve derbas bikin û di nava partiyê de nêzîkbûnek rêbertî ya rast, nexasim nêzîkbûnek rasteqînî ji nirxên şoreşê re bikin, nêzîkbûnek diyarde û vînê bi şêweyek watedar bi hev ve girê dide, ferasetek ku yekbûna

îdealîzmê û rasteqînî rast pêk tîne bidest bixin. Em ji vê re dibêjin nêzîkbûna felsefîk a materyalîzma diyalektîk an jî feraseta ku ji materyalîzma çors û îdealîzmê dûr disekine. Herî dawî em dikarin bêjin ku ev nêrînek cîhanî û pêdiviya ferasetek gerdûnî ye. Ev jî feraseta me ye.

## Mewkî Cihê Kar Dana Kirin û Xizmetê Ye

Hewl tê dayîn mewkîperestî, bi navê din **kariyerîzm**, di nava PKK'ê de bi şêweyek xeternak bidin jiyîn. Hema nebêjin mewkîperestî û derbas nebin. Di bin mewkîperestiyê de ferzkirinek çînayetî yan jî çînek ku dijberî çîna kedêye û eleqeya vê jî bi mêtîngeriyê re heye. Ev heta dawî diyarkere. Min ev ji we re got: Camêr jêrî xwe diçewsîne, jorî xwe jî, ango min hinekê jî

bikaranînê, pir kêm ked dide yan jî tevî ku keda dide li gorî keda me ye, xwe gihandiye yetkiyek berfireh. Heta firsendê bibîne, me jî tine bihesibîne, xwe hêjayî rêbertiya giştî dibîne. Vê ferasetê di nava xwe de dihewîne, lê ji ber ku zêde newêre vê nade der.

Di dîroka PKK'ê de ev pir derket holê. Mewkîkirin tenê, kariyerek, azweriyek û xweperestiyek di hundurê wî de nade axaftin. Bandora wê jî heye, lê hîn zêdetir dixwaze ya ji malbata xwe, mêtîngerî û gelek derdorên civakî girtiye bigihîne siûdê bidê jiyîn. Bê ku xebat bike û di rêya wê de şer bike, ji bo rewşek çînayetî ya cuda bidest bixe, hewl dide keda di nava PKK'ê de vale derbixe, tevî ku keda wî nîne wê bike hêcet, nav û şana xwe tim bilêv bike, ji me pêngavekê dixwaze. Ji ber ku çavsoriya wî û nepêkanîna quralan girêdayî xerîzeyên wî yên çînî û mêtîngeriyê ne wisa nêz dibe. Em ji vê re dibin **Abdulhamîtperestî**. Ev di manekê de girêdayî Kemalîzmê ye. Abdulhamîtperestî, di manekê de Kemalîzma pêşiye. Kemalîzmê, bingeha ku Abdulhamîd avêtî ji xwe re kir sipartek. Abdulhamîd bi xwe bavê Kemalîsta ye. Hem ji hêla teorî û siyasî ve, hem jî di pratîkê de hemû paşayên Kemalîst di dibistana Abdilhamîd de mezin bûn. Piştî ku me di nava kevanekê de ev jî destnîşan kir, em ji bo kariyerîstên çavsor ên di nava me de jî dibêjin ji Kemalîzmê bandor bûne û di şêwaza wî de çewsîneriyek heye. Ev rewşa gelê me ya koletî bikar tînin û hewl didin PKK'ê cuda pêş bixin, qaşo dê avabûna PKK'ê li gorî xwe veguherînin, di carekê de partiyê bidizin û dihizirin ku wisa xwe bigihînin armancên xwe.

Ger em mewkîperestiyê vekin, em ê bibînin ku di nava vî karî de hesabên mezin hene. Veguhertina sed kesî, tê wateya windakirina partiyekê, ji xwe re li hewa girtina partiyekê. Gelo ev çima evqasî çavsorin? Çavsorî wisa ye: Siparteke li piştî tiştên bidest xistine, ya rastî tiştên ku bidest bixin, dixwaze ew wisa be. Kesek nehêjaye, lê yên ji xwe re kiriye armanc ku bidest bixe pir mezinin û yên wî didin pêş pir mezinin. Di vê rewşê de wê cûceyê me çibe? Elbet gelekî çavsor be, hemû tiştên di hinavê xwe de bide der û ne zane bi devê xwe çi dibêje.

Ev derûnî çawa pêş dikeve? Ez bi şêweyek ku dahûrînên derûnasekî derbas bike vedibêjim. Derûnas evqasî rastiyan nizanin. Ji ber ku min jiyan kiriye dizanim. Heta ji bo min reftarên wî yên çav, mîmîk û guh fêmkirin jî ne zehmete. Min hinek hîn zêdetir ji nêz ve hilanîn û danîn nas kirin. Ya rastî dixwaze lez xwe bigihîniyê, çav berdaye hinek nirxan. Dikarim zêdetir jî vekim: Rewşek fermaneperestiyê ya pir zêde jî di nava me de pêş ketiye. Bê ku camêr tiştekê bide, zêde fermandariyê dixwaze. Dihizire ku sedan hejar, kedkarên hêja û şervanan reftar bigire û dibêje; “Ez çawa dikarim li ser van kedxwariyê bikim, hinek ji van ji bo ewlekariya xwe cihe bikim, hinekê jî weke xizmetkar bikar bînim.” Çavên wî dizivirin û ji bo fermandariya erzan ti dîn û hartiya ku raber nekê namîne. Aliyê leşkerî ya mewkîperestî xwe dide der wisa ye.

Me kiriye rêveberê girseyê, li wir mewkîperestiyê dike. Berê taziyek xwedê bû, di carekê de her cure dewlemendiya girseyî û rehetiyê dibîne. Zilamê ku berê ji bo şorbeyekê çil teqle davêt, dema di carekê de derfet dîtin, metirsîdar dibe. Dibêje; “Dixwazim yetkiya min hinek din bê berfirehkirin.” Roja duwem jî dibêje: “Ev endamê rêveberiyê nebaşe.” Dema dibêje nebaşe jî, ya rastî ji ber ku ew kes li pêş wî astenge lewma wisa dibêje. Li pey tekanê de ye. Di xizmetê de tekanebûnê naxwaze, ne ji bo bêje; “Ez dixwazim di xebatê de hinek tiştan ser bixim”, ji bo qada xwe berfireh bike, di nava gel de helwestên xwe yên keyfî hîn zêdetir bide rûniştandin, xwe hîn zêdetir binepixîne û bide pejirandin dike. Her wisa dixwaze bibe axayek ku hêsan neyê derbaskirin. Ev jî nêzîkbûnek kariyerîst a dine ku di nava xebatên girseyê de pir berfireh derdikeve holê. Yan jî xwe ferzkariyek çînayetî û ferzkirinek dijmine.

Min ev di dahûrandina provakatorê bi navê Şener, bi qasî di zindanê de rêbertiyê ji çêkera me ya giştî re bike xwe bilin kirî de jî raber kir û ji nêz ve reftarên wê yên derûnî şopandin. Em li zarokatiya vî û malbatî binêrin: Mînak ji bo komkirina pereyan rojnameyek yek rûpelî derxistine, bi derewan dadigirin, paşê jî difiroşin û pereyan qezenc dikin. Mîna vê li ser bingeha diziyê, bi

gelek ceribandinên jiyanî re derbas bûye. Ev xisleteke. Di hundur de berxwedaniyên mezin ên **Mazlum**’an, **Kemal’an**, **Hayrî’yan** heye. Ev kes jî bê ku birçîbûnek herî biçûk jî bijî, di roja çil û pêncê de beşdarî çalekiyê dibe. Di mînakên girtîgehê de tê dîtin ku fêlbaz, dizker û mewkîperest çawa derdikevin holê. Ew kariyerê bidest dixe, wexta lehengên mezin şehîd dikevin, bê ku tiştek ji wî bê pir hêsan xwe ji nav derdixe. Berxwedaniya mezin a Çileya 1984’an heye. Ev berxwedaniyek mezine. Êşkenceyên pir mezin tên kirin. Bê ku li hember êşek wî ya herî biçûk li ber xwe bide, dibe berdevkê zindanê yê yegane û diçe bi dijmin re lihev dike. Wê kêliyê welatparêzek me yê ji rêzê jî li cem bûye tê qetilkirin. Ew bi xwe hevpeymanê îmze dike. Dibêje; “Ez ê sirûda Îstîklalê bidim xwendin, cilan jî bidim berkirin û bidim pêkanîn jî.” Ji bo vê jî heta dawî fêlbaz nêz dibe û paşê xebatên xwe kûr dike. Girtiyan dike du beş û beramber hev dide şerkirin. Di sala 1988’an de hestan bikar tîne, kesekê bikar tîne, ji hêla hestiyarî ve bi rêbertiya xwe gavek din a girîng davêje. Dixwaze hevrêyên pêşeng bi bûyera tûnelê re tine bike, ger ev nebê jî li ser bingeha ku wan ji çêkerê dûr bixe rewşekê derdixe holê, ji vê hêz digire û li vir derdikeve pêşberî me.

Qaşo rêbereke, rêberê zindanê ye. Belayek li ser serê hezaran şervanên mezin û berxwedêran xwe dide jiyîne! Bi dijmin re lihev kiriye, ev encam vê destnîşan dikin û xwe bi girtîgehê daye pejirandin. Yên li çep û rastên wî jî cîh digirin bi temamî hevrêyên girêdayî girseya girtiyan û gotinek biçûk bê kirin, wê xwedî lê derbikevin. Tu jê re bêjî li ser çavên te birhên te heye, wê yekser ên me bixeyîdin. Ev bela ev qasî bi bandor bûye. Behsa derûniyê dikim. Hat pêşberî me, dixwaze hinek tiştan bêje, lê nikare bêje. Ma mijara ‘Dîktatoriyê’ çawa derket holê? Qaşo ditirse. Tişta dixwaze bêje ev e: Çawa li hember dibêje; “Ez dikarim sirûda Îstîklalê bidim gotin, her cure kiryarê dikarim bi çêkerê bidim pejirandin”, heman vî şêwazî, dixwaze hevpeymana ku pêk aniye bi min jî bide erêkirin! Qaşo ji bo vê jî pêdiviya wî bi ‘Demokrasiyê’ heye. Li gorî demokrasî, azadiya îxanetê ye. Xebitiye, hewl daye û hêzek wisa bidest xistiye, dibêje; “Wê tu jî

vê erê bikî.” Ger erê nekim, dê hunerên li gorî xwe, li gorî xwe xistin û her cure teknîkên lîstokan bikar bîne.

Tişta li vir berbiçav, ji bo bandor bike xwe li pişt rondikên çavên xwe û lîstokên kesên cur be cur vedişêre. Dema hewce kir dibe zimandirêjek, dema hewce kir dibe cinawirek wisa yekser dikare rêhevalê xwe tine bike, dema hewce jî kir ji bo keyfa xwe ya erzan çêkerê tîne rewşek wisa bi erdê re dike yek. Divê hûn hîn zêdetir lêkolîn bikin. Ev ji nirxandinek siyasî wêdetir, dikare bibin mijarên xebatek wêjeyê ya berfireh û lêkolînê.

Di encamê de em xistin şûna “Plahanovê ku modeya wî derbas bûye”, qaşo dê ew jî bibe “Lenînê Nû!” Ev, di nameyên ku şandî zindanê re derket holê. Malbata wî milyar şelandine, pereyên ku ji pişgiriya girtîgehê kom bûne hatine desteserkirin û hemû malbat derbasî Awrûpayê kiriye. Kedxwarî kiriye û hewl dide PKK’ê jî bifiroşe Komara Tirk û li ser Kurdistanê bilîze! Vêca li rewşa ‘Demokrasiyê’ binêre! Vêca alayên cerdevanên nû yên Abdulhemîd binêrin!

Partîbûnê pêk tînin, lê belê ji nava me rêberên van jî derdikevin holê. Kesê ku berê tazî, nirxan bi silaleya xwe dide xwarin, ev jî têrê nake, hîn zêdetir li pey mewkîperestî, kariyerîzm, hîn zêdetir firotina PKK’ê ye. Weke ku hundur têrê nake, hewl dide bifiroşe derve jî. Vêca dema hinekê jê re dibêjim raweste, ew dibêje; “Ma tu yî li dijî Lenînê nû derdikevî, ma tu yî dîktator.” Li gorî min lîstokek hêsane, lê belê ger em hinekê li pêşiyê nerawestin, xwedî jêhatiyek wisaye, dikare hemû PKK’ê bifiroşe.

Nexwe pêwîste em zêde li ser mewkîperestî û çavsoriyê rawestin. Di girtîgehê de bûn, mercên girtîgehê tên zanîn, zêde tawanbar nakim. Lê belê dîsa jî hewce dike peywirên partîbûnê, peywirên xwedîderketina ked û berxwedaniyê pir baş bênirxandin. Çima li şûna nûnertiyek rast, ber bi nûnertiyek pir xeternak ve herikîn, an jî çima agahiya hevalên din ji vê rewşê çênebû? Demokrasîparêzî tam jî di vê qonaxê de pêşxistina tevgera **xwedîderketina** nirxên me yên partiyê ye. Şûna vê, tevî ku heq nekiriye, çima kesek tenê di rewşek berovajî de derdikeve pêş? Kesên ji bo mewkiyekê, karyerekê bi dijmin ve girêdayî vê dikin,

çawa dibe ku dikevin rewşek yekser an jî ne yekser dikarin hemû jiyana me ya berxwedêr bifiroşin? Encamên ku pêwîste hûn ji vir derbixin hene.

Min ev ji bo berxwedêrên serê çiyê jî got. Yek din jî derketibû. Ya rastî ne kesek ji me jî bû. Li wir heval çewsandine, hatiye li vir jî min bikar bîne û wargehê biçewsîne. Mirovên me qetil dike, ev jî tenê ji bo yetkî û bandora xwe zêde bike dikir. Hem jî di astek cinawerî de dikir! Kêmek mabû vê rewşê heta ber bi me ve pêşve bibe. Me wê demê got raweste. Dikare gelek mînakên din bên rêzkirin. Kesayetek wisa çavsor, ne kesayetek wisaye ji rêzê bê destgirtin.

Pêwîste mirov vê bêje: Zemîna ku mewkîperest ji xwe re hêz dibînin, zemîna her kesê ku ji her tiştî re bi koletî dibêjin 'erê' ye. Kesên ku li ser bingeha keda sosyalîst tevlî partiyê nabin, bi qasî tevlîkirina keda xwe nizanin biparêzin, nikarin vê di cîhê sond û çalekiyê de raber bikin, bila bizanin ji bo kariyerîzmê dibin sipartekên herî mezin, herî kêm bi qasî wan divê ev jî bên destgirtin. Pir vekiriye ku pêwîste pêşî lê bê girtin.

Mewkî hewce ye, kariyer hewce ye, lê serfirazî jî hewce ye. Bes çima? Ji bo xizmeta zêde ev hewce ne. Mînak kariyera min a Rêbertiyê heye, mewkiya min heye û di radeyek mezin de jî bi tena xwe ava dikim. Di radeyek mezin de çêkerê didim karkirin, gel didim karkirin û birêve dibim. Her wiha di radeyek mezin de jî bi gavên xwe dimeşim, ya rastî ev rewş jî hewce dike. Tevî hemû nedilxwazî û nebesiyên civata hevalan, pir şayanî nûnertiya hevbeşiyê dikim. Gel jî serkeftî ber bi vî karî ve baz dide. Lê belê tevî vê jî tenêbûnê dijîm. Bi hêceteke dikare ev bê parastin: Xebatê pir baş dimeşîne, xizmetê baş dike. Nebesî heye, xeteriya vê jî heye, lê heta ku dijîm, qet nebê ez ê ya herî baş bikim. Jixwe ji ber ku ev wisa ye, di rêjeyek mezin de gel dengê xwe dide me. Ev ne mewkîperestî û kariyerîzme. Ji hêla kesekî ve pir şayanî meşandina saziyekê ye. Ya rastî min bi xwe rêbertî ava kir, bi xwe didim karkirin û ez ê vê jî weke sazî ji hinek din re bihêlim. Lê hinek din ne tiştek bi navê sazî hiştin, ne jî zêde tevkarî ji pêşketina min re kirin. Hêjî rojane mafê vê tê dayîn. Bi qasî xwe biteqînî wê tu

xizmetê bêkêmasî bikî. Wê tu bi tevkariya xwe ya Rêbertîbûnê re di mijarên leşkerî, siyasî, bîrdozî û rêxistinî de raber bikî. Wê demê tu vê mewkiyê pir baş bikar tênî, karê ku deh kesan nekarî bike tu dikî û ev jî ya raste. Pêwîste em bi hevbeş bikin, an jî gengaz be em li cihekê deh rêberên din derbixin. Hûn ê vê dersê derbixin û bimeşînin. Mewkiyên ku hûn dixwazin bikar bînin, bi vî rengî dema we rast nirxand û rast bikar anî, hûn ê bersiva herî têrkar jî bidin van. Ger hemû endamên partiyê mewkî û saziyê wisa binirxînin, kariyerîst jî namînin. Cihê wan di wextê de bi kesayetên rast û têrkar ve dagirtin û mirov bizane nûnertiya wê bike, pêşketin û serkeftina herî mezin ku partî û artêş bidest bixê ye.

Em dikarin li ser vî bingehî mijarê hinek din ronî bikin. Ji bo vê nexasim pêwîste pirsgirêka **yetkî** hinek din bê vekirin. Nemaze peywir û girêdana bi armanc ve xwedî girîngiyek mezine. Heta ku hûn bi armanc ve girêdayî bin û peywirên xwe jî dagirtî bijîn, wê wateyek yetkiyê hebe. Wê demê hûn ê bi yetkî û karbidest bin, vêca wê wateyek mewkî hebe. Ev hemû jî hestek berpirsyarî dixwaze. Hûn ê bêjin; “Ez berpirsyarim, mewkî ji min re hatiye dayîn, lê ji bo serxistina peywirên mine.” Peywirek çawa ye? Ev peywira sazkirina rêxistinê, pêşxistina çalekiyekê û pêşxistina artêşekê ye. Mewkî çiye? Mewkî, mînak fermandariya eyaletekê û fermandariya bîrîmekê ye. Berpirsyarî çiye? Ger ev kar baş be serkeftin a we ye, nebê jî wê hesab bê pirsîn. Hûn nikarin bêjin; “Ger erênî be xwediyê wê ez im, ger neyênî be ez ê berpirsyariyê bidim ser milê yeke din.”

Mewkî cihê kar dana kirin û xizmetê ye. Armanca wê jî peywira artêşbûnê serkeftî bicîhanîne. Mewkî, sazî wisa bê destgirtin watedare. Nêzîkbûnên weke; “Ez ê biçim xwe li wir bicîh bikim, ti berpirsyariya min li hember ti sazî û kesî nîne, tiştek bi navê peywir nahizirim, armanc jî ne di xema min de ye, ji bo bikeve çav ez ê hinek karan bikim, ên jêrî xwe jî biçewsînim, jorî xwe jî bixapînim û wisa keyfa xwe bijîm.” Ev pênaseyek mewkî ya dine. Em jî firsendê nadin van. Xalên ku hûn ji hev dernaxin, evin. Nexasim weke qadroyên pêşeng yetkî, peywir, berpirsyarî, kariyer, mewkî, rêveberî û hatina rêvebirin bi temamî, xalên ku pêwîste hûn

bi şêweya pirsgirêkên rastiya Rêbertiyê binirxînine. Pir baş dizanim ku hûn di vê mijarê de têrê nakin, lê belê nêzîkbûna rast jî di vê çarçoveyê de ye.

Em xalên mijarê yên berfireh vedikin. Para xwe ji van vegotinan bigirin. Ji bo tevgerek ku dewletbûn daniye pêşiya xwe û meşa ber bi desthilatiyê ve kiriye rojeva xwe, ev xal jiyanî ne. Ji hemû nêzîkbûnên berê bê xeber an jî weke kesên koleyê desthilatdarên cuda dijîn, yeqîn nakim tiştekê ji rêbertî û otoriteyê fêm bikin. Ez bi xwe jî demek dirêj wisa bûm. Ne şerme mirov van bêje. Lê di meşa ber bi desthilatiyê ve otorîte, yetkî, peywir, berpirsyarî, rêveberî, rêvebirin, quralên vê, edep û uslubê vê hewce ne. Hûn ê jî vê bizanin.

Ger hûn azadiyê weke qetandina benê golikê fêm bikin, hûn ê her biçe xwe bi sing û ben ve girêdanê weke jiyan û qural bizanin, wê demê jî meşa desthilatî watedar nabe. Hûn nikarin li ser vî bingehî ber bi azadiyê ve bimeşin. Ev ferasetên hovane ne. Qetandina benê golik ne azadî ye. Ev ne tê wateya ji ben rizgarbûn, ne jî cardin bi singek hişk ve girêdan tê wateya qural. Ev şaşin.

Dem bi dem saziya rêbertiyê bibîranîn çiye? Dema tê bîra min, hem jî bi bîranînek ji rêzê ve gotina rêbertî xweşike, nêzîkbûnek rêbertîbûna nû ya ku gel jî ji mêj ve derbas kiriye. Rêbertî ne tiştek wisa ye her roj derbikevin pêşberî mirov û bêje; “Tu wisa hewce yî, pêwîste tu wisa bî” û li gorî xwe eyar bikî, ne jî dema pir tengavî hat jiyîn saziyek ku mirov bibîr bînê ye. Na, ev nêzîkbûnên şaş û nebesin.

Xwe gihandina rêbertiyek netewî û çînayetî, weke laş xwe bigihîne goşt, hestî û xwînê ye. Ji bo netewekê, dîsa ji bo xwediyek kedê û çînek civakî wate wisa ye. Ev weke tiştek pir bihurdar destgirtin, fikrek weke; “Dibe ku dem bi dem ji bo me hewce be” jiyîn, ji dervî wê rastiyê jiyîne. Ev di wateyekê de redkirina Rêbertiyê yan jî li gorî berjewendiyên xwe ew jîndarkirine. Dibe nêrîna weke; “Ez bi temamî beşdarî netew an jî vê tevgera çînî nebûme, kesek dixwazim dem bi dem vî netewî yan jî çînê bikar bînime.” Ev jî kîne? Dibe ku ev çavkaniya xwe ji mêtîngerî,

hevkarî, burjuvaziyên biçûk ên cur be cur, tabaqayên navîn digirin. Yên bi navê wan tevdigerin dibe ku wisa bihizirin.

Li vir carek din xwe dide dest ku, kesên wisa nebes û keyfî nêz dibin, di rastiyê de çînên din hevkaran didin axaftin. Kesên şêwazek tevgera li gorî wan esas girtine. Ev jî ne bi kes ve hatina girêdan an jî ew redkirine. Li vir behsa keyfiyetê tê kirin. Ger bê gotin; “Em li gorî keyfa xwe vê wateyê didin” ev şaşe. Ev rastiya dîrokî ya objektîfe, hûn ê jî weke heyî bipejirînin. Dema hûn keyfiyetê têkil kar bikin, tê wateya ku hûn li gorî çînên din û hevkaran digirin dest. Ev bi zanebûn an jî nezantî kirin ewqas ne girînge. Dema keyfiyet dikeve nava kar, hemû xisletan di hemû pêvajoyan de bi baldarî û şiyarbûnek mezin ve neyên jiyîn, mirov xwe bi wan ve dagirtî jîndar neke, rê rêbertiyek çînek din pêk were û xwe bide axaftin. Ev jî dibe keyfiyet. Nêzîkbûna te ya dibêje; “Şêwazek min jî ya xwarina mast heye”, dibe helwesta çînek û hevkariyek din. Dibe helwesta koleyekê. Pir vekiriye ku ew jî ne Rêbertiya me ya rastqînî ye. Yê ku winda bike tu bî û tu berpirsê vê yî.

Rêbertî valehiyê napejirîne. Weke valehî heye tê hesibandin, lê piştî demek kin wê tu fêm bikî ku ne wisa ye. Dema tê hundurê wê vale bikî, pêwîste bê zanîn ku ev wisa nayê tinekirin. Navenda Rêbertî ya hilberînê, navenda hilberîna siyasetê, navenda hilberîna artêşê, navenda PKK’ê ya ji tinebûnê diafirînê ye. Ev nayê nîqaşkirin. Ya ku li cem me tê ravekirin Rêbertî tevgerek bi temamî kar ji sifirê û heta kêmbûnan anî vê qonaxê ye. Beramberî vê ger tu bêjî; “Ez ê li ser vê erzan bijîm, mewkîperestiyê bikim, yekê bidim dehan bigirim, biçewsînim wisa bigirim, ji rêderbixim wisa bigirim, bi zimandirêjî, fêlbaziya gundîtî û pozbilindiya rewşenbîrî vê bikim”, vaye kesê ku van tevan bikar bîne û dihizire ku Rêbertiyê wisa tine bike, bi awayek objektîf xizmetê ji mêtîgeriyê re dike.

Hinekan behsa “Bi camêrtî kuştina Rêbertiyê” dikir. Me jî lêkolîn kir, kes ku demek dirêj jiyana xwe bi diziyê derbas kiriye. Şêwaza jiyanek ku maşînên tê û diçe dişelîne bi dest xistiye û li gorî xwe jî heta asta duyem bilind bûye! Bêfihêt em çawa bi camêrî

kuştine di rapora xwe jî nivîsandiye. Tevî ku me nedixwest bi vê re jî dawiya xwe anî. Di pêvajoya rêbertiyê de dizî çawa pêş xistiye? Weke kesek pir durist dixwiya, lê weke kesek rêber ê di Kurdistanê de herî baş diziyê pêş dixe derket pêşberî me. Weke vî gelek kes hene. Kesên ku xwestin me bi rêya cureyên têkîliyên taybet tine bikin, bi ehbap-çawîşî tine bike, bi yarentiya hevaltiya kevin tine bike û heta koletiyê tine bike derketin. Ev girêdanek erzan a bi rêbertiyê re ye. Lê rewşek weke; “Ev çi ji min dixwaze, teqez dixwaze çi pêk bînim” nahizire û baldar nêz nabe. Ger hûn berpirsyariyê nejîn jî, hejartiyê raber nekin. Ev hemû tevgerên lewaz xistin û tinekirina Rêbertiyê ne. Rêbertî di van mijaran de ne vale ye. Xwediyên meylên wisa, yên di nava helwest û reftarên wisa de xwe didin hîskirin. Neçare ku bide karkirin û dide karkirin jî. Lewra pêwîste dawî li van ferasetên vale derdixin û tine dikin werin. Nexwe dê xwediyê xwe xirab bixapîne û têk bibe.

Encama ku ji van tevan derketî, Rêbertî saziyek wisa ye, ez jî di pratîka xwe de bi ser pêdiviyan de meşiyame, xwe daye pejirandin û wisa rê ji pêşketinan re vekiriye. Ev sazî ji bo Kurdistanê kar dike, yên di nava me de û dervî me jî pêşve dibe. Kok mezin bûye û bûye rastiya Kurdistanê. Tê dahûrandin, yên hewceye bimirin dikuje, yên hewce ye bijîn dide jiyîn. Ji serûbinbûnek mezin re rê vedike. Çaleke, ji yên dixwazin an jî xwedî îdîa ne di xwe gihandina armanc de firsendê dide. Ev hemû jî didin diyarkirin ku ev saziyeke, qural û pergale. Dema yek dibêje; “Min jiyana xwe bi temamî ji bo vê feda kiriye, ez ê di ber vê saziya Rêbertiyê de vî şerî bimeşînim, vê xebatê bimeşînim”, pêwîste bizane hewce dike bi hemû hebûna xwe ve beşdar bibe, tenê xwe fedakirin têrê nake, dide diyarkirin ku pêdiviya vê bi hewldanek weke afirînerî jî heye.

Rêbertî yeksane, ji sifirê, ji astên herî kevin ve pêvajoya afirandinê ye. Wê hewldanek afirîner a diyarker tevkariyê ji hewldana rêbertiyê re bike, lewra dizanim ku pêwîste xwediyê wê hewldanê bim, afirînerî di heman demê de bersiva jiyana ku hêjayî me dayînê ye. Ji ber qurale em ê şer bikin, ji ber şer ji bo jiyînê ye. Jiyan hatiye kirêtkirin. Rêbertî navê, dîtina jiyanek bedew û xwe

gihandina jiyana hêjayî me ye. Redkirina jiyanê mirine. Armanca jiyanê ya şer paşçavkirin bi vê Rêbertiyê re nabe yek, berovajî dibe înkara herî mezin. Li gorî vê pêwîste li hember nirxan baldariyek balkêş bê raberkirin û ev jî hîn zêdetir bên pêşxistin. Ji ber ku pir zehmet hatiye afirandin. Ji nêvengên pir xeter û kirêt, mirov bikare weke nirx rave bike berhem derketine holê. Rêbertî avaker, pêşvebirin û parazvanê vaye. Hûn ê jî wisa fêm bikin.

Ger em ê bijîn, yeqîn dikim ji me zêdetir pêdiviya we tevan ji vê re heye. Min xwest diyar bikim, hûn di rewşên pir zehmet û xwedî seknên nayê pejirandin de ne. Ev pêwîstiya we ye, derfet dayîn para me ye, yeqîn dikim me ew jî daye. Bi qasî xwarin û vexwarinê, bi qasî hewaya tê girtin, weke gel veguhertiye pêdiviyên hewce, ev jî dibe raveya hewcedariyan. Ne tevlîbûnek ji rêzê, ne tevlîbûnek dem bi dem û ne jî tevlîbûnek keyfî neraste.

Rêbertiya ku hatiye avakirin, di serî de Rêbertiyek bi tevkariya şehîdên nemir hatî avakirine. Encama hewldanên wan kedkarên mezine. Yeqîn dikim hûn ê li ser vî bingehî qabîliyetek karbidest û jiyanî derbixin holê, hêza jiyanê û derfetên jiyana hêjayî gel bidin. Tiştên ku hûn tevlî bûne, dixwazin bi tevkariyên xwe ve pêş bixin, di vê wateyê de gelê ku azad bûye, welatê rizgarbûyî ye û pêşerojek bêhempa ya hatî bidestxistine.

**5 Çile 1994**

## PÊŞBAZIYA MEZIN PÊŞBAZIYA PARTÎBÛNÊ YE

**Ji Bo Konferansên Eyaletên Kurdistanê**

**Ji Bo Tevahî Milîtan û Xebatkarên Partî, Artêş û Eniyê!**

Ji her demê zêdetir wate dayîna xwezaya şerê li Kurdistanê, bi qasî di nava rastiya nav-netewî de, ewqas jî girêdana wê bi şerê rastiya me ya netewî û civakî re fêm kirin girînge. Em di kîjan qonaxa şer de ne, bi şerek çawa re rûbirû ne? Derfeta wê ya serkeftinê çawa pêş dikeve? Peywirên şer teqez pêwîste werin bicîhanîn çine? Ji bo vê pêwîste mirov çawa beşdarî rastiya partîbûn û artêşbûnê bibe? Ev pirs ji her demê zêdetir sotînerin û asta dahûrandinê ferz dikin.

Dikare bê gotin, bi rastiya nav-netewî re rastiya Kurdistanê yekem care evqasî bi şêweyek hûrûkûr ketiye pêvajoyek ku pêwîstiya xwe bi siyasîbûn û çareseriyê dibîne. Ji kîjan alî ve lê bê nêrîn bila be, ev pêşketinek nû ye û dahûrandinê di nava xwe de dihewîne.

Ber bi sedala 19. ve, tengezariya hevsengiyên li ser Kurdistanê hatine sazkirin diafirînin, encamên sotîner ên dîroka dagirkerî û îstîlayê, şêweyên ku kapîtalîzm pêş dixe ne yekser bi bandorên mêtîngeriyê re yekbûnê ava dikin. Weke encamek vê jî bi lîstokên hewsengiyên Împaratoriya Osmaniyan ve mêtîngerî ji sedsalan dirêj hatiye domandin, rê ji domandina pergala li ser Kurdistanê ku pêwîste bê hilweşandin re vekiriye. Tam wexta ku ev pergal û împaratoriya bê hilweşandin, qonaxa nû ya bi Şoreşa Cotmehê re destpê kirî, di çarçoveya mercên dîrokî yên destdayî derxistine holê, Komara Tirk a derketî holê, hem sosyalîzm hem jî kapîtalîzm bikar anî, dema hewce kir giranî da yekê, dema hewce kir giranî da yê din, hevsengiyek di navbera her du pergalan de dayî rûniştandin derxist holê û vê carê jî pêvajoya îmhayê ya li ser Kurdistan û Gelê

Kurd pêk anî, rewşek evqasî bê wate û tinekirinê derxist holê. Di çarîka destpêkê ya sedsala 20. de, Komara Tirk li ser vî bingehî ji rewşa hevsengiyê sûd wergirtiye zextek giran û peyre jî bi bişaftinê re tinekirin pêş xist.

Em encamên sotîner ên kapîtalîzma Tirk baş dizanin. Heta dawî ji hêla aborî, çandî, civakî û siyasî ve karê daqurtandinê, di qonaxa derketina PKK'ê de ber bi encamgirtinê ve diçû. PKK di vê wateyê de weke **hêviya** dawî û di heman demê de ger derferta jiyanê hebe, weke raveya wê derket holê. Bêguman her çendî di şêwaza derketina wê de hinek xalên taktîkî girîng bin, ya herî girîng weke **yegane çareya hebûnê** xwe ravekirine. PKK bê ku li kêmbûna hejmar, zemînên objektîf guncavin an na binêre, weke gava dawî ya hêviyê pêwîste bê avêtin hat nirxandin û wêriya ku wisa jî derbikeve holê. Bêguman di vê derketinê de bandora mercên objektîf heye. Derbaskirina rewşa kapîtalîzmê ya li Tirkiyê û çelqîna ku derxistî holê, dîsa binesaziyên feodal-eşîriyên kevnare yên li Kurdistanê, bûye zemîn ku derbikeve holê. Dîsa bandora rewşa çepgir û partîparêzin li Tirkiyê di vê derketinê de heye. Lê belê ya esasî, bi têgihiştina hinek rastiyên ku bi navê mirovahî devjê nayê berdan, neçar hişt ku ev gav bê avêtin.

Weke tê zanîn ev derketinek nû ye. Tiştek bi navê Kurdewariya berê li ser lingan mayî nîne. Netewperestiya paşverû ji mêj ve weke saziyek sîxurtiyê bi şêweyek herî xeternak amûrek di meriyetê de ye. Ango ji mêtîngeriyê jî wêdetir weke bizav û ferasetek tinekirinê, ji hêla hêzên mêtînger û emperyalîst ve bi zorê tên xwedîkirin û weke amûrek bên ferzkirin pêş ketine. Zimandirêjiya Kurdewariya burjuvaziya biçûk bê bandore, bi qasî firsendê nede hewldan û fedekariyek herî biçûk têk çûyî bi berjewendî ye. Bi qasî nekare navê xwe bêje bê îdîa ye, lê belê bi zimandirêjiya xwe ve hevsengiyên nav-netewî hesab dike, lê di hewayek wisa de ye dixwaze di ava şêlo de masiyan bigire.

Bi hinek karbidestiyên xwe ve şênberiya Kurdistanê ku em dikarin wisa destnîşan bikin, hewl hat dayîn bi radîqalîzma PKK'ê ve bê derbaskirin. Piştî demek kin darbeya 12'ê Îlonê ket meriyetê, terora wê ya dijwar misoger di astek tinekirinê de bû û herî zêde jî

pêşketinek ku derketina me hedef dikir. Em dizanin ku şerê dijwar ê di navbera salên 1980-90'î de hatî meşandin çi rave dike. Li vir xala herî girîng, emperyalîzma nav-netewî û paşverûyên herêmî jî li pişt vê rejîmê bûn û heta dawî pişgirî danê. Lê di vê demê de jî pêşketina nû derketî holê jî, em bûn şahid sosyalîzm bi şêweyên cuda hilweşiya. Ji ber ku me amajeyên vê hilweşandinê pêşve dîtibû, nirxandinên me li ser vê kirîn, girêdayî Kurdistanê ji bo derbas kirina statîkoperestiya 70 salî û heta beriya wê jî, li gorî rewşa nav-netewî dema sosyalîzma pêkhatî û emperyalîzm di hevsengiyê de ava kirî, diyar dikir ku wê ber bi zemînek guncavtir ve biherike. Di sedsala 19. de, ji ber vê hevsengiyê, Kurdistan xwe negihand rastiya têkoşîna xwe ya xwezayî. Bêguman paşverûtiya hundurîn jî di vê mijarê de rolek diyarker lîst.

Di dawiya sedsala 20. de, êdî xirabûna hevsengiya sosyalîzma pêkhatî û emperyalîzmê saz kirî, bû sedem ku rewşek nû derbikeve holê. Bandora vê li ser herêmê, hewaya lihevkirina di pevçûnên Ereb û Îsraîlê de û bê encam mayîna Şerê Îran û Iraqê derxist holê. Ev jî ji bo Kurdistanê di asta nav-netewî û herêmî de bû zemînek guncav. Ji aliyê me ve dihat payîn ku ev rewş ji salên 90'î ve hîn zêdetir lez bidest bixin û jixwe pêşketinên cur be cur ev rewş derxist holê. Encama vê ya yekemîn, li Başûr bi pişgiriya emperyalîzmê, piştî erêkirina mêtîngeriyê jî girt û tevî vê ku pêşketinek pir girînge avabûnek di bin navê Dewleta Federe ya Kurd derket holê. Ev avabûn bi qasî berhema nehevsengiya li herêmê ye, ewqas jî xwedî xisletên ku vê nehevsengiyê kûr bikeye. Di derketina tevgera me de, bandorek vê ya berfireh heye. Jixwe di Şerê Başûr de jî rûbirû hatinek wisa çêbû. Di rastiyê de, pêşengiya PKK'ê ya xwestî nehevsengiya herêmê veguherîne derfeta şoreşê û sûd jê werbigire, li hember hêzên emperyal û hevkarên ku dixwastin Kurdistanê ji şoreşê dûr bixin, şerek rûbirû bû. Ev şerek cuda yê xweseriya xwe hebû, heta bandora şerê Kendavê ya neyekser bû. Ev şer tevdîrek emperyalîzmê ya li hember tevgera ku zemînê vekirî dixwaze ji bo şoreşê bikar bînê bû. Hêjî bi tevdîrên cur be cur ve rûbirû, em hewl didin têkoşîna şoreşgerî bimeşînin.

Li vir ya girîng, rewşa nav-netewî ya li ser Kurdistanê her çendî neyekser jî be rê ji lewazbûna venêrîna mêtîngeriyê re vekir. Ev lewazî çi di asta hevkaran de dibe, çi di asta şoreşgerên radîqal û welatparêz de be, rê vekir ku hinek pêşketinên lez çêbin. Bêguman weke di her şoreşê de dibe, pir vekiriye ku em ê jî bal bidin ser van. Parçekirina venêrîna mêtîngerî yan jî şikandina bandora rêveberiyên mêtîngerî yên bi armanca tinekirinê hêjî berdewam dike. Li Başûr ev rewş gihaya qonaxek diyarker. Di rejîma Tirk de jî ji salên 1090'î ve nexasim di merheleya Ozal de rejîma îmhaker a kevnar parçe bûye û dihat dîtin ku rewşek cuda derdikeve holê. Ya rastî hêzên emperyalîst pêşketinek ji vê hêlê ve ferz dikirin. Lê belê darbeya ku kesîmên Kemalîst ên kevnar pêk anîn, nexasim hukumeta Înonû-Demîrel û paşê bi darbeya Tansu Çîller ve Fermandariya Giştî xwest vê hilweşandinê rawestîne, cardin giranî da siyaseta îmhakirinê û niha jî dixwaze vê pir hûrûkûr bidomîne. Di vê mijarê de her çendî bi emperyalîzmê re nakokiyên wan hebin jî, di rastiya hukumeta Tansu Çîller de hewl didin vê bidin derbaskirin û tê zanîn ku ji bo vê jî tawîzên mezin dane. Fermandarên artêşê bi xwe yekser digotin; "Bibe sedema helakbûna Tirkiyê jî, hewce bike em Tirkiyê nîv bi nîv bifiroşin emperyalîzmê jî, em ê PKK'ê tine bikin." Di vê mijarê de biryardariya xwe raberkirin pir vekirî raveya nakokiyê ye. Hêjî di navbera emperyalîzm û mêtîngeriya îmhaker a kevnar de rakêşiyek berdewam dike. Hevsengiyên herêmê jî ji vê bandor dibin an jî vê bandor dikin. Li hember vê şerek dijwar tê domandin, tê zanîn ku dixwazin bi qasî siyaseta kevnar a îmhaker, hebûna welatparêziya şoreşgerî û bi şêweyên cur be cur nêzîkbûna hevkariya nû jî biparêzin û li gorî berjewendiyên xwe hinek encaman bigirin.

Nexwe hilweşîna sosyalîzma pêkhatî û sazûmaniya emperyalîzm li ser herêmê ferz dike, berovajî tê hizirîn, rê ji lewazbûna statûkoya kevnar a li Kurdistanê re vedike. Em ê li vir zêde li ser rewşa nav-netewî ji bo kapîtalîzm û sosyalîzmê tê çi wateyê rave nekin. Em ê diyar nekin ku bûhrana emperyalîzmê çawa kûr dibe, heta pirsgirêk çawa ji merheleya sosyalîzma pêkhatî zêdetir giran bûne. Kêm-zêde ev xal tên zanîn. Dîsa em naxwazin

vebêjin, nehevsengiya li herêmê ji dema berê xirabtir zêde bûye, nexasim serdema kevin a mêtîngeriyê ya kevnar hatiye girtin û di vê wateyê de ev rejîm zehmetiyê dijîn. Mêtîngeriya kevnar jî pir zehmetiyê dijî û nehevsengî her roj zêde dibe. Di encama van tevan de niha baştir tê fêmkirin ku, pêşketina objektîf a li Kurdistanê û ya herî girîng jî bûhrana hundurîn a rejîmên mêtînger dijîn siûda pêşketina şoreşgeriyê zêde dike û ji vê hêlê ve dahûrînên me nirxandinên zelal dihewîne.

Pêşketinên nav-netewî û dîsa nakokiyên herêmê hîn şênber bên destgirtin. Em bi xetên giştî dikarin van bêjin: Bûhrana kapîtalîzmê kûr dibe û texrîbatên sosyalîzma pêkhatî di sosyalîzmê de ava kirîn derdikevin holê. Hilweşîna sosyalîzma pêkhatî û rûxîna wê, hinekê jî rûxandin û hilweşîna xisletên dij-sosyalîzmê yên di nava sosyalîzma pêkhatî de ne. Berdêla wê çi dibe bila be, ti ferasetên sosyalîst nexweşiyên sosyalîzma pêkhatî napejirîne. Ji bo derbaskirina vê rewşa ku sosyalîzm nayê nasîn û li hember kapîtalîzmê aniye rewşek xeniqandinê, ji vê nexweşiyê rizgarbûn û siûda pêşketina feraseta sosyalîzmek saxlem girtine. Niha tê fêmkirin ku nirxandinên me vê piştrast dikin. Bûhrana kapîtalîzmê ya zêde dibe, rewşên pevçûnên berfireh dibin û îflas, ji demên sala 90'î zêdetirin. Me wê demê jî ev destnîşan kirin û ev niha tê piştrastkirin.

Dikare ji bo herêmê jî heman xal bên diyarkirin. Wê nehevsengiya herêmê di bin navê "sazûmaniya nû" de hîn zêdetir berfireh bibe û pêşketinên ku rû bidin ji bo şoreşan hinek din derfet biafirînin, nexasim me diyar kiribû ku wê Serdema Şoreşa Kurdistanê destpê bike. Heta lihevkirina Ereb û Îsraîl jî dibe ku ne dijber, rê ji hinek pêşketinên li gorî berjewendiyan vebike. Dîsa lihevkirinê encambûna şerê Iraq û Îranê jî wê nakokiyan neqedîne û wê rewşên li gorî berjewendiyên pêşketinên şoreşgerî xurt bike. Wê lihevkirin hinek din rê ji nêvengên saxlem re veke, nakokiyên di navbera gelan û emperyalîzm û hevkarên wî de zêdetir ronî bibin. Vaye di encama vê de derketiye holê ku tevgerên Îslamî ev rewş nirxandine, lê ji ber komên sosyalîzma pêkhatî nekarîne vê rewşê binirxînin ji holê rabûne. Ger ferasetek rast a sosyalîzmê

hebûya, zêde pêdivî bi tevgerên rengê îslamî nedibû, yan jî ev evqasî serkeftî nedibûn. Lê belê partiyên komînîst ên tên zanîn jî, dîsa netewperestiya burjuvaziya biçûk a bêçare jî, rê ji derketina van tevgerên îslamî re vekirine. Ji ber xisleta hevkarî ya hem sosyalîzma pêkhatî hem jî netewperestiya burjuvaziya biçûk a kevnar, bersivê nadin pirsgirêkên gelan. Ev tevger bi hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re, di nava gel de rêzdariya xwe zêde winda kirin û lewma tevgerên îslamî jî ji vê hêz digirin. Lê ji aliyê din ve di şênberiya Kurdistanê de, weke ji pêşketina me jî tê fêmkirin, ferasetek sosyalîzma rast jî dikare pêşketinên mezin bijî.

Nakokiyên di Rojhilata Navîn de nehevsengiyê zêdetir pêş dixin. Ev nehevsengî jî di rade û şêweyên cuda de rê ji derketinên tevgerên şoreşgerî re vedikin. Ev dem weke tê hizirîn ne "dawiya dîrokê" yan jî "serdema aştiyê" ye, tê wateya destpêka dîrokek nû, ketina nava merheleyek zehmet a hîn hişktir û pêşketinên şoreşgerî. Elbet ev rewşek nakokiye. Statîkoperestî û aştîxwaziya ku emperyalîzm jî ferz dike û bertekên beramberî wê jî di nava hev de pêş dikevin û ev jî hêdî pêş dikevin. Weke ku rewşên hîn zêdetir hejandinê tên payîn, dibê ku rewşên pir rehet jî derbikevin holê. Lê ya girîng wê nakokî di demek kin de ranewestin.

Di vê nêvengê de Kurdistan hîn zêdetir derfeta xwe ravekirinê bidest dixe. Li Kurdistanê rûxîna binesaziya civaka kevneşop bêguman lez bûye, betalî di asta herî jor de derkertiye holê, pîvanên eşîrtî hatina rûxandin û texrîpkariya kapîtalîzmê binesaziya civakê bi rewşek nikare ji bin rabe re rûbirû hiştiye. Weke ku pergala kapîtalîst ji ti pirsgirêkî re çareserî nayîne, her roj pirsgirêkan giran dike. Dîsa ya herî girîng, êdî feraseta rêveberiyên kevnar jî têrê nakin û derbasbûna wan dibe mijara gotinê. Çi derbaskirina rêveberiyan, çi jî ji ber ku êdî gel rewşa berê najî, ev jî dibe sedem ku bi rewşek objektîf a wisa bê kontrol ve encam bibe. Her ku pêşketinên wisa objektîf zêde dibin, elbet rêjeya tevlîbûna ji şoreşê re jî zêde dibe. Ji ber ku pêşketinên şoreşgerî jîndar dibin û tên meyandin, girîngiyek mezin bidest dixe. Jixwe PKK dibe raveya vê ya herî vekirî. Bi qasî teoriya xwe ve, ewqas jî bi pratîka xwe re van pêşketinan dinirxîne û jîndar dibe.

Elbet hemû beşên Kurdistanê di heman astî de pêş nakevin. Mêtîngeriyên cuda, desthilatdariyên cuda, pêvajoyên dîrokî yên cuda, dibin sedem ku rewşa van deran a objektîf bi radeyên cuda û tevgerên cuda ve rê ji pêşketinan re vekin. Em niha baştir fêm dikin ku tevgera PKK'ê ji serî ve ev pêşketin rast nirxandine û bi vê nirxandina objektîf re pêşketinên bi netewperestiya Kurd an jî çepgiriya wê re çêbûyîn nêzî rastiyan nirxandiye. Her wiha dahûrînên di çarçoveya ferasetên sosyalîzm, ol, malbat û kesayetî di wateya fêmkirina rastiya civakî û netewî de serbendên girîng daye, bi nêzîkbûnên ku kûr dibin re zanebûn û rêxistinbûna xwe pêş xistiye. Di vê manê de dîroka PKK'ê ne tenê vegotina dîroka neteweke ye, di asta nav-netewî û herêmî de, ji hêla bîrdozî û siyasî ve bi qasî rewşa objektîf radixe ber çavan, ewqas jî ev di kesayeta xwe û kesayeta rêxistina xwe de gihandina çareseriyê jî rave dike. Ango ya mijara gotinê ye, ne tenê tevgerek netewî ye. Di asta nav-netewî de sosyalîzm, di asta nav-netewî û herêmî de jî rizgarîxwaziya netewî rast dahûrandinê ve kesayetek rast a sosyalîst û kesayetek rizgariya netewî di radeyek girîng de pêş dixe. Di her qonaxê de pêşketina ku bi xwe re ava kirî, bi pêşketinên nav-netewî re encam bûye. Her çendî ev pêşketin bi temamî xwe ne dabin derve, vê di nava xwe de kûr dijî.

Nexwe qonaxa kombûna PKK'ê, tenê ne weke tevgerek netewî, pêwîste weke tevgerek sosyalîst bê hizirandin. Dîsa teşekirina kesayeta rizgariya netewî jî ne bi nêzîkbûnek teng, bi şêweya ku rê ji kesayeta rizgariya netewî ya hemdem re veke, bi nêzîkbûnek pir kûr ve derxistiye holê. PKK'ê, li hember hemû hewldanên emperyalîzmê yên di hemû mêtîngeriyan de bi armanca bindestkirinê dike û di encamê de şêweyên pêşketî yên şerê taybet ên pêş dixe, xwe gihandiye rastiyek şer û artêşê. Di vê manê de rastiya şer û artêşê, pratîka derbaskirina şerên taybet ên di roja me de emperyalîzm ferz dike. Ji vî alî ve xebatên ku di navbera salên 1980-90'î de hatine meşandin, bi qasî avakirina partiyek sosyalîst a şoreşgerî ye, ewqas jî xebatên di asta nav-netewî de firsenda avakirina artêşek şoreşger a watedare. Ev hewldan ne tenê ji bo

rejîma 12’ê Îlonê, di heman demê de hewldanên pêşwazîkirina hemû şerê taybet ên emperyalîzmê ne.

Partî, bi vî rengî partiyek xwedî bandorên nav-netewî ye, şer jî, şerek xwedî bandorek wisa ye. Ji ber vê PKK weke xeternakiyek nav-netewî tê nirxandin û bi şêweyek ‘rêxistina terorî ya cîhanê ye’ bi darezandinekê re rûbirû ye. Ango ev nirxandin, çavkaniya xwe ji xisleta wê ya bûna alternatîfa pergalê digire. Xeteriyê jî wisa şênber hîs dikin. Ji ber ku dihizirin encamên şerê şoreşgerî yên li dijî şerê taybet tenê bi Kurdistanê re sînordar namînin, li gorî wê hewldanên dijber em ji asta herêmî bigirin heta dem bi dem NATO jî tevlî vê dikin û wisa dimeşînin. Ev hemû jî destnîşan dikin ku, partîbûna me ne tenê partîbûnek netewî ye, partîbûnek enternasyonalî ye. Dîsa şerê me ne tenê şerê rizgariya netewî ye, şerek enternasyonalîste.

Bi rewşa nav-netewî û herêmî ya heyî re, em dikarin derketina partiya me û pêşketinên ku rê jê re vekirine em dikarin wisa xulase bikin. Wê dema pêş me jî, ev pêvajo hîn zêdetir lez berdewam bikin. Pêvajoya pêşketina siyasî ya nav-netewî misoger ne dijberî Kurdistanê, wê şahidiya pêşketinên li gorî berjewendiyên wê bike. Niha nakokiyên di nava wargehên emperyalîst ên heyî de, blokbûna DYE, Awrûpa û Japonya û dîsa cihê Rusya ya di nava vê blokbûnê de, derketina Çînê, dîsa zêdebûna pirsgirêkên netewên di asta paşketî û girêdayî rewşek wisa ava kiriye, aramiya ku berê emperyalîzmê saz kirî êdî bi findan lê tê gerîn. Jixwe em bandora vê ya li ser rewşa Kafkasan, Balkanan û Rojhilata Navîn roj bi roj dijîn. Ev hemû didin diyarkirin ne aramî, wê bê aramiyê pêş bixe, emperyalîzm hîn zêdetir zehmetiyê bijî, nakokî kûr bibin û ji vê jî gelek derizîn derbikevin holê. Jixwe ev derizîn, hêj ji niha ve derizînên ku em jê sûd werdigirine. Derizînên li Balkanan, Kafkasan û Rojhilata Navîn di wê astê de ne, em dikarin xwe bigihîninê.

Dîsa weke xweser li herêma me lihevkirina Ereb û Îsraîl, rewşa li Îranê û ya herî girîng jî ew aramiya Tirk ku gelekî pesnê wê didan ber bi bê aramiyê ve diçe, wê dema pêş me jî bi qasî tê hizirîn zêdetir rê ji pêşketinên nû re veke. Wê polîtîkaya pratîkî ya

eslî bi van pêşketinan re derbikeve holê. Nirxandinên partiya me û nêrînên wê yên siyasî, wê di vê demê de jîndar bibin. Niha di astek sînordar de jîndar dibin. Lê dema pêş yên hewce dikin pêk werin, bi qasî bi ti demê re neyê muqayesekirin wê xwe bigihîne asta herêmî û nav-netewî û karbidestiyek pêşveçûyî bidest bixe.

Xulase piştî ku me ev destnîşan kirin, ger em rewşa Kurdistana di roja me de jî binirxînin, rewşa objektîf a heyî ne di asta bê jiyîn de ye, nexasim em dibînin ku mêtîngeriya Tirk hem siyasî û leşkerî, hem aborî ketiye rewşek ku nikare birêve bibe. Êdî em nikarin li Kurdistanê behsa venêrîna hêza mêtîngeriyê ya aborî, siyasî û leşkerî bikin. Bi rastî jî rewşek bi temamî derbaskirina vê heye. Dagirkeriyek vekirî û rejîma şerê taybet mijara gotinê ye û ev şer jî ji bo wan ji ber astarê wî şerî bihaye. Bûhrana vê ya li ser Tirkiyê jixwe pir tunde. Bûhrana dawî ya aborî û siyasî di asta jor de ye. Lewra bi rewşek nikare rêve bibe re rûbirû ye. Hatiye astek wisa ancex dikare bi rejîmek weke wan goti; “Komara Kontragêrîla” bê birêvebirin.

Di vê mijarê de em bi kurtasî pêşketinên li Başûrê Kurdistanê jî bêjin, mêtîngeriya kevnare tê derbaskirin. An wê bi federasyonek demokratîk ve di çarçoveya yekbûna Iraqê de ber bi çareseriyê ve biçin, an jî neçarin Dewleta Federa ya Kurd an jî dewletek serbixwe ava bikin. Nexwe weke din nikarin vê pêvajoya derbasbûnê zêde bidomînin. Çi dewletbûn, çi jî federebûnek demokratîk dibe, pêşketinên bi vî rengî wê lez bide pêşketînên şoreşgerî.

Tê dîtin, rewşên objektîf ên heyî hîn zêdetir dervî kontrolê û çareseriyek bi şoreşê ferz dike ve di rewşekê de ne. Bêguman ji bo emperyalîzm van deran venêrîne, dixwaze hinek modelan pêş bixe. Dixwaze modela Dewleta Federa ya Kurd li Bakur jî belav bike. Lê belê rejîma kevnar a Tirk derfeta vê nade. Aloziya Ozal, ya rastî bi şêweyek kiryarên wî nediyar kuştina Ozal û piştre pêşketina gelek kuştinên kiryarên wan nediyar, girêdayî terora rejîma Kemalîst di navê de dijî yan jî li hember hêzên dijberê xwe raber dikene. Statûkoya nû ya polîtîkaya emperyalîzmê û nokerên wê dixwazin saz bikin naskirin, çavkaniya xwe ji meşandina statûyek ku 70 salî

dijwar dayî meşandin digire. Her çendî niha desthilatdar ew bin, derdorên berfireh ên li hember vê bertek raber dikin hene. Rewşa gel bi xwe, şoreşa li Kurdistanê û heta rewşa hevkarên heyî êdî dide diyarkirin ku wisa nikarin bimeşin. Emperyalîzm jî pir kûr ji vê aciz dibe. Ev jî didin diyarkirin ku rewşên pir bi nakok û qonaxên derbasbûnê tên jiyîn. Ev hevsengî jî bi vî halê xwe ve zêde dirêj nake. Jixwe rojane xebatên têkoşîna şoreşgerî vê hevsengiyê tengav dike û bê encam dihêle. Ango ne gengaze ku Kemalîzma kevnar ji nû ve aramiya berê bidest bixe. Hemû mercên nav-netewî û herêmî û ya herî girîng jî pêşketinên şoreşgerî yên li Kurdistanê rê nade vê.

Tevgera me ya şoreşgerî jî, di vegotina kurt a dîroka me ya partiyê de jî weke tê dîtin, di serî de bi partîbûnê, peyre gêrîlabûnê û artêşbûnê ve asta ku îro xwe gihandiyê wê hemû şerên taybet vale derbixe û sînordar bike. Dîsa wê çareseriya hevkarî bêkar bihêle, xwe gihandiye kamilbûnê û hêza cewherî. Em di vê xalê de pêwîst dibînin ku pirsgirêkên partîbûnê jî binirxînin.

## Tevgera PKK’ê Tevgerek Alternatîfa Pergalê Ye

Her çendî partîbûn bi serkeftî hatibe sazkirin û artêşbûn xwe gihandibe astek ku neyê tasfiyekirin, em nikarin pirsgirêkên giran ên tên jiyîn û peywirên ku pêwîste werin bicîhanîn ji nedîtî ve bên. Pirsgirêkên partîbûnê, pirsgirêkên ku em hewl didin herî zêde berfireh danîn holê ne. Ev nirxandinên ku me di bin navê Em Partîbûnê Pêk Bînin û Şer Ser Bixin de berhev kirine, pirsgirêkan pir dijwar datîne holê. Dema em partîbûnê pêk tînin, nexasim li dijî netewperestiya paşverû, li dijî çepgiriya sexte ya burjuvaziya biçûk a Kurd û Tirk û şovenîzma civakî, me ji hêla bîrdozî ve têkoşînek meşand û di vê wateyê de partî bidest xist. Dîsa hinek rewşên siyasî hebûn; çi li hember partiyên burjuva, çi jî li hember partî û tevgerên netewperest ên paşverû ku gihane asta tevgerên çalekiyan, şerek siyasî ya hatî meşandin hebû û ev şerê siyasî jî kêm-zêde hat serxistin. Ji bo vê weke xeta têkoşînê ya bîrdozî û siyasî serkeftina wê misoger bû.

Jêr û jor dîroka vê wisa ye: Di dema komê ya destpêkê, an heta salên 80’î li dijî netewperestiya paşverû, şovenîzma civakî û reformîstên burjuvaziya biçûk ên her cure, bi şêweyek hûrûkûr me têkoşînek bîrdozî meşand û ser xist. Dîsa nexasim ji bo çewsandina faşîzma 12’ê Îlonê Komara Tirk bi hêzên hevkarên Başûr re jî lihevkirinek çêkir, ji bo bandora me ya siyasî ji holê rakin û weke tevger me bixeniqînin êrîşên pêş xistîn re, bi Pêngava 15’ê Tebaxê û propagandeya çekdarî ve bersiv hat dayîn û bi vî rengî şerê li ser lingan mayînê hat meşandin. Ev jî weke siyaset dide diyarkirin ku em çawa li ser lingan mane û ji bo li ser lingan bimînin jî em çawa aresteyî şerê gêrîla bûn. Kurtasî navbera salên 1980-90’î bi qasî pêvajoya misogeriya partîbûn, xeta wê û destkeftiyên xeta wê ya bîrdozî û siyasî ye, ewqas jî neçariya artêşbûn û şerê gêrîla bi xwe re derxist holê.

Di navbera salên 1985-90’ de bûyera ku herî zêde xisleta wê ya herî girîng derxistî holê rûniştandina şerê gêrîla ye û ji sala 90’î

heta roja me bi pêşengtiya partiyê re gêrîla giha asta kamilbûnek wisa, êdî têk neçe. Niha li vir tişta girîng naveroka ferzkariyên li hember rastiya me ya partî û artêşê ne. Rejîma şerê taybet ancex dikare bi me re derve de şer bide meşandin û ferzkariyên hundur jî ji şerê taybet cuda nayê hizirîn. Ya rastî têkoşîna bîrdozî, siyasî û rêxistinî derbasî hundur bû. Niha em baştir dibînin ku, Kemalîstên li derve, li cînan têk çûyî, çiqas hêzên bandorên feodal û eşîretî dijîn hebin, di wateyekê de li hundur –ev jî xwezayî serê xwe dirêjkirine- ketin nava hewaya pêşxistina lêgerîna vê.

Dahûrînên ku ji sala 1985’an heta roja me hatine pêşxistin di wateyekê de şerê çîna navxweyî ye, heta dahûrînên dijmin ê di nava partiyê de derxistina holê ne û ev nirxandin gelekî girîngin. Dîsa bal bidinê, her roja derbas dibe di nava partiyê de û heta her sala ku derbas dibe dijberiyek ku zêde dibe tê dîtin. Em li provakasyonan û dîroka xeta navîn re li şoreşgeriya nebes binêrin. Nexasim em li nêzîkbûnên şaş, sexte û çewt ên beramberî rastiya Rêbertiyê binêrin û di vê mijarê de şerê kûr hatî meşandin berçav bigirin. Em ê bibînin sosyalîzm bi şerê netewî û çînayetî re, li dijî ferasetên netewperestiya paşverû û reformîst di nava şerek dijwar de ye. Em tenê bi nêzîkbûnên nebêjin hinek provakatorin û sipartekên dijminin, bandorên dervî çînî, bandorên Kemalîstê, bandorên axatî û eşîrtî ne û vê têkoşînê teng nekin. Niha baştir tê fêmkirin ku, me têkoşînek gelekî berfireh, di radeyek dorfireh de, xwedî sipartekên wê yên netewî, çînî û heta nav-netewî heyî jiyan kiriye.

Hêj di sala 80’ê de, di provakasyona **Semîr** a hatî ferzkirin de hat dîtin ku girêdana xwe bi emperyalîzmê, dîsa kemalîzmê û paşverûtiya navxweyî re heye û ev şênber bû. Wî wisa karî veşêre: Xwest diyar bike weke ku ferqa di navbera şêwaza jiyana Awrûpa û şêwaza jiyana burjuvaziya biçûk de kême û danê holê. Lê di bingeha ferzkariya wî de li hember partîbûnê, pêşketina wê ya bîrdozî, siyasî û rêxistinî êrîşek berfireh hebû. Piştî vê provakasyonê, hinek provakasyonên din jî hatin pêşxistin. Her çendî em dibêjin provakasyonin û derbas dibin, ev li dijî partiyê, tevgerên bûna **partiya dijber** bûn. Ango li dijî cewhera şoreşgeriya

rasteqîn a PKK'ê tevgerên ku pir dijwar şer dikirin bûn. Em dizanin ku ev di provakasyona Semîr xwest çi bêje de wisa hat pênasekirin: "Ev PKK, di sala 1973'ê de çawa derketibe holê, pêwîste bi heman şêwazî bê binaxkirin." Niha em baştir fêm dikin heta roja me bi pişgiriya şerê taybet jî, çawa xwestin rê û rêbazên derketina PKK'ê taqlît bikin, her rêbaza pêşketinê ya hatî destxistin weke çekekê bikar anîn û ew şêwaza "binaxkirinê" çiqas bi şêweyek tund pêk anîn.

Dîroka provakasyonan, ji aliyekê ve şerê taybet a li dijî partiyê hatî meşandin, ne tevgerek bi kesekî yan jî sîxurekî hatî meşandine, her çendî di bin hevgirtina bandorên Kemalîzmê yên sipartekên derve û hundur ve, di kesayeta hinek provakatorkaran de bê bilêvkirin û her cure bandorên feodalî û eşîrtî yên bi nebesiya şoreşgerî re bike palpişta xwe jî, di rastiyê de **tevgerek partiya dijbere**. Zemîna koletî ya kûr, dîsa ferasetên jiyana burjuvaziya biçûk –jixwe ev jî ferasetên bîrdoziya Kemalîst a Tirk û ferasetên jiyana kapîtalîzmê û bûna burjuvaziyê ne-, fêrbûnên jiyana feodalî û eşîrtî –jixwe ev jî girêdanên xwe pir vekirî bi mêtîngeriyê ve hene- û zemîna ku ev ava dikin ji xwe re dike palpişt, zehmetiyên partiyê jî ji xwe re weke firsendekê dibînin, wisa dibin tevgerek partiya dijber û ev jî pir şênbere. Navend, qadro û taktîkên wan ên şer –jixwe taktîkê şerê van, taktîkê şerê taybetin, lê bi şêweyek cudatir û ziravin- hene. Kesayetên wan tîpên **xirabkar** ên pir dişibin şerê taybetin. Ango lewra zehmet bû mirov bizane kîjan ji van sîxurên objektîf û kîjan sîxurên sûbjektîf bûn. Lê belê encamên ku bi dest xistîn pir balkêş bûn û dişibiyan hev.

Misoger diyare wan li dijî me şerek dan meşandin. Ango di dîrokê de lihevkirina van çiqasî rast be, di nava partiyê de jî bi vî şêweyî lihevkirinên wan mijara gotinê bû. Dibe ku ev pêwendî pir bi zanebûn nehatin sazkirin. Jixwe, ne watedare ku mirov di dîrokê de jî pêwendiyên wisa bi zanebûn bigere. Ji ber meylên heyî xwe bi xwe digihin hev. Heftî sale hevgirtinek xisleta Eşîrtî-feodal û xisleta Kemalîzmê ya ne rewa heye. Di dîrokê de yekbûna van a bi Osmaniyan re heye. Heta em dikarin hîn zêdetir biçin rabirdo. Dîsa fêrbûnên jiyanê yên van ava kirî re, lez hevûdû nas kirine. Li gorî

gotinên wan dibêjin; “Em li çavên hev dinêrin, ji hev fêm dikin dixwazin çi bêjin.” Nêzîkbûnek wan wisa heye. Şêweyek wan jî wisa bû û van bêhna hev digirtin wisa dihatin cem hev. Jixwe di kombûna xwe de ji rastiya hûn dizanin zêdetir avaniya me ya paşketî û xisletên koletiyê bikar danîn. Bi sedî salane ev gundîtiya kole û bermahiya serdema navîn bikaranîne û zemîna di nava me de jî wisa baş nirxandine û bikar anîne. Em pir baş dizanin ku, zehmetî kirine hêcet wisa hêviya jiyana sexte dane hinek beşan, mînak bi şêweya gotine; “Em ê ji bo te mal peyda bikin, xwarin peyda bikin, jin an jî zilam peyda bikin”, wisa jî ji bo hinekan derfeta jiyana erzan pêşkêş kirine û ji rê derxistine.

Di encamê de ev tevgerên partiyên dijber, bi qasî em dizanin zêdetir kûrin, bingeha wan a dîrokek berfireh, sipartekên wan ên civakî yên pir xurt hene û pir baş hatine perwerdekirin, tevgerek partiya dijber a nûnerên wan ên siyasî ku pir fêlbaz hene.

Ev di dîroka partiya me de çawa pêşketin, em di kesayeta **Şahîn**, **Semîr**, paşê jî di kesayeta **Cafer**, **Hüseyîn Yildirim**, **Şener**, **Terzî Cemal** ku jêre pêşengtî kirine, di ferzkirinên partiya dijber de dibînin. Dixwazin van nêzîkbûnên partiya dijber heta roja me her sal yekê derbixin pêşberî me û wisa bidin jiyîn. Di nava van de ya herî girîng jî **Fatma** ye. Ev jî weke Fatma xwedî mejî û ruhek nexasim li dijî me bikarin her cure taktîk esas bigirin, ji destpêkê heta roja me bûne bela, di nava şerek pir tund de ne, ji bo vê jî pêşengiyek bîrdozî û siyasî mijara gotinê ye. Me hewl da cihê vê ya di nava PKK’yîbûnê de baş destnîşan bikin. Ev şer çawa ji hêla bîrdozî, siyasî, ruhî, rêxistinî û leşkerî ve di nava hev de pêş ketiye, me di hemû nirxandinên xwe de  danîn holê. Belê windahiyên vê jî çêbûn. Lê em niha baştir dizanin ku destkeftiyên vê yên pir mezin jî çêbûn. Me di vê wateyê de xebatên provakasyonan an jî partiya dijber ji salên 75’an heta roja me destgirt û jixwe ev hemû jî bi hev ve girêdayî ne.

Me pir vekirî dît ku, yên herî zêde dijberî hev dihatin dîtin, çiqas objektîf an jî sûbjektîf domdarên hevin û di xizmeta hev de ne, çiqasî lihevkirinan digihin hev. Hêza van zemîna koletî ye, fêrbûnên jiyanê yên serdest bûne, bê ku kedê bide diziya kedê bike,

fitne-fesadî, fêlbazî û xirabkirine. Em niha baştir fêm dikin ku rewşa civaka me jî çiqas ji bo vê destdayî ye, ango kesayetên wisa rêveber çiqas encamê digirin em berçav bigirin, hêza van biçûk nayê dîtin.

Li dijî van bi welatparêziyek mezin û tevgera kedê sosyalîst a mezin ve, şerê rêxistinê û kesayet hatiye meşandin. Kesên ku nekarin dîroka PKK'ê ji vî alî ve binirxînin, ya rastî nûnerên wane. Dixwazim bal bikişînim ser vê jî. Kesên ku ev şerê me meşandî tevê nabînin an jî dibînin lê pêdiviyên wê di kesayeta xwe de şênber nakin, ne jidilin, ji aliyekê ve kesên ku dixwazin partiya kontra (partiya dijber) di nava me de bidin jiyînin. Encama herî sotîner jê bê derxistin ev e. Xebatên van ne rawestiyan. Her çendî hevrêyên me xwedî niyazek baş bin bila be, kesên ku zemîna ev xwe dispêrinê derbas nekin, ango kesên rast nêzî şer nabin, nexasim di şerê gêrîla de afirînerî û pîvanên partiyê pêş naxin, gelo wê kî pêk bînin û zemînê bidin kî? Elbet wê zemînê bidin partiya kontra û partiya dijber. Jixwe em dizanin ku piştî demek kin hinek xwe ji bo vê amade dikin. Çi eleqeya vê bi niyaza baş re jî nîne. Li vir şerek kesayetî ya pir çetin heye. Ger em şerê ku li hember binyata civakî ya paşverû û pêşketinên netewî yên hevkarî tên meşandin, ya herî girîng jî çetinbûna şerê gêrîla, perwerdekarî û rêxistinkirina wê nebînin û heqê vê nedinê, ev dîsa ji bo xirikîne provakasyonê zemînek guncave û ev zemîn lez bikaranîn, ber bi rewşa provakatorbûnê ve çûyîne. Hinek lez dikevin nava vî zemînî, hinek paşê dikevin navê, hinek newêrin bikevin navê. Lê em vê girêdanê niha baştir dibînin.

Kurtasî encamên ku pêwîste ji şerê partî bên girtin hene. Bi kurtasî derket holê ku, tevgera partiya dijber ne tevgerek wisa biçûk bê dîtine, berovajî şerek ku herî zêde şerê taybet hêviya xwe pê girê dide. Xesletên vê yên derketina şêwaza Rêbertiyê jî hene. Rêbertiya hêmana vê provakasyonê hema weke çavdêrekî ye, weke venêrînvanekî ji destpêkê ve, li ser rastiya Rêbertiyê rûniştiye yan jî di rewşa rûniştinê de ye. Bêguman rastiya Rêbertiyê jî di ferqa vê de bû. Wî jî ev ferzkariya Komara Tirk û ferzkariya zemîna hevkar didît. Lê belê hinek hevalên me yên wisa hene ji ber me

nêzîkbûnên wan yên weke; "Em di rojekê de bipirçiqînin, tine bikin" raber nekir, îro baştir tê fêmkirin çiqas nêzîkbûnek dîrokî û taktîkî bû. Ger rastiya Rêbertî li dijî zemîna hevkar hesabxwestinek rast nemeşîne –jixwe ev ji bo Kurdistanê rastiyek jiyanî ye-, hesabxwestina vê di nava rastiya malbatî, civakî, netewî û ya herî girîng şerê rêxistinî de ji her hêlê ve nebîne û nenirxîne, tevgerek dijber derketin pêş nexe, ne gengaze ku Komara Tirk a li Kurdistanê, Komara Tirk a şerê taybet, Komara Tirk a di nava PKK'ê de û dijminê di nava PKK'ê de bibîne, binirxîne, venêrîne û bê bandor bike.

Niha em hîn baştir fêm dikin ku divê rastiya Rêbertiyê ji vê hêlê ve jî girîng bê têgihiştin. Ev di dîroka Kurdistanê de pir cuda û pêşketinek heta dawî jî girînge. Ger hûn dixwazin rêbertiyek heta dawî şoreşger û ber bi serkeftinê ve diçe ava bikin, hûn ê wê di kesayeta Kurdistanê ya ava dibe de bidest bixin. Hûn ê pêşî kesayeta xwe, paşê jî xisletên dijmin ên ketîn nava malbatê, kesayeta di têkîliya taybet, pêwendiya xwîşk û bira, pêwendiya dayîk û bav, pêwendiya pêşiyan de bibînin û fetih bikin. Dîsa ji bo van tevan heta ku li hember pêwendiyên malbatî yên paşverû, têkîliyên jin û zilam ên paşverû û girêdanên wan, li hember paşverûtî û mêtîngeriyê û kesayetên ku zêde girêdayî şerê wê yê taybetin, ji vê re dibin zemîn –em ji vê re dibêjin sîxurtiya objektîf, lê ev bi sîxurtiya sûbjektîf re têkilheve, her malbat û her kes bi vê re di nava hev de dijî û pêş dikeve, ev rastiyek Kurdistanê ye, rewşek xwesere-, rewşek wisa re rûbirû hatinek neyê jiyîn, partîbûn jî ne gengaze.

Yeqîn dikim ev ji bo hevalên ku xwedî ferasetên yek alî jî dibe dersek. Hêvîdarim vê carê fêm bikin. Kesên ku nêzîkbûnên weke; "Me rasterast partiyek welatparêz ava kir. Di navê de jî partîbûnek rasterast heye, çepgiriyek rasterast heye, sosyalîzm û welatparêziyek rasterast heye. Ango di navê de dijmin nîne, zemînek ku xizmetê dijmin bike nîne" raber dikin, niha baştir fêm dikin ku çiqas xafilin, bê terbiye ne û bê rêxistinî ne. Tevdîr û rêxistiniya di rastiya Rêbertiyê de serwere, dijmin her tim di nava xwe de hîs dike, dijminê bi xwe re, dijmin di bin rûpoşiya

malbatparêzî û ehbap-çawîşî de, dijminê di bin rûpoşiya jin an jî zilam de –em ji vê re bêjin dijminê bi xisletê zilam an jî xisletê jinê- ne dîtiba û nehiziriya ev ji bo Kurdistanê tên çi wateyê, di pêvajoya rizgariya netewî, asta rêxistinbûna partiyê û taktîkên gerîla de çawa diyar dibin dernexistiba holê, gelo dibiya ev Rêbertî serkefti bûya yan jî vê Rêbertiyê dikariya heta roja me bijî? Hûn jî baş dibînin wê Rêbertî heta roja me nekaribûya bijî û her wiha Rêbertî hêza jiyanê ya herî mezin a vê têkoşînê ye.

Encama ku pêwîste ji vê bê derxistin ev e: Nexwe dijmin, hevkarî û dîsa tebeqeya xeta navîn em behs dikin ne tenê derve de, her wiha nûnerên van ên derbasî nava me bûyîn hene. Bi taktîkên pir hostane ve bi qasî li dijî şerê taybet ê derve û hevkariyê, ewqas jî li dijî ferasetên dijmin ên di nava partiya me de, heta feraset û fêrbûnên jiyanî yên dijmin ku di asta kesî de jî heyî, li dijî rêxistinbûn, xirabkarî, bê kesayetkirin û hewldanên wan ên ji her alî ve şer dixin, têkoşîn neyê meşandin, em ê çawa xwe bigihînin rastiya Rêbertiyê û rastiya partiyê? Em çawa dikarin yeqîn bikin hûn vî şerî serkeftî dimeşînin? Rêxistinên Komînîst û netewperest ên ev ceribandîn derketin. Mixabin temenê wan du sal bûn. Mînak ger hûn li tevgerên çepgerên şoreşger ên Tirk û tevgerên netewperest ên Kurd binêrin, hûn ê bibînin ev du mehan de ji aliyê dijmin ê hundurê xwe ve hatine desteserkirin. Hûn jî baş dizanin tevgera **Mustafa Suphî**, bi temamî îsyanên Kurd, tevgera **Barzanî**, KDP Tirkî û gelek tevgerên çepgir ên biçûk-mezin çawa ji aliyê dijmin ê hundur ve pêşî ew di nava xwe de berdane hev, hinek tine kirine, paşê jî yên mane çawa weke saziyek sîxurtiyê dane meşandin.

Ji roja destpêkê ve xwestin van tevan li ser me pêk bînin. Em jî di ferqa vê de bûn û me ev lîstoka mezin sedî salan a dewletê dît. Tevî ku di vê mijarê de fikarên me hebûn, bi qasî tirsên xwe me evqas jî wêrekiya xwe bikar anî û bi rêbazên guncav dij derketin. Me encamên kûr ji vê derxistin, xalên weke şêwaza şoreşgerî ya partiyê, şerê wê yê rêxistinkirî û çekdarî, di derbarê şêwaza jiyana wê de bi dahûrînên kesayetî ve xislet û erkên kesayeta şoreşgerî, kesayeta şer, kesayeta fermandar çine, rojane û heta di hemû jiyana

xwe de çawa bide meşandin vekirin. Hemû pênaseyên di van mijaran de hatine ronîkirin, di cewher de partîbûn bi xwe ye. Partîbûna bi vî şêwazî, partîbûna serkeftî û pêk hatiye. Sedema bingehîn a di pêşketina şerê gêrîla û xebatên eniyê de partîbûnek wisa ye. Pêşketinên bi vî rengî ji her alî ve berdewam dikin.

Weke din em **xeta navîn** jî serve bikin. Em dizanin zemîna çîna navîn çiqasî li Kurdistanê xurte. Nexasim di roja me de dewletek ku diçewsîne û tevgera me ya li dijber radiweste heye. Niha gilî û gazincên çîna navîn û xwesteka herdu aliyan bikar bîne pir şênbere. Em dikarin vê ji rewşên partiyên burjuva, partiyên burjuvaziya biçûk û tevgerên hevkar fêm bikin. Dîsa hinek tevgerên qaşo bi zagonî, demokrat û xwe welatparêz dibînin hene. Em dizanin ku ew jî çiqas dixwazin ji vê rewşê sûd werbigirin. Em van danin aliyekê, em ê çi navî li nêzîkbûn û ferasetên ku hewl didin çavdêriyê bikin, bi nêrîna gelo wê kîjan alî biçewsîne ji yên hêsan û zehmetiyê berçav nagirin re dibin amûr, dixwazin bi sondên jiyana Awrûpa û jiyanên erzan ve rêveberiyê desteser bikin, dilxwaziyên xwe yên kesî kêlî bi kêlî bijîn, li derdora kesayeta xwe komên biçûk ava dikin û hemû derfetên partiyê yên heyberî û giyanwerî bikar tînin bikin? Em nikarin ji hemûyan re bêjin sîxurin. Dikarin bêjin xebatên bûna partiya çîna navîn. Ango di nava me de hem partiya kontra, hem jî partiya çîna navîn heye. Mînak ger em Eyaleta xwe ya Mêrdînê binirxînin, hûn ê bibînin vê partiya çîna navîn çawa xwestiye xwe pêş bixe, dema vê jî ser naxe paşê çawa bi partiya kontra re dibe yek û pir balkêş ketiye bin xizmeta kontrgêrîla. Hinde hûn vê rewşê pir germahî dijîn, dibe ku hûn ecêb jî bibînin. Lê hûn baş fêm dikin çîna navîn jî partiyeke, her çendî nûnerên wan ên dervî me ne serkeftî jî bin, nayê wê wateyê ku di nava me de jî nûnerên wan nînin.

Çîna navîn zemînek xurt a civakî ye û wê her tim bixwaze siyasetê bike. Ger nekare li nav partiya zagonî de bike, wê li nav partiya dij zagonî û nava me de bike. Jixwe li gelek eyaletên me, heta li dervî welat ev partiya ku xwe ferz dike, partiyek wisa ye. Ev ne tam partiyek kontrgêrîla ye, ne jî tam partiyek şoreşgerî ye. Di navbera herduyan de ye. Pêwendî û eleqeya wan bi partiya kontra

re di qonaxên zehmet de, pêwendiyên wan bi partiya şoreşger re jî di qonaxên ku pêşketin lez çêdibin de destpê dike. Lê xwe dispêrin pevçûna di navbera van herduyan de hewl didin wisa xwe li ser lingan bigirin, ji valehî û tengaviyên herduyan sûd werbigirin û ger gengaz jî be xwe bidin pêş. Ev weke di asta cîhanî û herêmî de jî wisa ye, di nava tevgerên ku çavkaniya xwe ji çîna navîn jî digirin wisa ye û êdî di nava me de jî hatiye vê rewşê. Ji aliyekê ve koka çîna navîn a netewperestiya paşverû jî heye. Mînak YNK û komên reformîstên burjuvaziya biçûk em behsê dikin ji aliyekê ve bi me re pêwendiyê pêş dixin, ji aliyê din ve jî bi Komara Tirk an jî emperyalîzmê re pêwendiyê pêş dixin. Diçin cem wan dibêjin; "Em dixwazin şoreşê rawestînin alîkariya me bikin." Tên cem me dibêjin; "Em dixwazin pêwendiyên we bi emperyalîzm û mêtîngeriyê re baş bikin, alîkariya me bikin." Xebatên xwe yên di vê mijarê de jî pir xurt kirine. Vaye hinek nêzîkbûnên di nava me de jî zemîna vê rastiyê ne. Dibêjin; "Dibe ku baskê şoreşgerî yê PKK'ê yan jî beşê radîqal tengav bibe, em hinek eyaletan bigirin, wargehên li Başûr bînin rewşek guncav, ger em firsendê bibînin PKK'yek dervî gêrîla, hinekê lîberal û alîgirê çareseriya siyasî damezrînin." Çi zanebûn çi jî nezantî em baş dizanin ku ev partî çawa bi partiya kontra re tê cem hev, ev jî di pêvajoyên pêşketina partiya şoreşger tengav dibe de baştir derdikeve holê. Mirov dikare ferasetên herî dawî di bin navê rêbertiya siyasî de xwestin derbikevin pêş jî, weke partiyek navîn binirxîne.

Xala ku ji partiya çîna navîn re dibe zemîn **koletî** ye. Şoreşgeriya nebes bi xwe jî partîperestiya çîna navîne. Hûn van têgehan pir nîqaş dikin û dibêjin; "Ev şoreşgeriya nebes di nava refên me de serwer bûye." Ev raste. Niha di fermandeya gêrîla, fermandeya eniyê de, kurtasî li hemû cihên ku pêwîste nûnertiya partiyê bên meşandin de, şoreşgeriya nebes serdeste. Bingeha çîna şoreşgeriya nebes, çîna navîne. Çîna navîn, jixwe bi serê xwe çîna nebese û evqas şoreşgeriya nebes jî ancex dikare bi şoreşgeriya çîna navîn re bê ravekirin. Şoreşgerên nebes, dem bi dem ji bo partiya kontra dibin zemîn an jî direvin, dem bi dem jî derbasî aliyê partiya şoreşgerî dibin. Nexwe çîna navîn û şoreşgeriya nebes nabe

têgehek gelemperî, li ser bingeha civakî partiya kontra û partiya şoreşger ji hev nayê cihekirin, bi wî re di nava têkoşînek dijwar de ye, pêwendî û nakokiyek kûr dijî, her tim xwe berçav digire, dema firsendê dibîne xwe dide pêş, nebesiya xwe tîne astek partiyek çîna navîn, dema tengav jî dibe wê ber bi partiya kontra ve biçe, ger partiya şoreşger jî biçewsîne wê piranî derbasî aliyê partiya şoreşger bibin, mixabin wê her tim jî xwe li ser bingehek nebesiyê jî **ferz** bike. Partiya çîna navîn zehmetiyan berçav nagire, ferzkar nabe û di şerê şoreşgerî de serkeftinê esas nagire. Ji bo wî ne gengaze ku rêxistina têrkar, gêrîlayê têrkar, şervantiya têrkar, artêşa têrkar, di eniyê de girseya têrkar û kurtasî ji bo têkoşînê çi tiştê têrkar hebin pêk bîne. Ji ber ku pêwîste her tişt ji bo wî nebes be. Di vê wateyê de jî di nêzîkbûna vê çînê de binketin esase. Nexwe pênaseyek nebesiyên di nava refên me de ya wisa heye û ev jî, her ku firsendê dibîne herî kêm bi qasî partiya kontra xeternak dibe. Jixwe wisa jî dibe. Sedema ku ev şer li gorî em dixwazin pêş nakeve û pêşengiya partiyê rast nayê rûniştandin, ev şoreşgeriya nebese, lewma para herî mezin jî ya nêzîkbûnên xeta navîn a çavkaniya xwe ji bingeha çîna navîn digirine.

Bi vî rengî partiya kontra û partiya çîna navîn çiye, çawa derdikevin holê, sipartekên wan ên çînayetî û nav-netewî çine, dîsa pêwendî û nakokiyên di navbera wan de, pêşketina wan a di nava partiya şoreşgerî de, pêwendî û nakokiyên wan, di tevahî dîroka partiyê de pêvajoyên wan ên pêşveçûnê, nirxandinên di vê derbarê de berfireh hatine kirin berçav bigirin. Hûn wisa dikarin hejariya zanebûnê derbas bikin û xwe jî rast pênase bikin. Wisa dikarin pirsa; “Ez di partîbûnê de çi astê dijîm” ji xwe bikin.

## Heta Ku Partîbûn Pêk Neyê Têkoşîn Jî Ser Nakeve

Nêzîkbûnek afirîner ji sosyalîzma ku di derketina PKK'ê ya destpêkê de raveya xwe dîtî re kirin, nêzîkbûna şoreşgerî ya ji demokratîzm û netewbûnê re û nêzîkbûna herî hûmanîst a herî cewherî ya ji mirovahiyê re, têgehên bîrdoziya partiya me yên bingehînin. Ji hêla siyasî ve jî hinek têgeh û duruşmeyên PKK'ê yên weke dij-emperyalîzm, dij-feodalî û eşîrtî, dij-paşverûtî hene. Hîn şênbertir li dijî her cure sipartekên mêtîngerî yên hundur û derve siyasetê dimeşîne. PKK li ser xeta demokratîzm, sosyalîzm û tam serxwebûnê bernama xwe ya avakirina civak û miletek azad heye. Ji bilî vê nexasim di jiyanê de xisleta xwe ya şerkerî û rêxistinî pir şênbere. Fedekarî, wêrekî, însiyatîfa partiya me, bi şêweya di mercên guncav ên şênber de qabîliyeta wê ya vegotinê, wê li kuderê çawa nêz bibe, li kuderê çawa desteser bike, li kuderê çawa bê parastin û li kuderê çawa bê berdan, bi rêxistinparêzî û têkoşeriyê ve nêzîkbûnek hostane ji hemû erkên şoreşgerî re raber dike û her cure rê û rêbazê serkeftinê gengaz bike diceribîne. Ev di dîroka partiya me de ji gelek hêlan ve hatiye vegotin. Partiyek ku îro wisa hûrûkûr partîbûnek şoreşgerî pêk tîne, ev partîbûna şoreşgerî Kurdistanê, rastiya azadiya gelê Kurd û nasnameya wê ava kiriye. Li ser vî bingehî îro asta ku xwe aniye bala mirovahiyê bikişînê, êdî ji her demê zêdetir vekiriye.

Ev partîbûn, partîbûnek pêşenge, pir vekiriye ku partîbûnek rastiya Rêbertiyê serwere û avaniyê jî diherikîne, nexasim sedema yekemîn a şer tîne vê astê ye. Hêjî çi ji artêşbûna me ya gêrîla, çi jî serhildêriya girseyê re bi vê partiyê pêşengtî tê kirin. PKK li ser vî bingehî têkoşîna şoreşgerî ya gelê Kurd li ser rastiya siyasî ya nav-netewî û rastiya herêmî ferz dike, tê zanîn ku ev jî têkoşîn ber bi encamên girîng ve gihandiye. Ya girîng ev partîbûna şoreşgerî ji hêla her encamekê ve rast bê têgihiştin û pejirandine. Kesê ku

dibêje; "Ez endamê partiyê me, PKK'yî me", ger xefletek kûr nejî û rewşa wan a sîxurtiyek objektîf nebe, ne di nava nebesiyek cidî de bin û di gotina; "Ez di PKK'yîbûna şoreşgerî de bi îdîa me" de bi israr be, wê demê divê xeta navîn û şoreşgeriya her cure kêmasî berde. Dîsa divê dev ji nêzîkbûnên provakatîf û bûna zemînê nêzîkbûnên provakatîf berde. Xisletên milîtan û partîbûna şoreşger ên derketine holê esas bigirin. Ji ber ku xala gotin û çalekî digihije hev evdere. Ji bo vê bi perwerdeyek hûrûkûr ve, divê rêxistinparêziyek tam, asta fedekarî, wêrekî û afirîneriya şerkeriyê esas bê girtin. Bi qasî ev hat serxistin pir vekiriye hûn ê partîbûnê pêk bînin.

Ger em hîn şênber vekin, îro gelek eniyên me yên têkoşînê, hêmanên PKK'ê yên pêşengiya wê dikin, komîte û nûnertiyên wê hene. Bi rastî jî ger ev dixwazin nûnertiya PKK'ê bikin, mînak dixwazin vê di sazûmaniya gêrîla de diyar bikin, ev ancex bi nûnertiya PKK'ê dibe û ev jî bingeha serkeftinê ye. Di xebatên enî û dervî welat de, di nava her cure xebatên girse de, heta di nava xebatên demokratîk ên zagonî de jî ev wisa ye. Di radeya hûn tam partîbûnê pêk bînin de, hûn dikarin her qadê bigihînin pêşketin û serkeftinan. Hûn dikarin her qadê veguherînin qadên şer ên têk naçin. Di mijara partîbûnê de cewhera ku pêwîste bê fêmkirin wisa ye.

Di vê mijarê de wexta em dipirsin me çiqas partîbûn pêk anî û em di kîjan asta partîbûnê de ne, pêwîste her milîtanek û heta her şervanek me di vê çarçoveyê de xwe di ber çavan re derbas bike. Divê bê zanîn milîtanî û şervantiyek wisa ji rêzê nabe bê kirin, partîbûn pêk neyê xeta bîrdozî, polîtîk û rêxistinê neyê fêmkirin, di nava vî şerî de cihek saxlem nayê bidestxistin. Çima partîbûn neçariye? Li hember partiyên dijber, partiyên dervî me, şerê taybet û ya herî girîng jî weke kes li hember dijminê hundurê me partîbûn saz nebe, têkoşîn ser nakeve. Li hember kêmasiyên rêxistin, wêrekî û fedekariyê, kurtasî kêmasiyên me yên kesayet, -jixwe ev di wateyekê de dijmin rave dikin- neyê şerkirin, hûn nikarin partîbûnê pêk bînin. Hûn partîbûnê jî pêk neyînin, nikarin gêrîlatiyê pêş

bixin, nikarin pêşî li şerê taybet bigirin û dê ev jî bi komkujiyê encam bibe.

Piştî ku me pirsgirêk evqasî girêdayî hev pênase kir, êdî diyare ku pêwîste her eyaleta me, her bîrîma me ya xebatê di şênberiya xwe de di derbarê partîbûnê de encaman çawa derbixe holê. Bersiva ku pêwîste bê dayîn, şênbere. Her tim nêrînên weke; “Pirsgirêk hene, kontrgêrîla wisa bandor kir, partiya navîn wisa bandor kir, şoreşgeriya nebes wisa bandor bû”, xwe û piştî vê qonaxê partî xapandine. Êdî ev şerek li dijî partiyê ye û asayî jî nayê dîtin. Nêrînên weke; “Nikarim partîbûnê pêk bînim, nikarin perwerde bibîni û xwe birêxistin bikim”, tê wateya nêzîkbûna; “Ez dibim zemînê partiya kontra, ez ji xirabkariya çîna navîn re zemîn çêdikim” û ev jî binkeftine. Ger hûn di van helwestên xwe de israr bikin, hûn ê xetertir bin. Nexwe ti wateya nebesiyan nîne. Nexwe hewceyî ferzkariyên partiya dijber û hêjayî dijmin nîne. Partiya şoreşger van tevan napejirîne, li hember van şer dike û her ku şer dike partiyek pêş dikevê ye. Rêbertî jî bi temamî wisa şer dike, rastiya Rêbertiyek şer wisa dimeşînê ye. Rastiya Rêbertiyê jî dîrokiye û sazîbûne.

Hûn jî dibînin, pirsgirêkên partî, pirsgirêkên cidî ne. Dîroka partî û encamên vî şerê mezin a di vê dîrokê de pir sotînere. Mezinbûna PKK’ê, ne tenê ji bo rastiya me ya netewî, di asta nav-netewî de ji sosyalîzmê û gelê me yê li ber tinebûnêye re pêngavek rizgariya netewî dide pêkanîn. Ji rastiya netewî re, pêngavek rizgariya netewî dide pêkanîn. Dîsa ji bo desthilatî û demokrasiya gel pêngavekê dide kirin. Di kesayetê de tinebûna hezar carî pêk hatî û her cure xirabûnan dijî, pêngavek kesayeta serkeftî dijî pê dide kirin. Ev jî di astek dîrokî de ye û ji bo we jî bi qasî nan û avê hewce dike. Ti astengiyên hundur û derve yên li pêş vê nayên pejirandin. Pêşbaziya herî mezin, pêşbaziya partîbûnê ye. Pêşbaziya herî mezin, pêşbaziya Rêbertiyê ye û ew jî li ser vî bingehî ye. Yeqîn dikim dema wê ye ku êdî hemû xebatkarên ji vê hêlê ve bi navê partiyê tevdigerin, ji milîtanên pêşeng heta kesên herî ji rêzê dibêje; “Endamê partiyê me”, her kes xwe zelal bikin, cewaz bikin û xwe tevlî şêwaza şoreşgeriya rastiya partiya me û

partiya me ya şoreşgerî bike. Nabê ku di vê mijarê de mijûlkirin û taloqkirinek hebe. Êdî nabe ku di şêwazek zirav weke sîxurên partiyên dijber tevgerek hebe. Hêjî hinek xwe ferz dikin, giran dikin, zirav dikin û wisa dihizirin ku dê xwe berdewam bikin. Xwe dixapînin. Biryardariya me, biryara derbaskirina hemû partiyên dijbere. Biryara em ê van heta hemû bermahiyên dawî teşîr, tecrît bikin û hewce kir tasfiye jî bikin.

Dixwazim her kes van xalan bi girîngî li ber çavan bigire. Encamên ku pêwîste kesên dibêjin; "Ez li hember vê partiyê rêzdarim, amade me ku bi navê vê partiyê şer bikim" derbixin, vê partîbûnê ji her hêlê ve bijîn, bi xwe bidin destpêkirin, derbasî nava hemû bîrîm, enî, gêrîla û kurtasî hemû qadên me yên xebatê bikin. Ya hewce jî şerê vê ya herî dijwar meşandine. Wateya partîbûn û şerê nava partiyê wisa ye. Serkeftin bidestxistin jî girêdayî vê partîbûnê ye.

**21 Sibat 1994**

## ME GIRÊKA KOR A HEZAR SALÎ PARÇE KIR WISA PARTÎBÛN PÊK ANÎ

Her çendî em heta dawî giraniyê didin partî, pir vekiriye hûn bi asta xwe ya heyî re têrkar tênagihin û ji bo encamgirtinê jî pêwîste bi israr li ser xwe rawestin. Tevî hemû hewldanên me, asta we ya têgihiştin û pejirandinê bi sînor dimîne. Di vê mijarê de ji qasî tê zanîn zêdetir hûn bê berpirsin. Asta terbiya we pir lewaze û dîmenên hûn raber dikin ne hêjayî ne. Hêjî hinek we weke ku marîfeteke, xwe cuda diyarkirin û wisa li ser me ferzkirinê, mirovbûn dihesibînin. Weke pêşketina kesayetên tîpên wisa marîfetek mezine, hûn vê tînin astek teorî û feraset ferz dikin. Berpirsyariyek we heye. Di vê cîhanê de berpirsyariyek we nebe, hûn nikarin bijîn. Em hewl didin azweriyên we yên hêsan û rewşên we yên gef li jiyanê dixwin derbas bikin. Nabêjim beramberî me hizbek an jî dixwazin xetek cuda ava bikin. Hûn ji vê aciztirin û tam di rewşek belayê de ne. Mirov wate nade we hûn çawa wisa di bin lewaziyên xwe de, xwe belengaz dihêlin an jî bê dayîn jî, ji bilî ev rewşa we bi lenetî bê dîtin wêdetir ti wateyek nîne!

Her tiştî bikin, lê belê bi quralên pêşketina têkoşîna civakî û netewî hiştina aliyekê ve pir ketî, pir hov û bi xisletên mirovên di nava me de yên tine bûyî û vale ve nejîn. Me pir girîngî da ku van rewşan di nava partiyê de nedin jiyîn. Mixabin hêjî hinek fêlbaz diwêrin vê bikin. Heta ku hûn xwe bi lêpirsînek wijdanî re derbas nekin, bi zimandirêjî û rûpoşî nêzî xebatên herî cewherî yên şoreşgerî ku bi hewldanek dijwar ve hatine avakirin bibin, hûnê bikevin nava rewşên bêfihêt.

Dixwazin bi şaşiyên pir mezin û ji wê jî wêdetir ji rê derketinan gef li partîbûna me bixwin. Li hember vê rewşê jî tê gotin; “Min hêrs neke.” Lê di siyasetê de zêde ti wateya van gotinan nîne. Nêzîkbûn her tim bi rêbazên cuda ve li gorî xwe tên jîndarkirin, lê mafê ti kesî nîne ku bi şêwazên hovane yekîneyên me ve mijûl bibin. Asta mijûlbûna ku dixwazin daxin jêr, şêwazek hemû kirêtî

xwezaya civaka gundî ya kevin û naveroka wê vale dihewîne. Gavek pêşdetir a van gavan jî, qaşo bajar dîtiye. Hûn ji van helwestan rizgar nabin û hewl nadin di polîtîkayê de gavek pêşiya xwe bibînin. Hûn li çiya dimînin, lê mixabin dibin hov, yên li bajaran jî dimîne sivik dibe. Gelo mirov dikare ji van xebatên hûn dikarin re bêjin xebatên eniyê yan jî gêrîlabûn?

Yên evqasî xwe sivik kirîn û hejarî teşe dikin, dikarin ji kîjan pirsgirêka girîng re çareseriyê bibînin? Em ê jiyana xwe bidin xebata partiyê, hemû reftarên we perwerde bikin, hêza we ya sondê pêş bixin, mixabin hûn ê jî li cihê ku diçinê bibin şampiyonê berovajî helwestan an jî amûrên wan. Ev li kur hatiye dîtin? Kî ji we re got ev dilpakî û watedarî ye? We ev çawa û li kîjan dibistanê xwendine ku wisa mezin bûne? Gelo asta we ya terbiye û perwerdeyê pir paşketî bû yan jî çewtiyên we yên civakî ku dihatin jiyîn û asta we ya ji rê derketinê hîn xetertir bû? Hûn weke dane pejirandin, gelo çavkaniya xwe ji niyaza me ya zêde digire?

Min gelek caran bilêv kir ku, divê hûn wê werimandina kesayeta xwe bitefînin. Me ne karî kesayetek aqilmend û dilnizm bi we re bidin rûniştandin. Ev rewşa we pir hejare. Em raporan dixwînin. Ger kesek ji rêzê jî ya serfiraz be, van rewşên ku li qadên xebatê tên meşandin raber nake. Bi rojane, hewl didim vê biselmînim. Ger hûn hemalekî jî di nava xwîn û xwêdanê de bidin karkirin û derfeta jiyanek ji rêzê bidinê, wê hezar carî ji bo we şikir bike. Tevî hemû xizmet û hewldanên me, ferzkariyên we, di bin navê polîtîkayê de ji vê helwestê zêdetir paşketiye. Em neçarin vê sererast bikin. Wisa bi gotinên mezin û nirxandinên ku dihizirin xwe dinivîsin ve, ev kar nameşin. Qadroyên me pir baş dinasim. Dizanim ku hûn weke mezinbûna PKK’ê, mezinbûna xwe dibînin, dibe ku hûn hezar qetî zêdetir xwe cuda diyar dikin û hewl didin cuda bidin der. Ev derewek mezine û nêzîkbûna me dixapînê ye. Ji bo vê jî ji xwediyên van helwestan ti serkeftin nayê payîn. Jixwe piraniya wan jî, firsendê nabîne xwe vale bike. Xwediyên van kesayetan hinekê bi wêrekiya ku ji me girtine, qaşo dihizirin azad tevdigerin. Li holê ye ku azadiyê çawa bikar tînin û çawa digirin dest. Ji rê derketin û çewtbûnek wisa heye. Ev nêzîkbûnên ku li ser

rastiya partiya me tên ferzkirin, qet ne rastin. Her kes neçare bizane dilnizm be û li gorî armanc guncav bijî. Ji bilî vê ti bar nayê rakirin. Bi evqas fişalbûn û ji rê derxistinan ve, bi evqas rêbazên kirêt ve, em meşandina tevgerek şoreşgerî danin aliyekê, karek ji rêzê jî nayê meşandin. Karek sivik jî, bi dabeşkirina kar ve nayê pêşxistin.

Heta ku hûn, kesayeta em hewl didin di rastiya PKK'ê de veguherînin nepejirînin, nikarin saxlem ji bin vî karî derbikevin. Ger hûn nekarin di asta herî jêr de jî lêhûrbûna PKK'ê bijîn, çil sal jî derbas bibin, her ku ev têkoşîn bidome, hûn nikarin ji mehkumbûnê rizgar bibin. Divê pêşî li vê bê girtin. Dilxwaziya partîbûnê esas digire. Li ser dilxwaziyê evqas bê berpirsyarî ferzkirin, evqas bi xisletên jiyana paşketî ve dev ji xwe berdan, we dike xwedî rolek wisa xeternak a ku, dijmin bi zanebûn pêşî li vî karî digire xirabtire. Ger tenê yek kesî ev kiriba, me tiştek ne digot. Lê belê yek radibe, bê ku wijdanê wî bilerize û pêwîstiya hesab dayînê bibîne, tenê ji bo dilê wî dixwaze bi temamî helwestên dij partî birêxistin dike û tîne asta feraset. Xeyalên piraniyan jî, ji xeyalên paşverû jî wêdetir sivik, hewl didin bi asta netewî bidin pejirandin. Navê vê jî kirine siyaset, feraset û rexne. Gelek kesên wisa hene. Kesên ku eleqeya wan bi fikir ve nîne, paşketî, hov, nizane li ser piyan raweste, ji bilî girînê tiştek ji dest naye, aliyek din "gotinên mezin dikin." Bi mirov re hinek heya û wijdan çêdibe. Rastiya ku wijdan tê gotin, gelo qet dest li hestên we nade? Em siyasî bûn, dijwar bûn, bi îrade bûn, lê ev hemû ji bo nirxane. Ji ber me hinek fedekarî ji we xwest, mirov evqasî sînornenas xwe ferz dike? Ez nikarim ji bo vê bêjim, ji bo partiyê feraseta têkoşînê ye. Ji van kesan re dibêjim, kesên nav dest û piyan.

Ma em ê bi we re hûn kesayetek çiqas girîngin, çiqas nêrînên we yên cuda hene nîqaş bikin? Xweziya hûn xwediyê ferasetek wisa bûna, da ku me jî xwestekên we pêk baniya! Ger di halê xwe de bê hiştin, kesayetek ku wê deh carî ber bi têkçûnê ve bibe, em ê çawa muxatap bipejirînin? Ev kesayet derfetên nîqaşek bi tendurist jî ji holê radikin. Qaşo bi van fikir û reftarên xwe ve, xwe berfireh kirine. Her yek bûye saziyek. Me çek kir destê wan, hinek jî pere dan, her yek bitir bû. Em ê van çek û pereyan bixin binê erdê, dîsa

jî nadin destê van tolazan. Her tişt me da, çîroka van pir vekiriye. Ma wê mirov çima wisa xafil tevbigere? Kesên di mijara dîroka xwe de ne bi qasî pişîkekê ne, niha li ser serê me bûne şêr an jî yên herî hejar, li ser serê me bûne axayên ji xwe razî. Hûn van ji kur derdixin? Pêwîste mirov hinekê hedê xwe bizane, paşeroja xwe bizane. Em hêjî ji bo rojekê li gorî berjewendiyên xwe veguherînin di hemû şaneyên xwe de berpirsyariyê bijîn, ji bo pêşketinekê weke bi derziyê bîrê bikulin kar bikin û hewl bidin hinek tişt bidest bixin, hûnê jî wisa xwe li ser van nirxan dirêj bikin. Em qet nikarin vê bipejirînin. Qet nebê ji vir û şûn de rast nêzî rastiyan bibin û bi gotinan xwe nexapînin.

Me hewl da di nava PKK'ê de, asta jiyana civaka me û asta betonbûna wê derbas bikin. Gelek xisletên kesayeta we dizanim. Lê belê di nava PKK'ê de binyatek fikir û xetek me ya siyasî ya cuda heye. Pêwîste hûn tev li ber fermana wê bin. Pêwîste hûn xwedî nirxandinek weke; "Ger tevkariyek me ya zêde nîne, qet nebê em bê pirsgirêk bimeşin" hebe. Ger dilnizmî û hinekê jî li hember armancên xwe nêzîkbûnek rêzdar nebe, em ê çawa nêzî hev bibin? Min heta niha ji yek hevalî re gotinek ne di cîh de ne gotiye, nêzîkbûnek şaş nekiriye. Me her cure hêz û pişgiriya ji rêhevalekî bê payîn pêşkêş kir. Em heta dawî bi quralên rêhevaltiyê ve girêdayî man. Ger hûn jî wisa xwe bi fêlbaziyên gundîtiyê ve ferz bikin, elbet wê ji we re bêjin; "Nekin." Ne hêza we têra vê dike, ne jî pêdivî bi vê heye. Peywira we hûn bêfihêtiyên xwe derbas bikin. Em jî hewl didin vê derbas bikin û hûnê jî di vê mijarê de dilnizm bin.

Hema her kesayet kêmek maye rêbazên şaş bi me bidin kirin. Di bin navê feraset û rexne hene de, dixwaze ser şaşiyên xwe bigire. Çi eleqeya rexneyê xwe di nava heriyê de dana razandinê heye? Kesên ku şoreşgerin, li hember dijmin serbilindiya xwe li ser piyan digirin, li hember çalekiyên wan hene, bi biryarin ku bi ser wî de biçin dikarin rexneyan bikin. Di nava partiya me de kesayetên ku çavên xwe kor dikin, eleqeya xwe bi azadiya xwe û rastiya me ya berxwedaniyê re winda dikin hene. Ev kesên tîpên

wisa her tim bi ji rê derketin û şaşiyan ve, me mijûl dikin. Em neçarin pêşî li vê bigirin.

Me siyasîbûna nava partiyê pêşve bir, serwerxtbûnek bêhempa pêş xist. Hewldanên me yên weke zêdekirina hêza xwe ya nirxandinê û pêşxistina kesayetên ku bikarin rêbertiyê bikin hene. Dema hinekê fêrî vê dibin, vê jî li dijî me pir dijwar ferz dikin. Şûna ku pratîkên me yên cewherî tengav bikin, bila dijmin tengav bikin an jî hêmanên derdora xwe yên paşverû pêşve bibin. Li şûna gotinên pir mezin bikin û xwe cuda bidin diyarkirin, pêwîste hûn ji xwe bipirsin çima we komek mirov perwerde nekir, çima hêza taximek bijare ava nekir û heta bi wan re eleqedar nebûn. Kesên ku nikarin hinek pirsan ji xwe bikin, ne dikarin ji bo pirsgirêkên xwe çareseriyê ji me bixwazin, ne jî cidî tên girtin. Heq û huquq ji me dixwaze, lê şaş nêzî peywirên xwe yên herî bingehîn dibe. Heta naxwazin van bibînin jî.

Em neçarin nirxên PKK'ê biparêzin. Ev nirx tenê bi hewldanên we ava nabin. Lê mixabin kesên ku dixwazin li ser encama van kedan bicîh bibin hene. Di nava van nirxan de bexşînên gel, xwediyên berxwedaniyên girîng, şehîdên berxwedaniyên mezin û hewldana kesên keda navê wan nehatiye bihîstin heye. Qaşo di bin navê têkoşîna nava partiyê de kesên dibêjin; "Ez xwedî gotinim", rêjeyek mezin ev kes di nava hewldanên desteserkirina nirxan de ne. Neçarim bêjim ku, ez ê demek dirêj nekarim vê rewşê bipejirînim. Ez ê çawa destûrê bidim kesên ku bê sînor xwe li ser nirxan dirêj dikin, wateya van nirxan datînin aliyekê, wer dihizirin ku xwediyê her tiştî ne? Ez kesê ku dilnizmiya xwe winda kirî weke xeterî dibînim û dinirxînim.

Her ku partî berfireh dibe her cure bermahiyên qirêjî, mirovên her cure çîn û tebeqeyan û xwezayî daxwazên wan dikevin nava partî. Lê belê ji bo ev wisa ye, nabe ku ev ji bûna raveya cewhera partî şûnve bisekinin. Tenezilî her tiştî bikin, lê şaş nêzî yekbûna partî nebin, bi raveya partiyê ya cewherî ve nelîzin. Karên partî yên weke propagande û rêxistinkirinê, xebatên wê yên bingehîn hene. Ti carî dev ji wan bernedin. Min diyar kir ji bo me du gotin kirin, em çawa deyndarê hewldana sala ne. Hûn çawa vê ji nedîtî ve tên?

Em ne di pêvajoyek pevçûnê yan jî qonaxek şerê partî yê navxweyî de ne. Em ê vî karî di rewşek pelek ne dihejiya de, di mijara nasnameya xwe de nikare du gotinan bike, bi hewldanek ji kevirê reş avê derbixe pêşketinan ava bikin, wê hinek jî bi şêweyek bê sînor li ser vê hesaban bikin. Em qet nikarin vê bipejirînin.

Niha qaşo di nava PKK'ê de têkoşîn tê kirin. Her tim di bingeha ku bi hev re pirsgirêkan derdixin, têkoşîna li ser van nirxane, hem jî têkoşîna nirxê yên ku qet nirx ava nekirîn heye. Ger bizanin nirx bixwin û ji bo xwe rast jî binirxînin, mirov tiştekê nabêje. Ev têkoşînek pir paşketiye û encamên wê jî bi şêweyek ew qet hesab nakin de derdikeve holê. Em neçarin teqez rê li ber van bigirin û ber bi terbiyê ve bikişînin. Van helwestan weke rexne yan jî hizib napejirînim, weke bê terbiyebûn û ketîbûnê dinirxînim. Li holê kesayetek paşverû yan jî kombûna kesayetan û astek civakbûnek pir paşketî heye. Hêj xwe ji girêdanên pêwendiyên hêsan ên qlan û xwînê qut nekirine, siyasî nebûne, serwextiyek felsefî û siyasî ne jiyane. Ev jî bê siûdiya me ye. Em neçarin van hinekê ber bi terbiyê ve bikişînin.

Ya rastî me ji hêla siyasî û felsefî ve pêş bikevin derfet dabûn, dikariyan bixwînin û xwe perwerde bikin. Di vê mijarê de weke mînak, tevî derfetên herî kêm ên zanyar, bidestxistinê, ji bo em xwe perwerde bikin, me diyar kir ku çawa pirtûkên felsefeya burjuva û herî dawî jî nirxandinên sosyalîzmê digirin nava xwe xwendin. Heta ku serwextbûn çênebe, hûn nikarin wate bidin zagonên civakî, ji bo hûn wate jî nadin, hêza we têrê nake ku pratîkek watedar pêş bixin. Şûnve jî fêlbaziya gundîtî, bûna aqilmendê gundiyan dimîne. Em çiqas dikarin bi aqilmendiya gundî û dikandarên xwe ve şoreşê pêk bînin? Çiqas dikarin ji pirsgirêka netewî re çareseriyê pêş bixin? Çi feydeya aqilmendiya van heye? Ev ji her hêlê ve tine bûne, bîst û çar demjimêran rizgar dikin an jî rizgar nakin.

Em diyar dikin ku, we xwe ji bo doza netewî û çareseriya pirsgirêkên netewî daye pêş. Ez dihizirîm qet nebê ji bo vê dê wêjeya partiyê bixwînin û ji bo xwe ya hewce derbixin zanebûnê. Mixabin ew jî ecêb dîtine, heta avêtine aliyekê. Gelek dahûrînên me kirîn hene, qet nebê li hember van pirtûkên hatîn amadekirin

baldar bin û xwe pêş bixin. Kesên ku hêj girêdanên xwe yên bi êl û binemalî ne dahûrandî, xisletên bingehîn ên girêdana netewî berçav nagire, dema firsend dibîne di ruh de binemalparêz, herêmparêziyê derbas nake, dema firsend dibîne hestên xwe di asta herî ketî de dijî û nikare xwe ji vê rizgar bike, dikarin behsa kîjan şoreşgerî û kîjan rizgariya netewî bikin? Pêwîste mirov hedê xwe bizane û bikare van pirsan ji xwe bike. PKK mezine, lê ev nayê wê wateyê ku hûn jî mezinin. PKK ji pêşketinek diyarker re rê vedike, lê nayê wê wateyê ku hûn jî ji pêşketinên wisa re rê vedikin. Nexweşiya herî mezin hûn dijîn di vir de ye. Ev xisletek berfirehe. Jixwe sedema ev kesayet di carekê de xwe bi hezar kesî didin pejirandin, ev e. Asta qelsî û paşverûtiyên heyî, ancex dikare mafê jiyanê bide rêberên wisa û derfetên serkeftinê bide. Lê em neçarin vê derbas bikin. Tevî hemû sondên hatine dayîn, yên ku hêza wan têra nûnertiya rêbertiyek rast dike, hejmara tiliyan derbas nake. Em li vir behsa kesayetekê yan jî kêliyekê nakin. Ger em rê li ber van nêzîkbûnan tevan negirin, em ê ji hemû paşverûtiyên civakî û bermahiyên paşverûtî, nûnerên ji asta pêşketina netewî û civakî ketîtir dikevin re rê vekin. Li hember ferzkariyên wisa, ger em partiyê xurt nekin, rizgariya netewî û serkeftina wê danin aliyekê, dibe ku em her çendî bi sînordar jî be netewbûna ku vebûye, derfetên pêşketina bîrdozî û siyasî jî ji holê rakin. Lewra pêwîste hûn van xalan fêm bikin. Pir girînge ku nûnertiya partiyê bê kirin. Em ê çi navî li kesên ku di bin bandora hest û reftarên xwe de dimînin û bi van ferzkariyan re lihev dikin, dibin amûr an jî bêxîretiyê dijîn û xwe davêjin erdê bikin? Em bi vê dikarin kîjan şoreşê bikin?

We bi salan dûyê cixarê firda, ketin deryaya xeyalan, ber bayê hinek hestan berda û heta roja îro hatin. Mixabin we xwe neda perwerdeyek dagirtî û rêxistinbûnek têrkar. Em berpirsyariya xwe ya li hember dîrok, gel û civakê dizanin. Em dîrok û civakê fêm dikin û dikarin bersiva ku hewce dike bidin. Me ev pêk anî jî. Lê belê em nikarin wate bidin vê rewşa we ya xwe evqasî nexweş dike û dixirikîne. Dema van vedibêjim, hûn weke nûnerên van hemû xisletên paşverû yên pêşberî min radiwestin. Ev rewşa we pir şênber û bê nîqaş dide diyarkirin ku hûn ji aliyê derûnî ve çiqas

nexweşin, qaşo ferasetên we yên siyasî jî çiqas tine dikin û hûn xwe dispêrin xisletek civakbûnê ya paşverû. Çawa hat bîra we hûn evqasî hêsan şerê desthilatdarî bimeşînin? Hûn ji kur fêr bûn şerê desthilatdariya gel û şerê desthilatiya partî ya navxweyî wisa hêsan bigirin dest? We ev ji nav pirtûkên kîjan dibistanê xwendine û kî fêrî we kiriye?

Ez ne weke we me. Ti cihek pê ve ne hilkişiyayîm nemaye. Hûn jî dizanin çiqas hizirîme, ji çiya heta kevir, ji gur heta çûkan çawa min hewl daye ji hemûyan hinek tişt hîn bibim. Vêca hûn hatine, bi hemû nezantiya xwe, hemû azwerî, hemû hest an jî bê hestiya xwe, hemû êş û bêrehmiya xwe, hemû tirs û qaşo wêrekiya xwe ve dibêjin; “Me rake.” Ji bo vî karî pêşî terbiye hewce ye. Kes nikare we bi vî halê we ve rake.

## Hêza Pêşeng Nebe Civakek Azad Jî Nayê Avakirin

Bi perwerdeyê xwe li gorî pêvajoyan amadekirin pir girînge. Hûn nikarin bi rêkûpêk perspektîfekê jî pêk bînin. Ya herî zêde hûn dikin mirina erzane. Ger hûn nikarin li ser jiyanê hukum bikin, em ê çi ji we bikin? Nexweşiyên di nava civakê de fêm dikim, lê ez ê çi ji nexweşiyên nav partiyê bikim? Ez ê çi ji kesê ku nikarin di mercên guncav de ewlekariya xwe berçav bigirin bikim? Ya rastî nexweşên di nava partiyê de ji nexweşiyên nav civakê kembaxtirin. Yên partiyê vediguherînin nexweşxaneyê ne kêmin. Niha hemû qad tam anîne rewşek warê nexweşan. Ez van kesayetan di axaftina wan a destpêkê de nas dikim. Qaşo em artêşbûnek leşkerî ne. Leşker çawa daxive? Leşker dev jê berdin li beramber kesek weke min berpirsyar, kesayetek hema li beramber her tiştî di tetîkê de amade ye. Mixabin rewşa yên me çavlixewin, weke kesek ji ser hişê xwe çûyî, bêhalên salane. Partiyê weke warek tedawîkirina hemû dert û birînên xwe yên kevin dibînin û dixwazin vê kûr bikin, dibêjin; "Bila partî me xwedî bike." Partî ne cihê li te nêrînê ye. Partî rêxistinek li civaka nexweş dinêrê, civata rizgarvana, civata doxtorane, ango ne cihê nexweşxanê ye. Hemû endamên partiyê xwe digihînin hawara mirovên nexweş. Nabê ku di nava partiyê de bê gotin; "Ez nexweşim." Ma çi mafê we heye hûn xwe wisa nexweş bikin an jî weke nexweşan bidin diyarkirin?

Di vê mijarê de çewtî û ji rê derketinên cidî hene. Wisa ne nexweşin, dema firsendê dibînin an jî li gorî wan e dibin cinawir. Di vir de xapandinek heye. Hûn jî dibînin, em neçarin di nava partiyê de rast bijîn. Ger hûn wisa nekin, hûn nikarin ji bin vî karî derbikevin û em ê jî bela xwe ji hev venekin. Kesê ku xwe ji bo têkoşîna nav partiyê amade dike, hesabê dawiya wê dike, qet nebê pêwîste xwe bike hêza lêdanê. Wê encama her gotina hûn dikin hebe. Dema wexta wê hat û we bi hinek helwestan re jî têkoşiya,

hesabê dawî ya vî karî bikin. Li gorî ku ez evqasî hesabê vê dikim, hûn ê çima hesabê nekin?

Partî kirina nêvengek velveleyê, karê sîxurane. Partî bi pirsgirêkên ne di cîh de û bê wext ve mijûlkirin, karê şerê derûnî ye. Lê belê milîtanê me yê herî pêşketî, tiştên ku hemanên şerê derûnî yên herî pispor nakin, pêk tînin. Gelo hûn ji bilî vê, ji bo çi hene? Her gotina we ya ne di cîh de, her gava we xizmetê ji dijmin re dike. Dibe ku ez jî wisa bim, ango dikarim xwe hinekê hestiyar bikim, çend rondikan bibarînim û we bandor bikim. Bes dizanim ku ev di quralên şerê me de ne raste. Dikarim her roj sînorên nebesiyê wisa tengav bikim, lê ji roja destpêkê tevlî vî karî bûyîm heta niha, min nexwest yek kêliya xwe jî wisa diyar bikim.

Di mercên herî rehet ku hûn bikarin têrkar bin de, ger hûn evqas nebesiyê bijîn, ev dibe felsefeya kî? Ger karê herî rehet hûn bikarin bikin, nekin û navê vê jî bikin nebesî, ev dibe çi? Bi mirov re hinek wijdan çêdibe. Ger hûn bêjin; “Ez ê birokrasiyê bikim, mewkîperestiyê bikim”, hûnê bi vê çi rizgar bikin? Ketîbûna birokrasî û mewkiyê çi rizgar dike? Jixwe hûn nizanin mewkîperestiyê jî bikin. Hûn hêj wateya têgeha mewkîperestiyê nizanin. Hûnê van tevan fêr bibin.

Ev pirsgirêk hemû me mijûl dikin. Hewldanên me ji bo partiyê dayîn, ne ji bo sererastkirina çend kesane, ji bo pêşwazîkirina pêvajoyek tevê ye û derbaskirina paşverûtiya li ser netewbûnê tê ferzkirine. Kesayeta ku xwe li ser partiyê ferz dike, rewşek ji rêzê ferz nake. Ne tenê kesayetê, nexweşiyek derûnî ya ji rêzê ferz dike. Paşverûtiya we, gundîtiya we ya hêsan a netewbûn û partîbûn pêk ne aniye, burjuvatî û bêrîkirinên we yên erzan, ji xwe re dike palpişt. Ev çîrok, di dîrokê de gelek caran hatiye dîtin.

Kesên ku ji zehmetiyên şoreşê tengav dibin, her tim di nava daxwazkariya îsyana dijber de ne. Ev, di dîroka tevahî provakatoran de heye. Zehmetî û bêrehmiya pêvajoyê jî dizanim. Lê ev bi temamî veguhertina îsyanek dijber, nêzîkbûna ku dijmin di tevahî dîrokê de ceribandiye. Dihizire ku yên şoreşê pêk tînin pir diwestin û dema tengav jî dibin wê bertek raber bikin, lewra zilamên xwe dişînin nava partiyê û nêvenga me tehrîk dikin. Paşê jî

zagona poşmaniyê derdixin, banga vegerê dikin û em baş dizanin ku ev çawa li ser me tê ferzkirin. Lewma nêzîkbûna weke; “Em li dervî jiyana partî û leşkertiyê ketin”, tê wê wateyê hûn ji bo xwe îsyankarek dijber digerin. Hûn ê pirsgirêkê wisa fêm bikin. Ger we hinekê dil û mejiyê xwe şiyar kiribe, ma we ne dikariya rêya berxwedêriya miletekê bibînin û refên xwe sererast bikin? Wisa tê fêmkirin ku, tişta li ser me tê ferzkirin ev e: Zehmetî pir zêde ne, bi şêwaza şoreşgerî ev kar nayên serxistin, netewperestiya paşverû nayê derbaskirin, pêwîste heta dawî bi netewperestiya paşverû û polîtîkayên mêtîngeriyê re lihevkirinek çêbe. Reformîzm nayê derbaskirin, pêwîste heta dawî bi ferasetên burjuvaziya biçûk re lihevkirinek çêbe. Li vî welatî rêbazên şoreşgerî zêde encam nadin! Heta dawî bi rêbazên reformîst re, gotinên weke; “Şêwaza jiyana şoreşgerî ya heyî pir zehmete” kirin, bi reva ji jiyana şoreşgerî re lihev bike û heta derfetên ku şoreşê bi kedek bêhempa ava kirîn belav bike, rêbertiyek taktîkî qaşo afirîner a van tevan esas digire bijî, bi nêzîkbûnek wisa xwe bike rêber û weke derdorek xwedî helwest ava bike, paşê jî bêje; “Vaye ev encam dide.” Di encama ev derbixe holê de hedefên dîrokî û civakî nayê gerîn. Kesê ku dixwaze xwe weke sîxurekî pêşkêş bike jî, xwe ji rewşek evqas paşverû re vekirî nahêle. Kesê hewl dide xwe bifiroşe jî, pirsgirêkan bi tevdîrên aqildarî ve digire dest.

Zehmetiyên me hene û wê her demî jî hebin. Min zehmetiyên pêvajoya netewbûnê her du peyvên destpêkê derxistîn holê de vegotin. Em dizanin ku wê zehmetiyên çalekiyên vê çawa bin û partîbûna bi me re jî bi parçekirina girêka kor a hezar salî ve pêk tê. Baş dizanim ku ez ê partîbûnê, bi kesên ku tu serê wan jê bikî partîbûnê pêk nayînin, di nava recima qlanê de bi paşverûtiyên xwe ve xeniqîne re saz bikim. Mirov derfetek di nirxa zêrîn de jî pêşkêş bike, ev kesayet nizanin li wê binêrin, lê ger tu cixareyekê pêşkêş bikî kesayetên wisa çil teqleyan davêjin. Em tevî hemûyan partîbûnê pêk tînin. Hewce nake em bêjin dijmin çawa nas dikin û taktîkên afirîner ên şoreşa me çine. Lê belê hûn wan jî nizanin. Taktîk jîndarkirin li ku re û hûn li kurin? Kesê ku tevî li serê çiyane lê nikare vesazbûnek ji rêzê jî çêbike, dikarin behsa kîjan taktîkî

bikin? Kesê nekare bi rêkûpêk hesabê hêza çekekî bike, dikarin behsa kîjan taktîkî bikin? Em dikarin van tevan jî vebêjin, lê belê wê çiqasî bi bandor be?

Ser pirsgirêkan evqasî bigire û ji rê derbixe, paşê jî me bikişîne nêvengek nîqaşê. Ev dişibe şêwaza Komara Tirk a rojevê berovajî dike. Komara Tirk her roj rojevek nû derdixe. Di nava hefteya dawî de, gelo hûn dizanin Komara Tirk kîjan rojev berovajî kiriye? Ez bi xwe jî zehmetî fêm dikim çawa vê rojevê berovajî dikin. Tişta yên me jî rojane dikin, berovajîkirina rojeva şoreşgerî ye. Ji ber ku dil û mejiyê we rojeva şoreşgerî ranake, hûn berovajî dikin. Lê em neçarin a zehmet esas bigirin, ji ber ku ji bilî vê em nikarin ji bin vî karî derbikevin. Ger hinekê li hember rastiya xwe ne şiyar bûma, wê hezar carî ez jî berovajî kiribam, ez ê kişandibam nav rojevek din û fetisandan. Jixwe di hinek raporan de rojev ji çil aliyan ve hatiye berovajîkirin, vale me didin nîqaşkirin û bi dûelloyan ve didin mijûlkirin. Hema bêjin raporên ji her qadê tên hinekê wisa ne.

Di bin navê taktîk de hinek karan dikin. Ger bi wê ve asê bimînim, bese ku ev me tine bikin û di têkoşînê de xeteriyek pir cidî ava bikin. Dibe ku ev bêjin min jî di radeyek mezin de dixapînin. Dibe ku niyeta me ya rêhevaltî di astek bilind de jî bikar anîbin. Lê dikarim bêjim, bi temamî radestî van nebûme. Hinekê firsend dîtine, hewl didin me bi rêbaz û bandorên pir zirav ve radest bigirin. Qaşo dê wisa partiyê bikin qurbana taktîkên xwe. Ger em hinekê ne şiyar bin, kî dizane wê me çiqas şaşî kiriban. Jixwe ya we ne şaşî, di rojekê de deh carî radestbûne. Kesayetê ku evqasî li hember nirxên xwe yên siyasî ku şoreşgerî ne tawîzkar nêz dibe, di wateya siyasî de ne ketiyê kolana ye, çiye gelo? Pêwîste rêgezên we yên siyasî yên dev jê nayê berdan û reftarên we yên pratîkî ku hewce dike hûn bi aheng bijîn jîndar bibin, da ku hûn nebin ketiyên kolanan. Ma ji bilî vê em dikarin we rizgar bikin? Hûn dibêjin; “Partîbûn pir hêsane, mirov dikare hêsan nûnertiya karan jî bike.” Vêca ev çi derew-merewin? Ya rastî derewên mezin hene. Hem hûnê bêjin; “Qut bûm, qut dibim”, hem bêjin; “Di nav de me, mijûl dibim”, hem jî behsa navên navbeng bikin û bêjin; “Kesayeta min.”

Ma mirov evqasî derewker dibe? Berovajîkirin û sextekarî dibe, lê ma evqas tê kirin?

Xwe ne gihandina siyasîbûn û xetê, nexasim çend gotinan bigire jî, hêza pêkana wê raber nekirin û şiyar nêzî gelek xalan nebûyîn mijara gotinê ye. Ger em merheleyê wisa derbas bikin, wê çalekiya we ya dîrokî vale biçe. Nabê bê gotin, radestî û îxaneta netewperestiya paşverû lihevkirine. Wê ji her cure şer rev bê jiyîn, dervî şer bimîne û xirabkirina kesayeta şer re, nabê bê gotin rehetkirina jiyanê ye. Nabê ji her cure pêwendiyên erzan ên dewletên mêtînger re, bê gotin hostatiya taktîke. Nexasim di nava partiyê de ji kûrkirina xweperestiyê re, nabê ku fermandarî bê gotin. Di encamê de wexta ev hemû tên gel hev, derdikeve holê ku ev ferasetek e. Dema dibêjim encamên van ferasetan bibînin, hêj bi ser wan de neçûyîn, tofanê radikin. Ti endamê partiyê xwe nayînê vê rewşê. Kesên partiyê hêsan digirin dest, partîbûnê erzan digirin dest, dawiya wan xeternake. Kesên çeper, mewkî, raye û berpirsyariyên xwe çarçûr dikin, nêz-dûr wê bikevin vê rewşê. Wê hemû bêrîkirinên wan di qirika wan de bimîne. Jiyana wan veguhere dojehê û bi lenetî bin. Ti karê wan rast nameşe. Jixwe yên li ser xeta xwe nebesin, zêde nikarin bijîn.

Em nikarin bibin eşîret, el û malbatiyê bikin. Yên li Kurdistanê vê herî baş dikin jî bela ne, hevkarên herî xeternakin. Kesên di malbatperestî û xweperestiyê de israr dikin, herî zêde ew hewl didin xwe bi dijmin bidin pejirandin. Di mercên mêtîngeriya heyî de, ji vê pêşdetir jî naçe. Hinek çeperên şoreşê weke wehşiyan çarçûrkirin, xirabiya herî mezine. Hinek bi van helwestên xwe ve, derfetên rêxistinê parçe parçe dikin. Jixwe ev xwe birêxistin nakin, naxwazin feraseta raye û berpirsyariyê jî binasin an jî bi şêweyek herî xirab bikar tînin. Bi vî rengî jî derfetên partî yên heyberî didin windakirin. Kiye çek û pereyê xwe baş bikar tîne? Gelo we perwerdeyek ji rêzê jî meşandiye? Dema hûn firsenda perwerdeyekê digirin, dikarin sekna xwe jî rast binirxînin?

Ji van hemû nêzîkbûnên we jî derdikeve holê, we hilbijartinek pir şaş kiriye û rastiya şoreşê pir şaş digirin dest. Hilbijartin û tevlîbûna we ji bingeh ve lewaze, ji lewaziyê jî wêdetir pir şaş û bi

macera ye. Bi salane mêtînger dibêjin; “Hûn nikarin bibin netew, nabê ku nasnameya we bê bilêvkirin” û ev heta roja me jî ferz kirin. Tevgera me jî, tevgera li dijî vê ferasetê ye. Me fikra vê û pêwîste gavên vê çawa bên avêtin derxistin holê. Lê mixabin nebesî û xeta navîn a hûn hêjayî xwe dibînin, hemû nêzîkbûnên neyênî yên bi gazind, encamên êrîşên dijmin ên hezar salî rave dikin. Encama axîna weke; “Em nikarin bibin netew û miletek azad” vê rave dike.

Nepêkanîna partîbûnê, tê wateya; “Em nikarin bibin hêza wê ya pêşengî” ye. Kesên dibêjin; “Em nikarin bibin hêza pêşeng”, çawa dikarin bibin netewek serbixwe, miletek serbixwe, civakek serbixwe û azad? Şûna ku pêwîste her kes kêm-zêde afirîner be, nizane ya amade jî biparêze, li hember vîna mêtînger hûr dibe diweşe. Lewazî û gilî-gazind jî raveya vê ne. Raveya van teva heye. Ev sedem tev, partîbûnek bê eman ferz dikin. Tam jî di vê xalê de hûn dibêjin; “Nikarim tevlî partiyê bibim, nikarim tevlî perwerdeyê bibim, nikarim xwe birêxistin bikim.” Lewra rewşek pir giran dijîn. Li cem me gotinên wisa nayên kirin û reftarên wisa di kêliyan de jî nayên raberkirin. Rewşa ku ev ferz dikin, rewşek civakî ya ji hovîtiya ji gundîtiyê jî wêdetire. Lihevkirinek ku em nikarin reformîst jî bi nav bikine, lê belê serê vê diçe xwe dispêre dijmin. Ger hûn şiyar nêz nebin, wê hemû şervan di demek kin de li ber ba bikevin û vegerin. Nabê ku ev weke çarenûse li ser me bê ferzkirin. Di encama hûn van xalan sivik digirin dest û ne bi rêgezin, ji bo partiyekê ev tirsnakin.

Hûn ê dersa partiyê tam bigirin. Dersa partiyê, dersa jiyanê ye. Dema em di vî rayê de xwîn bidin sekinandin, wê laş di yek çirkeyê de têk biçe, ji bo jiyana netewî ya azad jî dema em partîbûnê bidin sekinandin, em ne endamên partiyê bin, tê wateya rayê me sekiniye an jî hatiye birîn. Ev pênaseyek raste. Ger em behsa jiyan û azadiya jiyana rizgariya netewî dikin, zanista vê wisa ye. Tişta em dixwazin derbas bikin, hemû xal û aliyên ku sedî salin rizandinek kuştinê, hûn nûnertiya wê dikin û we ber bi mirinê ve dibine. Ger em van ranekin, dê ev bibe şaşiyek mezin. Di dîrokê de, di kêliyên rewşên wisa de çi dibe, wê ew jî bê serê me. Em jî dixwazin vê rawestînin.

Hûn ê bi aqil bin. Hûn dibêjin; “Em ciwanin, xamin û hestiyarin.” Hestê herî mezin û dildariya mezin, rawestandina vê îmhaya ku li ser jiyanê tê ferzkirine. Çelengiya herî mezin di vir de ye. Ji bilî vê ti hest û jiyan nîne. Hûn ê cidî bin, bizanin rêxistinkirî bin û girêdayî armanc bijîn. Wexta hûn vê nezanin, ji rezîltiyê jî wêdetir hûn mirîne. Hûn ji min wêrekiyê dixwazin. Hûn ê bi xwe wêrek bin, ji ber ku hûn pêşengê jiyanê ne. Hûn çima me wisa bi rewşên vale re mijûl dikin? Hûn bi xwe neçarin li nexweşan binêrin û gelê xwe tedawî bikin. Perwerde, rêxistinbûn û rêveberî ji bo vê ne, partîbûn jî ji bo vê ye. Bi rastî hêjî çima hûn hewl didin min bixapînin? Rabûne her cure derkirin û tasfiyekariyê bi rêbazên cur be cur ên zirav ve pêşkêş dikin. Hûn ê bizanin li ser vî bingehî bibin netew, bibin endamê partiyê û bibin mirov. Hinekê li hember xwe rêzdar bin, ger dildariya we di vê mijarê de bi bandor be, wateyekê rave dike.

Kiye partîbûnê pêk nayîne? Kiye xeta partiyê ya saxlem esas nagire? Xwe weke dînan avêtine naverastê. Ez ê çi ji şervanên wisa bikim? Donkîşot jî wisa şer nedikir. Em neçarin aqilmend bin. Ger ferasetên we yên macera û xeyalperest hebin, yekser derbas bikin. Ger reftarên we yên tirsnak hebin, yekser bidin rawestandin. Ger hêz û dilketinên we hebin, bi hîmdar li ser pîvanên partiyê lêhûr bibin, wê ji xwe bipirsin û wê ser bixin. Êdî hûn ê hişê vê bigirin. Bi fêmkirina rastiya Rêbertiyê re, hûn ê hêza pêkanê jî raber bikin. Xisletên vê kesayetê yên netewî, demokrat, siyasî, rêxistinî, çalekgerî, enternasyonal, dij-emperyalîst, dij-feodalî, dij-hevkarî hene. Dîsa ev kesayet li dijî qelsî, ketîbûn û kêmbûnê ye. Hûn ê xwe nêzî van xisletan bikin û yekbûnê ava bikin. Ev partîbûne, netewbûne û bûna Kurdek bi namûse. Ev aresteyî ber bi jiyana cewherî û serbilindbûnê ve ye. Qet nebê baldariya ku hûn li hember fêrbûnek xwe ya hêsan raber dikin, hinekê jî li vir raber bikin.

Hûn jî dibînin çawa birêxistinkirî me û çawa li ser linga me. Dibînin ku çi erê dikim çi na, dibêjim çi derbas dibe çi derbas nabe, çi dibe çi nabe, çi ser dikeve çi ser nakeve û çi raste çi şaşe. Her kêlî nebêjin min fêm nekir û nas nakim. Jixwe ez jî, xwediyê xizmetekê me. Di gelek xalên ku hûn pêdivî pê dibînin de, ez

xizmetkariya hevalbendiyê dimeşînim. Ger baweriya we bi vê heye, hûnê jî xizmetê ji hinek nirxan re bikin. Hûn ê van li her derî û her demê fêm bikin. Ger hûn piçekê jî li hember xwe rêzbar bin, hûn ê ji bo wê bijîn. Yek kesê bêje; "Ez jî di vê jiyanê de bibim tiştek" hebe, ev firsendeke, vebijêrka jiyanê ya yekane ye û hûn ê vê binirxînin. Partîbûn jî ev e. Hûn ê li ti cihî û ti demî nebêjin; "Min hêjî ji partîbûnê tiştek fêm nekiriye, fêm kir lê belê pêk ne anî, ez xapandim û min lihev kir." Berovajî hûnê bêjin; "Min partîbûn pêk anî, ez ê her derê û her wextê ji bo xebatan bibim hêz" û vê jî di pratîka xwe de diyar bikin. Rêya bûna mirov û egîd, ev rê ye. Heta ku em sax û selamet bin, ji bîr nekin em dikarin vê bimeşînin. Bi nebesiyên cidî ve dernekevin pêşberî me, ji ber ku em napejirînin.

Li cem me tengavkirin nîne. Karên ku hûn bikarin bikin, karên dilnizm û biçûk hûn bi hêza xwe ve dikarin deh qetî zêdetir pêk bînine. Ti carî karên ku hûn nekarin bikin, neketine rojeva we. Min hemû zehmetiyên vî karî kiriye para xwe. Karê herî zehmet rakiriye, min hinek kar ji we re pêşniyar kir û we jî pejirand. Nexwe li gorî wê bijîn. Em ti caran hunerek weke xapandinê li ser xwe û derdora xwe ferz nakin. Her cure ji rê derketin û çewtbûn mîrasa xirab a sedsalane. Cewhera me ya ku li ser rastiyan serwere, li her derî hêza me û hostatiya ku wê jîndar dike heye. Wê ev jî we bilind bike, rûyê we ber bi jiyanê ve bizivirîne. We bigihîne rêzdarî, hezkirin û jiyanek serfiraz. Ji bilî vê hûn nikarin ti rêyê bipejirînin.

Dersa herî bingehîn a partiyê, wisa dersek jiyanê ye. Her tişt ji bo serkeftina vê dersê ye. Em ê bibin şopdarê vê jiyanê û ser bixin.

**8 Adar 1994**

## PKK PARTIYA KEDÊ Û KEDKARA YE

Bi mebesta roja kedkaran carek din hevdîtina bi we re bi mane ye. Dîsa dema em dikevin vê meha girîng a pêngava biharê bi pêşxistina pêşengiya partiya me ve bersivdayîn, di şêweyek girîngiya wê ya nav-netewî zêde dibe de bersiv dana sosyalîzmê jî pir manîdare.

Bêguman bi qasî aliyê netewî ya lêhûrbûna têkoşîna me ya zêde, ewqas jî aliyê wê yê nav-netewî jî girîngiyê bidest dixe, xwe bi hemû giraniya xwe ve dide der. Bi qasî sekna dijmin, sekna dostan jî xurt dike. Dema gelek helwest û nêzîkbûnên kevin derbas dibin, helwest û nêzîkbûnên nû jî pêş dikevin. Berî her tiştî me ev di nava xwe de jiyan kir. Me bi wêrekiyek mezin hewl dan pêşengtiya xwe ya partiyê li ser bingeha aligiriya kedê û xwediyên kedê pêş bixin. Bi qasî parastina jiyana azadiya xwediyên kedê û ramanên wan ên cîhanî, ewqas jî nûnertiya destkeftiyên wan ên pratîkî jî kirin, gavên mezin bi me dan avêtin. Partiyê ji vê hêlê ve destkeftiyek pêşveçûyî û nûbûna ku vê hewce dikir jiyan kir.

Ev pir baş tê fêmkirin ku, heta partîbûnek baş çênebe, em kesayeta partiyê ji her hêlê ve bi xwe re ava nekin, dev jê berdin şerê heyî bêmeşînin, em nikarin xwe li ser lingan jî bigirin. Dahûrînên hatine pêşxistin ev derxistin holê: Kesê xwe ji rastiya partiye qut dike, li hember rastiya partiyê ne jidile, bandora partiyê ya birêxistin û ronî dike û di wateyekê de jî ji hêla me ve bandora wê ya kirina mirov û berz dike hîs neke, xwe jî bi wê re ava neke, nikare xwe bûna bela serî rizgar bike. Di vê wateyê de partî siparteka herî bingehîn a her kesê dixwaze ser bixe, bidest bixe û xwedî li jiyanê derbikevê ye. Niha baştir tê fêmkirin ku çiqas girînge em çima xebatên tevê jî girêdayî vê digirin dest, bi israr li ser pêşengtiya partiyê -nexasim sala dawî ya derbasbûyî-rawestiyan, hem jî ji bo çareserkirina hemû neyêniyan bûye xeleka herî bingehîn. Ger bal bê dayîn, helwestên ku ti carî serkeftin bidest nexistîn, hîn xirabtir rê ji her cure tasfiyekarî û rasgeriyê re vedikin,

xirabkirina partîbûnê, li pêş partîbûnê bûna asteng û ji wê qutbûnê weke helwesta sereke ji xwe re esas girtine.

Helwesta ku ji kesayeta partî ya rêxistinkirî û hevbeş dûr disekine, tê wateya destpêkirina her cure xirabiyan. Em jî pir dijwar dibînin. Kesê ku bi pîvanên partiyê najî, em şerê çekdarî danin aliyekê, ji jiyîn û pêşxistina jiyanek asayî ya civakî jî dûre. Kesayetên ti carî nikarin partîbûnê pêk bînin, pirsgirêka me ya herî bingehîne û heta ev neyên derbaskirin dev jê berdin destkeftiyên nû bên bidestxistin, hîn ji niha ve em dibînin wê destkeftiyên heyî jî neyên parastin. Di nêvenga me de ji encama xirabûn û seresertiya kesayeta partiyê, xetimandin tên jyîn. Ev ne rewşek wisa ji rêzê ye, bandorê wê dikare li pey hev gelek nîqaşan vale derbixe û helwestên wisa ne, dikare ber bi xirabûnek gelemperî ve jî bibe. Bêguman bingeha vê ya çînayetî heye. Em dizanin ku çîna navîn di vê mijarê de pir dixwaze li ber xwe bide, gelek astengiyan derdixe, karan xirab û jihev dixe, pir nebes dihêle, zerara ku dijmin jî nekare bide ew dide.

Ev derket holê: Di şênberiya partiyê de bûna endamek partiyê yê baş, ya rastî wate dayîna her cure pêşketinên mirovî, civakî û netewî ye. Kesên di vê mijarê de berpirsyarî najîn û pêdiviyê wê hîs nakin tevî vê xwe didin jiyîn, bi serûber nebûna xwedî kedekê, em dibînin ku dibin diz û nikarin wêdetir jî biçin, nikarin xwe ji bûna kesên kedxwarî bi nirxan dilîzin rizgar bikin. Lewra xisleta çîna partiya me pir girînge û hemû pêşketin jî bi vê ve girêdayî ne. Heta ku girêdana PKK'ê ya bi kedê û pêwendiya wê bi keda şoreşgerî ve neye fêmkirin û li ser hemû xebatan serwer nebe, mirov nikare hêjayî partiyê be û nûnertiya wê bike. Xwezayî mirov nikare behsa serkeftinan jî bike. Di vê manê de wisa çeka partiyê hemêzkirin a herî raste.

Di van salên derbasbûyî de ji bo sosyalîzm ji çav bê derxistin hewldanên ku hatin kirin û dûrbûnên ji sosyalîzmê çiqas berfireh hatibin jiyîn, nirxek zêde jî ji nêzîkbûna me ya berxwedaniya em di mijara partîbûnê de raber dikin, nexasim bi derbaskirina nexweşiyên sosyalîzma pêkhatî re hêza xurtkirina partiya sosyalîst raber dikin re tê dayîn. Vaye ev hêjî, bi serkeftî di meşandina

têkoşîna me de dibe sedemek bingehîn. Em di bûna partiya kedê, girêdayî kedê hemû xebatên xwe di ber çavan re derbaskirin, li ser vî bingehî xwe birêxistinkirin, berpirsyarî girtin û mewkî girtinê de bi israrin. Jixwe hîmdara pîvanê jî wisa ye. Em ji her demê zêdetir baştir dibînin wê ji nêzîkbûnên wisa re qîmet neyê dayîn, firsend jê re neyê dayîn û ya hewce dike pêkanînê de jî bi israr nêz dibin.

Partîbûn berdewam dike. Em çeka partiye bi destpêkirinên nû ve sererast û xurt dikin, wisa pêşve dibin. Divê şûnvê neyê mayîn. Kesên ku xwe di vê mijarê de xirab kirine û paşketî hîs dikin, teqez pêwîste partîbûnê pêk bînin. Ji bilî vê ti siûda serxistinê û rê nîne. Pêwîste her kes bikare bi dilnizmî û têrkar di kesayeta xwe de partîbûnê şênber bike. Hewce dike ev weke bingeha hemû pêşketinan bê fêmkirin û li gorî wê heqê wê jî bê dayîn. Divê bê zanîn, rastiya Rêbertiyê jî weke raveya vê ya herî şênber û hûrûkûr, hemû xebatan bi hîmdar girêdayî van birêve dibe û muqate ye. Bi qasî kesayet xwe digihîne vê yan jî di nava vê de dihele û vê dipejirîne, nirx jê re tê dayîn û cihê kes di nava partiye de çêdibe. Dîsa li ser vî bingehî wate dide qedemeya fermandarî. Rastiya Rêbertiyê berî her tiştî berpirsê qîmet dayîna vê ye. Pir baş tê zanîn, heta ku berpirsyariyek wisa çênebe, zehmete ku em îro jî vê avaniyê li ser lingan bigirin. Lewra hema li her qada me ya xebatê, her qedemeya me ya berpirsyarî, di asta têrkar de xwe gihandina pîvanên partiye de, ger pîvan kêm û nebes bin, dihejin ev bê derbaskirin, ji bo her kesê bêje; “Ez endamek partî yê berpirsyarim”, peywira partî ya ku pêşî roj bi roj pêk bînê ye. Lewra divê girîngiyek mezin bide vê, ger di vê mijarê de rewşên weke nebesî û xirabûyî hebin, teqez divê hûn derbas bikin.

Pêwîste her kes xwe ber çavan re derbas bike, ji pirsên weke partî çiye, rastiya Rêbertiyê ya vê partiyê çiye, çawa jîndar bûye, çawa xwe tevlî jiyanê kiriye û jiyanê çawa bi rêve dibe de bersiv bên dîtin. Êdî divê her kes xwe bi rêzdarî, bawerî û serwextiyek mezin ve beşdarî partiyê bike. Di nava vê partiyê de ne bi niyazên ferdperest û sûbjektîf ve zêde pêşveçûn çêdibe, ne jî kes di wateya takekesî de dikare ji destkeftiyekê û rizgariyê re rê veke. Pêwîste em bi temamî vê nêzîkbûna şaş derbas bikin. Êdî misoger divê

nêzîkbûnên ku niyetên xweperest û sûbjektîf derbas nakin bên terkirin. Divê her kes bizane êdî bi van ne dikare di nava partiye de gavekê bavêje û ne jî bi qademeyên berpirsyariyê bilîze. Pîvanên partiyê di qademeyên berpirsyariyên bingehîn de neçarin teqez bên pêkanîn. Pêwîste her kes jî li ser vî bingehî partîbûnê esas bigire.

Nexasim divê em dawî li bandorên çîna navîn ên nêvenga partiye tîne asta nenas de bînin. Pêwîste nêzîkbûn û helwestên pîvanan tevlîhev dikin, şêwaza kar dixin asta nayê nasîn, bi temamî girêdana bi kedê ve ji holê radike, fêlbaziya gundîtî û hîleyên feodalî weke şêwazek polîtîk tên ferzkirin bên terkirin. Demek dirêje çîna navîn ji pir aliyan ve xwe li serê me kiriye bela. Kesên wê yên pir cuda, ya herî girîng jî jixweber li gorî tê zanîn zêdetir em tengav kirin û rê ji gelek zeraran re vekirin. Di nirxandinên me yên berê de kêm-zêde mînakên van derketin holê. Ev hêjî mînakên neserxistin û nepêşxistina jiyanê raber dikin. Taktik rast nepêkanîn û tevlîbûna rast nekirin xisleta vê çînê ye û dixwazin vê jî di nêvenga me de berfireh bikin. Em ji bîr nekin, di eniya me de kêm-zêde pêşketina vê dibe sedem ku ji kontrayan zêdetir zerarê bidin û gelek enî rola xwe nelîzin. Ji kur ve lê bê nêrîn bila be, hemû herêm û qadên me yên ku rola xwe nelîstine, sedema xisletên vê çînê rola xwe nelîstine. Ji bilî vê ti sedema bingehîn nîne, sedemên din talî ne.

Em li kur behsa pêşketinek cidî dikin, li wir pêşengtiya partiyê û kesayeta partiyê heye. Li kur xirabkariyek heye, li kur li pey hev windahî tên jiyîn, li wir kesayeta çîna navîn, her cure xisletên burjuvaziya biçûk û helwestên keyfî xwe didin axaftin. Tevî ku ev qet nehewce ne yan jî rayeya wan nîne, ji ber sedemên helwestên wan ên keyfî her tim herêman têk dibin û derfetên heyî çarçûr dikin. Ger hinekê kesayetên van ên berpirsyar, bi rêkûpêk û birêxistinkirî hebûya, niha wê her qada me di astek bêhempa de meşa serkeftinê pêk baniya. Mezinbûna kesên bê perwerdehî, bi temamî li ser bingeha hevkariyê ye. Ji ber ku ev jiyanek bi her cure keyfiyet û ji rastiyan qut esas digirin, dixwazin di nava partiyê de ji xwe re cîh vekin. Di vê mijarê de rayeyên xwe xirab bikar tînin, derfetên ku tên dayîn jî bêrehm çarçûr dikin.

Niha ev neçarin hinekê xwe binasin. Pêwîste bizanin derfetên partiyê wisa nayên bikaranîn, cixareyek jî wisa nayê kêşan û pariyek nan jî wisa nayê xwarin. Ev partî, partiya kedê, kedkar û kesên xwe tevlî baweriya sosyalîzmê dikine. Ji bilî vê heq û huquqa ti kesî nîne. PKK, ne partiyek eniyê ye. Enî bûyerek cuda ye, me platforma wê jî diyar kir. Weke xebatkarek eniyê tevgerîn, bi pêşengtiya partiyê ve gengaze. Her wiha em her tim diyar dikin ku pêwîste pêşengtiya partiyê çawa tevbigere. Jixwe cihê kesên ku weke hevkaran jî tevdigerin diyare. Em dizanin divê hevkarek li kur û çawa tevbigere. Di pêşengtiya partiyê û qadroyên wê de, wisa ji gotinên weke hevkaran, nizanim filan û bêvan çînayetî re cîh tine ye. Di vê mijarê de lihevkirin nabe. Hema bêjin van partî aniye asta koalisyona lihevkaran, her kes bikare li gorî keyfa xwe, derdora xwe û bandora xwe cîh bibe û koalisyona ku dixwaze wisa beşdar bibe. Xwestin bînin astek rêxistina eniyê. Hêjî bi vê ve mijûl dibin. Ev şaşiyek mezine. Niha ne rêxistinek wisa ya eniyê pêş dikeve, ne jî rastiya PKK'ê vê dipejirîne. Ev pirsgirêkek ji roja destpêkê ve hatî destnîşankirine. Heta ku pêşengtiya partiyê nebe, enî û artêş jî nabe. Enîperest, artêşvanên erzan û kesên dihizirin ku leşkertiyê dikin, pêwîste vê baş fêm bikin.

Hebûna van tevan, girêdayî bawerî û lehengiya keda vê partiyê ye. Dervî vê ne ti tiştin. Yeqîn nakim ev wisa rizgarvaniyek netewî ya cidî û şervantiyekê dikin. Li Kurdistanê hemû pêşketinên salên dawî, heta dîroka hemdem, bi pêşengtiya PKK'ê ya kedê ve pêk hatiye. Lewra pêwîste her kes di vê mijarê de hesabê xwe baş bike, bizane rêxistinek kedê rêxistinek çawa ye wisa beşdar bibe û bizane bi pîvanên wê ve bijî. Em ji bilî vê ti cihê bi şeref nadin kesên hêmanên burjuvaziya biçûk ên nû û xwediyên fêrbûnên hevkarî. Em ê firsendên ku van dema berê girtine cardin ji destê wan derbixin û çavên xwe ji wan re nagirin ku qad û eniyên nû erzan bikar bînin. Em nikarin bipejirînin ku kes xwe wisa bi raye û bandor ferz bike. Pêwîste ev bizanin nikarin qudret û kerameta vê partiyê wisa weke ewliyayên guhêrbaz ji xwe hezkirinê ve binirxînin. Jixwe ne kesayetek û ne jî hêza wan a wisa heye. Ev

rewşek xeternake û xwe xapandine. Ya herî guncav dev ji van helwestan berdane.

Nexasim di salên dawî de kesên ku çek û raye girtine û me jî tengav dikin cewhera vî karî fêm bikin. Di nêvenga me de dixwin û vedixwin, qet nebê bila hinekê li hember vê rêzdar bin. Wisa bûna fermandarê hezar kesî li aliyekê bimîne, pêwîste bûna xizmetkarek ji rêzê jî ji bo xwe nîmetekê bibinin. Di vê partiyê de wisa tê meşîn. Me bi xizmetê ev partî hinekê da pêşxistin. Vê jî xirab nekin, ger hûn xirab bikin em ê jî lîstikên we xirab bikin. Heta hûn dixwazin begtiyê û xweperestiyê bikin, lê nehizirin hûnê bi fêlbaziyek wisa ve rewşa xwe rizgar bikin. Ev rewşek xeternake. Ne hêza we heye hûn wisa bikin û ne jî kes dikare çavên xwe ji vê re bigire. Tenê partîparêziyek rast dikare we bide jiyîn.

Çima hêjî pîvan nayên pêkanîn? Ger hûn pir egîdin, çima we dema berê bi serê xwe hinek tişt nekirin? Hûn ê çeka partî ya mezin bikar bînin û wisa ji xwe re cihekê bigirin, paşê jî taktik û jiyanê nemeşînin û vê jî li hember partiyê weke çekekê bikar bînin. Na, divê ev bêberpirsyarî bê terikandin. Raye pîroze, nirxên ku emanetî we tê kirin pîrozin. Ger hûn bi wan re bimirin û jîndar bibin, hingê berpirsyariya we watedar dibe û em ê jî hingê we cidî bigirin. Bila ji bilî vê ti kes pîvanan ferz neke û ji me jî ti pîvan neyê payîn. Ev partî, ne partiyek wisa gelek ji we dinasê ye. Partî ne baneya bavê wan e. Raye tenê dikare ji bo karekê bê bikaranîn. Ger hûn rê ji serkeftinê re vedikin, dixwazin hinek din bi xizmeta xwe ve mezin bibin, hingê raye wateyekê rave dike û binirxe. Nexwe şoreşgeriya raye kirin û bi vê jî mezinkirina kesayeta xwe esas negirin. Ev tê wateya, şerê bi me re. Jixwe di van demê dawî de pir tê dîtin, her kes li pey derdê rayeyê ye, bê ku xebatek perwerdeyî û rêxistinkirinê raber bike, hema dixwaze serserkî xwe berde nava desthilatdariyê. Her roj wisa ji xwe hez dikin. Bê ku pêdiviyên mezinbûnê pêk bînin, dixwazin yekser mezin bibin. Dema vê jî ser naxin, xebatê xopan dikin, qadan vale dikin û ji bo ti tiştî terk dikin. Mezinbûna wisa nabe û raye jî wisa nayê bikaranîn. Êdî ne gengaze ku kes wisa keyfa xwe bide axaftin.

Pêwîste xeta PKK'ê ya şer û feraseta PKK'ê ya berpirsyarî baş bê zanîn. Em ne li pey nêzîkbûnek hema bi hinekan re nîqaş bikin û hedê wan şanî wan bikine. Lê belê kesên xwe pir fêlbaz dibînin û di asta herî kêm de jî xwedî li peywirên xwe dernakevin, rast nêzî nabin jî divê me baş binasin. Em rêzdarin û pir jî nirxdar nêz dibin. Ev ne ji bo ew bi xwe pir girîngin an jî pir nirxdarin wisa nêz dibin. Ev pirsgirêka uslube, pirsgirêka şêwaza Rêbertiyê ye. Pêwîste di vê mijarê de xwe nexapînin. Ji bo avakirina rêzdarî, peywirên ku pêwîste pêk werin hene û teqez divê wisa jî be. Em jî hewl didin li hember we rêzdar bin, lê em dizanin ku girêdana vê jî bi hinek hêmanan ve heye. Rêzdarî jixweber çênabe.

Pêwîste di vê mijarê de pîvan cardin ber çavan re bên derbaskirin û watedar bin. Em di mijara rastiya partiyê û pîvanên partiyê de tawîzan nadin, pîvanên xwe jî xirab nakin. Qadroyên partiyê bi paşverûtiyan re lihevkirinê napejirîne û bi ferasetên weke eniyê ve xwe xirab nake. Qadroyên partiyê ne rayeyek erzane û wisa jî xwe li ser karan nade razandin. Em yeqîn dikin ku ji bo pêkanîna herî afirîner a sosyalîzmê rê vekiriye. Li hember sosyalîzma pêkhatî ya hilweşiyayî, jiyanek me ya sosyalîst ku pêş dikeve heye. Ev watedare û divê hêjayî vê bin.

Hûn bi israr dibêjin ku bi rastiya Rêbertiyê ve girêdayî ne û di vê mijarê de jî diyar dikin ku jidilin. Ez jî li ser we pîvanan ferz dikim. Pîvanên serkeftinê û asta pêşketina qadroyên partiyê bibîr dixim. Ji bilî vê em nikarin behsa rêzdarî û girêdanê bikin. Ev jî xwe bi pêşketinek li her qada şênber, her eniyê û li her herêma me ya şer dana diyarkirine. Hûnê bi mehan û salan qadekê bi rêkûpêk nedin şerkirin, pêşketinan saz nekin û paşê jî girêdana xwe bilêv bikin. Ev fêlbaziya gundîtî ye, fêlbaziya dikandara ye, pêwîste hûn dev jê berdin. Dikare bi pêşketinan ev bê selmandin. Divê em di girêdanê de jî hinekê wisa bin.

Demek dirêje nirxandinên ku di van mijaran de em bi we re parve dikin, kêm-zêde di hişê we de ne. Teqez hûn bi wan re lêhûrbûnekê dijîn û di xebatên xwe de jî diyar dikin. Hûn hesasiyeta ku di hinek qademeyên berpirsyarî de tên xwestin, berpirsyariyên xwe yên mezin dizanin û pêdiviyên vê jî pêk tînin.

Divê mirov qet di vê mijarê de nede xapandin. Ger ev çêbe, em dikarin giranî bidin alî û şêweyên kar ên din. Ger em civatek rêhevalên baş bin, em dikarin bi tenduristî karen din jî dabeş bikin.

Me bi vê mebestê carek din hinek pêdiviyên partîbûnê yên girîng û dev jê nayê berdan bibîr xistin. Pratika we jiyan jî kirî berçav bigirin, hûn dikarin hinek guhertin û karbidestiyê saz bikin. Her çendî zehmet jî be, divê hûn bikarin di van mijaran de hinek karan bikin. Zehmetiyên şer çi dibin bila be, xetimandina kesan û asta wan a bûhranê, dîsa ji rê derxistin û xirabkariyên çîna navîn çiqas tengav bikin bila be, partî her tim bi qadroyên partiyê re pêvekan jî amade digire. Nexasim her tim qadroyek pêvek ku bikarin dewsa şahadetan qat bi qad dagire û temam bike li ber serê xwe perwerde bikin. Wê ev jî we ber bi serkeftinê ve bibe. Bê ku ti merhele bên taloqkirin, navber bê dayîn û her ku diçe bi kûrbûnê ve, pêwîste hûn di vê mijarê de peywira xwe ya avakirina qadro berdewam bikin. Di vê manê de her ku pêşêngtî saxlem bê girtin, misoger dê ev şer pêş bikeve û bê serxistin.

Di encamê de, yeqîn dikim êdî ji bo di xebatan de bi temamî pêşengtî serwer bibe kamilbûnek heye. Derfetên we yên serkeftinê jî misoger bikin hene. Di vê mijarê de yeqîn dikim wê hemû xebatên we serkeftî bin û baweriya min bi we heye.

**1 Gulan 1996**

## PARTÎ JI MILETEK DIJBERÎ CEWHERA XWE KETÎ RE RÊYA RAST NÎŞANDANE

Pirsgirêka herî bingehîn a di rastiya jiyana me de xwe gihandina azadiyê ye û ev jî ancex bi partîbûnê dibe. Bêguman miletê ku herî zêde bûhrana mirovahiyê dijîne. Ferdên ku ji nav rastiya jiyana miletek wisa jî derdikevin, herî kêm bi qasî wê bi bûhranin û ji bo jiyana xwe bidomînin serî li hezar rêyê didin, lê tê zanîn ku di van hemûyan de dilê wan têşe. Di wateyekê de bi qasî miletek rêya xwe şaş kirî, em jî pir baş dibînin, ferdên civata ku rêya xwe şaş kirî ne. Ji bo dîtina rê ronahî hewce ye. Tenê ronî jî têrê nake. Her wiha ji bo bikare di vê rêyê de bimeşe, hêz hewce ye. Li cihê her kesî rêya rast pejirandiye, pêwîste her kes wê rêya rast bibîne û bikeve navê. Dikare bê gotin, çiqas rêyên şaş ên li dijî cewhera xwe hebin, fikrên şaş û reftarên dirizînin hebin, hemû weke rê ji civaka me re dane pejirandin û ferzkirin. Mixabin kesayetê ku pir belave, pir dijbere, dijberî cewhera xwe ye û ber bi hedefa xwe de çûyînê danin aliyekê, hîn zêdetir ji hedefê dûr dikeve, heta dawî di civaka me de bi bandore.

Di vê mijarê de armancên hewldanên me yên esasî, ango xeta me, ceribandina ku her kesî bigihîne armanc û hedefa wî, di vê rêyê de hêz û rêxistinbûna bikare bimeşe derxistina holê ye. Lewra em partîbûnê bi girîngiyek mezin digirin dest. Partîbûn, rastiya partî jiyîn bûyerek mezine. Partî ji bo rêya wê ya rast şanî miletê ku hatiye mêtînkirin û di vê wateyê de dijberî cewhera xwe ketiye bide û bibe hêza wê ya rêvebirinê bûyerek pir mezine. Em jî hewl didin vê bi we bidin fêmkirin. Hinde hûn ewqas ji rê hatine derxistin, lewaz hiştine û taqet xistine, hûn nizanin windakirin an jî serxistin çiye.

Polîtîka hunerek pir zirave. Partîbûn û rêxistinbûna wê bi serê xwe polîtîkayek hurgulî ye. Wate dayîna vê û hêz têrêkirin, dibe ku pêwîstiya herî bingehîn a mirovbûnê be. Lê mixabin hûn herî dawî cih didin vê, qada herî kêm tê de serkeftîne û zehmetiyan dijîn ev rastiya we ya jiyanê ye. Ji ber hûn bê îdîa, lewaz û bi şaşiyan

dagirtî beşdarî jiyana partiyê dibin, hûn ji destpêkê ve li hember jiyanê bê îdîa hiştine û hûn ê bimînin jî. Hêza xwe têra kûraniya teoriya partiyê, esasên kargeriya rêxistinî ya şênber, siyaset û taktîkê kirin, heta dawî ji bo we zor û bêhntengiye. Ji ber ku dijmin zêde li ser kesayetên we lîstiye û encam girtiye. Di vê wateyê de hûn ji amûr û pratîka herî bingehîn a azadiya we rave dike direvin. Bi vê re jî ji ber ku hûn her cure şaşî û nebesiyên xwe watedar nakin, hûn rastiyê berovajî dikin.

Dema bi kurtasî hewldanên xwe yên çil salî vedibêjim, bi wateyek gelemperî xwe gihandina rêxistinbûnekê, mirovê Kurd qane kirin, ji bo wî ber bi rêya rêxistinê ve bikişîne dibînim neçarim hêjî hewl bidim û weke roja destpêkê watedar bijîm. Hûn rêxistinbûnê tengav dikin, tevlîbûnek we ya rêxistiniyek xurt nîne û di vê mijarê de di nava tengaviyên mezin de ne. Ancex dîsa jî hûn misoger pêwîstiya rêxistinbûnê têdigihin. Wexta wisa jî dibe, ev jî nade diyarkirin ku hûn dikevin nava hewldanek rêxistinkirina baş. Ji ber neçariyan û ji ber ku derdorek we ya din nemaye, dibêjin; “Em endamên partiyê ne.” Pêwîstiya avakirina civakek û rêxistinek ku li ser dihizirim û pêwîste bi keda xwe pêş bixim, ji sedî yek jî we hîs kiriba, yeqîn dikim we dikariya bi hewldanên ji rêzê û nebes jî niha hûn baştir pêşve çûbûn. Mixabin fêrbûnên we yên jiyanê, ji rastiya rêxistinbûnê reve. Çawa zehmete hêştir xwe ji ser xendekê re bavêje, rewşa we ya sazkirina qonaxa rêxistinî jî weke mînaka hêştirê ye. Hûn her tim paşve tên kêşan û radiwestin.

Ne tenê dîroka partiyê, dîroka jiyanê jî berçav digirim. Kesayetên ku rasterast dijmin ava kirine, ji rê derxistine, dîn bûne, gotin û çalekiya wan a rast nîne, ango her ku civat û bîrîmên PKK’ê yên niha dibînim, hewce dibînim bi sebir nêz bibim. Her tim belengaz, tevlîhev û bê çare ne. Kesên xwe dixapînin, ji yên hîmdar girtinê dûrin û dema bi tena xwe dimîne li hember xwe bêrêzin, dema firsend dikeve dest jî dibe kesê herî bê xem, her tim paşverûtiya di dilê xwe de diherikîne û fitne-fesadiyê dijî, weke kurmê jiyana xwe, kesayeta xwe bi xwe dikemirînê di nava me de hene. Ev nexweşiyek mezine. Partîbûn jî, dermanê derbaskirina vê nexweşiyê ye. Pir rehet dibêjin; “Me pîvanên partiyê, jiyana partiyê

derkir û hişyar nêzî pîvanên partiyê nebûn.” Hûn çawa dikarin wisa erzan van gotinan bikin û çima pêdiviyên partîbûnê pêk nayînin? Li gorî we bê partî jiyîn pir rehete, heta dibe ku hîn azadtir be û dikarin bêjin; “Xweseriyê bide me.” Lê belê ev helwest û ferasetên pir xeterin.

Me ji pir aliyan ve têkoşîn esas girt û hinek jî vegot. Em ji we re cureyekê, malbata we re cureyekê, ji dîrok û dijmin re jî cureyekê vedibêjin. Kî ye ev anîne vî halî? Berpirsên van kî ne? Ne raste ku di vê mijarê de tenê mirov bi ser we de bê. Her çendî bingehên we xwe sipartiyê pir hatibin parçekirin, dîsa jî ne raste mirov we weke qurbanê feraseta çarenûsekê bibîne. Ji ber ku kes dikare xwe ava bike û her tim jî pêşketinên mezin ji kes tên payîn. Tevî ku pirsgirêkên we pir giranin û em pirsgirêkên herî bingehîn dixin rojeva we, ji ber hûn li ser van lêhûr nabin, dibe sedem hûn bikevin nav rewşên hîn xirab û hesab bidin. Bi salane ji bo di xala hesab pirsînê de şaşiyê nekim, pir dilpak nêz bûm. Jixwe cara yekê ye em li Kurdistanê rêxistinbûnê pêş dixin. Ji bo em şaşiyê nekin, her tiştî hurgulî dest digirin. Ji ber ku kêm-zêde em dizanin bi kîjan kesayetan re rûbirû ne.

Pêwîste mirov di vê mijarê de ne zimansaf be. Lê carina jî ji xwe dipirsim gelo çiqas dikarim li ber xwe bidim. Şîreta dayîka min wisa bû: “Tu bi van re mijûl dibî, gelo wê ev weke tu dihizirî derbikevin an jî bikarin hewldan û fedekariya tu raber dikî diyar bikin? Tu xeyalên baş dibînî, ev tenê heta feyda xwe digirin bi te re dixwiyên û paşê wê her kes li berjewendiya xwe binêre.” Tişta dixwest bêje, rastiya jiyana me ya hişt a heyberî û materyalîst bû. Ev raste. Lê belê ev rastiya kî ye û rastî xizmeta kî dike? Tevî vê ji wê rojê ve înad dikim. Ev kesayet li gorî dixwazim nabin, bes li gorî xwe bûyîna wan jî kêrî pênc quruşî nake. Ji wê rojê heta niha heman çîrok didome. Vîna şoreşgerî wisa rabû ser piyan. Di demên ku xeyal jî nayên kirin û bi helwestên ku mirov nikare kêlekê re jî derbas bibe de, me dest bi têkoşînê kir. Li gorî min qural û pîvanên hatîn rûniştandin nebes bûn. Ji bo min hinekê dervî quralên gund ên heyî û dîsa quralên bajar ên heyî derketin, dibû raveya azadiya ku xwe ferz dikir. Hêjî bi kûrkirina vê hewldanê ve mijûl dibim.

Gelo hûn vê çawa fêm dikin? Ji ber ku rojane dema mirov li rewşa we ya şênber dinêre, rewşa we heman dişibe zarok û kesên dayîka min di wê demê de ji bo zarok û kesên li pey berjewendiya xwe ketîn gotî ye. Dihizirim ku di vê mijarê de bi qasî misqalekê jî pêşveçûn heye yan na. Elbet, ev nayê wê wateyê ku ti pêşketin çênebûne. Hûn dest bi partîbûnê jî dikin. Di vê mijarê de pêşve jî diçin û fedekariyê jî dikin. Lê belê ev nadin jiyankirin ku xweperestî bi temamî ji holê rabûye. Qaşo xweperestiyê dijîn. Ne zehmete vê zelal nekim. Dema firsendê dibînin bi kariyer û ketîbûnek mezin nêzî erk û raye dibin. Dibe ji zarokekî yan jî berjewendiya zarokekî sed qetî zêdetir zerar û ziyan, di astek bilind de bi berjewendiyekê derdikevin pêşberî me. Berjewendiya zarokan zêde zerar nade. Lê berjewendî û ferdperestiya kesê xwe di nava partiyê de birêxistin dike pir xetere. Hema bêje yê vê neke nîne. Berjewendî ne bidestxistina derfetê jiyanek pir rehet û xwe xurt dana diyarkirine. Koletî jî heta radeyekê berjewendiye, ferdperestiye û bêxîretî ye. Bi çarenûsa xwe razîbûn jî ferdperestiye. Oblomovbûn jî ferdperestiye. Ev hemû heta radeya dawî bi we re bi bandorin.

Lê dîsa jî ev ne çarenûse. Ji ber ku hûn wisa ne, em nikarin li hember ferdperestiya we, dev jê berdin. Jixwe ew roj ev roje şerê min jî di vê derbarê de ye. Hêj di heft saliya xwe de ji roja min li hember dayîka xwe serî hildayî heta roja îro, ez girêdayî rastiya xweperest a jiyana heyî nemam û wisa jiyan nekir. Bi vê ferdperestiya hişk ve girêdayî nemam, min hewl da bibim kesek her ku diçe bi civakî dibe û vê jî bi têkoşîna azadiyê re digire dest û pêk tîne. Ev serhildanek wisa bû.

Şerê min ê çil salî û rastiya ku hûn heta şaneyên xwe dijîn berçav bigirin. Qirêjiya ferdperestiyê, bi qasî dîroka mirovahiyê kevne. Kapîtalîst jî ferdperestiyeke. Karsazên Emerîkî ferdperestên herî mezinin, lê li ser cîhanê hukmê dikin. De ka em li ferdperestiya we ya pir kêm berzbûn, pir kêm hevbeşî, pir kêm rêxistinî û ya herî girîng jî belengaziya we binêrin. Ferdperestiya we berovajî ferdperestiya Emerîka ye. Ferdperestiya yê herî di jêr de, herî lewaz û herî zêde winda dike ye. Jixwe jiyînê zêdetir, bi

perestiya putê hundurê xwe ve ferdperestiyekê dijî û wisa jî bê hejmar her kes li gorî xwe putên wî hene.

Wext û modeya putan derbas bûye. Xweperestina azwerî yan jî fêrbûnên ku ne diyarin xizmetê ji çi re dikin, nêzîkbûnek ji wê nevegere. Ger hûn teqez dixwazin hinek tişt ji rastiya Rêbertiyê hîn bibin, li pîvanên Rêbertî yên min xêz kirîn û pîvanên xwe binêrin, muqayese bikin. Hûn ê bibînin, berovajî hevin. Ez çiqas ji fêrbûnan direvim, hem xeyalî hem jî bi şêwaza fikir çawa her tim bilind dibim, dîsa çawa hewl didim di reftarên xwe de dîsîplîna rêxistinê pêk bînim, hûn jî ewqasî ji van direvin an jî di pêkanîna van pîvanan de zehmetiyê dijîn. Elbet ev xwezayî ye. Ji ber ku rastiya hûn jê hatine, rastiyek di bin bandora dijmin a kûr de ye. Lê belê dîsa jî hûn li hemberî me baldarin.

Hûn pir berjewendîperest û xweperestin. Xwe dana mirinê jî ferdperestiye. Bes bi me re jiyana rast pêkanîn, di wateya xwe dana mirinê de jî dev ji ferdperestiyê berdane. Dema hêza we têrê dike hûn yekser dibin axayê herî xurt, heta dibin rêveberek ku ji dijmin xirabtir. Di vê mijarê de jî dema hûn ji hêz dikevin, yekser xwe terkî mirinê dikin. Vaye ev hemû ferdperestî ne. Her jiyana ku siyaset û rastiya nêvenga rêxistinê berçav nagire ferdperestiye. Mirov dikare di rexnedayînên hûn rojane didin xwe de bibîne ku hûn çiqas di şêwaza xwe de israr dikin û berfirehe. Di vê wateyê de pêdiviya we bi terbiyek pir mezin heye. Lê terbiye yan jî perwerde ji bo we pir zehmete. Hûn bi sêla sor terbiyekirin ne rêbazek raste. Birçî hiştin û êşkence kirin jî her tim şêweyên terbiyekirinê ne. Lê belê şêwaza me jî berovajî ye. Pergalek terbiyê ya ku yek lêdan û heqaret di nav de neyî hewce dike û em jî hewl didin wê bidin we. Ev jî şêweyek terbiya ku hîn zêdetir naskirina cewhera mirov û kesayeta esas digire ye.

Lê hûn dibêjin; “Em ji darkutik fêm dikin.” Mane yên ji axaftinê fêm nakin heqê wan darkutike, hûn heman weke yên ji axaftinê fêm nakin bi darkutikan tên terbiyekirin raveyek şênberin. Bi darkutik terbiyebûn, çûna pratîkê û serê xwe li erdê dayîne. Me gelek dahûrîn pêş xistin. Ev jî şêweya bi gotinê terbiyekirinê ye. Mixabin hûn ti carî ji bo xwe hêja nabînin bi vê terbiye bibin. Wê

teqez tiştek bê serê we, serê xwe çep û rast bidin û paşê jî bêjin em bi aqil bûn. Lê ev ne rêbazek raste. Kesên azadiyê dixwazin rabaza wan a terbiyê ya rast heye.

## Ji Sondê Fêmkirin Di Şêwaza Sosyalîst û Demokratbûnê De Cewhera Pêşketinê Ye

Pêwîste bê pejirandin ku di sosyalîzm û demokrastiyê de sond, amûra terbiyekirinê ye. Ji sondê fêmkirin, di şêwaza sosyalîstî û demokratbûnê de cewhera pêşketinê ye. Lê belê ya ku hûn herî kêm didin an jî di fêmkirin û xwe gihandinê de zehmetiyê dijîn, ev sondên rasteqînin. Wateya vê çiye, em çawa dikarin vê veguherînin jiyanê? Di vir de ti îdîaya we nîne. Heta ku hûn serê xwe li kevirek hişk nedin û gazincan nekin, tiştekê ji jiyanê fêr nabin. Ev jî dibe astek pir paşverû. Mixabin hûn vê hêjayî xwe dibînin, lê divê derbas bikin. Bi salane xalên ku dibêjin, pir kêm bandor dikin. Gotinek herî bi bandor, gotinek bi qasî ayetên Quranê hêja jî, ji bo we xweş nayên. Mînak di nava PKK'ê de we ti caran xwe ne anî asta perspektîfan û encam ji perspektîfan negirt. Lê belê ev axaftinên hatîn kirin tev jiyanî ne. Ji ber bi vê ve girêdayî bin şahadet nayên jiyîn û wê di jiyanê de jî serkeftin li ser serkeftinê bê bidestxistin. Lê belê li şûna vê ya xwe kirin heye. Gelo we bi vê çiqas pêşketin çêkirin û çiqas cidî ne li holê ye. Hûn girîngiyê nadin perwerdê û ya ku amûra perwerdeyê ya herî bingehîne nirxa sondê xistin jî, rastiya herî zêde hûn dijîne. Di wateyekê de rewşa hûn dijîn dilê mirov pê dişewite.

Em jî weke we bûn, di qonaxên cur be cur re derbas bûn. Wê demê kesê tiştekî fêrî me bike nebû, tenê me derdora xwe dişopand. Hêjî dixwazim çend gotinan ji bo we bikim. Ez ez im, ne raste ku ez rabim xwe weke we bibînim. Lê ji ber ku ev jî wisa ye, her tim îdîa dikim xwe li ser bingeha rast dimeşînim û dev ji vê jî bernadim. Dîsa ya herî rast tiştên em dibêjine. Tiştên hûn dibêjin şaşin. Hûn çiqas bi niyaz baş dibin bila be, jiyana we bi şaşiyan destpê kiriye û bi şaşiyan dimeşe. Ger we bikariya xwe tam rast bikin, weke kes dê we jî azadbûn pêk baniya û ev jî dibû partîbûnek bêhempa. Jixwe partîbûnek wisa bêhempa jî ne gengaze ku di şer de hêsan winda bike.

Ger yek di şer de pêşketinê saz nake, tê wateya partîbûn pêk ne aniye. Ji bo partîbûn jî pêk ne aniye, kesayetek bi şaşiyan dagirtiye. Kesayetek şaşiyên wî pir, dikare kîjan rastiyê ser bixe? Elbet hûn van pirsan ji xwe nakin. Hûn fêlbaziya gundîtî, her cure fêrbûnên feodalî yên we ji girêka kor a civakî girtine, xisletên ku we ji Komara Tirk, Kemalîzmê -jixwe hûn ne di ferqa vê de ne- girtine, hewl didin di nêvenga partiyê ku bi zorê me ava kirî de ferz bikin. Ma hal û ehwalên ku ev bi kes didin avakirin, bi mirov re aliyek saxlem dihêle? Hûn bi vî halê xwe ve ne bi qasî zarokane, heta hîn xetertirin. Weke zaroka tevdigerin. Ger zarok rast bên destgirtin, pir baş tevlî perwerdeyê dibin. Mixabin hûn ji zarokan zêdetir pir zehmet xwe didin perwerdeyê. Ez vê destnîşan dikim. Em pir li ser sedemên vê radiwestin. Di derbarê binyata kesayeta we de, min gelek dahûrîn pêş xistin, lê pirsgirêk bi vê jî xilas nabin. Em bi kîjan rêbazî dikarin partîbûna we pêk bînin? Ya rastî hûn ji partîbûnê re nabêjin na, xwedî niyetek başin, heta ji min zêdetir fedekar û wêrekin. Lê ev jî, rewşê rizgar nake. Ji ber ku rêxistinbûn û partîbûn, bi ziraviya hunerî ve dibe. Ev jî hunerek li gorî xwe xwedî sebir, reftar, uslub û jiyanê ye. Çawa ku hostayek şoreşger ji bo bibe hostayek baş bi salan ked dide û bi ziraviyên wî hunerî ve dikare hunerê saz bike, partîparêzî jî li cem me bi hunerek zirav ve tê sazkirin. Heman hunera ku hunerkar saz dike. Hunera van huneran pêkanîn, ango ji doxtorek emeliyatek herî giran zêdetir ziravtir, bûna cerahek civakî ya operasyonê dixwaze elbet zehmete. Lê belê ji bo jiyînê jî, çareyek din nîne.

Beramberî vê jî em, halê we yê seresere, heta dawî gundî yan jî burjuvaziya biçûk derbas nake berçav bigirin. Hûn jî dibînin ku kar çiqas hesasin û gelek ji we di bin navê emeliyatê de kêra xwe çep û rast çawa her tim li şaneyên civakî û rêxistinî dixe. Her ku lê didin bi darbeyên vê kêrê li çav û dilê hev dixin. Hinek dixin rewşa komatiyê, hinek dikevin rewşa komayê. Encama ku derdikeve holê, dibe jiyana ku rastiyên partiyê û rêxistinê pêk nayîne. Em ê vê çawa sererast bikin û qet nebe di nava rêxistinê de bikin keseyatek ku zerar û ziyanê nede? Ji bo vê jî em hewldanek mezin didin. Bal bidinê, kesayetek ber bi îxanetê ve hatiye kêşan an jî çawa rastiya

civakî re bi rûbirûbûnek xeternak ve hatiye hiştin rave dike. Di nêvengek ku her kes xwe tiştek dibîne de, her çendî lewaz û qels jî be, em li kesê ku dixwaze şerê hebûnê bi îdîayek ziwa ve û şanedariyek kesayetek pir erzan ve rûbirû bê binêrin. Pir zehmete ku mirov wî veguherîne rastiyê û jixwe civata Kurd jî bi temamî wisa ye. Li cem me şêweyek gel û civakî bi rastiyên cîhanê yên herî zehmet ve rûbirû hatî hiştin heye. Vaye hûn jî ji vê rastiyê hatine. Jixwe zehmetiya herî mezin a vî karî jî di vir de ye. Em hinekê bi ser we de bên, hûn ê yekser pêşberî me kelogirî bin, xwe bigirin, reben bikin û heta dawî veşêrin.

Kesayetên lewaz di nava me de pir bi bandorin. Min gelek malbat nas kirin, heta hinek malbatên gund ên herî belengaz û reben dinasiya. Hinek malbatên ku zarokên wan pir kirêt û bê şêwe hebûn. Wan zarokên xwe, weke zaroka cîhanê ya herî bedew dinirxand û digotin; “Bes bila ya min be.” Ev rewş hema bêje bi her kesî re heye. Niha hûn jî wisa tevdigerin û dibêjin; “Ez yê herî başim.” Yek kesê ku xwe wisa xirab bibîne nîne. Tenê hûn dibêjin; “Ez wisa xirabim, wisa kêmim” û bi vê jî hewl didin rewşa xwe rizgar bikin. Lê di rastiyê de jî ji xwe pir razîne. Ji xwe ger hûn evqasî ji xwe nerazî bûna, tevî ku bi şaşiyan dagirtîne, we di jiyanek wisa de israr nedikir. Ji bo hûn ji xwe razî ne, di jiyana ku ti carî rêxistinbûn û pergalê pêk nayînê de israr dikin. Ji ber ger we bizaniya ev şaşe, dê we ji mêj ve xwe bigihanda rastiyan.

Sedema ku hêza we têra rastiyên partiyê nake, wate nadin azadiya jiyanê, ger bidin jî pêwîstiyên vê pêk nayînin, hûn pir ji şaşiyên xwe razî ne. Belê li vir jî hûn weke kole û reşûpêşin. Tê gotin, civaka me pir dûjînan dike. Bal bidinê, mirovên me ji sedî not di jiyanê de dûjînan dikin. Bav ji hevjîn û zarokên xwe re, zarok ji xwîşk û birayê xwe re, cîran ji cîran re, ango hema her kes beramberî her kesî bi dûjînan jiyanê îdare dike. Bi kurtasî, bi şêweyek derewan, sextekarî, durû, tirsonek, ne ji dil û her şêwe jiyanek şaş ve hevûdu pêşwazî dikin. Ev çavkaniya xwe ji kur digire? Çawa çêdibe evqasî ji rastiyên bingehîn qutbûn tê jiyîn? Ger îdîa we rast bûya, misoger em li dijî van tiştên hûn dibêjin dernediketin. Ger hûn bêjin; “Em li ser vî bingehî mezin bûn, li ser

rewşê serwerin”, wê demê ez ê jî ji we re bêjim; “Li rastiya xwe binêrin, tevî evqas nirxandinan kî ye digirî û dinale?” Tevî ku di nebesiyan de dinale, hêza wî têra jiyanê nake, tevî vê kî ye di xebatên rêxistinî de dibêje; “Ez têrkarim?” Ger ev îdîaya we rast be, bidin diyarkirin ku hûn çiqas li ser rastiyan serwerin û rastiyan di jiyanê de çiqasî serwer dikin. Hûnê bibînin, di nava we de yek kesê wisa nîne. Hûn dixwazin bi gotinên weke; “Gazindên min ji vî hene, lewma kêm mam, ji ber hatim girtin, hatim çewsandin û ji vê bandor bûm” ve, erzan ji vê rewşê rizgar bibin. Ma ev nêzîkbûn dibin raveya kesayetek ku rastiyên jiyanê yên esasî pêk tînin û karbidestin? Hûn jî dibînin, ji bo hûn xwe sererast bikin, gelek sedemên cur be cur hene. Rewşek we wisa ji xwe razî jî bin nîne û hewce nake hûn xwe belav jî bikin.

Îdîayek we ya weke; “Ez yê herî kirêt jî bim, herî bêçare jî bim, herî ketî jî bim, dîsa jî yê herî baş ez im” heye. Niha ev jî di nava me de felsefeyek mezine. Weke min diyar kirî belengazê herî kirêt û bêçare yê gund ez im. Lê dîsa jî dibêje; “Kurê min paşa ye, lawê min mezine.” Yan hûn li gorî vê felsefeyê mezin dibin, an jî dema hûn dibînin rewş qet ne wisa ye, kirêtî, şaşî û ketîbûn heta noqê ye, hûn dibêjin; “Ez nabim mirov, em nabin mirov.” Şiyar bin aliyê din ê vê felsefeyê wisa ye. Ev du şaşiyên bingehînin. Li hevalên me, şervanên me yên bîst salan dinêrim, dibêjin; “Em hêjayî xwe nabînin bibin mirovê rêxistinê û rêber.” Ez dibêjim, di bîst salan de rêxistin pêş ket, em pir rehetî dikarin navê mirovê rêxistinê li xwe bikin, ew dibêjin; “Ez, em ne hêjayî vê ne.” Rewşa navenda me hemûyan jî wisa ye. Ger hûn dibêjin; “Ez ne hêjayî şana navendê me, ne hêjayî rêveberiyê me”, wê demê çima bi salane hûn xwe hêjayî vê pêş naxin? Ya rastî dema mirov li cewhera vê gotinê dinêre, cardin derdikeve holê ku mirovên herî zêde ji xwe razî dîsa ev in. Ev xwe vekişandina kesayeta ku dibêje; “Lawê min paşa ye”, bi şêweyek dibêje; “Ez nabim mirov” xwe dide dere. Jixwe hûn her du xisletan jî li gorî dem û war zêde bikar tînin.

Pêwîste dev ji vê bê berdan. Bi vê jiyan nayê bidestxistin. Hûn li hewa bi devê xwe çûk jî bigirin, ev ji bilî sextekariyek mezin ne tiştek dine. Partîbûn, PKK hinekê jiyîn û hinekê jî mirov bizane ji

felsefeya wê jiyana heyî hûn ferz dikin dûrketine. Ji ber ev civak bi temamî di nava şaşiyan de dinale û beramberî vê jî yên ez nûnertiya wan dikim rastin, min hêza xwe derxist holê. Vê hêza xwe ji pere-mereyan an jî hinek hêzên heyberî nagirim. Berovajî ji bo her tim helwestên min ji aliyê rastiyên bingehîn ve ne, min karî evqasî di nava vê civakê de bi bandor bim. Ango nûnertiya rastiyên jiyanî yên bingehîn dikim. Ger hûn jî dixwazin di Kurdistanê de xurt bin, dema we karî li ser quralên jiyanê yên rastî hukum bikin, ev gengaz dibe. Ger hêza we têra vê dike, pêwîste misoger xalên min destnîşan kirine cidî bigirin. Ne bi koletî bêjin; “Em hêjayî nebûn”, ne jî bêjin; “Ez keyfkarim, her tiştî ez dizanim” û qet jî pêwîstî bi şaşî kirinê jî nîne. Her çendî rastiyên jiyanê yên bingehîn ji bo we zehmet jî bin, rastiyên ku mirovan ji bingeh ve bihêz dikine. Em rastiyên rêxistinê, şêwaza rêxistinê, xeta wê, stratejiya hatî pêkanîn, taktîk û gelek xisletên wê yên jiyanê dinirxînin. Hûn dikarin bi van mezin bibin, ji bilî vê ti rêyek din a mezinbûnê nîne. Ger weke berê we kirî hûn fêlbaziyan bikin, bi rastiyan, yetkiyan, feraseta berpirsyarî û erkan bilîzin, tenê hûnê xwe bixapînin. Bi vî rengî jî wê derbikeve holê, hûn çiqas tolazin. Lewra hûnê şêwaz, nêrîn û perspektîfên jiyana rêxistinê û xalên çawa bijîn baş fêm bikin. Jiyana leşkerî hinek din lêhûrbûnê rave dike. Pêwîstiyên wê yên teqez hene. Ger hûn nekarin xwe bigihînin vê, tê wê wateyê ku we xwe avêtiye erdê. Lewra lez û bez xwe ji van şaşiyan rizgar bikin û ber bi rastiyan ve biherikin.

Rêbaza bi me re, nabe ku rêbaza serdest û mêtînger disepînin bin. Ger ev rast bûya, dê me jî ev rêbaz pêş xistiban û me jî serlêdana van kiriba. Mixabin gelek ji we li dijî hev rêbazê dûjîn û lêdanê bikar tîne. Lê belê di nava partiyê de ev rêbaz qet ne rastin. Hûn zehmetiyê dijîn ku rêbazê partî yê axaftinê û qanekirinê pêk bînin. Hûn dibêjin; “Em pir daxivin, jixwe jiyan axaftine.” Ev jî nêzîkbûnek pir xetere. Hema bêje bêçaretiya we di vê xalê de kûr dibe. Hûn çima vê dikin? Çima li gorî tê xwestin wate nadin gotinê? Pêwîste hûn van ji xwe bipirsin. Ma hûn ê hêza xwe ji şaşiyan bigirin? Jixwe hêza we ya bingehîn şaşî ne. Lê belê kesê ku hêz ji şaşiyan digire, gelo hûn dizanin çorsek qure û tolaze? Tolaz

li ber çavan dîlawêrê taxê ye, xurt tê dîtin, lê dema carekê dikeve qereqolê jî, tika ji polîsê herî belengaz dike. Hêza dîlawêrekî, çiqas hêzbûnê rave dike? Dema hûn li ser bingeha şaşiyan xwe bihêz dibînin, misoger dişibe wê rewşê. Kesê ku li hember zehmetiyan dev ji xwe diberde û li hember peywiran bin dikeve kî ye? Gelo di nava me de çend kesên naşibin dîlawêrên li cem polîsan radest dibin hene?

Hûn nikarin xwe birêxistin bikin, ji ber ku we xwe sipartiye şaşiyekê û wisa dijîn. Çima çalekiya rast, lêdana rast, rêvebirina rast, rêxistinkirina rast û hêza qanekirinê tine ye? Ji ber we xwe bi sipartina şaşiyan ve bê kesayet hiştiye. Kesê xwe sipartî şaşiyan, hêza wî têra rastiyan nake. Bal bidinê, dîlawêr wer dizanin ku bihêzin, her tim bi propaganda belav dikin ku xurtin, pesnê xwe rêz dikin. Jixwe serdestî jî, herî zêde ji aliyê kesên ku van şaşiyan baş dinirxînin ve tê kirin. Ev padîşah jî bin, dîsa tevgera derewên mezin pêş dixin. Ev kesayet herî zêde di şêwaza jiyanê ya şaş de israr dikin, xwe vedişêrin, berjewendiyên wan hene û keda hinek din didizin. Vê jî li her derî belav dikin. Hewl didin bila civak tevahî bikeve nava şaşiyê, da ku kesê şaşiya herî mezin dike weke padîşahan bê dîtin û jixwe ya çêdibe jî wisa ye. Vaye hûn ji vê exlaqê û ji nava vê ferasetê hatine. Hûn xwe, her tim dîlawêrek dibînin, xwe weke xweperestekî diyarkirin, ji bo we yegane rêya derketinê tê dîtin. Ev jî ne raste.

Rastiya sosyalîzm û demokrasiyê vê red dike, rastiyê derdixe holê, derew û şaşiyê teşîr dike û rastiyan esas digire. Mafê kedê, şêwaz û şerê kedê esas digire. Ev jî şêwaza me bi xwe ye. Me bi şerê xwe di rêya rastiyan de xwe selmandiye, me xwe sipartiye rastiyên xwe û xwe wisa xurt dikin. Kesayeta ku rast teşe digire ev e. Dema hûn vê di kesayeta xwe de pêk bînin hûn ê bibînin ku, hûn xwe dispêrin gelek şaşiyan û xwe vedişêrin, wisa xurt didin diyarkirin. Ji bo hêza xwe biselmîne, mirovên me yên ku xwe bispêrin rastiyan û wisa derbikevin pêş bi qasî mirov bêje tine kêmin. Zêdetirîn xwe vedişêrin. Ji ber ku gelek hêza me ya fermande fermandarê şaşiyane, şaşiyan ferz dikin. Ji bo yên jêrê di bin fermana şaşiyan de ne, şaşiya şervan jî fermandar xwedî dike.

Di encamê de ruhê rastiyan distînin. Gelo di nava we de yek kesê vê nejî heye? Sedema hûn nabin fermadarek mezin an jî gêrîlayek yeman, ev şaşî esasgirtine. Her çendî hûn îdîa bikin û bêjin; “Ez nikarim wisa pêş bikevim, nikarim wisa ser bixim”, dîsa jî wê jiyan li serê we bikeve. Hûn her tim, di rastiya azadiyê de wisa şaş û paşo dibin.

Êdî divê hûn van rastiyan ji kûranî bibînin. Ger hûn nebînin, wê cardin jiyan li serê we bikeve. Di vê wateyê de gelo hûn ê bikarin bi terbiye bin, li ser bingeha rastiyan sonda bibin kesayet bidin xwe? Gelo hûn ê bikarin hêza ji şaşiyan derketinê raber bikin û bikarin dev ji her cure daneyên kesayeta sexte berdin? Xwe xapandin, pakbûn, belengazî û bêçaretî jî nîşaneyên şaşbûnê ne. Hûn ê bikarin dev ji van berdin?

Ji berê ve ji bo xwe li ber şaşiyan netewînim, di rêya rast de bi qasî vekirîbim, ji bo xwedî hewldan, helwest û têrkariyek vekirî bim, min kedek pir mezin da û jidil nêzî bûm. Ez her tim bandora xwe ji axaftina rast û israra di axaftina rast de digirim. Weke din jî taktîk heye. Li her cihî her tişt nayê gotin, li her cihî her tişt nayê kirin. Li gorî cîh ji sedî yek gotin, li gorî cîh ji sedî not û neh gotin, li gorî cîh sedî sed kirin, li gorî cîh ji sedî not û neh kirin. Ev jî hostatiya taktîkî yan jî hostatiya rêxistinî ye. Baldar nêzî van tevan bûm û encam jî hişt ku rastiyan bibînim û bi gavên guncav jîndar bikim. Ango rastî bi taktîkan xwe gihandiye wateya mezin. Ev rastiyek wisa ye, neçare hemû cîhan bipejirîne. Vaye ji ber vê ez hatim vê rewşê. Weke min diyar kirî, hem di merheleya min a zaroktî hem jî mezinbûnê de, her kesî xwe xurt didît. Bi rastî jî bi bandor bûn. Yê herî jêr, herî zêde di tengaviyê de û herî zêde bêçare xwiya dikir ez bûm. Ji ber ku min li gorî yên din zêdetir rastî dîtin û girêdayî rastiyan jiyan kir, ber bi pêşveçûnek mezin ve hatim. Gelek kes vê pêşbîniyê nabînin û nakevin ferqê jî. Ji ber ku di vê mijarê de min dev ji şopdariya rastiyan berneda, di encamê de îro bi bandorim. Hûn ji vê jî zêde tiştekê fêm nakin. Ji ber bi şaşiyan re mezin bûne.

Li gorî uslubê rêxistinê jiyîn, li gorî min tê wateya di her mijarê de karkirine. Ji bo endamek partiyê ev hîn zêdetir derbasdare. Nayê

hizirîn ku mirovê rêxistinê weke hûn dijîn li hember şaşiyan raze, li hember gelek şaşiyan belengaz bimîne û hêza wî têra pirsgirêkan neke. Min xwe di mijara rastiyên xwe de rast meşand. Bila yek ji we li hemberî min şaşiyek xwe bi israr ferz bike yan jî qet nebe li hember rastiyên min bila bêje; "Şaşiyên min mezinin." Li Kurdistanê rêxistinên cuda, emperyalîzm û mêtîngerî hene. Lê nikarin ji me re bêjin; "Rastiyên me mezinin, tu nikarî bi bandor bî." Jixwe di nava partiyê de gelek provakator, xwediyên gelek helwestên xirab ev nêzîkbûn raber kirin. Çima yek ji wan xurt nebûn, çima ser neketin? Ji ber bi israr şopdarê rastiyan, bi tena serê xwe jî be, li dijî her cure şaşiyan -ev ji dewletê jî bê-, hîn zêdetir bi bandore. Me ev selmand. Hûn jî wisa di rastiyan de israr bikin, bibin parazvan û rêveberên hosta yên rastiyan. Ger hûn wisa bikin di cîhanê de kes nikare li hember we bisekine.

Hêvîdarim hûn hinek rastiyan fêm dikin, qet nebe hêdî hêdî ji şaşiyan û kesayetên xwe yên xisletên me diyar kirî rizgar dibin. Qet rastiyên we nînin, her tiştê we derewek mezine. Gelek rastiyên we hene, lê ew rastiyên we jî ji ber serdestiya hinek şaşiyan, ew anîne rewşa nekevin meriyetê. Jiyana we tev çend şaşiyên we hemû keda we vale derdixe. Berovajî, bila çend rastiyên we yên bi bandor hemû şaşiyên we, derew, xwe xapandinên we bi erdê re bikin yek. Elbet ev gengaze. Vê jî pir giştî bigirin û yekser li ser her tiştê xwe pêk bînin. Ji ber ku şaşî, ne tenê şaşiya gotina ji dev derdikevê ye. Şaşî, ji şêwaza meşê destpê dike, heta razanê diçe. Ji şêwaza xwarinê destpê dike, heta rabûn û rûniştinê jiyana we bandor dike. Li her qada jiyanê rastî heye, şaşî şaşiye. Şêweya bêhempabûna her tiştî heye, şêweya wê ya her tiştî nebes dibîne jî heye. Ji van hestan destpê dike, heta felsefeyê. Em ji teoriyên kûr bigirin, heta pêkanîna hewldanek aborî ya rojane, di hemûyan de bi bandore.

Di hunera Rêbertiyê de jî têrkarî esase. Ger hûn jî dixwazin rêbertiya rastiyan dest bixin, şaşiyan derbas bikin li her qadê û di her astê de xwe bigihînin têrkariyê. Lê belê kesayeta Kurd ber bi vê ve nayê, di vê xalê de pir zehmetiyan dijî. Dibe ku kesayeta Tirk, di vê mijarê de ji me kembaxtire. Dibe ku derewên di kesayeta Tirk de, hîn mezintirin. Derewên di civakên emperyalîst de, dibe ku hîn

mezintir bin. Ez we weke objeya dahûrînan digirim dest. Ev nayê wê wateyê ku, her tiştê yên dervî me rastin. Dibe ku derewên wan ji yên me mezintir bin. Lê di nava şaşiyên xwe de, dikarim bêjim herî zêde em zerar û ziyanê didin xwe. Heta di nava partiyê de gelek hevalên bi şaşiyên xwe, xwe helak dikin hene. Ger em berçav bigirin ji bo şaşiyek biçûk me çiqas şehîd dane, em ê tev pir rehetî bikarin encama şaşiyan a tirsnak bibînin. Ma ev çarenûseke? Li nêvengek ku quralên rêxistinê hatine xirabkirin jiyîn, ji ber şaşiyekê rêhevalên weke çiyan di carekê de windakirin, dilê we na êşîne? Dikariya rê li van bê girtin. Ger hûn bi raveya mirovî, rastiyên rêxistin û şer ve dagirtî bûna, dibe ku her yek ji van şehîdan weke fermandarek mezin ên şer dikin biman û niha jî serkeftina vî şerî pêş ketiba.

Lê belê di şerê me yê mirin û mayînê de bi çarçûrkirina çekan ve, hûn ber bi têkçûnê ve diçin. Tevî we, em we jî bi zorakî digirin, rizgar dikin û hewl didin hinek din bidin jiyîn. Hûn bi çi mafî evqas şaşiyan dikin, xwe dispêrin kî evqas nebesiyan raber dikin? Evqas xal dikarin bi çi biparêzin? Hûn her tim dibêjin; “Kêm mam, bêçare bûm, min serî tewand û lihev kir.” Bi şaşiyên hûn dikin ve ber bi şahadetê ve diçin, nirxên zêrîn ji dest diçin û şerê mirin û mayînê ber bi binkeftinê ve diçe.

Em kêmasî û lihevkirinên we napejirînin. Ya herî xirab jî, hûn bi xwe dilîzin û wisa jî jiyana we ji dest diçe. Sedema vê rewşa we kêmasiyên we yên di rêhevaltiyê de û israra di vê rewşê de ye. Hûn dibêjin; “Hêza min têra vê jî nekir, tengav bûm.” Şoreşger tengav nabe, di kêmasiyên şoreşgerî de israr nake. Ger di vê de israr bike, ji ber di nava rêxistina şer de ye, dê xirab winda bike. Ger hûn di jiyanê de şaşiyan bikin, hûn ruhê xwe jî nedin, dema we di nava rêxistinê û nexasim mercên şer de di şaşiyan de israr kir, berdêla vê jî ji destçûna jiyanê ye. Her roj dihizirim gelo hesabê vê berpirsyariya şaşiyan ji kordînator, berpirsê herêmê an jî şervan bixwazim? Rewşek weke hinek kêm, hinek jî zêde şaşiyan bikin nabe. Rewşa we tevlîhev dibînim. Ji ber ku şaşiyê, şaşî xwedî kiriye. Bi evqas şaşiyan hev xwedîkirin, peyre jî derketina pêşberî me yan jî derketina pêşberî rastiyan bi yek gotinî bêfihetiye, ger

hûn di vê de israr jî bikin suce. Jixwe ev tiştên hûn dikin, tê wateya tawanên giran. Gelo hûn ê tam di vê xalê de çi bersivê bidin? Li hember van tevan bê bersiv mayîn, di pîvanên rêxistinê de paşde mayîn, di nava pratîkek tije şaşiyan de tewşbûn çiqas xirab, çiqas heyfe! Ma wijdanê we vê dipejirîne? Niyeta we çiqas durist dibe bila be, rastî evqasî hesab dipirsin û evqasî dihejînin.

Yên ez bilêv dikim rastiyên şerin, rastiyên leşkerî ne. Ger hûn bi gêrîla ve girêdayî nemînin, hûn qet nikarin xwe biparêzin. Ger hûn nikarin xwe biparêzin jî, hûn ne ti tiştin. We çima rastî ne parastin? Lê belê ev rastî pir girîng û pir hewce ne. Weke nav rastiya pîrejin, we tîne rewşek wisa ya bê bersiv. Hûn bi serîtewandin û kelogirî dibêjin; "Çarenûse, tişta bê serê me em ê bijîn." Ev ne raste û helwesta azadiyê jî vê napejirîne. Mertbûn, exlaqê nû, jiyana nû û jiyana rast jî vê napejirîne. Hûn nikarin ji van rewşên tên jiyîn re bêjin; "Çarenûse." Em çarenûsa wisa nas nakin. Nexwe hinekê jî hûn ê hewl bidin weke me bin. Ji bo ne weke me bin ti hêceta we nîne, ji bo vê hûn ê rastiyan esas bigirin. Rastiyên me misoger, **rastiyên azadiyê** ne. Rastiyên me esasgirtin, di wateya ber bi azadiyê ve çûyîne.

## Me PKK Li Ser Bingeha Qanûna Hezkirinê Ava Kir

Em hewl didin ji keçan hez bikin. Hûn jî dibînin ku çawa hewl didim xwe bigihînim hêza hezkirinê. Min qanûnên hezkirinê wisa nîşan dan. Min bingeha bîrdozî, siyasî û rêxistinî ya ku hezkirin xwe dispêriyê danî holê. Heta ji bo xwe bi keça bidim ecibandin, hewldanek bêhempa raber kir. Xwe erzan nadim ecibandin. Ji bo hinek min hez bikin jî, xwe ferz nakim. Lê belê cihê ku ez lê me jî, ti şopa hezkirinên şaş lê namîne. Kesayetek şaşî û rastiyan têkilhev dijî û bi xwe re jî dide jiyîn, ji hêla min ve ti carî nayê pejirandin. Hûn dikarin li ser vî bingehî eleqeya xwe ya beramberî me pêş bixin. Nabêjim bi zorê me hez bikin û bi me ve werin girêdan. Ez jî hêsan hez nakim an jî mafê hêsan hezkirinê bi xwe re nabînim. Piraniya rêberan vî mafî bi xwe re dibînin.

Ez wisa nebûm evîndarê gelê Kurd, li hember gelê Kurd her tim di nava êrîşek mezin de me. Elbet ger ev li ser bingeha şerek bi kirêtiyan re çavsorî be, dibe evîn. Heta ku ked nede ji kesî re nabêjim tu çawayî jî, hêza silavdayînê jî bi xwe re nabînim. Ne hezkirin, mafê min nîne ku kêlekê re jî derbas bibim. Lê belê piştî ku min hewldan û keda mezin raber kir, niha dikarim bêjim vî gelî hez bikim û xwezayî ew jî dikare min hez bike. Ev bi şerê herî mezin ê eslî vê pêk hat. Berê ez jî kêleka keç û mêrxasan re derbas dibûm. Di nava hevalên min ên zaroktiyê de keç jî hebûn. Di nêvenga gund de hezkirina wan danin aliyekê, ne diwêriyam navê wan jî bilêv bikim. Hinekan keç digirt direviyan, min jî sehim dijiya. Min tim ji xwe re digot çawa wêriyan keç birevînin, heta çawa wêriyan keçekê bixwazin. Keç revandin an jî keç xwestin ji bo min bûyera herî zor bû.

Lê mixabin di nava we de yek zilamê ku keç revandin an jî keç xwestinê şerim bike tine ye. Hûn bi çi wêrekiyê dikarin keç bixwazin? Nebêjin; "Çi eleqeya vê bi perwerdeyê re heye?" Hûn nikarin bi vê kesayetê partîbûnê pêk bînin. Kesên wisa feraseta wan a xwestina keçê hebe, yên weke keç jî xwedî ferasetên xwe dayînê

hebin, ew ti carî nikarin bibin milîtan û partîbûnê pêk bînin. Di vê mijarê de ezmûnên min ên pir mezin hene. Xêr ji mirovek weke milk bê kirîn û dayîn nayê. Bihizirin we koleyek girt û hûn bi şêweya; "Ez zilamek wisa me" şanaz bûn. Wê demê ev kar diqede. Min hêj di zarokatiya xwe de di van mijaran de digot têkçûnek heye. Hêjî di bîra min de ye, dayîka min bê agahiya min çend caran ceribandibû ku keç bixwaze. Min jî li hember vê rewşê got wisa nabe, ew çawa dikarin bi navê min keç bixwazin. Her wiha ne xwestinek wisa hejayî dîtinê jî bû. Min ji dur ve bihîst û carek din gotina vê nehat kirin.

Li Kurdistanê pêwendiya wê bi pirsgirêkek pir bingehîn ve heye. Dema hatin xwîşkên min xwestin, min bertek raber kir. Wisa keçên me girtin, birina cihên ku ne diyarin çine ne rewşek xwezayî bû. Qet di wijdana we re derbas nebû hûn vê nepejirînin? Dema hinek weke koleyan tên dayîn, qet bawer nakim hûn xemgîn dibin. Heta bi nêzîkbûnek; "Asayî ye, li gorî kevneşopiyane", hûn kêfxweş dibin. Lê belê ez hêjî ji dest çûna xwîşkên xwe, xemgîn pêşwazî dikim. Ez xwediyê wijdanim, wijdanê we jî ji mêj ve hilweşiyaye, bûye xwelî. Em ê çawa wijdanê bidin we? Ev jî rêgezek Kurde. Hûn ê vê rêgezê binpê nekin. Ne wisa keç tê girtin, ne jî tê dayîn.

Hewl didim rêyên hezkirinê pêş bixim. Tevî ku di vê mijarê de pir azad û bi îdîa me, hêjî di nava hewldanek hûrûkûr de me. Ev karek pir cidî ye. Beriya her tiştî hemû keçên pêşberî we, koletiyek kûr dijîn. Ger ev belengaz bi we ve bên girêdan jî, dibe ku gelek xeteriyên vê hebin. Hevjîna we hebe, ji bo me destpêka ketîbûnek pir mezine. Dîsa hûn bibin mêrên wan, ev jî xeteriyek pir mezine. Ji ber li cem me di felsefeya jin û mêrtiyê de sedî sed **ketin** heye. Têkîlî di astek dijwar de dixin û li vir her tişt tê windakirin. Hêj ne gihiştî bîst saliya jiyanê, enerjiya fîzîkî diqede, ruh tarî dibe, zanebûn jixwe tine dibe û di encamê de kesayeta Kurd derdikeve holê. Pêwendiya vê rewşê pir tund bi malbatê re heye. Di vê mijarê de xwe ferz nakim, ez jidilim. Misoger nêzîkbûnên wisa axatî yan jî serdestiya zilam bi min re nîne. Jixwe vê nakim. Ger vê bikim

xwe înkarkirine, jixwe ev jî ne gengaze. Pirsgirêka min jî heta dawî li ser bingeha wekhevî û azadiyê ya pêşxistina pêwendiyan heye.

Nabêjim teqez bi min ve werin girêdan. Tenezilî vê nakim. Hûn di fêmkirina min de serbestin. Çawa gel dixwaze me weke rêberekî fêm bike, hûn di fêmkirina min de serbestin. Ez ê bi hemû hêza xwe ve hewl bidim bersiva vê bidim. Lê divê di vir de sextekarî nebe. Ez neçarim ku hezkirina xwe hîmdar pêş bixim. Neçarim ku giştî hezkirina zayend û zayenda beramber, nexasim hezkirina qadro pir taybet pêş bixim. Ger hewcedariyên vê pêk nayînim, wê demê bi ser min de werin. Lê ger hûn hewcedariyên wê pêk nayînin, nikarin hezkirina xwe biparêzin û heta nikarin pêş bixin – jixwe qanûnên vê jî hene-, vêca ez ê bi ser we de bêm. Hezkirina min, bi hezkirina welat, hezkirina rêxistinê û pêşxistina jêhatiyên xwe yên şerkirinê ve destpê dike. Ger we ev hemû veder kiribin û hezkirina erzan pejirandibe, wê demê hûn dijminê minin. Ev mafê we nîne. Weke ku mafê we nîne, hûn bixwazin min bikin kole û erzan bi xwe ve bidin girêdan, dê xeyalên we vale derbikevin. Misoger pêwîste hûn qanûnên hezkirinê berçav bigirin.

Me li ser vî bingehî partî damezirand. Hûn nikarin pêşketinên partî yên dema koma destpêkê û pêşveçûna PKK’ê qet fêm bikin. Wê demê keçên ciwan û mêrxas di nava me de hebûn. Ez wê demê bi girêkek kor a mezin re rûbirû bûm. Ji bo min her tişt di tarigewrikê de, li nêvengek xayîn, bi niyazên xayîn ve hatibû dorpêçkirin. Niha hûn kêr nayên partîbûna ku amade jî pêk bînin, li hember vê eleqeya we jî nîne. Tevî ku ji çar hêlan ve hatime dorpêşkirin, dîsa jî bi fikrek ez ê çawa partîbûnê pêk bînim di nava lêgerîn û hewldanek mezin de bûm, ji bo vê jî min hewl dida her tiştî bi tena serê xwe bikim. Li Enqereyê derdora min ji aliyê kesên ku min daqurtînin ve hatibû dorpêşkirin. Bi tena xwe bûm, rewşek min a xurt jî nebû. Di wê demê de wexta MÎT’ê jî ez dinirxandim – wê demê li ser maseyan bi xiroş daxivîm- digot; “Ew li ser maseyê daxive, deka bila biçe Kurdistanê” û wisa kena xwe dikir. Paşê di vê mijarê de MÎT li xwe mikur hatibû ku gotibû; “Me biçûk dît, sivik girt, hêj serê mar bostek ger leşkerê me potînê xwe rakira dê biperçiqanda. Mixabin me sivik girt û ev hat serê me.” Vêca vî halê

min bihizirin, dikariyan di carekê de min bixeniqînin. Her kêlî her tişt bi fikar bû. Her tişt weke marek bi me ve bide re rûbirû bû. Çima li hemberî van nexeneqîm? Me derketinek ji hêla dijmin ve jî nedihat payîn çawa pêk anî? Hinek ji we dibêjin; "Me nêveng ne nirxand, zemîn baş berçav negirt." Lê min di bin serdestiya dijmin a teqez de li qada ku em lê ne, karî ku pêşveçûnekê pêk bînin. Me wisa dest bi partîbûnê kir. Ger hûn vê paşçav bikin, misoger nikarin PKK'ê fêm bikin. PKK'ê wisa dest bi vî karî kiriye. Vê fêr bibin, ji ber ku çîroka jiyana we ye. Ger fêr nebin, hûn nikarin bibin milîtanên yeman.

Bi girêdan û eleqeyek mezin guhdarkirina min li aliyekê, min ji rê derxistin, bidestxistin, xirab bi xwe ve dana girêdan an jî ji bo qewitandinê keçên ku hemû hêza xwe bikar tanîn hebûn. Van tevan ji bo hûn qîmeta keçên di nava têkoşîna me de bizanin vedibêjim. Divê cihê keçan di nava têkoşînê de hebe, pêwîste bi wan re eleqerdarbûn hebe û bi baldarî bên nirxandin. Her wiha divê bê fêmkirin ku ev jî ne hêsane. Niha ji bo we hêsane ku hûn dibêjin; "Keç barin, keç giranîne, belaya serê me ne." Ev ne nêzîkbûnên rastin. Her çendî we di nava civakê de ji bo qelen deh salan kar dikir û çil teqle davêt jî, yan we keçek şelûşeht peyda dikir an jî we peyda nedikir. Niha keçên di nava refên me de pir pêş dikevin. Ji bo keçên di refên me de gotinên weke; "Barê li ser pişta me ne" kirin, durûtiye, bi yek gotinê bêrêziye. Ez ti caran wan bar nabînim. Berovajî, ew çavkaniya hêzê û aliyê jiyanê yên eslî ne.

Ji bo we van dibêjim. Elbet di heman demê de jin, li gorî dema xwe amûrek xistinê ye. Ger hûn jinê weke kole bigirin, dê li serê we bibe bela, hewl bidin bi pereyan bigirin, hûn ê neçar bimînin deh salan kar bikin, dibe ku hûn pereyê qelenekê jî peyda bikin. Hûn bi pereyên xwe jinê bigirin jî, dîsa xetere û bela serî ye. Bi revê jî nikarin ji nav vî karî derbikevin. Sewdaserî jî mirov dixe nava rewşên kembaxtir. Ev hemû çîroka jiyana we ye. Pêwîste hûn di van miran de jî Rêberî fêm bikin. Ji ber ku pêwendiya xwe pir bi dîroka partiyê ve heye. Dema mêrxasek bûm hewl didan ji min re keçekê peyda bikin, dihizirîm ku karesatek bi ser min de tê û min

hewl dida hinekê xwe biparêzim. Paşê dema ez bixwe ketim nav lêgerîna keçê, min dît ku bi cinawirên metirsîdar re rûbirû me.

Ez li Zanîngeha Zanyariyên Siyasî ya Enqereyê bûm. Keçên burjuva hebûn. Piranî jî keçên birokrat û serbazan bûn. Piranî jî heyranê min bûn û ez pir diecibandim, pişgirî didan min. Ji ber ku min wê demê rêbertiya xwendekaran dikir. Lê nêzî wan bûyîn ji bo min pirsgirêk bû. Başe ku min di vê mijarê de xwe ne xapandiye. Ger min wê demê xwe xapandiba, dê ev bibûya dînîtî. Hêjî di bîra min de ye, mêrxasek ji Amedê bi navê Farûk hebû, kurê meleyê Lîcê bû. Zêde evîndar bû. Paşê bi kêrê li pey keçek ji Adane'yî ket, hemû zanîngeh rakir ser serê me. Ez hevalê wî bûm û hinekê jî hêza xwe ya giyanwerî ji min digirt. Her kêlî evînek jiyan dikir. Heta ku ew hevalê min ji vê rezaletê rizgar bû, ez jî ketim binê erdê. Bihizirin, kesek rewşenbîr piştî ket rewşek wisa, wê kesên din çawa tevbigerin? Wê demê keçên ku min jî pir ecibandîn hebûn. Lê min navê wan keça jî nepirsî, ti carî ji wan re negot hûn çawanin û gotinên weke tu bedewî nekir, jixwe nabêjim jî. Ev pirsgirêka şêwazekê bû. Ger min wê demê ev gotiban, dibe ku min winda kiriba. Niha derdikeve holê ku çiqas bi aqil bûm. Di mercên burjuvaziya biçûk de ber bi evînekê ketin xetere. Hêj ez li gund jî û piştî gund jî ti carî nêzî tiştên wisa nebûm. Min ti carî pirsên weke keç hene-tine ne, keç tên girtin an na, ez zilamim an na ji xwe nekir.

Vaye rûbirû keçê hatina min jî di salên 1975-76'an de di qonaxa koma me de çêbû. Ev rûbirû hatinek cuda bû. Ji ber ku sedemên vê yên dîrokî, civakî û siyasî hebûn. Êdî ez jî ji bo têkoşînê di pêvajoya gav avêtinê de bûm. Min ji bo ya beramberî xwe jî ev digot: Ger xwe bihêz dibîne, bi qasî nêzî me bibe ji xwe bawere, wê demê bila beşdarî komê bibe. Elbet ez jî gernasek bûm, nedibû birevim. Ya rastî pir tengav dibûm, dîsa jî min digot bila beşdarî komê bibe. Rola gelek sedeman di vê xalê de hebû. Ji aliyekê ve siyasî û rêxistinî, ji aliyekê ve jî hestiyar, ji aliyê din ve jî heyberî û giyanwerî şerek pir dijwar dihat meşandin. Elbet ev jî dihat wateya destpêkirina şerek mezin. Ji ber vê min digot baldar bin, bila karesatek neyê serê we. Ger min şêwazek pir awarte, heta

li gorî xwe saz nekiriba, PKK'ê danin aliyekê –PKK îro rêxistina bingehîn a hûn ava kirine-, weke kes min nedikariya xwe jî rizgar bikim. Belayek mezin bû. Mane gotinek weke; "Min sax nahêle" heye, heman bi wî şêwazî bû. Ger min bi keça bermaberî xwe re pêwendiyek têkîliyek pêş xistiba, ez ê tine bûbam. Ew dem, demek jiyana min a mêrxasiyê bû.

Yeqîn nakim hûn bi kûranî wan deman dijîn. Ji ber ku bi we re pîvanên dilxweşiyê tine ne. Dema hewl didim hestan pêş bixim hûn tine dibin, hewl didim birêxistin bikim, hêza we têra vê jî nake. Keça beramberî min endama arîstokratên feodal a herî baş hatî perwerdekirin bû. Min demekê xwest jê dûr bikevim, min got dev ji vê komê berdidim û ji komê reviyam. Ev reva min jî, deh-panzdeh rojan domand. Demek berî wê jî reviyabûm. Lê paşê min dît ku nabe, vegeriyam. Bi revê ji bin vî karî ranedibûm. Ya rastî pirsgirêk jî ne ev bû. Hinekê jî sedemên vê yên siyasî hebûn. Malbata wê di îsyana Dêrsimê de rol lîstibû û malbatek sîxurtî kiribû. Rev di wateyekê de rê ji wê re vekirin bû. Ya rastî ji bo çareserkirina nakokiyekê tişta herî baş bê kirin serdeçûyîn bû. Li şûna rev an jî dûrketinê, rêbazek min a bi ser nakokiyan de çûyîn, wisa çareserkirin û derbaskirinê hebû.

Hûn jî dizanin, şerê vê deh salan domand û ev jî qonaxa PKK'ê ya bûna PKK bû. Ji salên 1975-76 heta 1986'an tam deh salên min girt. Ger min ev deh sal li derdora vê bûyerê rast ne dahûrandiba, ne Kurd dima, ne Kurdistan, ne PKK dima, ne ARGK (Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê) û ne jî hûn diman. Gelek ji we nizane min ev şer çawa û bi kîjan hêza sinirê ve meşandiye. Ya rastî hûn pir rehetî dikarin bêjin ez jî zilamek bûm û wisa binirxînin. Wisa me jî, lê min tevger û ferzkariyên ku ti zilam nepejirîne bi serkeftî pêşwazî kirin. Zilamek wisa yê Kurd tine ye yan jî di cîhanê de zilamek wisa tine ye. **Kemal Pîr** rojekê li têkîliya me dinêre û ji bo vê keçê dibêje; "Em vê bêrêza mezin bikujin." Tevî vê jî min deh salan li hember her cure ferzkariyan sebrek mezin raber kir. Lê belê li hember pêşketinek herî biçûk dest û lingê we lihev dikevin, hûn wate nadinê û xwe winda dikin. Ger hûn tenê vê rewşa min a li hember vê bigirin dest û bi xwe re muqayese bikin, hûn baş fêm

bikin ku hûn çine û teqez jî divê hûn fêm bikin. Ji ber ku ya li vir tê dahûrandin bi temamî girêka kor a Kurde. Her tişt li wir tê çareserkirin. Di têkoşîna min a bi Komara Tirk, jinê û malbatê re rêyên çareseriya pirsgirêkên ku cur be cur derketin holê tev jî, di nava vê pêvajiya şer de û jiyana min zelal bûn. Niha jî kesek bihêzim. Çi li hember Komara Tirk, çi li hember rastiya jinê û çi jî li hember rastiya zilamê Kurd di astek bêhempa de bihêzim.

## Rast Tevlîbûna Partiyê û Li Ser Bingehên Rast Mezinbûn Qanûnek Jiyanê Ye

Hîn jî li ber çavê mine. Di dema cir û cedela min a bi dayîka min re, ji ber şerê min a bi dayîka min re, yek cihê deriyê me yê ku bi keviran nehatî kunkirin nemabû. Wê demê yên li deriyê me dinêriyan dikeniyan û digotin; “Ev çi derî ye.” Dayîka min ez digirtim û dibirim govê, destê xwe dixist qirika min û radikir jorê, heta henaseya min dawî dihat digot; “Sê caran tobe bike.” Ev ne rewşek wisa rehet bû. Min jî çarnaçar tobe dikir. Lê dema kunek biçûk jî didît, çawa derî vedikir min baz dida. Dayîka min piştî wê derî digirt. Min herdu derî jî didan ber keviran, perîşan dikir û wisa diketim nava malê. Ji wî temenî ve wisa me. Jixwe dayîka min digot; “Kes nikare vî, yan jî kes nikare bi te re mijûl bibe.” Ango ev aliyên min hebûn. Hûn vê çawa şîrove dikin, bikin. Navend jî di nav de, kes nikare min wisa hêsan bigire dest. Dibe ku ji we re ecêbe, lê rastiya min wisa ye. Wisa hêsan kes nikare min zeptûrep bigire û tevlî şaşiyan nabim.

Li gundê me gelek hevalên min ên zaroktî hebûn. Dibe ku niha hinek bûne karmend. Dibe ku porê hinekan spî bûye û bûne bapîr jî. Ew baş dizanin hêrsa min a tolhildanê çawa ye. Ez ne weke we me. Ferasetên we yên hezkirinê jî, yên tolhildanê jî lewazin. Xwe xurt bikin, bila tol û hezkirina we kom bibe û weke ya min veguhere teqînê. Di nava têkoşîna me de hezaran keç hene, me bi milyonan jî birêxistin kirine. Hemû jî heta mirina xwe bi partiyê ve girê dane. Ger ji yên zewicî re bêjim dev ji hevserê xwe berdin, wê hemû jî di rojekê de berdin. Jixwe di rewşa berdanê de ne. Hûn ê girêdana xwe wisa pêş bixin. Lêkolîn bikin em çawa pêş ketine û fêr bibin. Ev pêşketin girêdayî rêxistinkirinê ye. Mirov ji dil û can bi tevgerê ve girêdan, rêxistinparêziya herî mezine.

Hûn bi pirsgirêkên dîrokê yên herî mezin re mijûl dibin. Lewra hûn ê xwe bi dîsîplîn bikin û dijwarî bi hedefê ve girêdayî bin. Ger hûn dibêjin; “Em hatine bibin PKK’yî”, hûn ê di meşa xwe ya bi

ser hedefê de yeman bin. Hûn vî şerî çi dihesibînin? Heyfe ku hûn bi vî halê xwe ve berdewam bikin. Em naxwazin bi zorê we bikin PKK'yî. Bixwazin dikarin ji nav vê têkoşînê derbikevin biçin. Em vê dipejirînin. Lê belê wê PKK'yîbûna wisa bi nebesî, şaşî û lewaziyan ve dagirtî we bişewitîne. Dikarim her cure xizmeta ji bo we hewce pêşkêş bikim. Ji xizmetê bêzar nabim, enerjiyek min naqedê heye. Lê neçarim ku zehmetiyên vî karî jî vebêjim. Gengaz be rewşa xwe pir nîqaş bikin, bihizirin û bixwînin. Ji ber ku dizanim çiqas pêdiviya vî karî bi perwerdeyê heye. Ger ez vê hewldanê dikim, hûn jî hinek tişt fêr bibin. Hinekê aqilmend bin, bila wijdana we hebe. Li ser nirxên bingehîn lêhûr bibin.

Hûn ê çima li ser xwe ne serwer bin? Çima wê dil û mejiyê we ne herike? Çima hûn ê şehlûşeht bin, her tim li hember dijmin têkçûyî bin, li hember jiyanê jî bêçare û kirêt rawestin? Ma başe hûn van hêjayî xwe dibînin? Hûn ciwanin, elbet enerjiya we heye, dikarin ji min jî baştir pêk bînin. Kes bi zorê we ber bi şaşiyan ve dehf nade. Hûn jî dikarin ya hewce bikin. Her tim baweriya min bi mirovên me heye û misoger kesî biçûk nabînim. Di asta bêhempa de miriyê rêhevaltiyê me. Mirov anîna asta civatê, dîsîplîne kirin, kirina rêya rast ji bo min jiyan bi xwe ye. Hûn nikarin biserûber xwe çareser bikin. Lê ez di çareserkirina girêkên kor ên dîrokê de jî ti fikaran najîm. Hûn nikarin bi xwe re yan jî çend kesan ve mijûl bibin. Ez miletek ku di mercên qet nayê ragirtin de di astek bêhempa de ber bi rastiyê ve dikêşim. Min hemû sedem û rêyên vê şanî we kir. Ger hêj nekarin xwe biserûber bidin karkirin, hûn bîst salan jî bijîn dîsa jî weke rebenan derkevin pêşberî me, hûn ê bihincirîn û wê ev jî ji bo we rewşek pir xirab be. Tişta ku pêwîste fihêt be û ecêb bê dîtin, di xisletên şaş û nebes de israrkirine. Ji ber ku tiştekê nade we û tiştekê nade bidestxistin. Dema van tevan diyar dikim, nabêjim lez û bez çar bi çar bin. Hûn rehetî dikarin xwe sererast bikin. Hûn di vê mijarê de serbestin, em heta dawî derfetên perwerdeyê datînin pêşiya we. Lê hûn ê bizanin ku pir cidî bin. Ev ne karê henekane. Tevlîbûnek sist, têr nake, demogojî û bi xwe xapandinê nabe.

Gelekan em seresere girtin dest û wer fikirîn me li gorî keyfa xwe bikar bînin. Ev rêhevalên me jî bin, bi kelogirî bilêv dikin ku çiqas xirabî kirine, bi qasî xwe helak bikin beşdarî pratîkê dibin, dîsa jî nikarin rewşa xwe rizgar bikin. Ji bo nekevin rewşên wisa, hûn ê qîmeta destpêkirinên teze bizanin. Misoger divê hûn li hember jiyanê ne durû bin. Ez bi qasî zarokekê dilsozim û di rewşa ji nû ve dest bi jiyanek nû bikim de me. Lê belê bi qasî feylesofekî yan jî herî kêm weke xwediyê ramanê bi qasî wate bidim karê felsefeyê jî li ser xebatên xwe radiwestim. Weke ku ne gengaze ev neyê dîtin, ne gengaze ku qet encam jî jê neyê derxistin. Em şaş bikaranîn, rewşek tenê dijmin dikare hêjayî xwe bibînê ye. Rastiyên ku min diyar kirîn dijmin ti carî cidî negirtin, min çi got wî kena xwe kir. Niha jî bersiva tawanbariya xwe dide. Hûn jî weke dijmin şaşiya min rast nenirxandinê nekin. Jixwe, hûn ne dijmin, berendamên rêhevaltiyê ne. Hûn ê bibin şopdarên vê rêyê. İsrara di şaşî û nebesiyan de para dijmine, nabê para milîtan. Negirtina cewher, şêwaz, şêwe û tempoya têkoşînê, misoger ne hêjayî şêwaza têkoşîna me û şêwaza Rêbertiya me ye. Zû-dereng şêwaza me ya Rêbertiyê, yan dê we li gorî tê xwestin pêş bixe, rast bike, yan jî pêlê bike derbas bibe. Ez hebim û nebim jî, bingeha vê tevgerê û vê partiyê wisa hatiye avêtin. Ger îxanet lê neyê kirin û ji rê neyê derxistin, heta serkeftinê, heta tam bigihe armancên xwe wê wisa bidome. Pêwîste hûn hewl bidin partîbûna ku evqasî berfireh û kûre û dîroka pêşveçûna wê baş hîn bibin. Bi qasî tevlîbûna rast, li ser bingeha wê ya dîrokî rast mezinbûn jî, ancex bi helwestek wisa ve pêk tê.

Pêwîste hûn firsendê nedin neyêniyên ku tevlîbûnên şaş û nebes ên berê derketine holê. Dema dîroka partiyê digirin dest, pêwîste hûn ji nirxandinên wisa yên şaş ders derbixin. Bi qasî partîbûnek rast, hewce ye hûn mezinbûna di nava partiyê de jî binirxînin û bipejirînin. Ev ji bo hemû qadên şer esasin. Kesên nikarin bi beşdarbûnek wisa ve mezinbûnê bijîn, nikarin ji ti pirsgirêkên jiyana Kurdistanê re –şer dibe, aborî dibe, hest dibe, pêwendiyên malbatê dibe- bibin bersiv. Hemû pêşketin vê didin diyarkirin: Şêwaza PKK, bi tevlîbûnê mezinbûn sazkirin, bi qasî

xwedîderketina raveya azad, serkeftina wê jî sazkirine. Ev berê weke teorî û bîrdozî dihatin gotin, hewl dihat dayîn bi propagandayê ji çend kesan re bê ragihandin. Niha bi ezmûnên şer re milyonan ev selmandiye. Nîqaşa vê jî nayê kirin.

Rast tevlîbûna partiyê û li ser bingehên rast mezinbûn êdî qanûnek jiyanê ye. Ger kesayeta we ji bo vê ne cidî be, pir şaş û nebes be, pêwîste hûn sererast bikin. Rêbaza vê jî perwerde ye. Şerê kesayetî yê ku pêşî hûn li hemberî xwe bimeşînin û veguhertina wê ye. Vê jî wisa ji rê dernexin an jî neyînin rewşek ku mirov nekare ji bin derkeve. Partî alîkariya we dike, destpêkê ez ji bo vê di nava hewldanek bêhempa de me. Li gorî ku bi tena serê xwe hatime heta van pêvajoyan, hûn pir baş dikarin ji ezmûnên me sûd werbigirin. Elbet ev ji we payîn mafê me ye. Weke demên berê hûn nikarin bêjin; “Wisa hatim xapandin û min çareser nekir.” Ger hûn van ji min re bêjin, ne pîvanên rêhevaltiyê ne. Şûna ku hûn bikevin van rewşan, a herî baş hûn qet nêzî me nebin. Êdî em di rêya xwe de saxlem dimeşin, hewce bike dikarin bibin fermandarê herî baş ê leşkerî. Em dixwazin xwe bigihînin milîtan û rêberên gel ên dema hewce kir pir baş dest davêjin her pirsgirêkî. Lewra vê hewldanê dikim. Ev hewldan, hewldanên watedar û bi nirxin.

Madem we jî sond xwarine, bi temamî li ser vî bingehî xwe ji nû ve bi jiyanê bidin serxistin û wê demê mafê vî karî bidin. Di derbarê ku bi sedemên cur be cur ev çawa nehatine pêkanîn û serxistin de ti gotinê nekin. Şûna ku wisa bêjin bihizirin, nîqaş bikin û xwe perwerde bikin. Kesek we bi zorê ber bi şaşiyan ve bibe nîne. Ger fêrbûnên we yên şaş û netebitî hebin, hewce kir hûn ê bi kêrê jê bikin û bavêjin. Elemek bi ziyan dikemirîne û her ku diçe tîne rewşek ku neyê jiyîn. Jixwe, nêvenga me ya partiyê we tedawî dike. Hûn jî girêdayî tedawiyê bimînin. Rêbezên me yên tedawiyê bi qasî mirovên me di rastiyên xwe de ber bi serkeftinê ve bibe hene û ev jî rojane li ser we tên pêkanîn.

Hûn bi qasî pratîbûnek rast, gihan siûdek bi wê re mezinbûnê. Ev ne tenê peywire, kêliya jiyanê ya herî xiroşeye û bi qasî ji nû ve dayîk bibe hêja ye. Siûdek wisa bi pereyan jî nayê bidestxistin. Ez jî bi xiroşa wê ve, çil sale xwe dimeşînim. Hêviya min a herî

mezin, rojekê di nava têkoşîna welatek wisa de, bûna xwediyê şerek wisa ye. Min ji bo vê bîst salên xwe dan. Bîst salin şerê me bi serkeftî pêş dikeve. Şêweya jiyanek ji vê xiroşe bide nafikirim. Dibe ku hinekan hûn xapandibin û hûn bêjin; “Çavkaniyên xiroşên cuda, çavkaniyên azweriyên cuda hene.” Lê ev şaşe. Ji ber halê civak û dijmin li holê ye. Her tiştê wan derew û sexte ye. Ya hinekê bêhempa û rêzdarî kom dike rêya me û şêwaza meşa me ye. Dibe ku, di mijara tevlîbûna we û xwesteka we ya mezinbûna li ser bingeha PKK’ê de kêmasî hebin. Lê ya esasî û her ku diçe serkeftinê misoger dike meşa we ye, ji bo vê ya hewce jî hewldan, ezamet û vîne. Ji bilî vê ne vebijêrkek jiyanê dibe, ne jî wê hinek vê siûdê bide me.

Em partiyek bendên xwe yên pergalê qut kirine û mirina herî wehşî ya ku pergal li ser me ferz dikê ye. Yan wê dijmin dev ji vê polîtîkaya xwe ya bi lenet û serdestiya mêtîngerî berde, yan jî dê me hûr bikin. Ji bilî vê rêya sêyem nîne. Ger ev hemû rast bin –bes ger hinekê aqilê we, qet nebê hûn hinekê aqil dibin, bi wijdan bin, an jî ber bi wijdanê ve tên-, hûn ê xwe bispêrin yên me dane, jidil beşdarî rêya rast û nirxên bingehîn bibin. Nabêjim hûn neçarî vê ne, weke siûdek pir mezin, hûn ê wate bidin vê. Enerjiya bi mirov re ti carî naqede û mirov hebûnek herî mezin a **afirîneriyê** ye. Hûn ê bi ahenga ku ew didê ve bi ser de biçin, qet nebê ji vir û şûn de jiyana xwe li ser bingeha rastiyan û bi şêweyek serkeftî bimeşînin.

**15 Kanun 1994**

## ŞOREŞ ÇALEKIYEK AFIRANDINÊ YE Û FEDEKARIYEK BÊ SÎNOR DIXWAZE

Şer bi hemû leza xwe didome, em jî hewl didin we bigihînin vê lez ê. Rastiyên ku hûn rojane didin der, me neçarî xwe nexapandinê û dehî caran pirsên weke bi kî re, çawa mijûl dibin jixwe kirinê dike. Rastiya şer çiye? Bi vî şerî re mijûlbûnek çawa dibe? Kî dikarin şer bikin? Bê ku ev şer ji leza xwe tiştekî winda bikin me mijûl dike. Ji ber sedema zêdebûna şerê ku em dijîn, divê hûn bibînin ev kar weke hûn dizanin nameşe û wê nemeşe. Elbet dema kesayetên we dibin mijara gotinê pêwîste em bibînin hûn pir mijûl bibin, nexasim teqez ji şaşiyên xwe yên kûr rizgar bibin. Dîsa pêwîste hûn ji kesayetên heta dawî xafîl û xwe dixapîne ber bi kesayeta şerên rasteqîn ve veguherin, nexwe ji bilî hûn di şer de bibin bar nekarin ti rolekê bilîzin û divê em van rewşan baş binirxînin. Dîsa divê bê zanîn ku bi niyazên baş û hewldanên ji rêzê ve bi gotinên weke; "Ji min çi tê xwestin, tevî canê xwe her tiştê xwe feda dikim" ve kes nikare ji bin van karan derbikeve. Em ji we dixwazin hûn rastiya şerê me têbigihijin û bipejirînin. Ev nebê ne genaze ku em we bidin jiyîn. Ger hûn hinekê beramber me rêzdar bin, hûn ê bizanin em çawa hewl didin rojane xwe bigihînin rastiyan, di têgihiştin û pêkanînê de hewldanek çawa didin. Dibe ku hûn bêxem û xafil bin, lê piştî evqasî li ser we hat sekinandin hêjî hinek tişt ne fêmkirina we nayê pejirandin. Hûn dikarin pala xwe bidin zaroktiyê û bi her cure niyeta baş ve xwe jî bixapînin. Lê piştî ku dijmin evqasî îmhayê ferz dike û me jî şer bi germahî anî vê rewşê û piştî ku me jiya, êdî divê ti hêceta we nebe. Çima hûn di şêwaz û tempoya tam tê xwestin de şer nakin? Ger em di halê xwe de bihêlin, weke ku rêjeyek mezin qadroyên me xwe dixapînin, her cure paşverûtiyên ku eleqeya xwe bi şer û jiyanê re –bi jiyanek ji rêzê ve- nîne hêjayî xwe dibînin, rêxistina me jî wisa dinirxînin û dê bi me bidin windakirin. Hem jî wê vê bi niyeta baş bikin.

Milîtanî û leşkertî ne hunerek weke hûn dizanin dimeşê ye. Ev

kar bi qasî hewldan û jêhatiyê **hostatiyê** jî dixwaze. Ger we dest bi vê pîşeyê kiriye, nexwe pêwîste hûn bi israr pirsên pêdiviyên vî karî çine, çawa bicîh tên ji xwe bikin. Siyaset hunera **baldariyê ye**, siyaset hunera **pêşbîniyê ye**, siyaset pîşeya hesasiyet û baldarî û hunera **şiyarbûnê ye**. Hunera rewşên ku piştî salekê rû bidin bi texmînî destnîşankirin û ew sal li gorî berjewendiyên xwe veguhertine, pêşbînî û hewldana vê ye. Dema em bi van ve muqayese dikin, hûn dibin xwediyên nêrîn û reftarên şaş ên ku asoyan tarî dikin, pêşveçûnê radiwestînin, yan jî dibe ku berovajî dikine. Rojane bi qadroyan re hevpeyvînên min çêdibin. Lê dikarim bêjim hêj min yek kes jî ne ecibandiye. Bê ku bihizirin pêşberî wan kî heye, vî şerî çawa dimeşîne, hêdî hêdî û weke belengazan daxivin. Bebekek, zarokek jî evqasî kêm nabe. Lê hemû jî bi vî şêweyî derdikevin pêşberî min û bi rehetî bistehbûna axaftinê raber dikin.

Lê ez ne wisa me. Dema derdikevim pêşberî dostek ji rêzê jî, pir şiyar wî guhdar dikim û ji bo her kêliyê bersiva rast bidim xwe amade dikim. Qadroyên me nikarin ji cihê xwe rabin. Bi nêrînên vale li me temaşe dikin, hewl didin min jî û xwe jî bixapînin. Sondek tê çi wateyê? Seknek rêbertî ya ji rêzê çiye, seknek milîtanî çiye? Ev hemû ne di xema wan de ye. Ancex dilê wan bi gotinên weke; “Tu başî, yemanî û giyana me yî” dilxweş dibe. Em nêzîkbûnek wisa napejirînin. Vaye di vir de bê baldariya we û xwe jiyîna we di astên pêş de ye. Hûn bi ci heqî û bistehiyê dikarin wisa nêz bibin? Piştî ku milîtanek ket nava rêxistinê û erk girtin divê qusurên wî pir kêm bin. Ma mirov bi salan evqasî bi qusur bijî? Di siyasetê de devjê berdin evqasî bi qusur bijîn, di demek kin de jî be, bi hinek lewaziyan ve nayê jiyîn. Ji ber ku hûn nûnertiya miletekî dikin û şerekî bi hemû hesasiyeta wê ve dimeşînin. Mixabin helwest, bêxîretî û çarçurkirina nirxan a ku hûn ê nekarin di ti avahiya dewletê de raber bikin, bi rehetî dikarin asayî pêşwazî bikin.

Şoreş çalekiyek afirandinê ye, fedekariyê ji kes dixwaze. Weke gundiyekê yan jî karkerekî rê ji nêzîkbûnên di şêweya; “Min evqasî kar kir, evqas jî bersiva wê dixwazim” re rê nade. Dibe ku şoreş

heta dawiya temenê we fedekariyê ji we hêvî bike, her tim bixwaze ku hûn bidin. Şoreşgertî jî ev berçav girtine. Lê belê gelek, hinek derfetên şoreşê yên pêş dikevin bê ku ti hewldanê bikin – oportonîst, yên ku bi şoreşek dijber ve dewlet bidest xistine, hewl didin partiyekê bidest bixin, mewkî û yetkiyek bidest xistine ev kesin- bidest dixin. Mane ev siyaseteke.

Şoreş zêde bi zagonan ve jî nehatiye girêdan. Bi rêgezên giştî ve dimeşe û xwe dispêre baweriyê. Lê dema yek bi vê dilîze, hem jî bi niyetek baş, bê ku asta fedekariya ku şoreş fermana wê berçav bigire, hûn dibînin ê ku xeteriya herî mezin ferz dike ew e û yên wisa jî di nava me de zêde ne. Dibe ku li gorî we di şêwaza ku pêwîste bersivek zehmetiyan hebê de jiyanek we heye. Hûn ne şênber dikin û ne jî bi rastiyan ve muqayese dikin. Hûn dibêjin; “Pir dilxweşim wisa li gorî keyfa xwe jiyan dikim.” Hinde ev helwest zêde ne, hûn ê hinekê jî ji vê hêlê ve çima pêş nakevin fêm bikin. Şoreş hunera herî zehmet a civaka ye. Nexasim di rastiya civakek weke gelê me di sînorê tinebûnê de ye şoreş nîtelîkek **awarte** dixwaze.

Ev têgeh hemû ne di xema we de ne. Niha ji bo min a zehmet di vir de ye: Hûn dibêjin; “Heta niha te çawa meşandiye wisa jî bibe. Mane serfiraziyek ku şoreşê dayî me heye. Ev ji bo me nefesa jiyanê ya yekane ye. Em bikarin rojek wisa jî bijîn ji bo me başe.” Di nava me de ew paşayên qereçiyan ên navdar an jî kesên helwestên weke; “Rojekê li gorî keyfa xwe bijî, çi dibe bila be” jî ne kêmin. Lewra xwezayî gelek xwe PKK’yîyên xwezayî dibînin. Ya rastî tiştek wisa jî nîne, lê ev hêjayî xwe dîtine. Êdî divê hûn cewhera vî karî fêm bikin.

Reftarên we li gorî min pir paşverû ne. Nabêjim ji bo min jî vê bikin an jî vê reftarê raber bikin. Lê hûn bi **hunera şer** ve mijûl dibin. Di destê dijmin de ketina rewşa pêlîstok, bê ku şer bike di temenê xwe yê bîstê de mirin pir xirabe û hûn tev dikevin vê rewşê. Bê ku daneyekê ava bikin hûn dimirin. Ez ji vê re nabêjim şahadet jî, hûn berpirsê vê rewşê ne. Kesê ku evqasî xwe ji mirinek erzan re amade kirî, ew bi xwe berpirsê dawiya xwe ye. Şervantiya hostane û yeman ji bo me hewce dike. Şer hunera pêkanîna jiyanê û

dirêjkirina temene. Lê di nava me de weke hunera qedandina temen tê nirxandin. Ji ber paşvetûriyên we em nikarin çavên xwe jî vekin. Dema dibêjim hûn, di serî de yên di eniyê de şer dikin, behsa qadroyên li Awrûpa û qadên din dikim. Çend kesên ku saxlem xwedî li sonda xwe derbikevin tine ye. Yek kesê ku bikare bi şêwaz, tempo û uslubê xwe ve rojane têra şoreşê bike tine ye. Her tim şaşî û qusur mijara gotinê ye.

Yeqîn nakim kesayetên rêber wisa bin. Kesê **Rêber** li her cihî amade ye, her tiştî çavder dike, dibihîse, dike û dide kirine. Rêber wisa dibe. Lê belê yên me hewayek rêbetiyê ya wisa ava dikin, çil carî mehkumî binkeftinê ye. Paşê jî dibêjin; "Em weke hemalan kar û şer dikin." Şer hunereke. Bi qasî hûn bikarin dijmin bin bixin, dikarim vî şerî bipejirînim. Na hûn her roj bin bikevin û bên kuştin, ez di nava vî şerî de tine me. Niha divê hûn van fêm bikin. Rêgeza bingehîn a em bikarin li beramberî hev rêzbar bin ev e. Ez ê cuda çima bi we re mijûl bibim, çima we tengav bikim? Em ê çima hev rast fêm nekin? Ma em pir bêmafin an jî fêmkirina rastiya bingehîn a şer ne pir hewce ye? Ma zêdahiyên jiyana me pirin, em dev ji ya esasî berdin? Na, derfetek jiyana me ya pir sînordar heye û ew jî bi şer tê bidestxistin. Em tenê dikarin bi serkeftinên şer ve bijîn. Li hember vê bala we jî nîne. Hûn bi vê rewşa xwe ve barin. Ji bîr nekin, bavê di nava malbetekî de nikare çend zarokan jî îdare bike. Ger hûn nekarin li ser hunera şer hukum bikin, em nikarin rojane deh hezar kesî îdare bikin.

We vedixwînim cidîbûnê. Bal bidinê, we wêrekiya PKK'yîbûn, artêşbûn û her alî ve li dijî dijmin derketinê raber kiriye. Bi israr diyar dikim ku divê hûn li gorî pêdiviyên vê bijîn. Pirsgirêk ne ku mirov bizane bimirê, bizane bi têkoşînê re **bijî ye**. Niha qadroyên me yên kar bimeşînin tine ne, lê ev weke ku kar dikin xwe didin nîşan. Siberojê dewletek me çêbe jî, yeqîn nakim bi van qadroyan bê parastin. Dê xwe bi xwe dewletê belav bikin. Jixwe di dîrokê de rastiya Kurd her tim wisa bûye. Her çendî serdestên Tirk bêmaf û xirab dibin bila be, zanîne ku bibin dewlet û dewletperestên çavsorin. Em berovajî ne, çavsorî bi dewleta xwe dilîzin. Weke ku qet pirsgirêkek me ya wisa nîne, em dervî vê ne. Jixwe ya ku rewşa

niha pir baş rave dike jî ev nirxandine.

Vêca li dewletperestiya li nav Tirkê serdest binêrin û yên me ku ji dewletbûnê direvin binêrin. Gelek herêmên welatê me yên hatine rizgarkirin hene. Bixwazin dikare dewlet jî bê damezrandin, lê hûn naxwazin serê xwe bi vê bêşînin. Ev pir vekiriye. Dema hûn cixareyekê dibînin, çeteyek ehbap-çawîşî saz dikin, ev li gorî we bese. Asoya dewletekê, îradeya dewletekê û şêwaza we ya rêvebirinê qet ne di xema we de ye. Jixwe dema hûn weke eşkiya yek-du çekan jî diteqînin, daxwazên we bicîh hatine. Ev paşvetûriyên mezinin. Bi vî rengî belaya herî mezin hûn ne tenê tînin serê xwe, li ser serê me jî belav dikin. JI ber Rêbertî hinekê hewl dide bibe dewlet, hûn ji bo ji dewletbûnê derbikevin çi hewce be wê dikin. Di serî de jî nikarin bihizirin, hema ji fikra dewletê û fikra siyasî direvin. Hêj hûn nikarin perwerdeya xwe bimeşînin. Xeteriya siberojê çavkaniya xwe ji qîmeta îro nezanînê digire.

Xisletek dîroka Kurd heye: Pir ji xwebere, pir bê amadekarî dest bi îsyanan dike û hemû îsyan jî li serê wan dibin belayek mezin. Niha jî yên di nava me de dixwazin heman tiştî bînin serê me. Ger me bi berpirsyariyek mezin hêza li ber xwe dayînê raber nekiriba, em ê hezar carî bi çalekiyên yê me ve tine bûna. Elbet me ev nepejirand, me li gorî xwe li ber xwe da û hêjî berxwedaniya xwe didomînin. Wexta gelek heval xwe binirxînin, wê bibînin ya rastî ji mêj ve winda kirine. Ya rastî hûn jî bê ku şer bikin mirine û winda kirine. Xwe ne dahûrandin û ji şer re ne amadekirin, ji mêj ve mirin pejirandine û ev jî vînê dikuje. Vîn nebe jêhatî jî dernakevin holê, dema dernekevin hûn nikarin şer bikin. Jixwe niha trajediya min a herî mezin ev e. De vêca were yê xwe evqas dixapîne bide şerkirin.

Hûn jî dibînin, jinên ku nizanin du gavan bavêjin dervî mala xwe, di nav refên me de tije bûne. Nabêjim çima tevlî refên me dibin. Zextên civakê hûn pir tengav kirine. Lê hûn ê bizanin ku rêxistina me jî ne weke hûn dihizirine. Ez kesek wisa me min hêj di deh saliya xwe de bi dayîka xwe re şerek dijwar meşandiye. Ger li gorî min nebe, dayîka min jî be, dibe sedema şer. Bes hûn tevlî têkoşînê dibin, lê bêxîretin û zêde jî kêrî karekî nayên. Ez jin û

zilamê wisa napejirînim. Hûn ê Rêbertiyê rast fêm bikin. Dilnizmim, heta dawî xizmeta gel dikim, lê ger ew jî bizanin şer bikin ez ê bipejirînim. Na, ger axatî, bêxîretî û durûtiya xwe ferz bikin, wan jî efû nakim. Ji ber min nîv demjimêrî jî dayîka xwe ne pejirand. Çima van bipejirînim?

Kesê ku dixwaze bi min re bijî, berî her tiştî berandemek şer ê bêhempa ye. Kesên ne berendamên şer ên bêhempane nikarin yek çirkeyê jî li semta min rawestin. Êdî dev ji gotinên weke; “Malbatperestî, em nikarin PKK’yîbûnek xwezayî bikin” berdin. Hûn ji kur van fêr bûne? Kesên ku dixwazin li qada min, di bin fermandariya min de bijîn û têbikoşin, divê hinek xislet bidest xistibin. Me bi **Kemal Pir’an** re nîv demjimêrî hevdîtin pêk anî, heta mirina xwe bû berxwedêr. Di dîroka PKK’ê de milîtantiya wisa heye. Hinek tên nava refên me xwe weke axayan bicîh dikin, weke şanedar tavêjin nava rêxistinê. Jin jî, zilam jî bi vî halî ve nikarin yek rojê jî di nava partiyê de bisekinin. Em li beramber mirovên xwe rêzdarin û dixwazin wan mezin bikin. Ya rast ev e û hêjayî wê bûyîn, eleqedariya me rast fêmkirin, hêz û wêrekiya em didin misoger divê li gorî armancê guncav bê nirxandin.

Hûn nikarin di nava PKK’ê de li gorî dilê xwe bijîn, heta şer bikin û li gorî keyfa xwe çeka me jî bigirin. Malbatên we hûn avêtine naverastê û sosret mezin kirine. Ger hûn tolaz û nebes bin ez ê bi vî halî çi ji we bikim? Li beramber we sebir dikim û ji her tiştî zêdetir nirx didim perwerdeya we. Pêdiviya we pir zêde bi perwerdeyê heye. Ger perwerde nebûya, li rûyê we jî nedihat nêrîn. Çima rûyê Kurd tine ye, çima kes silavê nade we? Ji ber ku kes we mirov nabîne. Ev rewşa we ancex bi perwerdeyek dagirtî û şervantiyek dijwar ve bê derbaskirin. Ev nebê nirxek pênc quruşî jî ji we re nayê dayîn. Modayek derketiye dibêje; “PKK rêxistinek bi şeref û serfiraze, wexta we navdengiya PKK’ê girt, tê wê wateyê ku hûn jî bi şeref û serfirazin.” Ev dişibe rewşa xafilê ku dema navê xwe dike muhammed wisa xwe nebî dihesibînê. Navê xwe kirina PKK ve mirov nabê PKK’yî. Lewra şeref û serfiraziya PKK’ê wisa nayê parkirin. Berxwedaniya PKK’ê ya mezin û bi kedek mezin bidestxistina nirxan heye. Ger li ser vî bingehî parvekirinek we jî

çêbe, hûn dikarin hêjayî PKK'ê bin. Şaşiya we ya li ser vî bingehî kûre, pêwîste ev bê derbaskirin. Hewce dike hest û hesasiyetên we pêş bikevin.

Bêguman nêvenga partî zelal, bi coş û heta dawî azad dihêlim. Ev peywira mine. Lê ji ber ku ev wisa ye, hûn nikarin bi hemû qirêjî, paşverû û her cure nexweşiyên xwe ve werin li ser nirxan birûnin. Li gelek cihan bi sedan nexweş tên û weke nexweşxaneyeke li nava partî rûniştine. Lê nêvenga me, qadek ku şervanên di asta bilinde pêş bikevine. Lewra nêvengê azad û zelal dihêlim. Tevî dehên caran min ev destnîşan kirine, gelek weke stran dihesibînin, heta ne weke stran, guhek wan re dikeve di yê din re derdikeve. Dema hinekê jî bi ser wan de diçin, vê carê jî berbelav dibin û li erdê dikevin. Bi vî rengî jî derdikeve holê ku çiqas xafil û necidî ne.

Madem hûn hatine bibin leşker, hûn dibêjin; "Em ê bibin artêş û gêrîla", nexwe kesayeta wê raber bikin. Roj weke avê derbas dibin, divê wextê xwe baş binirxînin. Hûn ji bo çi sekinîne? Hûn ji perwerdeyê tengav dibin, em dişînin şer, di şer de jî pêşve naçin. Hûn xwedî kesayetek valene. Ne sîxurin dibêjin; "Em ji dil û can amade ne." Vêca hûn çima pêwîstiyên vê pêk nayînin? Hûn ciwanên bîst salî ne, çima ruhê xwe xirab û erzan bikar bînin? Hêza kî ji we têra xebatên mezin dike. Hûn nikarin du gotinan bikin. Ya rastî rewşa gelek ji we ber rizgarkirinê ye. Ez vê baş destnîşan dikim. Hûn dibêjin; "Ez ê biçim nava PKK'ê, xwe bavêjin nêvenga partiyê, jixwe dê PKK me xwedî bike, bi şêweya şanadar û eşîret bide jiyîn. Ger karekê jî bidin, em ê jî weke hemalan kar bikin." Lê belê rêxistina şoreşger ne wisa ye, nexasim rêxistina şer qet wisa nabe.

Nikarim derfeta rehet ya kêşana cixareyekê jî bidim xwe. Ji bom in xewek rihet jî nîne. Ger nêvengek rehet hebe jî, rehet nabim. Gel beramberî min eleqeyek awarte raber dike, lê qet nekarim ji bo wan wext veqetînim. Ji ber derd û kulê min cuda ye. Yek hestek min heye; ew jî hîskirin, fêmkirina şer û li gorî pêwîstiyên wê jiyîne. Ji ber ku dizanim jiyan girêdayî vê ye. Cîhanê jî bidin min, dema derfetên şer pêş nekevin, dernekeve

holê, tê wateya ez mirîme. Mixabin hûn naxwazin me fêm jî bikin. Weke ev hemû pirsgirêkên minin hûn nêz dibin. Ev weke nêzîkbûn û ruh bi temamî şaşe. Hûn ê bizanin ku di vê mijarê de cidî bin. Ji bo em cidiyetê fêrî we bikin, ma hewce dike em jî weke serbazên Tirkan rojê du caran bigirin beramberî xwe û zilehan li we bidin, dûjînan ji we re bikin? Ev ne rêbazek raste. Ya herî rast mirov bi vîna xwe ya azad ve têbigihije. Ev ne bê berpirsyariye û nabê keyfiyet jî. Gelek vê helwesta me ji bo keyfa xwe dinirxîne. Kesê ku vê wisa digire dest, wê di encamê de xirabiya herî mezin li xwe bike. Ji ber ku dîsîplîna me ji ya artêşên burjuva pir bihêztire. Li nav me rê ji keyfiyetê re nîne.

Zêde hêvî nadim. Ji bo gelek hevalên me, em dihizirin gelo em vê erkê bidin dê çiqas bikare pêk bîne. Gelek nakevin çavên min. Ji ber xwe pir dixapînin, jiyanê û bi jiyanê re jî têkoşînê jihev dernaxin. Hestên wan ên hirs û tolgirtinê lewazin. Bi qasî bikarin xwe bi cixareyekê re mijûl bikin xafilin. Dijmin tê heta ber bêvila wan, bi qasî nekarin bibînin –di wateya siyasî de- korin. Li hemberî me nikarin du gotinan bikin. Lê min di derketina destpêkê de weke fîşekê du gotin kirin, hêjî wisa me û her gava min jî wisa ye. Ger ji wan re bimîne dev jê berdin em bi dijmin re şer bikin, wê ya herî jî xirab bikin. Hemû jî niyaz baş û temenê xwe ji bo vî karî bexşandine. Lê belê siyaset û leşkertî pirsgirêka şêwaz û tempo ye. Ev bi wan re nîne. Kurd dixebite lê ji kî re? Di cîhanê de miletek ku ji me zêdetir kar bike nîne. Lê ji me feqîr û hejartir jî nîne. Hevalên me vê rewşê di nava partiyê de jî didin jiyîn û ji min jî erêkirina vê tê payîn. Erêkirina vê rewşê tê wateya di nava partiyê de destûrê bidim koletiyê û bila her kes li gorî xwe bijî ye. Di nava hezaran bîrîmên li serê çiyan kesên pir nebes, pir keyfî û ji xweber dijîn hene. Em jî dixwazin vê biguherin.

## PKK Tevgereke Azadiyê Ye

Ez rêberê rêxistinek têkoşînê me û şerekê dimeşînim. Nikarim bi zarokbûna we yan jî xwe xapandina we re lihev bikim. Dema rewşa we ya bi îsyana di deh saliya xwe de tînim beramberî hev jî, dibînim ku hesasiyetên we pir paşverû ne. Di ferzkirinên we de du nêzîkbûn hene: Hûn dibêjin; "Yan bila dijmin me weke kole bikar bîne, yan jî PKK" an jî "Ger dijmin em nekirîn bila PKK me bikire û bikar bîne." Em vê napejirînin. Ji ber ku PKK, rêxistinek azadiyê ye, rêxistinek şere. Weke dijmin mirovên xwe bikar nayîne. Ji bo serfiraziyê rizgar bikim, evqasî hewl didim. Armanca min a sereke, bê ku li hember dijmin têk biçim, bikarim bîjîme. Vêca vê ji xwe bipirsin. Hûn dibêjin; "Jixwe nêveng rehete, em bimirin jî ne xeme, me rojekê ev şeref parve kir, besî me ye." Ev hemû şaşin. Behsa rizgariyê û çawa xwe bigihînin armancên milyonan bikin. Pirsgirêk ne tenê hûnin, jixwe hebûn û tinebûna we hûn bi xwe ne. Hûn dibêjin; "Wê çi ji min bê, mafê min, daxwazên min, jiyana min çawa be?" Ev fikarên we tev di derbarê we de ye. Gelo di derbarê partî û dîrokê de gumana kî heye?

Malbatên we û dijmin hûn weke belayekê avêtine ser serê me; ez jî dipejirînim, lê hûn ê quralên me bizanin. Hûn ê bizanin bibin şervanek azadiyê yên pir yeman û di wextê de û hêjayî xwe bibînin. Ger hûn bi van şertan di nava me de bimînin, em ê her cure xizmeta we bikin. Ez ê bi xwe jî rojane her tiştî pêşkêş bikim. Lê ger hûn bi vê bilîzin, ne li gorî pêwîstiyên vî karî bin, çavên min jî bin misoger ez ê derxim û bavêjim. PKK ev e, bila ti kes PKK'ê cuda fêm neke. Nexasim weke wan kêfkarên ku dibêjin; "Artêşa PKK'ê heye, Eniya wê jî heye, em dikarin li gorî dixwazin vî karî bikin jî, nekin jî", hûn qet nikarin nêz bibin.

Gelek derfet û mewkî derdikevin holê. Me parlemento jî îlan kir. Dijmin jî vê weke "Komediya yekemîn, komediya duyem" dinirxîne. Dijmin dibêje; "Van hukumet jî îlan kir." Elbet dijmin dixwaze van weke du komediyan bigire dest. Ji bo ev xebatên me

bibin komedî jî wê her cure hewldanê bike. Lê belê ya para me jî dikeve ew ne weke erkek komedî, weke gavek herî bi şan û şeref a dîrokî pêkanîne. Yên di nava vê saziyê de, ger pişgiriya me ya rojane nebe dê bikarin bijîn? bi fikarim ku, dê vê jî fêm nekin. Ango ev nirxên bi kedek mezin derketine holê kî dizane wê çawa şaş şîrove bikin û veguherînin komediyek ku dijmin çawa kenê xwe pê dike. Gumana me ev e. Ji ber vê hûn ê mafê van saziyan bidin. Ji bo ev xebat nebe komedî, divê hûn vî karî ser bixin.

Berê her kes çawa nêzî me –dema dibêjim me behsa Kurd an jî mirovê bindest dikim- dibû? Îro mirovê bindest, Kurd herî zêde kenê xwe pê dikin, ti carî naxin şûna mirovan, wisa dinirxînin û ev jî şermek mezin ava dike. Ji bo ji vê şermê rizgar bibim, min ev çalekî sazûman kir. Elbet hûn vê fêm nakin û dibêjin; “Jixwe PKK mezine, xwedî şane, her kes li hember dilerize, her kes li hember rêzdare.” Ez rewşê weke we nabînim. Hûn dişibin vê: Hinek zarok hene, dibêjin; “Nizanim dê û bavên me wisa mezinin.” Çavên wan ji wî zêdetir tiştek din nabîne. Şêwaza we ya dîtina PKK’ê jî hinekê hestiyar û şoventî ye. Ya rastî PKK’yek wisa nîne. Lê ji ber ku hûn zarokên pir bê çare û bê hêzin, dixwazin wisa bibînin. Werin ji min bipirsin PKK’ya rastî çiye. Hûn ê çima fêr nebin PKK’ya rasteqîn çiye? Hûn ê çima bi israr rastiyan bi hestiyariyek zaroktî û li gorî niyazên xwe yên sûbjektîf şîrove bikin? Ev nêzîkbûnên we şaşin. Ji kîjan alî ve binêrin bila be, pêwîstiya bûna rasteqînî û li ser wî bingehî jî bûna têkoşerî heye. Ji bilî vê ti çareyek we ya din nîne.

Ji bo tevlîbûna we ya ji têkoşînê re tiştekê nabêjim, lê êdî hûn ê bizanin ku hêza we têra qanûnên şer bike. Ji bo vê jî hûn ê şev û roj xwe perwerde bikin. Hûn dikarin ji hevalên bi ezmûn jî gelek tiştan fêr bibin. Em we di halê we de bihêlin, hûn kena xwe dikin û bi hev re ehbap-çawişiyê dikin. Lê hûn nikarin yek demjimêrê vale derbas bikin. Lûksa we ya wextê nîne. Hûn bi şereke tund re rûbirû ne. Jixwe ji bo hûn biçin bimirin jî em we naşînin şer, serkeftin ji we tê payîn. Pêwîste destpêk her roj wisa bên kirin. Em çawa coş, hêvî û kêfxweşiyê didin û ji bo we jiyanê watedar dikin, ger hûn jî hinekê bi namûs bin, ji bo derdora xwe jî wisa bibin çavkaniya coş, kêfxweşî û hezkirinê. Çima hûn her tim hewl didin yek alî bigirin?

Ma evqasî ferdperestî û xweperestî dibe? Hûn dudilî, newêrekî û belengaziyê li ser derdora xwe ferz dikin. Eleqeyên we lewazin, keyfa we xirab û belave. Hûn bi van helwestên xwe ve gefan li rêxistinê dikin û hêz jî didin dijmin.

Ez hewl didim dijwariya îrade û mezinbûna kêfxweşiyê bidim hemû netew û mirovatiyê. Ez jî mirovekim û ti ferqa min ji we nîne. Ez jî mirovê peywirê me û milîtanek weke we me. Neçarim rastiyan wisa fêm bikim, nikarim li hember rastiyan xwe bixapînim û durûtiyê bikim. Mixabin hûn çiqasî xwe dixapînin û durû ne! Dibe ku hûn qet ne divê ferqê de bin. Ji ber ku civaka me, civakek xwe li ser bingeha **derewan** dihilberîne û tine dikê ye. Li cem me derewa derewê, derewkerê derewkeran şêwazek serwere. Her kes hevdu dixapîne. Êdî divê dev ji van helwestan bê berdan. Yê egîd xwediyê sonda xwe ye. Ji bo bibe xwediyê sonda xwe jî bi salan amadekarî tê kirin û kedek mezin tê raberkirin. Li hember dostekî, heta dijmin jî şûna ku ez ê lewaz û bi nexweşî bim, ez ê lenetê li xwe bînim û dernakevim pêşberî wan. Lê hûn weke miriyan derdikevin pêşberî me. Nikarim weke we derbikevim pêşberî gundiyek ji rêzê jî. Mirov bi van lewaziyan ve dernakeve pêşberî dijmin û wisa bi nexweşî nayê asta kedemeyên bilind ên partiyê. Bes hûn van tevan asayî dibînin. Lê ev xeterin û rewşên mirov bêje heyfin. Koletiya girane, tiştên kirêt ên dijmin dayî we ne. Pêwîste yekser ev rewş bên derbaskirin.

Misoger hûn ê bizanin mezin bifikirin û mezin tevbigerin. Ger hûn van nizanin, hûn ê bi pêdiviya hînbûnê bihesin. Hinek tevî ku nizanin pêwîstiya hînbûnê jî nabînin. Mafê me tine ye ku em evqasî zerarê bidin xwe. Dijminê me hem jî di asta me qehir bike de li me dide. Em jî neçarin ku hinekê mezin bin. Elbet ji bo vê em ê jî hîn bibin û xwe jî bêhempa perwerde bikin. Bi qasî bikarin dijmin bibin bixin, hûn ê xwe pêş bixin. Min bi zorê hûn tevlî refên me nekirin, nexwe yê tevlî refê me dibe wê bizane şer jî bike. Mirov di gorê de jî be, divê bizane ku pêwîste hesab bê dayîn. Nêzîkbûna bêje; "Ez ê bimirim" an jî "Kes nikare li serê çiyan hesab ji min bixwaze" şaşe. Mane tê gotin di mehşerê de hesab tê dayîn, ev têgehek raste. Dema hewce kir divê hûn bizanin di mehşerê de jî

hesab bidin. Hinde dijmin hûn bê îdîa, bê hesab û kîtap hiştine, dibêje; “Tu çiqas şaşiyan bikî bike, ji te hesab nayê pirsîn.” Ez van helwestan napejirînim û hûn ê van derbas bikin. Neçar nînim ku van paşverûtiyên we rabikim. Li hember hevalan rêzdarim, lê ji bo pêşketina we van xalan diyar dikim. Ji bilî vê min weke kesê di cîhanê de herî hişk û bê feraset binasin. Divê hûn hêrsa min binasin. Weke din nêzbûnek cudatir jî ji min hêvî nekin. Nêzbûna bi min re di çarçoveya esasên siyasî de ye û li gorî pîvanên rêxistinê ye. Dema li gorî van pîvanan be, heta dawî jiyanê parve dikim, dema nebû jî diqewitînim. Mirovên tîpên wisa xwe dixapînin nikarin di nava PKK’ê de bijîn. Kesên pak, niyaz baş û bê xêr jî nikarin bijîn. Em neçarin PKK’ê weke rêxistinek şer a yeman bigirin.

Di reftarên we de kêmasiyên mezin hene. Dîsa gelek qadên me yên xebatê hêjî xwe negihandine şêwaz û tempoya ku hewce dike. Weke min beriya niha diyar kirî hesasiyet û hişyariyên min hene. Yekser li ku derê çi bûye bi min dide hîskirin û encamên wê radigihînim. Tê zanîn ku di van mijaran de wisa hêsan naxapim. Ger hûn girêdayî û rêzdar bin, xwe li gorî van hesasiyetan bipîvin, rakin-danin û tişta ku ferman tê dayîn û pêwîste bê kirin çine, gav bi gav hewl bidin xwe bigihînin wê.

Ez di mijara mirov çawa dikeve nava PKK’ê, çawa dibe şervanê PKK’ê de pênaseyek vekirî dikim. Ji bilî vê pîvan nas nakim. Min bi bê ferasetî û cîhana mirov a hundur ne naskirinê tawanbar nekin. Ev nirxandinên şaşin. Yekî bi qasî min miletê xwe jî, mirovê xwe jî binase nîne. Kesek bi qasî min bi mirovahî û mirov ve mijûl bibe nîne. Em li pey **mirovê azadin**, li pey mirovê hêjayî jiyînê ne. Em ji mirovê bi lenet, ketî û bêxêr direvin. Ma ez ê çi ji mirovê wisa bikim? Çil sale ji van direvim. Hûn nikarin min bi van ve girê bidin, bi mirovên paşverû û têkîliyên mirovên paşverû ve bigirin. Yek sedema min şoreş pejirandî jî ev e. Min li ser vî bingehî dest bi şoreşê kir. Ez di nava cîhana van pêwendiyan de tine me. Ji van pêwendiyan direvim, bi şoreşê re van dihilweşînim û ji nû ve çêdikim. Vaye niha jî min ev pêk anîne. Vaye Rêbertî ev e. Min tika ji we nekir ku hûn werin cem Rêbertiyek wisa, hûn bi

çavsorî hatin cem me, nexwe hûn ê me fêm bikin. Nikarim bibim rêberek weke reîstiya bavê we û axayê eşîrekê. Nikarim rêbertiyek weke cendirmeyekê jî bikim. Hûn çîrok û şêwaza Rêbertiyê hîn bibin. Ji ber ku daxwazkarê vî karî hûn in. Hêvîdarim her kes fêm dike dixwazim çi bêjim. Çi tevlîbûna nû, çi jî yên kevin dibin, wê bi baldariyek mezin xwe bike xwediyê destpêkirinek saxlem û xwe nexapîne.

Li hember mirovê ku hewl dide xwe jî, min jî bixapîne hêrs dibim. Hûn ê vî karî xapandinê bi dawî bikin. Wisa nebêjin; "Dê her tiştê ku bikim ji min re bimîne." Li her cihî ji we re dimîne, lê di nava PKK'ê de erênî yan jî neyênî çi karê bê kirin bê bersiv namîne. Karê te kirî baş be, tu başî, xirab be tu xirabî û di heman kêliyê de bersiva vê jî derdikeve holê. Nêvenga me zelale. Nêvengek pîvanê her tiştî tê girtine. Hûn jî xwe di van mijaran de bi niyetên sûbjektîf nexeniqînin. Di vê mijarê de îstîsna jî tine ne. Dersên ku pêwîste her kes bigirin hene. Em di nêvenga xwe de objektîf nêzî her hevalekê dibin. Kesek ku pir dûrî me yan jî pir nêzî me nîne. Reftarên pir nêzî me, rêgeza pir nêzî me û şêwaza pir nêzî me heye. Kî nûnertiya vê bike ew endamê partiye, di xeta Rêbertiyê de ye û milîtane. Girêdan li ser vî bingehî ye. Li cem me eleqeya taybet û ehbap-çawîşî tine ye. Jiyan temamî bi pîvanên siyasî û pîvanên rêxistinê tê pêşxistin. Ji bilî vê her tişt durû û xwe xapandine.

Misoger hewl bidin ne tenê bi hestiyariyan, bi rastiyên bingehîn ên siyasî û rastiyên rêxistinê ve bijîn. Pêşî divê ya pêk were ev e. Ji bo fêmkirina vê jî bi qasî nan û avê pêwîstiya we heye. Ji ber ku şer pir dijware, ev jî mirovê ku bikare li hember vê li ber xwe bide û ser bixe dixwaze. Ez ê kar bikim, lê ev şer tenê bi min jî nayê serxistin. Ya xeter şer tenê bi min bê sipartine. Hêj duh Cîgirê Wezîrê Karê Derve yê Emerîkayê ev digot: "Serê mar li Şamê ye, heta ku serê axtapot neyê perçiqandin, ev naqedin." Ev nêrîn vê nîşan didin: Ya rastî ji operasyonan, birîna hinek şax û baskên di nava welat de bê hêvî ne. Ji ber ku serî heye, ji nû ve diafirîne. Jixwe dema te baskên axtapot birî jî ew xwe ji nû ve ava dike. Ji ber wê dibêjin; "Divê serî bê girtin." Her roj zext li ser zextê, hêz li

ser hêzê pêş dixin. Ji ber ger hûn bal bidinê baskên axtapot ne saxlemin. Weke di asta baskên axtapot de jî nabînin. Hêjî şerkertiyek girêdayî yek kesî esas digirin. Ev jî bo min jî xeteriyek mezine. Divê şer tenê bi min ve neyê girêdan. Ne bi hebûn û tinebûna min ve, divê di çarçoveya quralên xwe de bimeşe. Ev pir girînge.

Ez ê dîsa xizmetê bikim, ji ya heta îro min kiriye baştir jî bikim. Lê hûn jî ji xwe bipirsin wê di vê xetê de çawa bê şerkirin û hîn bibin. Di vê mijarê de jî bê tawîz bin. Ji ber ku ya mijara gotinê ye weke kes jî jiyana we ye. Xwe sipartina hêza min ve nejîn û wextê xwe jî vale derbas nekin. Xwe sipartina hêza min ve li ser bingehek bi şeref, hêzdar û dewlemend bijîn. Ez alîgirê jiyînek wisa me. Di jiyana min de belengazî, bêçaretî, hejartî û rebentî nîne. Di jiyana min de serfirazî, bêhempabûn û dewlemendiya heyberî û manewî heye. Ji roja destpêkê heta niha ev hene. Lê ger hûn nikarin wisa bijîn ez ê çi bikim. Yên tawanbar hûn bi xwe ne.

Di encamê de hemû xalên me destnîşan kirine, pêwîste pêkanîna esasên tevlîbûn û destpêkirinê derxe holê, ya herî girîng jî ev kêlî bi kêlî pêkanîn ji dil nêzbûne. Misoger li ser vî bingehî pêşveçûn ji we tê payîn. Wê hemû qadroyên me carek din li ser vî bingehî rola xwe bilîzin. Tevlîbûnek ji rêzê jî misoger wê di vê çarçoveyê de lez xwe bigihîne pêvajoyek pêşketinê.

**19 Nîsan 1995**

## MIFTEYA SERKEFTINÊ YA ZÊRÎN PARTÎBÛNE

Dîrok her wextî ji bo dozek mafdar mirovên **îdealîst** dixwaze. Bê ku li jiyan û berjewendiyên rojaneyî binêre, ji bo hêvî û mexsedê jiyanê ferz dike. Kî vê bike rê ji pêşveçûn, serkeftin û rizgariyê re vedike. Pêşengtiyek wisa nebe, doza herî bi mafdar jî nikare xwe ji dîrokê tinebûnê rizgar bike. Lewma heta dawî rastiya nêvenga me ya perwerdekar û veguherîner bijîn. Di serî de bandora herî paşverû û belavker a jiyana kevin hilweşînin. Şoreşgeriya di nêvenga PKK'ê de ji hemû jiyanên din hêjatire. Ger hûn xwe bigihînin rastiya vê, hûn ê fêm bikin çiqasî pêdiviya me bi qadroyên bi bandor heye.

Şoreşgerên Tirk jî çiqas bikarin bersiva pirsgirêka qadro û kesayet bidin, misoger dikarin şoreşê pêş bixin. Em jî van xebatan dimeşînin û li vir pirsgirêka kesayet digirin dest. Jixwe herî zêde ev ji bo me hewce ye. Em ji bo serkeftina mezin a di nava PKK'ê de, deyndarê sebir û înada herî mezin a di vê xebatê de ne. Niha ya ku hemû pêşketinan diyar dike, ev lêhûrbûna li ser rastiya partiye. Her ku me karî hêza vê ya jiyanê raber bikin, ewqas jî me pêşketin saz kirin. Yên ji vê jiyanê revîne, li her cihî û her wextê winda kirin. Lê belê yên di vê jiyanê de israr kirin, bi îdîa û înadek mezin bi ser de çûn, rê nedan kêmasiyan zanîn ku ser bixin. Hêvîdarim hûn vê weke heyî dinirxînin. Ger egîdî, jidilbûn û fedekariya we hebe, pêwîste ev bi milîtanbûnê encam bibe. Ya ji bo me hewce jî ev e.

Pir dijwar pêdiviya me bi mirovên ku di peywirên xwe de serkeftî heye. Komek biçûk jî di nava civatek biçûk de dikare serkeftinê bidest bixe. Misoger divê hûn vê şansê û firsendê li ser vî bingehî binirxînin. Wexta we got; "Em amade ne", bizanin hûn ber bi gavavêtina herî girîng a dîrokî ve diçin. Di nava we de ya baweriya xwe bi xwe tîne, dixwaze rist bilîze, di vê wateyê de pêwîste bizanin emade bin. Nexwe dê rêya jiyanê bixetime. Îro di nava pergalê de rêya jiyanê xetimiye. Êdî her kes dibêje pergal bi

temamî tine bûye. Dibîne ku Komara Tirkiyê ji hêla teorîk ve tine bûye, ji hêla pratîkî ve jî tinebûna wê êdî girêdayî gavên pratîkî yên şoreşgerî ne. Wê gavên pratîkî yên şoreşgerî jî milîtan bavêjin. Wê jiyana nû li ser vî bingehî derbikeve holê, weke alternatîf, weke qonax li hember jiyana ku tine bûye, dê xwe biselmîne. Vaye wê nûnertiya vê jî milîtan bike. Israra we, xwe dîtin û ber bi serkeftinê ve çûyîna we di vê wateyê de ye. Egîdî jî ev wate bidestistin û nûnertiya wê kirine.

Di nava we de yên asta wan a çandî paşketî, bê ruh û heta dibêjin; "Bes xwe bavêjim nava PKK'ê, çawa dibe bila be", tam di rewşa bên rizgarkirinê de ne. Kesên wisa nikarin PKK'ê qirêj û bêrûmet bikin. Misoger pêwîste her kes bikare xwe li gorî ruh û şêweya PKK'ê tevlî bike û bibe xwedî destpêkirinekê. Nêzîkbûnên feodal-malbatî û ehbap-çawîşî yên pir paşverû qetiyen nayên pejirandin. Kesên ku rastiya me ya bîrdozî û siyasî esas nagirin, teqez wê rê ji me nebînin û nekarin xwe ji tesfiyebûnê rizgar bikin. PKK ne qadek ku kesên kor, kulek, kole û xetimî bikarin lê bijîne. PKK, partiya mirovên ku dizanin lê bidin û pêşve biçine. PKK misoger warê mirovên ku pêwendiyên civakî yên paşverû bi erdê re dike yek û şûna wê jî pêwendiyên hêjayî jiyînê derdixin holê ye. Partî ne cihê kesên ku di jiyanê de îflas kirine û bi serê xwe nikarin bimeşin xwe didin rakirin û dispêrin me ye.

Hûn ê misoger bi gelemperî pênaseya partiyê, taybet jî dîroka PKK'ê tê çi wateyê rast fêm bikin. Ger pêdiviya min bi fêmkirina van mijaran hebûya, min ne dixwar, vedixwar, dernediketim hewa nedigirt ez ê van fêr bibûma. Hêjî tê gotin ku di rêveberiyên me de ferdperestî tê jiyîn. Di tevlîbûna wan de jî behsa bêruhiya wan tê kirin. Pir vekirî bêjim, pêşberî me wisa bûyîn, heta dawî bê pîvanî, bê hed û bê rêzî ye. Me di nêvengek tiştek neyî, her tişt û her kes dijberî me de, ji bo xwe bigihînin pêwendiya yek kesî, pêwendiya dostekî, gotinek rast, em hezar carî li ber digeriyan, me gavavêtina yekemîn di nava dijwariya hewldana salan de domand. Li holêye ku ev tê çi wateyê, tevî vê hêjî hûn nikarin biryarek rast a partîbûnê bidin. Hûn ji xwe napirsin dikarin partîbûnek çawa pêk bînin. Ne pêkanîna kesayetek bîrdozî û siyasî, ne bûna kesayetek hêvî û siûda

jiyanê, tê wateya di kesayetek ku em nikarin bêjin pir paşverû û ferdiye de israrkirin û derfetên partîbûnê yên me bi zorê bidest xistine çarçûrkirine. Mafê yek ji we nîne vê bike. Hûn neçarin hişê xwe bînin serê xwe.

Yên partîbûnê nezanin, nizanin bijîn jî. Yên xisletên partîbûnê yên bingehîn di kesayeta xwe de nedin avakirin, nikarin di nava me de cîh bigirin. Cîh bigirin jî, weke hêmanek dervî çînayetî, weke kesayetên dervî xetê, wê sîxurtiya aliyê beramber bikin. Wê ew kesayet zû-dereng winda bikin. Niyeta wan a baş çi dibe bila be, li kêleka yên bi salane partîbûn pêk ne anîne, yên nû jî tevlî bûne ku partîbûnê evqasî hêsan digirin dest, nêzîkbûnek nayê efûkirine. Em tevgerek partîbûnê li pêş her tiştî digirine. Ji bo me ji nan û avê zêdetir, heta beriya hewayê jî pîvanê partîbûnê ye. Em heta niha bi van pîvanan pêş ketin. Ger me destûr daba hûn partîbûnê bikin qurbanê keyf, bêruhî û bê xîretiya xwe, niha em hezar carî bi erdê re bibûn yek. Yên nû tevlî refên me jî dibin di nav de, bila ti kes xwe di vê mijarê de nexapîne. Divê hûn yek kêliyê jî pêdiviya bûna partî ji serê xwe dernexin. Pêwîste di vê demê de pîvanên PKK'ê bên fêmkirin û pejirandin. Ti pîvan ji pîvanên partiyê bi nirxtir nîne, hewce jî nakin. Yên xwe dervî pîvanên partiyê digirin, wan pîvanan xirab dikin, niyet û nav çi dibe bila be, ji bilî zerarê herî mezin didin tiştek din nayên ravekirin. Hemû xisletên wan çiqas erênî dibin bila be, yên xisletên wan ên partî paşketî bin, nikarin xwe ji zerara mezin dayîna partiyê rizgar bikin.

Îro rêya jidilbûna di îdîaya azadiyê de, partîbûna raste. Ti pîvan bi qasî pîvana partîbûnê wate nade azadiyê. Kevirê we yê pîvanê, rewşa we ya li hember partîbûnê ye. Bersiva pirsên hûn çiqasî netewî, çiqas çînayetî, çiqas siyasî û çiqas rêxistinî ne, girêdayî bersiva xalên çawa beşdarî partiyê bûne û bi pîvanên partiyê çiqas dijîne. Niha pirsgirêka herî bingehîn a PKK'ê jî, paşverûtî, heta dawî ji hêla çawanî û çendinî ve lewaziya milîtanên ku wê rast fêm nakine. Xwe tam tevlî xeta partiyê ya bîrdozî û siyasî nekirin û tevlî rastiya jiyana rêxistinî û pratîkî nekirin, partî li gorî helwest û paşverûtiyên xwe destgirtin, nexweşiya herî bingehîne. Kesên partiyê ji xwe re dikin amûr, ji bo xwe gihandina

partiyê li şûna hewldanên azad, afirîner û eslî bikin, partiyê ji kesayeta xwe ya tolaz, tine bûyî, qediyayî, tarî û bê ruh re dikin pêpilkek pêşveçûnê, dema wexta wê hat dê nekarin xwe ji tasfiyebûnê rizgar bikin. Partî tê wateya rêveberiya bijare, zelal, vîn û hevbeş. Kesên van xisletan nagire, dihizirin ku wê fêlbaziya xwe ya gundîtî, xisletên xwe yên tine bûyî û kêrî tiştekê nayê xwe bispêrin partiyê û wisa bidomînin, misoger xwe dixapînin. Ez van pir baş dinasim. Heta niha bi van re pir têkoşiyam û weke ku me baş ronî kir helwestên van tê çi wateyê, hûn dizanin ku me li beramberî van jî çi kir.

Em hemû hêza xwe ji partîbûnê û weke endamek partî jiyînê digirin. Niha di nava partiya me de piranî dixwazin berovajî hêz bigirin. Dixwazin partiya me pêş xistî li gorî xwe û şîroveyên xwe yên keyfî bikin û wisa bijîn. Ev şerek li dijî partîbûnê ye, yan jî nerastiya partîbûnê ye. Yên di paşverûtiyê de israr dikin, kêm-zêde partîbûnê pêk nayînin, li dijî Rêbertiya Partiyê şer dikin. Yên serkeftinek berz raber nakin, di bêbandorî, jixweberbûn û keyfiyetê de israr dikin, bi rastiya Rêbertiyê re şer dikin. Li gorî ku mijara partî mijara herî bingehîne, di vê wateyê de zelalbûn hewce ye.

Ne mirovên li dijî partiyê şer dike, hûn ê bizanin bibin mirovên **ji bo partî** şer dike. Divê hûn bizanin ev bi ti hêcetî cureyek din nayê raberkirin û ji rê jî nayê derxistin. Kesên dibêjin; “Astengiya hundurîn, astengiya derve, bingeha çînî, şêwaza malbatê û bandora kes” û li hêcetan nepartîbûnê bigerin bi temamî winda dikin. Di partîbûnê de hêcet diyarkirin bi yek gotinî nêzîkbûnek ketiye. Kesên dibêjin; “Çima min nekarî partîbûnê pêk bînim, çima nikarim qet partîbûnê pêk bînim?” Pêwîste ji nav refên me biçin. Bese ku mirov ji bo partîbûnê bi derfetên perwerdeyên heyî ve çend gavan bavêje. Hinek kesên me dahûrînên wan kirîn, partîbûn kirine pirsgirêkek rikê. Weke ku fazîlet di vir de nêz dibin. Em jî dibînin dawiya xwediyên helwestên wisa çawa dibe. Jiyana ku ji bo we herî hêsan, jiyana ne pêkanîna pîvanê partiyê ye. Ev jî, ji bo binkeftinê çi hewce dike ew esasgirtine.

Yên ne birêxistinkirî bin qet şer ser naxin. Yên nekarin bi mirov re mijûl bibin, nekarin guhertin û veguhertinê ser bixin,

nikarin ti şerî bimeşînin. Di vê mijarê de xwe nexapînin. Hûn şûna rêxistin bin û veguhertinê saz bikin, ji wê direvin. Vêca, hûn ê çawa şer bikin? Ger hûn nekarin bibin bîrîmek rêveberî, nîqaşekê pêş bixin û yekbûnek tenduristî bi mirovan re pêş bixin, hûn ê kîjan şer û jiyanê bikin malê xwe yan jî dikarin bijîn? Êdî divê hûn dev ji vê xefletê berdin.

Partîbûna di nav PKK'ê de, yekane çareya bûna netewbûn, mirovbûn, her cure pêşketina civakî, siyasî û çandî ye. Bila ji bilî vê ti kes nehizire ku pêş bikeve. Hezar carî şikir bikin ku, me ev derfetê partîbûnê pêşkêşî we kir. Dibe we li cihên din qîmeta partîbûnê nezanî. Lê belê li qada me, em ji her alî ve nirxa partîbûnê şanî we dikin. Jiyanek we ya pir vale û tine bûyî hebe yan jî dibe ku hûn di her mijarê de hatibin xapandin, lê ev hemû jî di nêvenga me de tên dahûrandin. Roj bi roj rêzdariya li hember mirov, mirov xistina ser rêya mezinbûnê û tevlî jiyana watedar kirinê pêş dikeve. Li hemberî vê bertek raberkirin, nepêkanîna vê tawane, bêrêziye û beriya her tiştî nepêkanîna jiyanê ye. Îro kesên xirabiya herî mezin li PKK'ê dikin an jî bi salane di nepêkanîna pîvanên partiyê de israr dikin, li dijî partiyê yan fêrbûnên ku di bin bandora giran a dijmin de ava bûne ferz dikin, an jî bandorên korbûne yên sedî salan dijîn. Ez jî van di nêvenga me de napejirînim.

Taybet rêhevalên di qedemeya fermandarî de cîh digirin, pêwîste raveya rêbertî ya partîbûnê bi xwe re bijîn. Gelek kesayetên hedê xwe nizanin û ji rêvebirina li ser lingan jî acizin. Yekser hişê wan bînin serê wan. Nikarin bi şêwazek din li pêşberî me bisekinin. Bi me re jiyîn jêhatîbûn dixwaze, hêz dixwaze, têgihiştin dixwaze û baweriyek mezin dixwaze. Ger we îflas kiribe, li kolanan mabin, nikarin jêhatiyên xwe yên şer pêş bixin, bela bin ez çi bikim? Di derbarê hinekan de her tim tê gotin; "Wisa xwe ferz dike, wisa pêş nakeve." Ez dibêjim wan biqewitînin. Çi karê kesên evqasî derfetên perwerdeya bilind û rastiya şer fêm nakin, di nava me de heye? Di felsefeya min de cîhê van nîne. Li hember kesên xwe xurt nakin û li gorî hêcetên rizgarî najîn hêrs dibim.

Nabe ku di felsefeya me de serkeftin neyê hizirîn. PKK'yîbûna rasteqîn, tê wateya **serkeftinê**. Gelek kesên sextekarên feodal, gundî û bajariyên burjuvaziya biçûk hedê xwe nizanin, heta naveroka çînayetî ne diyare derbasî nav me bûne û ev partî mijûl dikin. Divê yên bi rastî jî bi partî ve girêdayîne firsendê nedin van. Jixwe hinek rêveberên rastgir, rêveberên heta dawî ferdî û keyfî ji bo şêwaza wan serdest be, bi israr van kesan di nava me de digirin. Min ji cîgirê me yê herî nêz re got ger hûn di vê de israr bikin ez ê we biqewitînim. Kes bi qasî min nizane seroktî çiye, cîgirî çiye, milîtanî çiye. Lê belê bi kesên bê ku pêdiviyên qural û fermiyetê bizanin û pêwîstiyên wê bicîh nayînin û dijîn re, di bin navê pêwîstiyek qurale de bila neyê payîn ku bikarim bi wan re bijîm û ev qas jî ji şoreşgeriyê dûr neketime. Ev, ji bo milîtanê ji rêzê hîn zêdetir derbasdare.

Pêşî divê di nava rêxistinê de bê zanîn mirov şoreşger be. PKK, kesekî bi tika, minet û şikirdarî di nava xwe de nagire. Di vê mijarê de li ber kesî nagere. PKK tevgera kesên dilxwazên mezin, armancên wan ên dîrokî heyî û dixwazin dijwar şer bikine. Di nava me de yên dixwazin PKK'ê weke malbat, rêxistinek eşîrtî an jî weke derdora xwe ya gundî bijîn jî nekêmin. Heta ku ez hebim dê ev kes negihijin armancên xwe. Ji van rêjeyek mezin, di vê wateyê de nêz nabin rastiya Rêbertiyê fêm bikin. Ev çima di nava me de digerin û ev kî ne? Yên kêm-zêde partîbûnê nayînin bîra xwe, abc'ya vî karî ji hev dernaxin, heta li hember vê ne baldarin kîne? Bi çi mafî û ji bo çi di nava me de ne? Qaşo dilê wan "Azadiyê" dixwaze! Bila biçin tiştên lêdigerin li nêvengek din bibînin. Li cem me azadiya wisa nîne. Li cem me girêdana azadiyê bi partîbûnê ve heye. Azadî, bi pêkanîna partîbûnê ve saz dibe. Bila kes jiyîna keyfî weke azadî ferz neke. Bila di nava me de kesên partîbûna me bi hezar û yek kedî pêş xistî li gorî keyfa xwe şîrove dike û dibêje; "Ez mafê xwe yê azad bikar tînim", evqasî xafil û hedê xwe nizanin nemînin. Her wiha bila ti kes kole û paşverû nemîne.

Em yên paşverû û kole napejirînin. Hêj deh saliya xwe de min di nava malbatê de bi vê re şer kir. Ji îsyana destpêkê heta pêvajoya şerê gelêrî min li dijî her cure pêwendiyên malbat, qebîle, gundî û

ehbap-çawîş ên ti nirxa xwe yên rêxistinî, siyasî, civakî nîne û teng derketim. Weke ku em bi salan mijûl bûn ku rêgez û armancên eslî çine, herî dawî jî di bin navê PKK'yîbûnê de me di xala yekîtiya li ser bingeha bîrdozî û siyasî ya zanistiyek şênber de biryar girt. Bê ku ev bê dîtin çiqasî pîroze dibêjin; "PKK mirov li gorî keyfa wî dide jiyîn" û wisa tên. Niha hema ji çaran sê yên tên dixwazin giranbûn û bêxîretiya xwe bi PKK bidin rakirin.

Jixwe pir bi navdenge, her çîn û tebeqe dibêje; "Heta ku li tirêna PKK'ê siwar nebe nikare biçe Kurdistanê." Ev dixwazin li trêna PKK'ê siwar bibin. Ev neraste, lê ji ber ku wisa ye em nikarin her kesî li maşîn, trêna xwe siwar bikin. Em endamên xwe bi xwe jî ne ji bo tiştek dest bi wan nede, qet ked nedin û li rawestgehê bisekinin li wir rehet bijîn na, wan bi yek şertî, ji bo birina şer li trêna xwe siwar dikin. Ev nêzîkbûnên çînên dine. Em ê wan jî wisa erzan nêzî xeyalên wan nekin. Min di her wext û mercê zehmet de ji bo partîbûnê bi tena xwe şer kiribe, hema bêje bi goşt û neynokan kolandina şikêran ve pêşketinek ava kiribe, divê ya ku hûn jî bikin mijûlbûna partî be. Jixwe di nava vê partiyê de henase û xwîna hezaran lehegên bê nav hene. Rêbertî jî raveya kombûna wane. Yên li hember vê rêzdar bin, wê bizanin ku hewldanek rast a partî raber bikin.

Dikare bê gotin, a niha di nava PKK'ê de tê jiyîn rastiyeke. Kesên xwedî xisletên pir paşverû, bi şêweyek pir bê şanaz, bê xîret û bê pîvan xwe di nava partiyê de dikin bela. Ev ne ji gotin û ne jî ji çalekiyê fêm dikin. Hemû xisletên kesayeta xwe yên bi nexweşî li ser partiyê ferz dikin. Şerma wan nîne ku partiyê dixin yekdestdariya ehbap-çawîşiya xwe. Nêvenga me bi kesên partiyê li gorî her cure şîroveyên xwe yên keyfî digire dest an jî nikarin xwe ji qurbanbûna şêwazên hemal û xeşîm rizgar bikin ve dagirtiye. Ev nikarin asta azadiya PKK'ê rave bikin, tenê dikarin asta koletiyê rave bikin.

Gelekan erk û yetkî girtine û xwe li ser serê me kirine rêveberiyên PKK'ê. Misoger vê helwestê napejirînim. Mirovê ku rêveberiya PKK'ê di çarçoveya pîvanên rast de pêk tîne, bi qasî tiliyên destekê hene yan tine ne. Gelek kesên paşverû, kariyerîst,

ketî û hedê xwe nizanin, di nava rastiya rêveberiya PKK'ê de cîh girtine û xwe dinixumîne. Tişta destpêkê bê kirin, pêwîste ev xwe rast binirxînin. Ji sedî notê van raporên weke; "Xetimîme, teng bûme û nikarim ber bi serkeftinê ve biçim" nivîsandine. Ev jî tê wateya gotina; "Ez di rêveberiya PKK'ê de neserkeftî bûm, min pîvanên wê negirtin." Vêca partîbûn, serkeftina bûna partî li kur dimîne?

Êdî divê hûn hinek têgehan bikin malê xwe, pêdiviya we bi vê heye. Ji ber ku hûn ne rev, dixwazin şer bikin û pêş bikevin. Nexwe çima wate nadin têgehên bingehîn? Yên kevin û nû jî di refên me de cîh digirn keyfî û paşketî ne. Lewma nikarin her cure pîvanên partiyê bigirin. Mirov ji we dibizde, dibêjim dê kî van bide jiyîn. Kesên nekarin di kesayeta xwe de welatekî û civakek nû damezrîne, damezrandina welat û civatek nû li aliyekê bihêlin, nikarin xwe ji pirsgirêkbûnê rizgar bikin. Nexwe em ê çi ji we bikin? Elbet em ê bi mafdarî ji yên nikarin çiqil û ka ji hev cuda bikin û serê xwe naşixulînin bizdine. Ji bo vê pir zêde pêdiviya we xwe pêşxistinê heye. Hûn ê bi kîjan kesayetê welat damezrînin, rêxistinê damezrînin û şer bimeşînin? Em çek didin destê we, lê hûn nizanin bimeşin, bê ku nîv metreyî biçin dikevin. Li vir tawanbar hûn in. Tevî ku bîst salî ye azweriyek xwe nîne. Kesek ku xiroş, vîn û ezamet pêş neketî û bê ruhe. Paşê jî dibêje; "Tu çawa dixwazî wisa li min bike." Koleyên serdema destpêkê jî evqasî ne bêruh bûn. Ev jî, asta ketîbûna di kesayeta Kurd de çiqasî ji koletiyê jî kembaxtire diyar dike. Misoger ji xwe bipirsin ku ev pênase tê çi wateyê. Koletiya çar hezar salî riziyayî, ji koletiya beriya çar hezar salî deh qetî zêdetir xetere.

Qet hewce nake hûn peyva azadiyê erzan hemêz bikin û koletiya xwe binixumînin. Pêwîste hûn rastiya me ya zelal ji her hêlê ve bibînin, ger gengaz be xwe bigihînin derfetên azadbûnê. Ez şerê vê dimeşînim. Tevî evqas şer, min ti carî xwe bi qasî we azad nedît. Ji ber ku hewl didim rasteqîn bim. Bi rasteqînbûn, ji her alî ve hizirîn, siyasî û rêxistinbûne. Ev nebin ma dikarim çiyê azadiyê bijîm? Em rojekê we di halê we de bihêlin, wê ti pîvanên ku hûn hêjayî xwe nebînin nemînin. Hûn dihesibînin ku pir azadin, keyfî

ne, ji her tiştî re dibêjin; "Erê", lê tiştek ji destê we nayê. Ev kesayet ji koleyekê kembaxtire. Rastiya we ya mirovê xwe na dahûrîne wisa ye. Pirsgirêka Kurd û pirsgirêka kes ev e.

Pergal rêxistinkiriye û we bi erdê re dike yek. Lê hûn bêrêxistinî ne û îflas dikin. Vêca wê kî we bide jiyîn? Hûn şêwaza rastiya Rêbertiyê dizanin. Hûn jî dibînin çawa xwe birêxistin dikim û xwe digihînim hêza ferasetekê. Hûn jî li gorî vê bin. Ti kes tiştekê nade min. Bi qasî bikarim bi hewldana xwe ya cewherî xwe birêxistin bikim û siyasî bim, ancex hingê nirxek min a jiyanê çêbe. Di rastiyek ku ez jî nikarim weke we bêjim; "Dijîm", an jî "Azadim" de, gelo wê rewşa we çibe? Divê hûn vê jî fêm bikin. Na ger hûn bêjin; "Naxwazim fêm bikim û partîbûn ji bo min tenê di gotin de ye", wê demê hûn ne ti tiştin. Hûn çima xwe jî û me jî dixapînin?

Partîbûna me pêwîste, cuda em nikarin nêzî azadiyê bibin. Ev çar hezar sale em di rewşa koleyên kembax de ne. Mirov ji mirovê tine bûyî, li hember xwe ne rêzdare, hebûn, ax û çanda xwe ya hezar salî înkar dike ditirse. Hûn hinekê wisa ne. Sedema hûn ji vê rastiya xwe direvin, hûn pir ji xwe fihêt dikin, aciz bûne û pir winda kiriye. Lê rev ne çare ye. Rev, radestbûna dijmine. Di nava me de weke ku partîbûn wurşedare, kesên di hewaya hebê jî dibe, nebê jî dibe de nekêmin. Ez jî vê pirsê ji wan dikim: Dane, çand û têgihiştina we çiqase? Hûn nikarin du gotinan bînin ber hev, em çiqasî hêz û raye bixin destê we, hûn wan çarçûr dikin. Wê demê ji xwe bipirsin em ê çi ji we bikin. Hûn mirovin, divê ji xwe bawer bin. Hema weke her kes fêr bûye, bi israr naxwaze vê xalê bibîne. Bi van nêzîkbûnan ve xeteriya herî mezin li ser PKK'ê tê ferzkirin. Li şûna PKK'ê ji her hêlê ve rast têbigihije û bijî, ew di axaftinê de pejirandin û di pratîkê de jî înkarkirin xwe dana jiyîne. Ya rastî ger bizaniyan xwe jî bijîn me tiştek ne digot, lê ew jî nîne. Ya şûn vê jî tasfiyekarî ye. Êdî divê ev bi temamî bê derbaskirin.

Ger hûn bizanin di nava partiya me de van tevan derbas bikin, wê bibe başiya herî mezin hûn ji bo xwe bikin. Ger hûn perwerdeya partiyê vale derbixin, hûn nikarin xwe ji lenetbûnê rizgar bikin. Ji bo nirx didim we van destnîşan dikim. Madem hûn tevlî refên me

bûn, em jî ji we bawer dikin û ji bo pêşketina we hewl didin. Ev ne hewldanên vale ne. Hema bêje hinek ji nêvenga me direvin, weke ku xalên em destnîşan dikin qet ne girîngin nêz dibin. Lê belê xalên em destnîşan dikin tev jiyanî ne. Nexwe ger evqasî merîfetên we hene, we çima heta niha li hember dijmin serkeftinek raber nekir? Hûn dizanin, hûn li hember dijmin ne ti tiştin û di nava jiyanê de jî çi rave dikin. Nexwe çima hûn van ji nedîtî ve tên û çima dixwazin xwe cuda diyar bikin?

Meylên reben ku her kes dijî qaşo keyfî ne –ez ê nebêjim lîberal-, lê belê ew bi xwe jî nizanin tê çi wateyê, helwest û reftarên bê vîn û bê armanc tên jiyîn hene. Dema li ser vî bingehî li milet dinêrim, dibêjim ku wê kî vî miletî rabike. Jixwe malbat ji mêj ve bûne belaya serê xwe. Hûn jî ji mêj ve bûne belaya serê xwe. Hûn nikarin xwe wisa bi me bidin rakirin. Berxwedêriya herî mezin pêşî xwe rakirin û xwe dana jiyîne. Berê dihat gotin; “Xêra axayê xwe, xêra hevserê xwe, xêra kurê xwe dimeşiyam.” Niha jî hûn dibêjin; “Xêra partiyê dimeşim.” Lê belê hûn ê bêjin; “Ne xwe sipartina milê hinek din, ez xêra hewldanên xwe, xwe dimeşînim.” Li vir heta dawî pênaseyek kesayetek nû û azad tê kirin. Ev jî kesayetek partî ye. Partiya ku dê xêra pêwendiya hêza cewherî, hewldana cewherî û bi temamî kesê azad sazkirinê ve hatî pêşxistin, neçar dike ku di nûbûna civakî, hewce bike ji nû ve avakirina wê, netewbûna wê û di asta nav-netewî de bi bandor û serkeftî be. Kûrbûna PKK’ê ya bîrdozî û siyasî heye. Gelek burjuvaziyên biçûk bi israr weke ku di PKK’ê de kûrbûnek wisa nîne, helwestên wan ên keyfî esasin û weke ku her kes wisa ye bi hev re reqabetê dikin. Ev bi zanebûn an jî nezantî dixwazin me tasfiye bikin. Em nikarin van bipejirînin. Ev nêzîkbûn partîbûnê red dikin.

## Partîbûn Fedekariya Herî Mezin û Berzbûne

Partîbûn nebe, rizgariya netewî û şerê netewî jî nabe. Partîbûn bingeha her tiştî ye. Hûn ê beriya nan û avê fêrî partîbûnê bibin. Hûn ciwanin, zêde ji taqet neketine. Me ji bo derfetên perwerdeya bîrdozî, pêwendiyek dostanî û ji bo derfetek têkoşînê salên xwe dan. Lê belê hûn a amade belav dikin û didin windakirin. Hûn pêwendiya koma amade jî belav dikin. Di bin fermana we de taxim û yekîne heye, lê hûn nikarin yek dersa partî û yek perwerdeyê bidin wan. Tevî ku hûn di nava gel de ne, nikarin perwerdeyekê birêve bibin. Pêwendiyên di nêvenga me de, ne di astek bilind a partîbûnê de ye. Hûn ji vê direvin. Vêca, ma em mirovek çawa bûn, me hewl da bi tena serê xwe bê derfetiyan derbas bikin û ser bixin û ji bo mirovan qane bikin, ketin ser rêyan? Ne ku em neçarî van bûn an jî keyfa me xwest, ji bo peywira fermana dîrokî bû. Ger tê xwestin nasnameyek û serfiraziyek bê bidestxistin, ji bilî vê çareyek din nîne. Ev ji bo we jî derbasdarin. Misoger divê hûn jî xwedî nasnameyek û serfiraziyê bin. Kêmek maye hemû rêhevalên me vê ji bîr bikin. Helwestên heta dawî hêsan, bê aso, yên bi şêweya filan û bêvan jî dibe pir şaşe.

Qira dîrokî ya li ser me tê meşandin, ferzkirinên dij-mirovî yên li ser me tên meşandin, misoger pêwîstiya biryardariya kesayeta pir alî û têrkar derdixe holê. Ger hûn wisa bin, nexwe bi ser peywiran de biçin. Ji bîr nekin hûn di peywiran de pir kêm serkeftî ne. Hûn nikarin xwe kontrol bikin û li gorî xetê gavên ku di cihê xwe de jî dijmêrin bigirin. Hûn belavin, ger ji çend aliyan ve sipartek ji we re neyê dayîn dikevin li erdê dimînin. Vêca, milîtanî li kure? Berê dihat gotin; “Bila eşîret min bide jiyîn, bav bide jiyîn û hevser bide jiyîn.” Niha jî hûn dibêjin; “Bila partî bide jiyîn.” Li cem me wisa nayê jiyîn, hûn ê bi hêza xwe ya cewherî ve bijîn. Ev jî fikir û hêza pêkana fikre. Hewldanên min ên di vê derbarê de li holê ne. Hûn jî dibînin, a ku her roj dijmin dixe nîqaşê jiyana me ye. Hewl didim dijmin bişopînim, dibêjin; “Me çima APO kontrol nekir? Ev şaşiya

kîjan rêveberê me be, em serê wî jêkin.” Ji ber beriya bîst salan nekarîn reftarên min ên rêxistinî asteng bikin, niha Tirkiye lihev ketiye. Dert û kulê Tirkiye ya herî mezin, çima nekarîn min asteng bikine. Ji bo ez rêxistinî bûm, nekarîn şêwaz û tempoya min a rêxistinî asteng bikin, nekarîn vê bikin. Hûn qet bala xwe jî nadin wir. Jixwe hûn axa ne û yên we îdare dikin hene! Ne ez wisa we îdare dikim, ne jî ez axa me. Hûn di vê mijarê de xwe dixapînin. Dema kesek a ku li bendê ye nebîne, bila xeyalên wan vale neçin û neşkin.

Ancex ên hewl didin weke min bi min re bin dikarin rêwitiyê bikin. Ev meş pir bêrehme, meşek esîl û bi armance. Lê li gorî min meşa sereke ya berz û yekane rêya raste. Hûn ê rastiya Rêbertiyê bi qasî dijmin jî nebînin û paşê jî bêjin; “Em jî girêdayî Rêbertiyê ne.” Vê girêdana bi sexte danin aliyekê. Girêdana rast xwe gihandina şêwaza rêwîtî, ezameta ketina ser rê, vîn û ruhê wê ye. Duristbûn jî ev e. Hejartiya di vê mijarê de durûtiyê diafirîne. Sergirtina armancên xwe yên takekesî û çîna xwe rave dike, jixwe ne gengaze ku di tempoya me de ev di nava me de bimînin. Hûn dikarin van li jiyana kesên ku tevlî meşa koma destpêkê bûyîn jî binêrin û wisa binirxînin. Carek din jiyana **Heqi**’yan, **Kemal**’an, **Xeyrî**’yan û **Mazlum**’an ber çavan re derbas bikin. Ma we ev kesayet çi zû ji bîr kir, çawa wisa zû jiyana wan paşguh kir? Ma ne bêrêziyek mezine? Ma van di rastiya PKK’ê de berxwedaniyek mezin ne kirin? Tevî ku derfetên îro nebûn, rojên qiyametê bûn û di nêvenga dojehê de diman, ma ne mezin jiyan kirin û şer kirin? Ev PKK’yî ne û raveya cewhera PKK’ê ne. Weke ku ev tine ne, helwesta; “PKK tevgerek desthilatiyê ye, her cure derfet hene, tu derbasî nava PKK’ê bibî, tişta ku te ji dewlet û malbatê ne dîtî, wê tu di nava PKK’ê de bibinî û bijî” misoger pir şaşin. Ev xwe dixapînin. PKK xwe bi kesî nade xwarin.

Şerê herî girîng ku heta niha me meşandî, şerê di xisletên PKK’ê yên bingehîn de israr kirinê ye. Piranî di vê mijarê de me ji nedîtî ve tên. Weke ku me tawîz dane, weke ku Rêbertî di van mijaran de xafile, xwe dixapînin. Dikare bê gotin, bi salane şerê herî dijwar me meşandî, şerê di partîbûnê de israr, ji partîbûnê

tawîz nedanê ye. Partîbûn mezinbûne, fedekariya herî mezine. Dibe ku em her tiştê xwe winda bikin, lê qetiyen em nikarin partîbûnê winda bikin. Şerê herî dijwar, ev şere. Ango hûn jî dizanin bi gotinên weke; "Me çek rakiriye, em tevlî pevçûnan û çalekiyan bûn" ve partîbûn çênabe. Li gorî min ev mijûlkarên ji feydeyê zêdetir zerarê didine.

Şerkeriya PKK'ê, hêj di qada leşkerî de ne ketiye meriyetê. Ji bo pêkhatina vê di pîvanên partiyê de israr heye. Ji bo em hinekê jî israr dikin, ev şer dimeşe. Ger min di van pîvanan de israr ne kiriba, weke ku dê îro li ti cihî partî û têkoşîn nebûya, wê her tişt di xizmeta dijmin de bûya. Ji bo em di partîbûnê de israr dikin, îro li eniyan şer heye. Vaye me bi zorê xwe derbasî qada nav-netewî jî kir. Yek raveya vê heye, ew jî Rêbertiya min a di partîbûnê de israr dikê ye. Weke partîbûnekê jiyîn, bi prisgirêkên bîrdozî, siyasî û rêxistinî ve mijûlbûne. Kêlî bi kêlî hûrûkûr wisa hat jiyîn û ev destkeftî pêk hatin. Jixwe, ev ji bo Rêbertî azwerî ne, ne helwestek wisa ji jor ve ji aliyê kesekê ve bi neçarî hatîn ferzkirinin. Ji bo ev nirxên hêrî jiyanî ne, bi zanebûna tiştek bi qasî van ne bi nirxe bi ser vê têkoşînê de diçe û hewl dide wisa bijî. Divê ev ruh bi we re jî hebe.

Ez partîbûnê ne ku ji ber fermaneke yan jî tenê pêwîstiyek dîsîplînê ye li ser we ferz dikim. Sedema ferzkirina min, li gorî min jiyan û pêşketinek bê partî nabê ye. Di rastiya ku îro em dijîn de rêya li hember her cure hejariyê rawestîn, di kesayeta xwe de partîbûnek rasteqîn pêkanîne. Ji bo min ev bi kûranî û zû fêm kir, min dît ku partiyek ji bo miletekî her tişte. Partiyek şoreşgeriya rast, ji nan û avê binirxtire. Bûna endamek partî, bûna xwedî jiyana herî bi nirxe. Ji bo kûranî baweriya min bi vê hebû, min hemû hewldanên xwe kûr kirin û çalekiya herî mezin derxist holê. Ma ji bo min ev kir ez mirim û qiyamet rabû? Berovajî, min a herî baş kir û di kesayetekê de biryara herî rast hat dayîn. Vaye pêwîste biryarek we jî ya wisa hebe. Pêdiviya we bi vê heye. Ez nikarim bi tena serê xwe vê pêdiviyê pêşwazî bikim. Ancex dema her kes kêm-zêde wisa partîbûn pêk anî, em dikarin serkeftî ber bi armancên xwe ve bimeşin.

Min ev hinekê pêk anî, hûn jî hîn zêdetir pêk bînin. Hewldanên me yên di vê mijarê de, weke pêşiya we vekirinê û dibe ku tiştên hûn nekarin bi serê xwe bikin niha dibin derfetê xwe gihandina wê binirxînin. Lê vî karî jî bi dawî bikin. Hewldanên min weke hewldana dawî yan jî ji bo xwe weke serkeftina her tiştî nenirxînin. Ev hewldanên min ji bo destpêkirina we rê vekirin û hûn anîna rewşa ku yên ne kirine bikare bi serê xwe pêk bînê ye. Lê piştî wê hewldanek mezin dixwaze û ew jî erka we ye. Pênaseya rast ev e. Bila ti kes nebêje; "Rêbertî her tişt pêk aniye, para me jî jiyîne." Heta yên ku ev jî fêm nekirine û dibêjin; "Jixwe Rêbertî mezin fikiriye, mezin pêk aniye, hewce nake em jî fêm bikin", di kêliya yekemîn de winda kirine.

Dîroka partî kêm maye digihije bîst û pênc salan, ango digihije çarîka sedsalê. Wateya herî bingehîn a partîbûnê bi qasî van xalên me destnîşan kirine, ewqas jî yên herî zêde hatîn xirabkirinin. Gelek kesên weke ku di nava me de PKK'yîbûnek û şerek cureyek din gengaze nêz dibin hene. Ev kes dixwazin xisletên kesayeta xwe, fêrbûnên xwe yên jiyanî û nepêkanîna rêxistinbûnê di nava me de serwer bikin. Ev jî tê wateya şer, pergal, paşverûtî, korbûn, xafiltî û her cure ketîbûna çînên beramber. Rêveberên pir fêlbaz û fermandarên pir sexte derdikevin pêşberî me. Ev hemû jî bi rêxistinê re şer dikin. Kesên dîroka mezin a partiya me wisa şîrove dikin û dikin malê xwe, wisa di nava partiyê de cîh digirin, li dijî me şer dikin. Elbet wê bersivên encama kiryarên xwe jî bigirin. Bila ti kes ji bîr neke em şerekê dimeşînin. Bila her kes berçav bigire ku em derfetên vî şerî û partiya vî şerî bi hezar kedî di asta mucîze de pêk tînin û wisa nêz bibe. Ma ez ê van xafîl, hedê xwe nizanin, kariyerîst, ketî, kole, bê mejî û bê dil ên di nava me de bidim jiyîn? Ya herî girîng jî kesên dibêjin; "Fêm nakim, hewce nake serê xwe bişixulînim", ne gengaze ku wisa di nava me de bikarin bijîn. Ji van hemû aliyan ve pêwîste hûn PKK'ê fêm bikin. Minetê li ti kesî nakim, ev ne hewce ye jî. Ger hûn dibêjin; "Em amade ne bi her tiştê xwe ve di vê rêyê de bimeşin", ji ber cidiyeta hûn raber dikin û wateya hûn didin vê em jî dibêjin ku; nexwe rêya vê jî ev partî wisa fêmkirin û jidil pêkanînê re derbas dibe.

Berovajî bêrîkirinên xwe nekevin. Em cuda nakin pênc quruş pere jî. Di rastiyê de ez ji dervî partî û partîbûnê mirovê cîhanê yê herî belengazim. Min ev jî dahûrînan de pir vekir. Kesayeta APO, ji bilî bûna partî û esasgirtina pîvanên partiyê, kesayetek belengazê cîhanê ye, heta ne tişteke. Ew, ji ber ku di her tiştî de hinekê jî be rêxistinbûn û her ku diçe partîbûnê saz dike lewma heye. Ev, di heman demê de derbaskirina kesayeta Kurde, rawestandina tinebûn û mirinê ye û serxistina hêviya jiyana nû ye. Ji ber vê saz dike kesayeta APO heye. Dijmin jî van fêm dike, encam derdixe û lez û bez radibe. Ya beramberî me jineke (Tansu Çiller), lê weke milîtanek çar bi çar tev kar dikin. Bes her ku diçe hûn bêxîret dibin û tiştên ku dijmin ji me girtine jî nabînin. Ev di pîvanên kevin ên Kurd û pîvanên koletiya kevin ên gelan de israrkirine. Hûn xwe aqilmend dihesibînin, lê di rewşek reben de ne. Ma dijmin dîne evqasî bi tempo, şêwaz û dijminatî êrîş dike? Na berovajî, dijmin dibêje; “Ez ê vî welatê we zêdetir bimêtim, we zêdetir weke kole bikar bînim, jiyana bêzarî hîn zêdetir bi we bidim jiyîn.” Ji ber ku agahiya we ji jiyanê nîne, xalên weke ma welat bi zorê tê bidestxistin û ma mirov bi zorê xwe digihîne kesayeta azad û serbilind ji bo we qet ne girînge. Nexwe hûn jî nikarin kêleka vê jiyanê re derbas bibin, nikarin xeyalê vê jiyanê jî bikin û di dûxana cixareyê de bifetisin. Wê serfirazî, şeref û vîna we jî nebe.

Divê hûn bikarin pirsên weke kî bidest dixe, kî dijî ji xwe bikin û bersivên rasteqîn bidin. Di nêzîkbûnên we de zaroktiyek zêde dibînim. Dema behsa zaroktî dikim, behsa kesên di temenê bîst-sih salî de nêzîkbûnên zaroktî raber dikin dikim. Nexwe zarokên din zarokên başin, zarokên digihin temenê deh salî zarokên başin, ew ji gotinan fêm dikin. Mixabin zaroktiya weke we qert bûyî pir xirabe. Ango nefêmkirina jiyanê cûcebûne. Hûn jî dizanin, em weke gel çiqas kevin bin ewqas jî tine ne, em çiqas dihesibînin jiyan dikin ewqas jiyan nakin, çiqas dihesibînin em tiştekin, ewqas jî ne ti tiştin. Hûn ê çima van nebînin? Hûn ji vê direvin, lewma nikarin bihizirin. Ji bo nikarin bihizirin jî, reftarên we yên rêxistinkirî jî pêş nakevin. Wê dem ê jî hûn ê bêjin; “Em ferdî ne, keyfî ne, kariyerîstin, ketî ne, çavkorin, fermandar û rêveberên sexte ne.”

Vaye aloziya Kurd jî di vir de ye. Di civaka Kurd de yê herî xwe axa dibîne jî rastiyeke ku li hember cendirmeyekê çil teqleyan tavêje. Nexwe ev hemû derbaskirin, di rastiya Rêbertiyê de weke hatî destnîşankirin baldariyek mezin dana partîbûnê, ji her alî ve têgihiştina partîbûnê û şerê wê ji her alî ve meşandin gengaze. Bi qasî hûn bikarin vê bikin, hûn ê mafê jiyînê bidest bixin. Ger hûn gelek hêcetên nekirinê bidin pêş û bêjin; "Astengiyên hundur, astengiyên derve, ev sedem, ew sedem" û xwe mijûl bikin, hûn ê jiyanê bê ku şer bimeşînin winda bikin. Hûn beriya bigihin şer jiyanê winda dikin û bi vê jî xirabiya herî mezin li xwer dikin.

Di vê wateyê de Rêbertî, xwe gihandina rastiya şere. Hûn xwe nagihînin rastiya şer, dev ji zanîn û rêvebirina şer berdin, hûn di şer de ne, lê ne di ferqa şer de ne. Ma evqasî belengazî dibe? Kanî rêveberiya şer, perwerdeya şer, rêxistinbûna şer, hûn li kuderê ne? Kanî hûn şerê çekdarî dixwazin, kesayeta vê li kure? Ji bo em wan derfetên şerê ku bîst sale hûn ji dijmin zêdetir tine dikin biafirînin, em gav bi gav hewl didin. Min li vê qadê hewl da rasterast ez bixwe yek bi yek bîst hezar kesî pêş bixim. Yên herî ji xwe razî ev derfet çarçûr kirin, nekarîn yekê li ser yekê ve zêde bikin. Tevî ku em li qadên derve û di mercên herî zehmet de ne, hêjî em dihilberînin, mixabin ên di nava welat de ne tine dikin. Dema em hinekê jî bi ser wan de diçin yekser dilê xwe digirin. Hûn çi didin serxistin, çi didin windakirin û heta xwe çawa didin jiyîn? Ma tinebûnek wisa dibe? Ma tinebûnek wisa tê pejirandin? Lê belê li gorî we ev hemû çarenûse. Ev hemû ferasetên paşverû û nêzîkbûnên her cure binkeftinan di nava xwe de dihewînin.

Tevlî asta şerê PKK bûyîn, ji serkeftinê jî rûmetire. Bi salane em hewl didin wateya van bidin we. Bi israr nefêmkirina van û berovajî vê jiyîn nabe. Min dijmin ji bîr kir, sedî nod li dijî van ferzkirinan şer dikim. Ma di nava me de çi nexweşî, çi koletî û çi ketîbûn hene. Nexweşên desthilatiya zû û xwe navenda her tiştî dibînin hene. Dema we dîroka partiyê lêkolîn kir hûn ê van tevan bibînin. Ger ev neyên dîtin, neyên derbaskirin û ya rast neyê fêmkirin, wê heyfa we be. Em ji bîr nekin, heta niha hûn her tim di jiyana xwe de bêfêhmî nêz bûn, lê divê vê carê hûn fêm bikin.

Derfetên ku ji bo perwerdeyê ji we re hatine dayîn biçûk nebînin. Ger komek biçûk jî durist be, derfetan rast binirxîne, dê ev têra gel û welat bike. Ger ji bo min perwerde hewce kiriba, wê min şev û rojên xwe kiriba yek, heta ku xwe bigihînim serkeftinê, wê min tenê ji bo vî karî dev ji girtin û dayîna henase berda. Niha ez biçim kur bila be, dikarim ji bo partiyê bijîm û serkeftina wê saz bikim. Lê hûn nikarin bi heman şêweyî vê îdîayê bijîn û sonda vê bidin xwe. Ji ber ku her cihê hûn diçinê partiyê ji bîr dikin. Pîvanên partiyê ji zû ve tên derbaskirin, her cure ferdperestî, her cure pratîka kontra li ser nêvenga me tê ferzkirin. Paşê jî tê gotin; "Em çi bikin, bila Rêbertiya partiyê destwerdanê bike." Em xizir jî bin, ne gengaze ku her wextê ji bo alîkariyê xwe bigihînin we. Lewra fêrî pîvanên partiyê bibin û ger hûn mirovê sonda xwe bin nûnertiya vê bikin.

Me her wextî û li her cihî nûnertiya partiyê kir. Lê belê hûn li cihê amade, di nêvengek ku her tişt li wir partîbûyî ye jî, devjê berdin nûnertiya partiyê bikin, hûn tasfiye dikin. We ev wurşedar ji kur girt. Min wisa partîbûn fêrî we nekir. Di hemû nirxandinên me de partîbûnek dijwar esase. Ew hemû pêvajoyên dîrokî sal bi sal, meh bi meh, roj bi roj bi dersên ku bi naveroka partiyê çawa tê jiyîn ve dagirtîne. Ez kedkarek mezin ê partiyê me. Ji bo me karî vê hinekê ser bixin, îro dîrok ji bo me bi cureyek din ve dimeşe. Ger hûn li ser vîna xwe serwerin, sondek we ya şerekê ku we dayî xwe hebe, divê hûn bi partîbûnê xwe biselmînin. Partîbûnek baş mifteya zêrîne, efsûne û her tiştî çareser dike. Lê dema mifteya partiyê ne di destê we de be, hûn li hewa bi dev ê xwe jî çûk bigirin, ji bilî bûna kesek bêçare nikarin wêdetir biçin.

Yeqîn nakim hûn zêde ji taqet ketibin, bi qasî bikarin partîbûnê ser bixin hûn ciwan û enerjîkin. Ger hinek ji partîbûnê aciz bin, em wan bişînin cihek din. Ger hûn bi qasî nekarin partîbûnê pêk bînin ketîbin û we dev ji xwe berdabe, nexwe divê em we cuda bigirin dest. Yeqîn nakim hêza we nîne partîbûnê pêk bînin. Jixwe, kesên hêza wan a partîbûnê tine dikarin behsa kîjan şerî bikin? Ger em di vê dema kin de serkeftinê dixwazin, ev jî bi partîbûnê dibe. Ger hûn evqasî hewceyî şerkirin, serxistin û nexasim jiyana azadin,

nexwe partîbûnek rast û têrkar pêk bînin. Mifteya vê ya zêrîn jî ev e. Hûn mirovên bawermendin, fedekarin û wêrekin, nexwe van tevan bi partîbûnê biselmînin. Ji bo vê jî derfeta lêkolîn û nîqaşa ji we re hatî dayîn binirxînin. Bi lêhûrbûnek mezin ji kî re çi pêwîste wê bidin. Di nêvenga me de heta dawî azadiya nîqaşê heye. Girêdayî pêwîstiyên vê bin û bibin mirovê xwedî sonda xwe. Bawerim sedema hatina we ya nêvenga me, ne ji bo hûn heyranê çav û rûyê me ne. Ji bo hûn hinek dersên dîrokî bigirin hatine nêvenga me. Em zêde jî van didin we, ger hûn nezanin bigirin ez qet bi we re eleqedar nabim. Kesên ku qet nayîne bîra xwe pêdiviyek dîrokî û bingehîn heye pêşwazî bike, li cem min ew sererast nabe. Li hember ên rêgeza partiyê û jiyana partiyê rast esas nagirin hêrs dibim. Ger hûn wisa bikin, pir vekirî dixwazim bêjim, naxwazim rûyê we jî bibînim.

Ji bo min partîbûna rast beriya her tiştî ye. Dema yek bi partîbûnê dilîze û pêdiviyên wê bicîh nayîne, ji dijmin zêdetir li hember wî hêrs dibim. Ev nêzîkbûn zêdetirîn ji bo we derbasdarin. Dema pîvanên we nabin pîvanên partiyê, hevûdû nepejirînin, heta pêkhatina partîbûnê xwe û derdora xwe efû nekin. Elbet ev şer zehmete. Şerê rêxistinî, şerê herî zehmete. Kî ji we re got şerê rêxistinî nebe, ev têkoşîn dikare ser bikeve? Heta rêxistinbûnek dijwar nebe, kî ji te re got dikarî şer bikî? Hûn van tevan ji ber xwe derdixin. Nepêkanîna rêxistinbûna ku bi israr li ser partiya me tê ferzkirin, ne pejirandina jiyana partiyê ye. Kêmek maye ev li ser her tiştê me serwer be. Li hember van ferzkirinan tenê ez heme; ez jî pêşî lê negirim, ji ber sedema vê meylê weke hatî serê gelek berxwedanî û îsyanan wê bi pêngavek dijmin a demkin ve em jî bên tinekirin. Çi di ferqê de bin, çi jî ne di ferqê de bin, rewşa bêxêr a van kesayetan rê jêre vekirî wisa ye. Dixwazin dîroka bi lenet cardin dubare bikin. Lê belê em jî dixwazin dîroka azadiyê bi şêweya têk naçe mayînde bikin û yeqîn dikin ku me ev serfirazî jî bidest xistiye. Divê hûn bizanin vê fêm bikin.

Kesayeta mezin bûyî ne weke we fêm kiriye. Hûn cîhana xwe ya hêsan esas digirin an jî nikarin heyrantiyek xeşîm derbas bikin. Ya rastî em ji vê zêdetir rave dikin. Rêbertî berdewam dike ku bibe

çavkaniya jiyanek awarte, derfetên jiyanê derdixe holê û vê gengaz dike. Qet nebê bizanin vê parve bikin û ger gengaze hinekê jî tevkariyê bikin. Li ser vî bingehî ji mirovbûna xwe bawer bin. Pêşî wêrek bin ku bibin mirovek wisa, hûn ê di vê mijarê de ne bê pîvan û durû bin. Dema we karî li ser vî bingehî bi bîrdozî, siyasî û rêxistinîbûnê ser bixin û partîbûnê jî saz bikin, hûn ê bibin xwedî meşek bi qudret. Helwest û reftarên mirovî yên bi navê mezinbûna rasteqîn, kesayeta rasteqîn, serfiraziya rasteqîn û rêzdariya rasteqîn wisa derdikeve holê. Xwe serwer dike û ev jî serkeftine.

Tê dîtin, ên hatine destnîşankirin watedarin û ji bo we jî pir derbasdarin. Hûn ciwanin, ti halê we yê zêde westiyayî û hincirî nîne. Qet nebê bi qasî em bikarin we rêzdar û serfiraz birêve bibin xwe bigihînin pêdiviyên partîbûnê. Ger hûn di negihandina vê de bi israr bin, ti nirxê we çênabe. Di vê rewşê de ji min jî qetiyen eleqe û rêzdarî hêvî nekin. Di vê wateyê de kesek pir bêrehmim. Bi kesên bê ku bal bide pîvanan û bijî re pir xirab mijûl dibim. Di vê mijarê de jî ji her hêlê ve rastiya Rêbertiyê binasin. Li hember kesên ku bi pîvanên partiyê dilîzin, em şerek dijwar dimeşînin. Min ne dixwest di nava partiyê de şerek wisa bimeşînim. Lê ji ber hinek dihizirin wê rastiya Rêbertiyê bixapînin, bi zanebûn an jî nezantî, xafil an jî bi zanebûn xirab dikin û wisa bi fêlbazî êrîş dikin, ez jî neçar mam û min ev şer meşand. Têkoşîna herî zehmet jî ev bû.

Waneya partiyê, **têkoşîna çîna nav partî** ye. Ev jî di nava PKK'ê de di asta pîvanên gerdûnî de tê meşandin. Têkoşîna çînayetî ya li nava partiyê, wê hemû daneyên rê ji hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re vekir ji holê rake û bi qasî ji rêwîtiya sosyalîzma nû ya mirovahiyê re jî derfet ava bike, saxlem tê meşandin. Ger îdîa we heye vê bibînin û di vê wateyê de li ser bingeha erênî beşdarî têkoşînê bibin. Egîdî jî, hevrêtî jî wisa ye. Pêwendiya herî hêja jî pêwendiya hevrêtiyê ye û jiyane.

Di vir de pir yeman bi ser de diçim. Ji bîr nekin, hêzê herî emperyalîst ê cîhanê jî me weke "rêxistina herî xeternak" dinirxîne. Ev jî weke rejîmên herî zordar, ên di gelemperiya cîhanê de derketî holê bi ser her cure tevgerên azadiyê de diçin, êrîşekê rave dike. Lewma wisa êrîşî me jî dikin. Nexwe li gorî vê bizanin pîroziya

jiyanê û şerkertiya jiyanê pêwîste di ruh, zanebûn û rêxistinbûnê de çawa saxlem bê meşandin, ji her hêlê ve bibînin ji bilî vê ti mijûlbûnek we nabe û binirxînin. Kurtasî bizanin partîbûnê wisa pêk bînin. Kesên partîbûn pêk anîn dikarin li her qada têkoşînê her cure peywirî serkeftî pêk bînin. Ti astengî nikare meşa wan a ber bi serkeftinê ve qut bike. Dibe ku şahadet çêbin, lê belê yên li pey wan dimînin ger bikarin li ser vî bingehî heta serkeftinê bimeşin wê rêya xwe bibînin. Pêwîste rastiya PKK'ê ji hemû aliyan ve wisa bê fêmkirin û jiyîna wê jî başiya herî mezin ku hûn ji bo xwe bikine. Raveya vê ya herî vekirî jî bi sonda xwe ve girêdayî mayîn, ji hevrêyên xwe re ne bûna bar, barên hev parvekirin, pêwîstiyên sonda ku we daye gelê xwe bicîhanîn, dîsa bi bawerî û fikrên herî pîroz ve girêdayî mayîne.

Em bawerin ku hûn hinekê nûnertiya rêwîtiyek wisa dikin. Ez bi xwe jî bi vê dijîm û weke hûn jî dibînin ev jî tê wateya pir bi serkeftî bûyînê. Divê hûn ji me zêdetir serkeftîbûnê esas bigirin. Nêzîkbûnên xwe bispêrin serkeftinên me yên ji rêzê û divê zêde neyên mezinkirin û wisa erzan jiyînê, ti caran hêjayî xwe nebînin. Me bi sedemên cur be cur ve tenê karî evqasî ser bixin. Yên me kirine zêdetirîn ji bo we derfetên serkeftinê dide. Vê ne weke encamekê, ger hûn weke destpêkekê bigirin dest û bêjin; "Em ê ya ji bo serkeftin û serfiraziyê hewce pêk bînin", rola herî rast hûn didin xwe. Her wiha ger hûn bikarin pêdiviyên vê jî pêk bînin, wê wateyek bi nirx a jiyana we hebe. Ev jî misoger di radeya partîbûn û partîbûna rast de, di hundur û dervî partî têkoşîna rast meşandine. Wê têkoşîna me li ser vî bingehî misoger heta serfirazî serkeftinê bîne.

**22 Nîsan 1995**

## DEMA DI OXIRA JIYANÊ DE TOFAN TÊ RAKIRIN WATEYEK RAVE DIKE

Her roj em bi kesayetên çewt re rûbirû dimînin. Behsa duristbûnê nakim. Niyeta baş û hewldan bi her kesî re heye, lê ev ji pêkanîna serkeftinê dûrin. Ev dereng têdigihijin, ji wê jî wêdetir ên têgihiştine naxin metiyetê. Jêhatiya wan a vesazkirina tiştên ku têgihiştine jî lewaze.

Di kesayetê rêber de di biryardariyê de tawîz nîne. Kêmasiya bi şêwaza encamgir ser karan de çûyîn aliyê we yê herî lewaz dimîne. Em çiqasî we zana bikin, şaşiyên di kesayetên we de ewqasî kûr dibin. Em çiqasî rêya derketinê şanî we bikin û derfetên jiyanê bidin we, hûn ewqasî xeter dibin. Rewşa we, dema hinek din bê lêkolînkirin dişibe hinek din gavek ber bi koletiyê ve diçe. Koletiya ku pêş dikeve, nayê wateya azadiyê, heta hîn zêdetir xeternak dibe. Dibe ku koletiyek kûrbûyî zêde nexeter be. Ji ber hatiye fêrkirin, her tişt pejirandiye û lewra nikare zêde zerar bide. Lê koletiyek ku şiyar bûyî, ger azad nebe û li ser bingehek rast li ser helwestek azadiyê neserwer be ew pir xeternake. Ya di nava me de tê jiyîn jî wisa ye, heta koletiyek ji vê tevlîhevtire. Aliyê ecêb jî vê dixin şûna azadiyê. Ger em koletiya ku pêş dikeve weke pêşketina azadiyê binirxînin, em ê bi xwe ji rewşek wisa tevlîhev re rê vekin. Yeqîn nakim hûn azad bûne. Mirovê azadbûyî, misoger napejirîne ku bi vê şêwaza pratîka we bijî û wê heta li hember îsyan bike. Xisleta herî girîng ez di azadxwazekî de dibînim, li hember sedemên neserxistin û nepêşketinê îsyan dike. Lê ev bi we re tine. Berovajî, beramberî serkeftinê bertekên we hene. Ne ku ji binkeftinê aciz dibin, fêrbûnên we yên weke wê kûr bikin hene.

Nexwe em ê çi navî li vê kesayetê bikin? Çima hûn ji binkeftinan aciz nebûn? Çima hûn heta niha ji pirsgirêkên azadiyê re di astek pêşveçûyî de nebûn bersiv? Em tenê dikarin bi asta we ya koletiyê ve bersiva vê bidin. Nayê hizirîn ku kole bikarin di azadiyê de bimeşin. Hûn ne bi azadî, bi koletiyê re beşdarî nav

refên me bûne. Ev jî rewşek pir xetere. Bal bidinê, koletiya serdema destpêkê cihê xwe ji koletiya serdema navîn re, koletiya serdema navîn cihê xwe ji koletiya hemdem re hiştiye ku, we şêweya herî tevlîhev û paşverû ya van jî bi serkeftî ne jiyaye. Ango bi we re kesayetek feodal ê baş, kesayetek kapîtalîst ê baş û kesayetek burjuva ê baş ava nebûye. Hemû kesayet bi we re nîvçe û bi nexweşî ne. Hinekê jî rastiya Kurd wisa ye. Me dikariya vê bi hemêz kirina azadiyê ve derbas bikin, lê vê jî hûn nakin. Bi gelek hêcetan ve pêkanîna vê taloq dikin û xwe nadahûrînin. Ger hûn dahûrînin û fêm bikin jî, ji bo vê hewldana hewce raber nakin. Hêza we ya hewldanê nîne, yan jî hûn dibêjin; "Çi qonaxa koletiyê ya pêşketî dibe bila be, têra min dike." Ji ber ku dema hûn bi ya berê re muqayese dikin van jî weke pêşveçûn dinirxînin.

Ger pirsgirêk sedem ên objektîf bûna û me gotiba sedemên objektîf ên şoreşê zêde firsenda pêşketinê nade, em evqasî bi ser pêşeng û pîvanên partiyê de nediçûn. Mercên objektîf ji bo pêkanîna şoreşek netewî heta dawî destdayîne. Heta mercên sûbjektîf jî, ango pêşketina asta zanebûn, nexasim pişgiriya gel û vekirîbûna qanalên rêxistinî di astek pêş de ne. Em tên bi vê ve girêdayî dimînin: Pêşeng, navenda pêşeng jî, rêjeya qadroyên pêşeng çavkaniya rasteqîn a pirsgirêkê ne. Lewra em hemû hêza xwe didin vê pirsgirêkê. Lê belê hûn li hember çareseriya vê pirsgirêkê li ber xwe didin. Lê me jî berxwedaniyek mezin raber kir. Min bi xwe pir li ber xwe da û hewl da li hemberî we bin nekevim. Me pir nirx winda kirin, lê dîsa jî em radestî ferasetên we nebûn. Tiştek din min kiriba nebû. Ger dînîtî jî bûya wê min li hemberî paşverûtiyên we li ber xwe bida. Di vê mijarê de hinek destkeftî çêbûn. Pêwîst bû we rastiya Rêbertiyê bi hemû esasên wê ve fêm kiriba, wateyek rola şoreşgerî ya ku we hêjayî xwe dîtî hebûya.

Bal bidinê, di dîroka partiya me de pîvanên pêşengtî pir hatine xirabkirin û zerarên ku kontrayek nekare bide partiyê bi xwe daye. Nêzîkbûnên her sal kontratiya ku tê ferzkirin jî derbas dikin mirov pê yeqîn nake, lê ev rastîne. Yên herî niyaz baş jî li hember peywirên herî bingehîn bê baldare, bi her cure şaşiyê re lihev dike û

nêzîkbûnên qet bala xwe jî nade wir raberkirin xeteriya herî mezine. Mirov bi vê yeqîn nake. Dîsa em hezaran kesî kom bi kom li her qadê belav dikin û derfetên pêşketinên awarte pêşkêş dikin, bersiva ku didin vê tasfiyekarî û belavkirine. Li hemberî van bi qasî misqalekî hestên şerimbûnê nîne, berovajî xwe mafdar dibînin. Em oportonîzmê û bêberpirsyariya siyasî danin aliyekê, em li vir bi bê exlaqî û bê terbiyetiyê ve rûbirû ne. kom tine bûye, lê wijdanê wan jî nalerize. Ev ne pirsgirêkek siyasî yan jî leşkerî ye, pirsgirêkek **exlaqî** ye. Misoger ji ber kêmasiyên xwe bûne sedema windahiyan. Lê mixabin êşa vê jî najîn û hêrsa wan tine ye. Ev ketîbûnek exlaqî ya pir cidî ye û mixabin pirsgirêkên we yên exlaqî û mezin niha derdikevin pêşberî me.

Li pratîka gelek fermandaran binêrin: Mînak di raporekê de tê gotin; “Kesek ji Xerzanê hat, rê ji tasfiyebûna sed û bîst hevalan re vekiriye.” Qaşo yê ev kirî jî fermandarê herêmekê ye! Dibêjin; “Me cezayê herî giran da sê kesan, lê em guncav dibînin ku pêvajoya ked dayînê bijîn.” Em ê di van mercan de çi bêjin? Yeqîn dikim qet wijdana wan kesan nalerize. Di demek kin de biçi şêweyî dibe bila be tasfiyebûna sed û bîst kesan tê çi wateyê? Ev ji hêla exlaqî ve jî ketine û dilxweşiya wan jî tine bûye. Ev bê şerim dihizirin ku jiyan dikin. Ger firsendê bibînin kî dizane wê hêj çi bikin. Ya herî xirab jî tevî kesên ev dîtîn hene, qet li çareyê negerîne. Dema em behsa pêşketina koletiyê dikin, behsa vê dikin. Dilê mirov bi rewşa we dêşe. Hûn ecêbin, dîsa jî dixwazin bijîn. Ger hûn li hember tişta ku ji bo jiyanê pir hewceye wisa nêz bibin, hûn ê li hemberî jiyanê bibin **derewkerê** herî mezin. Yên rêzdariya xwe evqasî li hember jiyanê winda kiribe, yeqîn nakim zêde pêş bikevin.

Dema di oxira jiyanê de tofan tê rakirin wateyek rave dike. Dema jiyan ji aliyê fîzîkî ve bi erdê re dibe yek, hûn qet berê xwe jî nadinê, ev jî diyar dike ku hûn bi pirsgirêkek bê exlaqî ya mezin re rûbirû ne. Kêxweşiya jiyana we nîne, rizgarî û azadiya jiyana we nîne, kurtasî ji her hêlê ve tevdîra jiyana we nîne. Hûn ji gelek hêlan ve bi windakirinê re rûbirû ne. Nexwe ger hûn vê hîs nekin, çawa dikarin bêjin hûn mirovên cidî ne? Ez ê çawa bi we bawer bikim û çawa li hemberî we rêzdar bim? Ger hûn pir bi aqilin û

rêya jiyanê dizanin, şanî min jî bikin û min ji vê şaşwaziyê rizgar bikin. Bêjin ku; “Li van çiyan wisa tê jiyîn, li van mêrgan wisa tê jiyîn”, da ku ez jî bi we bawer bikim. Ev jî tine ye. Em bi rewşek pir cuda re rûbirû ne. Ger qet pêwîstiya we bi rizgariyê nîne, em dikarin wê jî nîqaş bikin.

Dijmin dibêje; “Ya PKK dike terore, bi temamî dijberê jiyanê ye.” Ev îdîaya dijmine. Jixwe rêjeyek girîng reformîst jî ji hêla pratîkî ve vê rave dikin. Di vê wateyê de ferqa we zêde ji reformîstan, heta nûnertiya îdîayên dijmin kirinê wêdetir ti nirxa we nîne. Lê hûn ji ber pirsgirêka namûsê yan jî pêdiviya îdîayekê bûne şoreşger. Ev şoreşgeriya îdîayekê ye. Ez her tim xwe weke şoreşgerek lewaz dibînim. Pirsgirêkên min her tim giran bûne, lê tevî vê jî çavkaniyek jiyana ku qet xilas nabe me. Têkoşînê bi hewldanên bêhempa ve dimeşînim. Li we dinêrim, dibêjim ev çine? Xwe di nava sînorên pir dilnizm de weke şoreşgerekî dibînim. Lê dema li rewşa we dinêrim nabe ku mirov şaşwaz nebe. Dibêjim; “Ev xwediyê kîjan hewldanîne ku, xwe wisa dihesibînin, heta çima xwe dijwar lêpirsîn nakin?” Ne di dest de ye ku mirov li hember vê rewşê xembar nebe. Ji ber ku hûn ê nekarin bijîn û nepêşxistina jiyanê jî pir xirabe. Yên nikarin jiyanê pêş bixin an hêsan dimirin, an direvin, an jî dibin çavkaniya pirsgirêkan. Ji bilî vê ti rê nîne.

Ya rastî hûn nizanin we xwe li gorî çi bi biryar kiriye û pêwîste xwedî kîjan gavê bin. We qet bala xwe neda wir, heta di vê mijarê de qet pirs ji xwe nekirin. We li çav hinekan kiriye û ji bo çav bibînin tevlî têkoşînê bûne. Asta biryara we, vîn, baldarî û asta we ya dîtina pirsgirêkan pir lewaze. Dibe ku hûn di nava bêhêziyek mezin de di derbarê ku çareserî ji pirsgirêkan re peyda nekin de ji mêj ve bin ketine. Ev hemû kesayeta we ya milîtanî diyar dikin. Nexwe min pêşiya we negirt. Ez kesek wisa me jiyanê pir balkêş tehrîk dikim. Bal bidinê, di cîhanê de ti kes biqasî min di destnîşankirina pirsgirêkan û azadkirina mirovan de astek mezin girtî nîne. Lê belê ev jî têra we nake. Jixwe dibe ku hûn ji ber vê tevlî bûne. Ji ber vê rewşa we xemgînim.

Di serdema navîn de derwêşan her tim hu (Di nav Derwêşan de gotina silavkirinê ye.) dikir. Di roja me de hûn kevneşopiya seyîd û pîran dizanin. Ev ne ezmûnên vale ne. Ger hûn her roj bîrdoziya partiyê zikir nekin, wê heta dawî girêdana bi rêxistinê û di rêbertiya rêxistinê de rabûn misoger xwe xapandin be. Ger hûn rojane siyaseta partiyê pêk neyînin, hûn ê di vê rabûna xeternak de bişewitin. Dîsa jî yeqîn nakim hûn vê fêm dikin. Hûn kesayetên pir xeterin. Ger evqasî nirxandinên min ên li ser bîrdozî û polîtîkayê nebûna, tiştek li ser piyan nedima. Ger evqasî hûrûkûr li ser bîrdozî û polîtîka nerawestiya bam, ma me dikariya bijîn? Hûn vê jî fêm nakin, qet lê jî nanêrin. Ji pirsa xebata bîrdozî û siyasî çiye re, bi tinebûnek mezin ve bersivê didin. Xefleta we evqasî kûre. Jixwe hûn naxwînin, asta bîrdozî jî qet berçav nagirin.

Êdî divê em aliyê xeternak ê rêbertiya taktîkî destnîşan bikin. Ev aliyê xeter, ji ber ku dihizirin dê bikarin bi vî şêwazî jiyan bikine. Ev jî di navbera min û qadroyan de dibe şêwazek xeter. Pêwîste vê çareser bikim. Pir xirabe ku hûn xwe dispêrin û bi vî şêweyî dijîn. Naxwazim komplo li we bikim. Ev ancex dibe îdîaya dijmin. Di radeyek pir mezin de hewl didim we zane bikim. Ger hûn bal bidinê, şêwazek min bê qusur a ronakirin û rêxistinkirinê heye. Lê dema mirov li şêwaza tevlîbûna we dinêre, weke komplo li we hatiye kirin û hûn tên îdarekirin di nava rewşekê de ne. Elbet li vir qusur a we ye. Yeqîn dikim ku rêbertiyek rast dikim û min hemû dane jî dan we. Rêbertiya taktîkî di hêmanên bîrdozî, siyasî û leşkerî de hejartiyek kûr dijî. Em bi civakek pir xeter û endamên wê re rûbirû ne. Di nava komên kevin ên PKK'ê de bawerî û ezamet bihêz bû. Ev ji we jî dihat payîn. Lê belê we ev paşguh kir. Berî sala 1980'î wisa daneyek me zêde ya bîrdozî û siyasî nebû. Lê hinek nirxên komên me pir jidil bûn û bi girêdanek pir rasteqîn ve dimeşiyan. Piştî sala 1980'î ev hatiye xirabkirin, di radeyek mezin de qonaxa tîpên **evîndarê xwe** destpê kiriye. Nexasim piştî berxwedanî û şehadeta kesên herî girêdayî yên di girtîgehê de, di radeyek bilind de girseyek zindanê ya bê berpirsyar derket holê. Dîsa nexwazim di gêrîla de dema fermandarên xurt û baş derneketin, –ez ê nebêjim pir xwe dana jiyankirin, ji ber di nava

mercên şerê çekdarî de ew ne gengaze- bi şervan re jî rewşa îmhabûnê hat jiyîn. Em şev û roj li ser qada Ewrûpa disekinin, lê em nikarin ji ferdperestiyek ji rêzê dûr bixin. Rewş wisa ye û her yek jî xwediyê hesabê ye. Ya rastî tiştek ku zêde hesab kirîn jî nîne, tenê ji bo hema bêjin xwe dixapînin. Xwediyên dikanên biçûk zêde hesaban dikin, lê belê dema mixaze û markêtên mezin pêş ketin, qet nakevin ferzê ku îflas dikin. Ferdperestiya yên me jî hinekî dişibe vê rastiyê. Dema em dibêjin; “Tu îflas dikî, çavên xwe di ber de nirxên mezin.” Ew dibêje; “Na, dikana min heye.”

We çima ev pirsgirêk di wextê de nedîtin û li ser van pirsgirêkan nîqaşek we çênabe? Hûn mijarên herî bingehîn ên siyasî zewq nagirin û ji van direvin. Tiştên hûn zewq jêdigirin, tiştên pir ferdî ne. Dema behsa azweriya cixareyê dikim, vale nabêjim. Ji ber ku ew mînakeke bi israr vedibêjim. Zewqên we piranî dişibe zewqa ku hûn ji wê duxana cixareyê digirin. Baldariyên we her tim tiştên hêsanin. Hezkirina mezin, girêdana mezin, şerkirinek mezin, berteka mezin û hestên mezin bi we re nîne. Kesayetên rêber di van mijaran de dizane ku mezin be, mezin pêk tîne û dihese. Hevalê me yê herî baş diçe, difikire ku wê bîrîmekê çawa li gorî hesabê xwe bigire û çawa li derdora xwe bizivirîne. Bê ku şerm bike vê jî hêjayî xwe dibîne. Tevî evqas derfetên min hene, nikarim wisa weke we tenezilî şêweya xwe dana jiyînê bikim. Dema dibînim feyde nadim kesekê li hember xwe hêrs dibim. Dema feydeyekê nadim nêvengekê, ne gengaze ku wê rojê xwe bipejirînim. Lê hûn devjê berdin ji nêvengekê re bibin feyde, hûn ruhê nêvengê distînin û vê jiyanê hêjayî xwe dibînin. Vaye ferdperestiya xeternak ev e. Ev kesayet dikare her tiştî bike, lê qet nikare rêbertiya gelan bike. Dema ev kesayet diçin qadên herî mirin û mayînê û dikevin nav pêvajoyên herî giran, pêşî xwe difikirin, xwe saxlem dikin û rêxistin û gel paşê tê bîra wan, her yek ji wan ketîne. Ev kesayet misoger ji xayînekê zêdetir xirabin. Di pratîkên we de jî bandorên vê qet nekêmin. Jiyana xwe lêkolîn bikin, hûn bi hîs û fêrbûnên xwe ve wisane û ji hêla pratîkê ve jî îflas û winda dikin. Jixwe rûyê madalyon ê din jî ev e.

Gundî pir baş xwe dixapînin. Yên herî zêde xwe aqilmend dihesibînin gundî ne, lê herî zêde jî ew li hemberî pergalê winda dikin. Vaye hûn jî nûnertiya vê dikin. Hinek fermandar bi şêweya xwe ya şaş bikaranîna yetkî û li hember erkên xwe sekna şaş dihesibînin ku rehet dibin. Lê mixabin bi vê helwesta xwe ve herî zêde jî bê hed xwe dixapînin. Ya dibe dîsa li serê gelek nirxan dibe. Ez ê çi ji vê kesayetê bikim? Zarokek ferdî jî evqasî ne sefîle. Ji ber ku ev kesayet van karan bi zanebûn dikin. Çi xêr ji van tê? Kesê mezin dihizire qetiyen van napejirîne. Ji hêla exlaqî, felsefî, rêxistinî û siyasî ve jî wê şêwaz û tempoyek we ya bêhempa hebe da ku hûn bikarin pîvan raber bikin. Di heman demê de wê xebatek we bawerî hebe, da ku hûn bikarin bêjin; “Ez ser dixim.”

Dema bi biryargehên xwe yên navendî re daxivin, dibêjin; “Me wisa erkdar kir, wisa axivîn û nîqaş kir.” Gelo ev yeqîn dikin kêlî bi kêlî serkeftinê bidest dixin? Mînak ez li vir çiqasî teorîk, siyasî û felsefî bihizirim jî, dema bi kesek ji rêzê yê kêleka xwe re daxivim jî, hinek tiştan deh carî dubare dikim ma te ev kar wisa kiriye. Heta vî karî tam ewle nekim, devjê bernadim û dehî caran dubare dikim. Dema yeqîn dikim wê ser bixe û bi rêve bibe, wê demê rehet dibim. Ma hûn jî wisa ne? Hûn karê ku hewce dike bêkirin tenê di axaftinê de dibêjin, lê di pratîkê de pêk tê, nayê qet ne di ferqa vê de ne. Lê ez îro û vê hefteyê bi dest dixim. Hûn jî ji xwe bawer bin, tenê hukmê ya we bidest xistî bikin û rojane ji min re bêjin min ser xistiye.

Rêbertî tevgera serxistinê ye. Hinek zimandirêjin, lê pratîka wan nîne. Hinek jî hemaltiyê dikin, lê nizanin ev tê çi wateyê. Wisa rêbertî nabe. Rêbertiya wisa winda dike, wijdanê wan ti êş û janê najî. Niha fêrbûnên ku sedî sed sedemên windahiyane hema bi her kesî re heye, lê mixabin kes xwe di vê mijarê de lêpirsîn nake. Rêxnedan jî di axaftinê de ne. Ger di wan rexnedanên xwe de jidil bûna, wê misoger pêşveçûn cuda ba, wê fermandariyên wan û rewşên di bin erka wan de hatî raberkirin jî derneketiban holê. Mijûlbûnek wan ku rojane ji jiyanê ders derbixin nîne. Qaşo rexnedayînek dane. Ya rastî ev kesayet ne dil xirabin, bi qasî dixwazin bila bêjin ku durist jî nêz dibin. Lê belê em çi navî li van

kesayetan bikin? Hûn di vê rewşê de ne. Girêdana we bêhempa ye. Hûn ji min zêdetir bi min û partiyê ve girêdayî ne. Bes hûn bi vê çi rizgar dikin? Ya ku pêwîste bê rizgarkirin ne ez û ne jî partiye, cewhera dozê ye, şer bi xwe ye û çalekiye. Ev feraset jî bi we re nîne. Ger girêdana we bi serkeftinê encam nebe, wê xirabî û zerarê bide we. Ez qetiyen girêdanek wisa naxwazim, ji ber ku hûn ê tevgav bibin. Mafê min nîne ku we wisa girê bidim, heta mafê we nîne ku hûn wisa bi partiyê ve jî bên girêdan, ji ber ku dê ji bo siûda we heyf be.

Şêweya girêdana rast, şêweya misoger bidest dixe û erk digirê ye. Girêdana we ya bi Rêbertî û partiyê ve li ser vî bingehî rasteqîne. Lê belê ger hûn weke derwêşekî yan jî fanatîk girêdayî bin, hûn ser naxin. Ger hûn wisa bikin, hûn ê paşê jî bixetimin, tengav bibin û xwe bişewitînin. Jixwe ji **rêderketin** jî wisa pêş dikevin. Di cewhera derwêştiyê de ev heye. Sedema ku di dîrokê de mezhebên bindestan ser nexistine, ji ber van sedemên min diyar kirine. Xwe gihandina destkeftiyên polîtîk û bilindbûna van pir zehmete. Lewra naxwazin girêdanên xwe winda bikin, terîqet û mezhep pêş dikevin. Nexwe divê em feraseta xwe ya girêdanê sererast bikin, heta serxistinê pêşve bibin û di vê mijarê de heta radeya dawî afirîner bin. Ya ku ji bo me hewce jî ev e.

## Milîtanê Herî Hêja, Dizane Çawa Bijî

Rastiyan pir berfirehî vedibêjim. Di vê mijarê de tiştekê ji we kêm nakim, lê ji min hêvî nekin ku tawîz bidin paşverûtiyên we û lihev bikim. Gengaz be hinekê vê xalê fêm bikin. Li ser bingeha PKK'ê bê ku tawîz bidim ji jiyanê re heme, lê divê bi we re jî pêşketinên mezin çêbin. Dema hûn hinek tişt têbigihijin, pêwîste pêşketin li gorî paşverûtiyên we zêdetir lez çêbin. Ger pirsgirêk pêşketina min bûya, min dizaniya ku çawa xwe bidim karkirin. Her kes vê dizane ku, ne gengaze bisekinim û bêm sekinandin. Li ser bingeha Rêbertiyê di wateya ji karên gel re derfetên serkeftinê avakirinê de ne kes dikare min rawestîne, ne jî bi kesên weke we ve asê dimînim. Ger şêwaza Rêbertiyê wisa ye, vêca ji we re çiye? Çima evqas bêdengî heye? Derdê we çiye û çiyê we heye? Tişta ku we evqasî muhafezekar dike çiye? Ma cîhanek we ya berê ku we winda kirî heye, yan jî firsendên jiyanek din li benda we ye? Qet yeqîn nakim wisa ye, dîsa jî hûn bêdengin. Hişê mirov ji rawestandinê re ne guncave. Dema fikir kar kir, quweta herî mezine. Dema vîn dijwar bû, ji pola dijwartir dibe. Li ser xwe jî van pêk bînin. Nexwe aliyên ku hûn derbas nakin û quwetên ku we radiwestînin hene. Ger dixwazin îdîaya xwe bisepînin, hûn ê van tevan hilweşînin. Em jî li ser vî bingehî we şervan bipejirînin, PKK'yî bipejirînin, lê divê hûn jî kêm-zêde vê bibînin û bipejirînin. Êdî divê hûn jî di nava partiyê de evqasî muhafezekarî û lihevkirinê hêjayî xwe jî, me jî nebînin.

Nêvenga partiyê, nêvenga **azadiyê** ye. Ger bêjim tişta bi we re dibînim ferasetek azadiya pir hov a paşverû ye wê fişal be, ji ber ku we hêj di wateya hov de jî gav ber bi azadiyê ve ne avêtiye. Di vir de ya herî xeter jî Kurd xwe dixe dewsa mirov de. Yeqîn dikim we xafiltiya herî mezin jî di vir de kiriye. Ji ber ku di mercên hemdem de koletî nîne, mirovê Kurd jî xwe hemdem dihesibîne. Nexasim di pirsgirêkên teşe de koletî nîne, cilek her kesî, cil û berg, nav û paşnavek her kesî heye. Li ber çav weke her kesî Kurd jî azad

dixwiye. Misoger xapandina herî mezin ji vir destpê dike. Kurd û gelên weke wan ji koleyên serdema destpêkê zêdetir koleyên xeterin. Hêj baş pênaseya koletiyê ya hemdem nehatiye kirin. Başiya herî mezin min li xwe kirî, di şêwaza ku heta niha we kirî de min xwe zilam nehesibandiye. Yeqîn dikim şêweya vî karî di vir de ye. Heta tê bîra min xwe naxim dewsa zilaman. Hêjî her roj ji xwe dipirsim, tu çiqas bûyî zilam? Bihizirin, ez jî vê ji xwe dipirsim, vêca hûn werin xwe muqayese bikin.

Bê fişal van vedibêjim. Dizanim ku bûna mirov bi çi ve girêdayî ye û pêwîste çawa be, hewl didim mirov bim. **Bûna mirov** bi welat, serxwebûn, şer, rêxistin û bi hemû xisletên milîtanî yên em hewl didin raber bikin ve dibe. Ev nebin em nikarin bibin mirov. Hûn li ser vane û qaşo mirovin. Diyare ku misoger her kes xwe xwediyê nefsekê dibîne û dibêje; “Ez jî şanazim, serfirazim û mafê min ê jiyînê heye.” Di vê mijara nêzîkbûna azadîxwaziyê de xapandinek kûr rave dike. Hewl didim sedemên ne mezinbûna we derbixim holê. Ya herî xeter hûn xwe ne fêhmî dikin, nefêmkirin an jî şaş fêmkirine. Şerê fêmkirinê şerê **herî başe**. Şerê vegotinê jî beriya her şerî ye. Êdî piştî vê qonaxê bibin xwediyê ferasetek kûr. Ger hêrsa we li hember tiştên ku heta niha we kirîn heye, êdî ji vir û şûn de jî em dipejirînin. Bes hûn bikarin xwe bidin jiyîn. Ger hûn bêjin; “Em baş dijîn”, wê ev ji bo me bibe başiya herî mezin. Ya girîng hûn ji bo xwe bidin gotin; “Baş dijî, rêxistinî û siyasî dijî.”

Kes ji we naxwaze hûn koletî, hemaltî û beredayîtiyek evqasî kûr bijîn.  Mirovê herî baş, milîtanê herî hêja yê di nava partiya me de, di vê wateyê de dizane ku pêwîste çawa bê jiyîne. Milîtanê ku vê ser dixe, di asta awarte de hêja ye. Me dixwest ku wisa ji her eniyê dengek derbikeve bêje; “Ez dizanim ku pêwîste çawa bê jiyîn.” Gel, rêxistinbûn û pêşketinên rojane yên derdora me, dide diyarkirin ku kesî ev ne selmandiye. Ne bawerim min ji yek kesî jî di vê wateyê de nirxandinek girtibe. Her kes kar dike, gel jî şev û roj di nava xwîn û xwêdanê de ye. Lê ez ji van xebatan re dibêjim xebatên koletiyê. Xebatên azadiyê tiştek cuda ye. Hûn ê vê bêjin; “Ma dema hewce dike ez namirim?” Dema hewce kir mirin ji bo serkeftinê têrê nake, hêsan mirin pir xirabe. An jî hûn ê bêjin; “Ma

her cure hemaltiyê nakim?" Ew jî pir xirabe. Weke gotina lêborîna wî ji qebeheta wî mezintire, rewşa we jî hinekê wisa ye. Nêzîkbûna we ya dibêje; "Rêxistinê baş bikar tînim" hîn xirabtire. Jixwe çewsandina gel tawana herî mezine. Piraniya van di bin navê; "Vê wisa dijîm" de tên pêşkêşkirin.

Gelo hûn fêm dikin çima neçarim wisa bijîm? Ger hûn lêkolîn bikin, "Ev zilam çawa wisa dijî" û min fêm bikin, ez ê pir dilşad bim. Êdî bi xebatê re jiyîn neçartiye. Kesê bi qasî min lêhûr dibe kêm tê dîtin. Ji ber ku çareyek din nabînim wisa dijîm. Ger hûn bizanin bêçaretî û zêdegavî çiye jî, şêwaza we ya li dijî van derketinê pir cuda ye û hemû jî li kêleka hevin. Min hevsengiya xebatê pir çêkir. Min jî palehî kir, pembû kom kir, hema hema di gelek karî de xebitîm. Dîsa min dibistan xwend, xebatên zanistî û heta ol'î jî kirin. Ji van hemû karan kêm fêm dikim. Encamên ku min ji van karan tevan derxistî cuda ne, ya we hîn cudatire. Dema hûn dikevin nava xebatekê, hûn her tiştê xwe bi wê re winda dikin. Misoger naxwazim di nava ti karî de hevsengiya xwe winda bikim. Bi qasî pêwîste di her karî de bê kirin dikim. Weke kes jî qetiyen xwe weke we feda nakim. Ji ber ku ev dijberî xisleta min a azadiyê ye. Neçare azad bim. Ji temenê xwe yê biçûk ve vê rêgezê esas digirim û ji vê tawîz nadim. Girêdayî şerê azadiyê jî ked didim.

Ma di nava we de di bin navê; "Dê û bavê min dixwazin" de yên ku xêra wan hewl nade bimire hene? We tevan heta mirina xwe kar kiriye û gotiye; "Êdî ji bo rewşa xwe rizgar bikim ez ê xwe wisa bidim jiyîm." Hûn bi ekolek din, şaxek din tevlî jiyanê nebûne. Jixwe di vir de kesayet jî hatiye windakirin. Lê min ti carî heta dawî ev kes wisa dixwaze, malbat wisa dixwaze, derdor wisa dixwaze, dewlet wisa dixwaze xwe amade nekir. Min li vir mirovahî û hinekê jî kes bi xwe jî berçav girt. Dibe ku min weke we pir tişt jiyan nekiriye, rasterast cixareyek nekêşa, nebûm lawek baş ê malbatê yan jî xewek xweş ne girt, helwestên min ên keyfî çênebûn, lê min hevsengî parast. Li hember merc û nêvengan têk neçûm. Niha jî sekna herî bi bandor didomînim. Çima hûn hewl nadin vê jî fêm bikin? Qaşo hûn bi me ve girêdayî ne, ji me fêr dibin, lê belê cidî nagirin ku ez vê hevsengiyê çawa saz dikim. Ji

destpêkê ve dibêjim, çima ev heval min cidî nagirin. Bal bidinê niha li Kurdistanê kesê herî zêde cidî tê girtin ez im. Dîsa jî ne li ser bingeha min diyar kirî ye. Di vê cidî girtinê de ji rêderketinek xeter heye. Komek di rêjeyek sînordar de li ser bingeha min diyar kirî cidî bigire, wê her çarenûs ji kokê ve biguhere.

Niha di pêşketina karên Kurd de şêwaza min heta dawî encamgire. Ji bo hûn dixwazin şer bikin vedibêjim: Li vî welatî kî dixwaze şer bike wê hinekê hewl bide me fêm bike. Bes şêwaza we ya min bikaranînê pir xetere, ji ber ne gengaze ez bêm bikaranîn. Wê di encamê de wî kesî şeht bike. Xwe sipartina min ve erzan jiyîn pir xetere. Weke pergal bikaranîna min, xwe sipartina min xwe jiyîn ne gengaze. Min hûn bi tika û minetê ne anîn, dîsa jî ger hûn girêdayîne, hinekê ji bo xwe me fêm bikin. Dikarim qet rûyê we jî nebînim, dîsa jî hûn min fêm bikin, hûn ê bijîn. Ne ji bo xatiran û min razî bikin, ji ber ku ev rewşek objektîfe lewma min fêm bikin. Li vî welatî ancex li ser vî bingehî berxwedanî dibe, kar tê kirin û tê jiyîn. Lewra ger di nava partiyê de derketinek rêbertî yek din hebûya, ez ê pir dilxweş bam û wê min pîroz kiriban, lê dernakevin. Niha ne tenê di nava me de, li dervî me jî yek kesê bê ku xwe bispêrê min û bijî nîne. Heta yên dawî li dijî me jî tevlî vê ne. Her çendî ji bo we zehmet jî be, êdî hêdî hêdî tevlî şêwaza me bibin. Di vê mijarê de qet durûtiyê nekin. Qaşo dibêjin em girêdayîne û heta tevî ku ji gelek aliyan ve pir girêdayîne, gelek xalên bingehîn windakirin pir xirabe. Ji bo xatiran girêdanên wisa naxwazim. Ango bi nêzîkbûna; “Em şermîn nebin, bila rûyê me spî be” neyên girêdan. Ev bûyerek dîrokî ye, ne bûyerek ku kesek pêk bînê ye. Eleqeya xwe zêde bi min ve jî nîne. Di wê qinyatê de me duruşmeyên weke; “Fermana partî ye, neçare em bikin û tê xwestin” şaşin. Hûn xebatên azadiyê ne ku ji ber tê xwestin û neçarin, ji bo bi qasî nan û avê ji we re **pêwîste** bikin. Ne ji bo hûn xwe neçar dibînin, ji bo hûn pir tî bûne divê beşdar bibin. Azadî we neçarî vê dike yan jî ger hebê bêrîkirinên we yên azadiyê hûn misoger ji bo neçariya vê dikin.

Hilberîn her tim û li her derê ye. Cîh û wexta kesayetên partîbûn pêk anîye nîne, ew her wextî di hilberînê de ye. Hilberînek

bê perwerde nabe. Başiya herî mezin hûn li xwe û me jî bikin, ev çarçoveya me diyar kirî li her qadê, zemînê û pêvajoyan bê dudilî, bi biryar û ezamet pêkanîne. Em dixwazin PKK'ê li ser vî bingehî rakin ser piyan. Ya ku Kongreya V. bi biryar kirî ev e. Derketina destpêkê ya PKK'ê jî li ser vî bingehî bû û cewhera hemû dîroka wê jî ev e.

Me PKK evqas vegot. Di encamê de hûn bikarin li ser bingeha van pîvanan kar bikin, nexwe we fêm kiriye. Ev pîvan pir hatin tengavkirin û ev tengezarî feyde neda kesî, heta pir zerar da me tevan. Her wiha yên ev tengezarî pêşve birin jî, dibe ku ne di ferqê de bûn, lê kesayetên pir bê berpirs bûn. Lewra divê di astek bilind de mirov li partî miqatebe û hemû pîvanên wê pêk bîne, bila ev karê zerardayînê raweste û nebe. Ger hûn partiyê winda bikin, hûn ê her tiştî winda bikin. Di nava partiyê de bi pîvanên partî tê jiyîn. Em dibêjin bila pîvan neyên xirabkirin. Ji ber dema pîvan tên xirabkirin yek kesê ku tenê temaşe nekê namîne. Vêca hûn yekser winda dikin. Hûn çima van fêm nakin? Rewşek we wisa zêde tine bûyî jî nîne. Hûn dikarin kar bikin, lê ji şêwaza partiyê serkeftinek erzan tê payîn. Vaye keyfiyeta we jî di vir de ye. Ev di şoreşgeriya proleter de nabe. Şoreşgeriya proleter, şoreşgeriya girêdayî kedê, şoreşgeriya sosyalîste, partîbûna sosyalîst dizane ku li ser van bingehan kar bike. Hûn çima vê bi keyfiyeta xwe binpê dikin? Çi mafê we heye? Jixwe biryara PKK'yîbûnê daye, serê xwe daye ber mirinê û we xwe feda kiriye. Lê şêwaza we nîne, rastiya we nîne û tenê xeyalên we hene.

Hûn bal bidinê, em bi dijwarî û israr li ser pêşengtiya partiyê radiwestin. Pêwîste hûn vê ji kûranî hîs bikin. Divê her kes bi qasî hewce dike partîbûnê pêk bîne. Asta partîbûnê, asta artêşbûnê ye. Ger hûn PKK'yîbûnê dixwazin, bila berê pêşî aqilek dernekeve û nebêje; "Ev xisleta gundîtî ye, ev xisleta Botanê ye, ev xisleta Amedê ye, ev xisleta Dêrsimê ye, xisleta hemaltiyê ye" û xwe nexapîne. Em behsa xisleta partiyê ya pir bingehîn û gerdûnî dikin. Ji ber ku ez berpirsyariyê di hemû şaneyên xwe de dihesim, PKK'yî me û ev berpirsyarî ya me tevane. Hûn jî dibînin, ji PKK'yîbûnê serfirazî tê jiyîn. Hinek hêviyên we yên weke; "Ez ê

mezin şer bikim, mezin ser bixim” hene. Vaye PKK’yîbûn ji bo vê ye. Dîsa hêrs, xwestek û xweziyên we hene. Vaye ji bo pêkanîna van PKK’yîbûn hewce ye. Heta ku PKK’yîbûn pêş nekeve, nikarin xwe bigihînin ti tiştî. Hûn nikarin ti xwestek û bêrîkirinên xwe, heta azweriyên xwe yên şer jî pêk bînin. Ez kesek pir hêsan têr nabime. Radeya min di partîbûnê de pêş xistî min hinekê têr dike û wisa xwe îdare dikim. Hêza min dide jiyîn asta partîbûnê ye. Dema PKK’ê wisa pêk tînim ji hemû nexweşî û bêtêrbûnên xwe yên mezin hinekê rizgar dibim. Ji hêla felsefî, dilxweşî û siyasî ve asta bêhempa ya pêk tînim û hemû hîsên min, ji min re dibêje; “Bi qasî tu dikarî partîbûnê pêk bînî dikarî li ser piyan bimînî” û ev jî raste.

Ma hîsên we hene, yan na? Gelo hîsên we jî wisa we têrkar dike yan na? Divê ev bê ceribandin. Ez di hemû şaneyên xwe de partîbûnê dihesim û wisa dizanim ku dijîm. Li kêleka serê we derfetên rêxistinê belav dibin, pîvanên rêxistinê xirab dibin, lê li hemberî vê hîsên we jî şiyar nabin. Ev ji bo partîparêziyê rewşek pir xirabe. Ji hêla asta partîbûnê ve karesateke. Bihizirin, di nava we de yên ne wisa hene? Paşê jî hûn dibêjin; “Em PKK’yî ne” û tên nava me. Em ê bi vî halî çi ji we bikin, hûn qet vê dihizirin? Bi çanda eşîret û malbatê mezin bûne û hatine, paşê jî dibêjin; “Me îdare bike.” Xweziya bijiya û hûn biçûna we bi dayîka min re nîqaş kiriba! Xwîşkên min hene, dikarin biçin bipirsin. Di vê cîhanê de zilamê ku qet neyê îdarekirin ez im. Ez ê çima we evqasî îdare bikim?

Hêvîdarim hûn partîbûnê li ser vî bingehî fêm dikin. Êdî hûn ê xwe bidin karê partîbûnê. Her çendî em di tengaviyê de jî bin, em ê van karan bimeşînin. Dibe ku dema em Rêbertiya di cîhanê de herî zehmet dikin, dîsa jî em ê hêz bidin we. Gavên xwe li gorî wê bavêjin, ne xapin û ne xapînin, êdî bese. Evqas xapandin, evqas tawanbarî, evqas xizmeta ji dijmin re çawa tê pejirandin? Evqas bê edebî, evqas fanatîzm, evqas girêdana erzan, girêdana di axaftinê de, girêdana çavsorî, girêdana sewdaserî nayê pejirandin. Pir vekiriye, êdî em neçarin rast têbigihijin û rast pêk bînin. Bila ti kes ji bilî vê ne eleqe, ne pêwendî, ne jiyan, ne rêzdarî, ne nêzîkbûn, ne hezkirin, ne şer û ne jî rêxistinê ji me hêvî neke. Ji yê herî nû heta

yê herî kevin ji bo we tewan vedibêjim: baldariyên we, hezkirinên we, rêzbariyên we, asta we ya şervantiya siyasî, perwerdeya we, rêxistina we, şêwaz, tempo û uslubê we, êdî di çarçoveya pîvanên kêm-zêde derketin holê de bila bi girêdana PKK'ê, nexasim Rêbertî û gel ve hevgihînekê pêk bîne. Ji bo serkeftina hemû xebatan, bila ya hewce bê girtin, li vir jî heta dikare bibe xwedî hewldanên têrkar. Rêgeza jiyanê ya ku tawîz nayê dayîn jî ev e. Başiya herî mezin hûn li xwe bikin jî di çarçoveya van pîvanan de xebat û jiyan li ser van bingehan azadkirin, ger gengaz be ev di nava hemû partiyê, jiyana artêşê û her ku biçe di nav girseyê de serwerkirin û serxistine.

**14 Gulan 1995**

## AZADÎ RASTIYA RÊVEBIRINÊ YE Û AZADÎ DEST BI XWE RÊVEBIRINÊ DIKE

Di wateya gelemperî de hêjî pirsgirêka me ya herî bingehîn pirsgirêka rêveberiyê ye. Rastiya azadiyê rastiya rêvebirinê ye û azadî dest bi xwe rêvebirinê dike. Weke ku hêza rêveberiya cewherî nîşaneya pêşketinekê ye, esasê wê ye jî. Civatek ku nikare xwe birêve bibe, civata herî zêde ji bikaranîn û mêtîngehkirinê re amade ye. Netew, partî û kesên ku makanîzmaya xwe ya rêveberiyê xurt saz kirine, berendamin ku xwe ji her hêlê ve birêve bibin û di vê wateyê de pêş bixin. Tevgerên azadiyê yên ku makanîzmayên xwe yên rêveberiyê xurt saz kirine jî venêrîna xwe pir xurt ava dikin û zû dibin desthilat.

Em jî weke gel, partî û artêş bi şêweyek hûrûkûr pirsgirêka rêveberî dijîn. Nexasim pirsgirêka fermandarî hêjî weke pirsgirêkek pir cidî li pêş me ye. Di artêşbûnê de pirsgirêka herî cidî me jiyan kirî pirsgirêka **fermande** ye. Fermande anîne rewşek nayê nasîn. Ger em pêşî li vê rewşê negirin, dibe ku em ji neyêniyên mezintirîn re rûbirû bimînin. Ya rastî ev pirsgirêk bi rewşa xwe ya îro ve rê ji gelek tengezariyan re vekiriye. Ev rewş bese ku me ji artêşbûnê dûr bixe. Rêveberiya partî jî hîn şûndetire. Rêveberiya partiyê rewşek gelek dûrî pêdiviyan dijî. Ev şêweya rêveberiya seqet ku em pir bikar tînin, em xistine rewşek ku ji feraseta rêveberiya Komara Tirk paşketîtir. Ev feraset tam feraseta karmende. Weke di şerê Başûr de jî hat dîtin, asta rêveberî pir paşketî ye û nikare kar bike. Heta ji rêveberiyên feodal, eşîret û artêşa Komara Tirk jî paşketîtire. Lê belê di rastiyê de em di mijarên wêrekî û fedekariyê de hîn pêşdetirin. Ev xisletên ku ji bo serkeftinê hewce ne. Girêdayî van hêza xwe dispêre berxwedanî û êrîşê jî heye. Lê mixabin asta rêveberiyek xurt ku bikare van tevan bigihîne serkeftinê nîne. Ji ber tinebûna xisletên rêveberiyê nirxên herî bi qîmet tên puçkirin.

Yeqîn dikim, hewce dike em di van nirxandinên xwe de zêde li ser babeta rêveberiyê rawestin. Em ê vê pirsgirêkê hem ji aliyê teorîk hem pratîk ve bigirin dest. Em ê makanîzmaya rêveberiyê ji her hêlê ve binirxînin. Tê dîtin ku hevalên ji welat hatine hêj ne di ferqê de ne ku divê rêveberî çawa be. Pêwîstiyên rêveberiyê yên ji rêzê jî pêk nayîne. Hewce nabînin berpirsyariya xwe rake. Pir rehet dikarim bêjim ku we bi qasî axayekî jî xisletên xwe yên rêveberiyê pêş nexistine. Ev çima wisa dibe, dibe ku encamên vê çibin? Ev pirsgirêk ne tenê girêdayî partî ye, ji hêla gel ve jî em pirsgirêkek wisa dijîn. Çawa ku gelê me nikare xwe birêve bibe û xwe dispêre hêcetên nerêvebirinê, hûn jî heman weke wan dikin. Hûn di nava partiyê de nûnerên rastiya miletek ku nikare xwe birêve bibê ne. Dema di nava me de hinekê rastiya rêveberiyê pêş dikeve, yekser hewl tê dayîn ev bi zimanê mêtîngeran an jî serdestan bê meşandin. Lewra hewce dike em vê pirsgirêkê bi şêwaza rêveberiyek rast derbas bikin. Divê mirov derbixe holê hûn çima evqasî zehmetiyê dijîn? Em ê di vê babetê de mînakên pir balkêş diyar bikin. Em dikarin vê bêjin; çend peyvên rast û ferman dibe ku gelek ji we rizgar kiriba û ber bi serkeftinên mezin ve biriba. Ger derfetên heyî ji rêzê jî rêkûpêk kiriban dibiya ku pêşketinên mezin ava kiriban. Şêwaza rêveberiya hûn niha dijîn gelek tevlîhev û rêze şaşiyan dihewîne. Derfetên şerkirina ku we bi berxwedaniyê ava kirine, ji ber nayê birêvebirin tam rizîbûnekê dijî. Ev jî dibe sedem ku hûn bi şêwazek pir xirab winda bikin. Ev rewş ji her alî ve diyar dibe. Hem dijmin hem jî dost vê rastiyê dibînin. Gelê me jî vê rewşê rexne dike. Gelê me hema di nav lepên rêveberên xirab de ax û wax dinale. Elbet ev rewş jî bi rastiya me ya Rêbertiyê re nakoke.

Feraseta rêbertiya ku min pêş xistî bêhempa ye. Ev feraseta rêveberî hem ji hêla şêwaz hem tempo ve bi temamî ji ya we cewaztire. Di vê manê de di navbera me de bi qasî çiyan ferq heye. Tevî ku hêza rêveberiyek bêhempa heye, hûn nikarin vê bi şêwazek rast bikar bînin. Weke ku hûn nikarin bikar bînin, berovajî dikin û bêkêr dihêlin. Em nakokiyek wisa ecêb dijîn. Em bi xwe re pêşketina rêbertiyek rast dafirînin. Bes çima ev çareseriya xurt bi we re ji pirsgirêkek ji rêzê re jî nebû bersivek? Pirsa ku herî zêde

gelê me jî dostên me jî dipirsin ev e. Bi nêrînên weke; “Qadroyên me şaşiyên pir mezin dikin” me hişyar dikin. Pir vekiriye ku vê hêjayî mezinbûna PKK’ê nabînin.

Ji bilî vê ya herî xirab jî, hinek oportonîst hewl didin ji vê valehiya ku derketiye sûd werbigirin û rêveberiya partiyê desteser bikin. Ger ez nebim, gelek tîpên oportonîst ên di kemînê de bi rehetî dikarin beşek partiyê ya mezin desteser bikin. Di vê mijarê de çavdêrî û ezmûnên min jî pir hene. Hûn ne di ferqê de ne ku çawa bi we didin windakirin. Me ev pir vekirî vegotin. Li şûna ku hûn ê hêrsa xwe ji bo cihek din bikar bînin, di valederxistina xebatên partiyê de hûn bikar tînin. Ev çavkaniya xwe ji nezanîna rêveberî û rêvebirinê digire. Jixwe weke gel asta me ya xwe rêvebirinê pir lewaze. Lê partî ji bo valederxistina vê rewşê bû daxwazkarê rêvebirinê. Lê mixabin li gorî tê xwestin pêwîstiyên vê pêk ne anî. Ev rewş jî çavkaniya xwe ji feraseta takekesî esasgirtinê digire. Belê qelsiya herî bingehîn ev e. Dema li mercên çiyan dinêrim, dibînim ku hêza we heye li hember her tiştî sebir bikin, lê belê hûn qet naxwazin dev ji vê helwesta xwe ya takekesî û keyfî berdin. Ev jî nexweşiya we ya herî mezine. Dema ku hûn wisa dikin, diyare ku we ji destpêkê ve her cure êş û tengezariyên mezin pejirandine. Ji ber we rêveberî bi sazî nekiriye, di feraseta erk, raye û berpirsyariyê de kûrbûn ne jiyaye, hûn helak dibin. Berpirsê vê jî tenê hûn e. Ji ber we hêj destpêkê ve şaş dest bikar kir. Niha jî êşa vê dijîn. An hûn ê weke min bi hewldanek bêhempa ve vî karî bimeşînin an jî hûn ê devjê berdin.

Di rêveberiyê de sazîbûn hewce dike. We ne karî hêz bidin ji rêveberiya keseke ku rast kar dike, ne jî destûra sazîbûnê da. Sazîbûn çiye? Bi pênaseya herî hêsan bi şêweyek herî saxlem asta avakirina **komîtebûnê** ye. Elbet kesê ku kordînasyonê jî baş bike, divê li derdora xwe bi qasî têrê dike alîgiran jî bigire. Hinek hewl didin teqlîda min bikin, lê ti eleqeya vê bi rastiyê re nîne. Pergala xebata min sazûmankiriye, di vir de valehî tine ye. Tempo û şêwaz pir leze. Divê ev jî wisa be. Rewşa min neçar dike ku ev wisa pêş bikeve. Ne gengaze ku hêz têra vê bike. Ji ber hûn nikarin şêwaza xebata hevbeş bimeşînin hûn helak dibin û dikevin rewşek nenas.

Ez di pêşîgirtina vê de zehmetiyan dijîm. Dihizirim ez ê çawa we bi sazî bikim.

Me di vê navberê de tije berg nirxandin pêş xistin. Nexasim di vê dewreyê de bi giranî di mijara pirsgirêka rêveberiyê de dahûrînên berfireh hatin pêşxistin. Asta dahûrînan tevkariyek ji dijmin re jî kir. Lê mixabin me nekarî vê di nava avaniya xwe de pêş bixin. Ev rewşek dil bi êşe. Em hewl didin pêşiya vê rewşê bigirin.

Zêde naxwazim ji rêveberiyên ku di cîhanê de pêk hatine mînak bidim. Lê rastiya rêveberên Emerîka û Alman'an pêşketinek ava kirine ku bi tenduristî ber bi çareseriyê ve birine. Mirov nikare vê paşguh bike. Van makanîzmayek rêveberî ya pir xurt ava kirine. Hem teorîk hem pratîkî pir baş birêxistin kirine. Yekser dixwazim vê bêjim: Ev bi qasî me ne xwedî fedekarî û wêrekiyê ne. Lê di mijara rêveberiyê de rêkûpêkiyek pir baş pêş xistine. Ger me li ser hêza xwe ya fedekarî û wêrekiyê hêza rêvebirinê jî zêde kiriba, misoger ti hêzî ne dikariya derkeve beramberî me.

Vêca rêveberiya hêzên Başûr ên ku em naecibînin binêrin: Pir hesas û pêşketine. Dîsa wê hêza rêveberiya YNK ya em biçûk dibînin binêrin: Ji me gelekî pêşdetirin. Van rêxistinan bi ezmûnên salan û fêrbûnên çîna serwer ve rastiya rêvebirinê baş têgihiştine û ser halan de hewl didin me jî rêve bibin. Em ji bîr nekin, gelek bîrîmên me yên xebatê di bin kontrola wan de bû. Heta ger di vî şerî de jî destwerdana me ya neyekser nebûya, dê we qet ferq nekiriba ku hûn di demek kinde ketine bin kontrola wan jî. Hêza me ya rêxistinê qet ne avaniyek wisa hêsan bê rêvebirine yan jî ne avaniyek wisa ye bikin amûrê berjewendiyên wane. Lê belê rêveberî vê rewşê ji hêla objektîf ve wan dixe vê rewşê. Ger rêveberî winda jî bike, divê hêza me vê nepejirîne. Me gelekî şêwaza xwe vekir. Hêza min a rêveberî û şêwaza min pir girînge. Ev hêz hemû netewê di asta herî jor de birêve dibe. Hûn vê jî lêkolîn nakin. Hûn çima nabînin ez çawa birêve dibim? Ya rastî divê fermandarek di wê îdîayê de be ku bi me ve girêdayî tevbigere.

Nexwe çima di şêwaza rêveberiyê de evqas cudabûn ava dibin? Ez ji tinebûnê dafirînim. Lewra hûn nikarin bêjin min; "Tu nikarî birêve bibî." Heta niha jî me di astek bêhempa de birêve bir. Lê hûn mukir tên ku we li herêmek biçûk jî tiştek ne daye guhertin. Ma ez ê sucê vê ji xwe bipirsim, an jî ji we? Ma pere, çek û şervanên we nebûn, an jî qad teng bû? Na, hemû jî hebûn. Heta ji derfetên min zêdetir, hûn xwedî derfet bûn. We mirov, amûr û alav baş nenirxandin, heta derfeta xwarin û vexwarinê jî baş nenirxand. Zimanê xîtabeta hevalên me yên herî pêşeng ku bikar tînin dide revandin. Zimanê rêveberiyek hêsan jî pêş nexistin. Tevî me dehê caran hişyar kirin dev ji vê fêrbûnê bernedan. Ez dibêjim; "Heval zimanê te dide revandin, heta ev neyênî digihe min jî." Ne di ferqa vê xisleta dide revandin de ne. Em ê pir cidî li ser vê pirsgirêkê rawestin. Lê em tenê li ser ranawestin, em ê giraniyê bidin perwerdeya hewce jî.

Dema hêza rêvebirina we dinêrim, di radeyek mezin de paşverûtiyan dibînim. Nexasim di tempo û zimanê xîtabetê de rakêşwerî, dîsa di fikir de kûrbûn nîne. Ev hemû ji bo leşkertiyê xisletên herî bingehîn ên pêwîstin. Deka li serbazên Tirkan binêrin, weke jiletê ne. Peyvên hemû bikar tînin hema bêje bijarene û bi pîvanin. Bi hesap van bikar tînin, ji ber ku bi wan re hêza rêveberî esase. Ji bilî vê ne xwedî naverokek dinin. Camêran weke jiletêne û girîngiyê didin teşe jî. Bi qasî xwedî teşeyek başin, rêxistinkirîne jî. Mane di civakê de dibêjin weke xorte çelenge, hema wisa ne. Mixabin di nava me de nîvê avaniya me weke nexweşê ruhin. Her wiha ji hêla fîzîkî ve jî hemû bê teşe û bêhêzin. Dîsa dema li zimanê wan dinêrim, hema her kes zimanek li gorî xwe heye. Yek ji sedema herî bingehîn a ne artêşbûnê jî ev e.

Weke din jî huquq û pêşbînî jî nîne. Gelek ji wan du metre pêşiya xwe nabînin. Ger bibîne jî nikare li gorî vê tevdîrên pratîkî pêş bixe. Ev esasên rêveberiyê ne. Ma ez ê çi ji kesê ku pêşbîniya wan nîne, tevdîr nagirin û şêwaz nagirin bikim? Di vê xalê de ti wateya gotina; "Ez dixwazim li ber xwe bidim, wêrekim" nîne. Belê wêrekiya koranî em behs dikin wisa ye. Ev nexweşiyek pir girînge. Kes naxwaze cîgirekê bigire cem xwe. Ger bigire aciz

dibe. Ma rêveberiyek wisa kêrî çi tê? Ger kes neyê perwerdekirin, cîgirê esasî neyê pêşxistin dê artêş çawa bi sazî bibe? Valehiya ku di windahiyekê de derbikeve holê dê çawa bê dagirtin û wê kî çawa pêş bixin? We hewce nedît van pirsan jî ji xwe bikin?

Min çima xwest van tevan bikim? Ne gengaze ku bersiva vê pirsê bidim. Ji ber ku li vir pîvanên min ên pêşxistina mirov pir sînordarin û bi van re mijûlbûn jî pir zehmete. Heta bi hinekan re ferasetek wisa heye dibêjin; “Ger ên me pêş xistine hewl bidin cihê me bigirin dê cîh ji me re nemîne.” Kesên tirsên wan ên wisa hene, di mijara ji xwe re cîgir avakirinê de heta dawî bê xwestek û bê biryar tevdigerin. Lewra dixwazin xwe bi tenê bihêlin. Kesên ku dibêjin; “Ev kar bê min nabe”, kesên ku naxwazin partî mezin bibe ne. Ev rewş di nava refên me de gelek caran hatine jiyîn û fêlbaziyên bi vî rengî jî zêde ne. Ji ber ku her tim bi feraseta; “Bila partî her tim hewceyî min be” tevdigerin, encamek wisa dijîn. Divê mirov vê bipirse; “Dema ku tu nexweş dikevî yan jî di pevçûnekê de birîndar dibî, ger mirovê ku dewsa te bigire nebe, wê kî zerarê bibîne?” Li gorî vê ferasetê partî zerar bibîne ne girînge. Ji ber ku tişta esasî berjewendiyên wan ên takekesî ne. Ev feraset bi temamî berhema feraseta netew û çîna serdeste û ferasetek pir xetere.

Her kes neçare ji bo partî zerar nebîne tevdîr bigire. Ji ber ku partî ne ji bo kes, ji bo gel heye. Di vê mijarê de Rêbertî xwedî seknek bûye malê milyonane. Ma ez çima evqasî hewl didim qadro pêş bixim? Pir vekiriye, ji bo ez bikarim xwe demdirêj bidim jiyîn vê dikim. Lê hûn berovajî vê dikin. Hûn xwedî feraseta; “Ez nebim, piştî min wê tufan derbikevê” ne. Sedema hûn mirovan pêş naxin jî ev e. Ev ferasetek feodaliya kore yan jî çavkaniya xwe ji bo xwedî fikrek malbata kor û eşîretek teng a di nava civaka me de heyî digire. Hûn nûnertiya felsefeyek weke; “Ger dê hebe divê ya min be, nebe jî bila ne ya ti kesî be” dikin. Sedema di bin vê rastiyê de jî ev e. Ev ferasetek pir paşketiye. Vêca ma derfet hemû ne di heman astê de ne? We dikariya li qadên xwe yên xebatê jî bi qasî dixwazin rêvebir û qadro pêş bixin. Lê we ev nekir. We qadroyên ku bikarin li ser xeta çînayetî rûniştî û rêbertiyê ji têkoşîna rizgariya netewî re bike pêş nexistin û got; “Bila ji bilî min ti pêşketinên din

çênebin.” Vêca ev tên çi wateyê? Ev tê wateya nehezkirina mirovê li dora xwe, nehezkirina gel, ji bilî xwe mafê jiyanê nedana keseke din û bi kurtasî ne esasgirtina artêşê çavkaniya xwe digire. Tîpên wisa ji bo di her tiştî de berjewendiyên malbata xwe ya teng û eşîretê esas bigirin û berjewendiyên xwe yên takekesî esas bigirin wisa dikin. Yeqîn dikim, ji sedî notê we wisa ye. Lê pirsgirêk nayê fêmkirin û nayê ferqkirin.

Di vê mijarê de ne weke PKK’yîyekê, hûn weke zarokek malbatê tevdigerin. Lewra qabîliyeta we jî vale derdikeve. PKK’yîbûn, ji bendên malbat, berjewendiyên êl, binemal û herêmî yên teng qutbûne. Derbaskirina niyaza bûna PKK’yî xetere. Lewra divê hûn lêpirsîna rastiya çiqas PKK’yî ne bikin. Kesê ku PKK’bûnê wisa esas bigire xwe bi tiştek wisa ve sînordar nake, nikare pêşketinan jî di kesayeta xwe de bixetimîne. Rastiyek PKK’ê ya xetek rast a netewî, xeta rast a çînî û rêbazê rast bikaranînê heye. Wisa tê fêmkirin, bandorên dervî çînî deh salan PKK mijûl kirine. Çi di ferqa vê de, çi jî bê zanebûn bikin, qet ne girînge. Xisletên kevin ên çînî pêşketinan radiwestînin. Hemû rik û ferzkirinên kevin ên takekesiya we, xwe dispêrin bingehek çînayetî. Ev xislet, xisletên çîna paşverû ne.

## Partî Warê Yekgirtina Serfermandarî Û Rizgarvana Ye

Em her tim qala partîbûnê dikin. Salvegera 17. a rizgariya PKK'ê hat derbazkirin. Dema derbazî sala 18. ya rizgariya partiyê dibin, hîn jî dibêjin bibin partî. Partîbûn cidî ye. Hîn yên partiyê jiyan dikin û didin jiyankirin derneketine holê. Ez berovajî vê dibînim. Ger berxwedaniyek mezin ya Rêbertî û hêza wî ya temsîlê nebe, wê PKK li şewka pergala civakî a paşketî baliqe û tine bibe. Asta xilasbûyî ya çîn û partiyên ji derveyî me jiyan dikin wê demê dê di nava me de jî heqê jiyanê bibîne. Ferasetên li derve tine bûyî wê hewl bide di nava jiyana me de bibe xwedî mafê jiyanê. Mînaka sosyalîzma pêkhatî vê encamê dide nîşan. Ferasetên bi vî rengî di nava partiyeke heftê salan li ser desthilatî mayî derketiye û partî tine kiriye. Ya em behsa wê dikin, partiyên komînîstên kevnare ne. Partiya me jî partiya herî nû ye, lê bi teşegirtineke di nava mercên civakî yên herî paşkeftî de ketiye riya serkeftina şoreşê bidest bixe. Her wiha zemîna civakî ya partiya me heya bêjî paşkeftî û ji bo xirabûnê **destdayî** ye.

Ez bi keda xwe di rewşeke hêz didim de me. Dema li rewşa yêkîneyên me yên herî baş temaşeyî dikim, dibînim ku çima hêz bidest naxin û şer nakin. Piraniya yêkîneyên me yan ji hêmanên oportonîst re zemîn ava dikin yan jî xwe li ser bingeha zemîneke biçûk ya oportonîstiyek ku mirov nikare rê li pêşî bigire diberdin. Di nava me de feraset û nêzîkatiyên ku ji gelek çînan re zemîn veke hene. Ev kêmaniyek mezine. Ji we hemûyan dipirsim: Hûn çima van ferasetan diparêzin? Ger hêza te ya temsîlkirina çînekê nebe, tu yê çawa bikarî tevbigerî? Hûn hemû ferdperestiyê ferz dikin. Di navendeke kes kesî nas nake û pêşbirkekê de bûyîn, ancex mirovên li xwe difikirin dikarin derbikevin. Perdperestî, tê wateya xwe tinekirinê. Heta yêkîneyên herî nêzî we jî wê dilê we derbixe. Ger feqîrî û çavbirçîtî jî hesab bikin, wê neyê zanîn ku dê encama vê ber bi ku derê ve here. Heke em civaka me ya ku heta atomên wan jî hatî parçekirin berçav bigirin, vekiriye di nava partiya me de

selmandina vê parçebûnê wê encamên pir xirab biafirîne. Yek jî nîqaşkirina ji bo nirxan, li hember hev daxwaza dijminatiyê jiyîn wê bibe sedem ku ancamên pir xirab derbikeve. Fikra partî wisa bûyîn rewşek pir tirsnake. Nebûna partî, tê wateya di sosyalîzmê de paşde mayîne. Kî dikare vê qebûl bike? Hûn dikarin qebûl bikin, lê ez ispat dikim ku wê ev wisa nebe. Ger hêza min ya rêveberiyê nebe, hûn çiqas durist bin bibin, wê hemû hewldanên we vale biçin. Bi ax û waxê re tiştek nayê xilaskirin. Yek jî piştî evqas şehîd, ketina rewşên bi vî rengî wê qet neyê qebûlkirin.

Hûn dibînin rewşa Çepê Tirk di nav de dijî. Hema maye hemû ji paşeroja xwe re dijûn bikin. Yên dibêjin; "Salên me dizîne" hene û di derbarê me de axivîne çêbûn. Yek ji van xwedî li şehîd û paşerojên xwe derneketine. Bi vê re jiyan jî pêşnexistin. Zimanê ev bikar tînin zimanê dijmine. Li çepgirên binkeftî temaşe bikin û xwe bibînin. Ger rewşa ew tê de bandora xwe li me bike, wê belavbûna di nava me de hîn zêdetir bibe. Dubare vê destnîşan dikim. Çima Kurd bi xedar li hev dixin? Heta ji bo mirîşkekê li hev dixin. Wê ev bi awayeke hîn xeter di nava rêxistinê de bê selmîn. Ji ber wê dibêjim ku, bibin partiyî û hevgirtî bin. Li ser bingeheke rast hewl bidin ji rastiya şerê me re bibin bersiv. Ji bo we ev beriya henase girtin, nan û avê tê. Ev jî ancex bi avakirina mekanîzmayeke rêveberiyê re çêdibe.

Yê nikare xwe bimeşîne, wê nikare partiyekê jî bimeşîne. Di bingeh de partî heyeteke kurmayê ye. Pênaseyeke din a partiyê nîne. Mamoste vê dibêjin: Partî, heyeteke kurmayê ya karker û kedkaran dimeşînê ye. Dema li rewşa we temaşe dikim, em bûna **heyeta kurmayê** li deverekê bihêlin, hûn nikarin xwe bimeşînin. Ji ber wê pêwîste bi hewldaneke awerte ve tevdîr pêş bixin. Ev keda me, dişibe partiyiyên ji bîra ziwa derxistine. Hemû hewldana me di derbarê kirina vê de ye. Hêjmareke zêde qadroyên me ne rîzgarvan, di rewşên bên rîzgarkirin de ne. Di encama dîtinên demdirêj de gihiştim vê encamê: Yanî çiqas nexweş hebin hemû tên navenda me û dibêjin; "Me xilas bikin." Ya rastî partî ciheke, hevgirtina serfermandarî û rizgarvana ye. Dema em li nav refên rêxistinê temaşe dikin, dibînim ku hêjmareke mezin li ser armanca rizgar

bibin hatine. Ev şaşin û li hember van helwesta me pir tunde. Dipirsîn dibêjin ku hûn çima yên li ber rizgarkirinê tînin. Partî, ne cihê nexweşane, civateke hekîmane. Heke hûn evqas nexweş bînin, wê kî van sax bike? Li gel me yekî peywira bijîşkiyê rake nîne. Tenê ez heme. Kesek tenê çawa bikare vê peywirê bicî bîne? Ev rewşek nayê famkirine.

Gelek nexweş hatine navenda me; dema li we temaşe dikim vê dibînim. Mafê kesî nîne nexweşiyên xwe bîne nava rêxistinê. Mirovên bi tendûrist her kêlî di rewşek hekîmbûnê de ne. Ev di hêza civak û her wiha kes çêbikin de ne. Ti rêxistin nikare avaniyeke evqas nexweş di nava xwe de bihewîne. Hûn wek mîsala “ha ji te re belaya serî” tên. Madem hûn bi îdîa ne, wê demê bigire gel xwe û perwerde bike, ger hunereke te taybet hebe wê bide nîşan. Yên tên vir bê ku berpirsyartiyê hîs bikin tên. Lê me di serî de jî got ku wê wisa neyên vir. Em hewl didin biwêja dijmin ya ‘hûn nabin mêr’ vale derxin. Gelê me heya bêjî mileteke kole ye. Selmandina vê di we de hîn mezintire. Divê dema hûn li xwe temaşe dikin vê rastiyê baş bibînin. Ez tevlî nêrîna ku dibêje ‘mirov ji çêbûna xwe ve ne xwedî taybetmendiya birêvebirinê ye’ dibim. Ger mirov bixwaze û bi ser xwe de biçe dikare gelek tiştan biser bixe, yê ser nexe jî wê biser bixe. Wiha ev di rastiya rêbertiya me de pir şênbere. Min xwe ji we re vekir. Min di navendeke herî neçar de gelek derfet afirand. Çima hûn min fam nakin? Hûn çima ji min hêz nagirin? Cîhan vî aliyê min dibîne. Ji Emerîkiyan bigirin heta faşîstên Tirk hemû ji bo min dibêjin; “Sepînerek bê emane.” Ev hatiye selmandin. Tişta hatî nîqaşkirin ma pêwîstiya wê bi nîqaşê heye? Na, pêdiviya me bicîanîna pêwîstiyan heye.

Heke bêjin; “Em nûnertiya çînek din dikin.” Ez ê jî bêjim derdê we cuda ye. Em ê bi van ferasetan re helak bibin, bi misogerî li hev nakin. Li gel me cihê van tîpan nîne. Çi karê nexweşan li gel me heye? Bi misogerî divê hûn li pêşiya van bigirin. Pêwîste ez vê bi cezayên civakî û mueyyîdan ve nebêjim. We daxwaz kiriye ku di kurmayê de cî bigirin, lê pêwîstiyên wê jî pir vekiriye. Rêbertî ev hinek piştrast kiriye. Ger ez neserkeftîbam, min ê neserkeftinbûna xwe îlan kiriba yan jî mercên di nav de wê ev neçar kiriba. Yanî bi

awayeke xwezayî wê îflasa min banîba. Lê min îflas nekiriye, nakim jî. Bi performanseke bilind ve hewl didim pêşketinan bimeşînim. Dijmin jî vê baş dibîne û li xwe mukir tê.

Hûn nikarin bêjin; "Ya rastî em jî wisa bûn." Na! Rewşa gelek ji we li holê ye û diyar dibe ku hûn newisanin. Ji ber pir vekirî vê nakokiyê dibînim. Bi giranî di vê qadê de hûn dikevin nav nêzîkatiya eşîretgeriyê. Eşîret, tişta axayê wê dike qebûl dike. Pêwendiya me bi vê rastiyê re nîne. Çi emperyalîsta pir modern a heyî û hêza mêtingeh, çi jî hêza hevkar, li ser hemûyan potansiyeleke me rêveberiyê heye. Ti pêwendiyeke me bi eşîretgerî yan jî bi şêweyên teng yên rêveberiyên komûnîst re nîne. Me ji zû ve wan derbaz kiriye. Hûn ê gihiştina rêveberiyeke jêhatî esas bigirin. Ji bo gihiştina vê jî hûn ê di asteke têr de perwerdeya vê ya bîrdozî, siyasî û rêxistinî bigirin.

Lê weke ku di me de kêmbûna tecrûbê heye di mijara nefêmkirina perwerdê de jî muhafezekariyek û heta bûna gef heye. Hema di we hemûyan de ev jirêderketin heye. Pêwendiyeke vê bi partîbûnê re nîne. Yekî ku dixwaze taybetmendiyên esasî yên fermandariyê bigere divê bê xeta rast. Ji ber fermandariya artêşê ji milîtanên partiyê yên herî pêşketî pêk tê. Yên nayên rêxistinê yan jî yên ne xwedî danaheveke bihêz ya siyasî û teorîk be wê nekarin bibin fermandareke baş. Fermandarên leşkerî yên di nava me de navbera wan a siyasî û teoriyê zêde baş nîne. Ev rewşeke pir ecêbe. Yên fermandariyê pêş dixin, pêwîste bibin xwedî zanistiyeke siyasî û teorîk.

Xala me tê de winda kirî û herî lewaz man ev dere. Me fermandarî zêdetirin li ser gundiyan hişt. Yêkî ku ev taybetmendî pê re heye tevî hemû hewldanên wî wê nekare şer pêş bixe. Di demên derbazbûyî de ev derketibûn holê. Çima tevî hewldanên herî mezin nikarin artêşê pêş bixin? Ji ber hişmendiya teorîk û siyasî nîne. Gundîtî, wê nikare şer zêde pêş bixe. Îsyana gundîtî isyaneke jiberxwe ve ye. Ji vê zêdetir nikare tişteke din pêş bixe. Dibînin çiqas dihincirin. Ferasetên di gundîtî de israr dike me ber bi ku derê ve dibe û yên bi zimanê pergalê taxivin me çiqas ji artêşbûnê dûr dixe li holê ye. Em nakokiya yên hewldana pratîkî bi danaheva

teoriyê re nakin yek jiyan dikin. Niha rewşa di artêşbûna PKK'ê de tê jiyîn ev e û ev bi me didin windakirin. Heta ev ne di zanebûna serkeftinê winda dikin de ne; ev rastî ne di xema wan de ye. Tevî ev wisa ye kes xwe nawestîne. Hûn di kesayeta xwe de partiyekê winda dikin. Windahiya PKK'ê, tê wateya windahiya netewekê. Li vir kes bi zanebûneke berpirsyar tevnagere. Lewazî heye, di mijara raye û berpirsyariyê de şêlobûnek heye. Ev hemû derdixe holê ku hûn ne kurmayeke başin.

Em partiyê dikin kurmayê gel, bi taybet jî kurmayên artêşa me pêş nakevin. Di nîqaşên me de ancama derketî holê ev e. Hûn dibêjin di asta jor de nediyariyek heye, dîsa her tişt têkil hev bûye. Bi qasî fêm dibe ferdperestiyek heye. Ferdperestî bibandore. Dema pergal nebe, her tişt weke parçeyeke makanîzmayê nexebite, wê kar nemeşe. Wexta bi serê xwe mayî tu yê nikarî kar bimeşînî. Dema bi serê xwe dimînî artêş darbe dixwe. Ger hûn hinek windahiyan tehlîl bikin, hûn ê bibînin di bin hemûyan de ev sedem derdikeve. Yêkî bi serê xwe dimîne nikare biryareke rast bide. Di encama xeterî nedîtin, biryar nedayîn, derfetan nedîtin û her wiha neçûyîna ser, windahî hatine jiyîn. Ya rastî di devera em qezenc bikin de, me winda kiriye.

Dîrok ji we re pir hêsan tê. Hûn vê dibêjin; "Yên dibin min zêde eleqedar nake, min nekarî hêz jê re bînim, pêwîstbû Biryargeha Giştî ew kiriba, biryargeha herêmê kiriba." Dibe ev rastbin. Lê heke biryargeh pêwîstiyên biryargehbûna xwe bicî ne anî, nezanî di şer de bibe kurmay wê demê çi tê kirin? Wiha ji bo wê me qala însiyatîfan kir. Heke hûn wê nedin nîşan, rewşa bikevinê wê ev be. Wiha evqas sale şer dikin. Hîn zelal nebûye ka yên me di nava şer de terfî pêş dixin an jî pêş naxin. Hemû mîna serbazin, lê xwe weke general dibînin. Rojek generale, roja din serbaze. Komara Tirk jî ketiye ferqa vê, ew jî dibêjin; "Wisa nabe." Ji ber vê min jî rexne dikin, dibêjin; "Ev artêşek çawa ye." Yek rojekê fermandar, roja duwem dibe serbaz. Berpirsyarê vê ne ez im. Me ji bo xwe gihandina asta artêşeke baş pir tişt kir. Di pêş de tenê ne di warê teorîk de, hewl didim bi şêwaya wê ya pratîk ve jî vekim.

Hema hema di gelek qadan de pirsgirêkên perwerdê û şer jiyan dibe. Em ê hewl bidin van bi tecrûbeyên xwe yên pratîkî ve derbaz bikin û ji vir destpê bikin li hemû qadan vê pêkanê belav bikin. Ji bo xebatên me yên li vir wê ji hemû rêxistinê re bê ragihandin û qezenckirina vir bê wateya qezenckirina hemû rêxistinê, em ê bi israr li ser bisekinin. Bawerim yek ji karên me yên yekem bikin, di warê rêveberiyê de hinek vesazbûn çêkirine. Di warê rêveberiyê de kordîneya ferdî zêde bi bandor nabe. Temsîla kordîneya ferdî zêde nayê kirin. Ev kordîne li ser bingeha ferdperestiyê tê bikaranîn. Derket holê ku ev ji feydê zêdetir zerarê dide. Lê pêwîste hebûna kordîneya ferdî neyê înkarkirin. Di kesayetên bihêz de derfeta vê dayîn û pêwîstiya giraniya ku ji rêveberiya kolektîf re bê dayîn derdikeve holê. Ji dêvla kordîneya ferdî dema saziyan pêşxistin wê hîn biserkeftî be. Li gorî vê wê ev rêbaz hîn encamgir be. Di jor de kordînetoriya eyaletê, li jêra wê kordîneya herêmê, hîn li jêrtira wê heta vesazkirina komînê pêwîste em xwe ber bi erzaniyê ve bernedin. Rêgeza hevbeş, rêgeza desteya sazî jî di nav de divê esas bigirin. Ger ji kesekê re wê însiyatîf bê dayîn, ew jî serkeftîbe, divê bi şêwaz û tempoya xwe ve xwe bide qebûlkirin.

Pêwîste yê di serî de nizane wê çi bikin weke fermandar nedanin ser serê xwe. Di hinek mijaran de sedema windahiya me ev e. Yê serkeftî dibe dîsa dikare derkeve pêş; ev derketin pêwîste bi destûra rêveberiyê be. Rê û rêbazeke wisa wê hîn rastir be. Ev tenê ne ji bo vir, ji bo her derê derbazdare. Ji vir bikevin rê divê em vê pêkanê li her derê belav bikin. Ramanên me ev in. Dibe berdevkê deste û saziyan hebe. Lê ger wê tenê ji hêla yek kesî ve bê rêvebirin, wê yek derkeve temsîla vî karî bike. Lê wê ew yê din vale dernexe, berovajî wê piştgirî bide. Wê dabeşbûna peywirê bê çêkirin tekaneya ku ava dibe ne bi awayê ku yên din vala derxe, berovajî divê em weke kêmbûnên wan temam bikin, fêm bikin. Ev pêkan wê feraseta rêveberiyeke rast derxe holê. Ev rêgezeke rêveberiyê ya başe. Yên din neçarin yên tenê temam bikin. Nexwe ger tekane yekbûnê tangav dike, ango ger deste yan jî komîteyê tangav bike, pêwîst dike ku ew tekanebûn yan ji holê bê rakirin yan jî bê sînordarkirin. Em dixwazin hemû xebatan nû bikin. Em ê

nîqaş bikin ezmûna vê ya yekem li vir bikin. Bawerin ev şêwe, sînordar jî be wê ji pirsgirêka rêveberiyê re çareseriyekê bîne. Yên nû, kevin û gelek ji yên di astên cuda de peywir digirin bi şêwayên cuda dikarin di çarçoveya vê ferasetê de bi awayeke ceribandin bikin rêveber. Xebatên we wê bi şêweya desteyê be.

Ez dîsa bi tenê dimînim, lê bawerim tenê mayîna min di nava gel de jî hatiye pejirandin. Gel yekanebûna min pir dixwaze. Heta dixwazin ez vê hîn pêş bixim û teqez bikim. Jixwe hûn jî bi alîgirên min ve dixwazin bixebitin, lê lewaz dimînin. Lê ez dîsa tevî her tiştî kolektîf kar dikim. Heta ez bi zarokan re jî hevbeş kar dikim. Pirsgirêkeke min bi vî rengî nîne, lê pirsgirêka we ya hevbeşî xebitandinê heye. Hem hevbeş nebin hem jî pirsgirêkên we yên tekbûnê jiyan dibe. Ji ber vê bi misogerî pêwîste em hevbeşbûnê û tevkariyê pêş bixin.

Ev çareserî dibe bibe çareseriyeke cidî. Ev der di heman demê de dikare weke birîmeke artêşê bê destgirtin. Pêşkeftina em li vir bidest bixin, divê bi awayeke zincîrekê bikare li qadên din jî belav bibe. Ne bi yên pir dişibin hev re, di vê em yên cuda jî di nava heman desteyê de bicî bikin. Ji ber yên pir dişibin hev, yên nakokiyên wan yên giran nîne wê rê ji pêşkeftinan re venekin. Pêşkeftin, li ser bingeha çareseriya nakokiyan çêdibe. Heke yên dişibin hev li gel hev bin, wê demê dê pêşkeftin çênebe. Pêwiste yên dişibin hev li gel hev neyên girtin û ji yêkîtiya yên bi nakok jî netirsin. Di vê mijarê de jî gelek xetayên mezin tên kirin. Di nava yêkîneyekê de yên ku hinek nakokiyên wan yên biçûk hene hema tên tinekirin. Ev şaşe. Ya rastî yên bi nakok re tevgerîn, dikarin pêşkeftinên hîn girîng biafirînin yan jî li ser aliyên nakok bê rawestin, bi serkeftî bên dahûrandin û serkeftin bê sazkirin. Heman çav tenê tiştek dibîne, lê çavek cuda dikare bi awayên cuda pir tişt bibîne. Her wiha wê danehevên pir dewlemend derkevin holê.

Di vê mijarê de jî di we de nexweşiyek heye. Her kes neçare hêzek diyar bigire û weke min bibe. Heke ev wisa jî be, bi demê re bûna vê pêwîste paşçav neyê kirin. Di vê wateyê de divê bibînin ku bi çareserkirina nakokiyan re bigihin encamê. Di serî de “heke cira yêkî neşibe cira min û weke min gotî yê nake re ez naxebitim”

nêzîkatiyek wisa tê maneya parçekirine. Wisa parçekirin tê wateya ketina xefika civaka kevin. Ev tê wateya em ji nakokiyên xwe yên civakî re nabin hêza çareserî û ev jî windakirine. Ev rewşeke hûn pir zêde jiyan dikin. Nêzîkatiya we ya dibêje; "Ez bi vî kesî re kar nakim" neraste. Hinekan yên kêfa wan jê re nedihat îmha kirin; vederkirinê deynin aliyekê, kemîn danîn, tine kirin. Ev li gelek cihan jiyan bû û heya bêjî rewşek tirsnak bû. Heke me zanîba bi hev re kar bikin, me yê karîba gelek nirxan biparêzin û xilas bikin. Ev dikare rê li ber pêşkeftinek gelek mezin veke. Lê feraseta erzan derket pêşiya vê pêşkeftinê asteng dike. Ev di serî de windakirine.

Min li vir rêbaza xwe şanî we kir. Min bi nakokiyan re dest bikarê vê rêxistinê kir. Têkiliyên min yên seratayî, li ser bingeha çareserkirina hinek nakokiyên civaka gund destpê kir. Têkiliyên min yên destpêkê bi zarokê malbata dijber re destpê kir. Di gund de rêxistinkirina min a sereke li ser bingeha çareserkirina van pirsgirêkan destpe kir. Bal bidinê: Ev bingehê rêxistinbûna me ya destpêkê ye. Dîsa min derketina xwe ya ji Enqerê, li ser bingeha yên pişgiriya dijmin dikin û bi hêzên bibin nûnerên wan yên bi hêz re ketim nava pêwendiyê û pêk anî. Min derketina wê demê bikaranîna vê têkiliyê re pêk anî. Min du nakokiyên dijberî hev kirin yek û derketinek bi tendûrist ser xist. Di encama yekirina nakokiyan de aliyê bihêz ez derketim. Min van nokiyan di aliyê xwe de bikar anî, di encam de Komara Tirk heland; civata ku ava kirî heland, di gund de me ew têkiliyên pêşketî yên dijminayî heland; dîsa nakokiyên di navbera gel û yên bi dewletê re rast tehlîl kir. Hemû mantiqê min yê têkiliyan wisa ye. Dibe hûn ne di ferqê de bin, lê me ev pêşketina mezin li ser vê bingehê pêk anî. Nêzîkatiya min a ji têkiliyan re li ser vê bingehê ye. Em ê van hemûyan careke din li ser bingeheke berfireh vebêjin.

Di encam de pêşketina we pêwîst dike. Hûn ê bizanin, qadroyeke li ser kar serwer, bikare kar bimeşîne ava bikin. Pêwîste hûn êdî hêcet û xatirê nasan nedin pêş. Ger wisa be, ya hûn yên îflah nabin rizyane yan jî fikara we xirabe. Herdu jî nayên qebûlkirin. Kesê ku wisa dizane evqas li ber xwe dide, evqas

têkoşîn dike bawerin wê çareseriya nakokiyên rast jî di xwe de bibîne.

Di PKK'ê de ast nêzî hevin. Pirsgirêka me ne meşandina yê pir paşkeftî û yê pêşkeftiye, pirsgirêk yên pir nêzî hev bikarin hevdu bimeşînin. Rêveberiya yên nêzî hev jî pir giringe, hesase. Rêveberiya yên paşkeftî hîn hêsantire. Di nava xwe de kom xwe bi xwe meşandin pir giringe. Ev rêz û cidiyetê dixwaze. Dîsa yên di asta nêzî hev de meşandin pir giringe. Tepisandin dibe tiştên pir girab derxe holê. Danîna şûna mirovên paşkeftî wisa meşandin qet nayê qebûlkirin. Jixwe herî zêde hûn vê şaşiyê dikin. Ger tu yê nêzî xwe nemeşênî û tiştek nediyê, wê ew te red bike û tu jî serî li yê beramberî xwe tepisandiye bitewînî. Her du jî nerastin. Red jî, tepisandin jî şaşe. Her wiha ev rêveberî hesase û hûn ê bizanin bidin.

Jixwe ji bo civaka me bihêze ji we hewldaneke awarte naxwaze. Lê dîsa hesasiyetên wê hene, wê bixwazin pêwîstî bicî bên. Heta di mijara rêveberiya rast de wê bi israr bin. Ji ber Rêbertiyê rojane dişopînin. Ew jî pêşketine. Dema berovajî me dikevin, bi misogerî wê hêzên me qebûl nekin. Her çiqas hêza me bi hêsanî neyê rêveberiyê jî, rêveberiyên şaş jî qebûl nake. Divê hûn vê bizanin. Pêwîste hûn bizanin karê rêveberiyê ne retkirin û tepisandine, berevajî kirin û dana qebûlkirine. Dîsa bi taybet ne bi zorî divê hûn qebûl bikin ku tevlîbûnek jidile. Ger tişteke hûn bidin nebe, divê hûn qebûl bikin ku wateyeke hûn di rêveberiyê de bimînin jî nîne. Pêwîste hûn bizanin ku herî zêde yên pêwîstiya wan bi dayînê heye kargeriya rêvebirinê bidinê. Ev ji bo min jî wisa ye. Heke bizanim tiştek nadim, ez ê gava xwe ne avêjim vê wargehê. Bi awayê ruhî jî wisanim. Rojek jî be heke hîs bikim tiştek nadim, ez ê neyêm vir. Ez ê xwe tijî bikim, dema tiştên bidim çêbûn ez ê bêm vir. Ev ji bo we hemûyan derbazdare.

Weke din yên di rewşa girtinê de jî divê bizanin bi baldar bigirin. Gotina; "Teng dibim, pêwîstiya min zêde bi teştekê nîne" ne raste. Di van mijaran hemûyan de hûn ketin nava xeletiyên pir mezin. We di karê girtin, dayîn, rêvebirin û dana rêvebirinê de xetayên pir mezin kir. Em dixwazin li ser bingeha vê modela biçûk

serarast bikin. Ji bo wê bi misogerî hûn ê cidî bin. Divê li vir ketina nava nêzîkatiyên erzan yên weke; “Ev hêsane, ma li vir rêveberiya tu dibêjî çiye,” neyên jiyîn, ji ber em li vir modelekê pêş dixin.

Dixwazim ji netewên pêşkeftî hinek mînakan bidim. Hinek ezmûnên min çêbûn. Tevî ez xwe gelek baş dibînim jî, hinek şaşiyên min weke şaşiyên mezin nirxandin, ez pir paşketî dîtin. Ya rastî ez dizanim çiqas hesasim. Dema bi vê re qiyas dikim rewşa we hîn paşketîtire. Ji ber vê hûn ê pir cidî bigirin û em ê pêngava xwe ya rêveberiya nû ji vir destpê bikin. Pêwîste em li ber çav bigirin ku serkeftinên me yên li vir wê hemû partiyê bibe serkeftinê. Li vir serkeftina yekî, serkeftina bihezarane. Her wiha serkeftina min a li vir, vediguhere serkeftina hemû netewek û heta serkeftina mirovahiyê jî. Wiha divê em rast nêz bibin û biçûk nebînin. Di heman demê de ev pirsgirêkeke qarekterê ye jî. Pêwîstî pir bi vê heye. Divê pêşkeftinê di xwe de destpê bikî, di astek biçûk de destpêkirin û encama wê mezin bidestxistine. Di wê baweriyê de me ku, -madem hûn bi kedeke mezin hatine vir- hûn ê mijareke wisa hesas paşguh nekin. Pêwîst nake hûn wisa evîndarê xwe bin û xwe bê hêvî bikin. Ger di vê mercê de jiyanê li vir bimeşînin, wê xebatên me yên encamgir çêbin. Heta bêjî xêr û ber bê girtin.

Em ê şêwaza jiyankirinê pêş bixin. Wê ev jî rê li ber rast destgirtina me ya şêwaza şer veke. Ev hewce ye û divê em bawer bikin ku pêwîstiya me bi xebateke wisa heye. Bi salane em dixwazin qadroyên PKK’ê yên rast ava bikin. Lê hemû dewreyên me yên heya niha bûn qurbanê serensertiyê. Ji ber wê li welat pir xirap winda kirin. Ji bo bibin hêjayî bîranîna yên di welat de şehîd bûne, pêwîste em hema şaşiyên xwe sererast bikin. Em ê hewl bidin vê di şexsê vê dewrê de ser bixin. Divê em xwe bi nêzîkatiyên serensere, sivik û erzan ve nexapînin.

Jiyana li vir bi qasî şer zêde ye. Dibe hûn li jiyana qadên ku jê hatine bigerin, lê pêwîstî qet bivê nîne. Ji ber me bersiveke têr ji pêşketinên wan qadan re neda. Ji bo kêmaniyên li wan qadan tên jiyîn ji holê rakin li vir in. Ji bo em dizanin yên ji qadan hatine zêde serkeftî nebûne li vir kom bûne. Dîsa ji bo em ezbûnên xwe parve

bikin hatine vir. Li vir ji bo em xwe bidin partiyê û artêşê em ê xwe têr û tijî bikin.

Li ser vê bingehê di wê baweriyê de me ku ev xebatên li vir nirxeke bilind îfade dike û derfetên me yên serkeftinê jî pir zêde ne. Di biryara nirxandinê de ne û em ê biserkevin.

**4 Kanûn 1995**

## HÛN DÎROKA PARTÎ DI DIL Û MEJIYÊ XWE DE NEKOLIN NIKARIN BIBIN ENDAMEK PKK'YÎ YÊ RASTEQÎN

Pêşketinên girîng ku em dijîn, dibe pirsgirêkan ava bike. Lewra misoger divê di navenda me de yek kesê ku di bin pirsgirêkên giran de bêçare dimîne û heta xwe sazûman nake, nikare xwe kom bike nemîne û hedefa me jî wisa ye. Ez hem hemû hêza xwe didim, hem jî asta vê dahûrînê ya bilind dibînim, dihizirim ku pêwîste di navenda me de yek kesê ku sererast nebe nemîne. Em ê teqez milîtanê ku şer di hundurê xwe de bide û bigihîne serkeftinê ava bikin. Em neçarin. Qet nebe em ê meşa milîtanî bi derfet bikin, bigihînin hêza meş, şêwaza nêzîkbûna bîrdozî, siyasî û pratîka rast pêk bînin. Divê teqez her milîtanek me xwe bigihîne vê. Ji bilî vê em nikarin xwe efû bikin. Heta ji bilî vê ne hûn dikarin min fêm bikin, ne jî ez dikarim we fêm bikim. Pêwîste em heta dawî bi hevalbendî hevdu fêm bikin û bersivên peywiran bidin. Ji bilî vê tiştek din ne hêjayî me ye, ne watedare, ne tê pejirandin û ne jî tê efûkirin.

Êdî dawî li heqaret û xirabiyên we li xwe kirîn bînin. Sedema nepêşketina we, paşverûtiyên ku bi salane hûn dijîne. Em ji kesayetên doza xwe nameşîne, xeta partiyê nameşîne, wate nede taktîkên şer re dibêjin; “Êdî bese!” Madem me hûn anîn heta vê qonaxê, madem hûn jî jiyana xwe bi fedayî datînin holê, nexwe em jî vê bi hêza ciwantiya xwe û şêwazek pêşketina bilind ve bi encam bikin. Ma em gumanan ji xwe dikin, baweriya me bi me nîne? Ma doza me hêsan û dijminê me jî dijminek ji rêzê ye? Ma armancên me yên eslî armancên ji rêzê ne ku, em jî ji rêzê û bêçare bimînin?

Her tişt me neçarî fikra mezin, reftarên mezin û serkeftina mezin dike. Ji bo vê ti wateya gotinên weke; “Li çiyê xetimî, li çiyê kor bû, li çiyê dervî partî û dervî taktîk ma” nîne. Êdî divê yek ji me van gotinan bilêv neke û yek ji me van dubare neke. Ev rewş ne tê pejirandin, ne jî tê fêmkirin. Kî ji vê re rê vekiribe, em lenetê lê

tînin. Kî xwe wisa kiribe pirsgirêk, em heyf dibînin. Bi ti hêcetî rewşa kes a wisa nayê ravekirin û pejirandin. Êdî vê fêm bikin. Mirov xirabûnê li xwe dike, bes ne wisa. Wisa ji dervî partîbûnê, helandina pîvanên partiyê, ez ti caran efû nakim. Ji ber ku dihizirim mirov wisa xirabûnê li xwe nake. Êdî pêwîste hûn bêqauralî bi pîvanên partiyê lîstin, an jî bi niyetek baş ve ji pêlîstinê derbas bikin. Nexwe ti karê we di vê partiyê de namîne. Ez ê bi vî halî çi ji we bikim? Hûn ê çawa bijî? Ger hûn partîbûnê pêk neyînin, du gav ji we wêdetir wê tasfiyek bêwate û îmha be. Heta ku partîbûnek bilind pêk neyê, hûn bi salan jî şer bikin, wê dawî ne ti tişt be. Ma ne heyfa we ye? Ma îllahî hûn ê xirabûnê li xwe bikin? Hûn çima pîvanan nagirin? Partî nebe, li cem me ne tenê têkoşîn, netewbûn jî, mirovahî jî çênabe. Ger hûn amûrek wisa bi bandor danin aliyekê, heta bi destê xwe bihelînin, hûn ê di hundur de pişgiriya herî mezin bidin dijmin. Em vê nekin, hêceta vê jî nîne. Ma hûn di mijara nefêmkirina partî, nûnertiya partiyê nekirinê de dînin, ma hûn kontra ne? Erka we pîvanên partî heta mirina xwe parastin û sepandine.

Yek şertê têkoşîna rizgariya netewî heye, ew jî şertê **partiyê** ye. Heta ku pîvanên partiyê nebin, rizgariya netewî jî nabe. Hevoka yekemîn a bîrdoziya PKK'ê wisa ye. Dema me dest bi têkoşînê kir, wisa destpê kir. Niha jî lêdinêrim, bi navê PKK'ê, derfetên PKK'ê tên çarçurkirin û şerê dijber a valederxistina vî şertî tê meşandin û hûn jî li vê temaşe dikin. Nexasim kesên durist û bi niyet baş vê dikin. Vaye sucê we di vir de ye. Hûn dibêjin; "Me lihev kir, serî tewand, çewsand, xetimîm, tiştên hewce nekir, kêm mam." Jibîr nekin, ev nêzîkbûn tev ji bo armancên mezin darbe ye û zerare. Ez fêm nakim çima asta we ya berpirsyarî wisa ketî ye. Hûn çima di mijara doza partiyê de wisa bê eleqe dimînin? Eleqeya ku hûn li hember cixareyekê raber dikin, li hember doza mezin raber nakin. Ez di vê xalê de li hember kesayeta we bifikarim. Kesayetên we, kesayetên armancên hêsan û fêrbûnên jiyana hêsane. Lê belê, mezinbûna ademîzad bi doza wî û lihevkirinên bi doza wî re girêdayî ye. Kesê vê esas digire û ji vê tawîzan nade mezine,

nexwe kesê keyfa xwe û xerîzeyên xwe dide axaftin biçûke, ketiye û wê zû-dereng di refên têkoşînê de tasfiye bibe.

Hêvîdarim her roja ku derbas dibe hûn ê êdî bi şêweyekî rast fêm bikin û li gorî wê reftarên xwe sererast bikin, ev jî bi we tevan re pêş bikeve. Bila kes xwe ji me zêdetir bi bandor û karbidest nebîne. Hêza ti kesî têra vê jî nake. Em kesayetek xurtin, kes nikare wisa hêsan bi me bilîze. Ev helwest şaşin. Ev jî tê wateya ku ji dervî pîvanên partiyê nayê jiyîn, pîvanên partiyê nayên helandin, tam berovajî di bin her mercî de girêdana bi pîvanan û pêdiviyên vê bi serkeftî pêkanînê. Şaşî û nebesiyên xwe tevên di vê mijarê de derbas bikin. Hûn di nava şer de ne, hûn ne mirovên ji şer birevine. Ger bê ku ev şaşî bên derbaskirin hûn şer bikin, weke we heta niha dîtî dîsa zerarê herî mezin hûn ê bi xwe bibînin. Dibe ku ev, binkeftinek mezin jî be.

Ev şer ne heneke. Ger milîtanek lihevkirî, cidî, bi feraset bin û qet tawîzan nedin, em ê bikarin vî karî bimeşînin. Niha pirsgirêka me ya herî bingehîn ev e. Ji bilî vê pirsgirêkên bingehîn nînin. Pirsgirêkên din talî ne û dê girêdayî vê çareser bibin. Vaye ji ber vê ger hêjî di nava we de kesên ku dibêjin; “Em nehatine dahûrandin, nagihijinê, fêm nakin û nayîn veguhertin” hebin, ez dikarim taybet bi van re eleqedar bibim. Ji ber ne dixwazim yek hevalek bê pişgirî bihêlim, ne jî hêcetan dipejirînim. Em hevrê ne, pêwîste heta dawî jidil bin. Nabe ku ti xirabûn û nebesiyên ku em ji hevdu veşêrin û desteser bikin hebin. Hevrêtî heta dawî **duristbûnê** rave dike. Di axaftinên xwe de vekirîbûn, berdêla wê çi dibe bila be bizane heta dawî bi encama hatî bidestxistin ve girêdayî mayîne. Li cem me tiştek bi zorê nîne, her tişt li ser bingeha girêdanê ye. Bes girêdanbûn jî, heta radeya dawî misogere. PKK ev e, pênaseyek din a PKK’ê nabe.

Kes ji we re nabêje bi lezgîn gavan bavêjin. Ger hûn di çarçoveya me destnîşan kirî de gavên biçûk jî bavêjin, em bi vê razî ne. Weke din jî kes ji we re nabêje zêde şer bikin. Em dibêjin xwe di van mijaran de sererast bikin. Heta kes ji we re nabêje jiyana rehet, bi ewle, heta bi tenduristî hêjayî xwe nebînin; berovajî em dibêjin hîn zêdetir rêzdar bin, bi tenduristî bin, hevalbend bin,

xwedî jiyanek tije hezkirî bin. Misoger qada me dibistanek mezin a jiyanê ye. Em li vir şerek qed bi qad ji eniyan girantir dimeşînin. Şerê li vir pir bi tunde. Şerê li çiyan li beramber şerê li vir bi qasî pirtikekê sivik dimîne. Heta ku **şerê mezin a bîrdozî** neyê bidestxistin, mirov nikare nêzî şerê pratîkî jî bibe. Dram, êş û şaşiya we di vir de ye. Ji ber ku hûn di fikir de şerê mezin nadin, ji nav we fermandarên mezin dernakevin. Ez vê baştir fêm dikim. Ger serûbinbûnên mezin ên bîrdozî ku dijîm nebin, nikarim wisa li ser pratîkê û we serwer bim. Di rastiya de ger dikarim vê partiyê birêve bibim, ev bi hêza min a bîrdozî ve girêdayî ye. Pir baş dihizirim, gavên pir baş davêjim. Ev jî tê wateya PKK'ê û meşa PKK'ê ya serkeftî ku heta niha pêk anî. Nexwe hûn hemû jî di pratîkê de ji min baştir tevdigerin û şer dikin, lê bê bandor dimînin.

Sedema vê jî lewaziya bîrdozî ye. Gelo hûn çima ji hêla bîrdozî ve pêş nakevin? Ger hûn nayên veguhertin, em dikarin her cure hêsantî, pişgirî û alîkariyê saz bikin û we pêş bixin. Çêkera qadro di vê mijarê de xurte. Hûn dikarin di nava xwe de nîqaşek hûrûkûr pêş bixin. Qada me dibistanek pir bedewe. Çi di qonaxên dîrokê yên cuda de dibe, çi jî di roja me de dibe, yeqîn nakim di vê astê de dibistan hebin. Nirxa vir bilinde. Ji ber vê heta dawî tişta ji we re hewce bigirin. Hûn zêde paşketî ne, heta netêrin. Ger hûn nekarin asta kesayeta xwe ya heyî derbas bikin, hûn ê li hember dijmin ne serkeftinê, binkeftinê, ne bidestxistinê ji dest berdanê, ne kesayeta nû kesayeta kevnar bijîn.

## Çîroka Me Çîroka Vejîna Miletekê Ye

Çîroka jiyana xwe pêş dixim. Ji ber dixwaze li wir tiştekê vebêje. Rewşên ku li ser we tevan serwer û şêwazên jiyanê hene. Ev çîroka jiyanê şerê binpêkirina kesayetek bê bawerî, nezan, bêrêxistin, bê îdîa û asta têkçûyî ye. Lewazî, bê îdîbûn, rebentiyên cur be cur û bêhêziya we tevan di vê çîrokê de hatine derbaskirin. Elbet ev Rêbertiya miletekî ye. Lewazî û bêhêziya miletekî hatine derbaskirin. Min ev bi hostatiyek mezin pêk anî, mezinbûna vê çîrokê jî di vir de ye. Qetiyen ev ne çîroka kesekî ye, di jiyanê de pêkhatina **çîroka vejîna** miletekî ye. Di vê çîrokê de hostatî, sebir, ziravî û zehmetiyek pir mezin heye. Sedema bê ku bikevim nava girse jî evqas hêza min a rêxistinkirinê heye, ji ber hêza min a jiyanê ye. Bi qasî we nagerim, zêde kesekî jî nabînim, bes dîsa jî hêzek min pir mezin a bandor dike heye. Ev misoger çavkaniya xwe ji şêwaza jiyanê digire. Ji bo gel dijîm, her tim dihizirim û her tim jî gavên pir aqilmend davêjim. Pir bi berpirsyar, pir bi îdîa, pir rikdar, pir baldar, çil çarî dipîvim û wisa dikim. Encam, her roja ku derbas dibe gavek din pêşveçûne. Ger hûn jî xwe wisa amade bikin, misoger hûn ê vî karî bi serkeftinek bilind ve bimeşînin. Jixwe ji bilî vê rêyek din nîne.

Feraseta we ya kar, di karên hemaltî, kedkariya gundîtî ya hêsan û niha jî karê ber lingan, zibale ên dijmin ji sedî salan ve ferz dike karkirine. Ev kar jî, karê mirinê ye. Feraseta min a kar, karek gundîtiya hêsan û hemaltiyê derbas dike. Min di çîrokê de ev ji we re vegotibûn. Min di karên gundiyan de pir baş kar dikir, pir baş cotkarî dikir, lê min got bi vê rizgarî pêk naye. Min di pir xebatên cuda de jî kar kir. Di karê zanistî de jî kar kir, baş fêrî wê jî dibûm, lê bi wê jî rizgarî çênedibû. Herî dawî heta gihiştim Rêbertiya gel min kar kir. Niha Rêbertiya gel kirin min têr dike. Ji ber ku di vir de rizgariyek topyekûn heye. Bes feraseta we ya kar heta niha bi takekesî çêbûye. Dema mirov we beramberî rêbertiya gel digire, ji

ber ku serweriya we pêş neketiye, hêza we dest nade û we xwe tam ji takekesî rizgar nekiriye, hûn dihelikin. Sedema tengasiyên we ya herî bingehîn di vir de ye. Şêwaza rêbertiya gel ku ez ferz dikim û ferdperestiya ku li ser bingeha karên hêsan teşe girtiye ku hûn li ser hev ferz dikin napejirîne. Yek neçare ya din tine bike. Ferdperestî dixwaze her nirxê bilind dibe **tine bike** û bi bêwatekirinê ve vale derbixe. Lê nirxên Rêbertiyê, mirovê herî ketî radike ser piyan, bilind dike û dixwaze her tiştê ku winda bûye bidest bixe. Jixwe mezinbûna Rêbertiyê jî ji vir derdikeve holê.

Pêwîste hûn di vê mijarê de rastiya Rêbertiyê lêbikolin. Rastiya partiyê, rastiya Rêbertiyê ye. PKK'yîbûn, Rêbertîbûne. Pêwîste hûn ji nav pêwendiyên mirovên ji rêzê derbikevin xwe bigihînin ên bilind dibe, asta civakî û netewî ya berfireh, heta asta mirovahî ya ku wê jî derbas dike. Pênaseya PKK'yîbûnê ya herî rast ev e. Ev hîn di şênberiyê de çawa ye? Hûn ê ji hemû şêweyên ferdperest û tangaviyan rizgar bibin. Mînak; niha ti ferdperestî min têr nake. Berê min çixareyek dikişand, niha dev ji wê jî berdaye. Min berê ji xew, rehetî, bi kurtasî ji fêrbûnên xwe hez dikir; niha jî ev li ser min barin. Tişta min kêfxweş dike, pêşveçûna bilind ya azadiyê ye û meşa bilind ya serkeftinê ye. Ji bilî vê her tişt ji bo min bê wate ye. Îfadeyeke din ya mezinbûnê nabe. Dema we jî ev di ruh de pêk anî û bi pratîka xwe re xurt kir tê wateya hûn dibin PKK'yî. Mînak, bi fêrbûnek takekesî zêde yeqînkirin û bandora helwestên keyfî yên takekesî li ser we zêde ne, tenezilê van kirin û devji van fêrbûnên bê wate neberdan, misoger li pêş partîbûna we astenge.

Ez tecrûbeyên xwe ji we re vedibêjim; ev tecrûbe van bi min dide vegotin. Bêyî azadiyeke hevbeş çêbibe, weke kes jiyanê pir bê wate dibînim. Jixwe heta niha vê ez neçarî hewldana mezin kirim. Ji ber ku li gorî min heta mirov azad nebe her yek rezîleke û divê mirov hemûyan ji vê rewşa wan rizgar bike. Derdikevim kolanan li nav mirovan digerim, rewşa gelekan ji min re mîna moriyan tê. Dibêjim heta nîvê van mirovan bên selihandin pêwîste di perwerdê re bên derbazkirin. Ji ber li gorî min hemû di nava dijûnan de ne û weke îxanet li wan hatiye kirin. Li hember jiyana wan hêrs dibim. Ji bo malek erzan xilas bikin temenê xwe diqedinîn, helak bûne. Vê

jî ji bo malbatê xilas bikin, nanek kesî yan jî çorbeyekê xilas bikin di nava jiyanê de çil teqle tavêjin dikin. Hûn ê bêjin; "Ma cuda çawa dibe?" Encama ferdperestî gihiştiyê ev e. Li wir siyaset û mezinbûn nîne. Di bin navê rizgarkirina kes û malbatê de xwe tine dike. Ji bo wî malbat namûse, jinek an jî mêrek her tişte, zarokek hêsan pir girînge.

Milyonan zarok hene, em bêjin ka carekê li rewşa wan jî binêre qet nanêre. Em bêjin hemû zarok weke zarokê te ne, heta yên xweşiktir jî hene, vê qet na fikirê jî. Çavên xwe tarî kiriye, her tim dibêje; "Ez, ez, ez" û heta dimirê jî ev wisa ye. Di nava me de kêmzêde jiyana her kesî wisa ye. Ji ber vê hûn weke gel pir ketî û weke kes jî pir xeniqîne.

Dema di temenê we de bûm, min jî ev jiyan dikir. Ancex min di wan deman de hema xwe parçe dikir. Tevî ku bi tenê bûm, kes rêşandarê min nebû, dihizirîm çawa pêş bikevim û di cihê xwe de nedisekinîm. Ji bo min digotin **weke çelenge.** Hêjî di bîra min de ye, wan deman di cihê xwe de nedisekinîm û hêjî wisa me. Tiştek bê sekinandin nîne, ji ber ku jiyan li ber çavan ji destê me hatiye girtin. Wisa kirine te îxanet li welatê xwe kiriye, weke civak hatî tinekirin. Ger wijdana te ya mezin, îsyana te nebe û çareya van pirsgirêkan nebînî tu ne ti tiştî. Lewra nikarim li hember van mirovan rêzdar bim û her tim hêrs dibim. Min berê qet nedixwest li kêleka wan jî rûnim, ji wan reviyam, li hember wan bertek raber kir û her ku dihizirim min dijberiya van pêş xist.

Pêwîste hûn van di çîroka me ya berxwedaniyê de bibînin. Em ji îsyana zaroktiya xwe bigirin heta roja îro pêwîste hûn qonaxa herî girîng a têkoşîna me meşandî fêm bikin. Min weke we îsyan nekir. Hûn jî pir giriyan, zêde bertek raber kir, lê nikarim bêjim ev bi we re weke xelekên zincîrekê li ser bingeha azadiyê pêş ketiye. Paşê jî we xwe belav kir û her ku mezin bûn ketin nav rewşek xirabtir. Rewşa min ne wisa ye; min her ku hemû hêrs, bertek û sîyanên xwe weke xelekên zîncîrekê veguherand rêbertiya gel, rastiya PKK'ê ya îro û yekbûna wê di rêbertiya gel de pêk tînim. Mixabin hevalên me yên herî bi ezmûn jî fêm nakin ji bo rêbertiyek gel a wisa pêş bixim min çawa jiyan kiriye, ji bo vê hewldanek

bêhempa raber kiriye, pir hizirîme û hema şerek fikir a pir mezin daye. Divê hûn vê bizanin. Dema ji hêla fikir ve dikevim nav tengaviyek zêde, çend caran kêm mabû dîn bibim. Hêj li dibistana amadeyî, heta ya li navîn dema min dixwest mijarên felsefe û ol fêm bikim dîn dibûm. Dema tevlî siyaseta pratîkî bûm, her roj bi mirinê re rûbirû dimam û cardin gav tavêt. Ger min weke we çavên xwe ji xeteriyê re girtiba, min dikariya îro wisa saxlem bêm heta vir. Me PKK weke em ji pira siratê re derbas bibin, bi mirinê re rûbirû hatin ava kir. Mixabin gelek milîtanên me qet naxwaze vê jî fêm bike û xwe nagihîne hêza rêzdariyê raber bike. Di vê rewşê de hûn nikarin bibin PKK'yiyek karbidest. Ji ber ku çîrok û rastiya vê wisa ye. Dewletan ev rastî lêkolîn kirine, bes tevî yên me milîtanin qet nêzî lêkolînkirinê nabin. Ev bi yek gotinî hewldana minafiqtî, oportînîstî, çewtkirin û ji rê derxistinê ye. Di encamê de vaye rebentî û bêçaretiya we derdikeve holê ku, ev rewşek qet nehêjayî milîtanî ye.

Ecêb dimînim hûn çima hinek tiştan di wextê de hîn nabin. Hêrs dibim ku, çima milîtanek me ev fêr nekirine. Tiştên me kirîn li holê ne. Em nabêjin ti aliya vê ya neyê fêmkirin nîne û zêde zehmetiye wê jî nîne. Lê dikare partîbûn di rastiya kesayetek wisa de jî bê lêkolînkirin. Pêvajoyên têkoşîna me lêkolîn bikin.

## Partîbûn Raveya Herî Watedar a Dîroka Gelê Me û Mirovahiyê Ye

Her salek min sala şer a pir mezine. Yên sala vî şerê mezin fêm nekin, PKK'ê jî fêm nakin. Ên PKK'ê fêm nekin nikarin şer jî bikin. Xweziya we sal bi sal karê fêmkirina têkoşîna me rast ser xistiba! Hêjî di bîra min de ye, pêvajoya min biryara vê xetê di nava xwe û fikir de yekser dayî destpêkirin dawiya sala 1972' ye û her roja min a pey wê re jî bi hewldaneke bêhn bi bêhn derbas bû. Min kêlekên rê weke dersxaneyan bikar tanî. Me şûnên razanê û hinek malên biçûk girtibûn –em di xorfê de deh kes diman- hemû veguherandin dibistanê. Hemû rûniştinên min ên di waneyan de dihat wateya têkoşînê. Kî bihata derdora me, me bîrdozî direşand.

Min di sala 1973'an de bi wêrekiyek mezin ev bîrdozî bilêv dikir. Di sala 1974'an de hîn wêrektir kombûn derxist holê. Di sala 1975'an de min li Komaleya Xwendinê ya Bilind a Anqereyê de (ADYÖD) peywirek herî bilind girt. Di sala 1976'an de pêşengî ji mîtîngek mezin re kir. Di sala 1977'an de piştî şehîdbûna hevrê **Heqî Qerer** min bi xwe Pêşnûmeya Bernamê nivîsand. Di sala 1978'an de êdî bi navê PKK'ê Danasîna Rizgarî weşand û min di vê têkoşînê de gavek jêneveger avêt. Di sala 1979'an de bi berxwedaniyek pir xurt a Hîlwan-Sîwerekê re me di bin navê PKK'ê de fermî li dijî dijmin vekirî şer îlan kir. Ji bo em bikarin encamên giran ên êrîşên li dijî vê pêvajoya me dayî destpêkirin pêş dikevin pêşwazî bikin, em derbasî qada Rojhilata Navîn bûn.

Me di sala 1980'î de hewl da darbeya faşîzan a 12'ê Îlonê derbas bikin. Me di sala 1981'ê de cardin amadekariyên pratîkî yên vegera welat kir û ji bo vê li qada Rojhilata Navîn konferansek rêkûpêk lidar xist. Di sala 1982'an de hem amadekariyên teorîk ên vegera welat kirin, hem jî bi hewldanek mezin ve komên ku me amade kirîn –jixwe hejmara wan çend sedan derbas dikir- derbasî welat kirin. Me Pêngava 15 Tebaxa 1984'an her çendî bi zorê jî be yan jî ne li gorî me dixwest jî be pêk anî. Di navbera salên 1985-

86’ê de tevî wê operasyona mezin a dijmin ferz kirî, ji bo Pêngava 15’ê Tebaxê vale dernekeve carek din me li Rojhilata Navîn xebat kûr kirin û Kongreya 3. lidar xist. Sala 1987’an, vê carê şerek ku propagandeya çekdarî derbas dike ya gerîla mayînde bike da meşandin û sala valederxistina kiryarên Rewşa Awarte ye. Sala 1987’an di sala yekemîn a Rewşa Awarte de li hember planên dijmin ên me li zindan û çiyan tine bike me têkoşîn hîn zêdetir bi kûranî û domdar da bidestxistin û bû sala gav avêtinê. Sala 1989’an jî, sala gerîla hîn zêdetir serxistî kirin û mayîndekirinê ye.

Sala 1990’î, li dijî hemû planên dijmin ên tasfiyekirinê, sala serhildan jî bi servekirina gerîla û serhildan têkilhev pêşxistin û netêkçûna têkoşînê derxistina holê bû. Sala 1991’ê, sala lêgerînek nû ya dijmin, guhertina hukumetê, heta pêngava pêşxistina darbeyek nû bi têkoşînê pêşwazîkirinê bû. Di sala 1992’an de gavek hîn pêşveçûyî çêbû. Ev sal bû salek wisa me nekarî pêşketina Şerê Başûr a dijberî me asteng bikin. Me di sala 1993’an de bê ku di çeperên têkoşînê de tawîzan bidin, nemaze pêngava Başûr a dijmin vale derxist. Sala 1994’an, sala valederxistina polîtîkayên dijmin ên “Yan dê xilas bibin, an dê xilas bibine.” Di sala 1995’an de jî êdî xwediyên vê polîtîkayê ketin nava bûhranekî û hatin paşvexistin. Niha jî hûn dibînin ku ez çawa pêngaveke nû amade dikim.

Yekser dikarim van bêjim. Weke din jî ji bo her salê bersivên girîng ên bîrdozî hene. Min tezên Mêtîngeriyê di sala 1973’ê de derxist zanebûnê. Di sala 1974’an de jî bi komekê re parve kir. Di sala 1975’an de yekem car me bi nivîskî derxist, di sala 1976’an de bi şêweya danasînê belav kir, di sala 1877’an de veguherand Pêşnûmeya Bernameyê û di sala 1978’an de jî veguherand Manîfestoyê. Me di sala 1979’an de jî kir broşûr. Me di sala 1980’î de rastiya mêtîngehbûna Kurdistanê, bîrdozî û polîtîkaya PKK’ê hîn berfihertir weke belgename belav kir. Di **Rapora Polîtîk** a di sala 1981’ê de ev bi şêweyek hîn berfireh û sazûmankirî hat nivîsandin. Di sala 1982’an de nirxandina bi navê **Pirsgirêk û Peywirên Me Yên Pêşketinê** re bersiv ji pirsgirêkên derketîn holê re hat dayîn. Di sala 1983’ê de pirsgirêkên kesayetî kûrtir hatin

destgirtin û me hewla çareseriyê pêş xist. Dîsa me di sala 1982'an de **Li Kurdistanê Rola Zordarî** nivîsand. Di sala 1983'ê de pirsgirêka rizgariya netewî û rêya çareserî hîn kûrtir hat destgirtin. Di sala 1984'an de bi raporek polîtîk a pir pêşketî ve hat destpêkirin û giranî ji pirsgirêkên navendê re hat dayîn. Di sala 1985'an de di derheqê mijarên cur be cur de hejmarek zêde broşûr hatin amadekirin. Di sala 1986'an de bi axaftinên Kongreyê re asta biryarê di asta herî pêş de hat dahûrandin. Di sala 1987'an de pêvajoya hîn bi rêkûpêk pêşxistina dahûrandinan hat destpêkirin û bi dahûrînên hema her salî pêş ketîn re ji pirgirêkan re bersiv hat gerîn. Ev xebat bi hemû lezgîniya xwe ve berdewam kir û di roja me de jî hema her meh di berfirehiya çend bergan de dahûrîn pêş dikevin û karbidestiya bîrdozî gihaye radeyek herî xurt.

Di van salan de ji hêla polîtîk ve jî gavên mezin hatin avêtin. Ew gava koma teng a di sala 1973'an de jî darbeya herî mezin li polîtîkaya mêtîngeriyê da. Gavek biçûk a bîrdozî, tê wateya gav avêtina bingeha bandorên polîtîkayê. Ev dibe gava herî mezin a qûtbûna ji bîrdoziya mêtînger û şovenîzma wê ya civakî û destpêkirina polîtîkayek bingehîn. Di sala 1974'an de pêşketina komê, helwestek pir wêrek a polîtîke. Êdî mirovên me li şûna polîtîkaya bûna kole, her yek bûna dîlê ji dijmin rizgar dibin û girêdayî hêza cewherî hêza jiyînê raber dikin. Di sala 1975'an de ev bi taktîkek hîn aqilmend hat sepandin, bi çepgeran re yekîtiyek cewaztir hat pêşxistin, dijmin hat xapandin û me rê li ber pêngavek girîng vekir. Ji bo em di nava girseyê de berfireh bibin me gavek din avêt. Dîsa di sala 1976'an de me xwe gihand pêşketina girseyek pir wêrek û dijmin zêde şaşwaz dike. Di van deman de karbidestiya polîtîk û teşegirtina polîtîkayek nû ya gel'ê Kurdistanê tê dîtin. Di sala 1977'an de jî pir baş tê dîtin ku em pir baş li Kurdistanê berfireh dibin û li her alî pêşketina çalekiyên serbixwe destpê kiriye. Di sala 1978'an de jî bi servê ve polîtîkaya çekdarî pêş dikeve, ango me polîtîkayek li ser bingeha tundiyê pêş xist. Êdî em tirs û xofa xewnên hevkarên xwecihî bûn. Êdî di sala 1979'an de nêveng serûbin dibû. Li hember bandorên hevkarî û kevneşopiyên dijmin, em bûn hêzek polîtîk a seyr. Jixwe danasîna damezirandina

PKK'ê çalekiyek berz a polîtîk bû. Di sala 1980'î de jî li hember êrîşa ku mezin bûyî, hinekê jî çekên giran hatin zêdekirin û rê ji rewşa şerek berfireh re tê vekirin. Ev jî, rê ji darbeya şoreşa dijber a faşîzma 12'ê Îlonê re vedike.

Di salên 1980-81'ê de paşve vekişîn û vebûna ber bi qadên nav-netewî ve dibe gavek polîtîk a mezin. Ev gav ji bo neçewsînbûna îsyanê û domdar be tevdîrek cidî ya polîtîk bû ku hate girtin. Dîsa di dîroka Kurdistanê de yekem care îsyanek têk naçe, berovajî ji bo domdar be gavek polîtîk a bingehîne. Di sala 1982'ê de ji nû ve vegera welat, li ser bingeha welatparêzî gavek bingehîn a dîrokî û helwestek berz a polîtîke. Ji ber ku her îsyan bê ku li pey xwe ti şopekê bihêle tine bûye û yê çûyî jî carek din venegeriyaye. Vê carê ne domdariya îsyanê tê astengkirin, ne jî yên paşve çûne dikevin nava xirabûnek ku êdî venegerin. Di sala 1983'ê de li nava welat li ser bingeha propagandeya çekdarî me qonaxek polîtîkbûnê ya mezin da destpêkirin. Hemû girseyan çavên xwe ji qonaxek nû ya polîtîk û qonaxek dîrokî ya nû re vedikin. Sala 1984'an jî dibê sala vê ya pêngavê.

Di sala 1985'an de tevî hemû seferên dijmin ên çewsîner dev ji şerê rizgariya netewî nehat berdan û bi israr ferzkirina polîtîkaya rizgariya netewî pêk hat. Di sala 1986'an de jî pêvajoyek pir zehmet bi heman biryardariyê hat berdewamkirin, di qadên Kurdistanê yên dîplomasî û siyasî de derfetên bêhngirtinê fireh bûn, êdî bû sala selmandina ku di hundur û derve de dê qonaxek nû destpê bike. Elbet li dijî êrîşên dijmin jî di van salan de ferz dikir ku provaqe û bê bandor bike, bi taktîkên polîtîk ve bi heman şêweyî bersiv hatin dayîn. Salên 1989-90'î jî salên polîtîkaya welatparêz a şoreşgerî bi **girsekirine**. Di salên 1991-92'ê de jî têkoşîn bi girse bû û serhildan hîn zêdetir hatin bilindkirin. Bi polîtîkayek şoreşgerî ya mezin ve em ketin nava pêvajoyek polîtîk a mezin. Gelê Kurd di dîroka xwe de yekem car dikeve nava pêvajoyek polîtîk a pir mezin û li ser bingeha girse helwestek yekîtî tê raberkirin. Êdî di sala 1992-93'an de şer li Başûr û Bakur berfireh dibe. Di vê demê de polîtîkaya PKK'ê di gelemperiya Kurdistanê de bi baldariyek mezin tê pêşwazîkirin û girseyan

bandor dike. Feraseta bê PKK polîtîkayê bike ya ku li ser PKK'ê dihat ferzkirin û lêgerînên çareseriya netewî yên bê PKK'ê, darbeya dawî xwar. Her cure polîtîkayên hevkarî bê bandor man. Hêviya van hêzan a herî dawî jî şerê 1992'an bû. Ancex di vê mijarê de bi tevdîrên hatîn girtin re ev hêviyên wan jî hatin valederxistin û polîtîkaya welatparêziya PKK'ê misoger xwe gihand asta pêşengî.

Di salên 1994-95'ê de polîtîkaya îmhayê ku dijmin di bin navê "Yan em ê biqedînin, an em ê biqedînin" di pratîkê de hat valederxistin, pêla şovenîzma mezin a ku ava kirî hat şikandin, hewldanên binpêkirina hêviyên gel hatin astengkirin. Êdî girseya Tirkiye û Kurdistanê bi şêweyek jêveneger ket bin bandora polîtîkaya welatparêziya şoreşgerî û bû hêzek wê ya bingehîn. Bi sala 1995'an re tevî operasyonên herî mezin ên dîrokê, hat fêmkirin ku êdî polîtîkaya welatparêz a şoreşgerî ji gelan nayê qûtkirin, ji bo dijmin danasîne ku em tine kirine bike me di hilbijartinên sexte yên sazûman kirî de rewşek berovajî wan selmandî bidest xist. Hûn jî dibînin, di her salê de pêşketinek wisa bêhempa ya polîtîk hatiye pêşxistin. Di heman demê de ev sal dibin salên şerê taktîkî jî.

Di dîroka Komara Tirk de **provakasyonên** ku li dijî her serî hildanê û her tevgerên şoreşgerî ferz kirîn hene. Ev sal di heman demê de salên her tim ferzkirina provakasyona ne. Jixwe di salên 1972-73'ê de Çepên Tirk bi xwe jî bi tevgerên şovenîstên civakî re di nava ferzkirinek provakasyonê de bû. Sala 1974'an li hember bandora wan sala berxwedanî û her ku çû ev anîna asta hêza berxwedaniyek rêxistinî û valederxistina komploya "Bîrdoziyên cuda û Rêxistinên cuda çênabin" bû. Di sala 1975'an de li dijî taktîka dewletê ya nexasim li Anqere'yê bi armanca me bixe bin venêrîna xwe û bê bandor bike yekser xwe xistî nava me, di salên 1975-76-77 û 78'an de me ev taktîka dijmin veguherand çekek dijberî wî. Gavên dîrokî yên herî pêşketî li ser vî bingehî avêtin û serkeftina saxlem ji Anqere'yê derketin girîng bû û me jî ev ser xist. Me di sala 1978 û 79'an de komploya Hîlwan-Sîwerekê ku ferz kirîn cardin bi têkoşîna çekdarî ve bersiv da û vale derxist. Weke ku me komployên bi çepên Tirk ve hatîn ferzkirin vale

derxistin, di heman demê de me rêxistinên komploger yên di bin navên çepgiriya Kurd de yên weke KUK, Beş Parcaci û Têkoşer'ên qaşo di bin navê çepgiriya Kurd de jî bê bandor hiştin.

Di sala 1980'ê de komploya 12'ê Îlonê di meriyetê de bû, me di wextê de li dijî wê tevdîr girtin û em ber bi dervî welat ve vebûn. Dîsa me gava pêşxistina têkoşîna çekdarî li ser vê bingeha rast avêt. Ji bo heman komplo li dervî welat jî pêş nekevin, me heta radeya dawî şerek bi înad meşand. Em ji komploya **Semîr** bigirin, hema weke her salê dihat ferzkirin, me salek komployê ya berfireh ku ferz dikirin vale derxist. Li dijî ferasetên dijmin ên yekser an jî ne yekser bi şêweya "Hûn nikarin vegerin welat, nikarin PKK'ê ji nû ve saz bikin" têkoşînek pir bi înat hat meşandin. Dema provakatoran gotin; "Yek ji van jî nikarin gav bavêjin Kurdistanê", me pêngava vegera welat bi şêweyek mezin da destpêkirin û pêk anî.

Çawa em gihiştin welat me pêşî li komployên Partiya Komînîst a Iraqê û KDP'ê girtin. Di salên 1984-85'ê de li hember sipartekên komploya di bin navê **Yekîtiya Çep** a bi pişgiriya nav-netewî dihat ferzkirin û li Ewrûpa tecrîdkirina PKK'ê em ketin nava şerek mezin. Hewldanên vê komploya ku hem li welat, hem dervî welat, hem jî li girtîgehan bi berxwedaniyên mezin ve rûbirû ma, dîsa bi hewldanên mezin ve hat valederxistin. Di salên 1985-86'ê de li hember kiryarên ku ji destpêkê ve bi kesayetên ku xistibûn nava me re dixwestin komployê bi encam bikin me bi têkoşîna ku me dayî meşandin ve dewlet di dîroka wê de bi binkeftina herî mezin pê da jiyîn. Êdî me di sala 1986'ê de teşîr û tecrîdkirina xwediyên komployê zelal kir. Em di sala 1987'ê de di rêjeyek mezin de ji van xilas bûn. Em di salên 1987-88'ê de bi valederxistina komployên nû, nemaze bi komployên giranî li ser zindanê hatîn pêşxistin ve mijûl bûn. Dîsa me komployên li çiyê jî hatîn pêşxistin vale derxistin. Nexasim hema hema me di sala 1988'ê de hemû komployên hatîn pêşxistin vale derxistin. Di vê sala ku dewlet herî zêde bi hêvî bû de, me nexasim bi hêza netewperestiya paşverû ya Ewrûpa re, heta bi çepgiriya Kurd û Tirk re ev komployên ku pêş

xistîn hemû têk birin. Di vê wateyê de di sala 1989'an de me darbeyek pir mezin li komplogeriyê da û pêşiya partiya xwe vekir.

Di sala 1990'î de serkêşê komploya ku li zindanan ser ketî, me sala 1992'an di nava partiyê de girt, ew teşîr û tecrîd kir. Elbet ev kar hemû hêzek mezin û qabîliyetek dahûrînan dixwest. Me di sala 1991'ê de jî nêzîkbûnên dijmin, di asta herî jor de yên **Ozal** ên weke ger hewce bike dê rêgeza zagona bingehîn jî berçav negire û pişgiriya provakasyonan bike bê bandor kir. Dîsa komploya di sala 1992'an de di Şerê Başûr de  û palpiştên wan ên di nava me de ji hêla me ve hatin dîtin. Em di sala 1993'ê de li dijî vê têkoşiyan û me derbas kir. Di sala 1994'an de jî em bi temamî derbaskirina bandorên komploya di nava me de pêş dikevin û komplogerên biçûk li cih û zemînên tên dîtin bikarên paqijkirin û tinekirinê ve mijûl bûn. Di vê wateyê de mêtîngeriya ku di hemû dîroka xwe de tenê bi komplo û darbeyan ve kar kiriye ber bi têkçûnek mezin ve çûye û ev di dîroka PKK'ê de bi şêweyek pir balkêş hatiye serxistin.

Mirov dikare van pêşketinan tevan di asta kongreyan de jî bigire dest. Me yekem car di sala 1973'ê de danasîna koma xwe kir û derketin holê. Me di sala 1978'ê de bi Kongreya 1. re îlana partiyê kir û biryara pêşwazîkirina şerê polîtîk hat dayîn. Di sala 1982'ê bi Kongreya 2. re misoger biryara vegera welat hat dayîn û gavavêtinên vê pêk hatin. Di sala 1986'ê de bi Kongreya 3. re biryara **berdewamiya** Pêngava 15'ê Tebaxê û **israra** di gerîla de hat dayîn. Di sala 1990'î de bi Kongreya 4. re berfirehkirina gerîla, yekbûna vê ya bi serhildanan re, valederxistina astengiyên hundur û rewşa xwe gihandina rewşa desthilatiya du alî pêk hat. Di sala 1995'ê de bi Kongreya 5. re di nava partiyê de kamilbûn pêş ket, yekîtiya netewî saz bû, desthilatî û artêşbûn li ser zemînê saxlem hat rûniştandin û yên li bendê bûn ev şer têk biçe ketin nava bûhranê.

Mirov dikare ji bo van salan behsa pêşketinên weşanan jî bike. Me rojnameya **Serxwebûn** ji sala 1978'î ve bê navber weke binyatek bingehîn heta roja me pêşxist. Bi sedan bergên dahûrînan bûn pirtûk û em gihan hêza weşanek bêhempa. Di pêvajoya weşana

ku deh salî derbas dike de me Kurdistan, şerê wê û rastiya şoreşa wê bi her zimanî hemû cîhanê da nasîn. Herî dawî me teknîkek weşanê ya nûjen jî ku di ti tevgerên rizgariyên netewî de nehatiye dîtin jî bi serve kir, radyo û televîzyon bi şêweya ku ji her aliyê cîhanê ve bê temaşekirin weke amûra propagandeyê ya bihêz pêş xist û bikar anî.

Weke tê dîtin, dîroka partî di van mijaran tevan de dîroka şerek mezine. Di hemû salan de pêşketin hene û ev hemû weke goşt û neynokê bi hev ve girêdayî ne. Ev xebat hemû dikare weke şerek bîrdozî ya mezin û diyarbûna neyekser a vî şerî bê nirxandin. Ger hûn dîroka partiyê vedikolin, pêwîste hûn van aliyan di bin sernivîsên esasî de bi xetên sor ên sitûr di mejiyê xwe de bikolin, da ku hûn bigihin zanebûnek dîrokî ya saxlem. Jixwe bi sedan çîrok û romanên ku ji bo her salê bê vegotin û nivîsandin hene. Di dîroka partiyê de gelek bûyerên ku destan li ser bên nivîsandi hene. Dibe ku me ji sedî yekê van jî ne nivîsandiye û venegotiye. Hêj dîroka partiyê zêde nehatiye zanîn û nivîsandin. Li ser zêde ne xebatên wêjeyî ne jî zanistî nehatine meşandin. Ev xebat hêjî li benda xwediyê xwe ne. Ger dema pêş merc dest bidin, yeqîn dikim dê ji bo her salê nirxandin û xebatên zanistî, wêjeyî û hunerên din bi pênc-deh bergan ve derbikevin holê.

Hûn ê evqasî berfireh nêzî dîroka partiyê bibin û rêzdar bin, da ku para xwe ji vê mezinbûnê bigirin û bi vê mezinbûnê ve bimeşin. Di vê mezinbûnê de çiqas şehîd hene, çiqas li hember îşkenceyê berxwedanî heye, hêj hûn nikarin navê van bêjin. PKK di meriyetê de **xwîna şehîda** ye. Berxwedana li dijî îşkencê ye. Li dijî birçîbûn û tîbûnê şerê berxwedanê ye. Sebir, fedekarî û wêrekiya mezine. Di xêra meylên mirovahiyê de di astek ku evdê alemê nebûye şahid de, navê şerê ku rê nade ti berjewendiyên takekesî ye. Dîroka PKK'ê, dîrokek wisa ye bi keda gelek lehengên bênav hatiye heta roja me. Misoger divê ev dîrok weke kombûna van nirxên berz bên dîtin. Ger hûn nekarin dîroka partiyê weke yekbûna van nirxan hemûyan di dil û mejiyê xwe de bicîh bikin, hûn nikarin bibin PKK'yîyek heqîqî û xwezayî jî nabin milîtanek mezin. Dibe ku min pênaseyek giştî kiribe, lê hûn ê pênaseya vê dîrokê qet bi qet

zêdetir bikin. Misoger bersivên têrkar bidin pirsên PKK çiye, nûnertiya wê çawa tê kirin û mirov dikare çawa xwe bigihîne PKK'ê bidin. Nexwe hûn ê heqareta herî mezin li vê dîroka mezin bikin. Ger hûn vê dîroka mezin jidil nepejirînin, hûn ê mafê evqas nirxên mezin nedin û ne hêjayî wan bin. Dê ev jî bibe nêzîkbûnek pir teng, bêrêzî û bê nirx.

Tevî ku partiya me xwedî van nirxên bilinde ew rastî nedîtin, heta vale derxistin, ji bo helwestên xwe yên takekesî û keyfî bikaranîn, li ser wan rêveberiyên keyfî avakirinan jî xetimandin ji îxanetê xirabtire. Kes, bi ti hêcetî nikare di nava partiyê de wisa xwe bide jiyîn. Kesên ku wisa nêzî nirxên berz dibin dê çelewarîbin. Jixwe her roj mînakên vê derdikevin holê. Ev dîrok ne dîrokek wisa ye ji rêzê bê bikaranîn, ji nedîtî ve bê dîtin an jî ger bê dîtin jî pêwîstiyên wê neyên bicîhanîne. Ji ber ku ev dîrok vîne, hem jî vînek zindî dijî. Kî vîna xwe tevlî vê neke û xwe bi vê vînê ve xurt neke nikare di nava partiyê de şer bike.

Sedema di bingeha zehmetiyên hûn dijîn de rastiya hejî hûn nikarin dîroka partiyê bi vê dewlemendiyê ve fêm bikin, bipejirînin, xwe tevlî partî nakin û xwe nakin hêza vîna heye. Ger we heta niha karibûya vê li ser bingehek rast saz bikin, dê PKK bibûya rêxistina herî mezin a şoreşgerî ya cîhanê. Jixwe emperyalîzm jî vale vale ji me natirse, vale nabêje; "PKK di cîhanê de rêxistina terorîst a yekemîne." Ji ber pir baş dizane ku PKK partiyek berxwedan, hedirîn û di heman demê de fedekariyek pir mezin û jidile. Zemîna ku PKK xwe dispêriyê di rastiya miletek windabûyî de, di dozek netewî ya ku bi qasî misqalekê jî hêvî ne mayî de û di nêvengek mirovahî ya tinebûyî de wisa pêk tê. Rastiya partiyê wisa ye. Sedema ku PKK, tirs û xofa herî mezin a emperyalîzm û hevkare ne, ji ber vê rastiyê ye.

Sedema rebentiya we ya herî bingehîn jî ji ber hûn vê rastiya mezin bi mafdarî najîn, nikarin şerê vê ya mezin jî her kêlî û li her deverê bikin çavkaniya xwe digire. Ger we xwe bi vê rastiya mezin ve xwedî kiriba, bi qasî hûn ê bibûna tirs û xofên xewnên hemû dijminan, ewqas jî bibûna şervanên hêviyên gel. Jixwe sedema ku ez evqasî bi hêrs dibim û bi ser we de têm hûn nikarin mafê vê

dîroka mezin bidin, vê dîrokê ji nedîtîve tên û heta bi bisteh ji rê derdixin.

PKK partiyek mezine û pir berfireh û vegirtiye. Tevî ku evqasî hewl didim, hêjî nizanim gelo hêjayî PKK'ê me yan na. Jibîr nekin, em bi dilê xwe yê tazî yan jî ferdperestiya xwe ve şer nakin. Di PKK'ê de şerkertiyek wisa nîne. Hêza ku îro hêjî têkoşînê dimeşîne û me dide şerkirin nirxên vê partiyê yên bingehîn, şehîdên wê ne. Berxwedana gelek lehengên bênav, gundî, kedkar û rewşenbîrên ku di zindanan de di îşkenceyê de li ber xwe dane. Ev nirx pîrozin. Weke kes hûn nûnertiya ji hezarî yek ji van jî nakin. Hûn şeref û serfiraziya partiyê parve dikin, lê di mijara bi mafdarî bûna xwedî rastiyên partiyê de, nahizirin ku hêjayî wê bin. Vaye şaşiya we di vir de derdikeve pêşberî me. Hûn dibêjin; "Me ev hemû danîn aliyekê, derbas kirin." Ma hûn dînin? Kontrayê dijmin ê herî ji xwe razî jî nikare wisa zerar bide. Xirabiya herî mezin em li xwe bikin, ev dîroka partî ya berz ji nedîtî ve hatin û li şûna wê dê bibe ferzkirina ferdperestiya xwe. Ji ber ku ev dîrokek mezine û ji rêzê nehatiye avakirin. Dikarim peyitînim ku her demjimêrek dîroka PKK'ê di nirxa destanî de ye û dikarim bêjim her şehîdek PKK'ê berxwedanvanek lehengiya mezine. Li şûna ku pêwîste hûn xwediyê vê bin û ji bo vê dîn û harbin, van hemûyan tine dihesibînin û dibêjin; "Me jibîr kir, em çewt nêzî bûn û pêwîstiyên wan bicîh ne anîn." Vaye, ev xirabûna herî mezine. Ger dijberî nirxek malbata xwe ya herî ji rêzê bikevin, hûn ê ji mezinê xwe lêdanê bixin. Li vir bi hezaran nirxên berz hene, bes hûn qet hesap nakin ku dijberî van ketin tê çi wateyê. Ji ber vê ne cidîbûn û bê ferasetiya we ya mezin me dibizdîne û dibe ku we li hember evqas nirxên berz misoger bîne rewşek ku neyîn efûkirin. Ger hûn helwestên xwe yên şaş û nebes bidomînin, nekarin ti carî partîbûnê saz bikin, di rewşên xwe ferz dike û dixetimînê de israr bikin hûn rast nabin û dibe ku bi êşek pir mezin dawiya xwe bînin.

Di vê wateyê de doza partiyê pir mezine. Mezinbûna min jî hem watedayîna van nirxane, hem jî di xêra wan de dikarim hêza jiyînê raber bikim. Ger kesek dixwaze di nava PKK'ê de mezin bibe, mezinbûna wî bi girêdana van nirxan, têgihiştina van nirxan û

di rastiya nûnertiya van kirinê de veşartiye. Pîvanê mezinbûnê jî wisa ye. Bila ti kes ji bilî vê ti mezinbûnê nexwaze. Bi qasî hûn ê heta dawî nefsbiçûk bin, ewqas jî dema hewce kir ji bo bi zehmetiyên mezin û astengiyan re şer bikin, hûn ê van mezinbûnan esas bigirin. Dema hewce kir em ê bibin otorîteya herî mezin, dema hewce jî kir em ê bibin mirovên herî nefsbiçûk, daku girêdana me ya bi van nirxan ve zelal bibe û bê fêmkirin.

Hêvîdarim êdî hûn partîbûnê di vê kûraniyê û berfirehiyê de hem fêm dikin, hem têdigihijin, hem jî weke carek din jê neçe di dil û hişê xwe de dikolin. Partî her tim nirxê herî mezine. Niha ji bo gel û netewa me û heta mirovahiyê jî rastiya herî mezin ku mirov pê serfiraze, ev rastiya ku di nava PKK'ê de lêhûr û berhev dibe ye. Partiyek wisa xirabkirin, pêwîstiyên wê bicîh neanîn, bila weke ketina rewşek pir xirab û lenetî li aliyekê bimîne, ew parvekirin û jiyîn bila bi we re weke dilketina herî mezin di kesayeta we de bê ravekirin. Ji ber ku ev partî hêjayî vê ye û partiyek ku kêlî bi kêlî fermana vê didê ye.

Ma kî dikare wesiyetên dawî yên şehîdan jibîr bike û bêhna wan a dawî paşçav bike? Kî dikare wateya wan berxwedaniyên mezin jibîr bike? Kî dikare bi zehmetiyên ewqas mezin re, bi qasî qiyametê birçîbûn, sir, seqem û germê re şerê ku hatî dayîn jibîr bike? Ev hemû berxwedanî ji bo armancên me yên berz, armancên me yên mirovî, armancên me yên netewî û çînayetî hatine raberkirin. Di vê mijarê de jî erka ku ji endamên partiyî re jî dimîne, weke nûnerên herî dawî yan jî milîtanên ku alê di refên herî pêş de radikin ev al li erdê nedayîn û hîn zêdetir bilindkirinê bersivdane.

Ya ku di refên herî pêşde şer bike partîyiye yan jî dikare partîbûn wisa bê ravekirin. Ango nêzîkbûna weke; "Qedir û qîmeta partiyê mezine, derfetên wê zêde ne, ez ê xwe bi wê mezin bikim û li ser partiyê ferz bikim" dê ji bo partiyê bibe heqareta herî mezin. Ma ev partî bûna kesek wisa dipejirîne? Ma dê evqas şehîd bipejirînin? Hewldanên me yên rêbertiyê hene. Ma em nêzîkbûnên wisa qet dipejirînin? Heta ku dixwazin bêjin; "Em axaftinê fêm nakin, em dîlawerin." Kesên ku xwe bi derfetên partî yên ku dijmin

ber bi we ve tîne dide jiyîn, ma dê bi vê rewşa xwe ve werin pejirandin. Ma kes diwêre ferzkirinek herî biçûk jî ya ku wateya wê nîne diyar bike? Ger ez jî bim ev rastî wisa ye.

Partîbûn, raveya herî watedar a dîroka gelê me ya herî berz, rizgariya netewî û mirovahiyê ye. Ev bi dîrokek berxwedaniya pir mezin ve heta roja me bi serkeftî hat. Me jiyana xwe bi temamî di nava vê de heland û bêmirinî jî wisa di nava vê partiyê de pêş xist. Kesê ku tevlî vê dibe divê pêşî bizane hêjayî van nirxan be. Pêwîste nehêle leke li ser van nirxan bikeve, berovajî ji bo berzbûnê tevkariyê bike. Partîbûna rasteqîn, PKK'yîbûn wisa ye. PKK'yîbûnek wisa her tim berz bûye û ser xistiye. PKK'yîbûna ku dê misoger ser bikeve jî wisa be.

**19 Çile 1996**

## RÊXISTINBÛN HIŞÊ HERÎ PÊŞKETIYE

Di meşa kes, gelan û netewan de şêwaza nêzîkbûna destpêkê, di dozên wan ên herî jiyanî û karên wan de, hemû encamê diyar dike. Ger naverok û cidiyeta şêwaza nêzîkbûn û hewldan di cîh de li gorî mercên dem û war bi zanistî hatibe rûniştandin, her çendî ev kar di destpêkê de bi kesekê yan jî komek biçûk jî destpê bike, dê encam serkeftî be. Bes ger destpêka vî karî ne di cîh de be û ji hêla zanistî ve ne rast be, şêwaz û hewldanên ku hewce dikin tije nebesî bin, kar ji destpêkê ve hatiye windakirin. Di vê rewşê de hûn dixwazin bi sed hezar kesî ve destpê bikin, an jî dixwazin netewekê bi temamî rakin raperînê û bila hemû cîhan a we be, dîsa jî binketin misogere.

Divê raveyek meşa PKK'ê jî ya li gorî vê pênaseyê hebe. Yên PKK di kesayeta xwe de dane destpêkirin ger bikarin li gorî vê pênaseyê bidin destpêkirin, ev kesek an jî komek jî be, dê serfiraziya PKK'ê pêş bixe. Lê ger ne li gorî pêwîstiyên wê be, her çendî artêşek PKK'ê jî be û bigihe ber serkeftinê jî, dê encamê de her tiştî winda bike. Mînak her çendî sekreterek wê ya giştî yan jî çend qadroyên rêber ên lewaz gelek peywirên girîng de hebin jî, dê ev partî serberjêr biçe û yên şûnde jî mayîn biperçiqin. Heman weke di dîroka partiyên welatên sosyalîsta pêkhatî de hatî dîtin, dê ev partî jî bi tena serê xwe bibe bela.

Her çendî doza gelan, çînan, netewan û heta kesan jî be, ji bo ev doz wateyekê rave bikin, pêwîstiya wan bi partiyan heye. Doz bê partî nabin. Weke din, ji vê hêlê ve pêwîste pêdiviya partiyan bê zanîn. Di bin navê doza min heye de bi tena serê xwe destpêkirina vî karî têrê nake. Ger di serdema me de her doz, doza çînekî, netewekî an jî rêxistinekî be, misoger pêdivî bi amûra partiyek saxlem heye. Di roja me de ti siûda doza ku xwe naspêre amûra partiyek saxlem nîne. Nexwe, hûn çiqasî pîrozwer, bawermendê doza xwe bin, hûn ê ewqasî pîrozwer wate bidin amûra wê jî. Divê

hûn pêwîstiya bûna partî û bê partiyê bêhnek jî nayê girtin û dayîn jî di hemû şaneyên xwe de bihesin. Ger hûn li hember doza xwe rêzdar bin û azameta we ya serkeftinê hebê, hûn ê bêjin; "*Ev kar bê partî nabe, partî gelekî hewce ye.*" Rastiyek herî fêmbar a serdema me jî ev e. Dema em pênaseya partiyê pêş dixin, divê misoger em pêdiviya amûrek bi vî rengî berçav bigirin.

Dema partî tê gotin, tişta ku divê bê fêmkirin, berjewendiyên jiyanî yên bingehîn ên kes, çînayetî yan jî netewekî di bin **polîtîkayê** de gihandina asta **xetê** ye. Polîtîka yan jî xeta partî, berjewendiyên gel ên jiyanî ne. Ev jî di qonaxa rizgariya netewî de rizgarbûna ji mêtîngerî û emperyalîzmê û qutbûna ji pêwendiyên hundurîn ên paşverû ku bi wan ve girêdayî ne rave dike. Ger xet hinek din zelal bibe, dê ev jî demokrasiya miletekî yan jî çînekî rave bike. Ger ev jî çînek bindest û mêtîngehkirî be, dixwaze xwe ji bindestî û mêtîngeriyê rizgar bike, pêwîste bername, pêşbînî û pêşnûmeya pergala **sosyalîst** esas bigire. Dema partî tê gotin, tişta divê yekser bê bîra mirov xete. Hûn ê weke navê xwe baş bizanin ku li dijî çi ne û pêwîste çi pêk bînin. Ev jî têrê nake, weke din pêwîste li ser bingeha xetê xwe **birêxistinkirin** çêbe. Xet çiqas rast dibe bila be, ger rêxistina wê nebe, qetiyen ne gengaze ku rewşek weke kargerî û çalekgeriyê derbikeve holê. Mafdariya xetê ancex bi rêxistinbûnê ve jîndar dibe û dikare xwe bigihîne serkeftinê.

Lewra beşek pênaseya partî ya jê qut nabe jî **rêxistinbûne**. Heta ku rêxistinbûn nebe, ti doz, ti partî û ti xet ser nakeve. Nexasim ger weke civaka Kurd, civakek ku hatiye parçekirin be, doza wê ji çav ketibe, partiya wê tine be, partiyên heyî jî her yek bibin sîxurên hêsan û ji bilî bûna amûrek xirabkarî zêdetir kêrî tiştek din nayên, ger li wir xetek saxlem nebe, nexasim rêxistinek ji pola û xelekên rêxistinî yên pir bi dîsîplîn ku li ser girêdanên girse û civakên hatine parçekirin bên ferzkirin nebe, ne gengaze ev partî bê parastin. Elbet dema ku ev partî jî neyê parastin, wê doz jî di asta duruşmeyan de nekarin xwe ji çelexwariyê rizgar bikin. Di vê wateyê de rêxistinbûn di rastiya Kurdistanê de her tişte.

Di rastiya Kurdistan û PKK'ê de kesê herî birêxistinkirî, kesê herî mezin şer dikê ye. Kesê herî baş xwe birêxistin kirî jî, kesê herî

bihêze. Di vê wateyê de rastiya rêxistina PKK'ê, rastiya Rêbertî ye. Rêbertiya PKK'ê xwe birêxistin kiriye, hêza xwe wisa derxistiye holê û rêxistina ku ti kesî nekariye bi navê çînayetî bike wî pêk aniye. Rêbertiya PKK'ê hêza xwe ji vir digire. Rêxistinbûn, têkilhev pêşketina xelekên girse û qadro yên bi hev re ne. Rêbertiya PKK'ê ev di kesayeta xwe de kom kiriye. Hemû êrîşên dijmin, hemû parşverûtiyên hundur û derve li vê dikevin û paşve dikevin û tên dûrxistin. PKK weke gelek ji we dihizire bi çekan, bi teşwîqên heyberî û van çalekiyan ve li ser piyan nayê girtin. Li vir şêwaza rêxistinbûnê hêza li ber xwe dayîna herî mezin dide.

Rêxistinbûn rêbertiye, rêbertî rêxistinbûne. Herdu evqasî têkilhev bûne. Elbet pêwendiya rêxistinbûnê bi hewldanê re jî heye. Ji bo rêxistinbûnê jî **hişmendî** hewce ye. Hûn ê ji bo rêxistinbûnê hişê xwe pêş bixin û her tim bi propaganda kirinê ve hişê gel pêş bixin. Hûn ê bendên gel ava bikin, bi komên biçûk ve her tim li gorî berjewendiyên gel hiş pêş bixin. Ger hûn bikarin bi vê ajîtasyonê xîtabî civatên berfireh bikin, dê bendên gel jî çêbin. Ger hûn bi propaganda xîtabî komên teng bikin, dê ev jî bendên qadro çêke û bi vî rengî jî hûn ê çalekgeriya xwe diyar bikin. Ger hûn nebin ragirmendê hişmendiyek mezin, hûn ê nekarin rêxistinbûnê bikin. Ji bo pêkanîna rêxistinbûnê, hûn ê her tim weke ajîtatorekî gelek babetan baxivin, weke katibekî xîtabî girseyên berfireh bikin an jî weke propagandevanekî komek biçûk re fikir bidin pêşxistin. Ger hûn bikarin ji van duyan bi hostane ser bixin, misoger hûn ê bibin xwediyê çalekiya herî mezin. Bi qanûnî yan jî derqanûnî, bi çek an jî girseyî di hemû xebatande rêxistinbûna hiş û ajîtasyon hewldana diyarker a esasî ye. Ajîtasyon li aliyekî sorkirina girse, rakirina serhildanê yan jî rêxistinkirina qadro ye û her tim ji wan re propagande kirine. Çalekiya herî mezin jî ev e.

Mamoste jî dibêjin; "Rêxistinbûn bi xwe yeksan çalekiye." Kesê ku rêxistinbûnê wisa pêş dixe, dê çalekiya herî mezin jî bafirîne. Jixwe piştî ku benda rêxistinek saxlem ava bû, dê ew rêxistin jixweber derbasî çalekiyê bibe û ber bi gelek hedefên weke leşkerî, siyasî, aborî û civakî ve bimeşe. Ji ber ku hêza birêxistinkirî vale nasekine. Hêza birêxistinkirî makanîzmaya sazbûyî ye, weke

bombeyê ye, biçe ser kîderê dê biteqe û encam bigire. Ger li cihekî çalekiyek serkeftî nebe, li wir rêxistinek têrkar nîne. Ger li cihekî şaşî heye, di rêxistina wir de şaşiyek cidî heye. Ger li cihekî çalekî xeternak be û rê ji windahiyan re vedike, li wir asta rêxistinbûnê qet berçav nehatiye girtin. Ger li cihekî çalekiyek saxlem hebe û li wir serkeftinên mezin tên bidestxistin, nexwe li wir rêveberiyek pir rêxistinî û rêxistinek saxlem heye. Ev evqasî bi hevdu ve girêdayî ne. Ger ev hemû rast bin –ev pênaseya partiyê dihewînin-, we xwe gihandibe feraseta partiyê, li ser vî bingehî hem bi feraset hem jî bi hewldan tevlî partiyê kiribe û ev kiribe jiyan bixwe, wê demê hemû meşa we meşa partiye û meşa serkeftinê ye. Ger hinek bextreşî çênebin, wê di her karê ku hûn dest tavêjinê de serkeftin pêk were.

Ger di pratîka we de zêde serkeftinek nîne, bizanin meşa we ne li gorî pênaseya partiyê ye. Yan dijberek rastgire, yan dijberek çepgire, yan hewldana we kême, yan jî hûn xwediyê çûnek xwekuştinê ne. Lewma bi xwe re hûn dervî îradeya xwe zerarê didin hem derdora xwe hem jî rêxistinê. Dibe ku hûn bêjin; “Ez xwedî niyazek başim, min pir hewl da û kar kir.” Lê mixabin we weke kesek partiyî û pênaseya partiyê kar nekir. Di vê cîhanê de ti milet bi qasî gelê me kar nake, di heman demê de jî bi qasî gelê me xizan û ji mafên xwe mehrûm nîne. Ji ber ku partî, rêxistin û rêveberiya gelê me nîne. Gelê me li ber fermana xeta rêxistinên dine, lewra ji wan re kar dike û nikare xwe birêve bibe. Ji ber vê ye meşa we jî ji hêla objektîf ve giranî bi navê hinek din çêdibe. Di mejiyê we de bêrêxistinî xwe bicîh kiriye.

Rêxistinbûn hevbeşiye. Hûn ji wê aciz bûne, ya rastî hevbeşiyek wisa hatiye parçekirin. Hûn bi israr dixwazin ferdperest bin û jixweber bimeşin. Ji ber ku weke jiyan, felsefe û pratîkî ev bi we dane pejirandin û hûn jî zewq ji vê digirin. Ev jî înkara rêxistinbûnê, înkara hevbeşiye û di encamê de felaketek vê meşa we ye. Jixwe di pratîkên we de sedema rewşên ku hûn ne li bendêne û we jî şaşwaz dike ku derketine holê, hûn nikarin xwe li gorî pênaseya partî ya rasteqîn birêve bibin û di serî de jî xwe birêxistin nakin. Rêxistinbûn çalekiya herî zehmete. Rêxistinbûn hişê herî pêşketî, rêveberiya herî pêşketî, hesasiyeta herî pêşketî û

herî cewherî raveya hewldanê ye. Rêveberiya herî hêja rêveberiya rêxistinkiriye. Rêveberiyek rêxistinî ya rast, cewhera rêveberiya şere jî. Ger hûn wisa bin, hûn ê pir baş bikarin xeta leşkerî, xeta aborî û lojîstîkê birêxistin bikin. Dikarin gel jî, dîplomasiyê jî pir baş birêxistin bikin. Ji ber ku pêşî em rêveberiya rêxistinî ya dendika partî têdigihijin û wê serkeftî pêk tînin, rêveberiyên rêxistinî yên din jî pir rehetî dikare bên birêvebirin.

Dema li gorî vê pênaseya lê tê nêrîn, meşa we di radeya karesatê de ye. Niha dema em we li hember rastiya partî dahûrîn dikin û dadixin heta asta hêmanên dîrokî yên rastiya partiyê, hûn ê bibînin ji ber ku we li gorî pênaseya partiyê rêyek diyar nekiriye xirabiya herî mezin jî we li xwe kiriye. Wisa jî hûn ne tenê hewldana xwe, her wiha hemû hewldan û nexasim hewldanên rêbertiyê jî vale derdixin. Ya herî xirab jî ev meşa we çi di encama şaşî û qusurên we, çi jî encama hinek binkeftinên we bi xwe dibin de, bi rastiyan re lihev nakin. Ger hinekan winda kiribe, tevî ku hûn rastin û serkeftî ne ew windahî dibe windahiya we jî. Ger hinekan ser xistibe, ji ber tevî ku we bi temamî daye windakirin bêmafiyek pir mezin ku hûn dikin para xwe û lewra xwe dixapînin.

Çi ji hêla rojaneyî çi jî dîrokî ve dema em li pratîkên we dinêrin, pir rehet dikarin bêjim ku aliyê we yê herî xeternak ev alîye. Hûn vê jî ne bi niyazek xirab, bi niyazek pir baş û hebûn û tinebûna xwe datînin holê û wisa dikin. Bes ji ber ku tiştên hûn dikin ne li gorî pênaseya partiyê ye, ev jî zerara herî mezin a li jiyana partiyê ye. Li vir bertekên pir mezin hene. Hêceta xwe parastinê, ji keyfiyeta xwe re qilif çêkirin û xwe mafdar derxistin, rêxistinbûn nepejirandin li her derî digere, li gorî hemû pîvanên pênaseya partiyê cihê xwe saxlem dike, hinek din jî her tim tawanbar dibîne û meşa partiyê li gorî keyfa xwe şîrovekirin heye. Her ku derfetên partiyê zêde dibin û tevî hemû astengiyên derve û hundur şêwaza Rêbertiyê partiyê birêve dibe, em kesên ji sedîsed astengiyan ava dikin bigirin heta kesên di asta herî girîng de hewl didin erkên xwe pêk bînin her kes dibêje; "Ez jî xwediyê van pêşketina me." Ger hûn têr nekin û we berovajî pêşketinan kiribe, hûn ê çawa bibin xwediyê van pêşketinan? Feraseta gotina; "Bila

encamên şaşiyên partiyê dûrî min bin, serkeftin jî yê min bin” an jî bûna qurbanê şaşiyên hinek din xwedî li rastiyên xwe jî nederketin nêzîkbûnek berovajîye. Bi vî rengî hûn ê bibin xwedî şêwaza nêzîkbûna vê feraseta tam koranî û oportonîstî ya pênasekirina dîroka partiyê.

Li aliyekê pênaseya partiyê, li aliyê din jî pêvajoya jiyana we heye. Ya herî xirab jî ev helwest bi we re weke hestiyan hişk bûne. Li vir pîvan zêde belav bûne. Wijdana partiyê hatiye xetimandin û hesasiyeta partiyê li aliyekê hatiye hiştin. Encama vê jî zêdetirîn ferdperestiye, bandora civaka kevin û heta pergala dijmin rasterast derbaskirina nava me ye. Bê ku jê aciz bibe, bêje ev ê me ber bi kurve bibe û dê ji me çi bistîne hûn xwe ferz dikin. Ev tam di rewşek bêwijdaniyê de pêş dikeve û êdî ne gengaze ku ev tîp bê rawestandin. Ji ber qîmetek partiyê ji ya keda xwe zêdetir bidest xistiye û bûye berpirsê derfetên partiyê. Dibe ku bûye xwediyê bandorek kesayetî ya ku di xewna xwe de jî ne dîtî û ji bo dev ji wê jî bernede deh caran dikare xwe bide ber mirinê. Ji bo wê rayeyê û wê hêzê ji dest bernede her cure bêbextiyê bike, dikare ji bo vê bibe kujerek, her cure demogojiyê bikar tîne, dixeyîde, ger ev nebû binre dilîze, ev jî nebû direve. Kesê ku di nava patiyê de dervî pênaseya partiyê hêzek şaş bidest xistibe, di vê wateyê de tam belayeke. Kontrayên dijmin ên veşartî li kêleka wî di sifrê de dimînin. Kontra û provakatorên dijmin ên veşartî di nava partiyê de zerarek biçûk bidin derdikevin holê. Lê belê ji ber ku ev kesayet gelemperî tevdigerin, teserûfê dikin û tevahî hêza heyî bi hostane digire bin kontrola xwe, teserûftiyê serdest dike, êdî sînorên xeternakiyê di asta ku neyê hişê mirov de pêş dikeve. Ev dişibin qereçiyên ku ji bo desthilatî pêşî bavê xwe darve dikin.

Ev di rastiya Kurd de pir tundî tê jiyîn. Ji ber ku hest, fikir û daneyên hiş pir paşketî û çewtin, dema raveya kombûna van bi hêza rêxistinê re dibe yek, ev kesayet dibe cinawirek û êdî ne gengaze ku bê rawestandin. Jixwe em nikarin şêweya şaş a meşa milîtan û fermandarên me yên rêber rawestînin. Diçin mirinê û nirxên di asta zêrîn de hêja jî bi xwe re tine dikin. Pêşî tişta ku pêwîste bê kirin rawestandina vê kesayetê ye.

Belê berovajî vê jî koleyên ne di ferqa keda xwe de ne, tîpê qadroyên **hemalin**. Jixwe qet ne di xema van kesayetan de ye ku kar xirab dibin û keda wan bi xwe vale derdikeve. Êdî ketiye bin fermana kesê ku diçewsîne û kar digire û dibe. Pênaseya partiyê vê jî napejirîne. Tevlîbûna li gorî pênaseya partiyê hevbeşiye, bi însiyatîf bûyîne. Partî heta dawî rastiyê erê dike û heta dawî ji şaşî, nebesiyê re jî dibêje na û însiyatîf dide qadroyê xwe. Ji ber qadro vê însiyatîfa xwe bikar nayîne, ger rêveber wan bibe li ber kendalê jî dê serî jê re bitewîne, heta wê bi hev re bikevin. Lê belê ger qadro hinekê dengê xwe bilind bike dê ev rewş rû nedin. Dema bê gotin; "Ev rewş ne li gorî pîvan, taktîk, berjewendiyên xetê ya demdirêj, pîvanên milîtaniya partî, pîvanên leşkertî û pîvanên jiyanê ne; pîvanên partîbûnê van napejirîne, ez ê rastiya vî karî şanî te bikim û te qane bikim", kesê beramber jî bersiva; "Ez qane nabim, derdor biçewsînim û kar jî li gorî dizanim bimeşînim" dide, divê qadro jî bêje; "Li gorî girêdana min a bi partiyê ve û tevlîbûna min a guncav ji pênaseya partiyê re ez ê pêşî te teşîr û tecrîd bikim, ger ew jî nebû ez ê ji te qut bibim. Ez ê biçim cem navendek partî ya herî nêz û ger hêza min hebe ez ê tevdîra vê bigirim û te jî vexwînim rastiyê" û têbikoşe.

Elbet ji ber ku qadroyên me ne pîvan, ne cîh û ne jî zemînê destwerdanê nizanin, kesên fêlbaz û diçewsîne yên beramberî wan jî keda wan digire dibe. Paşê jî qadroyên weke hemalan xwedî hewldan jî aciz dibin û bi şêweya; "Çima wisa dibe" gazincan dikin. Bûhranê dijîn û dixetimin. Di encamê de zêdetir serê partiyê dibin bela. Yên din jî zêdetir ruhê wan distînin û pirsgirêkê vediguherînin kangrenê. Nirxên partiyê yên bi hezar kedî hatine komkirin li ser bingeha lihevkirina van herdu aliyan ji dînamîtekî zêdetir teqamenî dixin binî de û berteraf dikin. Lewra pirsgirêka we ya bingehîn, ger bi rastî jî karbidestiya we ya partîbûnê hebe, divê hûn dîroka partiyê li ser vî bingehî lêkolîn bikin û ji pirsgirêkên partî yên rojane re bi van nêzîkbûnan hêza çareseriyê raber bikin. Milîtanê partî di vê wateyê de kesê ku pênaseya partiyê esas digire, dîroka partiyê rast fêm dike û di rojaneyî de jî partîbûnê wisa di kesayeta xwe de pêk tîne. Li her cihî ewleya şêwaza xebata rast,

serkeftina xetê û serkeftina mezine. Li hember hemû şaşiyên ku derbikevin holê panzehîre û çiqas pirsgirêk hebin çareser dike.

Ji bo vê jî pêwîstî bi hişmendiyek dîroka partiyê heye. Ev partî gelo kî li gorî pênaseya partiyê daye jiyîn û çawa daye jiyîn? Li zindanan, çiyan, Ewrûpa, kurtasî li hemû qadên derve û hundur li hember çi têkoşîn hatiye meşandin? Ya herî girîng jî ev partî heta niha çawa dane jiyîn û aliyê vê yê jiyanî pir girîng çiye?

## Rêbertî Rêxistinbûne û Hêza Diyarker a Esasî Ye

Çîroka Rêbertiyê niha bûye çîroka netewî. Her kes wate dide diyardeyên weke rêbertiya netewî, lehengiya netewî, jiyana netewî û dixwaze wisa pêngav bavêje. Gelo ev sifat hatine heqkirin an na? Gelo Rêbertiyek wisa heye yan na? Bila nivîskar û milîtanên me van lêkolîn bikin. Her çendî ev Rêbertî zehmet jî pêş bikeve, pir ecêb, pir watedar, pir hosta û bi qasî hosta ewqas jî pir egîde. Pênaseya partiyê ku min bi hewldanên bêhempa birêve bir û dîroka wê ya heta roja me wisa ye. Kesên ku vê fêm nekin, ne dikarin ji

dahûrîna Kurdê nû, ne şêwaza şer, ne welatparêzî, ne jî hestan tiştekê fêm bikin. Vê mezin nakim. Dijmin jî me guhdar dike. Ger ez dibêjim zewaca Çîller-Erbakan xetere, dijmin roja duyem dibêje; "Pêk hat." Ez dibêjim di nava Ereban de duserî heye, dê PKK ji vê sûd werbigire, yekser dibêje; "Kerametek di vir de heye" polîtîkaya xwe diguhere yan jî xwedî li her tiştê ku rexne dikin derdikeve. Ango dijmin berovajî me dike. Jixwe jêhatiyek wan a hînbûnê tine ye. Ez jî li hember dijminek wisa rêz digirim, ji ber ku hîn dibe.

Rayedarek serfermandariya giştî û sivîlek girêdayî wî dibêje; "Siya APO ketiye li ser vî karî, ev di parlementoya me de diyar dibe, qada me ya huquqî xirab dike; ev zilam vê fêm nakin, em vê napejirînin, bila me zêde tengav nekin." Min jî got; "Rast û xweşik tespît kirine, li hember vê rêz digirim." Lê mixabin li naverastê yên ku şer dikin vê fêm nakin û weke ku fêm jî nakin, tevdîrên wan tine ne, dibêjin; "Rastî çûda ne." Lê belê ne cuda ne, rastî wisa ne. Paşê jî hêzên demokratîk dicivînin û tengav dikin. Paşê jî ev hêzên demokratîk dibêjin; "Kanî mafên mirovan, hêzên nav-netewî hûn li kurin?" Ma hêz tine ye? Hêzan ji mêj ve çeperên xwe girtine. We li gorî wan çeper negirtine, xwe li naverastê bi tenê hiştiye. We di wextê de guhê xwe daye bangên hatine kirin û ya xwe kiriye. Ger em bijîn dibe ku ji darvekirinê rizgar bibin; ango jiyana van hêzan bi ewle kirin, niha erka me ya sereke ye. Rastiya Rêbertiyê wisa ye. Yên herî dûrî me jî, herî dijber jî tevlî vê ne. Rêbertiya Başûrê Kurdistanê bi temamî li dijî me kar dike, lê tevî vê dibêjin; "Ger hûn nebin em nikarin rojekê jî bijîn." Ev helwestek polîtîke. De bila ev jî wisa bijîn.

Em dikarin van nêzîkbûnan ji van serên tûj bigirin bînin heta navenda xwe. Navenda me jî dibêje; "Tu ji me re hewce ye", bes carê jî dibêjin; "Em ê bi kiryarên xwe ve ruhê te bistînin." Kesên em dost dizanin jî, dibêjin; "Ma dê kengê bimire da ku em şîn bigerînin û xwe bi xwe bidin jiyîn?" Qaşo ev heyranên minin, lê jiyana xwe jî li ser şîngeriya mirina min dibînin. Ev rastiyeke. Ferdperestiya vê ne bi jiyanê, ancex bi mirinê ve têr dibe. Ev di heman demê de bi dostên derve re jî ne sînordare, hinek kesên di nava me de jî wisa ne. Qadroyê ku hemû hêz û derfetên xwe ji me

digirin, dibêjin; “Jiyana me bi mirina we gengaze.” Ya rastî ev jî ferdperestiye. Li wir dixwaze hinek hestên xwe li gorî cihê keyfa xwe bijî. Ev ne jiyane, di kêliya jiyan dike de mirina amade ye, amade ber bi mirinê ve bazdane. Ji ber ku ti derfeta vê jiyanê ya ku bikare bîst û çar saetan li ber xwe bide û bijî nîne. Dijmin bi yek lêdanê ve vê jiyanê bi erdê re dike yek. Hêza ku wê dide jiyîn hewldanên Rêbertiyê ne, mixabin ji wî re ya hewce dîsa jî xwe jiyîne. Nêzîkbûna; “Çi dibe bila bibe, bes bikarim rojekê xwe bidim jiyîn” felsefeya Kurde. Mînak, vale bi ser pirsgirêka cixareyê de neçûm. Cixare fêrbûnek we ye, ji bo we tişta girîng ew xweşik kişêna nava hinavê xwe ye. Hûn li hember îşkenceyên mezin li ber xwe didin, şer dikin, lê nikarin bê cixare bijîn. Ew weke tiştek evîndara we ye, lê ev nêzîkbûn ne raste. Heta hûn dixwazin hewl bidin min bixapînin, bêjin; “Ez ji karên din re jî heme”, ev jî danasîna kesayetekê ye. Kesê ku nekare di carekê de van derbas bike, kesayetek xetimiye. Nikare dev ji xwe berde. Yan dê xwe weke miriyekê tevlî bike, yan jî dê ji ber keyfa xwe hemû rêxistinê tine bike. Ji bo xwe bijî vê dike û ev jî xetere.

Pêwîste ev kesateya ferdperest bê rûxandin. Ev kes li welatên kapîtalîst dil arame, cartele (şîrketên peymanê veşartî dikin), holdînge û weke penceşêrê mezin dibe. Bes li nav civaka welatek weke Kurdistanê jî, belengazeke, fiqîrê feqîrane, kesek ji bo piçek nan çil teqleyan davêje; lê dîsa jî kapîtalîste, ferdpereste û xwepereste. Ferdperestiya di nava me de pir xetere, ji ber ku **ferdperestiya naverasta feqîrtiyê** ye. Bê fikar ji bo mirîşkekê bira û cîranê xwe dikuje. Ev rewş gelek caran tê dîtin û heta rêhevalê xwe qetil dike. Ji bo ev kesayet ferdperestiya xwe bijî derdora xwe diçewsîne, ti gotin namîne nake. Ev xweperestiya herî xetere û di nava me de jî pir berfirehe. Nepêkanîna tevkarî, ne pêkanîna jiyana hevbeş û parvekirinê, di hest û raman de xîtabî hevbeşî nekirin û bi vê dilxweş nebûn, di gelek kesayetan de tê jiyîn.

Ev feraseta; “Bila ya min be, çi dibe bila be.” Di van mijaran de gelek mînakên me dayîn hene. Li gundê me kesek bi navê **Dedo** hebû, li şûnek du-sê golik jî lê di nava rîx û avê de dijiya. Me ne dikariya Dedo ji wir derbixin. Her çendî bêhna wir ew ji hiş jî

bibira, ji bo wî qunçikek bihuştê bû. Bi çend golikên xwe ve jiyanek wisa ava kiribû, we serê wî jê kiriba ne diket nav cemeata gundiyan, yek deqeyê jî li xwe ranedigirt. Her tim ber bi wir ve direviya û her kesî digot; "Dedo" û pê dikeniya. Ev felsefe, felsefeya Kurde. Zilam qunçikek li gorî xwe ava kiriye, hinek put jî di nav de bicîh kiriye û her tim di wir de asê dimîne. Ya rastî ev tiştek xwezayî ye. Ji ber mirov tenê dikare bi tiştên xwe re bijî. Rastiya we jî tiştên we, weke tiştên Dedo bi xwe ne. Her tiştê wî, çend lawirin, du-sê zarokên belengazin, hinekê axa xîçekî ye û ji bilî van jî tiştek din nahizire.

Ev jî çawa di kesayeta we de xwe dide der, kombûna we ya di nava partiyê de û şêweya sekna we diyar dike. Lewma hûn nikarin tevkariyê pêk bînin. Ango çawa ku Dedo nakeve nava cemaeta gund, hûn jî nikarin axaftinên giştî yên bi bandor guhdar bikin. Hûn jî weke Dedo diçin ajal, an jî putên xwe re daxivin. Hûn roniya rojê napejirînin. Tarîbûnek wisa û dergahek we ya ehpapçawîşiyan a qet şibaka xwe tine heye. Hûn ê dizîve biçin wir pistepistê bikin. Ji ber ku ew yê we ne.

Min hêj wê demê got şûna dê ev yê mebin, bila qet nebin baştire. Ew roj ev roje em xebatên fikrên ku xîtabî fikrên giştî dikin, giştî diecibîne û her ku diçe cîhanê jî bandor dike raber dikin. Em ji wê rewşa bêşerim, jiyana ketî gihan şêwaza jiyanek ku bandor li qada nav-netewî bike. Ev jî nûnertiya jiyana me ya partî, felsefeya me ya jiyana nû û cewhera meşa me dike. Gelo hûn di ku dera vê meşê de ne? Meşa me bi gelemperî dişibe meşa Palo û Dedo'yê cîranê min. Yeqîn nakim meşa we bi qasî misqalekê jî wan derbas dike. Heta xetertire. Ew kedkar bûn, qetiyen çav bernedidan nirxê kesek din. Lê hûn pir xetertirin ku zêdetir xirabiyan dikin û li ser gelek nirxan xwe didin jiyîn.

Misoger ev xeterî di nava PKK'ê de heye. Ji keda xwe zêdetir raye girtin an jî berovajî vê seknek nikare parastina keda xwe bike berfirehe û niha jî ya serwer ev şêwaze. Ji bo derbaskirina vê pêwîste diyardeya rêveberiyê pir bi edalet bê birêvebirin. Ev jî li gorî dîroka û pênaseya partiyê rêvebirine. Hemû daneyên nirxan parastin û ger em ê van nirxan parve bikin, pêwîste nirx li gorî

jêhatiya kesan bê radestkirin. Em ê van nirxan ji destê kesên ku neheq di destê xwe de kom kirine bistînin. Em ê ji kesên heq û rayeya xwe rast bikar ne anîn re bêjin; "Heq û yetkiya te ev e, xwedî lê derbikeve." Di encamê de wê karên rêxistinî sererast bike, birêve bibe û bimeşîne. Ger hûn bal bidinê, di şêwaza we ya xebatê de, cîh nade van.

Gelo di nava partiyê de nirx çawa bi edalet tên parvekirin, parastin û pêşxistin? Jixwe ev ne di xema we de ye. Herî pêşketiyê we jî, weke hemalek ji rêzê dibêje; "Vaye ez kar dikim." Bes di encamê de jî keda wî di devê gur de yan jî qijakê de ye, ne di ferqa wê de ye jî. Hinek jî dibêjin; "Ma ne bese min evqasî kar kir? Divê partî beramber vê tiştekê bide min", wisa jî şêwaza jiyana gundî yan jî burjuvaziya biçûk dixwaze. Hûn ne ji bo gundî yan jî burjuvaziya biçûk bimînin, ji bo guhertin û veguhertin, bibin şerkerek tevkar û rizgarvanê miletekê beşdarî partiyê bûne. Bes herî pêşketiyê we jî nekariye gundîtî yan jî burjuvaziya biçûk derbas bike. Daxwazên we yên mafan, lêgerîna we ya mafan, tev bi vî rengî ye. Hûn dibêjin; "Min di ber partiyê de evqasî ked da. Partî çima hêjî tişta dixwazim nade?" Di nava we de yek kesê ku vê nebêje nîne. Dema hûn beşdarî têkoşînê bûn, hûn ê beramber tiştekê nexwazin. Jixwe ew kêliya we bidest xistî bersiva wê ye, şanaziya manewî ye, nanê we xwariye, hezkirinên we yên rêhevaltî ne, azweriyên we yên rêhevaltî ne û xiroşên we ne. Ma ev xelat têra we nake?

Bes ger hûn bala xwe bidinê, di nava we de kesên ku wisa têr dibin nîne. Hinek yek rojê firsendê bibînin, yetkî bigirin destê xwe, dê qesrek li gorî xwe saz bike û kesî jî nêzî xwe nake, dê ji wan despotên kevin zêdetir feodal be. Ger koleyek jî be dê yetkiyên xwe bide hinek din an jî hemûyan di carekê de çep û rast belav bike. Koleyê berê yê ji bo pariyek nan tika dikir hemû nirxan ji dest dide. Ev jî pir xetere. Beşek girîng ji we rewşa koleyek wisa ya ku nirxan xerc dike dijî. Beşek ji we ya girîng jî despote, feodale û di şêwazek desteserkirina kedê de dijî. Beşek din jî ya girîng di xeta navîn de, di mijara çi dibe de serî tevlîhev belengaziyê dijî. Bi giranî pênaseya kesayeta we wisa ye. Ev her sê rêbaz û nêzîkbûn jî

partîbûnê rave nakin. Sedemên van ên çînayetî û encamên ku rê jê re vedikin diyarin. Ev nêzîkbûn ne li gorî rastiya Rêbertiya partî û pênaseya PKK'ê ne, li gorî we ne.

Ev nakokiyeke û pêwîste bê dahûrandin. Gelo em ê dahûrînê bi lehevkirina we re, şerek xwîndar a bi we re bikin? Pêwîste em van herduyan jî esas negirin. Em ne bi we re lihev dikin, ne jî şerek xwîndarî dikin. Ji ber ku ev rêbazên civaka kevinin. Gelek ji we ji vê re amade ne, hema hûn dibêjin; "Were li me bide." Ez tevlî şerê wisa nabim an jî nabêjim wisa bi we re lihev bikim. Ez ê bi we re lihev nekim û bi şêwaza hûn fêm dikin jî şer nakim. Em ê berovajî vê di şêwaza xwe ya serkeftin bidest dixê de israr bikin. Ev jî meşek mezin a li gorî pênaseya partiyê ye. Şêwaza PKK'ê dike PKK, vejîna vî gelî pêk tîne û îro jî tîne rewşa ku bikare bibe xwediyê mafê nav-netewî wisa ye. Ev doz ne dozek ji rêzê ye. Di çarîka sedsala dawî de derfeta meşa herî girîng a me bidest xistiye. Kes nikare bi ti hêcetê vê derfetê û siûda vê meşê ji me bistîne. Ev ne hewce ye, ne jî hêza kesî têra vê dike. Ne hedê kesiye jî biwêrê vê bike.

Hûn ciwanin, bi ezmûnin û niha jî tişta pêwîste hûn bikin dilnizm bin. Hûn ê nirxek mezin bikin pêşketina feraset û wijdana xwe. Di mijara hûn ê çawa xwe bigihînin vê û çawa nêz bibin de lêkolîn bikin, nîqaş bikin û bêjin; "Min xwe gihand diyardeya partiyê." Erka we ya bingehîn partîbûne. Hûn ê di vê mijarê de xwe bi nêzîkbûnên seqet ên min destnîşan kirî, bi sê rêyên sexte ve xwe nexapînin û di nava partiyê de jî vê yekser an jî neyekser nekin. Dema we ev kir, hûn ê bi Rêbertiyê re nakokiyê bijîn. Wê demê jî ji ber ku Rêbertî pir birêxistinî û diyarkerê esasî ye dê we tengav bike, herî dawî jî yan ez ê we weke provakatorekî jêkim bavêjim, an weke xulemekî poşiya we li erdê bidim, an jî ger hûn despotek bin ez ê diyar bikim ku ew jî çiye û we li cihê ku hewce dike bidim rûniştandin. Rêbertî di vê mijarê de hem bê tawîz hêza fêmkirinê ye, hem jî hêza sepanê ye.

Provakatorekî digot; "Me PKK qet wisa nas nedikir; pêwîste şêwaza her egîdekî, her PKK'yî li gorî xwe hebe, li gorî xwe kar bike." Jixwe paşê diyar bû ku ji destpêkê ve dixwazin partiyê bixin

çi astê. Provakatorê ku ev digot, piştî merheleyekê ev jî serve kir û got; “PKK çawa di salên 1973’yan de erd qelişand û derket, pêwîste PKK heman wisa bê binaxkirin.” Şêwaza PKK’ê, li ser PKK pêkan, ango zayînek çawa kiriye, wisa jî binax kirin, paşê bû taktîkê Komara Tirk. Xwestin di nasname û şêwaza min de kesayetek tam li dijî min derbixin holê. Ez çawa tevgeriyam, çawa nêzî kî bûm, heta çawa nêzî Komara Tirk bûm, wan jî heman tevger bi hostatiyek mezin ve li dijî min pêk anîn. Elbet taklîtkar nikarin a esasî diyar bikin. Ji ber ku yên eslî em in, me zehmetî ne jiya ku van derbixin holê. Ji ber ên pêwîste bên binaxkirin ew in, ew bi xwe binax bûn û di encamê de Komara Tirk bi xwe ber bi binaxbûnê ve diçe. Rastiya ku kemalîzm xwe avêtî nav hemêza **Erbakan’**ê ku jê nefret dikirin wisa ye. Me wisa kir. Rêbertî evqasî serwere.

Pêwîste hûn di mijarên polîtîka û hêzê de van fêm bikin. Bila dost û dijmin çîroka tiştên ku diqewimin bizane. Ger hûn dixwazin xwe bigihînin pergalek nû, nexasim bibin artêş, hûn ê weke navê xwe fêrî vê bibin. Ma ez ê çi ji şerên anarşîst ên takekesî bikim? Ev li Kurdistanê tije ne û her roj jî ji xurtkirina dijmin wêdetir rê ji ti encamê re venakin. Ev şervanên takekes û kesayetên ji xwe hez dikin, zerar li ser zerarê didin têkoşîna me. Pêdiviya me bi kesên ku aheng nêzî pîvanên rêxistina me dibin, ango esasên pergal û kargeriyê pêk tînin heye. Ji ber ku dê ev meşa saxlem bidomînin.

Di dîroka Kurd de serberedayên takekesî zêde ne û ti rêberê ku îxanetê lihev neke nîne. Hûn dixwazin vê bînin serê min jî. Hûn dibêjin; “Deka em jî vê bisepînin.” Çalekiya min a herî mezin, di vê mijarê de çalekiya ji dîrokê re dibêje raweste. Hûn nikarin vê îxanetê, vê anarşîzmê û vê ferdperestiyê ferz bikin. Hûn jî dizanin ez şerkerek başim. Di karên rêxistinî yên rêveberiyê de reş û spî ji hev derdixim. Weke maceperestekî hevsengiyên xwe xirab nakim. Ti wextê, li ti eniyê, li ti cihî hedê xwe derbas nakim an jî gavên ku min ber bi xeternakiyê ve bibin navêjim. Ji ber ku ez rêveberek rêxistinî me. Ez her roj bi diyardeya ku kî li gorî armanc û di derbarê çi de li gorî pergala rêxistinê ve mijûl dibim. Mirovê ku vê dike çi derdixe holê, çiqas li gorî pîvane, çiqas pêk nayîne, dixim

her du aliyên mêzînê û dipîvim. Ev jî derdixe holê ku hûn di nirxê çend xiraman de ne, an jî çiqasî dervî pîvanan dijîn. Em jî li gorî wê cîh didin we, li gorî wê raye didin û li gorî wê şer dikin. Ger hûn di pîvanê de hevsengiyê vale tengav bikin, dê diyar bibe hûn çiqasî sivikin. Ev hemû li gorî pîvane û dê we jî tam bigihîne hevsengiyê. Ev jî rêbazek rêxistinî ye. Van pîvanan di kesayeta xwe de pêk bînin.

Ez qet behsa uslup, şêwaz û tempo nakim. Aqil li kure, wijdan li kure û hûn li kurin? Vêca em ê bi vî halê we van karan çawa ser bixin, hûn ê çawa bibin hêza pêkana sondê ku we dane dîrokê û biryarên ku we girtine? Jixwe ruhek we heye hûn ê wê jî bi kesayeta xwe ya giryok ve bavêjin nava agir. Ma di vê qonaxê de şerê gelêrî wisa tê serxistin? Nexasim bi vê şervantiyê ma hûn dikarin li dijî şerê taybet tiştekê bidest bixin? Ma hişê we vê radike? Ji ber ji gelek we re dibêjim, gerîlayê serxweş û ji ber rewşa we xembar dibim. Gelek ji we jî ji pîvanan direvin. Ji bo em revên we bidin rawestîn, ji hewldana ku em li dijî dijmin bikar tînin deh qetî zêdetir ji bo we bikar tînin. Ji bo em pêşî li xirabiyên we yên pîvanan xirab dikin, hevsengiyan belav dikin bigirin, em hêza sebir û ragirtinek mezin raber dikin. Mixabin hûn ne di ferqa vê jî de ne.

Şêwaza mezinkirina we ya di nava stargeha malbatê de dijminatî ye, heta ji şêwaza mezinbûna we ya li dibistanên Komara Tirk xeternaktire. Şêweyek wisa ya mezinkirina we heye, her yekê belayek mezine. Bes hûn ne di ferqa vê jî de ne, lê di rewşa rizînê de ne. Xwe sipartina min ve rizgarvaniya netewî kirin, heta ne ecibandina min jî bûye modeyek. Ez jî ji xanim û camêran re dibêjim ku; werin rojekê tenê li hember vî dijminî serfirazî li ber xwe bidin, tenê karek serkeftî bikin, bila wê demê APO bibe koleyê we, her roj xizmeta we bike. Ez ji vê re amade me, gelo hûn jî dikarin bi namûs li ser lingê xwe bisekinin? Ger hûn dibêjin; “Nikarim van karan bikim, li hember vê li ber xwe bidim, ez wisa zimandirêj hatime fêrkirin, her tim ji bo karên wisa hatime amadekirin”, nexwe li cihê ku hûn lê ne rûnin.

Pêşî quralên ziman baş hîn bibin. Ger hûn dixwazin bibin hêzek siyasî, quralên vê jî baş hîn bibin. Ger hûn dixwazin bibin rêber, misoger şêwaza vê baş têbigihijin, da ku em jî ji we re çepka bidin. Mixabin di nava we de kesek wisa nîne. Jixwe qet ne diyare hûn li kurin. Jiyanek wisa nabe. Vê carê jî ger hûn bêjin; "Em ji mirinê re amade ne", navê vê jî ne jiyane, ne jî mirinek rasteqîne. Na ger hûn dibêjin; "Bihêle, dê ev kar li gorî şêwaza me be", em jî ji we re dibêjin; "Siûda şêwaza we nîne." Şêwaza we tevî rastiya Rêbertî, rastiya jiyanê li hember dijmin serê xwe li dîwar xistine û wisa gotina; "Ez li ber xwe didime." Şêwaza we di şerên ga de dema diberdin hevdu û paşê jî serê hevdu parçe dikin tîne bîra mirovan. Tişta hûn dikin ne şerê gelêrî ye, pehlewaniya ga ye. Karê hûn dikin ne vesazkirin, tevlîhevkirine. Karê hûn dikin ne xweşikirin, kirêtkirine. Lê dîsa yek ji van ne di xema we de ye. Ev encam derdikeve holê, hûn ji bilî rebenekê ne ti tiştin.

Kesayeta egîdî, xwe rast rave dike û kesayetek ji ti hêzî natirse. Ji ber ku karê dike bi lehengiye. Ti sedema wî ya bitirse û xwe vêşere nîne. Bes di nava we de kesek bikare xwe wisa biparêze nîne. Ji ber ku hêceta we ya ji bo vê, serkeftinên we yên mezin û parastina we tine ye. Hûn nezanin û hewldanên we şaşin. Hûn ne di ferqê de ne ku ji bo çi şer dikin. Madem rewşa gelek ji we wisa ye, hûn çima bêriya egîdiyê nakin? Ne ku ev ne hewce ye, berovajî jiyana herî hêja ye. Hûn ji bo çi vê talok dikin, çi pêwîstiya talokirinê heye? Pêwîste kesayeta ku kêlî bi kêlî nûnertiya wê bê kirin wisa be. Ev ji bo partîbûnê bersivên herî rasteqîn ên bên dayîne. Ger hûn nekarin van bersivan rast û têrkar bidin, dê ji bo we heyf be.

## Hêza PKK'ê Ya Esasî Rêxistinî Ye û Rast Partîbûna Wê Ye

Di vê manê de dîroka PKK'ê, dîrokek pir trajîke. Ji bilî pîvanên PKK'yîbûnê, dîroka vejînê dîroka windakirinê ye, dîroka êşê ye, dîroka zindana ye, dîroka hilweşînê ye, dîroka şaşî û bûna qurbanê ye. Dema pêş dê ev dîrok bibe mijara tije bergên romanan. Sedema ev wisa ye, qadro li gorî pênaseya partiyê najîn. Hinek dibêjin; "Bila hinekê jî li gorî min be" ango "Bila hinekê jî li gorî ferdperestî, koleperestiyê be" û ev dîrok wisa tevlîhev kirin. Niha şerê min ê herî mezin, qadro bikarin vê dîroka partiyê rast fêm bikin. Ev beriya navê we zêdetir ji bo we pêwîste. Pêşî dîroka partiyê, paşê navê xwe hîn bibin. Ji ber ku weke navê xwe dizanim, ger em vê pêşveçûnê rast nekin, nekarin we li gorî dîroka partiyê mezin bikin û beşdarbûna we pêk bînin, dê ji vir û şûn de bi temamî windakirin be. Ji ber ku beriya niha dema hêj ciwantir bûm, min digot dikarim bi nêzîkbûnek dînamîk çend partiyên din ava bikim. Bes niha dijmin her der dorpêş kiriye.

Ger meşa partiyê ya îro bê rawestandin an jî temenê we bîst û çar demjimêrî derbas neke, hûn ê di pêngava destpêkê de li erdê bikevin. Rewşa we bi vê feraseta partiyê ve ancex wisa dibe. Yek sedem heye, ew jî ne hêza dijmine. Ji ber ku hûn ne di partîbûnê de israr dikin û pîvanên partiyê rast pêkanînê de zehmetiyan dijîn ev xeterî mezine. Nexwe derfetên rojane yên partiya me bi qasî her dijminî bin bixe xurte û serkeftinê ji siberojê nêztir bike zêde ye. Bes hûn van derfetan weke partiyiyekê bikar nayînin, nûnertiya wê nakin, naparêzin, vê jî di asta herî xeternak de dijîn û dê xeterî jî ji vir rû bide.

Zehmete ku em we fêm bikin. Gelo hûn çima hêjî partîbûnek ku merheleyê bigire û bi serkeftinê dawî bike najîn, çima hêjî

bertekan dijîn û ji vê direvin? Derdê we çiye? Ma ji bilî çeka partiyê, kîjan çek dikare we rizgar bike. Nexasim ji bilî çeka partiyê ya rêxistinî, rêxistinbûn û rêveberî cudatir kîjan çek dikare we bigihîne hedefê? Ev çeka herî mezine. Lê mixabin yek kesê ku bikare vê çekê bikar bîne nîne. Hinek dibêjin; “Aliyê min ê leşkerî pêş ketiye”, hinek jî dibêjin; “Ev aliyê min pêş ketiye.” Ev hemû xwe xapandine. Ger rêveberiya we ya rêxistinî ne rast be, dixwazin di nava xebatên artêşê, dixwazin çandî, dîplomasî, dixwazin legal de bin, yek jî ji windakirinek bi êş rizgar nabe. Egîdiya herî mezin ku hûn bikarin bikin, pîvanên rêxistinê bi xwe re pêkanîne.

Ji bo hûn rêxistinbûnê fêm bikin û rêxistinbûnek rast pêk bînin, bi salan li benda we mam. Lê niha dinêrim, ger mirov ji we re bihêle, hûn ê ruhê rêxistinê bistînin. Êdî di vê mijarê de ji we re dibêjim; “Rawestin!” Êdî di rastiya Rêbertiyê de piştî vê rê ji van şêweyan re nîne. Tevî ku bi tenê me, hemû kesên li hemberî min ev ferz kirin têk çûn. Elbet ferasetek me jî li gorî xwe ya egîdiyê heye. Di serdema navîn de bi şêwaza şovalye şerkeriyek hebû. Di vê serdemê de jî di şêwazek rêxistinî de şerek min heye. Dê kî derbikeve beramberî min? Di nava partiyê de gelekan xwe ceriband û yekser êrîş kirin. Vêca niha gelek ji van li kurin? Dibê ku hûn di kemînê de jî bin û vexwînerên we dibêjin; “Li benda wextê bin.” Dibe ku we guhê xwe jî bel kiribe, dibêjin; “Gelo wê kengî rojên me yên miradên me werin?” Nexasim heta ku ez hebim, dê rojên wisa jî nebin, ji ber tevdîrên ku me girtine dê sedî salan jî ew roj nebin. Ji ber tiştên ji bo gelan hatine bidestxistin, ne gengaze ku ji gel bên girtin.

Lewra ev bendewariyên çewt ên kevnar li aliyekê hiştin, başiya herî mezin ku hûn ji xwe re bikine. Bila fêlbaziya we ya gundîtî, hîlekariya we ya bazirganî û xeta we ya navîn xilas bibe. We heta niha ti sûd ji vê negirt. Hûn ciwanin, bi ezmûnin, a rast bidest bixin. Bila egîdiyek we jî hebe. Jixwe ev ti carî ji bo kes xwe bijî çênabe, mirov ber bi însiyatîfek zanistî û cîhana xwe ya azad ve dibe. Ev jî di jiyana azad de ber bi egîdî, serkeftî li hember dijmin bê ku bin bikeve, bê xapandin, hêza xwe baş hesab dike û wisa dikare bersiva keda pir baş binirxîne rêyekê vedike ku, xwedî li keda xwe derketin

jî li ser vî bingehî pêk tê. Bi vî rengî rastiya welat û gelê serketî derdikeve holê ku, ev jî jiyan bi xwe ye. Ma jiyanek ji bilî vê kî hêvî dike? Ger welat kêm-zêde ber bi rizgarbûnê ve neçe, gel azad nebe, hûn weke kes dikarin çi bikin? Gelekan ceriband ku ji dervî gel bijîn. Ev di roja me de ne gengaze. Van xemrevîniyên xwe yên vale û gelek ji wan ji kevnare mane danin aliyekê. Ev we ber bi jiyana azad, welatê azad, kesê bi însiyatîf û mezinbûna kes ve nabe.

Niha kesek bi qasî min azad û ji bilî min bi însiyatîf nîne. Weke dixwazim dixwim, digerim, weke dixwazim daxivim. Xwedî raveya herî azad û şêwaza jiyana azad a vî welatî me. Ji bilî vê însiyatîfa herî mezin a takekesî nabe. Ev jî rêxistinbûnek hişk, girêdanbûnek hişk a bi pîvanên rêxistinî ve ye, ango bi qasî ji destê min tê çavkaniya xwe ji girêdana min a bi keda gel, rêxistinbûna gel û venêrîna we re raber dikim digire. Hêza xwe ne ji marîfetên taybet, ji van digirim. Çil û heşt salî me, bi sebrek mezin hatim heta vir û hêjî dikarim sebir bikim. Her tim dihizirim ma ez ê çima xwe bi hemû jiyana xwe ve fedayî vê têkoşînê nekim û zêdetir jî xwe fedakirinê ji xwe re pîvan dibînim. Ger di nava we de hinek ji xwe re parek azadiyê dibîne hebin, bila li xwe binêrin. Hûn weke ku dê jiyanek rêgez û esas danîne aliyekê pêk were tevdigerin. Lê siûda jiyana azad di çarçoveya pîvanên rêxistinî yên min destnîşan kirî de pêk tê. Hûn ê jî vê ji dil û can weke tişta herî hêja binasin.

Encamên bingehîn ên pêwîste ji pênase, dîrok û rastiya serkeftinên wê yên rojane bên derxistin ev in. Tevî ku me ev xalan bi dehî caran girtiye dest, mixabin me nekarî veguherînin xeta jiyana we. Çewtiyên we sînorên sebrê derbas kirin û ev xeterî hêjî didome. Tişta hewce dike hûn li vir bikin rastî pejirandin û xwe jî li gorî wê perwerdekirine. Ev ji mezinbûn û însiyatîfa we tiştekî winda nake. Berovajî hêz, siûda rasteqînî û serkeftinê dide we. Ji bilî vê hûn nikarin pêş bikevin, şer bikin, şeran jî ser bixin. Pirsgirêka herî bingehîn a qadrobûna me, li ser bingehek rasteqînî nepêkhatina partîbûnê ye. Ger hûn bikarin li gorî pênaseya partiyê xwe bigihînin feraseta dîrokî, hûn ê bibin qadroyek bêhempa. Şoreşa me, li tevahî welat têra bûna qadroyek li gorî xeta partî, raveya çawanî û çendiniya xeta partiyê dike û zêdeye jî. Bûna

qadroyek li gorî xeta partiyê, xebata herî girînge. Ger em bikarin vê li hemû qadên xwe yên xebatê bidin pejirandin, ti hêza dijmin nikare li hember partîbûnê li ber xwe bide. Jixwe xofa hemû cîhanê jî ji ber vê ye.

Ji bo dijmin aliyê PKK'ê yê herî zêde dide tirsîn, rêxistiniya wê û partîbûna rasteqîne. Jixwe serbazên Tirk şaşiyên ku hûn di gerîlatiya xwe de dikin di telsizê de ji we re dibêjin. Hûn her roj di hemû pratîkên xwe de diyar dikin ku girse çawa diçewsînin, heta çawa berovajî nêzî girse dibin. Dijmin ji vê şêwaza we ya kar natirse, tam berovajî hêz digire. Bes dîsa jî em ji emperyalîstê herî mezin bigirin, heta mêtîngerê herî nerim, an jî heta dostên wan, hemû ji me ditirsin. Ji ber ku ev şêwaza rêxistinbûnê ti dijberê xwe û ji dervî armanc mayînê efû nake, têk dibe. Rêxistinbûnek rast û rêveberiyek rast, ruhê hemûyan distîne. PKK wisa ye, helwesta ku PKK anî roja îro ev e û ancex dikare bi vê helwestê xwe bigihîne armanca xwe ya dawî. Hûn pir paş vê helwestê ne, ya pir çepê wê, yan jî pir rastê wê ne. An jî hûn ji vê helwestê qut bûne û lewra jî bi rewşek xeternak ve rûbirû ne. Pêwîste ev hemû bên derbaskirin, misoger wate ji pîvanan re bê dayîn, a herî girîng jî parastina helwesta rast bê kirin, li her cihî û di nava her peywirê de were pêkane. Ger hûn wisa bin dê ti astengiyên ku nekarin derbas nekin nemînin, pirsgirêkên ku nekarin çareser bikin nemînin û çalekiyek ser nexin nemînin. Şêwaza ku dijmin herî zêde jê ditirse ev PKK'yîbûne. Ji bo me jî ji bilî vê çekek bandortir ku em bikarin li dijî dijmin şer bikin nîne.

Zêde baweriya xwe bi çekên çors neyînin; ji wan deh qetî zêdetir li cem dijmin hene. Teknîk û hejmara zêde li cem wan heye. Bes rêxistinbûn û şêwaza jiyana rêxistinkirî ya em behsê dikin jî, misoger li cem ti dijminî nîne û nabe jî. Ev ancex li cem me dibe. Ji ber ku li cem me heye, encamê destnîşan dike. Ji ber ku vîna mirov, hêza berxwedana mirov, xwe bi xwe atomîzekirina mirov, xwe bi xwe anîna rewşa teknîka herî pêşketî bi vê rêxistinbûnê gengaze û ev rastî derketiye holê. Di vê wateyê de ev rêxistinbûn teknîka herî mezine. Me gelek caran ev rave kir. **Rêxistinbûn teknîkek bi qasî bombeya atomê bi bandore**. Ger milîtanên

PKK'ê jî wisa xwe birêxistin bikin, ti bomba bi qasî vê bi bandor nabe. Jixwe ji ber ku min xwe hinekê jî gihandiye vê teknîkê, vê milîtaniyê, ango vê rêxistinbûnê, niha bi bandorim. Ne li nav girse, ne li eniyê, ne jî di dîplomasiyê de çekên di destê we de bi min re nîne. Bes dîsa jî li vir bi çekek wisa şer dikim, hemû dijminên min ên li cîhanê nikarin li hember vê li ber xwe bidin. Elbet çekên din jî hewce dikin, lê divê hûn vê çekê jî kifş bikin û bi dest bixin. Dê hingê çekên leşkerî, çekên çandî, çekên dîplomasî, çekên aborî, çekên serhildanan û hemû çekên din bi bandor bişixwulin. Ji ber ku ew çeka bingehîne. Navê wê li sere; rêxistinî ye, rêveberiye û hemû çekan birêve dibe. Ger vê çekê ji dest berdin, pêwîste hûn misoger bizanin hemû çekên qadên din jî ji destê we çûne.

Çeka rêxistinbûnê di destê me de ye. Rêbertî vê çekê baş bikar tîne, lê têrê nake. Ne yek, ne deh, divê sedan milîtan vê çekê baş bikar bînin. Pirsgirêk di vir de ye. Çend sed milîtan li her qada peywirê vê çekê bikar bîne, PKK dikare bi plansaziyekê di wextê de derfetên xwe derbasî çeperan bike û vî şerî ser bixe. Giraniya hewldanên me yên dema dawî jî hemû jî li ser vî esasî bûn. Armanca me carek din wisa çend sed milîtan pêşxistin bû. Pêwîste hûn daxwazkarê vê bin. Divê hûn pêşketin û veguhertina xwe di vir de têrkar pêk bînin û li ser vî bingehî bi ser erkên xwe de biçin. Ger hûn vê bikin, yeqîn dikim dê siûda serkeftina we tevan bilind bibe û serkeftina dawî jî li ser vî bingehî pêk were.

**29 Hezîran 1996**

## SALA 18. SALA DOZA PKK'Ê YA MEZIN A HERÎ ZÊDE NÊZÎ SERKEFTINÊ YE

PKK'ê, di rastiya sala 18. de selmandiye ku di rewşek nêzî serkeftinê de ye. Doza mezin a partiya me, li gundê **Fîs** a girêdayî **Amed**'ê bi komek ku dê çibe û ne diyare çi bibe ve, zanebûnek pir kêm û bi îdîayên ku zêde ne pêşketî ve ji roja ku gavên partîbûnê avêtiye heta roja îro navê jiyîna pêvajoyek ku mirov dikare bêje destaneke.

Elbet pêşiya dîroka me ya partiyê jî heye. Bihara sala 1973'an, partîbûna me hêj di asta biçûk de bû. Ev jî gavek cidî bû û piştî wê jî nirxa her salê ya weke damezirandinê heye. Çawa ku her bihar di şînbûn, bişkivîn û tovdanê de destpêka jiyanek nû ye, her salek nû ya partiya me jî misoger xwedî wateyek wisa ye. Hema her sal zîl dide dibe tov, hem jî ne tenê ji bo salekê, di sala duyem de berhemek cuda dide û ya sêyem jî cewaztir û zêdetir berhem dide. Niha jî em di sala 18. a partîbûnê de ne. Berhemên wê cur be curin, hem jî pir karbidestin. Me PKK di nava vê dewlemendiyê de anî heta vir. Têkoşîna me ne tenê berhema rizgariya netewî, berhema partî û şere, mîna van gelek berheman dide. Îro berhemên sosyalîzmê jî yên herî bi îdîa dide, berhema azadiya jinê dide. Li hember şerê taybet ê ku di dîrokê de ne hatiye dîtin, berhema li ser xwe mayînê dide. Li hember wê hemû cîhan jî bibe yek, derfet û berhemê bidestxistina serkeftinê dide. Pêwîste kesên di doza partiyê de bi îdîa ne vê jî weke xezîneyekê binirxînin û bizane nirxên mezin ên hêvî û helwestên ku xwe bi serkeftina bê dawî ve bi çek bikine.

Nefêmkirina girîngiya doza partî yan jî bi hemû berfirehiya wê ve nirxandin û pêwîstiyên wê bicîh ne anîn, divê ji bo we kêmasiyek rasteqîn û nexasim çavkaniya xemgîniyê be. Di vê qonaxê de qet yeqîn nakim di vê berfirehiyê de bi îdeal û xebatek hêja bi qasî îdeala partiyê hebe. Ez weke gelek ji we nebûm xwedî derfetên hewldana ne di nava girseyê de, ne jî li qadên şer ên gerim

ku kar bikim. Bes dema li ser partî, rêxistinkirina fikra partî û nexasim li ser xebatên qadro lêhûr bûm, min diyar kir ku dikarim destanên çawa ava bikim. Xebatek ji vê hêjatir nabe. Hûn ji niha ve dikarin bibînin ev xebata ku me di nava mercên pir zehmet de birêve birine jî, dê çi bi xwe re bîne. Hûn ê bêjin; "Doza partî bûyerek pir mezine, partîbûn hêza herî mezine." Ez hemû hêza xwe ji partîbûnê digirim, ji bilî vê ti çavkaniya min a hêzê nîne. Li ser partiyê lêhûrbûn, li gorî rêgezên partiyê jiyîn û hêz dana rêxistinbûna partiyê, **esas**ê hemû hêzane. Ev pir vekiriye. Hûn weke qadroyên partiyê dixwazin kar bikin û karbidest bin. Rêya vê jî partîbûne û xwe gihandina şêwaza rêgezane. Dema we ev raber kir hûn xurtin. Li vî welatî di nava artêşê de û heta li hember hemû dijminên me rêyek din a xurtbûnê nayê hizirîn. Hêza xeta Rêbertiyê, hêza xwe di rêya partîbûnê de avakirine. Ger em hinek din vekin, rêgezên Rêbertiyê, bi van rêgezan ve hewldanên bi pîvan û ev hewldan bi hostane raberkirine. Vaye Rêbertî, vaye serkeftin!

Di demên dawî de hûn dibêjin; "Pîvanên partiyê jî, gerîla jî heliyane, li dervî welat, Ewrûpa jiyana partiyê heliyaye." Ji bo qadroyek PKK'ê tiştek bi qasî vê helwesta ev axaftin kirin, axaftin û êşa vê jî nejiyîn, an jî êş jiyîn bes li hember xwe şer nekirinê xetertir nîne. Lê mixabin, hûn tenê van naxavin, di heman demê de xirabiyan jî dijîn. Li gorî min sedema herî bingehîn a windakirina we jî di vir de ye.

Bi navê bîranîna hemû şehîdên PKK'ê dibêjim, ti hewldan bi qasî partîbûnê ne **hêja** ye. Israra di pîvanên partiyê de, israra di şêwaza jiyana partiyê de, israra di peywirên partiyê de, ji serkeftina herî dawî ya em di eniya şer de bidest bixin jî hêjatire. Serkeftinên dawî bihordarin, dibe ku pey wê re binkeftinek jî çêbe, bes her tim li pêş partîbûnek berfireh de serkeftin heye û ev serkeftin jî domdare. Yê partîbûnek berfireh pêk bîne, dê serkeftina dawî jî bidest bixe. Lewra di kesayeta serkeftinê de bi israr bin, pêşî xwe bigihînin hemû pêdiviyên partîbûnê. Ji bo watedayîna vê jî zêde pêwîstî bi gotinê nîne. Li pratîka min binêrin: Li cihek teng û bi derfetên pir kêm xebatên partiyê em dimeşînin, îro hûn anîne çi astê û gihandine çi? Gelo hûn dikarin hesabên serkeftinên me

bikin? Xala bingehîn ku hûn, ji dîroka partiyê hîn bibin, raza hemû serkeftinan partîbûne, rastiya ku di pîvan, şêwaz, tempo û bûna xwediyê exlaqa partiyê de biryar dayîn û di vê biryarê de israrkirine.

Qonaxên dîroka partiyê, her salên wê heta her demjimêrên wê hene. Misoger her demjimêrek wê ji ya din hêjatire. Weke xelekên zincîrekê, weke sitûnek mîna helezonî her tim ber bi asîmanan ve bilind dibe hevdu pêşve dibe û di navê de bê pergalî nîne, şêwaz û tempo misogere, bi qasî dijmin negihijiyê û xwe li ser ferz neke bihêze. Dema em weke tovekê hatin reşandin, ji bo nerize tiştên hewce hatine kirin, a herî girîng jî xwe ji dijmin parastiye. Ango vê tovê xwe ji bayek hişk, ziwabûn û rizandinê parastiye. Ev jî weke dayîkek li ser zaroka xwe birecife zêdetir recifandinek baldar ve pêk hatiye. Ji bo vê me xebata bîrdozî pêş xist. Ji bo em ji xeternakiyên dijmin dûr bin me xwe veşart û ev serket. Pêvajoya pêşketina bîrdozî, pêvajoyek di asta nebê nabê de bû. Beriya wê di nava vî gelî de ji xwe şerimkirin hebû. Heta tekeyên civakê parçe bibû û lewma lewaz bû. Di nava civakê de qet îdîa, biryar û hatina cem hevdu nebû. Bira bi xwe bira qebûl nedikir û demjimêrekî li cem hevdu ne diman. Pêvajoya me ya pêngava bîrdozî, pêvajoya dawî anîna vê rewşê bû. Li hember axa me û mirovê me yên bi salan hatine înkarkirin û ji wan re hatiye gotin; “Êdî nayêm cem te, êdî nikarim bi te re bijîm" nêrînek bû. Yên ku mîna xayînan lihev dinêriyan, dest bi lihev nêrînek dostane kirin. Yên ku pir zêde ji hev xerîb ketibûn, destpêkirina hevnasînê bû. Vaye rastiya bîrdozî ev e û ev raman hat avakirin. Ramanê dostanî, ramanê yekîtî, nêzbûna ruh û ramanê welat pir girînge. Hûn ê beriya bimeşin lê binêrin, beriya bikin jî pêşî bibînin. Heta ev nebin yek gav jî nayê avêtin.

Rêxistinbûn derbasî meşê bûyîne. Piştî ku raman hat avakirin û yên pêwîste bên dayîn hatin tespîtkirin ber bi wê ve meşe. Meşa ber bi ax û gel ve bi yek kesî ve na, ancex rêxistinê ve dibe. Ger em di nêrînên xwe de lihevkirî bin, em ê yên ku pêwîste em bibînin ve bimeşin. Ji ber ku armanca netewî ji bilî qevdek xayîn û kesên di wê de israr dikin, armanca her kesî ye. Azadî ji bo miletekî ye, ji bo

her kesî ye û lewra pêwîstî bi meşa her kesî heye. Kesên ku pêdiviyên rêxistinê bicîh nayînin derewkerin. Yên bi rêxistinê re nameşin hem ji nêrîn hem jî ji meşê dûrin. Ti nêrîna van kesan di derheqê welat û gelê wan de nîne. Ev korin, wisa dizanin ku dê bikarin korane û gêjok jî bimeşînin. Me ev sal bi navberên dem kin ve jiyan kirin.

Dema me gav ber bi sala 1080'î ve avêt, meşa ber bi axê ve û xwe gihandina gel di astek kêm de pêş ketibû. Ev qonaxek ji bîrdozî ber bi polîtîkayê ve bû, polîtîka rast bû, meşa gel pêk dihat û êdî dihat wateya ku di maneya polîtîk de şerê azadiyê destpê dikir. Hêza ku nêrîna te tine dikir û digot; "Welatê te û gelê te tine ye", dema dît nêrîn ava bûye û polîtîka destpê kiriye, ji bo heta ferdê me yê dawî tine bike, li dijî me pêvajoyek faşîzane da destpêkirin. Di encamê de 12'ê Îlonê hewldanek tinekirina nêrîna me û meşa me ya gelêrî bû. Ev şer, şerek mezin û taybet bû. Dema dengê lingê 12'ê Îlonê hat em derketin dervî welat. Ji bo pêşiya vê meşa me neyê girtin, ev taktîkek bû. Taktîkvan jî pêwîste ji xwe bipirsin ku, çima hêj dengê lingê wan ji dûrve dihat me ev gav avêt. Hemû şaneyên me direcifîn ku, em çawa dikarin di bin lingê 12'ê Îlonê de neperçiqin. Hestê berpirsyar jî wisa ye. Gelo hûn ê bihizirin, ji bo ev nêrîn tine nebe û pêşî li meşa me neyê girtin dilê me çawa li ser hev lê dida?

Ger di vê pêvajoyê de bêm girtin dê dilek min a biqetê nebe, dê dilek miletekê hebûya, awirên ku hatine tarîkirin ne tenê awirên min bin, dê awirên miletekî ku pêwîste li ser axa xwe azad û netewî binêrin bûya. Lewma min xwe parast. Ji bo parastin û jîndarkirinê jî, min taktîka xwe serê derziyê re derbaskirinê sepand. Ji bo vê jî ne dibû rawestim, xwe bavêjim erdê û terkî mirinek erzan bikim. Ji ber ku êdî çavên ku bi min re dibîne, çavên miletekî dibînê ye, dilê ku bi min re lê dide dilê miletek lê didê ye. Ma çawa me dikariya îxanetê li vê bikin! Ger rastî jî wisa ne, milyonan di dilê we de lê didin, çavên we çavên milyonane û mezin dibînin, êdî hûn nikarin rawestin û ji nedîtî ve werin. Belê, me wisa dest bi jiyînê kir. Îdîaya di awirên partiyê de û meşa bê navber wisa watedare. Me pêşketin

wisa domandin. Ev rastiya ku hêjî gelek ji we fêm nake, di meşa me de, yan jî bi navê partiyê bi me re wisa pêş ket û watedar bû.

Li hember kesên ji nav we hêjî nebûne xwedî vî raman û dilî ecêb dimînim. Ev, çiqas bi êşe û rewşek çiqas îflah nabe! Dema dixwazin bi botên dijmin karên ku bi navê partiya me hatine kirin bi erdê re bikin yek, ji bo li hember vê şervanek bê pêşxistin, em bi ruh û can tevgeriyan. Di wê pêvajoyê de yên li pey min cîh digirtin, digotin; “Ma cardin vegera li welat dibe?” û kena xwe bi me dikirin. Kesên ku pêwîst bû herî zêde xwe berpirsyar bibînin wisa bûn. Mixabin cuda tiştek ku bihata kirin jî nebû. Di wê demê de ji bo pêşxistina şervanekî ji bilî bi tiştek din ve mijûlbûn ne gengaz bû. Her tişt girêdayî israra wir bû. Ger hûn naxwazin dîrokî winda bikin, naxwazin dilê we bê jêkirin û ziwakirin, hûn ê di şer û şerkertiyê de bi israr bin. Kesekî wateya wê nezanî û negot; “Gelo çima ev heval evqasî bi israre?” Pêwîst bû israrbûn hebe, ji ber ger ev nehatibûya serxistin wê tiştek ne mabûya.

Niha di awirên we û di hilavêtina dilê we de vê kêmbûnê dibînim. Weke pirî caran hatiye gotin, pirsa weke gelo mîna yê li trênê dinêre, yan weke hilavêtina dilê gameşekê ye dikim. Ger weke min lê bê nêrîn û bihîstin, yeqîn dikim dê astengî nekare li hember wê hewldanê bisekine. Nexasim di peywirên partî û şer de wisa binkeftin û bêçaretî nayê jiyîn. Mijara ku herî zêde jî heyf dibînim ev xale. Ev awirên bi van re yên kî ne û çawa çûn bin vê axê? Bi azadiyê re nav hev de ne, bes bi qasî bizinekê jî ji wir hez nakin. Evîndariya bizina li çiyayê Cûdî, li hember çiyayê Cûdî zêdetire. Mixabin girêdana gerîlayên li wir hêj pêş neketiye. Em li hember vê hêrs dibin. Dilê van heman weke dilê gameşekê bêxeme. Ne di ferqê de ne ku dîrokek li wir zindî dibe û li wir gav bi gav azadî pêş dikeve. Belê tişta heyfa me pê tê ev xale. Ma qet li hember vê rêzdar nebûn û her tim bi hêrs pêşwazî kirin? Li gorî min ev tawanek mezine.

Hûn ên şer dikin nizanin çîroka vê ya di nava me de jî çawa pêş ketiye. Di vê rewşê de hûn dikarin behsa kîjan dilî bikin? Hûn ne gihane ramanê me. Dema wisa jî dibe elbet awirên me ti hêzê nade we û encama wê jî şêwaz û tempoya we dikeve. We PKK

fêm nekir, we nedît û ne bîhîst ku PKK ji hêla me ve tê meşandin. Lewma hûn niha jî ketina şûna civatên fitne û fesadiyê. Ev jî xirabiya herî mezin a li me tê kirine. Ji ber van nêzîkbûnên we yên bê nêrîn û bê dil zehmetiyên ku min jiyane û hêrsên min li hemberî vê jiyaye, min li hemberî seferên dijmin ên herî mezin jî ne jiyan. Nexasim dema bi aqilmendî xwecihbûna vî welatî de, hewayê wê jiyîn, tenê ne dîtina welat, derfetên gerimbûna bi gel re û pîrozkirina cejnan ku derketine holê de, xwe li ser gel ferzkirin, bi qasî reftarên we yên weke ku mirov nikare li welat bijî û divê jê bireve, ti helwestek min hêrs bike nîne. Ev helwestek bi lenete.

Me di wan salan de di dîroka me de şerek pir girîng û ji bo me rêya sereke ya jiyanê da destpêkirin. Pêşiya pêngava 15'ê Tebaxê û pişt wê re wisa bi henase henase dihat pêşxistin ku, ji bo min hemû zehmetiyên vê ne tiştek bûn, heta zehmetiyan ez xurt dikirim. Bes mixabin hinek dihizirîn; "Mirov çawa dikare li ser van hewldanan bijî û çawa dikare berhemên wan bidest bixe?" Gelo ev çi bê wijdanî ye, ev çi bêrêzî ye? Nefêmkirina şer, dîroka şer wisa fêmkirin çiqas şaşiyek mezine, feqîriya ji dilek mezine, dûrbûna ji rêzdarî û qet nefêmkirina hewldanên ku hatine dayîne. We çawa ev kir? Çima fermandarên şer û kesên li ser yekîneyên şer ev fêm nekirin? Qet wate nedana dîroka şer, bidestxistina çekekê de rola kî çiqase, bi sedan çek çawa hatin peydakirin, ji bo pêşxistina şervanekî hewldana ku bi salan hat raberkirin, ji bo welatekî pênc-deh kesên me windahî dayîn nezanîn, dê we tenê bi lenetkar bihêle. Di vê wateyê de hûn devjêberdin dîroka partiyê fêm bikin, heman weke deqek reş li nêvenga me cîh dagir dikin.

Nefêmkirina dîroka şerê partiyê bê **wijdaniyek** mezine. Lê despêkirina vê pêvajoyê bûyerek tam mûcîze bû. Di dîrokê de ti îsyanên Kurd çend mehan derbas nekirine û hemû jî bûne gavên serberjêrî. Bi têkoşîna me destpê kirî ve yekem care pêvajoyek bilind dibe û hêviya serkeftinê dide hatiye bidestxistin. Li şûna ku pêwîste ev bi berpirsyariyek mezin bê nirxandin, bi fikrek "Bila kevirek avahiyê ji min jî be" hewldan raberkirinê, we got; "Em quralên şer sist bikin, derfetan çarçur bikin, xêra vê fermandariyê

xerîzeyên xwe têr bikin.” Ev jî ketîbûna herî mezine. Nav û şan çi dibe bila be, ger rojekê dîrok encamê şanî min bike, her çendî kesên ku serkeftin jî dest xistibin, ez ê hesab ji van kesan bixwazim. Salên beriya niha ewqas şehîd hatine veşartin û vejîna ewqas hêviyan çêbûye ku, ne gengaze mirov heqê van nede. Di vê wateyê de, wate bidin van salan û di mijara we wate nedayî de jî xwe ber çavan re derbas bikin.

Şerê taybet ê beramberî me weke bahozê bû. Pir baş dizanim ku, hêzên li pişt şerê taybet digotin; “Ev hezar salin me ev bi erdê re kirin yek, lê hêjî nemirine, kesên ji nava wan serî hildidin û dibêjin ‘Dixwazim bijîm’ serê wan jê bikin.” Dîroka wan a hezar salî ev li ser wan ferz dikir. Gotin tenê ji bo wê dîroka neyênî rizgar bikin, pêlek êrîşê destpê bikin. Bi dûjînan, rêbazên şerê taybet ên di ti dîroka şeran de nîne ve bi ser wan de biçin û êrîş bikin! Dixwazim vê bêjim, kesên digotin; “Dixwazim şer bikim, bibim gerîla” ger dixwazin li hember me û xwe rêzdar bin, pêwîste vê hatina dijmin a pêl bi pêl bibînin. Ya herî girîng jî pêwîste mirov weke fermana mezin xwedî li hêviya jiyanê ya şiyar bûyî derbikeve, di nava hewldana mezin a derbaskirina şaşî û nebesiyên dikuje de be. Heta ku mirov vê nejî, pêwîstiyên vê hîs neke, ma hûn difikirin çawa şer bikin? Ma çima dilê we wisa hişk bûye? Hêjî bê ku şerim bikin hûn weke berendamek şer derdikevin pêşberî me, heta weke berendamên fermandarî disekinin.

Gelek caran ji xwe dipirsim ev kîne? Derfetên min wisa xwe gihandina çiyan û derbasbûna nava komên gel ên berfireh jî çênebû. Bes dema min di vê çepera biçûk de jiyana xwe ku hêsan nayê zeptûrepkirin jî çawa fedayî dozê kir û çi kir? Vêca hûn di çi halî de ne? Pêwîste hûn van binirxînin. Ne hêsane mirov bibe fermandarek baş, nexasim şervanek bi namûs û bi şeref. Ger qinyata we bi şer tê û dibêjin; “Ez ji bo şer amade me”, pêwîste hûn bikarin hesab jî bidin. Ji bo ez xatirê we neşkînim, we naqewitînim. Di xwezaya min de xisletek wisa qewitandina mirovan nîne û kes jî nikare min biqewitîne. Mirov bi şeref, serfirazî, armancên şer û dîroka bi we re dilîzin, hûn jî ji nedîtî ve

tên. Ez vê napejirînim. Lê hûn fêm nakin. Pir vekirî şanî we dikim, vî şerî ne weke hûn dihizirin û xwe dixapînin, di çarçoveya destnîşan dikim de birêve dibim.

## Hijde Salên Me Yên Bêhempa
## Salên Têkoşînê Yên Dijwar û Ronî Bûn

Ji ber ku dîroka PKK pir berfireh û bi nûbûnan ve dagirtiye, ya herî girîng jî ji ber ku dîroka PKK'ê aniye astek neyê fêmkirin, hêza min têrê nake wê vebêjim. Ji ber hûn xwe nêzî vê dîroka mezin nakin, vê dîroka mezin qirêj dikin û kesayetek evqasî çewt a ji kêmasiyan re ferz dikin, ji we hêrs dibim. Ji we tika dikim; kêliyekê zûtir li pêş vê dîrokê bûna asteng derbikevin. Ji ber ku hûn leza min dixin. Nexwe hûn ê li pêş vê dîrokê biperçiqin. Ma egîdiyek li gorî vê dîrokê ne gengaze? Dê evqasî şehîdên ku her yek abîdeyek nirxê PKK'ê ye watedar bin, dê hûn jî evqasî li hember vê çewt bin! Wê derfeta jiyana miletekî li ber kêrê be, hûn ê jî beramber vê evqasî bêxem bin! Wê derfetên şer evqasî dijwar bin û hûn ê jî evqasî beredayî bin! Mirov li hember nirxên wisa seknek hêsan raber nake, nexasim mirov weke we qet nasekine. Mirov bi evqas şaşî û kêmasiyan ve di doza partiyê de namîne. Ger bimîne jî dê ji we re bê gotin; "Hûn dijminatiyê dikin."

Mirov çawa dijminatiya vê dîrokê dike? Yeqîn dikim, ger sîxurek dijmin li vir bûya, dê min wêrekiyek bidayê û bi xwe bimeşanda. Lewra hûn ê li rast PKK'ê vegerin û rast watedar bikin. Bi mebesta vê salvegerê pir vekirî dikarim bêjim, kesên nekarin vegerek wisa li vê dîrokê bikin û mafê wê nedinê qet li hember wan rêz nagirim, bi qasî misqalekê jî nirx nadim wan. Ji bo min li gorî şêwaza partî bûyîn ser her tiştî re ye. Kesê wisa dilê mine, ruhê mine û hezkirina mine. Jixwe em ji bo van hene. Kes nikare bi cureyek din me bikar bîne û van nirxan parve bike.

Piştî salê 1990'î, gel kûrtir beşdarî têkoşînê bû û wêrek nêz bû. Di merheleyên serhildanan de dema Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ARGK, ango artêşa me lezgînî ber bi derfetek pêncî hezarî ve mezin bû, êdî dilê me ji vê re teng dima û me di xebatê de sînor nas nedikir. Li vê qada min a teng de çar hezar kesî perwerde dikim. Derfetên dervî welat pir kêmin. Hûn li welatin, li hemû

herêmên welat gav bi gav şervan diherikin û tên. Hûn bi girse re jî pêkve ne, lê girse dûr dixin, didin revandin û terkî îmhabûnek hêsan dikin. Di vê dîrokê de tiştek bi qasî vê mirov hêrs bike tine ye. Niha dijmin nû ji bo van dîrokan li xwe mikur tê dibêje; “Me di salên 1992’î de Kurdistan winda kiribû.” Îdîaya hemû kontrgerîlayên li dijî me wisa bû; “Me Kurdistana ku hatî windakirin ji nû ve bidest xist.” Gelo kî ji vê re rê vekir? Bi rastî jî kî ev Kurdistana ku ber bi serkeftinê ve diçû û ev şoreş winda kir? Ma hûn ê bi cidiyet vê ji xwe bipirsin an jî li hember dîrokê hêza xwe lêpirsînê raber bikin? Gelo hûn ê derfetên mezin ên vê serkeftinê bibînin û bi qasî hewce dike erka bikaranîna vê fêm bikin? Dema hûn vê peywirê pêk neyînin, gelo hûn ê bibînin çawa bi dijmin didin serxistin? Heta ev neyên dîtin dil nayê mezinkirin, fikir nayê pêşxistin, hûn nikarin wate bidin stratejî û taktîkê leşkerî. Mixabin, we bi vê kesayeta xwe ya kêr nayê û nebes ve ev dîrok li her cihî çil carî ber bi rewşek têkçûnê ve bir.

Bîlancoya xebatên min ên salekê, tenê li vê qadê hewldana pêşxistina ne kêmî hezarî şervan û qadroyên PKK’ê û elbet biçekirina wane. Gelo ev di dîroka ti tevgerên rizgarî yên cîhanê de hatiye dîtin? Li hemû qadên dervî welat hejmara mirovên ku rêberên xebatê birêxistin kirî sedî derbas nake. Lê min di vê pêvajoyê de tenê bi destê xwe ji sih hezarî zêdetir mirov mezin kir. Min bê ku quruşek hebe dest bi vî karî kir. Lê paşê bi trîlyonan pere hatin xerckirin û hemû bi çek kirin. Hûn jî dibêjin; “Jixwe weke baranê derfet hene û şervan beşdar dibin” û van derfetan berhewa dikin. We ev li Botan’ê, Amed’ê, bi kurtasî li her derê pêk anî. Niha jî hinek li Başûr vê dikin, qaşo dê wî ruhê xwe yê rezîl û bêxêr têr bikin.

Binkeftinên ku her sal we ferz kirîn, tevî we me bersiv da û li ber xwe da. Ji bo min şer ne qediya; berovajî şerên derbasbûyî weke pêvajoya amadekarî dinirxînim. Ji dîplomasî heta xebatên eniyên şer her tişt amadekariyek bû. Min xwe li ser bingeha van amadekariyan, ji nû ve tevlî têkoşînê kir.

Dijmin bi min re şer kir, we jî bi giranî li dijî dijmin şer kir. Di vê mijarê de keda we înkar nakim, berovajî ji we zêdetir qîmetê

didim ked û hewldana we. Xala em pê hêrs dibin, bêrêziya hûn li hemberî xwe dikin û nirxa nadin keda xwe ye. Qet hewce nake hûn di vê mijarê de hêrs bibin. Tenê mafê kesên ku li hemberî xwe bêrêze ya şerê bi xwe re heye û ti sonda ku ew bidin jî nîne. Me di vê wateyê de bi we re jî şer kir û xwe amade kir. Dijmin îro di encama şêwaza min de dîn û har bûye. Heta duh jî zanyariya ku ji nava dijmin dihat wisa bû; "Kesên ku dewletê jî, civakê jî tînin vî halî binketî ne, dixwazin suîqastê li we bikin û wisa rêyên rizgariya xwe vekin, hewar hay ji xwe hebin. Ji bo kesên evqasî têkil nav qirêjiyê bûne pak nayên diyarkirin bijîn." Vê jî ne hûn, kesek ji eniya dijmin dibêje. Me ev şer hinekê jî wisa pêş xist. Rêvebirên şerê qirêj, bela anîn serê civaka xwe, heta dewleta xwe, wisa gihan vê encamê. Şerê me yê mirovahiya mezin, bi rikek mezin xwe anîna vê astê eniya dijmin parçe kir û şerkerên qirêj ên di nava wan de jî hatin wê astê bûn barên giran ku nekarin rabikin.

Dijmin dihilweşe, ger hûn jî bi helwestên xwe yên şaş ve alîkariya dijmin nekin, wê têk biçe. Jixwe nikare ji vê binkeftinê jî bireve. Hêza ku dijmin herî zêde pala xwe didiyê hûnin. Dibêjin; "Kesek ku têdikoşe heye, ger em wî bikujin, dê qet hewce nemîne ku em şer bikin, yên bimînin jî jixwe bi xwe re şer dikin." Ma we li Biryargeha me ya Navendî ev ne selmand? Hêjî di hinek raporan de tê gotin; "Yekîneyê belav dikin." Îro çapemaniya dijmin jî vê dibêje. Hêviyên çeteyên şerê taybet ên qirêj hûnin. Mirin û mayîna min, an jî ger ez bimirim jî meşandin an jî nemeşandina şer mijarek cuda ye. Em şerê xwe bi mirina xwe ve jî sînordar nakin. Bes ji bo dijmin bûna hêviyek wisa, ji bo we şermek mezine, bê şerefî ye. Tenê rêyek ji vê rewşa we rizgarbûnê heye, ew jî kêliyekê zûtir xwe ji vî dijminî rizgarkirine. Bila ti kes nebêje; "Evqas ê mine, evqas ne yê mine." Her kes di vê tawanê de xwedî para berpirsyariyek mezine.

Hûn zêde ne westiyayî ne, pir ciwan di wê rewşê de ne dikarin pêngavên girîng pêş bixin. Hem xwedî siûdek mezinin, hem jî li ser derfetên vî şerî serwerin. Lê mixabin weke di van salên dawî de hatî dîtin li ser vê hesabên weke; "Deka ez desteser bikim û xwe bidim jiyîn" hene. Ev jî tê wateya karên ku dijmin nikare bike, hûn

dikin. Ne ku ez vê dibêjim, jixwe dijmin ji we re dibêje. Ev ji xayîntiya şer xirabtire. Kontrayek pir taybet jî nikare di eniya hundur de karê meşandina şerê dijber û me tinekirinê bi vî rengî xeternak bimeşîne. Hûn ê bêjin; “Keyfa me, hebûna me, mafê me yê jiyanê”: Ma mafê jiyanê û ferdperestiyek wisa dibe? Ev karê hûn dikin ne ferdperestiye jî, ber bi xerîzeyên xwe yên kor ve herikîne. Ma mirov ji bo armancên evqasî biçûk şer dike? Sucê we, nêzîkbûnek evqasî ferdperest raberkirin, di şer de tenê fermandariya xwe dîtin, temamiya şer nedîtine. Hûn heta hemû şaneyên xwe wisa ne.

Wisa şer nabe, bibe jî şerek bi navê dijmine. Kesayetên ku dijmin evqasî pala xwe didiyê, êdî ji bo min ne hêja ne. Di qonaxên ku mirov dikare bi serkeftî derbikeve pêşberî gel, dîroka gelan, derfetên serkeftina hêviyên azadiya gelê me derketî holê de, hûn bi navê kî wisa dimînin û ji kî vê wêrekiyê digirin? Ti pênaseya vê ji bilî ferdperestiya we ya kor û xweperestiyê zêdetir heye gelo? Ma ji bilî tinebûn û rizîbûna we zêdetir ti pênase heye? Ev jî dibe hêviya dijmin. Hedê kiye ku ji dijminê dirize û dihilweşê re dibe hêviyek?

Nexwe, bi qasî ku pir zehmete ewqasî jî watedare, dema em bi şêwaza xwe ya rêbertî ber bi pêvajoya şerek wisa dîrokî ve dimeşin de, dîroka têkoşîna xwe ya wisa bêhempa esas digirin, di eniya şerê taybet de jî vî dijminê ku sucê mirovahiyê kiriye didin beramberî xwe û vê lenetê tine dikin, nabe ku weke şervanek ji rêzê pênaseya bûna weke fermandarek gelek kêmasî û şaşiyan dike bê kirin. Heta dawî ezamet û biryara xwe ya serxistinê, qet nebê bi qasî keda min dayî dijwariya hewldana xwe, hêza ezmûnên xwe û mewkiyên ku min bi xwe bidest xistine berçav digirim û wisa xwe tevlî pêvajoyê dikim. Ger hûn jî dihizirin ev kar bê fermande nabe û dibêjin; “Bê serî nayê meşîn”, nexwe hûn ê jî li gorî şêwaza min a hebûnê bêjin; “Em hene.” Nexasim di artêşê de misoger ev wisa ye. Êdî qet şêwaza yetkî girtin û xwe dana jiyînê ne bînin ser zimanê xwe, qet neyînin hişê xwe jî. Berdin bi van kêmasî û şaşiyan ji me destûr bigirin, nêzî me jî nebin.

Hûn li vir vê dibînin: Em di doza partiyê de jî, di doza artêşê de jî ne lewazin. Ne ku nikarin hukum jî bikin. Ne ku hûn jî vê rastiyê nabînin. Siûdek mezin ji we re hatiye dayîn. Bes hûn jî vê şaş fêm dikin. Doza azadiyê wisa ne hêsane. Nabe ku ev pêvajoya dîrokê weke pêvajoyek ji rêzê bê destgirtin. Du peyvên fikrê vê têkoşînê xiroşek mezin bi min re ava kir û têkoşînê wisa destpê kir. Ger îro serkeftin ber bi evqasî pêkanê ve diçe, ma dibe bawerî qet bê xiroşe bimîne, ma dibe qet bê êrîş bimîne, ma dibe qet bê feraset be? Ev merhele, merheleyên bi baskên heloyan firdanê ye. Ev merhele, merheleyên heta dawî hawara dile û di ti merheleyî de mafê jiyînê bi vî şêweyî nehatiye jiyîn. Em tenê ji bo armancên xwe yên netewî tênakoşin. Sosyalîzma me bala gelên cîhanê jî dikişîne, bi rewşenbîrên welatên kapîtalîst herî xurt re jî hêviyê ava dike. Tenê şoreşa miletek ku di bin komkujiyê de mayî ser naxin, ji bêhêviya netewên herî pêşketî re jî dibin hêvî. Rastiya me ya partî û şer wisa ye.

Di van hijde salên navdar de nirxên mezin hatin avakirin û ya herî girîng jî xwe gihandiye ronahiyek balkêş a berbanga azadiya teqandinek mezin. Ger kî be xiroşa vê di dilê xwe de nahese, ew sefîlek mezin an jî minafiqe. Êdî ti derman jî ji wî re nabe çare. Lê ger girêdanek mirov bi jiyan, gelê wî û mirovahiyê re hebe, ev merhele, merheleyên cejnê ne. Em vê jî ji kesên ku jiyanê weke duxanek cixarê yan jî weke serdema seretayî ya mirovahî bi komkirinê zikê xwe tirkirinê dibîne re dibêjin. Em weke xwedîderketina nirxên pîroz ên bûna mirov wate didin. Em di van salên têkoşînê de mafdarin; mafdariya xwe jî serxistina van salan, dewlemendkirina berhemên têkoşînê û zêdekirinê de dibînin. Fikrê têkoşîn kirinê bedewe, madeya wê jî bedewe. Ma tiştek ji vê hêjatir çi heye? Hêrs di cîh de ye, hezkirin di cîh de ye, ma ji bilî vê çi di cîh de dibe? Belê, vaye ji we re **cîhanek mezinbûna** wisa tê dayîn. Ma ji vê mezintirîn çi tê xwestin? Partî evqasî mezine û ev jî herî zêde daye we û yên dixwazin bila jîndar bikin. Xelatek ji vê hêjatir çi heye? Ma kî bi qasî kesên vê fêm nakin, nirxa wê pîroz nakin, pir ferdperest û qaşo dixwazin li gorî keyfa xwe bixwin zindîk û dizker dibin?

Tişta ji we re tê dayîn xwîna şehîdên me ye; tişta di bin nirxên wisa mezin de heyî, keda milyonan ên bê navin. Ma tiştek din wisa pîroz bê pêşwazîkirin heye? Ma mirov dikare nêzîkbûnek wisa qedir û qîmet nezane li hember van nirxan bike? Hûn jî dibînin, ev 18 salên dîroka partî pir bêhempa, berz, bi hêrs, ronî, şerî, serkeftî û bûyerên trajîk ve derbas bû. Em van tevan têkilhev dijîn. Em ê bi hêviya ronahî û serkeftinek mezin ve ber bi rojên pêşve biçin.

Li ser vî bingehî em bang li we tevan, hemû PKK'yî û dostên wê, hemû gel û her kesê li her eniyê şer dikin xwedî li partiyek doza wisa mezin, serkeftî û partiyek ti caran têk naçe derbikevin, ji bo serkeftina wê jî carek din hemû jêhatiyên xwe bidin der, derfetan bi taktîkên partî yên rasteqîn ve, pêşî bi taktîkên gerîla yên di bingeha stratejiya şerê wê de ve û bi şêwazek amadekariya plansazkirî ya li gorî demê guncav pêşwazî bikin. Weke berpirsê têkoşînê yên di radeya pêşî de pêwîste destpêkê milîtanên partî vê pêvajoyê bi nêzîkbûnên bîrdozî, siyasî û rêxistinî pêşwazî bikin. Di navend, jiyan û pêşengtiya partiyê de çi tiştên ku pê re ne di ahengê de ne jêkin û bavêjin. Em vedixwînin ji bo rastiyan çi hewce dike şerê wê û hewldana serkeftina wê bidin.

Em ê li ser vî bingehî salên ku winda kirine bi sîûdek din a bêhempa ve cardin binirxînin û teqez serkeftinê bidest bixin. Ger aliyên we yên bên efûkirin hebin, lezgîn xwe çareser bikin û beşdarî xebatan bibin. Rewşa xwe ya dixwaze ser bixe, lê ser naxe derbas bikin. Dîsa van derfetên ku ji we re tên dayîn û yetkiyên partiyê rast û di cîh de, têrkar binirxînin. Em bang dikin sala 18. bikin doza sereke ya jiyana xwe. Salên pey vê li ser bingeha duruşmeya fermana hatî dayîn û serkeftina nêz bûyî bigirin dest. Li ser vî bingehî em bang dikin di asta bêhempa de lêhûr bibin, rê nedin yek nebesiya ku serkeftinê ji dest berde û van salan teqez bikin salên serkeftinê. Serkeftinê dixwazin.

**Bijî PKK!**

**26 Mijdar 1996**

## ESASÊN PARTÎBÛNÊ PIRA HERÎ SAXLEM A JIYANÊ YE

Yên partîbûnê nizanin şerê wan ê hundurîn a pir cidî jî çênabe. Kesên her tim li dijî partîbûnê bi bertek bin û nefêhma bin, cihê wan demdirêj di nava vî şerî de nîne. Dê ev her roj bibin bela serê partî. Lewra hûn ê hemû hêza xwe bidin partîbûnek têkûz.

Mixabin we li çiyê ev kiriye xala herî dawî. We xwe pir tenê hiştiye û heram kiriye. Ev jî çavkaniya pirsgirêkên we ye. Pêwîst bû qadroyek, nexasim milîtanek berpirsyar firsend ne daba ku pirsgirêk evqasî giran bibin. Xala ku em ecêb dimînin, we çawa evqasî firsend daye vê. Em vê hewldana ku me di nava partiyê de ji bo xebatên qadro dayî jî, bes nabînin. Tevî ku derfetên we yên partîbûna saxlem hene jî, hûn nikarin van dervî jiyanê û dervî hewcedariyan bihêlin û di vê mijarê bi ti şêweyî xwe biparêzin. Tevî ku pîvanên partîbûnê diyarin, hûn nikarin bi me bidin bawerkirin ku bi niyeta xwe ya baş ev pêk ne anîne.

Esasên partîbûnê pira herî saxlem a hemû jiyanê ye. Kesên nekarin vê pirê saz bikin, nikarin gavekê jî pêşve biçin. Hûn di vê mijarê de nayîn nasîn. Devjê berdin bi marîfetên takekesî şoreşê bikin, hûn nikarin xwe jî bidin jiyîn. Partî we dide jiyîn. We jî partî bi ferdperestiya xwe fetisandiye. Şûna partî ferdperestiya we di nava xwe de bihelîne, hûn di nava ferdperestiya xwe ku ti jêhatî û hêceta wê neyî hemû nirxên partiyê difetisînin. Hûn bi vê jî dilxweş dibin. Di bin vê ferdperestiya we de xwe nepêşxistin, ne sererastkirin, di serî de jî xwe ne gihandina siyasîbûnek rast hêza moralê heye. Sal jî derbas bibin, hûn çiqas dixwazin ferdperestiya xwe di bin hinek cilan de veşêrin û bidomînin, ger hûn partiyê weke qonaxekê dibînin, hûn nikarin vê qonaxê derbas bikin û her tim di refê de bimînin.

Ger hûn pratîkên ku jiyane dahûrînin, hûn ê bibînin ti hêceta wan helwestên we tine ye. Tevî ku li ber serê we dihan hevrê û endamên milîtan hene, hinek fermandarên me hewce nabînin bi wan re rûnin û civînekê jî lidar bixin. Dema dikin jî tenê ji bo gotin be dikin û teng dikin. Li gorî pêdiviyan çiqas qadro hewce ye ne xema wane. Weke vê gelek peywirên din jî hene. Bê ku hesabê bikin ji bo rêveberiyek rast û çalekiyek rast hewldan û rêxistinbûnek hewce dike, bê ku mercên vê berçav bigire û amadekariyan bike, hûn bi du gotinên ji devê we derdikevin ve hewl didin birêve bibin. Kesên dahî jî wisa nakin. Napolyon jî fermandariyek weke we nake. We şêwazek pir erzan ava kiriye û ev jî dibe sedem ku di wextên qet nayê hêvîkirin de rewşên wisa derbikevin beramberî me. Madem hûn diwêrin şer bikin, nexwe hûn çima ji esasên partîbûnê yên pêdiviya wê ya herî bingehîn re bi heman xwesteka şerkirinê bersivê nadin? Madem hûn dibêjin; "Ez bi salan dikarim vî karî bikim", nexwe hûn çima di asta herî kêm jî de be wate nadin van pêwîstiyan? Heta ku hûn van helwestên xwe berdewam bikin, hûn nikarin xwe ji durûbûnê rizgar bikin.

Dibistana Navenda Partî, dibistana herî bingehîn a perwerdekirina qadroyên partî ye. Kesek ku nekarê li vir partîbûnek rast ava bike, rast nabe. Hûn ê ti caran qadek ji vê derê rasteqîntir a ji bo partîbûnê guncav nebînin. Kesên ku vê nenirxîne, ji bo pêşveçûnê ti îdîaya xwe nîne. Asta pêşketina we ji rêzê dibînim. Hêjî bi we re hêza rakêşwer a PKK'yîbûna mezin û şêwaza dilsoziyê nabînim. Bi we re şêwazek ji rastiyên me yên bingehîn agahiya xwe nîne, pir seresere û bersivê nade rastiyên me yên siyasî yên pir girîng û şerê me dibînim. Heta we di çeperên PKK'ê de weke kesên bê hewldan, zêde encam nagire, rastger, lê paşketî jî nabêjim milîtanên ecêb, şervanek ecêb dibînim. Seknek we weke ku dê bi hewldanek ji rêzê ve bê jiyîn jî heye. Ev şaşiyên kûrin. Bila kes nehizirê ku dê di PKK'ê de wisa bê jiyîn.

Misoger wextê we ya fêmkirina hinek tiştane. Min bi salan ev vegot û niha jî dubare dikim: Ger îro emperyalîzma sereke ya cîhanê ji bo me dibêje; "Rêxistina terorê ya herî xirab" û îstîxbaratên cîhanê yên herî zêde şoreşên dijberin her roj di derbarê

me de civînan lidar dixin, ev tê wê wateyê ku, PKK nikare wisa hêsan karê xwe bimeşîne. Hûn nikarin bi asta xwe ya paşketî û rastger ve vî şerî bimeşînin. Qutbûna we ne tenê ji niyet û nêzîkbûnên dijmin ê li eniya beramberî we heye, di heman demê de qutbûna we ji rastiya dîroka we jî heye. We şêwazek ava kiriye û dimeşin. Asta we ya berpirsyarî lewaze. Hûn ji rastiya dîrokî esasgirtinê dûrin, hêza jiyînê ya li gorî rastiyên siyasî yên rojane raber nakin, lê nexasim li ser şêwaza PKK'ê ya em dimeşînin jî bi rehetî dikarin bêjin; "Ev bi salan besî mine" û hewl didin jiyana xwe di tengaviyê de rizgar bikin. Ev nêzîkbûn şaşe. Mirov misoger bi vê re nabe milîtanek PKK'ê ya rasteqîn. Jiyana we îflas kiriye. Hûn ne rizgarvanin, di rewşa rizgarkirinê de ne. Bes peywir nerizgarkirina we, bi rizgarvanên weke we ve rizgarkirina gel û nirxane. Karê herî baş hûn dikarin bikin, xwe xistina rewşa rizgarkirinê ye. Reftarên we yên weke "Bila partî min rizgar bike" pir kirêtin. Misoger divê hûn vê derbas bikin.

Tevî me ev dîrok anî heta vir û we pir zehmetî jiyan, em ti carî rewşa wisa bê rizgarkirin najîn û ji kesî re jî nabêjin; "Were min rizgar bike." Niha dijminên cîhanê yên diyarker me weke dijmin ê herî xirab dibînin. Ger em evqasî dijminê xwe ditirsînin, em nikarin destûrê bidin xwe ku bêjin; "Westiyame, nikarim." Em ji dost û dijminê xwe her kesî re diyar dikin ku dikarin vî karî bi tena serê xwe bimeşînin. Hûn di nava partiyê de ne, evqas pişgirî ji we re tê dayîn, tevî vê hûn bêrû hem rewşa bên rizgarkirin dijîn, hem jî didin jiyîn. Hûn li nava çavên me dinêrin dibêjin; "Deka, hinek din min rizgar bike." Rewşên we yên wisa giran tine ne. Ji ber hûn qet nikarin ji vê rewşa teoriya zarokan jiyînê rizgar bibin lewra wisa ne. Hûn nikarin xwe ji felsefeya jiyana sexte ya li gorî teoriya jin û mêrtî rizgar bikin lewra wisa ne. Hûn li gorî van teoriyan hatine mezinkirin. Hûn dihizirin ku teqez dê hinek we xwedî bikin. An hûn rica ji dijmin, an ji Xweda dikin, an jî rewşên weke hestiyarbûnê dijîn ji çarenûsa xwe dixeyîdin. Her tim jî ji van helwestên xwe re hêcetekê dibînin û wisa jî ne çareserî, bêçaretiyek kûr dijîn. Hûn ê di navenda me de pêngavek ji vê rewşê derbikevin raber bikin.

Van rastiyên we yên jiyanê red dikim. Niyeta min nîne weke berê van derewan guhdar bikim. Di cîhanê de destûrê nadin ti kesî ku evqasî demdirêj zaroktiyê bike. Dîsa di cîhanê de kesek qebûl nake ku mirov wisa zêde xeşîmê siyasetê û bi kêmasî bisekine. Beriya niha îhtîmalek mezin ji eniya ku li dijî me şer dike ne yekser agahiyek hat, dibêje; “Misoger Rêbertiya Partiyê bi tenê ye, qadroyên derdora wî yan jî giştî qadro nikarin siyasetê bikin.” Niha ev pênaseyek raste. Kesên nekarin polîtîka bikin, nikarin şer jî bikin. Wan jî tespît kiriye ku qadro nikarin şer li gorî xetê birêve bibin. Ev jî dijmin dixe nava rehetiyek mezin an jî her tiştî bi Rêbertiya Partiyê ve sînordar dibîne û li gorî wê planan çêdike. Heta asta wî jî pir baş tespît kirine. Ji milîtanê li çiyê bigirin heta nizanim kîjan polîtîkvanê erzan ê li kure, dibînin ku her aliyê polîtîkvaniya Kurd têrê nake û pir rehetî bike hevkar. Em jî li vir hewl didin vê bişkînin.

Pêşî hûn ê ji xwe re pênase bikin çima nikarin bibin şervanek baş? Şûna ku weke pîrejinan dixeyîdin an jî weke gundiyan dilê xwe digirin, dev ji xwe diberdin, weke mirovan serê xwe bêşînin bersiva bidin pirsên rola min çiye, divê egîdî çawa be. Bila misoger kes bi navê PKK’ê hesabên şaş neke. Divê bê zanîn ku di nava PKK’ê de sucê hesabên şaş kirin pir girane. Nabe ku kes di nava PKK’ê de erzan jî bijî. Li gorî ezmûnên xwe van tiştan vedibêjim. Di vê mijarê de niyeta kes ji we ya cewherî tiştek rave nake. Tişta ku ji bo me bi nirxe bi dehan şehîdên rojane tên dayîn, ax û nalîna miletekî û windabûna hêviyên dawî yên miletekî ne. Ev min eleqeder dikin. Reftarên kesan ên erzan û tarî nayên nîqaşkirin. Tenê hûn li vir van esas digirin.

Li hember hinek raporên ku ji min re tên nivîsandin ecêb dimînim. Li gorî min ev rapor ne bi pîvanin. Mînak, hevalek me nû hatî partî di kesan de nas kiriye û li hember Rêbertiyê jî bertek dijî. Elbet ev hevalên ciwanin, nabe ku mirov zêde tewambar bike. Ji ber kesekî tiştek fêrî wan nekiriye. Hinek fermandarên me gotine; “Partî ez im.” Ev ciwan jî yan xwe nû nas dikin an jî nas nakin, nirxên wan ên moralê tine ye, hebê jî tevlîhev bûye. Elbet ev jî dibe sedem tişta em jî fêr dikin berovajî fêm bike, paşê jî qaşo li hember

me bertek dijîn. Tewambarên vê jî ew kesên berpirsin. Van bi salan bi navê me axatî kirin. Rewşa gelek ji we jî wisa ye.

Dema me ji bo azadiya jinê jî rûpelek vekir, me çarçoveya ku pirsgirêk çiqas piralî ne jî danî holê. Hûn ê jî di çarçoveya azadiyê de ji xwe re sînorek jiyanê xêz bikin. Hûn ê ji bilî vê cîhana we ya pirtikî ku kevine, êdî ji dil û mejiyên xwe bavêjin. Ger ev hêza we nebe, hûn ê xwe berpirs bibînin. Di vê mijarê de xwe lêpirsîna hinek hevalên me li gorî min têrê nake. Ji ber kesayeta wan, yeqîn nakim di jiyana PKK'ê de li ber xwe bidin. Weke ku nikarin, hûn fêrî wan jî nakin çawa dikarin bikin. Li vir zêde hêza pêşketina nêzîkbûnên giştî çêkera partiyê, taybet jî ya zilam nîne. Jin jî bi hest û felsefeya jiyanê ve wisa hatiye girêdan, mirov nikare rake. Hûn jî dizanin, rika jinê jî pir bi keftûlefte. Tişta bi jinê re pir zêde, hestewariya erzan û ew veguhertina bertekane. An jî dema tê çewsandin, vêca tam berovajî weke koleyekê bi salan qet devê xwe venake û her tiştî berovajî dijî. Ev jî hestiyariyeke û elbet şaşe. Hûn di nava partiyê de vê hûrûkûr dijîn û didin jiyîn. Me gelek caran destnîşan kir ku pêwîste ev bê derbaskirin.

Kesên ku li welat erzan didin windakirin dê ew bi xwe biçin. Nexwe em nikarin vî şerî bidin rawestandin. Bi gelemperî jî kesên ku dixwazin me bixapînin an jî xwe dixapînin winda dikin. Dema rêveberî jî rola xwe nalîze, ez yekser vê fêm dikim. Jixweber diyar dibe ku rêveberî çiqasî bi şervanan re eleqeder dibin. Hûn bi vê xwe didin dest. Dibe ku bi salan wisa fêr bûne, bes di encamê de hûn nikarin xwe ji berdêla wê ya bê dayîn rizgar bikin. Hûn ê pirsên weke; "Nexwe, ev pîvana PKK'ê ya tê behskirin çiye? Gelo ez di kîjan asta vî karî de me? Gelo jêhatîme ku vî karî ser bixim? Cewhera karên li vir çiye? Çi çawa tê destgirtin û çawa tê serxistin? Bi rastî ez bi van pîvanan dijîm?" ji xwe bikin. Hûn ê pişgiriya ku ji me digirin wisa xirab bikar neyînin. Ma min ji we re got fermandariyê wisa bikar bînin, rêveberek wisa bin? Hûn van tevan ji ber xwe derdixin û di encamê de jî dibêjin; "Ma çima kesayeta me nayê pejirandin?"

Weke Rêbertî kesayetek wisa me, hêj di heft saliya xwe de ji ber ku pîvanên wê ji bo min paşketî bûn, min dayîka xwe red kir.

Vêca ez ê çima we bi vî halê we ve bipejirînim? Salane bi pîvanên mirovên pêşketî ve mijûl dibim. Hûn çawa dikarin mirovek ku her tiştê xwe ji bo vê rêxistinê feda kiriye û henase bi henase dijî bixapînin? Gelek ji we di wateya giştî de di nava refên me de tên îdarekirin, nexwe em we weke milîtanên PKK'ê yên rasteqîn nameşînin. We îdarekirinek erzan û hatine îdarekirin hêjayî xwe dîtiye. Lê belê, nêzîkbûna me ne wisa ye, em vale najîn û birêve nabin. Ger hûn ji xwe bawerin û li hember xwe rêzdarin, wê demê êdî ji xwe bipirsin pîvanên rast çine. Mane we gotiye; "Ez hatime şer bikim û bibim endamê partiyê?" Gelo zehmete mirov van fêr bibe? Nêzîkbûnên me cewazin, em li ser we tevan pîvanên PKK'ê yên hişk ferz nakin. Me şerte em bi zorê serê we bitewînin, weke quralên artêşa Tirk li ser we ferz bikin? Gelo rêveberiyek wisa, li gorî bîrdozî û baweriyên me guncave? Hûn dixwazin zextek li ser we hebe. Rêbezên hûn dixwazin bi şêweya; "Yan em qet nikarin bên cem hev, an jî dema em hatin jî bi zorê werin û hevdu biçewsînin" pêş dikevin. Jixwe diyare hûn qet nikarin bi vê xwe bigihînin ti cihî.

Hûn ji ferdperestiya xwe pir kêm tawîzan didin, lê dema firset jî derdikeve hûn hewl didin hemû tawîzan ji partiyê bistînin. Ev partî, ne partiyek wisa tawîzan bidê ye. Partîparêziya PKK'ê, weke Emerîkayê gotî partiyek 'Dijware." Vê di mejiyê xwe de bicîh bikin. Dijwariya PKK'ê, ji ber ne partiyek tawîzkare û tawîzan nade kesan. Di dilê we re çi derbas dibe bila be, hewldanên we çi dibin bila be, hûn nikarin di nava partiyê de parsekiyê bikin û tawîzan bigirin. Pêşî bipejirînin ku PKK, PKK'yek wisa ye û li gorî wê hesabên şaş nekin. PKK di vê qonaxê de, di wateya teqez de dema hewce kir di nava xwe de amûrek teknîka herî pêşketî, dema hewce kir, mirovê dilsoz, dema hewce kir weke leşkerek herî wêrek û leheng partiya dana şerkirinê ye. PKK dibêje; "Wê tu li her eniyê weke kesek bêhempa şer bikî." Ji bilî vê mafê xwe wisa bijî, evqas heqê te heye, evqasî keyfê bike, ferdperestiyê bike nade ti kesî. PKK di vê wateyê de, rêxistinek lehengiyekê ye. Rêxistina lehengiya kedê, lehengiya hevbeşî ye. Pêwîste hûn jî ziraviya vê fêm bikin.

Ev di heman demê de quralê danasîna rêxistina pêşeng a rastiya civaka me û gelê me bi şoreşê derbaskirine û rêxistinek li gorî wê guncav avakirine. Di wateya we fêm kirî de partîbûn çênabe. Ango ji vê rewşa heyî ya feraseta partîbûnê yekîtiya ehpap-çawîş tê sazkirin an jî konê hembajarî saz dibe, lê partî ava nabe. Partîbûna em dimeşînin, weke Emerîka jî fêm kirî partîbûnek pir "xirabe" ye. Dixwazin qebûl bikin an jî nekin, heta ku ez hebim tawîzan nadim vê. Me bi minet û tikayan bangî kesî nekir. Em bi xwe bawerin û nirxek mezin didin partîbûnek wisa.

Hişê xwe bînin serê xwe, ger xoşa we naçe hêdî hêdî xwe bidin aliyekê. Dibe ji ber ku hûn ji ber şanaziya xwe nikarin yekser xwe bidin alî, lê hûn ê rêyek vê jî bibînin. Ez kesek mirov herî baş nas dikime, min dewlet jî dahûrandin. Ma hûn ê min bixapînin? Weke din qet hewl nedin ku hûn min erzan bixapînin, ji ber ku ne gengaze hûn min bixapînin. Ger di vê cîhanê de kesek ku neyê xapandin hebe, ew jî ez im û min ev selmandiye. Dema em dinêrin mirov bi navê miletekî dikare çi derbixe holê, jixwe tê fêmkirin ku kî cîhanê bikar tîne. Vêca li şêwaza fermandarên me yên bikaranîna PKK'ê binêrin: Ma dê heta ku derê bikar bînin? Gelo dê bi jiyana erzan heta ku derê PKK'ê bikar bînin? Gelo bernameya PKK'ê vê dipejirîne. Ma bernameya PKK'ê ya jiyana azad heta kure, çi ji kes dixwaze û ev bi çi ve girêdayî ye? Hûn van pîvanan berhev nakin, dibêjin; "Deka xwe bijîm." Ji ber hûn firsendê ji vê re nabînin jî pir hêrs dibin. Ez di rûyê we de hêrsê dibînim. Bes ti carî ne hatiye dîtin ku hêrs tiştekî çareser bike. Rewşa we weke zarokên ku dilê mirov bi wan dişewite, mêrxasên ku dibêjin; "Dê rewşa me çibe?", keçên dibêjin; "Wax, dê kî xwedî li me derbikeve?" ye. Ez van asayî nabînim.

Dema me gava xwe ya destpêkê li hember malbatê û pergala sazîbûyî avêt, em nediketin destê kesî û wisa jî weke we ne tirsonek bûn. Hûn dibêjin; "Baskên me hene" û diferfitin, lê nikarin bifirin. Hûn weke kêvroşkên kedîkirî ne. Yê dixwaze dikare we li cihê dixwaze bigire. Feraseta we ya azadiyê evqase. Lê ya min ne evqase. Ez hêjî nehatime girtin. Ma dijmin kengî dixwaze we nagire û li we naxe? Ma hûn di her xebatê de şaşiya ku dixwazin

nakin û zerarê nadin partiyê? Ev jî tê wateya ku hûn weke kêvroşk an jî mirîşkên kedîkirî tevdigerin. Rastiya xwe baş bibînin. Firîna azad û neketina dest şaş fêrî we kirine. Hûn tenê dilawerin. Dema dilawer an jî zîrevanê kolanê yê herî baş tê, tenê rola we heye ku hûn bêjin; “Fermo axayê min” û ma ji bilî vê ti rola we heye? Ev dilawertî li cem me derbas nabe.

Gelek encamên girîng ku hûn ji van derbixin hene. Ger hûn bi dilsozî şoreşê û şerê wê yê ku heta niha ji aliyê Rêbertiya PKK’ê ve hatiye meşandin ve girêdayî bin û hêza we têra vê dike, pêwîste hûn hemû pîvanê xwe ji nû ve di berçavan re derbas bikin. Dibînin ku êdî hinek ji we bûne kevir. Hûn tam di rewşa bûyera nexweşxaneyê de ne. Ez ê çi ji we bikim? Hûn çawa tenezilê vê dikin? Şervantiya herî mezin, şervantiya ku hûn di hinavê xwe de pêk bînine. Pişta xwe dana hêza PKK’ê û çarçûrkirina nirxan rewşek pir xetere, heta xayîntiyek objektîfe.

Dîsa jî pêwîste mirov bi we bawer bike. Rexneyên ku em li we dikin, ji bo rê ji we re vekirinê ye. Ma ez ê cuda çi bikim? Cuda devjêberdin bibin xwedî gotin, hûn nikarin demdirêjî ruhê xwe jî bidin jiyîn. Ji ber em dijminê xwe nas dikin û wisa dijîn, em neçarin vekirî bin. Ger hûn dibêjin; “Bi me re egîdî heye”, ez ê li ser vî bingehî bi we re baxivim; na ger hûn ne wisa bin, zû-dereng hûn ê derbikevin holê û biçin. Lê diyare ku gelek ji we dixwazin şer bikin. Ez dixwazim feraseta we rast bikim û çareseriya pirsgirêkê ya rast bidim fêmkirin. Ji kur dinêrin binêrin, dihizirim ku pêwîste PKK’yîbûna rasteqîn wisa be. Di nava PKK’ê de nabe ku wisa bêberpirs bê şerkirin. Şêweya şerê we li gorî min pir xetere. PKK, evqasî derî ji dijminê xwe re venake. PKK, evqasî bêxem û bê fikar nabe, şêwazek wisa erzan û keyfî şer nake. Niha jî hûn tam berovajî vê ferz dikin.

Di jiyan, rêxistin û ziman de, nexasim weke karê herî giran di şer de bi şêwazek ku hûn nikarin kêlekê re jî derbas bibin, çi tiştê di bin navê fermandarî de heye digirin û dibin. Vêca çi eleqeya vê bi fermandariya ku PKK esas digirê ve heye? Hema bêjin hinekan PKK, ji destê PKK’ê diziye û diçe. Di raporekê de tê gotin; “Em rehîne tên girtin.” Nirxên PKK’ê yên asta bîrdozî û siyasî bidest

xistine rehîn tên girtin. Eşqiyayek çiyê yan jî ewareyekê pere, şervan û rêxistina PKK'ê rehîn girtiye. Ev jî tê wateya ku hûn ji bilî rebentiyê nikarin bijîn. Hûn mirovên çawa ne,  ma her tim ez ê we ji destê dijmin, ji destê ewareyên di nava PKK'ê de û her wiha ji koletiya nava we rizgar bikim? Piştî we evqasî xwe aniye rewşa rizgarkirinê ez ê çi ji we bikim? Jixwe ji ber ku we evqasî xwe aniye rewşa berxê qurbanê û li ser kêlekê razane, kes xwedî li Kurdan dernakeve û kes naxwaze peyva Kurd ji devê xwe derbixe. Di raporên we de jî yek cihên we yên vekirî ne mayî yan jî netêkçûyî nemaye. Dil, mejî, fîzîk, an jî her cihê we kunkunî bûye. Ev jî kesayeta ku hatî kuştin rave dike. Em jî li vir hewl didin vê kesayetê ji nû ve ava bikin. Ger evqasî fikrê we nesazûmankirî be, helbet wê dijmin li her cihê li we bixe. Ruhê we çiqas hatiye belavkirin, hûn dilreş bin, we nesîbê xwe zêde ji moral û îrade negirtibe, tê wateya hûn ewqasî tine bûne. Kesek ku moralê xwe wisa, dê bibe çavkaniya bê moraliyê. Ango kêfxweşî û îdîaya we ya jiyanê nîne. Qaşo bila yek were we rizgar bike! belê, de bêjin, ev navê çiye? Dema firsendê dibîne, bê ku ti quralî binase rojek jî be cîhana xwe erzan jiyînê ye... Em bi vê astê re şer dikin û dibêjin ku; "Ma hûn ê van derbas bikin, an jî niyeta we ya derbaskirinê heye?

## PKK'yîbûn Sêlmek Pêkanîna Qonaxên Mezin A Mirovahiyê Ye

Gelo hûn di kîjan asta azadbûnê de ne? Heta ku şerên mezin neyên meşandin, ruhê we girêdayî tayê pembû ye, hûn bi tiştek herî biçûk tên xapandin; kûranî, rêzdarî û hezkirinê bi cewher nakin. Ger em we di halê we de bihêlin, kî dizane hûn bikevin çi halî. Elbet em naxwazin vê rewşa we weke çarenûsekê bibînin. Em nabêjin hûn naguherin û venaguherin. Di vê xalê de PKK, bi rikek mezin navê veguhertinê ye. Hûn ê jî werin guhertin û veguhertin. Gelo hûn bi rewşa xwe ya heyî re dikarin çi rizgar bikin? Ger a heyî têra rizgarkirina rewşê kiriba, qet pêwîstî bi PKK'yîbûnê nebû. Niha jî heydedanên PKK'ê hene. Ger em we bi vî halî ve bihêlin – gelek tiştên wisa yên berbiçav hene- hûn ê di demek kin de hevdu bêkar bihêlin. Kesên ku pêwîste pir rehet bi hev re bimeşin, hevdu naecibînin. Ger firsendê bibîne, dê qet ni yê din re nemeşe. Kes ji bilî çend ehpap-çawîşên xwe hewce nabîne bi yeke din re be, heta li dijî vê ye. Ya herî girîng jî, meyla wan li ser jiyana hêsane û di berzbûnê de ne bi israrin. Niha firsendê bidin me, ma kî ji we tenezilî jiyana di nava sînorên kesayeta Kurdê hêsan nake? Daxwaz û bêriyên we tevan jî wisa ye. Bes ez napejirînim. Şêwaza Rêbertiyê ya di vir de, jiyana meyla we li ser napejirîne.

Xalek pir xirab ku Emerîka dibêje di vir de ye. Ev şêwaza ferdperest dibêje; "Em pariyekê bavêjin, Kurdan jî îdare bikin, bihêle bila ev mirov hinekê jî wisa bijîn." Ez jî li hemberî vê dibêjim, lenet lê were, nadim jiyîn. Bes hûn tenezilê vê dikin, heta kêm maye bêjin; "Bihêle em hinekê wisa bijîn" û digirîn. Di nava her tiştê hûn dixwazin bijîn de pîsî heye; hûn dixwazin ji birça bimirin, em vê bi we nadin xwarin. Em weke rastiya Rêbertiyê di

vê mijarê de bi îdîa ne. Ji ber ku di nava vê jiyanê de jehir heye. Ger hûn vê bixwin, di wateya azadî û berzbûnê de, yan jî di wateya ger hebe hinek nirxên ku em rizgar bikin de, hûn ê bimirin. Hemû şêwazên jiyana ku meyla we li ser heye, misoger weke şêwaza jiyanek masiyek ku li şewkekê aliqiye. Ger hûn dev ji vê şêwaza jiyanê bernedin, hûn ê weke masiyê ji avê derbikevin, dê we bixin nava selikê û paşê jî biqelînin. Pêwîste hûn dakevin binê deryayê û xwe ji van şewkan rizgar bikin. Ger hûn bêjin; "Ditirsim, hêza min têrê nake" ma ez ê çi bikim? Şewka xwarinê we rizgar nake.

Di vê cîhanê de kesek bi qasî min jiyanê hez bike nîne. Hêjî di bîra min de ne ku, min ji bo nanekê çawa şer kiriye, çawa êrîşî nan kiriye, şerê xwe çawa dijwar meşandine. Ti zarok bi qasî min neşatire. Min hewl dida hinek tişt bi qasî hêza xwe bidizim. Min hemû kulekên mala me serûbin dikirin bê ka çi tiştên veşartî tê de hene. Lê niha tenezilî tiştekê nakim. Min di helwestên xwe de pir dijwar israr kir, bes piştre lênêrî ku wisa nabe, ji ber ku min fêm kir rêya jiyanê ne di vir de ye û em jî li pey jiyanê ne. Ji ber ku ez şopdarek bêhempa yê jiyanê bûm, min tiştê berê lê geriyabûm dîtin, bes ên min dîtin jî vale derketin. Niha berovajî meylên xwe yên destpêkê nakevim, tiştên lê digerim di rastiyê de berdewamiyek wê ya xwezayî ye. Yeqîn dikim, we xwe di astên herî jêr de sînordar kiriye yan jî hepis kiriye. Di rastiya Rêbertiyê de jî rewşek tam berovajî van heye. Niha jî li şûna hûn van bibînin û derbas bikin lîstokan dikin, baş diyar dikin ku hûn ê ji bo van çawa lihev bikevin û çavên hevdu derbixin. Dema we di vî halî de dibînim hem xemgîn dibim ku hûn çiqasî bûne PKK'yî, hem jî li we dinêrim û dikenim.

PKK'yîbûn, sêlma xwe gihandina qonaxên mezin ên mirovahiyê ye. Em PKK'ê wisa digirin dest. Ti xisleta PKK'ê ya weke li ser vê sêlmê wisa rehet rûne û bixwe nîne. Ûtopya, hunera silêm gihandina asîmana ne. Dawiya vê sêlmê nîne; heta ku hêza we têrê dike, hûn ê vê sêlmê bilind bikin. Ev sêlim balkêşe, ji ber ku bilindbûnê rave dike. Hûn wisa di nava jiyanek bê ûtopya de hiştin, li we heqarete. Ji ber ku ez vê jiyanê hêjayî xwe nabînim, tevî her tiştî vê astê neçar dikim. Mixabin hûn dibêjin; "Em dev ji

vê jiyana qirêj û gemar bernadin”, bi qasî quruşekê jî nirx nadin vê jiyana me. Hûn nikarin di helwestên xwe yên weke “Em westiyan” de israr bikin. Ger hûn biwestin jî, dîsa jî hûn ê vê jiyana me hilbijêrin. Vaye ev terbiya PKK’ê ya herî mezine, rêgeza perwerdeya PKK’ê ya rasteqîne. Ger hûn xwe bispêrin vê rêgez ê, tê wê wateyê hûn di nava PKK’ê de hene. Lê ger hûn xwe nespêrin vê rêgezê, hûn ê ji PKK’ê dûr bikevin. Elbet ev jî gaveke, ya pey wê re jî karên weke hunera şer, hunera rêxisitnê û hunera rêveberî ya di nava PKK’ê de bêhempa destgirtine. Hûn di van mijaran de hêj lewazin.

Hinek ji we dibêjin; “Me her tiştê xwe li gorî vê rêgeza bingehîn fedayî PKK’ê kir.” Her kesê ku tên refên me di rêgeza xwe fedakirinê de ji min zêdetir pêşveçûyî ne. Dibe ku min evqasî xwe fedayî PKK’ê ne kiribe, lê we xwe feda kiriye. Ji vê fedayîbûna we re, dikare teslîmiyeta PKK’ê jî bê gotin. Hûn dibêjin; “Min vîna xwe teslîmî PKK’ê kiriye.” Lê ev bi şêweyek din ve teslîmbûna dijmine. Mirov teslîmî PKK’ê nabe, ji ber ku PKK ne tevgerek teslîmgirtinê ye. PKK, tevgerek **beşdarbûna azade**. Nêrîna min vîna xwe teslîmî PKK’ê kir, tê wateya ku ji bo pêwîste ez bêm rizgarkirin ji ber vê min xwe avêtiye nava PKK’ê. Peyre jî hinek dibêjin; “PKK, çi ji me dike bila bike”, hinek jî dibêjin; “Min keç û kurê xwe da, PKK çi dike bila bike.” Ev tê wateya tu milkekê bigire çawa dixwazî bikar bîne. Nabe ku mirov di nava PKK’ê de weke milk be. Tevlîbûna ji PKK’ê re, tevlîbûnek dile, misoger tevlîbûnek fikrî û mejî ye. Ev destpêka kare.

Di vê mijarê de aliyê ku bê rexnekirin, li şûna bi şêwazek rast tevlîbûn ji PKK’ê re çêbe, feraseta xwe teslîmkirinê ye. Na, hûn ê xwe teslîmî PKK’ê nekin. Hûn ê xwe tevlî PKK’ê bikin, bêjin; “Ez hatim tevlî PKK’ê bibim û peywiran parve bikim.” **Parvekirin**, hevbeşbûn, hevbeşbûn jî tevkarî, ango yekbûnkirina kedê ye. Ev jî tê wateya yekbûnkirina keda bîrdozî, heta çalekiyên şer. Ger tevlîbûn di wateya teslîmbûnê de be, wê bê wateya “Min weke kevirekî dane aliyekê, weke lîstokvanekî bikar bîne û weke xizmetkarekî li gorî dixwazî binirxîne.” Ev jî reda regez hevbeşkariyê ye. Ji ber dê misoger li ser vê ferasetê dîktatoriya

takekesî bê sazkirin. Kesayetên fermandar û ferasetên tasarufên em rexne dikin, li ser esasê van cure tevlîbûnan bilind dibin. Împaratorên Romayê li ser koleyan bilind bûne. Împaratorî jî şêwaza rêvebirina pergala koletiyê ye. Demokrasî jî şêwaza rêvebirina gelên ku şiyar bûne û vîna xwe danî holê ye. Şêwaza tevlîbûna we ya ji PKK'ê re, devjê berdin xwe bigihîne pîvanên demokrasiya gel, dişibe tevlîbûna koleyên serdema Roma'yê. Heta ku di nava PKK'ê de şêwaza tevlîbûna koletî neyê derbaskirin, dê her tim rehetî li ser van koleyan jî împarator derbikevin. Ger şêwaza we ya fermandarî jî bi vî halê xwe ve bidome, dê we ber bi împaratoriyê ve bibe. Xweziya ev çêbûya, lê mixabin di nava me de împaratorî pêk naye, ji ber ku hûn kêfkariyên xwe yên pir xoşa we diçin li ser me ferz dikin. PKK, ne cihê kêfkariyên xwe dana axaftin û ferdperestiyên xwe têrkirinê ye. PKK, cihê dibe ku ji mûminekî yan jî derwêşekî zêdetir xwe helandinê ye.

Ji bo em hinekê van karan pêş bixin, asta siyasî bi we re didin avakirin. Em rêbertiya siyasî dikin, pêwendiyan di astek têrkar de saz dikin û dimeşînin, dîsa ji bo xebatên leşkerî amadekariyan dikin û di rastiyên herî bingehîn de israr dikin. Bes hûn dîsa jî bi vê re ahengê najîn. Gelo hûn di kîjan asta siyasî de ne? Ev bi salane em asta pêwendiyên rêxistinî li ser we ferz dikin, bes hûn di navbera xwe de pergala pêwendiyek rast jî saz nakin. Di mijara ne zepturepbûna we de hûn yekemînin, ango di hunera pêwendiyan de di rewşek pir xeter de ne. We xwe negihandiye şêwazek leşkerî jî.

Niha kesayetek fermande ya bi îdîa pêş nakeve. Şêwaza hemû fermandarên we yan întîharî ne, yan jî bi qasî bikare yekîneyek şer a mezin bi salan serberedayî bihêle di astek bêberpirsyare de ye. Gelo hûn dixwazin di van mijaran tevan de pêş bikevin? Gelo di hunera şer û rêxistinê de îdîayek we heye? Hinek peywirên ku pêwîste pêk werin hene, bes ji ber ku hûn xwe weke milkekê davêjin nava partiyê an jî ji ber ferdperestî û tasarufên xwe her tiştî li gorî keyfa xwe dikin, hûn nikarin vê hunerê saz bikin. Gelo hûn ê xwe ji vê rizgar bikin? Gelo hûn bikevin ferqê ku di nava PKK'ê de kar bi ziraviya hunerê tên meşandin û bikarin di vî karî de bimeşin? PKK, ne rêxistinek wisa hûn dizanîne, rêxistinek di şêwaza min

destnîşan kirî ye. Hûn dibêjin; "Em PKK'ê, weke rêxistinek wisa pêşketî, têk naçe û şerê xwe bi serkeftî dimeşîne bibînin wêdetir, weke rêxistinek ku her yeke ji me dikare bêrî û meylên xwe bide axaftin bibînin." Însafa we li kur ma? Gelo rêxistina wisa ya bêriyên we dikare rojekê jî rizgar bike? Dibe ku hûn niha dikarin bijîn, qet nebe ewlehiya ruhê we û dibe ku hêviya we heye, bes dê wê demê ev jî nebin.

We gelek caran xwe xapandiye û wisa fêrî jiyînê bûne. Ezmûnên we yên jiyanê, hûn bi yên herî teng û bê aso ve sînordar kirine. Ji bo we ezmûn an dikuje, yan jî pir tenge. Bê ku ti encamî derbixin hûn di radeya "Li vê cîhanê tiştek bandor li min nake" de digirin dest. Baldariya kesên siyasî û PKK'yî wisa nabe. Ger xisletên we pir teng, nebihîstî û lêdanê ve hişk bibin, hûn weke zarokan hatine mezinkirin, ez ê çi ji we bikim? Ev jî rebentiya we derdixe holê, tiştek din rave nake. Ji ber vê ger hewce bike xwe ji heft salî ve hewl bidin ji nû ve ava bikin. We şaş dest bi jiyana civakî kiriye. Her tiştê we bingehek şaş avêtiye û hûn xeter hatine mezinkirin. Di nava vê mezinkirinê de nirxek hêjayî girtina dest nîne. Dayîka we rebene, hûn rebenin. Kesên hûn mezin kirine hêviya serkeftinê danin aliyekê, nikare xwe ji nexweşketinê jî rizgar bike. Ez di vê mijarê de neheqiyê li we nakim. Hinek kar didim mezinê we jî, biçûkê we jî. Bes hûn ne li cihê vî karî ne. Gelo di nava we de kî heye bêje; "Min xweşik, di cîh de û serkeftî jiyan kir?" Çend kes hene vê mînakê diyar bikin û li kurin? Dema hûn a hêvî dikin nabînin, yekser hêsan bêhêviyê dijîn û dibêjin; "Êdî ev kar qet nabe." Ev jî yek nêzîkbûnên herî xetere. Hûn ji kur dizanin ev kar nabe? Vaye ev kar dibe. Çalekiya PKK'ê jî dema feraseta nabe tê ferzkirin, tevgera herî mezin a dibê ye. PKK, li her cure hebûna we, rebentiya we û sivikbûnên we dixe, parçe dike û binêrin a çêbûna xwe pêk tîne. Vî karî hêsan nebînin, ev şerkertiya herî mezine.

## Qonaxa Jiyanê Ya Herî Hêja Beşa Partîbûnê Ya Rasteqîne

Kesên ku partîbûnê saxlem pêk tînin, şervanên herî berzin. Kesên ku hêza wan têra partîbûnê nake, kîjan xisletê wan xurt dibe bila be, heta çiqas şer dikin bila be, wê zû-dereng, li vir an jî wir, misoger kesayetên ku rê ji binkeftin û zerarên girîng re rê vekine. Êdî tam wextê bi PKK'ê bawerkirinê ye. Her çendî dereng jî be di derbarê hinek tiştan de li xwe mukir werin. Bêjin; "Divê bi vê PKK'ê bawer bim û PKK'yîbûnê rast bigirim dest." We heta niha xwe di bin postê her cure de da jiyîn, êdî vî postî bavêjin. Rastiya we çibe, hûn wisa ne. Ez her roj wisa xwe tevlî dikim. Hinekê jî jidil û cewherî bin, daku mirov bi we serfiraz bin. Pîvanê vê jî hûn çiqas PKK'yî ne. Di nava we de çi jin, çi jî zilam dibe, kesek ku ji bo partîbûnê bibe mînak û mirov bêje; "Partîbûnê pir baş pêk tîne" nîne. Qonaxa jiyanê ya herî girîng, beşa partîbûnê ya rasteqîne. Divê hûn çav berdin vê. Divê hûn çavreş, evîndar û hezkiriyê vê bin. Ji bilî vê her tişt axaftina vale ye. Diziya di jiyanê de, yan jî israra di zimandirêjiyê de we nagihîne ti derî. "Dijwariya" PKK'ê wisa ye. Bersiva herî bi bandor a em bidin rapora Emerîka jî wisa ye.

Hewl didim vebêjim ku Emerîka çima me di cîhanê de weke partiya herî xirab bide diyarkirin. Ji ber ku rika me dît. Emerîka hemû tevgerên rizgariya netewî û tevgerên komînîst serûbin kir û li gorî xwe xistin nava qalibekî. Dema dor tê me yan jî tê min misoger me fêm nake. Weke ku fêm nake, her cara me dixe nav diranê xwe yan weke kevirekî çeqil diranê xwe dişkîne, yan jî dîn dibe û ji devê xwe davêje. Bes hûn devjêberdin di navbera diranê Emerîka de, hûn di navbera diranê hemalên Emerîka yên di rêza sêyem de weke nokê ne. Pêwîst bû hûn vê fêm bikin. Ez çi bikim

we fêm nekiriye? Min kêm behsa xwe ji we re nekir.

**Kemal Pir**’an, **Mazlum**’an, **Hayrî**’yan banga PKK'ê du hundur de sererastkirinek bingehîne û milîtanên girêdayî vê ne. Bila kesên nû beşdarî refên me dibin bê ku wext winda bikin, bi şêweyek çavreşî vî şansê xwe bi pîvanên PKK’ê ve baş binirxînin. Kesên kevin jî bila bi feraseta “Em ji ku dera şaşiyê vegerin sûde” ve bi hêza ezmûna xwe ve xwe veguhertinek eslî bi xwe re çêkin. Mezinbûn, ji kok ve vegera ji şaşiyê ye. Lê kesek bêje; “Ez ê carek din bi helwestên zirav ve bixapînim”, wê bi şêweya kesayeta ku di zimanê civakê yê siyasî de dibêjin weke ceban rol bilîze. Di zimanê siyasî de wateya vê, her roj heman şaşî dûbarekirin, xwe bi wê têrkirin an jî jiyan tenê wisa dîtine. Elbet ev xetere. Encamê ku pêwîste ji van tevan bê derxistin, divê ev kar saxlem bên destgirtin. Kesên ku nekarin kar saxlem bigirin dest, misoger ne ji ber nezantî, ji ber xisletên ku min destnîşan kirîn karan vale derdixin an jî dixwazin vale derbixin. Dê ev jî zû-dereng wan jî vale derbixe.

Di vê manê de em ti carî ji rêgeza PKK tevgerek berzbûnê ye venagerin. Ji ber ku ewqas nirx, ewqas îşkence, ewqas egîdî, ewqas xwîna şehîdan li holê heye, mafê yek ji we nîne ku bêje; “De berdin, ez dixwazim li gorî xwe bim.” Mafê min nîne ku bêjim; “Dev ji min berdin, hinekê bêhna xwe vedim, şêwaz û tempoya xwe hêdî bikim.” Hûn ê vê fêm bikin, ger fêm nekin nayên pejirandin. Ne ku ji ber vê dixwazim, ji bo li naverastê nirx hene dibêjim. Êşên mezin çawa didin hizirandin, çawa noqî êş, rik û hêrsan dikin? Dilxwaziyên mezin û îdealên jiyana mezin çawa bi çoş dikin? Nirxên ku ji destên me tên derxistin divê me çawa bi feryad û fîxanê bixe? Min xwest van tevan vebêjim. Bes eleqeya we zêde bi van têgehan ve nemaye. Hema bêjin hûn vê li ser min ferz dikin; “Ma em xwe ne li gorî van têgehên mezin, li gorî têgehên biçûk bidin jiyîn dê çi bibe?” Ger dev ji we berdim dibe ku hûn bikarin yek-du rojan bijîn, bes hûn nikarin encamekê ji vê bi dest bixin.

Di ruh û dilê we de kêmaniyekê dibînim. Dema binkeftina mezin tê li ber derî, ger dilê we yekser ranewestê, hûn ji şerefê dûr ketine. Dema di vê dozê de binkeftinek mezin li derî dixe, hûn

nikarin bêjin; “Ji bo me rêya jiyana takekesî vebû.” Ez pir vekirî vê xeteriyê dibînim. Dema binkeftin nêz dibe, pir rehet dilê we dihîse ku xwe bide jiyîn. Lê dilê min piştî salan dibîne. Di heman demê de hemû xeteriyên ku tên jiyîn dibîne û tenê ji bo li ber xwe bide dijî. Ji bo bikare li hember binkeftinên ku dil rawestîne de pêş bikeve liberxwe dayîn hewce dike, ger gengaz be vê binkeftinê weke çarenûsekê nepejirîne û pêşî lê bigire, ger dê ew dil bijî jî pêwîste ji bo serkeftinê kar bike. Gelo hûn dilê xwe li gorî vê rêgezê didin karkirin? Dema ji xwe bipirsin gelo dilê we wisa ye yan na? Haya we ji dil nîne, bes dîsa jî hûn carê xwe xwedî dil dihesibînin. Girî û nalînên we tev, ji bo we bi xwe ne. Ger hûn ê bigirîn ji bo nirxên mezin bigirîn. Dema hûn xemgîn jî dibin, kêfxweş jî dibin, li xwe difikirin. Nabe ku di navenda xemgînî û kêfxweşiyên me de jî em hebin. Pêwîste di navenda xemgînî û kêfxweşiyên me de şer, gel û pêşketinên dîrokî hebin, da ku wateyek van hebe.

Ez li hember kesê qaşo xwe dike çavkaniya kêfxweşî, xemgînî, êş û coşan jî pir hêrs dibim. Hûn çima evqasî xwe sivik dikin? Hûn çima evqasî di xwe de israr dikin? Vê pîvanê didim we tevan: Misoger ne di xemgînî, ne jî di kêfxweşiyê de hûn bi xwe nebin. Weke ku dê nirxên giştî, pêşketinên erênî yên giştî dê we tevlî coşa jiyan û hezkirinê bike, dê neyênî jî we bi hêrs bikin. Hûn xwe û hevdu dikin pirsgirêk û dibêjin; “Wê rojê moralê min xirab bû.” Wexta hûn yek-du ehpap-çawîş an jî nêvengek li gorî keyfa xwe dibînin, bi we re kêfxweşiya jiyanê ava dibe. Ev şaşiyek mezine. Partîbûn jî derbaskirina rewşên hestên wisa ye. Di vê wateyê de zêde hezkirî, kêfxweşî, xemgînî û êşên min ên di derbarê min de tine ne. Heta hemû şaneyên xwe di bin bandora pêşketinên giştî de me. Pêwendiyek ku pêwîste taybet jî be, misoger ji bo xwe weke çavkaniya ne xemgînî, ne êş, ne jî kêfxweşiyê nabînim. Di wir de jî giştî difikirim, dibêjim; “Gelo çiqas li ser giştî bi bandor bûye?” Hûn ê vê fêm bikin, ji ber derbaskirina dilê biçûk di vir re derbas dibe. Gelo we evqasî tengbûn çawa jiyan kir, çima hûn evqasî bi xwe xemgîn bûn?

Bûyerên ku mirov mezin pê kêfxweş bibe pirin. Tevî ku ne bi keda we ye, îro di nava welatê me û gelê me de hinek rewşên ku

me kêfxweş bikin hene. Beriya her tiştî pêşketina me ya şoreşgerî didome. Çeperên me zêde dibin, hêjî çekên me di dest de ne. Aliyên ku me hêrs bikin û biqehrînin jî pirin. Ji ber ku çeperên şoreşê baş nayên bikaranîn, çekên me di destê hinek dizan de winda dibin, nirxên me tên çarçurkirin. Çavkaniyên me yên kêfxweşiyê pir mezinin û ev jî we ber bi pêşveçûnek bêhempa ve dibe. Lê çavkaniya we ya kêfxweşî û xemgîniyê jî, bi me fikrên weke; "Deka ez bi ser berpirsên van de biçim, da ku ruhê wan bistînim" dide gotin. Ev jî vediguherîne dijberiyekê. Ne zehmete ku ev bên fêmkirin û pêwîstiyê wê pêk werin, berovajî ya herî zehmet pêwîstiyên vê nepêkanîne.

Van tevan li ser esasê partîbûna rasteqîn û girêdana bîranîna bi şehîdan ve vedibêjim. Van weke bûyerên jirêzê negirin dest. Ez her tim weke şervanên PKK'ê yên rasteqîn **Mazlum**'an û **Kemal**'an dibînim. Destpêkê **Heqî**' hebûn. Ew ji bo me her tim nêzîkbûnên PKK'yî yên rasteqînin. Hûn tev bi derfetên weke çiyan ve di asta bîrdozî û siyasî de, di asta şerkertiya pratîkî de, hûn dikarin ji wan hezar qetî zêdetir bikin. Ji ber vê em nikarin dev ji vê xisleta PKK'ê berdin. Hûn ê jî wisa bin. Destûra PKK'yîbûnek din dayîn, destûr xwestin an jî tenezila nêzîkbûnên weke; "Valehî heye, derfetên berfireh hene" kirin, ev tê wateya îxaneta li van mezinbûnane. Ger hûn van baş lêkolîn bikin, xwe di terbiyekirinê de bi îdîa bin û weke şerek encamgir bipejirînin –yeqîn dikim duristbûn û niyeta we tevan a baş ji bo vê ye- hewldanên xwe zêde bikin, hûn ê bikarin vî karî bimeşînin û bibînin ku dikarin bibin milîtan. Niha ev hewce dike û em jî nikarin ji vê tawîzan bidin.

Emperyalîzma hemû cîhanê bûye yek, li bendê ye ku em ji vê tawîzan bidin. Jixwe aliyek vî karî ya ecêb jî ev e. Li nirxandinên dawî dinêrim, dibêjin; "Em PKK'ê nerim bikin, parçyeke jî be em PKK'ê veguherînin." Hêzên emperyalîst, nexasim Emerîka û Almanya li benda vê ne. Ger PKK li gorî xwe bibînin, dê hemû cîhan bibe ya wan. Sedema vê jî ne ku zêde pereyan bidest bixin an jî li ser Kurdistan û kedkaran mêtîngeriyê dixwazin. Ev ji bo wan bûye pirsgirêka rêgezekê. Dixwazin em ji rêgezan tawîz bidin. Di nirxandinên wan de navê Partiya Sowyetê ya mezin jî derbas nabe.

Partiya Bolşevîk niha ji bo tenê mijara pêkenokê ye. Gelê di Çîn'a **Mao**, Kore'ya Bakur û Arnawut de anîne rewşa gelê cîhanê yên herî ketî. Em baş dizanin ku heta duh **Enwer Xoce** çiqas radîqal bû, di bin navê xeta Arnawutê de çawa şeqşeqa xetekê dikir. Di rapora DYE de di derbarê wan de yek rêz jî nîne. Her tiştî ji bo me dibêjin, ji ber ku li vir tiştên nû çêdibin hene.

Di rastiya PKK'ê de gelek xalên ku pêwîste mirov baldar nêz bibe hene. Dewletek mezin weke xeterî nabînin, bes çima evqasî êrîşî PKK'ya ku li ser pira komkujiyê re derbas dibe dikin? Ger hûn sedema vê fêm bikin, hûn ê mezinbûna PKK'ê jî fêm bikin û ev serfirazî têra jiyanek heta dawî dike. Jixwe kesên wisa serfiraz dest bavêjin çi, dê wî karî ser bixin. Em behsa PKK'ê ji we re dikin, li her derî mijara PKK'yîbûnê bi kûranî weke perwerde tê dayîn. Dixwazim bêjim ku ev hem firsendek mezin, hem jî siûdeke. Ji bilî vê ger cîhanê jî bidin we, hûn ê nepejirînin. Bes derfetê we ya jidil pejirandina PKK'ê heye û dê ev jî hemû cîhanê bi we bide serxistin. Dê ev belengaziyên we tev bên derbaskirin, hemû bêrîkirinên we jî bicîh bên û tengasî û êşên we jî hemû hêdî hêdî kêm bibin. Ji bo vê hewce bike bi salan milîtaniyê bikin. Ma cuda çi karê we heye? Jixwe em weke civak bi komî betalin, bi qasî quruşekê nirxa me nîne. Bes ev tê wateya bi qasî ya hêja bi lezgînî kirina malê giştî, ji nirxên estetîk heta nirxên heyber, ji moral heta nirxên serkeftinê bidestxistina hemû nirxan. Mirov tenê ji bo vê şikir dike û dibêje; "Bijî ji me re ku xwediyê vê siûdê me" û ya peyre jî hewldan dixwaze. Jixwe tişta ku mirov dike mirov jî hewldane.

Weke min diyar kirî, jixwe karek me din jî nîne, em dikarin pir kar bikin û mezin bidest bixin. Ger hûn şerên pir girîng plan bikin, hûn ê li gorî şêwaza xwe bidest bixin. Hûn ê bikarin bi vê cîhanê jî bidest bixin. Ma êdî hûn çi dixwazin? Karek din nanek somon jî bi destê we nakeve. Niha ji sedî heştî welatê me betale, bixwazin jî nikarin karek ku nanek somon bidest bixe jî peyda bikin. Hewce nake ku bê gotin çiqas ne kêfxweşin, çiqas ketîne, çiqas di rewşek ketî û lenetî de tên girtin. Gelo dilşadin û serfirazin? Ma xwe dijîn? Ma jiyana wan a malbatî heye? Kes bi qasî quruşekê jî nirx nade

wan. Ev rastiyên ku tên jiyîne, ne min çêkirine. Ez misoger tiştên weke xwarin û vexwarinê girîng nabînim. Ji bo min her tim tişta xweş pariyek nanê ziwa û savarek hebe bese, li kêlekê jî pîvazek jî hebe tiştek ser wê re nîne. Em dikarin jiyanê wisa bimeşînin. Tiştên ku min têr bikin cewazin. Ji bo xwe tevlî serkeftinek girîng kirin, naveroka PKK'ê pêşxistin, qadroyên wê pêşxistin zewqa herî mezine. Xwe tevlî fikrek afirîner, rêxistinbûnek pêşketî û çeperek bidestxistin, zewq, hez û dildariya min a herî mezine. Jixwe ger ev pêk werin, dê yên din jî jixweber çêbin.

Tevî ku gel birçiye, gelo me qet hûn birçî hiştin? Tevî ku hemû cîhanê dixwest me tengav bike, ma karî tengav bike? Mane em her tim berfireh dibin? Nexwe, tevî van rexneyên me yên hundurîn tev û vî halê we, ger em hîn zêdetir ked bidin, tiştek ku em bidest nexin nîne. Ger hinek rasteqînî xwe beşdarî vî şerî kiriba, gelo dê me ne ji mêj ve ser xistiba? Hûn dest davêjin kîjan xebatî bavêjin, mane êdî di astek bêhempa de derfetên bidestxistina madiyatê jî, manewiyatê jî ronî bûne? Na ger tevî van hûn dibêjin; "Ji bo me koletiya kevin û şêwaza kevin hewce dike", ez jî dibêjim; "Ew ya herî bi lenete." Ev hem hatine selmandin, hem jî êdî hatine derbaskirin. Ger hûn van bixwazin jî, hûn êdî nikarin van bijîn. Me li welatê xwe jî koka vê ji binî ve rakir. Êdî gelê me lawê wî yê eslî jî be ger di vê rewşê de bijî tifî li rûyê wî dike û dibêje; "Tu nikarî ji bo ya kevin bibînî vegerî." Li gorî ku ev rastîne, nexwe divê hûn jî PKK'yîbûnê weke siûdek mezin bigirin dest.

Tevî van zehmetiyan, hêjî jiyan û azadî min ber bi xwe ve dikişîne, di cihê xwe de nasekinim. Her tim dibêjim xweziya bikarim dirêjî vir bibim, dest bavêjim wir. Lê me xwe gihandiye milyonan û gelek derfetên me yên pêşketina bê sînor hene, dîsa jî van têr nabînim. Ev tiştek başe, pêdiviya me jî bi vê heye. Ger ji bilî vê tiştek din a bihata jiyîn hebûya, dê min gotiba; "Bila ya we be, bijîn." Bes naxwazim di yek şaşiyekê de firsendê bidim we ku hûn xwe bi xwe bixeniqînin. Ji ber ku em biçûk mayînê û biçûk xistinê hêjayî we nabînin pêşiya vê ferdperestiya we digirim û ev ji bo we başiya herî mezine ku em dikin. Hûn ê van tevan wisa fêm bikin, nexwe nêzîkbûna "Em aciz bûn, teng bûn" dibe durûtî. Mafê

we heye ku her tiştî bêjin, bes mafê we tine ku hûn di derheqê xwe de vê bêjin. Ji ber ku her tişt teqez we neçarî berzbûn û veguhertinê dike. Hûn ê jî xwe bi wê re azad pêk bînin.

Yeqîn dikim me cardin li ser vî bingehî çarçoveyek ji bo bendewariyên we yên partîbûnê diyar kir. Pirsgirêkên we çiqas giran dibin bila bin, her çendî hûn bi tevahî nexweşiyên xwe ve ji nava pergalê hatine, ji bo wan jî çareserî heye. Kesên herî zêde ji xwe razî jî di nêvenga me de gelek tişt hene ku ji xwe re bigirin. Dema hûn bi dilnizmî, dilsozê cewhera partîbûnê hîn dibin, ger hûn hinekê jî hînkirinê esas bigirin û bimeşin, dê PKK di vî karî de bi gavên ji xwe bawer xwe bigihîne armancên ku ji xwe re kiriye hedef. Ger şerê herî dawî yê zehmet jî be, çi tişta astengî li pêş disekine derbas bike û teqez serkeftinê bidest bixe.

**2 Gulan 1997**

## ŞOREŞ TEVGERÊN BERZBÛNÊ NE

Weke qadroyek şoreşê pirsgirêkên we yên lêhûrbûnê pir giran berdewam dikin û asta we ya çareseriyê di pêşketinek sînordar de ye. Sekna we ya li hember dijmin, bi darbeyên giran hilpekîna we û ne di ferqa vê de bûyîn, rastiya we ya li hember jiyanê rave dike. Lewaziya eleqederbûna we ya li hember bîrdozî û pratîka şoreşgerî, dîsa raberkirina nêzîkbûnên pir xeter, şaş û nebes, raveyek din a kesayeta binkeftî ye. Mirov nikare vê hema weke pêşketinek civakî ya jixweber û asayî bibîne. Hema bêjin şerê ku em li dijî paşverûtiyên we û şerê yekser li hember dijmin dimeşînin di heman astê de ye. Şerê ku hûn ferz dikin, ji ya ku dijmin ferz dike xetertire. Cihekirin, jihev veqetandin û derbaskirin hewldanek mezintirîn dixwaze. Qaşo qadroyên şoreşê yên ku pêwîste kesayetên pêdiviyan bin, ji sîxurên dijmin bi zanebûn ava dike xetertire.

Dijmin jî vê ferq dike û polîtîkayekê pêş dixe. Hûn zêde nikarin vîna derbaskirina vê raber bikin. Xwe bi xwe hêrs dibin an jî hûn bi nêzîkbûnên dijberî pîvanên partî yên pêşketinan ferz dikin êrîşan dikin. Mirov çiqas li aliyên we yên paşverû bide, hûn ewqasî bertek raber dikin. Dema em pêl lewaziyên we dikin, hûn heqaret dihesibînin an jî nêzîkbûnek di bin de diperçiqe raber dikin. Elbet ev jî pêşengtiya bingehîn, sazîbûn û pratîkbûna gavên guncav ên şoreşê vale derdixe. Pejirandina neçariya serkeftina li ser we tê ferzkirin danin aliyekê, hûn bi bertekên cur be cur her tim vê asteng dikin. Dema hûn vê dikin jî çeka herî mezin hûn xwe dispêrinê bi gotinên weke; “Evqas ji min tê, ez şeht bûme, hêza min têrê nake, serê min nagire, îradeya min parçe parçe bûye, nikarim ava bikim, ez ji mêj ve qediyame” civaka paşverû ya ji hêla dijmin ve hatiye çewsandin xwe didin der. Çeka we ya herî mezin, çeka bêçarebûnê ye. Tişta ji destê we tê, bênaverokbûn, bêbandorbûn û zêde girîngî nedana armance.

Me jî xwest vê parçe bikin. Bes ji ber ku hûn bi qasî kevirek mermerê jî ne saxlemin, ti aliyê we yê ne herifî nemaye. Ji her derê we ax û valehî derdikeve. Her çendî em hewl bidin rastiyan pirrengî diyar bikin, hinde bi we re bê watebûn rû dide yan jî rewşa watedarî hebe jî, em bi bertekên we yên sed carî paşve dikeve re rûbirû tên. Êdî di vir de niyeta baş an jî hewldan nîşandan ne girînge. Mirov di şoreşan de yan di xeta serkeftinê de pir dijwar dimeşe, yan jî hûn ê bi erdê re bibin yek. Şêwaza meşek **jirêzê**, di şoreşê de şêwaza meşek ji rêzê û asayî herî zêde dide **windakirin**e. Ev jî tam li gorî sekna we ye. Çawa ku jiyan li serê gelê me bûye bela, di vê wateyê de şoreşgerî jî bûye bela serê we.

Dema di kesayetê de tevger bi navê jiyana şoreşgerî destpê dike, bi hesabxwestinek tund ve destpê dike. Kesên ku hesapxwestinek mezin di kesayeta xwe de nejîn, dibe li nav refên şoreşgerî bin, bes nikarin bibin meşvanên şoreşê. Dibe ku ji bo şoreşê şer bikin, lê nikarin pirsgirêkan çareser bikin. Dibe ku weke şoreşgeran dijîn xwiya bikin, lê nikarin bi şêwaza şoreşgerî bijîn.

Jixwe ne diyare hûn perwerdeya şoreşgerî çawa digirin dest û tije tevlîhevî ye. Ne diyare hûn di vî karî de çiqas cidîne û dixwazin bibin şoreşger an na? Li gorî jiyana kevin keyfa we ji vê jiyanê re tê yan jî bi qasî keyfa we jê re tê hûn dibêjin; "Ez amade me." Hûn xwe bi temamî hewesan, hîsên ku bingeha wan a saxlem neyî û bi hinek fikran ve îdare dikin.

Emperyalîzm di dawiya vê sed salê de bi israr ferasetên weke "Êdî şoreş ne hewce ne" yan jî "Her tişt di bin kontrolê de ye, dibe ku guhertin çêbin, azadî jî li gorî em dixwazin çêbe, dê mafên kesî û pirsgirêkên netewî jî em çawa bixwazin dê werin çareserkirin" ferz dike. Ger li gorî vê ramanê ya mijara gotinê rastiya gelê me ye, jixwe navê me jî derbas nabe. Dibe ji bo hinek gelan û kesan çend vesazbûn çêbin, bes ji bo me di nava vê ramanê de cîhgirtin nabe mijara gotinê jî.

Belê ev bi we dana fêmkirin pir girînge. Ya rastî hêj we biryar ne daye ku di asta herî kêm de jî hesab ji cahiltiya xwe ya takekesî bixwazin û hûn ê li dijî dijmin jiyanê çawa bimeşînin. Devjêberdin hûn li dijî emperyalîzmê bin, hûn nikarin li dijî paşverûtiyên hêsan

di nava xwe de derbikevin. Di vê manê de ji qadroyek rizgarvan zêdetir, rewşa we bi temamî di asta nexweşek ku li benda rizgariyê ye. Elbet ev jî **berovajî** pênaseya şoreşgeriyê ye. Mirovê şoreşger **rizgarîxwaze**. Dema li hemû hal û ehwalên we dinêrin, hûn di hewayek fikra "Dê partî yan jî şoreş kengî min rizgar bike" de ne. We gel jî jibîr kiriye. Ev feraset pir pêş ketiye û di pîvanek bilind de li pêş me disekine. Ango hema hûn dibêjin; "Bila partî pêşî min rizgar bike, yê ku li benda rizgarî ne gel'e, ez im." Bi rastî jî zehmete ku mirov fêm bike we ev çawa wisa pêşxist û çima wisa berfireh kir. Jixwe vê ferasetê serê hemû şoreşan xwariye.

Şoreş bi gelemperî tevgerên **berzbûnê** ne. Rewşên civakî yên dema fedekariya takekesî digihe lutkeyê, ruh berz dibin û zanebûn bi gelemperî dibe rave dikin. Ev heta ber bi dewletbûnê ve jî diçe. Dema hewl didim feraseta we ya şoreşgerî fêm bikim, ne berzbûnek wisa, weke ku hûn bêjin; "Ev çiye hatiye serê me?" rewşekê dibînim. Elbet di bin vê de jî xwe birêxistinkirina pergalê, jiyanek pir teng pêşkêşî we kirî, di rastiya me ya civakî de jî hemû rêyên jiyanê xetimandî û nêzîkbûnek bi her tiştî razî bike erêkirin heye. Ji wê jî xirabtir dijmin we ji heft saliya we ve weke kesayetek pergalê ya objektîf an jî sîxurek xwe mezin kiriye, ne ji aliyekê ve ji çend aliyan ve çewt kiriye. Kesayetên çep û rastê wan nediyar, nayê fêmkirin xwe dide çi nade çi, bi hestên tevlîhev û fikrên ne saxlem ve di her gava tavêjin de şaşiyekê dibîne, her tim digirî û dinale, hêza nêzîkbûnek kûr li hember jiyanê raber nake, devjêberdin jiyanê biguhere, veguherîne, xeteriya ku dijî û heta mirinê jî fêm nake, ji bilî girî nikare tiştek din bike. Ev nêzîkbûnên bertek, ken, rewşên rû didin nefêmkirin û li gorî vê nebûna xwedî helwest ku hûn raber dikin hinekê jî **girîne**.

Derbaskirina van tevan girêdayî kesayet bikare xwe di astek bêhempa de birêxistin bikê ye. Pêwîste însiyatîfek tam takekesî derbikeve holê. Ferdperestiya hûn behsê dikin cuda ye. Neçarim vekirî bêjim, ferdperestiyek di wateya kapîtalîst de ji ferdperestiya we pêşketîtire. Carina ferdperestiya kapîtalîst pêşve dibe, lê belê bi we re ew jî nîne. Yeqîn dikim di nava we de hinek hevalên ku dixwazin bi şoreşgeriyê ve mijûl bibin û di vê mijarê de wêrek

derbikevin. Lê belê me heta niha mînakên wisa yên serkeftî nedîtine. Dengê we weke wan gotinên gundiyan ên vale ku guhê mirov ker dike ye. Hevpeyvînên di nêvenga me ya şoreşgerî de jî bi şêweya "Baxive, valehiyê dagire" pêş dikeve. Ji nava me kesên çareyên bingehîn bihizire, nêvengê li gorî wê zindî bike, nêvengê bike artêş, bide şerkirin, radeya serkeftinê bilind bike û xwe berpirsyarê vê bibîne dernakevin. Rêjeyek mezin jî tam pesnokî ne. Ango ji bilî feraseta "Bila partî min îdare bike" zêdetir tiştekî rave nake.

Kesên ku di civakê de dibe ku bikarin heşt-deh demjimêran kar bikin, bi hewldanek xweşik û karek xweşik pêş bixin jî, di nava me de bêxêr dibin. Kesên ku xwe dispêrin ked û daneheva giştî û bi takekesî dijîn ji xwe re kirine fêrbûn jî nekêmin. Ev jî şêweyek nêzîkbûna zêdetir xetere. Ji ber ku partî **kombûna keda giştî ye; yekbûna** hewldana milyonaye, mîrasa şehîdan û daneya xebatên me yên şoreşgerî ye. Niha di nava me de hinek li gorî pergalê firsetên mezin dibîne û li ser van firsendan rojekê jiyîn ji bo wî berdêla her tiştî ye. Ji ber vê xwe belav dike û dibêje; "Ez rojekê jî bi van derfetan bijîm, êdî bimirim jî ne xeme, çi dibe bila bibe ez ji her tiştî re amade me." Yeqîn dikim di demên dawî de ji ber vê ferasetê ye komên qadro xwe wisa li ser partiyê ferz kirin. Li gorî pîvanên wijdana xwe dibêjin; "Min namûs rizgar kir, dijmin kuşt, tol jî rakir û êdî bese." Li gorî pîvanên wijdana wan ew bimirin jî, bijîn jî ferq nake. Ji ber wijdana wan an jî bêwijdaniya wan evqase.

Pêwîste vê jî vebêjim, wijdanek we wisa kûr û li hember nirxên bingehîn hestiyariyek we ya cidî jî nîne. Ez li hember hestên we hêrs dibim. Di demên dawî de dibînim ku bi hinekan re kûraniya hest nemaye. Tevî ku me bi qasî çiyan nirxên mirov pê hestewar bibe derxistine holê, ev li gorî hinekan bêhesiyetek mezine. Kesayetên wisa hêsan û zarok nêz dibin nizanin ji nirxan sûd werbigirin. Lewra ne gengaze ku em ji van kesayetan razî bin. Hestên van ên taktîk pêş nakeve, ger dê nirxek pir girîng ên rû didin hebe, wê jî ji nedîtî ve tên, heta bi fêlbazî li ser nirxan dijîn. Gelek nêzîkbûnên wisa fêlbazî yên ecêb hene. Dilê van kesan nîne, pêdiviya fikrek cidî jî nabînin. Qaşo hinek tişt di axaftinê de fêr

bûne û dibêjin; “Îdare bike.” Tişta ji dîsîplînê fêm dikin jî venêrînek hişke, dibe ku hingê hişê wan bê serê wan. Bes ev jî di mercên me de negengaz û ne raste. Feraseta me ya dîsîplînê li ser bingeha dilxwazî û jidilbûnê ye.

Sedema ku em neçarin pêşketina di nav gelên cuda de bi tevgerên entellektûel, hunerî û civakî yên cur be cur ku sedî salane hatine sazkirin, ji ber nêzîkbûnên dijmin di nava tevgera xwe ya şoreşgerî de saz bikin an jî ji rastiya civakên din pir cewaz astek civakî bijîn, sedema objektîf a di bin vê rastiyê de ye. Şoreşa me jî vê berçav digire. Ji ber ku asta her cure pêşketinên hunerî, siyasî û civakî yên sedsalan saz kirîn li cem me ne asayî ye, pêwîste ev hemû bi rêbazên şoreşgerî di rêkurtê re pêk werin. Piştî ku pêşketina civakî ya asayî nehat fêmkirin, hûn ê vesazbûnên şoreşî çawa fêm bikin? Ev jî we şaşwaz dike.

Ji bo vê çareser bikim, min şêwaza jiyana xwe pir balkêş danî holê. Dibe ku hinekê van fêm dikin, lê pir zehmete ku hûn xwe li gorî vê sazûman bikin. Qaşo hewce dikir hûn ji tiştên me di çil salî de kirî zêdetir bi hêsaniyek mezin û bi derfetên heyî yên pir mezin ve pêk bînin, tevî hemû pişgiriyên me, kesayetên we yên ziwa rabûne û bi bertekên pir cure ve dibêje; “Ez nikarim, ji vê re ne amade me” yan jî “Ev der li gorî mine, ew der li gorî mine, ancex ez dikarim li gorî wir bim.” Xwe nenaskirin wisa ye.

Bal bidinê, em ji her tiştê jiyanê hatine qutkirin. Hûn ji axa jiyanê, azadiya jiyanê, tenduristî, perwerde, çand, dîrok, pêşeroja kesayetî û rojane hatine qutkirin. Bes fikra vê jî bi we re ava nabe. Hûn di fikir de tam tênagihijin çima hûn feqîr hatine hiştin û ji hêla kî ve hejar hatine hiştin. Ev tenê bi hinek rastiyên giştî ve çêdibe. Lê belê ne gengaze ku hûn vê jidil hîs bikin, bînin asta doktrînekê û xeta hişk a bîrdozî.

Ziravî, avantaj û zehmetiyên şoreşa me hene. Me hemû daneyên vê pêşkêşî we kirin. Bes ji ber we bi sedemên cur be cur lêhûrbûna li ser rastiyan paşgeh kir û hêz jê re nanî, ev hewldana awarte û her cure afirîneriya pêş dixe li cem me rêya yekane ye. Hûn serê xwe li ser van aliyan na êşînin. Her tim xwe di vê mijarê be berçav digirim û dibêjim çima evqasî bitevger im. Ji ber ku bi

cureyek din ji bo jiyana azad gav nayê avêtin. Jiyanek ku kelecan, hezkirin û coşa wê ya rast nebe, dê bibe jiyanek ku dijmin her tim bê ruh dike, ber bi îxanet û înkarê ve dibe. Her çendî we di asta herî jor de bilind bikin jî, dîsa jî hûn ê bikevin. Ango bilindkirina we bi xwe jî ketina herî mezine. Hêjî gelek ji we jiyanê di çarçoveya dijmin de bilindbûnê fêm dike. Ji pereyan heta çandê, ji çandê heta siyasetê di derbarê her tiştî de wisa dihizirin, mixabin ew jî nakeve destê we. Dema em jî şoreşê weke rêbazek datînin pêşiya we, weke ku hûn pir kêm fêm dikin û xwe jî tevlî nakin, bi bertekên paşverû ve dibêjin; "Her tişt vale ye, jiyan vale ye" û lihev dixin. Elbet ev jî zêde encam nade.

Li ser vî bingehî pejirandina hinek encaman ne weke ferman û ferzkirin, an jî ji ber ku partî dixwaze, pêwîste hûn di ruhê xwe de serûbinbûnekê bijîn, hesapxwestinekê pêş bixin. Em dixwazin pirsên weke "Dê çi ji min were, ez ê çi bikim, bi rastî jî nirxek min heye, gelo siûdek min a jiyanê heye? Çi dijîm, gelo bi armanc dijîm, çi armancê min heye, ez ê çawa û bi çi meşê vê ser bixim?" bi we re bidin avakirin. Di vê mijarê de jî zêde deng ji we dernakeve. Berteka we ya herî baş bi şêweya "Jêvegere, wisa hatiye dê wisa jî biçe" ye. Elbet ev nêzîkbûn jî raveya cûcetiya we ye. Mirovê wisa dike mezin nabe. Kesayeta ku badekên wan wisa, mirov derfetên bi qasî çiyan jî dane pêşiya wan, nizane çawa lê binêre. Ger zindîbûnek û îdîaya we ya jiyanê heye, pêwîste hûn teqez hinek pirsan ji xwe bikin. Tevdîrên ku me girtine û karê herî zirav ku ez bikim wisa ye, ji bilî vê tiştek ku bikim nîne. Ez ê hinek pirsan bi we bidim kirin. Ango em ê bi hinek kesên ku vale dinêrin, her tiştî tevlîhev dikin re qet nebe hinek pirsên bingehîn bidin hîskirin. Jiyan ne weke hûn dizanîne. Jiyan tenê li ser bingeha pirsên ez dikim dikare pêş bikeve. Di vê mijarê de xwe qet nexapînin û piştguh jî nekin. Di derbarê jiyana ku hatiye windakirin, bi temamî hatiye lenetkirin, ji kur bê nêrîn biba bênêrin ji zemînê wê hatiye qetandin hinek pirsan ji xwe bikin. Hûn nikarin bi gotinên weke "Ez bi partî û Rêbertiyê ve girêdayî me" ve bersiva van pirsan bidin û heta nikarin van pirsan ji xwe jî bikin. Ger hûn pirsiyar bikin jî, dev ji bersivdana van berdin, hûn bi şêweya "Dev

ji jiyana bi çareserî berde" piştguh dikin. Rastiya we wisa ye.

Dema min nû çavên xwe li jiyanê vekir, hêj dibistan nexwendî, hêj cîhan nas nekirî, min rewşa karesat fêm kiribû. Ez bi cîhanek ku bersivê nade xwestekên mirov ên xwezayî re rûbirû bûm. Hûn mezin kirine, qaşo kirine mirov û dibêjin; "Bijîn." Paşê jî mirov dibîne ku tişteke bê jiyîn nîne. Vaye ev jî, hemû asta kesayeta we diyar dike. Hûn belengazin; di wê rewşê de ne nikarin bihizirin, birêxistinbin û şer bikin. Hûn gav tavêjin tên kuştin, bin dikevin; reftarên we bêrêz û kirêtin. Rastiya gelek ji we wisa ye, tiştek din jî ji destê we naye. Dîroka Kurd bi ax waxan dagirtiye. Kesê herî egîd jî di kêliya nayê hêvîkirin de hatiye kuştin. Ma kesek heye bêje; "Vaye min jî ser xist, min di vê cîhanê de rê ji pêşketinekê re vekir?" Rewşa we ji ya wan paşketîtire. Gelo dê ev rewş hemû pirsan bi we bide kirin?

Hûn ê li kur, bi kî re û çawa bijîn? Gelo hûn ê bi rêxistinê re û şer re bijîn? Me gelek şervan şandin welat. Lê mixabin tişta ku fermandarê herî ji xwe razî kirî jî, pirsgirêkên ku bixeniqîne zêdekirin, a herî rast jî pêşxistina bûhranan bû. Bûna çare, rêyek dîtin û bûna hêza çareseriyê danin aliyekê, van fermandaran derdora xwe çewsandin, pîvan derbas kirin, bi xwe jî nikare rave bike ku dê encam biçe heta kur. Ger roja xwe qedan dibe ji bo wî bese. Tiştek din jî ji dest naye. Ji bo tiştek ji dest were pêwîste fêm bike, lêkolîn û lêpirsîn bike. Bes nêzî wê jî nabe.

Bi salane hinek derfet digihînim destê wan. Niha ev jî dişibe nêzîkbûna bav û dayîka min a weke; "Kurê min, me tu mezin kirî, malbatê îdare bike." Min wê demê mûçe digirt, lê mûçeya xwe neşand ji wan re. Ji ber min nêzîkbûnek wisa rast nedît, min digot; "Wisa xwe sipartina min ve jiyîna wan ne rast bû." Bes niha dihizirim, tişta min ji bo malbatê nekirî, ji bo we kiriye. Ji ber ku PKK malbatek hîn cewaz û berfirehe pêwîstiya kirinê dibînim. Her tim dihizirim, em derfetan bigihînin ji yên me re da ku li ber xwe bidin, hinek din bijîn û jîngeha wan tarî nebe. Bi vê hişmendiyê ji bo we kar dikim. Ya rastî li dijî vê bûm. Lê dihizirîm dibe ku bav û dayîk hinek din mezinin, dikarin xwe bidin jiyîn. Mixabin hûn hêj weke zarokane. Ji bo baş dizanim ger alîkariya me nebe hûn ê weke

çîçikên çûkan li her derê belav bibin, tempoyek xebatek pir mezin raber dikim. Li hember rastiya we wijdana mirov ranake. Hûn ne di nava pergal, ne jî di nava jiyana ku şer de ne. Ji bo me rewşa we bûye pirsgirêkek wijdanî ya mezin. Hêza we nîne hûn xwe li ser lingan bigirin. Qaşo ji bo hûn silala şoreşê rizgar bikin derketine serê çiyan, bes hûn ê bi vî halê xwe ve li çiyan ziwa bibin.

Hûn nikarin bêjin; "Em mezin bûn." Hinek hevalên me bûne çil û pênc salî, bes hêjî weke zarokanin. Mirov ji mezinbûna zarokan ku dê bibin zilam keyfxweş dibe. Lê ger bêjim ez ê zilamê çil û pênc salî mezin bikim, ez ê kena xwe bi xwe bikim. Mirov piştî çil û pênc salî mezin nabe. Temenê asayî yê mezinbûnê di çarçoveya bîstê de ye. Pey wê re mezinbûn radiweste. Ger em we li ser piştê bihêlin û bêjin êdî hûn mezin bûn, biçin xwe bi xwe îdare bikin, hûn ê yekser birevin biçin. Hûn bi çarçavî li benda vê ne. Tişta destpêkê tê bîra we baş dizanim. Çawa ku kesek di nava malbatê de mezin bûyî her kêlî li bendê ye baz bide dervî malbatê, rewşa we jî dişibe wê. Bes paşê jî yan hûn karesatên bên serê we nabînin an jî ne li xema we ye. Di civakê de keç ji malê direve, dikeve kolanan; kur ji malê direve, dibe eware. Paşê dibe ku hişê wan bê serê wan, lê êdî feyde nake. Bes rewşa we ji vê xeternaktire. Çeka we ya herî mezin xeyalên erzan û xwe sipartina duayên pêk nayêne. Tevî vê jê re dibêjin amîn.

Nêzîkbûna vê malbatê me tengav dike. Ma em ê heta kengî û çawa li we binêrin. Ma hêj hûn mezin nebûne? Ma hûn nikarin di nava malbata netewî, malbata civakî ya li ser bingeha nû û azad li ber xwe bidin û bijîn? Girêdayî van tevan dipirsim. Gelo hûn ê bikarin hinek pirsên dijwar ji xwe bikin û bêjin; "Ma ez dikarim bibim mirov?" Tiştên dibêjim nefişalin. Ji ber ku tevî vî temenê xwe xwedî hewldanek evqasim û hêjî weke ku qefesan parçe bikim pêngavan pêş dixim. Hûn li cihên amade û qadên azad jî ji cihê xwe nalivin. Karê hûn dikin jî teşqeleye. Elbet pirsgirêk ne ku hûn çiqas tewanbar an jî ne tewambarin, divê hûn wisa fêm nekin. Ev pirsgirêka pergalekê ye, pirsgirêka raberkirina vînekêye, mixabin hûn nikarin vê hêzê raber bikin.

Hinek niyetên baş hatine pêşxistin. Dîsa bi niyetên baş,

fedekariya lawek bi namûs a malbatê ve xwe belavkirina kesayet û xilaskirin mijara gotinê ye. Hûn nikarin feraseta xwe ya namûsa di nava malbatê de –jixwe feraseta we ya namûsê vê derbas nakewisa ji feraseta xwe fedakirinê zêdetir di astek berz de derbixin holê. Pirsgirêka bira û xwîşkan mezin me tengav dike. Yê herî mezin jibilî gotinên weke; "Ez birayê te me, min guhdar bike" cudatir tiştekê nabêje. Niha pirsgirêka hemû fermandarên me jî wisa ye. Lê em li dijî vane. Îdîaya dijmin jî di demên dawî de wisa ye: "Belê, em zêde bi ser we de hatin û me hûn înkar kiribûn; lê niha hinek tiştan dihizirin. Pêşî bi serwerê xwe yê mezin ve girêdayî bin û tiştên ew dibêje esas bigirin, em ê hinek tişt bidin we. Belê, me fêm kir hûn li dijî çi derdikevin, bes wisa li hember mezinên xwe, serwerê xwe yê mezin îsyan nekin û vînek wisa cuda jî ferz nekin." Polîtîkaya li eniya dijmin pêş dikeve wisa ye. Dijmin dibêje; "Van hinekê îsyan kir, vêca em hinek tiştên ku wan mijûl bike danin pêşiya wan." Ger em we di halê xwe de bihêlin, hûn ê bê ku qet di ferqê de bin vê polîtîkayê bipejirînin. Ya rastî dijmin hema hema tevahî civak aniye vî halî û gelek rêxistin jî amade kiriye. Hinek hewldanên min hene, niha jî dijmin dixwaze van ji holê rake. Ji bo vê jî gelek tevdîr girtine û ya rastî jî gelek ji we jî li gorî vê amade kiriye.

Mantiqê min ê lêpirsînê xurte, vîna min a azad û pîvanên min ên ecibandinê pir cewazin. Ne hûn li hember dijmin pirsgirêkan ava dikin, yeqîn dikim hûn li hember wî weke berxane. Lewma pir hêsan we ji holê radike. Em tenezilê vê nakin, ji ber ku vê haqaretek mezin dibînin. Ecibandin û pîvanên me pir cewazin. Di şêwaza we de jiyîn, ecibandin, di derbarê hinek tişt de qanebûn û di şêwaza we de şerkirin ji bo biçûkbûne. Bihêlin em nirx bidin van, li hember rêz nagirin. Ev jî şerkertiya me ye. Ez mirovek ji şerkertiyê zewq digirim. Jiyanek bi vî şêwazî zadê me ye. Hûn di bin vê de yên diperçiqin û ditewinin. Bi we re evîn û hêrsên mezin tine ye. Lewra kesayetên we hinekê jî li gorî paletî û hemaltiya şêweya dema nû ye. Di vê mijarê de nêzîkbûnek fişêl jî raber nakim. Xweziya ji nav we hinek derketan pêş, me jî bi hemû hêza xwe ve pişgiriya wan kiriba. Lê ew hewa bi we re tine. Me ceriband raye

da gelek ji we, mixabin we serûçavên xwe da. Xweziya me bi we re daxwazên watedar û naveroka wan bihêz pêş xistiba!

Qaşo gelek ji we dixwazin bijîn. Hinek xwestekên we yên weke; "Mafên min hene, ez ê kengî bijîm?" lê belê ew jî xwe xapandine. Yeqîn nakim hûn tiştên hêja û cidî dixwazin. Ger qinyata min bi vê hebûya, dê min gotiba; "Bila tiştên hûn dixwazin tev ê we bin." Tiştên hûn dixwazin weke cixareyê, tiryakê ne. Wateyek tiryaka ku sosyete jî dikêşe heye, lê ti wateya hûn xwe ditevizînin nîne. Tişta hûn dikin, bi axaftin an jî di asta dendika hêjîrê de bi tiştên erzan xwe tevizandine. Lê ez xwe natevizînim, zindî dikim û tevgerê zêde dikim. Yên min zindî dikin hewldanin. Mînak di her bûyera ku digirim dest de, başkêşî û rewşên mat dikin hene. Mirov qet nizane hûn ê çawa bijîn. Ger em we ji we re bihêlin, pêşî hûn ê xwe bi erdê re dirêj bikin, ji kezebê cixareyekê bikêşin û dilê we çi bixwaze wê bikin. Tişta dilê we dixwaze jî qutbûna ji armancê mezine. Hûn armancên mezin ji bo xwe astengî dibînin û dibêjin; "Em pir tengav kirin." Karên civakê yên pir biçûk, dibe ku karên jin û mêrtî we hinekê mijûl bike. Jixwe hûn ê paşê birçî bimînin û ji bo peydakirina pariyek nan bilez xwe li çep û rast bidin. Temenê we zêde nemaye, êdî ji bo we jiyîn, ne jiyîn jî qet negirînge.

## Pênaseya Azadiyê Ya Herî Rast Û Yekane Bûna Kesayetek Mezinbûyî, Dewlemend Û Ava Dike

Ji bo jiyan ne wisa be me bahoza herî mezin rakir. Em hêjî di hewaya bahozê de rêya xwe didomînin. Hêjî tevî vî halê xwe dibêjim ger biçim çiyan, bikevim nava gel û bi heman xiroşê jî rêya xwe didomînim. Weke pêlên mezin berfirehbûn, ji bo karek wateya wê mezin rê vekirin, hêjî rêgeza em pê ve girêdayî ne û şêwazek tevgerê ye. Cîhanê jî bidin ez vê şêwaza xwe pê naguherim, vê jî jidil dikim û kes jî nikare zorî li min bike. Gelek caran dihizirim gelo ji bo we jî cîhanek wisa gengaze. Ji ber ev dikare we ber xwe bibe. Di jiyan û meşa we de ji bilî vê ti siûdek din nabînim. Elbet wisa navê min bikaranîn û xwe bi vê evqasî xapandin pir xirab û xetere. Ger hûn wisa bikin, hûn ê heyfa xwe bînin. Ji ber ez kesekê wisa hêsan nadim jiyîn û ev jî rastiyek me ya pir balkêşe. Ev ji kevin ve wisa ye.

Ehdek û rikek min a pir mezin heye ku we bi vî halê we ve nedim jiyîn. Me ev jî bi xebatek bêhempa ve pêk anî. Elbet rikên we jî hene, lê rikên we nerêxistinî û rebenin. Yên min hîn zêdetir bi plansazî û rêxistinkirî ne. Di vê mijarê de bihizirin û xwe bi min re muqayese bikin. Di navbera me û we de hem cewaziyek mezin heye, hem jî em berovajî hevin. Lê hûn ê niha bêjin; "Te xwe bi xwe dît, hevgihand û ava kir." Ev raste û dibe ku ez raveya vê ya yekane jî bim. Bes ya girîng rastiyên ku hûn pê mehkum bûne; ji ber hûn tev ji hinek dijminan acizin. Ger a girîng binxistina wan e, yek raveya wê heye ew jî rastiya min pêş xistî ye, ango şêwaza min a êrîş û parastinê ye. Em ne tenê dijmin, şevgerên weke we jî aciz dikin û nadin jiyîn. Pêşî vê bizanin û rewşa xwe jî li gorî wê rast bikin. Makanîzmaya we li dijî vê pêşxistî xwe xapandinek mezine. Ez ji ber vî halê we ecêb dimînim. Hûn derdora xwe bi axaftin an jî pratîkên erzan dixapînin. Lê teqez ne gengaze ku bi min bidin yeqînkirin. Ez kesek pir zehmet diecibînim. Ji bo xwe na ecibînim

min ev hemû pêk anîn. Ez ê we bi vî halî ve çawa biecibînim?

Hûn ê bêjin; “Wey gidî, ev çiye hatî serê me”, ne min ev anîn serê we, ji kesên hûn anîn vê rewşê re bêjin; “Wey gidî.” Min vale ji dayîka xwe re negot; “Tu sucdarî, te çima ez anîm vê dinê” pê re şer nekir. Hûn hêjî ji xwe napirsin; “Ez çawa di vê cîhanê de dijîm?” Hinek kilam hene, biçin têra xwe wan kilaman guhdar bikin. Mînak Orhan Gencebay dibêje; “Ez çawa dijîm?” Dîsa gelek ciwanên nû yên popvan derketine, wan guhdar bikin. Ew jî li dijî jiyanê derdikevin. Lê belê lêgerîna wan a jiyanê weke ya me ne civakî û siyasî ye, berovajî zêde ferdperest, li dijî civakê û li ser bingeha şoreşa dijbere. Faşîzan jî li gorî xwe bûn çete, milyaran kes kuştin. Bal bidinê, ew dewlemendî tev desteser kirin. Ev tişta kirîn jî ji bo faşîzmê şoreş bû. Yên herî feqîr, di herî jêr de û reben mayîn jî hûn bûn. Çawa ku civak hat mehkumkirin, di nava partiyê de jî hûn dibêjin; “Em jî wisa hatin mehkumkirin.” Lê min şoreşgeriyek mezin domand.

Ger gengaze bîranînên xwe ji nû ve zindî bikin: Hûn çawa ji dayîk bûn, ji van waran çawa qut bûn, kî hûn xapandin, hûn çima ketin nava rewşek wisa bê çare? Em bi zorê we ne tevlî jiyanê, ne şer, ne jî meydanekê dikin. Xwe wisa bi şêwazek wêrek ferz nekin. Em hinekê alîkariya we dikin. Ger ew jî têrê nake, hesab ji dayîkên xwe û sedemên hûn ji dayîk bûne bipirsin. Şerê min ê bi malbatê re sembolîke. Min bi wan re û paşê jî bi hemû sedemên ku min tengav dikin re şer kir. Min bi dewletê re şer kir, heta niha em bi tevahî mirovahiyê re şer dikin. Jixwe ev kar bi cureyek din jî nabe. Ya niha min nade jiyîn mirovahiya heyî ye, emperyalîzme, mêtîngerî ye, herî dawî jî faşîzma Komara Tirk û her tiştê ku wî rahênandiye. Sedema ku em vî şerî evqasî bi gelemperî dikin ev e: Ev cîhan min nade jiyîn. Lewra ya herî rast jî bi vê cîhana min nade jiyîn re şerkirine. Şêwaza din, şêwaza koleyane û qet niyeta min jî nîne bibim kole. Pêwîste hûn ji xwe bawer bipirsin gelo niyeta we ya bûna kole heye yan na. Yeqîn nakim biryarek we ya weke; “Ez ê bi vê cîhanê re şer bikim û ez ê qet weke koleyan nejîm” hebe. Ji ber ku ger biryara we ji bingehîn bûya, hûn ê heta niha weke bahozan bûna.

Pêvajoya ku min xwe di temenê pir biçûk de birêxistin kirî pir ecêbe. Bi aqilmendiyek ku feylesofek nekare raber bike, hema bêjin min her kêliya jiyanê bi serheve kir, xwe plan kir û pir hişyar heta roja îro hatim. Mixabin bi we re amajeyek vê jî nîne. Xwe sipartina min ve jiyîn, xeteriya herî xirab hûn bikine. Bi sipartina her tiştî ve bijîn, lê xwe sipartina min ve nejîn. Ger hûn xwe bispêrin min hûn ê giyana xwe ji dest bidin, an jî ancex hûn dikarin bi lehengiyek ku min jî derbas dike ve hêza jiyanê raber bikin. Min dê û bavê xwe wisa li cem xwe nedan jiyîn. Xwîşk û birayên min zorê ji destê min derdixistin. Xisletek min a din jî wisa bû: Hêj di temenê xwe yê biçûk de bi zarokan re digeriyam, hinek nirxên ku min ava dikir bi wan re parve dikir û ew dikişandin jiyanê. Vaye wisa heta îro hatim û min ew jî kêşan nav refên me.

Ji kesên ku di ferdperestiya xwe de israr dikin re vê dibêjim: Ne gengaze ku hûn bi ferdperestiya xwe ve di nava me de bijîn. Em di nava partiyê de pergalê nadin jiyîn. Ma em ê kopya pergalê ya erzan çawa bidin jiyîn? Gelo ji bo vê ev nêzîkbûn dikare di dilê we de hestek wisa, fikrek wisa û jêhatiya têgihiştinek wisa pêş bixe? Ger hûn hewl bidin tiştên ku vedibêjim fêm bikin jî, yeqîn nakim hûn yek-du rastiyên pir girîng derdixin zanebûnê. Lê vegotinek nîv demjimêrî jî têrê dikir ku milîtanek rasteqînî derbixe holê.

Îro dîsa nûnerê Barzanî bang dike; “Hewar, bila agirbes çêbe.” Pêwîste ev jî ji bo we bê çi wateyê? Ev bîst sal zêdetirin ev zilam ne xwest tiştekî me fêm bike. Qaşo axayê şer ê mezin ku herî zêde çekên wî hene jî ew bû. Dibe ku her kes gotiba; “Ez nikarim bi çek şer bikim”, lê wî ne digot. Vaye ew jî hat vê qonaxê. Ev jî, bi şêwaza me ve eleqedere. Berê çep û rast dibeziyan, niha jî neçarin yekser ber bi min ve baz bidin. Ji ber ku çareseriyê bi me re dibînin. Hejmarek zêde yên me jî her tim duviktiya wan dikin. Jixwe piraniya van jî reviyan. Sedan kesên ku ji nav PKK’ê revîn li wirin. Me jî li hember vê înat kir û bi vê şêwaza xwe ya têkoşînê ve kar anî heta vê qonaxê. Dê siberojê Komara Tirk jî bê vê qonaxê. Di vê mijarê de ji xwe bawerim. Ev mînak jî didin diyarkirin ku ez ê xwe biselmînim.

Pêwîste encama herî girîng hûn ji vir derbixin ev be: Ger kesek

weke Barzanî jî em fêm kirine, ma hûn ê çima bi vê şêwaza xwe ya paşverû û li cihekê ferzkirina vî şerê xwe yê hundurîn ve me mijûl bikin? Ma hûn bi qasî wî xurtin? Hemû hêza we belengaziya we û xwe xapandine. Lê ev jî şaşe û me jî di van mijaran de tevdîr girtine. Me têgehên weke bav, reîs, Xweda û Nebî dan derbaskirin. Lewma dibêjim, şerê paşverûtiyê bidin rawestandin. Hûn ê jî rojekê weke Barzanî tika ji me bikin û bêjin; "Agirbes, Agirbes!" Jixwe Barzanî şer dike, feydeyek wî jî li me nabe. Şerê Barzanî bi pereyan bû, xwe bi xwe hestê mezinbûnê dijiya û hinekê jî polîtîka dikir. Dibe ku wateyek vê hebe. Vêca ya hûn dikin polîtîkaya çiye? Dev ji vê berdin. Ger hûn jêvenegerin nikarin xwe ji hesabdayîna me rizgar bikin. Hûn nikarin piştguh bikin ku em şerkerin. Dayîka min ji destê min xilas nebû. Hûn ê çawa rizgar bibin?

Encama ku ez jî ji van tevan derbixim, hinekê cidî bim û qet nebe bibim xwedî şêwazek ku bikarim xwe bimeşînim. Leşkertî jî wisa ye. Madem we xwest evqasî leşkertiyê bikin û çek bigirin destê xwe, elbet ez ê jî li gorî vê heq ji we bixwazim. Bihizirin, hûn di asta herî kêm de jî bi quralên leşkerî re lihev nayên. Weke zarokan cilên komando li ber xwe kirine, çekên xwe jî dane milê xwe û meş dikin. Êdî ev lîstoke bese! Êdî em vî karî li gorî rastiya wê bimeşînin. Ger em van karan di vî temenî de nekin, em ê kengê bikin? Ger hûn naxwazin van karan bikin bêjin; "Ev kar ne li gorî me ye." Di artêşa Tirk de jî tê gotin; "Şerefek cilên mehmecîk heye." Ji bot, heta qupçe û qîtanan baş girê didin. Ji ber ku dibêjin; "Şerefe." Wê rojê jina bê perwerde û cahil cardin gotinek ji devê xwe derxist got; "Onbaşiyê bê şeref." Ji ber vê gotinê artêşa Tirk rabû ser lingan, kêm mabû civak bi ser de bimeşe. Elbet gotina ji dev derketî pir girîng bû. Paşê jî gotina xwe guhert û got; "Min behsa onbaşiyê siyasî kiriye." Lê leşker fêm kiribû ku dixwaze çi bêje û jê re gotin; "Tu çawa dibêjî onbaşiyê bê şeref?" Ya rastî pergala artêşê bi xwe xwedî baweriyek hişke. Ger ew xwedî baweriyek wisa hişk bin, ma çima em ê di rastiya xwe ya leşkertiyê de ne girane bin?

Leşkertiya we hinekê dişibe leşkertiya **Kemal Sunal**. Em vê napejirînin. Lewra neçare ku hûn cidî bin. Hûn nikarin ji vê birevin.

Ango kesek weke Barzanî jî, li gorî ketiye rêya rast, hûn jî lezgîn dev ji paşverûtî, bê ferasetî û tiştên xwe yên bên redkirin berdin. Hûn rêhevalin, biryarek we vekirî ya bi me re şer bikin jî nîne. Hûn beşdarî partîbûn û artêşbûnê bûn. Hûn ciwanin; dibe ku ez westiyabim, lê divê hûn ne wisa bin. Hinek din xwe kom bikin û bidin bawerkirin. Kesê ku dibêje; “Ez nikarim”, bila yekser bê serlêdana me bike, lê bila xwe ne xapîne. Çend salên xwe durist û egîdî bidin vî karî. Jixwe we her tişt winda kiriye. Siûda we ya sereke di vî şêwazî de israrkirine. Her kes nikare bibe egîd. Ger hûn egîdiyê dixwazin, pîvanên wê jî wisa ne. Deka em jî pêşketina çend rave û kesayetên egîdane hêjayî xwe bibînin. Em bi biryarin ku artêşê ava bikin û vê ji bo her qadê jî dibêjin. Ji artêşbûna saziyên çandê heta artêşbûna şerê gerim, ji artêşbûna jinê heta sazîbûna televîzyonê, hemû astên ku pêwîste bên bidestxistinin. Ger hûn jî gavên li gorî vê bavêjin, hûn ê ji bo şoreşê tişta herî baş bikin.

Asta we ya têgihiştin û nêzîkbûnê pir berovajî ye. Ev jî şerek li dijî me ye, lê me axayê herî mezin jî anî rêya rast. Ma hêza we çiqase? Elbet ev ne di wateya serî tewandinê de ye; em ji we serî tewandinê naxwazin. Egîdî, bi hişyarî û wêrekiyek mezin ve nêzî rastiyan bûyîn û bûna xwedî hewldanek têrkar ve pêk tê. Hûn ê jî di vê mijarê de bêjin; “Em ê vê egîdiyê raber bikin, di vê mijarê de bi israrin û teqez bibin mirov.” Ger hûn vê bikin misoger hûn ê bi me re bi xiroşek bêhempa ve bimeşin. Lê ger hûn wisa nêzî pêwîstiyan nebin û bêjin; “Ez hinek din li gorî şêwaza xwe, rika xwe û lîstokên xwe yên biçûk bijîm”, dê otorîteya me jî we vale derbixe û heta qonaxa dawî jî bela xwe ji we veneke. Ev ne gefe, rêzdariya li hember bi rasteqînî nêzî rastiyan bûyîn û bê ku wext bê windakirin nêzîkbûn raberkirine. Ango nirx dayîna xwe ye, xwe bi pîvanên rasteqîn ve kirina mirove. Em neçarî vê ne û karê me yê herî baş jî wisa ye.

Ev vegotinên min tev gotinên min pêşîne û gotinên serkeftinê yên dawî jî dê li ser vî bingehî be. Ji ber ku hûn salên dirêj bi cidiyet nêzî hewcedariyan nebûn, hûn pir tengav bûn, we pir zerar dît, pir zerar da, bin ketin û we kêm serxist. Niha jî em dixwazin van derbas bikin. Ger hûn jî hinekê bi feraset nêz bibin, hûn ê

derbas bikin. Pêwîste astengiyên ku we didin sekinandin nemînin. Lê ger hûn bêjin; "Em ê bi zorê xwe weke asteng ferz bikin", ev kar nabe. Azadiyek wisa ji bo ti kesî nîne. Ango em yeqîn dikin heta ku mirov nebe mirov azadî çênabe. Ji bo paşverûtî û hemû sedemên windakirinê azadî xwestin, ne ferasetek rast a azadiyê ye. Yek pênaseya azadiyê ya rasteqîn heye, ew jî bûna kes, gel, netew û mirovê mezin, dewlemend û ava dikeye. Pênaseyên ji bilî vê qetiyen bi peyva azadiyê ve nayê ravekirin. Tengbûn, binketin, bêxêretî, bê baldarî, nerêxistinî, ne serkeftî û rehetî xwestin û ji bo vê jî feraset hêvî kirin, ne daxwazek azadiya rasteqîne. Lewra pêwîste hûn dev ji van nêzîkbûnên xwe berdin. Her çendî hûn ji van tevan re bêjin azadî, ferdperestî, çi dibêjin bêjin, ev şaşin. Em ê azadiya rasteqîn, şerê wê bi ziraviya endazyariyê ve bipîvin û weke meydana siyasetê ya mezin nîqaş bikin.

Em ê bibin civatên şervanên ku şerê azadiyê wisa bi wêrek û ferasetek berz ve dimeşîne, dizane pêwîste ji bo çi û çawa bê meşandin. Ev ji bo we hewceye û ya herî başe. Mirov ji her tiştî direve, lê ji vî şêwazî nareve. Ji ber mane em di nava şer de ne. Êdî PKK di qada netewî û nav-netewî de ji hêla siyasî û leşkerî ve hem vînek azadiyê ye, hem jî tevgerek ku dixwazin dorpêş bikine. PKK tevgerek bêhempa ya şere û ev jî hewce dike. Ji ber ev çil salin lêkolîn dikim, min ti serbendek ji bilî vî şêwazî em rast bibînin nedît. Hemû reçeteyên ji bo me tên dayîn derew û şaş hatine nivîsandin. Reçeteya jiyana herî rast wisa ye. Ji ber vê hinek pêşketinên girîng jî hene. Bal bidinê, pêşketina di rastiya PKK'ê de pêşketinek hem netewî û hem jî civakî ye. Serekeye, serwere, hem jî pêkhatinek girîng a ku dost û dijmin tev baldar nêz dibine. Ji wêrekiya wê jî diyar dibe, ev we xweşik û watedar dike. Bûyera em dibêjin jiyane wisa bûye xwedî derfet ku bê bidestxistin. De em jî bi vê nelîzin û ti caran piştguh nekin ku ji bo vê jî kêlî bi kêlî pêwîstî bi şer heye. Berovajî vê hewce dike refên xurt dibin, fikir û hestên ku pêş dikevin xwe bi cidiyetek mezin werin birêxistinkirin û her kes jî tevkariyê ji vê re bike. Bila kes wisa erzan li ser keda kesî nejî. Bila her kes azad, ango sosyalîst –jixwe ew afirînere jî-beşdar bibe û xwe bike raveya nasnameya azad. Ger dê pêşbaziyek

çêbe, dîsa bila li ser vî bingehî be. Dê ev me tam bibe serkeftinê.

Hûn ji kur ve binêrin, pêşketin vê diyar dikin. Dibe ku me pir zehmetî jiya û bi tena xwe zêde ser vî karî de çûn. Lê ya girîng encame, pêşketine û ew jî heye. Bê ku hûn şerim bikin, van pêşketinan dikin malê xwe. Bi qasî pêwîste hûn bibin şerkerek hosta yan jî rêveberek vê, hewce dike hûn li her qadê jî bibin şerkerek kedê ya dagirtî. Bi qasî pêwîste di vê mijarê de heta dawî bi hizir û plansazî bin, hewce dike hûn hewldanek di cîh de û pêwîst jî kêm nekin. Hewce dike qadroyên nû vê şêwaza çareseriyê pêş bixin. Vaye qadroyê PKK'ê wisa xwe digihîne çareseriyê û dide gihandin. Dê ev jî bibe encamê. Peywira me ya herî bingehîn jî avakirina van qadroyane. Xebata herî hêja û bilind a li pêş gelê me û mirovahiyê wisa ye. Ev xebat pir zehmet pêk tê, dijminê wê jî zêde ne. Heta dikarim bêjim, rastiya şerê herî mezin jî ev e.

Ji ber vê pêwîste hûn dersên ku ji we re hewce têrkar bigirin. Ji felsefeyê heta lojîstîkê her tiştî di hemû astê de li vir tê dayîn û hînkirin. Ji rastiya dîplomasî û nav-netewî bigirin, heta dîtina rastiyên me yên herî veşartî û windakirî her tişt li vir bi şêweyek pir baş tê hînkirin. Ji taktîkên pir balkêş û şerê pir hewce bigirin, heta aliyên jiyanê yên baldar, em hemûyan jî ronî dikin. Lewma van xalên tên hînkirin weke şansekê bibînin û bizanin hûn li hember gel û mirovahiyê berpirsyarin û qîmet bidin van nirxê derfetan. Me hem ev heq kirine, hem jî ji bilî vê çareyek me nîne. Ger ez jî dikarim evqasî li ber xwe didim, ji ber mezinbûna wateya vê ye. Divê hûn jî nebesiya xwe ya heta niha veguherînin têrkariyek bêhempa.

Qada me her tim giştî bandor dike û ev bandor ji êrîşên dijmin ên dawî de jî tê fêmkirin. Îxaneta hundurîn tê çareserkirin, bi giranî derfeta çareseriyê jî ji her demî zêdetir bilind bûye. Yeqîn nakim êdî Komara Tirk jî zêde bike rik. Pirsgirêk ber bi çareseriyek rast ve diçe. Elbet dijmine, dema firsendek biçûk bibîne dê bixwaze me tine bike. Lê tiştê em jî ferz dikin nekêmin; ger em têkoşînê wisa ferz bikin û bidomînin, yeqîn dikim em ê vê pirsgirêkê çareser bikin. Êdî dijmin gihiştiye wê qonaxê dê ew jî vê bipejirîne. Lê ev berpirsyariya giran li ser pişta me ye. Ger hûn weke berê kirî erkên

xwe ser guhê xwe re bavêjin û bêjin; “Derfet zêde bûne, em ê wisa xwe bijîn” dê karesetek çêbe.

Qadroyên şoreşê yên pêşeng nikarin kêliyekê jî dîsîplîn, berpirsyariya bilind û jêhatiya çareseriyê piştguh bike û bi oportonîstî kedxwariya wê bike. Ger hûn vê fêm dikin û xwe jî li gorî pêwîstiyên wê tevlî bikin, dê misoger ev kar jî saxlem bê meşandin, gelek kêmasî û şaşiyên heyî bên derbaskirin. Em ê xwe bigihînin hinek xalên ku ji bo serkeftinê hewcene û dê ev jî di serkeftinê de rolek pir girîng bilîze.

**2 Cotmeh 1997**

## DÎROKA PKK’Ê DÎROKA TÊKNEÇÛNÊ YE

Dema em fermî danasîna 20. a PKK’ê dikin, bi pêşketinên mezin ên derxistî holê re, hêjî bandora xirabiyên xisletên bi lenet û pir xeter ên civaka kevin li ser jiyan û şer pir balkêş berdewam dike. Heta ji bo di demê dawî de rewşa artêşa xwe bide diyarkirin ji vegotinên ku rojnamevanên birine jî diyar dibe ku, di dahûrînên me de çi tişta ku artêşê di nava gel, jiyan û quralên şer de mezin dike û pêş dixe hebin, dijmin wan digire bi şêwazek taktîk disepîne. Li hemberî vê jî rewşa dijberiya gel, bê bawerî, şêwaza jiyan û têkîliya xwe dispêre rêbazên fermankarî ên sar ku dijmin di nava xwe de jiyan dikir, têkil me jî bûye. Dijmin pêşbînên me esas digire, hemû xirabiyên xwe jî li ser me ferz dikin. Mixabin ji ber ku hûn jî vê rewşê pir hûrûkûr dijîn, bê ku bikevin ferqê dijmin bi wêrekî didin jiyîn jî şîrovekirin me jî dîn dike. Ez jî hewl didim çareser bikim ku hûn çawa ketine vî halî û çima di vê rewşê de dijîn.

Ger dijmin jî evqasî ji me hîn dibe û disepîne, hûn çawa radibin teqlîda dijmin dikin? Hûn ê çawa hesab bidin? Zehmetî dijîm ku vê rave bikim. Bi rastî jî hûn li hember hemû esasên bûna mirovek azad nakokiyê ferz dikin. Ev rewşa ku qewm û civatên ketî di navê de dijîn rave dike. We bi nirxên mirovî yên bingehîn ên rêgezî û berz dikin re, çi tiştên ku îrade mezin dike, naşke û narûxe çi hebe bi wan lîstîn ji xwe re kiriye fêrbûnek. Cewhera ferzkirinên we yên dema dawî wisa ye. Tevî ku em hewl didin bi hemû hêza xwe ve pêşî lê bigirin, hema bêje dijmin ê di hundurê we de weke ahtapotê ye; tu milek xwe didî, neçar dimînî milê din jî bidî, lê nayê kuştin. Heman dişibe çillingê. Tu yekê dikujî, roja paştir yeke nû zêde dibe. Hinde hûn fêrî jiyanên hêsan û mirinên hêsan bûne, ne gengaze ku ne di ol’ekê de, ne jî di felsefeyekê de ev bê dîtin.

Hêjî hûn ketûber û bi jiyanê lîstin weke rewşek asayî ya xisletek kesayeta ku devjê nayê berdan didomînin. Ev çi wêrekî ye? Li hember hemû nirxên mirovî li cihek ku bi temamî îmha lê tê

jiyîn, di naverastek şer de çima bi salane hêjî hûn fêr nabin û kombûnê pêk nayînin? Me leneta di nava civakê de fêm kir; bes di nava me de kesên ku di rewşek ji vê xetertir de lenetiyê didomîne, ferdperestiyê bi her şêweyî ku dikare bibe dijminê rêhevalê xwe hene û em di fêmkirina van de zehmetiyê dijîn. Vê jî bi navê; "Dê cihê min kuder be?" dike û evqasî ji xwe hez dike. Pir vekiriye, bi vê xwebûnê ve dev ji pêşxistina artêşbûn û çalekiya azadiyê berdin, hûn weke keriyê guran hev dixwin. Dibe ku ji bo we ev hemû hêsan bin. Lê di dahûrînan de jî derket holê ku, fermandarê we yê herî ji xwe razî di nava me de bi şêweyek pir xeternak dijmin kûr kir, tevî ku ji bilî kûrkirina teorî û pratîka vê tiştek din nekir hêjî li pey heq û huquqê ye, hêjî dibêje; "Dê rewşa min çibe?" û bi şêweyek çavbirçî li pey bêrîkirina desteserkirina nirxane.

Nefsa mirov qirêj dibe, ruhê mirov qirêj dibe, bes ne evqas. Ger hinekê bi navê fermandarî tevdîr girtiba, hinekê jî wijdan û îman hebûya, misoger ne evqasî êşên me û windahiyên me çêdibûn, ne jî em evqasî li hember jiyanê bi bertek dibûn.

Dema em dibêjin ev nêzîkbûnên we bermahiyên kî ne vekin, yekser hûn li hêcetan digerin. Gelo we ev terbiye ji kur girtiye? Bênamûsiya herî mezin jî di nava me de xwe wisa dide jiyîn. Kesên hema ji bilî xisletên fesadî û weke sitiriyan di mirov re biçin tiştek wan neyî, ji xwe re heq dibînin ku di nava me de bi vî halî ve bijîn. Ma har bûne? Mirov cahil û feqîr dibe, bes ne evqas. Ji aliyek din ve jî qaşo gêş û koleyên durist jî dibin zemîna vê. Em ji van serkeftinê hêvî nakin, nikarin fikarên ruhê xwe çareser bikin û tevdîrên ku pir rehet ji bo xwe jiyînê jî nikarin bigirin. Ecêb dimînim, rastiya jiyana ku me di temenê herî biçûk de lêpirsîn kirî, hêjî çawa diwêrin bê şerim bijîn. Hêj di temenê heft salî de hemû bandorên lenetî yên ji rê derdixin dane we û hûn anîne vî halî. Di derûniyê de tê gotin mirov di heft saliya xwe de çibe, heftî saliya xwe de jî wisa ye. Ev jî rewşek pir bi êşe.

Kêlî bi kêlî xwe dadihûrînim. Ger negihijim jiyana rast û kêmbûna fikir bijîm, ez ê wê rojê xwe tine bikim. Tevî ku her tiştê we bi kêmasî û şaşiyan ve dagirtiye, êdî ji bo we heta dawî bi wê re jiyîn bûye çarenûsek. Kes nikare bi vî ruhî yan jî bê ruhiyê beşdarî

vî şerî bibe. Tenê behsa eniya şer a germ nakim. Jiyana me tev şere. Beriya her tiştî esasê fikir heye û min jî ew esas girtiye. Ruhê min weke ya we ne fesad û rûreşe, di nava ronîbûnek bêhempa de ye. Heta ku vînek bikare hemû zilman bi hestên herî xweşik ve hilweşîne neyê bidestxistin, ez wê rojê xwe weke jiyan kirî nahesim. Lê mixabin hûn van hemûyan tavêjin aliyekê. Hûn esasên ku me dikin em an jî hêcetên bi temamî bilindbûna partiyêne tînin rewşek nayên nasîn. Hûn xisletên jiyan û heta şerên dijmin jî dûr dixin, li ser me û gelê me ferz dikin. Ev rewşek mirov yeqîn nake, lê rastîne. Şerê taybet çawa di nava we de wisa bi bandor bûye, we kesayeta xwe çawa ji vê re evqasî vekirî hiştiye. Mirov ecêb dimîne. Lewra dibêjim; “Hûn şaş ji dayîk bûne û şaş mezin bûne.” Xweziya hûn ji dayîk nebûna! Mirov çawa diwêre bi evqasî şaşiyan ve bijî? Ev, sucek mezin û heqaretek mezine. Ji ber vê em dibêjin bila erd biqelişe û ez bikevim navê.

Bi kurtasî hûn serdemên îsyanên xeternak ên qewmên lenetî bibîr dixin. Ev rewş jî ji bo we asayî ye, lê ne wisa ye. We pirtûka PKK’ê fêm nekiriye. We asta pîrozbûn, îman, şerê taktîk û mijûlbûnên rojane yên PKK’ê fêm nekirine. Pêwîste ev pirsgirêk kêliyekê zûtir ji holê bê rakirin. Kes nikare van xisletên dijmin ên barbar û mîrateyên qirêj di nava tevgera me ya mezin û berz de ferz bike, misoger divê kêliyekê zûtir bên derbaskirin. Ev ne ferzkirineke û ti aliyek rast a parastina vê lenetiyê nîne. Ez pênaseya vê ne di pirtûkê de, ne jî di ti rastiyên civakî de nabînim. Pênaseya vê wisa ye: Bi bandora bilindkirina şoreşê ve, ji şerê taybet ê dijmin jî wêdetir –ne tenê rojane taktîkên kuştinên mirovan- hûn nûnertiya tiştên ku di bin dorpêça fêrbûnên jiyanê de mayîn dikin û we ev jî tevlîhev kirine. Ez ti caran nikarim jiyanê wisa bigirim dest. Tevî hatime vî temenê xwe, çirkeyek xwe jî nikarim weke we bijîm. Li gorî min **heqareta** herî mezin li jiyanê bê kirin, bi vî şêwazî jiyîne. Bihizirin, gel ji gotin û meşa we acize, ev jî ne serkeftin, binkeftine. Hûn ê xwe berpirsê vê bibînin. Ti carî vê partiyê ev heq nekir. Tevî ku em evqasî êş dijîn, li ber xwe didin û ji mucîze jî wêdetir bi hewldanek bêhempa van karan tînin heta vê astê ev ferzkirinên we yên li hemberî me heqareta herî mezin

rave dike.

Nepêşketin, neserxistin û nebûna rêhevalek şirîn heqarete. Hûn bi rastiyek pir bi xeternak ve dilîzin. Her çendî em xebatek berz û pîroz derbixin holê jî, rewşa ku niha em rûbirû ne wisa ye. Hûn jî pir baş dizanin ku, we dev ji dijmin berdaye û bûne bela serê van nirxan. We dijmin daniye eliyekê, di bin navê şerê raye, şerê kariyerê, şerê fermandarî, şerê **xirabûna** nirxan tê meşandin. Hûn naxwazin van jî fêm bikin. Êşa herî mezin, rojevek we li gorî we heye û weke kurmên kirandinê her tim wê duxwin. Hûn naxwazin nefsa xwe terbiye bikin, vîna xwe pêş bixin û kar xweşik bikin. Em li fermandarê xwe yê herî pêşketî dinêrin: dihizire ku dê li ser rêhevalên xwe vîna xwe ya keyfî çawa ferz bike yan jî wan çawa bişîne mirinê, bê ku ti karî ser bixe dê wan nirxan çawa bike malê xwe. Fikir û zikrê wî jî wisa ye û gelek valehî jî eşkere dibin. Pêşî hûn li hember hemû bandorên partiyê yên berzkirinê lihev dikin, paşê jî piştî ku hemû xeta bîrdozî û pratîkî ya rêxistinî yên berzkirina partiyê hatin binpêkirin û quralên wê avêtin aliyekê, di asta duyem de dor tê hûn bi hevdu ve mijûl bibin. Vê carê jî hûn dibêjin; “Dê kî, kî bin bixe?” û hemû hunerên xwe li dijî hevdu bikar tînin. Peyre jî qaşo yek diqede yê din jî serdest dibe û piştî dibe desthilatdar, di qonaxa sêyem de jî dor tê we, ango hûn ê çawa bimirin. Hûn bi mirinek pir xirab ve xwe encam dikin, bi vî rengî jî xwe di sê qonaxan de tine dikin. Ev tiştek ecêbe. Vêca li pratîka xwe binêrin, hûn ê bibînin bi we tevan re ev her sê qonax jî xwe didin der.

We dîwarek hişk ava kiriye, hûn ê li wê bikevin û paşve bikevin, ev rastiyeke. Hûn nikarin li welatê xwe henaseyekê jî bigirin, li yekîneyên şer jî nikarin yek-du gavan bavêjin. Di hemû windahiyên dema dawî de, di meşek ji rêzê ya hêsan de, tê diyarkirin ku gav jî li gorî quralên şer nayên avêtin. Di jiyanê de hemû jî bi hêrsin, ji ber ku kêmasî û xirabûnên rêveberiyê di asta herî jor de dijîn. Heta serfermandarên artêşa dijmin jî dibêjin; “Berê di nava me de rûtirşbûn serwer bû, niha jî em bi leşkerên xwe re germin di bin heman konê de dimînin.” Ji bo gel jî dikarin dibêjin; “Berê me digot ev jî PKK’yî ne û bi dijminatî êrîşî wan

dikir, niha jî em diçin li ber lingê hemûyan, niha hemû jî ne PKK me dixwazin." Dîsa dibêjin; "Em taktîkên gerîla, kemîn, çavdêrî û kêlî bi kêlî lêkolînê pêk tînin." Artêşa dijmin hemû xisletên me yên baş kirine malê xwe. Tişta yên me jî dikin ji bilî ewarebûnê ne tiştek dine. Hêjî hewl didin bi me bidin selmandin ku; "Ji bilî vê nabe." Gelo hûn 'ji bilî vê nabe' ji kî fêr bûne? Qaşo we rayeek bidest xistiye, ji wê jî tiştekê fêm nakin. Ger hûn jiyanek bê îdîa û ji rêzê dimeşînin û qîmeta rêhevalên xwe nizanin, çavê we ne li welate, di pêkana dîsîplîna yek quralên şer de ti îdîaya we tine, nexwe hûn ê çi ji xwe bikin? Hûn çawa hêjî bi vê kesayetê dijîn? Ev bi xwe ji mirovahiyê re heqeretek mezine. Teoriya nepêşketin û xirabûnê kirin, ma di nava me de ne dijminatiya herî xeternake?

Vêca li hemû raporên xwe, hest û fikrên xwe yên rojane binêrin; navê vê **kiritandine**. Heta ger mirov hîn kûrtir bigire dest, xisletên ku dijmin di kesayetên malbat, qabîle û eşîretên rastiya civakî de kûr kirî, ji nû ve zindîkirina kesayeta ku hezar salin di mejî û dil de li hember hevdu dide şerkirine. Nêzîkbûnên vê kesayetê yên weke êrîşî derdor dike, îxanetê li eslê xwe dike, jiyanê rezîl dike, kirêtiyek pir xirab weke ku pir xweşike hêjayî xwe dibîne, ger ne sîxur hevkarek ji rêzê bûya, em ê dîsa razî bûna. Ez li vir behsa rêxistinbûn û siyasetê nakim, hûn ê ji hezar alî ve hevdu tine bikin, bi her tiştê xwe ve weke sitiriyekê pê ve bidin û paşê jî ji xwe re bêjin; "Tu Kurdek başî berdewam bike." Bîrdoziya bav û kalan –jixwe yê herî mezin jî Barzanî ye- wisa tê pêkan, ên din jî dibin quralên vê.

We çîroka hezar salî wisa têkil nava PKK'ê jî kir. Min bi van re şer kir, şer kir hatim heta vê astê. Ji roja xwe dinasim heta niha min li hember van xirabiyan şer kir wisa pêş ketim. Şaşiya we jî di vir de ye. Em bi vî şerê xwe ve bûn bûyerek mezin û ev jî ne îdîa ye. Em tevgerek girseyî ne, tevgerek gel'in. Niha yan hûn ê vê binasin û pêwîstiyên wê pêk bînin, an jî li ku derê dibin bibin hûn ê bibin hedefa vî şerî. Em destûrê nadin jiyana bermahiya bav û kalan. Şêwaza ku hûn niha dijîn ez hêj di deh saliya xwe de li dijî derketim, bi erdê re kir yek û wisa mezin bûm. Ger hûn şaş mezin

bûne ma ez ê çi bikim? Hûn li ser bingeha fitne, fesadî, belengazî, înkar, bê ruhî û kirêtiyê hatine mezinkirin.

Dema nebî jî xîtabî gel kirî gotiye; “Dev ji vê cehalet, cahiltî û minafiqtiyê berdin.” Weke tê zanîn ev di pirtûkan de hene, van bixwînin. Ger hûn nikarin bibin PKK’yî qet nebe oldar bin. Ez razî me ku hûn Xirîstiyanek baş û Misilmanek baş jî bin. Lê qetiyen bi vê **minafiqtiyê** nerazîme. Ger hebin PKK aliyên ol’î û sosyalîzmê yên erênî esas digire û tevgerek wisa ye ji xwe jî hinek tiştan têvlî dike. We çima lêkolînkirina van rawestand? Tevî sal derbas bûne, bi tena xwe hinek tişt bi milyonan fêr dikim û hêjî ji vê aciz nebûme. Hûn nikarin xwe perwerde bikin. Berê dipirsîn; “Hûn ji kîjan êl û binêmalê ne, ji kîjan eşîret û qewmê ne?” Vêca hûn kîne û ji kîjan berî ne? Ne diyare çîna we kîjane, lê ev pirs dijwarin.

Xala din jî di vir de ye: Hinek nirxên ku bibin malê gel hatine avakirin, mixabin niha jî şerê kiritandina van heye. Bal bidinê, niha jî tiştek me zêde ku em parve bikin nîne. Behsa “Dewlemendiya PKK’ê” dikin, bes ji bo têkoşînê hinek tişt tên xwarin, nexwe tam û zewqa tiştekê jî nîne. Hezar carî bêriya xwarina berê dayîka min çêdikir dikim. Tiştên ku hûn dixwazin parve bikin, bêriyên min ên dema min ên zaroktî bibîr dixin. Ji ber ku ev nirxên xwînêne û tenê dikare bi şerkertiyek mezin ve bên xwarin û daqurtandin. Nexwe hûn ê ji bilî vê xwîn daqurtînin. Tevî ku evqasî şer dikim, ez hêjî nikarim baş xwe bidim jiyîn. Li hemberî evqas şehîd û evqas kedên gelê feqîr xwarinê jî zêde dibînim. Lewra medeya min kar nake. Bûyerek fîzîkî jî evqasî xwe li gorî vê rahênandiye. Bi navê rêbertî yek gotinek ne di cîh de nabêjim, nexasim şaşiyên wisa mezin di asta peyv û gav de jî nakim. Vêca li xwe binêrin, hûn ê hingê arjenga heyî bibînin. Ger hêjî van di kesayeta xwe birêxistin nekim û şiyar nêz nebim, hûn di asta ku min biqedînin de jî xwe ferz dikin.

Gelo çima di rastiya Kurd de kesayetek cidî dernakeve? Çima ji nava we fermandarek navdar dernakeve? Ji ber ku bi vî ruhî dernakeve. Vaye fermandarê we yê navdar **Zekî** jî we dît. Qaşo di nava we de kesê herî yeman û xwe diecibîne ew kese. Jixwe rewşa wî jî li holê ye. Vêca hûn çima xwe lêpirsîn nakin? We leşkerek jî

nabîne, dibe ser avê bê av tîne. Ger tirsa wî ji me nebûya û dîsa bandora me li ser nebûya, dê kuştinek bêsînor jî di navê de heta dawî her cure xirabûn kiriba. Keçan ji mirovê ketî xirabtir di rewşekê de bikar tîne û hûn tenê li hember vê heyran dibin û temaşe dikin. Nexwe hûn ê mirovahiya xwe çawa biparêzin? Kanî hûn şervanên azadiyê bûn? Di vir de pir baş derdikeve holê ku hûn di nava xeflet û şaşiyek pir mezin de ne. Bi zimandirêjî û xwe xapandinê ve mirov ji pirsgirêkan re nabe bersiv.

## Rêxistinkirina Gel Karek Di Nirxa Zêrîn De Ye

**Egîdî** di roja me de ji rastiyên bingehîn û helwestên bingehîn tawîz nedan, wêrekî û hewldana wî berdewamkirine. Ji nava we yek mirovê egîd ê kamil, zîrek, dizane çi dike û hinekê jî bi dijminê xwe re şer dike dernakeve. Gelo di nava we de çend kesên dibeje; "Ez egîdîm" hene? Paşê jî hûn radibin behsa 'jiyan, jin, zilam û hest' dikin. Di rastiyê de hûn nikarin li ser piyan bisekinin. Ger ez wisa bim, ez ê jinbûna xwe jî, zilamtiya xwe jî di du rojan de biteqînim. Jixwe min ji roja destpêkê ve teqandin. Hûn di bin her cure tevger û xeteriya mirina dijmin de ne, mirin ketiye nava çavên we, dîsa hûn hêjî behsa jiyana li gorî xwe dikin. Tevî ku tiştên tên jiyîn rojane pêş çavên we ne, bi israr dibêjin; "Tu berde, ez ê dîsa derewên xwe bi te bidim bawerkirin." Ma hûn nizanin ez li ser rastiyekê çiqasî hewldanê dikim? Ma hûn qet min nas nakin?

Di vê mijarê de dayîkên we tewambar nakim, jixwe divê mirov qet dayîkan neke mijara gotinê. Ji dibistanê dayîkê yên hûn fêr bûne dibistanê cuda ne, li van dibistanan hûn pir xirab xapandine. Şêwaza hînbûna me cewaze. Hûn nikarin bibin rêheval. Dev ji rêhevaltiyê berdin, a we tevgerek kiritandinê ye didome. Yên din jî kole û bê vînin. Di bûyerek herî biçûk de çelexwarî dibin. Mirovek ku em bêjin egîde tine ye. Pêwîste hûn nîqaşek 'Mirovek egîd çawa ye?' bimeşînin û xwe sererast bikin. Gelo di nava we de kesek heye ji xwe dipirse dê çawa li gorî dilê gel û rêhevalên xwe be? Ez xwe li ser we ferz nakim, nabêjim min biecibînin. Ji ber rêzdariya li hember xwe digirim, tevî ku evqasî cidî me, hêjî li her cihê ku diçimê – pir baş tê zanîn dijminê min jî li hember min pir rêzdare-, -jixwe bi ti derfetî naçim ti derî- di bin ramanekê de firsendek bi qasî serê derziyê digirim, bi hewldanek mezin ve hinek tiştan ava dikim. Ji bilî vê ti derfetên min nîne. Bi rayeek yan jî bi wê fermandariya ku hûn pir dikin ve, bi hêzek amade ve naçim ti derî. Ev pir vekiriye û li ber çavên we ye. Kî ji we vê esas digire û

dixwaze wisa dest bi rojekê bike? Ger hûn ne wisane, vêca hûn çima xwe diecibinîn?

Xalek din jî ev e: Ma qet karek hûn baş bikin tine ye? Li Emerîkayê endamên hinek tarîqatan bi komî xwe dikujin. Jixwe di nava me de jî windahiyên erzan di şer de tên jiyîn jî hema bêjin xwe kuştinên komî ne. Lê belê ez li hemberî vê jiyana ku nayê bidestxistin hînî we dikim. Dema min di temenê biçûk de fêm kir ez ê jiyanê nekarim li gorî ku dixwazim bijîm, min rêya aqilmendî û îradebûnê hilbijart. Hûn di vê mijarê de di nava bêxemiyek mezin de ne. Min di wî temenî de di nava malbat, gund û civakê de derfetên jiyana sînordar zû tespît kir. Piştî ku min dît bi alîkariya hinekan xwestin û xwe bi hinekan dana qebûlkirinê ve nagihim ti derî, min got ez ê vî karî hîn bibim û bi temamî bi ser xwe de çûm. Paşê min êdî tişta ku civak baş nabîne nekir, lê ji ber ku rewşa civakê jî nebaş bû biryara rêyek nû da. Min salan xwe bi vê da jiyîn. Min ji bo xwe ew jiyana ku her kesî dijiya û tiştên ku hêjî hûn ji bo xwe dixwazin dan rawestandin. Min got ger gengaz be ez ê nirxek mezin bidim mirov. Min di hemû pirtûkan de mijarên ol û felsefe lêkolîn kirin, lêpirsîna jiyanek ji bo me heye yan na kir. Her ku min rastî dîtin ji derdora xwe re jî vegot û di pratîkê de jî kar kir.

Ez keseke hezkiriyê mirov im. Min bi her mirovî re li ser bingeha rastiyan û bi hewldanek ti carî naqedê ve hevgihînek esas girt. Hêza min a niha ne xêra vê rêxistinê, ne xêra vê pêwendiyê û ne jî xêra van rastiyane. Min hêza bi milyon caran bi dubarekirina van ve bidest xist. Pir vekiriye ku şerê jiyanê wisa pêş ketiye. Ma hûn hewce dibînin lêpirsîna xwe bikin? Hûn ketine hemû rêyên xirab, newêrin di derbarê xwe de di yek mijarê de jî ji şaşiyê re bêjin raweste. Ma di nava we de kesek heye bêje; “Ez ê xwe ji bo hinek rastiyên bingehîn ava bikim, ger di nava rêxistinê de şaşî bên kirin jî ez ê şaşiyan nekim” heye? Aqilmendê we jî di navê de, neçarim ku ji hinek kesayetan re vê bêjim: Binêrin, bese, ev bîst sal derbas bûn em we guhdar dikin, an xwe bidin aliyekê biçin, an jî wisa dernekevin pêşberî min. Hûn bi zanebûn rê ji binkeftinan re vedikin, paşê jî ji ber çi mizemiz dikin? Weke camêran xwedî li peywirên xwe derbikevin, hinek tişt bikin. Ger hûn nikarin bikin,

biçin di wargeha penaberan de bijîn. Dibêjim; wisa bi navê mezinbûn û bi navê fermandarî nesekinin. Rê û rêbaz şanî we dikim. Di nava şer de kesayetên evqasî xirabûnê dijîn hene, dibêjim li ser van serwer bin. Dîsa jî tiştek ji destê wan nayê û ya xwe dikin. Vaye rastiya xirabûnên di nava PKK'ê de û çima di nava PKK'ê de navendek saxlem saz nabe, fermandarek û yekîneyek çavên xwe berdayî serkeftinê dernakeve ji ber vê rewşê ye.

Em ji nûnerên kesayet û nasnameya PKK'ê ya esasî **Heqî**'yan bigirin, heta dema mirîn jî **Xeyrî**'yên ku xwe deyndar dîtin, her çendî li gorî derfetên wan rojan serkeftinên pir mezin nebin jî, tevlîbûna şaşiyan li aliyekê bihêlin, bi yek gotinê jî rêhevalên xwe newestandin, tengav nekirin û li gorî hêza xwe her tim bi qasî hinek tişt bidin derdora xwe nûnertiya kesayeta milîtanî kirin. Kesayetên di nava me de heyî –rêveber, qadro, fermandar hûn çi dibêjin bêjin- ne dikare hîn bike, ne jî hîn dibe. Gotinên wan jehrin, reftarên wan jî ber bi îmhayê ve dibin. Dijmin bi tiştên ku ji me fêr bûye ve şêwaza me disepîne û di vir de jî serkeftiye. Ger ev neyê derbaskirin, rewşek pir xeternake. Ez hinekê li hemberî vê li ber xwe didim. Ger kesek heye dihizire dê pey min re wisa bîst û çar demjimêran bijî, heta tiştekê ser bixe, misoger wê tine bibe. Qet hewce nake hûn xwe bixapînin. Ger di nava we de yên dixwazin bijîn hene, pêwîste bê ku taloq bike nefsa xwe sererast bike û vê bi şerek azad ve pêk bîne. Sedema pirsgirêkan li vir û wir negerin, di xwe de bigerin. Nebêjin; "Me fêm nekir, ne bîhîst." Her hatinek min cidî ye. Ez çawa weke camêrekî derdikevim pêşberî we, hûn jî weke camêrekî derbikevin pêşberî min û duristbûna xwe raber bikin. Êdî naxwazim li pêşberî xwe kesayetên we yên bê çare, fêlbaz, vale û her tişta ku dibêje derew derdikeve bibînim.

Dinya alem mijarên dîrokî û jiyanî dizanin. Ma hûn çima fêm nakin? Ez rastiyan şanî we dikim. Ez ji we re nabêjim hûn çima li vir destanan nanivîsin û di carekê de nabin egîd. Tişta vedibêjim vekiriye. Çi di şer de, çi jî di jiyanê de ji bo mirov zelal be, tişta ku pêwîste bi serwerî li ser nefs û rastiyan bê kirin, bê ku mirov biweste bike hene. Dema kêm û kurtiyên min jî çêdibin, pêwîste hûn li her derê û her demê ji min re bêjin –bizanin erka we ya li

hemberî min wisa ye- rastî rastî ye, şaşî şaşiye û erka xwe bicîh bînin.

Li gorî qinyata min sedemek din a girîng di bin gotinên we de veşartî, hûn naxwazin bijîn an jî jiyana ku dijmin hezar carî xirab kiriye dixwazin bijîne. Ger em weke xala cixareyê cardin mînak bidin, hûn dibêjin; "Berde, em ê hinekê xwe bi vê duxanê ji hiş bibin, ji bo me jiyan evqase." Ez vê erê nakim. Dema tiştek gundiyan nebe jî, her tim dibêjin; "Ya rebbî şikir." Dema bê taqet jî bin, mirov dibêje; "Hûn çawanin?", her tim dibersivînin; "Sax bî, başim." Bes li naverastê ne başî heye, ne jî saxî. Gotinek derew ji xwe re girtiye û berdewam dike. Niha hûn jî dixwazin vê ferz bikin. Bes ez jî wisa hêsan bi vê nayêm xapandin.

Ji kevin ve xwe bi fikrên rast mezin dikim û bi şêwaza jiyanek mezin ve dadigirim. Lê belê hûn naxwazin vê jî fêm bikin. Vaye cahilên kor, an jî li gorî gotinek di dîrokê de Ebû Cehîl jî wisa ne. Pir ecêbe, rewşa we çiqasî dişibe hevdu. Şerên ku hezarî salan berdewam kirine, şerê di navbera tevgerên mezinbûn û cahiltiyê de ye. We tewambar nakim, ji ber ku mercên we pir xirabin. Ji ber hûn di demên şaş de ji dayîk bûne û bi şêwazek şaş hatine mezinkirin, bê siûdiya we ye. Ez jî bi salan ji ber fikra te çima ez welidandim bi dayîka xwe re mijûl bûm. Min kevir li derî dida û dixwest tola xwe rakim. Ji ber ku li gorî min ev tewanek herî mezin a li hember zarokekî bê bikaranîne. Hêceta şerê min a herî mezin, ev jiyanek nedihat pejirandin bû. Bal bidinê, bi çakuçan ketim ser vê jiyanê, di rastiya paşvetûriya we û dijmin de lê da û tînim çi halî. Hêjî di vê mijarê de têr nebûme. Kîn û hêrsa min hîn zêdetir mezin bû. Vîna we lewaze, hêj we tiştek nekiriye, lê dîsa jî hemû westiyane, ger dev ji we berdim hûn ê li cihekê bikevin û bimirin.

Dema min dest bi vê têkoşînê kir bi tena xwe bûm û hêjî li pêşberî we me. Tevî ku li çeperek tengim, her roj bi daneyên nû ve şer dikim. Dikarim ji vê re bêjim şerê telê jî(televîzyon, radyo, cîhaz). Hinekê teknîka demê jî bikar tînim û vî şerê telê derbasî ku derê dikim? Ji bo şaşiyek taktîkî nekim ji cihê xwe dernakevim. Nexwe yeqîn dikim ez ê bi tevgerek biçûk ve rê ji pêşketinên zêdetir re vekim. Min û **Kemal Pîr**'an yekem car di sala 1972'an

de hevdu dît. Zivistan bû û sar bû. Wê wextê ez li ser piyan bûm, ew jî li hemberî min raza bû. **Kemal Pîr** nîv demjimêrî ez guhdar kirim û piştre jî biryarek da, bes bi rastî jî biryara xwe pîr da û piştî wê kêliyê tevahî jiyana xwe weke lehengekî jiya. Bihizirin, min di sala 1972'an de tenê di derbarê hinek rastiyên giştî de çend tişt gotin. Mixabin em di vê demê de her meh di asta sê pirtûkan de dahûrînên hêja dikin. Ev dahûrîn di guhek we re dikeve, di yê din re derdikeve, lê nediyare gelo di guhek we re derbas dibe yan na.

Dema em li Şoreşa Îslamê, Şoreşa Fransa û Şoreşa Bolşevîk dinêrin, dibînin ku tiştên wisa hene. Ger hûn niha lê binêrin çi hatiye serê Şoreşa Bolşevîk, hûn ê bibînin sefîlên herî xayîn çawa xirab mîrasê dixwin. Hûn jî dizanin li Rusya dewlemendî girêdayî mafyakariyê pir lez pêşketiye. Ger em niha kapîtalîzma Emerîka û kapîtalîzma Rusya bînin beramberî hev, weke ku kapîtalîzma Emerîka li hember ya din xwe bi heft avan şûştiye. Kapîtalîzma herî reş, niha li ser mîrateya Şoreşa Cotmehê pêk hatiye. Şoreşa Fransa jî wisa bû. Dema burjuvazî dîktaya xwe saz kir, serê lehengên şoreşê yên herî mezin ên weke **Robespierre** bi giyotinê jê kirin û wisa dest bikar kirin. Ma di Şoreşa Îslamê de jî ne wisa bû? **Muaviye** û **Yezît**, **İmam Ali** qetil kirin, serê **Îmam Hûseyîn** jê kirin û saltanata xwe wisa bi navê Îslamê bilind kirin. Li kêleka her şoreşê xeternakiya şoreşa dijber a wisa heye.

Rewşa min hinekê cewaze, hinekê li ser xwe serwerim. Weke ku ji dîrokê dersan derdixim, ji ber ku di pratîka xwe de jî pir hişyar tevdigerim, min sedan şoreşgerên dijber û kesayetên wan ên biçûk hêj ji dayîk nebûyîn anîn rewşa pênc quruşan. Nexwe şoreşa dijber a di nava PKK'ê de di ti tevgerên şoreşî de tine ye. Ev hem berfirehe, hem jî dijware. Hinek sondên ku min ên weke '**ez ê ji piştê ve neyêm xençerkirin**' ji xwe re dayîn hene. Wateya wê sondê jî ji bo îxanetên wisa nejîm şiyarbûn û baldariyek bêhempa raber dikim. Di vê mijarê de di nava we de kesên ku neyên xapandin, dev ji xapandinê berdin, kesên ku nexapînin hene gelo? Her carê hêza min dipirsin: Hêza min çavkaniya xwe ji hesasiyeta min û pir tevdîrbûna min digire. Tevdîr jî, xwe bi feraset û pêwîstiyên wê ve şiyar hiştin, rêvebirin, xizmetkirin, dana axaftin û

karkirine. Ji bilî vê rêber çênabin, ji bilî vê fermandar jî çênabin. Hûn di vê mijarê de hinek rêbazên ku ji bavê xwe fêr bûne xwe dixapînin. Li gorî min muxtariya gund jî evqasî erzan nayê bidestxistin. Rewşa we ji ya muxtarê gund jî paşketîtire. Lewra hûn ê bi pîvan, hişyar û durist bin. Kesayetên hişyarî û duristbûna wan hebe ti carî weke we nabin û winda nakin. Her tim vê îdîa dikim. Ji bo têkoşînê yek tişt pêdivî pê heye, ew jî rûyê rojê dîtin û henase girtin û dayîne, ya peyre jî serkeftine.

Di ti demên dîrokê de mirov evqasî bê kar nemane. Min di karê rûçikandinê de jî rûçikand, pembû jî kom kir, kevir jî rakirin, ev karên cidî û girîng bûn. Piştre dema min dît rê girtîne, wê demê min serê xwe li ser pirsa; “Kar çawa tên avakirin?” êşand. Min herî paqij dirûçikand, bavê min her tim li karê min dinêriya û bê qusur didît. Şêwaza min a kar bêhempa fetih dikir. Min di nava mercên gund de jî bê kêmanî kar dikir. Tevî vê min ew kar nebes dîtin. Herî dawî jî giham asta qedandina zanîngehê. Lê min got; “Xetere ku mirov xwe zêde bi van karan ve mijûl bike.” Min wisa dest bi şoreşgerî kir. Xisletek min din wisa ye: Karekê pir baş dikim an jî xwe tînim asta ku baş bikim. Piştre jî li ser wî karî dihizirim bêka têrê dike yan na. Heta ku heqê karekê nedimê nabêjim; “Aciz bûm, nikarim” û dev ji xwe bernadim. Ecêbe, ev xisleta min hêjî heye, heta heqê karekê nedimê jêvenagerim. Piştî ku bi rikek mezin wî karî baş dikim, dibêjim ev kar evqase û dev ji wî karî berdidim. Paşê jî dibêjim; “Karek nû û encamgir ji min re pêwîste.” Me zanîngeh jî wisa qedand. Bal bidinê, min dikariya li gorî pîvanên rojane karek herî baş ji xwe re hilbijêrim, lê min weke heyî hişt.

Li hember vê xisletê şaşî yan jî qusurek we ya pir girîng heye. Hûn ti karî ser naxin û paşê jî tevlî partiyê dibin. Ev şaşe. Hûn ê hemû karên din baş bikin, paşê bêjin; “Ev hemû kêmin, karê herî xweşik ê PKK’ê ye” û wisa tevlî partiyê bibin. Misoger hûn ê nêzîkbûn û tevlîbûna xwe ya ji PKK’ê re wisa pênase bikin. Ji bilî vê hemû tevlîbûnên din şaşin. Her çendî civak di asta nirxên zêrîn de jî çiqas kar bide we, hûn ê bêjin; “Ji bo yek ji van karan jî ne hêja ne.” Min wisa kir. Ger min wisa ne kiribûya, dê min bi qusurên xwe ve dest bi PKK’yîbûnê kiriba. Karek ji destê min

dihat, jixwe civakê jî ev ji min re digot. Di nava mercên wî gundî û heta yên welayetan de, di nava mercên çar-pênc kesî ne dikariya ji bin rabin de, dema min derfetek mezin a kar ava kir, min ji gundiyan re got; "Binêrin ez vî karî ji we re dihêlim." Wê demê bi cidiyeta min bawer kirin. Paşê jî hemû karên min kirîn wisa bûn, karên leşkertiyê jî wisa ne.

Ma hûn dihizirin van karan xwe bi xwe dikin? Na, piştî we tînim asta dikarin karekê bikin paşê ji we re dihêlim. Hûn hêj nizanin rast tevlî karekê bibin. Ger karek ji destê we neyê, jixwe qet karê şoreşê ji destê we nayê. Niha karê şoreşê yê ez dikim, di cîhanê de karê yekemîne. Bi rastî jî ev kar weke sihrekê ye, mifteye û bandora wê jî wisa ye. Cewhera wê jî wisa ye: Ger mirov di mijara karê herî hêja de kar bike, dikare karê herî berhemdar û xweşik ê ku ti teknîk nakere bike ew pêk bîne. Belê vaye ez jî nûnertiya vê dikim. Karê miletek ku lewaz ketî û heta atomên xwe parçe bûyî birêxistinkirin, karê yekemîn ê di nirxa zêrîn de ye. Karê zêrîn ê duyem jî, miletê di pêvajoya îmhayê de, li ser wî kêr tê hejandin karê li hember vê dana şerkirine. Ya sêyem jî, karê jiyana xweşik û azade. Kesên xweşik û azad dijîn, bi bandora wê jiyanê ve misoger her cure fikir û çalekiya hêja jêveneger dibînin û karên di asta nirxa zêrîn de pêk tînin. Ji we re dibêjin rêxistinbûnê pêk bînin, hûn direvin; dibêjim şêwaza xwe ya çalekiyê pêş bixin, hûn dibêjin; "Em amadene hezar carî bimirin, lê belê ji bo çalekiya rast ne amade ne." Dibêjim ji bo jiyana xweşik têbikoşin, hûn dibêjin; "Ji jiyana wisa re na."

Van teva ji bo hûn wate bidin dîroka PKK'ê vedibêjim. Nabe ku em vê dîrokê biçûk bibînin û ji rêzê pêşwazî bikin. Ev dîrok, dîrokek berxwedanê ya bêhempa ye. Yeqîn nakim di dîroka partiyek din de mînaka berxwedaniyên wisa û êşên wisa hebe. Em dixwazin bi şêwaza bingeh û rêveberinên wisa ve têgihiştinekê ava bikin. Pêwîste hûn jî vê têrkar û durist fêm têbigihijin. Ji ber her tişt di vir de veşartiye. Ev ji bo welat, ji bo gel, heta ji bo mirovahî karê tenê rast û girînge. Ger egîdiyek we hebe, misoger pêwîste hûn hinekê xwe di vî karî de diyar bikin. Evqas sondên ku ji şehîdan re hatîn dayîn hene. Pêwîste ev sondên ku ne ji yekê re ji hezarî re

hatîn dayîn bê ku werin taloqkirin, misoger xwedî li sonda van nirxan bi xwe re bidin jiyîn derbikevin. Hedê kiye ku van şehîdan binpê bike û jibîr bike? Ma me dev ji xwe berdaye û ewqasî jî xafilin bikarin îxanet li van nirxan bikin? Ger hûn bal bidinê em dixwazin bi van re hem we fêm bikin, hem jî PKK'ê rast vebêjin û gengaz be hevgerimbûn û yekbûna we bê ku taloq bikin –ji ber ku yek demjimêr û roja me ya ku em taloq bikin nîne- saz bikim. Nirx jî didim we, ji ber ku hatina we ya ber bi me ve jî karek pir hêja ye. We jiyanên xwe feda kirine, ev jî pêwîstiya nêzîkbûnek hêja derdixe holê.

Neçarim di vê de bi israr bim: Hûn nikarin bêjin; "Bi me re hêviya mirovahî, egîdî û jiyanê, xweşikbûn û serkeftin xilas bûye." Ma em ê çawa vê bipejirînin? Çîroka van xilasbûnan di çavên we de tê xwendin. Cewherek PKK'ê ya dixwazin bidin windakirin heye û ez jî dixwazim pêşî li wê xeternakiyê bigirim. Li hember evqasî berxwedanî, evqasî şehadet, evqasî kul û derdan li ber xwe dayîn, ji bo vê xisleta PKK'ê ye. Em misoger wê weke nirxa herî zêde pîroz û weke nirxek bê jiyîn dibînin. Em neçarin hemû jî xwe bigihînin vê xisletê. Kes nikare bi ti hêcetî bêje nikarim xwe bigihînim vê. Kî bêje; "Nikarim nûnertiya wê bikim" pir çewte. Em ê jî wî sextekarî bibînin û derbixin holê, wî bê ruhî û rebenî ji nava xwe derbixin û bavêjin. Weke ku ti rêya me ya jiyanê nîne, halê we ya xwe ferz dike ji rûyê we tê xwendin û ez gefek weke; "Berde, em ê şaşiyê ferz bikin" dibînim. Ref û reftarên we yên her cure jiyana kirêt erê dike jî gelek berfireh tên dîtin. Neçarim ku li dijî van jî rawestim.

Ez şer weke we fêm nakim. Wisa yek-du leşkerên Tirk kuştin, li gorî min aliyê şer ê herî hêsan a ku nayê xwestine. Em dijmin ji bo li pêş vê jiyanê astenge dikujin. Nexwe naxwazin yek dilopek xwîn birijînin. Ger li pêş me ne astengbûya yan jî nexwestibûya jiyana me îmha bike, ma min dikariya bi tena serê xwe evqasî şer bikim û bigihînim heta vê astê? Felsefeya we ya şer jî xirabe, dikare bê gotin qet tine ye. Bi qasî felsefeya we ya jiyanê nîne, we dît fermandarên me yên fêlbaz jiyana xwe çawa li ser we ferz dikin. Ger min weke kes pîvanên xwe berçav negirtiban, dê min jî

xapandiban. Jixwe demek dirêj jî xapandin. Ev jî vê rave dike: Kar hêjî di xeteriyê de ye û hûn jî yan xefletek mezin dijîn an jî di xewreşiyê de ne. Li gorî ku hûn xirabiyên ku artêşa dijmin bi xwe jêvegeriyayî dijîn, dijmin derfetên xwe bi reforman sererast dike bidest xistiye, xeternakiya we ya kontrabûnê mezin dibe. Gelek mînakên vê yên şênber hene.

Nexwe, ev mijara partiyê heta dawî dijwar û girînge. Misoger pêwîste yên nû jî, yên kevin jî li ser bingeha têrkar û jidilbûnek rast beşdarî partiyê bibin. Di vê mijarê de zorî li ti kesî nayê kirin, lê divê xapandin jî nebe. Ji bo we fêm bikim, tişta ji destê min tê dikim. Bes êdî hûn jî bi navê gel hewl bidin me fêm bikin. Heta bi qasî Emerîkayiyan, bi qasî serbazên Tirk, heta bi qasî xwe ji vê xefletê rizgar bikin hewl bidin me fêm bikin ku, em jî bizanin hûn xwediyê sonda xwe ne û aresteyî plansaziya jiyanê bikin. Me gelek heval şandin welat. Hûn dizanin hinek ji van çawa dan windakirin û çawa hatin windakirin. Kesayet ku koka xwe daye axê û gur bûyî nîne.

Dema ez hatim van deran, min li welatê xerîbiyê ji sifirê destpê kir. Dibe ku hûn bêjin; “Gel alîkariya te kir, ne te her tişt ava kir.” Bes ji ber ku ez hebûm ev pêşketin jî çêbûn. Hezaran kes di vir de hatin û çûn. Gelo çima nekarîn tiştekê bikin? Pêngavek hewce dikir, ew jî min pêk anî. Hûn hemû geriyan, ji cihê ez çûmê zêdetir warên berhemdar geriyan, mixabin we ya heyî jî ziwa kir. Heta pişgiriya ku kesekî nedayî min, min da we tevan. Ez ji bo hûn bizanin ew rewşên xwe birçî hiştin, xwe ziwakirin û xwe dana kuştin ne çarenûseke vedibêjim. Ma cihek ji vir ziwatir heye? Li her cihî nirx tê avakirin, lê yeqîn dikim li vir avakirin a herî zehmete. Mirov li vir ne hewaya welat digire, ne şikeft, ne ax, ne ewr û ne jî barana wê dibîne. Li vir her tişt a hinek dinê ne. Lê em li vir ava dikin û vaye ava jî kir. Dema dipirsim; “Hûn çawanin”, dizanim ku hûn di asta birçîbûnê de ne, sefîlin, belengazin û direcifin. Lê ji bo hûn li hember min bidin diyarkirin li ser lingane dibêjin; “Em başin.” Mixabin daneyek ji başiyê tine ye. Ma çima we xwe xist rewşa sefî û belengaziyê? Ez ne wisa me, her roj tiştekê didim her kesî û hêjî dewlemendim. Hûn nikarin tiştekê

bidin xwe jî. Ji ber eleqeya vê pir hişk bi terbiyê re heye.

Min wisa xwe terbiye kiriye, dema derdikevim pêşberî mirovan, yekser tiştek ku wan eleqeder dike datînim pêşiya wan. Ev daneyek û lîstokek bû; niha jî ev şerek mezin, şerek hilberînê ye. Çi êşe ku xiroşa vê jî bi we re nîne. Xweziya ev kar bi leşkertiya pere pêk hatiba, daku me mûçe bida we! Fermandarê sexte Zekî (Şemdîn Sakik) dibêje; “Em jiyanê pêş bixin, mêrxasan bizewicînin.” Xweziya çareserî çêbûya ku, me yekser bi vê rêyê xwe saxlem kiriba! Xweziya ev kar bi nirxên ku we diyarî hevdu kirî û gotinên nerm ve bimeşiya! Bes ev kar wisa nabin. Ger tişta ku hûn dibêjin bikim hûn ê bibin xayîn an jî ya dibe jî wê di rojekê de biqede. Ango ne ku ev xwestekên we ne gengazin, ji ber têkoşîn bi van nayê mezinkirin û bidestxistin. Ger hûn mirovek bi mûçe ve girêdayî bûna, hûn ê bi qasî pêşmergeyên Barzanî bin. Hûn jî dibînin ku gundî ji bo hevjîn an jî hevserê xwe di çi halî de ne. Jiyînek wisa îşkenceye, lê rastiye. Ma em ê van karan ji bilî vî rengî çawa bikin, deka hûn bijîn.

We di pêvajoya dawî de şêwazek wisa pêş xistiye û dibêjin; “Em ê bertekan wisa pêş bixin.” Hûn di rewşek bertekên dijber de xwe di radeyek bilind de birçî dihêlin û ji min jî tolê digirin. Ewqas pere ji we re hat dayîn, rê hatin vekirin, tişta dixwazin dikarin bikin. Weke din li her aliyê welat giya, dar û her cure nebatên xwarinê, heta keriyên pez hene; heke we xebatek xwêkirî çêkiriba hûn birçî nediman. We çima xwe birçî hişt? Ya rastî dema hûn wisa dikin, ji min tolê radikin. Ti raveya vê rewşa hûn dijîn nîne. Xalek din jî, hûn sed hezaran fîşekan, çek û pêxwarinên ku dikarin pê rolên pir girîng bilîzin hemûyan dixin destê dijmin. Heta hûn rêhevalên xwe, wan mirovên ciwan, berxê dayîkan terkî mirinê dikin. Ma ev çarenûse? Lê belê taktîkek baş were pêşxistin, tiştek bi yekê nedihat. De werin vêca hêrs nebin! Hûn vê bi niyeta xirab nakin. We di dema xwe de bawerî bi perwerdeyê naniye. Weke ku hûn pirsên gerîlayek çawa tê avakirin, gerîlayek li çiyê çawa dijî ji xwe nakin, hûn tenê ji bavê xwe dê gundîtî çawa be, konê gund çawa bê vedan û pêwendiyên gund çawa bin fêr bûne. Ger bi vî rêbazî mirovbûn pêk hatiba, dê pêşî bavê we bibûya mirov.

## Yek Ji Armanca Girîng A Şer Jî Pêkanîna Evînê Ye

Her wiha pirsgirêka we ya hest û evîndariyan heye. Ev jî dibe hilhila vî karî. Weke hûn her tiştî dikin, nermoka vê jî nekin xweşiya wê namîne. Dema em ketin nav vê qadê jî, ji ber ku ji qadên hesase, dibe tinebûna hemû tiştî. Xeleka dawî wisa ye. Jixwe xala Kurd herî dawî xwe tine dike jî evdere û hûn dixwazin vê jî di nava me de temam bikin. Zilamê reben di şer û hêzê de îflas dike, peyre jî –ez zêde keçan tewambar nakim, zilam pêwîste bên tewambarkirin- ji ber ku qaşo serdestî, vîn û hêz bi wî re ye çav diberdê keçê. Nekariya li dijî dijmin û paşverûtiyan bibe desthilat, dixwaze li hember keçek reben bibe desthilat. Ma ev neşerma herî mezine?

Ez dikarim ji vî aliyê xwe ve jî, xwe bi du hevokan bidim nasîn. Hêzek min a desthilatî ava bûye, hêza min a li hember emperyalîzmê axaftinê heye, li hember min pir bifikarin; bes tevî evqas hewldanên min, weke hûn dikin, xwe li hember mirovên lewaz, van şervanan, nexasim van keçan weke hêza desthilat ketîbûnekê raber nakim. Binêrin cudabûnek me çiqas mezin heye. Ma mirov li hember mirovên lewaz xwe hêzdar raber dike? Mixabin em nikarin di vê mijarê de leza fermandarên xwe rawestînin. Hinek jî tevizîne, dibêjin; “An em ê dev ji jiyanê berdin, an jî bibin cinawir.” Em ji van fermandarên xwe re dibêjin, tu çima mirinê esas digirî; sedê salane dijmin mirinê li ser te ferz dike, hinekê jî li ber xwe bide. Piştî ku hûn bin ketin şûna birevin cem jinê, hinekê jî ber bi serkeftinê ve bazdin.

Tişta di cewhera têkîliyên we de evin: Li cihê ku binketin destpê dike û rêxistin xilas dibe de xerîzeyên we û hestên we yên herî hov gur dibin. Mixabin pêwîst bû berovajî vê pêk bihata. Dema hûn ber bi serkeftinê ve bilind dibûn û hûn diçûn ku dijmin bin bixin, pêwîst bû hestên herî mezin pêş ketiban. Ev pênaseya **Evîn**’ê ya rasteqîne. Azweriya azadiyê her tim wisa tê vegotin.

Mixabin hûn vê her tim berovajî dikin. Navê wê jî dikin têkîliya jin û zilam û her roj zimandirêjiyê dikin. Hûn ti caran naxwazin xwe rast bi me bidin nasîn.

Têgehên weke mijarên civakî, jiyana civakî hatine pêşxistin. Min gelek caran jiyana civakî bilêv kir. Lê belê ew berovajî ya me bilêv kirî ferz dikin. Ji bo jiyana civakî wateyekê rave bike, me got neçare em bi xalên pir girîng ên siyasî û leşkerî ve bên girêdan. Weke mînak min jiyana xwe vegot. Ger min jiyana xwe bi yekbûna rêxistinbûn û siyasîbûnê ya bêhempa ve saz nekiriba, jixwe dê jiyanek bi navê jiyana civakî nebûya û hêjî wisa ye. Ev hemû vekirîne û me selmandine. Hestên we heta dawî korin û ji hêz dixin. Ev jî heqaretek mezine. Mirov şaşwaz dimîne ku hûn çawa diwêrin vê bikin. Tevî hatime vî temenê xwe, hêjî pêwendiya bihêz dike û evqasî bihêzkirina jinan kêm dibînim. Yên me li dijî vê ne û dibêjin; “Jina ku serê xwe radike cinawire.” Fermandarê bi navûdeng Zekî, li benda jina ku vîna wê tine bûye û çar bi çar teslîm bûyiye yan jî li têkîliyên ku heta dawî di ferdperestiyê de fetisiye digere. Ev çendî şermek mezine!

Ya herî xirab jî ruhê we fêrî vê bûye, ango hûn serbest bimînin dê hûn tev wisa bin. Ev li hember mirov û evînê heqaretek mezine. Di vir de ti daneya rêgeza xweşikbûnê nîne, tiştek bi têgehên ku mirov bêje xweşike rave bike nîne. Belê mamosteyên aqilê wisa derketine û di nava we de jî pêkhênerên vê yên çavsor hene. Min ji we re vekir evîndarî ne tiştek hêsane. Min ev dahûrand û gelekî jî bi zanistî bilêv kir. Yeqîn nakim niha ti psîkolok û civaknas bikarin vê pênaseya bihêz bikin. Hêza we tine ye. Gelo yên bêhêz dikarin çi girêdanê bi evînê re saz bikin? Mirov qet evîndarî kesayeta we nabe. Ji ber evîn ji berê de di kesayeta we de miriye. Gelo şûna wê çi maye, hûn dizanin? Xwecihên Afrîka mirovên pir xweşikin. Lê asta têkîliyên wan ên herî paşverû jî ji bo min pir watedare. Lê mixabin a we weke çiravek reşe.

Sedema vê di tevahî dîrokê de mêtîngeriya ku pêş ketiye û hûn neçarin van fêm bikin. Hûn dibêjin; “Dilê min hest dixwaze.” Ev çi heste? Mane bi we re tiştek bi navê hest nemaye. Yek ji armancê vî şerî ya din jî, pêkanîna evînê ye. Ji bo em hêz bidin van keçên

reben da ku bikarin bi xwe bimeşin jî, ev çil sale em amadekariyê dikin. Keçek bikeve destê we, wê di bîst û çar saetan de ne ruh, ne jî fîzîka wê bimîne. Jixwe dê peyre jî zilam weke xoşavê jihev bikeve. Rewşa evîndarê me dawî jiya jî wisa ye. Ma kesê ku hez dike û evîndar dibe wisa dike? Hûn ê jî van fêm bikin û wisa bijîn. Em ne ji wan tîpên ku hûn dinasine. Hûn ê fêm bikin ku ez ne "Hasoyê mêşgirtî" me. Ti keç û xort nikare me ji rê derbixe. Kesên tên cem me hewcedariya berzbûnê esas digirin. Dev ji ketin û danaxistinê berdin, ez behsa firdana ber bi asîmanan ve dikim. Me ev selmand. Em ne li dijî evîn û hestên we ne, lê gelo hûn ber bi esimanan ve firandin, vaye ev xal ji bo we negîringe. Xeta we ne wisa ye, peyre jî hûn ê yekser nebêjin; "Ez li erdê ketim, parçe bûm."

Para mezin nakim a xwe yan jî nabêjim her tişt min kiriye, lê yeqîn dikim ku min rêya evîna rast jî vekiriye. Bi baldarî vê lêkolîn bikin. Ez zilamek aqilmendim, bi rastî jî tiştna dikim, lê mixabin hûn jî xirab dikin. Ew hemû keç û xortên ku hûn dildar dibin min ava kirin. Dibe ku hûn ne di ferqê de bin, bes em hêjî hewl didin jiyanê fêrî wan bikin. bifikirin hemû aliyên fîzîkî, ruhî û cînseltî bi qusur û kêmin; ez jî hewl didim di asta bêhempa de sererast bikim. Ma heta ku ev nebin hestên girîng pêş dikevin? Hunerek ku we ji dê û bavê xwe girtî hene. Kî çawa yeke din xapand? Hêjî di bîra min de ye: Di sala 90'î de digotin; "Em li çavên hevdu dinêrin, fêm dikin çi dixwazin ji hev re bêjin." Başe ku me xwe li vê evîndariya çavsor neqeliband. Ji ber ger tu evîndar bûyî diqedî. Ger min xwe ji vê re negirtiba, ji kesayeta min jî kesek kêrî pênc quruşan bê dernediket. Zêde pesnê xwe nadim, kesek me, zêde ji mirovan bandor dibim, lê hêjî xwe bi tevdîr dimeşînim. Di pêwendiyên bi hemû mirovan re dilê min heta dawî şiyare. Bawer nakim nirxa ku didim mirovan hûn bi kesek din re bibînin. Dîsa ji xwe re dipêjim; " dibê ku wisa rû bide" û li hember vê tevdîr digirim. Ger hûn jî wisa bin her ku biçe hûn ê mezin bibin û dibe ku hêsan jî nekevin.

Ger em we serbest berdin, wê di asta jin û zilam de kesek ku hevdu nexapîne nemîne. Hûn bîrdozî, polîtîka û rêxistinê piştguh dikin, yekser dibêjin; "Bila ev li aliyekê bimînin, bila fitne û

fesadiyên me jî li aliyekê bin.” Elbet di vir de her tişt tê windakirin; artêş jî diçe, jiyan jî diçe û evîn jî diçe. Niha hûn ê ji min re bêjin; “Ev tiştên ku tu dibêjî me pir tengav dike.” Bes ne ez pirsgirêkê derdixim, tenê hêcetên derbaskirina pirsgirêkê ava dikim. Gelo dijmin ji bo we çi dike? Ma li gorî berzbûnê bi qasî quruşekê jî nirx dide nasname û kesayeta we? Ma rizgarkirina jiyanê, rêzdariya li hember jiyanê û vexwendina xweşikbûnê ne pir girînge? Çûk jî li cihên pir ewle, qet nebe li cihên ku destê mirov û maran nagihijiyê, bi ferasetek ewle hêlîna xwe çêdikin. Deka li xwe binêrin, ger dijmin destê xwe dirêj bike dê yekser bi qirika we re bigire. Ev çine, qaşo hestewarî pêş dikevin! Ecêb dimînim. Ma we li çûka jî nenêrî û hinek tiştan fêr nebûn? Hûn ê ji jiyanê hez bikin.

Dema van dibêjim, kes ji we re nabêje dev ji jiyanê, hestên mezin berdin; berovajî ez dibêjim, hemû diyalektîka jiyanê ji aliyên felsefî heta estetîk fêr bibin. Van fêr bibin. Ev kar wisa bi fêlbaziyên gundîtî ve çênabin. Ger ev kar bi fêlbaziyên gundîtî ser ketiban, em ê li pêş hemû cîhanê bûna û dê evîndarên bêhempa jî li wir derketan holê. Dersên PKK’ê yên bîrdozî û şer her tim li ser vî bingehîne. Lê we şêwazek wisa ava kiriye, hûn ji jiyanê qut bûne û tine bûne. Em ê şêwaza pêşî rêxistinê, peyre hevdu û herî dawî jî xwe tine dike ji holê rakin. Ez yeqîn nakim ku ev ji bo mirovan xwezayî be. Ya misoger israra di mirovbûnê de ye.

Hêvîdarim di vê kêliya ku partiya me fermî bîst saliya xwe dijî de, em ê xwedî li xisletên erênî yên ku dijmin jî ketiye ferqa wan derbikevin, li dijî aliyên xisletên xwe yên xirab li ser me ferz dikin şerek karbidest bimeşînin, ji bo vê jî hem mayîndekirin û hem jî di misogerkirinê de bibiryarin. Ne tenê bi biryar, hêvîdarim hûn kêlî bi kêlî di nava hewldanek têrkar de bin. Pêşî em ê hêza derbaskirina vê xeteriyê raber bikin. Dîsa hûn ê bi vê re aliyên berxwedanî û serkeftina dîroka me ya bêhempa cardin bi heman misogeriya biryardar û hewldana karbidestî ve bikin malê xwe û bi pîvan nêz bibin. Hûn ê di mijara jiyana azad de nirxek mezin bidin pêşketina balkêş a me saz kirî –jixwe ev kesên bêruh ber bi vejînê ve dikişîne- û eleqeyek mezin raber bikin. Hûn ê xisletên van hem pênase bikin, hem jî xwe li ser vî bingehî jîndar bikin. Em ê vê sala

fînalê ya bîst saliya partiya xwe li ser bingeha hêjayî van rastiyan pêşwazî bikin. Nexwe aliyên berovajî biryardarî nayên derbaskirin û ger di ketina sala bîstemîn de bi bandor be, em ê îxanetê li vê partiyê bikin û dê partî ji nav destê me winda bibe. Xeternakî evqasî mezine.

Em di dîroka xwe de cara yekê di quntara jiyanek serfiraz de cî digirin. Pêwîste em weke dev ji vê jiyanê bernedin xwedî lê derbikevin, ji ber vê jî heta dawî berpirsyarî û cidiyet raber bikin. Kêmasiyên her mirovî hene; bes her ku em jiyan dikin, hewl didin hem van sererast bikin, hem jî derbas bikin. Dema me dest bi vî karî kir, kesek ji we tevan lewaztir bûm. Lê piştî ku me biryar da em ji we cewaztir bijîn, bi bawerî û duristî ve, min her tim bi qasî ji destê min hatî hewl da û ji bo min pîvan bû ku pêwîstiyên jiyanê bicîh bînim. Dikarim misoger vê bêjim: Cewaziya bi min re domdare, xelek li ser xelekê servekirine û bi vê re jî ger hebim dibêjim heme. Hûn bi kêmasiyên xwe ve domdariyê qut dikin, bêndên we qutin. Ger hûn hêjayî nirxek zêrîn jî bin, ji ber ku hûn ji yên din qutin li erdê belav dibin. Maşîna şoreşê tenê bi xeleka saxlem pêşve diçe. Hûn jî ji ber ku hemû xelek qutin, nikarin bibin xelek jî. Em dev ji xelekek saxlem jî berdin, ji ber nelêhûrbûn û xelek bi ser xelekê ve nekirin, we bi şêweya xelekên qut vir û wir ve belav dike û tiştek hêja nahêle. Vêca em ê vê derbas bikin û lêhûrbûna li ser jiyanê domdar û misoger bikin.

Di vir de windahiyên me negirîngin; yek diçe, deh xelek amadene û bi ser ve zêde dibin. **Dîroka PKK'ê, dîroka nebinketinê ye**. Ev jî ji ber pergala li pey hev, bêhempa û zêde xelekên bi ser hev ve pêşve diçe. Ger hûn jî wisa bin, em ê li her qadê bi rêhevalên saxlem ve pêşve biçin. Yekê pirtûk nivîsandiye, ji bo me dibêje; "Komare." Em ne tenê komar, aborî, civakî û leşkerî, plansaziya hemû aliyên wê dike û otorîteyek wê bi xwe disepînin. Dixwazim vê bêjim: Em ne tenê di wateyek kevnar de partî ne. Em şêwaza rêbertiyek ecêb birêve dibin. Ev jî ne çav û birhên min ên reşin, saziyeke. Ez hebim jî, nebim jî dê ev berdewam bike û hîn ji niha ve ji dewletên heyî bandortirin. Hûn ê hinekê jî PKK'ê wisa pênase bikin. Pergal, rêgez, pratîk, jiyana nû

û şerê PKK'ê ya ji pergala dewletê cudatir heye. Ev hemû heman weke pergalek dewletê di nav hev de ye. Heta ez van dewletan li paşmayî dibînim. Ji wan re dibêjim dewletên dînazor. Dewleta nû ya me ye. Me ev hinekê pêk aniye. Em dizanin zêdetir jî bikin, quralên wê jî ava bikin û naveroka wê jî dagirin. Ev hewldanek mezin, bêhempa û pir xweşike, lê pêwîste mirov pêşî vê bibîhîse û fêm bike.

Tişta li vir pêk tê, em ji îdîayên mirovahî bigirin, ji nû ve dîtina hemû tiştên ku mirovekê winda kirine. Lewma hem li hember PKK'ê eleqe evqas mezin dibe, hem jî tê gotin; "PKK cihê nûnertiya meylên ku mirovahiyê winda kirine." Hêjî li hember PKK'ê eleqeyek ku dê hestên mezin ên mirov bê dîtin heye. Bal bidinê, PKK ne tenê partiyeke, lêgerîna jiyanekê, lêgerîna civakek nû ye. Hûn ê hewl bidin PKK bi kûranî fêm bikin. Xebatên artêşê jî parçeyek vê ya biçûke. Aliyên wê yên din jî pir girîngin. Ev hemû yekparene, yek nebe ya din nabe. Pergaleke û yek xeleka wê ya qut nîne. Lewra pêwîstiya we bi perwerdeyek pir cidî heye. Heta hûn hîn nebin hûn ê jî bêjin "qet" jiyan nabe û bijîn; "PKK partiyek wisaye ku vê heq nake" û wisa nêz bibin.

Yeqîn dikim, ev bûyera ku me ji bê derfetiyan ava kiriye hîn ji niha ve em dikarin bixin bin xizmeta mirovahiyê. Ne tenê gelê me, em dikarin bixin bin xizmeta hemû gelan û mirovan. Evîna PKK'ê wisa ye, lehengiya PKK'ê li ser vî bingehî ye dê serkeftina PKK'ê jî li ser vî bingehî be. Ji bilî vê ti wate nîne ku em we pêşwazî bikin. Hûn li kur dinêrin binêrin, parazvanên hemû dozên mezin û şoreşên mezin bi rêgez û şervanên xwe ve wisane. Ji bilî vê tiştek din ji me hêvî nekin; eleqe û têkîliyên li gorî pergalê ji me nexwazin; li benda pêdiviyên rêgezên mezin û şerên mezin bin. Hûn tevlî refên me bûn, we ev dît û li vê geriyan. Her wiha piştguh nekin ku ew nan û av, jiyana ku hûn hewl didin bi dest bixin jî ancex bi vê gengaze. Hemû dewlemendî encama şerê van rêgezane. Hemû kesên ku rêgez û şer danîne aliyekê niha birçîne. Lê ez ne birçî me û ev negengaze jî. Ez ji her hêlê ve dewlemendê herî mezin ê vî welatî û vî gelî me. Ev ji bo şerê rêgezên min ên bêhempa esas hatine girtin lewma wisa ye. Ev pir zelale. Ma hûn

dikarin çi bixin plana duyemîn û çi bidin pêş?

Vaye ev PKK ye, ev Rêbertî ye û ev Serkeftine.

**24 Mijdar 1997**

## DI PKK'Ê DE HER TIŞT LI GORÎ KESAYETA SERKEFTINÊ HATIYE SAZKIRIN

Jiyan nasekine, bes ji ber ku jiyana we li ser bingeha azadbûnê girêdana xwe bi demê re çênake, hûn ji bilî astenbûnê encamek din nagirin. Pirsgirêka me ya herî bingehîn ne rewşa me ya li hember van êrîşên şer ên dijmine, ne jî ew an jî ev kêmasiyên me yên dervî kesayeta me ne. Sedema em her tiştî winda dikin, di çavkaniya van xirabiyan tevan de kesayeta me ya **binkeftî** ye. Ger em pir şiyar nebin, sedemên van sedsalên ji bo me kirine sedsalên windayî, di van xebatên me yên azadiyê ya em pir bi îdîa ne de, dê heman lîstok bê lîstin û bi me bidin windakirin. Him nirxandinek saxlem a dîrokî, hem jî bi vê ve girêdayî ji ber ku em pir şiyar nêzî bersiva ku pêwîste ji rojaneyî re bê dayîn didin, em siûda sedemên her roj mirov dixe –dibe ku ji dervî we jî be lê ev we jî ava dike- û bandor dike nadin û vê lîstokê fêm dikin lewma em nakevin nava vê lîstikê. Derfeta me ya herî mezin jî wisa ye. Ev girînge. Ji ber ku heman sedemên ku sedî salan dan windakirin, kêlî bi kêlî ji binkeftinê re rûbirû dihêlin. Bes weke kesayet şêwaza min a xwe avakirinê, weke ku hêjî ez nexistime, min ber bi çareseriyê ve dibe.

Êdî hûn dizanin hûn ê encamê ji vê derbixin an na. Em bi mebesta rêhevaltiya xwe tişta para me dikeve kêlî bi kêlî pêk tînin. Her ku em kesayeta we dahûrîn dikin, ez tiştên ecêb dibînim. Ji nava pirsên ev ji kur tên, çi û çawa bikar tînin, xwe çawa dinirxînin, dixwazin bibin çi û bûne çi derketin, bi rastî jî egîdiyek mezin dixwaze. Ev hemû jî derketin holê yan jî hatin derxistin. Me di wateyekê de lîstoka rebenan û bêçareyan xirab kir. Ji ber ku ev kar pir bi zewq bû, me dev ji vê lîstokê berneda. Ev kesayetek wisa ye, sedî salane ji yên hatî re gotine axayê min, ji yên çûne re jî gotine paşayê min û bin ketine. Bes dîsa jî xwe her tim di derbarê jiyanê de bi namûs û serfiraz dibîne. Heta di mijara serkeftine,

binkeftine, koletiye, azadiye de pirsan jî ji xwe nakin. Bes bê ku aciz jî bibe dihesibîne ku bê bijî.

Elbet ev tiştek balkêşe. Min lê nêrî, di nava pratîka me de di kêliyên qet nabê de, li cihê partiya û di pêvajoyên herî girîng de, hewl didin me jî bi heman lîstokê bixin. Tevî sebir, hesasiyet û rêyên çareseriyê yên mezin, cardin dilêrin ku dîsa ya xwe bikin. Ev helwest berfirehin û hatiye dîtin ku ev nêzîkbûn li her qadê hene. Di şer de egîdî tenê bi hêza çors ve têra yên beramberî xwe kirin nîne. Jixwe, di roja me de ti wateya van egîdiyan nîne. Ev şêweya egîdî -em çiqas bixwazin bi bandorên emperyalîzm û mêtîngeriyê vebêjin- di rastiyê de hîn zêdetir pejirandî di kesayeta gel bi xwe û nexasim kesayetên wer dizanin ku bi navê wê rêbertiyê dikin de pir xetertir derdikeve pêşberî me. Ev jî dide diyarkirin ku emperyalîzm di asta çand û jiyanê de çiqas pêşve çûye û ya rastî jî derdixe holê ku binkeftina miletekî jî di vê kesayetê de pêk tê.

Elbet me ne tenê ev tespît kir, me giranî da karê çareserkirinê jî. Tevî vê, dema em li bûyerên di nava PKK'ê de diqewimin dinêrin, hinekê em bikolin em ê bibînin ev kesayeta ji sîxuran jî baştir xirabiyê dike bê ku şerim bike, bi şêweyek dilêr bi qasî misqalekê jî nêzî guhertin û veguhertinê nabe. Bi rastî jî ev kesayet heta dawî bê şerme û bi qasî bê hîse ewqas jî bê fikre. Dîsa di nava partiyê de bi nirxên azadkirinê ve hêz bidest xistiye, serwextbûnê zêdetir bi çêkerek hişk bûyî ve xwe weke kesek bi namûs dinirxîne. Heta hîn zêdetir gav davêje, dikare bêje ku; "Partî ya min e" yan jî "Partî ne ti tişte, ya girîng ferdperestiya ku ez pêş dixime." Elbet dema hîn berfirehtir tê nirxandin, çavsoriya vê kesayeta zêde feqîr ketiye, dema di wateya siyasî de talankerî û belengaziyê dijî, êdî hûn ruhê wî jî bistînin dê bi nasnameyek sexte ya partiyê ve ku dev jê bernadê bi şêweyek ku dijminê herî hosta jî nikare derbixe holê ve li dijî me derbikeve.

Weke em ji dîrokê jî dizanin, mînaka kurmê darê ji darê ye, rewşek ne yek bi şêweya hezar kurmî mîna dara azadiyê ya partî birizînin derdikeve holê. Êdî hûn dizanin, dixwazin van fêm bikin û xwe çareser bikin. Egîdî bersiva rojane dayîne. Hînbûna vê jî êdî karê we ye. Kesê hîn nebe nikare şer bike û di şer de jî nikare xwe

ji binkeftinê rizgar bike. Cardin hûn dizanin dixwazin van pêk bînin, an jî nekin. Bes ger hûn nekin hûn ê serê xwe li kevir bidin. Me jî ne dixwest di vê astê de dahûrînin, lê israra we em jî ber bi lêhûrbûnek hundurîn ve birin. Serî ji kesayeta we ya mirî û xilas bûyî re tewandin, li hember nirxên me yên berz heqarete. Lê belê ji ber ku em ji destpêkê ve xwedî ezmûnin, dev jê berdin em serî ji vê kesayetê re bitewînin, em neçarbûn ku şêwaza şerê xwe hîn sazûmantir ferz bikin. Lewra em behsa van xalan dikin. Hêjî hejmarek zêde kesên ku li hemberî me serê xwe dihejînin, lê berovajî vê disepînin hene. Hejmara kesên ku derewan dikin, serê xwe dihejînin û bi xapînokên weke wisa hatiye dê wisa jî biçê ve, yên dihizirin ku dê me jî bixapînin pirin.

Karê destpêkê yên nû beşdarî têkoşîna me dibin bikin, a ku karê me yê esasî ye, karê **xwe ji nû ve avakirinê** ye. Hûn şaş zayîne û şaş hatine mezinkirin. Hûn ji çalekiya afirandinê dûrin. Lê em li hember çalekiya afirandinê pir rêzdarin. Heta ew pêk neyê, bersiva hewce jê re neyê dayîn, divê hûn nehizirin kesî cidî bigirin. Hîn ez di deh saliya xwe de min li hember dê û bavê xwe, stargeha malbatê ya ku dixwest bandor li min bike diyar kir ku kes nikare bi gotinan bandor li min bike. Kesê ku rastiya we ya ji hêla dijmin ve hatiye înkarkirin û betonkirin ku kun kiriye û dibîne, elbet nabe ku reftarên we yên ne jidil piştguh bike. Ger hêz û cidiyeta we hebe hûn ê van hemûyan hîs bikin û rast nêzî me bibin. Nexwe ger ruhek we herî biçûk jî hebe, ne gengaze ku xwe ji piç piçbûnê rizgar bike. Ez ji bo hûn nebin Hesoyê berê van xalan vedibêjim. Paşê jî tevî evqas gotin, sond, hêz û çalekiya afirandinê, heyfê li halê we tînim. Ji ber ku ev bi safitî xwe dixapînin, dihizirin ku dê me jî bixapînin. Ev şaşiyek mezine. Ger hêza we ya hînbûn û guhertinê nîne, neçarim bêjim çi karê we di refên me de heye?

Şerê herî mezin hundurê xwe fetihkirine. Ji ber vê jî wext di nirxa zêrîn de ye. Kûraniya feraset, hesasiyet û terbiye pir girîngin. Pêwîste hûn di van xalan de astek nîqaşê pêş bixin. Me ev hemû jî bi şêweya şiyarî li ser şiyarî diyar kir. Bes mixabin hêjî em di vê xalê de nakokiyê dijîn. Lewra bi navê we pir xemgînim. Bi şerê xwe bi xwe re şêwaza ku min ava kirî û şêwaza we tînim berhev.

Neçar dimînim ku bêjim dê halê van zarokan –di wateya polîtîk û leşkerî de halê van zarokan- çawa be. Belê, ev di heman demê de niha di rewşek pirsgirêkek wijdanî de ye. Carina ji xwe re dibêjim, ez van çawa bi vî halî ve dişînim çiyê, nava gel, heta qada navnetewî. Ma ne heyfa wane? Lewma bi ser we te têm. Dîsa jî tevî ku em bi ser we de tên, kesayeta we ya weke berê spî ji belavbûnê rizgar nabe.

Min ne dixwest şerê hundurîn wisa pêş bixim. Ger hûn bal bidinê di destpêka dahûrînên me de ji vê hêlê ve yek gotin ne hatiye kirin. Berovajî wêjeya ev şêrên me baş dikin hatiye kirin. Lê paşê min nêrî ku, bi vê wêjeyê ve jî kar nameşe. Ji ber vê her ku we rik girt, em jî heta dawî bi ser we de hatin. Ger ma partî jî winda kiriba, dê me ev pirsgirêk çareser kiriba. Ji ber ku ji bilî vê ti rêyek din nîn bû. Ya rastî sebrek mezin dijîm. Sebra jiyana min a herî mezin, dibe yek ji sebrê dîroka mirovahî ya herî mezin be, ku min raber kiriye. Yeqîn nakim di wextek din de û di nava tevgerek civakî ya din de evqasî li ser qadroyan bê rawestîn. Elbet zêde ne dilxwaz bûm ku we bikişînim nava refên me. Sedema hişt ez we bikişînim nav refên me ji nirxên siyasî, heta nirxên leşkerî zêdetir, nirxên moral bû. Ez bi rêgeza exlaqek "Şûna ku wisa bijîn bila bimirin baştire" ve we dipejirînim. Nexwe ne ji bo leşkerên başin, dê polîtîkayê baş bikin em digirin nav refên xwe. Di wateyekê de min ev biryar ji mêj ve girtibû: Şûna ku di nava civakê de wisa xirab û bêşerim bijîn, bila bên nav refên me û jiyînê hîn bibin, bi qasî dikarin bila bijîn; lê ger nezanin bijîn jî bila bimirin. Me ev ji bo tevahiya gel jî berçav girt. Ger hûn bal bidinê ev ne rêgezek siyasî ye, rêgezek exlaqî ye û ev rêgez tê sepandin. Divê her ku biçe bi we re jî zanebûna rêxistinî, polîtîka û leşkertî pêş bikeve. Ancex dê ev we bibe rizgarî. Ger ev pêşketin çênebe, hûn ê li gorî rêgeza PKK'ê ya moral û exlaqî bimirin. Jixwe pratîk jî vê rastiyê pir dijwar diyar dike.

Partîbûn li ser bingeha dilxwazî dibe. Em nikarin partîbûnê weke eşîretekê û komek ehpapçawîş bihizirin. Nexasim hûn qet nikarin wê bi şêweya fermandar an jî şervantiyek ku di wateya leşkerî de ji têkoşînê re nabe bersiv bijîn. Ev niha pirsgirêkên me

yên herî mezinin û ji bo çareserkirina van jî em pir mijûl dibin. Jixwe hûn qet ne di wê ferqê de ne ku, çarçoveya hûn dikarin xwe li ser lingan bigirin çawa hatiye avakirin, derfeta pêşketinekê tê çi wateyê, heta hûn ê çawa bikarin xwe binasin. Em hostatiya van û heta dawî sedemên vê yên we şiyar dikin jî dixin çavên we. Mixabin derdikeve holê ku hûn hêjî van nabînin. Elbet em jî li hember vê dema dibînin tedawiya vê bi aspirînan nabe, vê carê jî rêbazên operasyonên giran ve yên emeliyatê diceribînin. Ger bi rastiya hekîmtiyê ve bînin beramberî hev, rewşa we hinekê vê rave dike. Kesayetên ku rêhevalên xwe di carekê de îxbarî dijmin dikin û qetil dikin hemû jî, li ber serê we derketine holê, yan jî di encama xefletek mezin de hûn bûne sedema şahadeta dehan hevalan. Ya herî xirab jî, hinek kesên ku li hemberî van rewşan bi qasî misqalekê jî dilê wan zîz nade. Di bin berpirsyariya xwe de dehan nirxan winda dikin, lê belê li hemberî vê dilê wan jî zîz nade.

Niha em ê pir cidî li ser vê mijarê rawestin. Nirxên herî pîroz jî di bin berpirsyariya van de û bi şaşiyên van dikevin bin erdê, yan jî pêşkêşî dijmin tên kirin. Gelo ev kesayet kîne, çine? Weke ku bi tiştên kirîn ve bihêz bûne, her wiha dixwazin tiştên kirine pêşve jî bibin. Ev pirsgirêkên pir xeternak û giranin. Aliyê ecêb jî, hûn qet bi van pirsgirêkan ve mijûl nabin. Ji ber ku hinekê jî kesayeta we berpirsê van pirsgirêkane. Asta xwe ya berpirsyarî xistin, heta ya rastir ji bo hûn asta bê berpirsyariya xwe pêş bixin, ev xisletek we ya bingehîne ku li ser me ferz dikin. Mijara ku hûn li ser pir hostane, bê berpirsyarî yan jî reva ji berpirsyariyê ye. Jixwe hûn bi vê ne polîtîka û leşkertî bikin, nikarin şivantiyê jî bikin. Ji bo ku şivan pezek xwe winda neke, tevdîrên dijwar û bêhempa digire. Yeqîn nakim hûn bi qasî şivanek pezê xwe diparêze bikarin xwe biparêzin. Elbet ev jî bi ketina asta berpirsyariyê ve girêdayî ye. Heta hûn dixwazin hewl bidin van xirab bikin û ji xwe re çêkerek guncav ava bikin; lê kesek ku hêjî di vî karî de îdîaya xwe winda nekirî heye, ango ez ê êdî heta hêza xwe ya dawî bi berpirsyarî û feraset li ser vî karî rawestim.

Pirsgirêkên hûrûkûr ku gelek ji we dijîn hene. Heta ku hûn xwe negihînin hêza dahûrandina van pirsgirêkan, dê dereng an jî zû

tengasiyên we biteqin û pêşî jî we tine bike. Di PKK'ê de her tişt li gorî kesayeta serkeftinê hatiye sazûmankirin. Kesek ku xwe li gorî sazûmankirina kesayeta serkeftinê amade û terbiye neke, dê biteqe û tiştek wî nemîne. Ev formûleke, lê li qunçikekê hatiye nivîsandin û tê sepan. Hêjî dema em xîtabî kesên me yên herî aqilmend dikin, ji her demê zêdetir bihêrsin. Em dibêjin; "Ger hûn nikarin peywirên xwe pêk bînin, hûn çima ser karin, çima derdikevin pêşberî me." Tişta ecêb, dema karên pir girîng, ronîkirî û dikare bên kirin ji wan re tê dayîn jî, dîsa xwe nadin ber. Di vê mijarê de ne di ferqê de ne ku li kîjan tehtê jî ketine, yan jî xwe dixapînin. Rika min û hinek xisletên min pir dijwarin. Bi encamek bêçare û trajîk re rûbirû tên, belengaz dibin, lê dîsa jî naxwazin sedemên vê fêm bikin.

Kesên ku xwe ji nirxên mirovahî ya bingehîn û karên pêwîste bên kirin dûr bixe, dê ji bilî xisleta bingehîn a tevgerek weke PKK pir bi îdîa, ji bo gel heye û biryardarê serkeftinê ye, xwe ji her cure xapandinê re vekirî dihêle, kesayetek dilê mirov pê dişewitê ye. Em ji ber kesayetên we vê êşê dijîn. Partîbûn jî, derbaskirina vê kesayeta dilpêşewate. Gelo hêza we têra vê dike û hûn dixwazin partîbûnê pêk bînin? Ev cidiyeta we heye gelo? Divê hûn van tevan baş bihizirin. Ji ber kesayeta di nava partiyê de, weke liba danê di bin kevirê aş de her tim tê hêrane. Lê belê helwesta we jî dişibe ferasetên weke; "Ez nayêm hêrandin, ez ji pola me" yan jî "Ez parçeyek kevirim, kevirê aş nikare min bihêre" ye. Bes her tiştê ku dikeve bin kevirê aş de tê hêran, nehêre jî diperçiqe. Ger em PKK'ê jî bişibînin kevirek aş, ger hûn libên genim ên baş bin, hûn ê baş bên hêrandin û bibin ard. Paşê hûn ê bi hevîr teşe bigirin û dê hingê nanek baş ji we derbikeve. Na ger hûn parçeyek kevir, an jî hesin bin, hewce bike dê ew jî bên hêrandin, nexwe hûn ê biperçiqin. Dibe ku hûn qirêj bikin, lê dîsa hûn nikarin xwe ji têkilbûna ard rizgar bikin. Hinekê jî rewşa we wisa ye. Bes tiştên ku hûn pê bawerin jî cuda ne. Hûn diperçiqin, şev û roj xembarin, dîsa jî hûn behsa ne helandin û ne veguhertinê dikin. Bal bidinê, kesê ku berpirsê van mijaran ne ezim, hûnin.

Ancex mirov di vê çarçoveyê de ji kesên kevin û nû, ji dervî welat, hundurê welat û ji zindanê hatine re bêje hûn xêr hatine

PKK''ê. Ji bilî xêrhatina PKK'ê kirin, dê ji bo we xirabî û şaşiya herî mezin be. Beriya niha ji ber ku zimanê min şewitî, carek din ez nikarim wisa rehet bêjim hûn bixêr hatin. Min got, lê ew jî di encamê de rê ji xapandin û karesatan re vekir. Kesê ku di deriyê PKK'ê re dikeve hundur kî dibe dila be, ez di vê çarçoveyê de jê re dibêjim tu bixêr hatî. Ger hûn nikarin bibin xwediyê malê yê eslî, divê hûn li gorî quralên mêvantî tevbigerin. Ger hûn bihûrdarin, mêvanek çawa li malekê dimîne, li gorî quralên wê nêz bibin. Na ger hûn dibêjin; "Ez ê bibim endamek malê yê eslî", divê hûn li gorî quralên wê jî tevbigerin. Ev jî pir girîngin. Divê hûn hilbijartina xwe jidil bikin. Yek ji xisletên egîdiyê ya herî mezin jî jidil jiyîne. Jidilbûn weke tê zanîn ne tenê hesteke, divê hûn ji bîr nekin pêwîstiya daneheva zanebûn û nirxan a bêhempa jî heye. Kesên hestiyar ti carî jidil nabin. Kesên ne xwediyê jiyanek pir saxlem, dîsa ezmûn û lêhûrbûna serwextiya wê bin, nikarin jidil bin. Di vir de zêde ti wateya niyeta baş nîne. Di dahûrîna kesayetên we de asta hestiyarî girtina dest ji bo min hêjî mijarek balkêşe. Ji ber ku ne tenê li dijî dijmin, li hember xebatên hundurê xwe jî, kesên ku hêza berxwedan û serkeftinê raber nekin, teqez divê bên dahûrandin.

Ez van dahûrînan ji bo tinazên xwe li we bikim an jî bi zanebûn we wisa derbixim holê pêş naxim, ji bo pêdiviya we ya tedawiyê pêşwazî bikim dikim. Ger hûn dibêjin; "Na pêdiviya me pê nîne", wê demê biçin bi dijminê xwe re rûbirû werin. Heta hûn serbestin ku biçin rêxistinek din jî. Vê bi dîrokê re rûbirû bînin wisa hilbijartina xwe bikin, em di vê mijarê de tengav nakin. Ger dê wateyek jiyana we hebe, hûn dibêjin; "Dijminê me heye, ji bo jiyanê pir kêm tişt ji me re hatine hiştin, li pêş jiyanê astengiyên cidî hene" û di vê de jî jidil bin, bi rastî jî pêwîste hewcedariyên têkoşînê bên fêmkirin. Niha hûn ê bêjin; "Zehmete em li gorî te li ber xwe bidin." Li gorî min ev ne hêza berxwedanê ye, hêza li gorî dijmin li ber xwe dayînê ye. Li gorî dijmin hêza fêmkirin û berxwedana min, dîsa ger hêza dahûrîn û rêxistinbûnê derbixin, dê ji kesayeta min çi bimîne? Dê ji min kesayetek reben, nizane li çep û rastê xwe binêre, bêçare, heta kesek herî di jêr de bimîne. Ji ber

vê pêwîstî qet bi rika takekesî, ferdperestî yan jî taklîdkariyek weke "Ew wisa ye, ez jî wisa me" tine ye. Ji ber ku rastiya me qet destûrê nade wê û bi wê re nakokiyê de ye. Qetiyen ne gengaze ku kesayetek diafirîne bi taklîdê bê dûbarekirin.

Ez nabêjim çîroka min a bêhempa, xweziya we lêhûrbûn an jî jiyana min a rojekê lêkolîn kiriba. Ev hêza we tine ye û ev jî we pir tengav dike. Ji ber ku we xwest artêşbûnê ava bikin, heta di bin navê "Em fermandariyê dikin" de bi salane xwe dixapînin. Bes di heman demê de li gorî fermandarî jî serfermandar derbasdare. Ger bixwazim, nexwazim jî, çawa her kar ketiye ser milê min, neçarim vî karî jî bipejirînim. Xisletek min a din jî wisa ye: Ji ber ku qet niyeta min nîne weke we xwe bixapînim, her çendî hûn yeqîn nekin jî, ez dibêjim serfermandarî, serfermandarî ye pêwîste bikim û li gorî xwe jî pergala xwe pêş dixim. Elbet ev jî fermandarî, polîtîkavanî û rastiya we ya rêveberiyek siyasî ya çi dibe bila be, dixe nava pêvajoyek bêhempa de. Ji ber ku hûn dixwazin bi peyvên pir erzan ve vî karî derbas bikin. Hûn nêz nebûn ku asta herî jêr a vî karî jî fêm bikin û we di asta xîtaba fermandariyê de xwe ji yek-du gotina re jî amade nekir. We nexwest teşe bidin hemû meşên xwe yên ku pêwîst bû aqilmend bin. Lê belê we got; "Fermandarî tiştek başe, li ser evqas mirovanim, berjewendiyên min ên ku berê qet hişê min re derbas nedibûn pêş dikevin, xwe pir cuda dibînim." Ev bi yek gotinî xeflete û zû-dereng dê ev kesayet piç û piç bibe. Ji bo em van bi we bidin hîskirin me xwest em li hemberî we di asta herî bilind de vekirîbin, lê dîsa jî we ew hêz raber nekir. Lewra ji we pir ditirsim. Ji ber ku rastiya we ya di navberê de mayî derdikeve pêşberî me. Em ê teqez çareya vê bibînin.

Hûn ciwanin, di nava we de yê herî ixtiyar û xwedî ezmûn ez im. Tevî vê bê ku aciz bibim bi xiroşek mezin li ser vî karî me. Ma qet bi we re îman û wijdan tine ye? Ez vê vale nabêjim. Rewşa hinek hevalên me tam dişebe kesek xwedî wijdana reş. Hinde reben û bê çare ne, tiştek bi navê wijdan ne maye.

Ma fermandar wisa dibin? Me gel jî, dijmin jî ji bîr kir. Em dibêjin dê halê van zarokên reben çi be? Ger qeyran ji ber rêbertiya stratejîk bûya, bi rastî jî min dikariya di deqeyekê de xwe ava

bikim. Bes di vê wateyê de pirsgirêk çavkaniya xwe ji min nagire. Niha jî derketiye holê ku ez rêbertiyek stratejîk ku cîhanê bandor dikim. Me peywirek pir teng a rêbertiya taktîkî da we. Ez dibêjim weke şoreşgerekê beşdarî jiyana rojane bibin, weke şoreşgerekê birêxistinkirî û berpirsyar bijîn. Belê qiyamet di vir de radibe. Dibêjim gelo hûn ê rêbertiya rojekê çawa bikarin bimeşînin? Hinek zarokan nû bi nû pêş dixim, lê deh qetî zêdetir ji we baştir pêş dikevin. Yeqîn dikim di navbera rastiya dijmin a xwedî dijûn û rastiya PKK'ê ya pak û ronî bûyî de, hûn tengbûnekê dijîn. Bextreşî jî di vir de ye. Ji ber vê ev nifş hem bi siûde, hem jî bê siûde. Siûda wê di vir de ye: Dikare ji cîhana xwedî dijûnên mezin ber bi cîhanek pak ve derketinekê çêbike. Bê siûdiya wê jî: Lez dikare bibe qurban, bêlîstok an jî provakatorê cîhana xwedî dijûn. Ev herdu jî gengazin. Hemû hêza me siûda li gorî ya yekemîn veguhertine. Em di vê mijarê de jî pir dijwar li ber xwe didin. Misoger pir baş dibînim ku hûn ji dijmin zêdetir li ber xwe didin.

Em di demên dawî de bawer dikin ku bandor li cîhanê bikin, heta dijmin jî veguherînin, ger ne veguhere jî bikarin çareser bikin. Amajeyên vê derdikevin holê. Zehmete ku mirov heman tiştî ji bo we jî bêje. Ev jî rewşek ecêbe. Carina dibêjim, gelo me zêde bar daye we? Min ji ber vê sebrek mezin raber kir. Me derfetên siyasî û leşkerî danîn heta pêşiya we, bes hûn nikarin bi qasî zarokekê jî bilîzin. Carina jî me qet bar ne danî ser milê we, lê vêca jî hûn piştqov bûne. Qovbûnên we yên hundurîn we wisa diteqînin. Carina bi temamî wer serbest diberdim, wê demê jî hûn pir giran bi zincîran ve girê didin. Ti raveya van reftaran nîne û çeprazin. Ez dibêjim em lêpirsînin û darezînin. Bes wê tu kî darezînî? Ji ber rêzdariya zilam li hemberî wî bi xwe tine ye. Dixwaze darezîne û ceza bide, dixwazî efû bike û bila bibe beg, cudabûna vê jî nake. Mirov dikare di asta ketibûna kesayetan de van xalan tevan bibîne.

Rêbertiya stratejîk xalek ku hêjî hûn tênegihiştine. Ji ber ku ger ji têgihiştinê fêm kiriba, dê hûn ê pêşî rêbertiya taktîkî û milîtanî têbigihiştan. Hûn di radeyek wisa de ne, bi ferasetek ku di nava civaka me de pir serdest ve, dibêjin; "Rêbertiya stratejîk Xweda ye, reîsê eşîret û malbata me ye, muxtarê kolanê ye, hevserê mine, jina

mine, heskiriyê mine, zarokê mine.” Ji ber wan darezên nirxên civaka ku bi temamî rûxiyane û ti aliyên wan ên bên parastin nemane, lê ji aliyê we ve pir tên pejiranin û demode ne, ancex hûn dikarin rêbertiya stratejîk wisa rave bikin, ji bilî vê jî ti hêza we ava nabe yan jî ji ber ku ev hêz jî ji destê we hatiye girtin hûn di rewşek pir trajîk de dimînin. Netêgihiştina hêza rêbertiya stratejîk, dibe sedema hûn veguherin rewşek dilpêşewat. Elbet ev jî dibe sedem ku reftarên zêdetir çewt derbikevin holê. Ji ber ku rêbertiya stratejîk bi asta we ya ku em bi têgehên weke rêbertiya taktîk, bûna qadro, milîtan û partiyê rave bikin ve pêk hatiye, hûn ji nişkê ve xwe dixin dewsa wî de. Taklîd jî wisa dibe. Di darizandinên nav PKK’ê yên dawî de, hûn dikarin gelek mînakên vê bibînin. Mînak zilam xwe dixe dewsa min, heta xwe ji min zêdetir aqilmend dibîne; min vale derdixe, bes hêza xwe jî tam ji min digire û dibêje; “Ez şer biqedînin, rê ji jiyanek nû re vekim”, weke ku xapandina partiyê ne bese, tê hewl dide min jî bixapîne.

Ev jî dide diyarkirin ku kesek ku taklîdê dike dikare xwe bixe nava çi rewşan. Nava çavên me dinêre diyar dike ku çiqas bi rêbertiya stratejîk ve girêdayî ye. Lê di pêvajoya rêya pir rehet de ronî dibe û çareser dibe. Ger jê bê dê me bi mişarê bibire û bikuje û her tiştê me jî ji bo wî canê xwe rizgar bike binax bike. Vaye hejmarek zêde endamên ku rêbertiya stratejîk ve girêdayî li ber çavin. Ya herî xirab jî vêca li rewşa hezaran şervanên ku xwedî wijdana baş, hewldanên baş û kedkarin binêrin. Hêza wî ji kêliyên hem bîrdozî hem jî rêxistinî yên zagona şerê xwe re du heban re jî têrê nake. Ev pirsgirêk tev jî di wê astê de ne ku em di mijara partîbûnê de bigirin destin. Ger hûn venekolin, dê kevirê aşê partiyê jî bi qasî bikare li we bixe û bihêre. Di jiyana me de di şer de binketin, di şerê pirsgirêkan de jî bêçaretî nîne.

Hêjî **Kemal Pîr** di bîra min de ne. Hinek milîtanên me yên wisa hêja hebûn. Ew hevalên me qet xirab nebûn û zanîn heta dawî bi milîtanî bimeşin. Di wê demê de derfetên wisa yên lêhûrbûn û şer tine bûn. Tenê karê dikirin, li gorî rastiya bingehîn û armanc, bê ku yek peyvê şaş bikin rastî gotin, bê ku gavên şaş bavêjin meşîn bû. Weke hûn jî dizanin lehengên wisa pir derketin. Ev jî rastiya

PKK’ê ye û xisleta wê ya herî bingehîne. Kesê ne wisa bin, mafê wan tine ye henase bigirin, divê hûn jî vê teqez fêm bikin. Ger hêza we hebe vêca hûn dikarin bibin PKK’yî. Gelo hêza we nebe, dê çi bibe? Dê kesên weke **Şahîn Donmez**’an her roj derbikevin holê. Jixwe derket holê ku rewşa wan pir bi lenete. Bes ne tenê ev, ji eniya derve deka li Komara Tirk, heta li Emerîkayê binêrin, hûn ê bibînin kî di çi rewşê de ye. Dîsa encama ku pêwîste ji van tevan bê derxistin wisa ye: Bersivek weke hûn li ser bingeha rast xêr hatin partîbûnê, we despêkirinek saxlem kir, hêvîdarin hûn ê serkeftî bin û silavdayîneke. Êdî bizanin silav bikin an jî bi silavê re hêdî hêdî fêm bikin dê silavdayîn çawa be. Ev ji Îslamiyetê mane, ji mêj ve wateya xwe winda kirine, lê em ê dîsa jî nûjen bikin. Hûn ê li hember min gundîtiyê nelîzin, ji ber ku ez bi vê lîstokê nayêm xapandin. Rastiya gundîtiya ku herî kêm bi qasî Kemalîzma li ber deriyê Komara Tirk gêj dike li ser min ferz nekin, bi wê jî nayêm xapandin. Hewce nake hûn zêde hirde wirde birevin. Rastî dîsa jî li qada me ye. Dibe ku qada me weke hinek din bide we zêde derfetan nade, lê rastî di jiyana mirov de tişta herî hêja ye; bi wê ve girêdan, girêdana herî hêja ye. Ev jî li vir heye, şaşe ku hûn li cihek din bigerin. Ger ev a herî zehmet jî be, pêwîste hûn vê hilbijêrin.

## Pêwîste Pêşengiya PKK'ê Tovek Ji Pola Be

Heta ku hûn partîbûnê pêk tînin li ser rawestin. Dema dijmin dibêje; "PKK belav dibe", em jî bi biryarin ku partiya xwe bînin wê astê Komara Tirk belav bikin. Her ku dijmin ji bo me bêje; "Belav dibe, belav bû", em ê jî xwe bikin guleyek ji pola li kelha herî saxlem a Komara Tirk bixin û wisa belav bikin. Ev jî înada me ye. Dema hûn PKK'ê dijîn, lêhûrbûna PKK'ê bi xwe re dikin, misoger divê hûn vê weke pîvan bigirin. Îdîaya PKK ew e ku, Komara Tirk ne tenê di asta leşkerî de, hemû nirxên wî yên çandî û moral li pey wî ne jî birûxîne. Ev pir girînge û tişta ku pêwîste ji PKK'bûnê bê fêmkirin jî ev rastiye. Kesên ku PKK'bûnê saz neke hêza wan a berxwedan, serkeftin û şer jî çênabe. Ez hewl didim ji we re hem PKK'ya dîrokî hem jî PKK'ya ku rojane dijî pênase bikim. Şerek pir dijwar heye. Tê gotin ku sosyalîzm di asta cîhanê de têk çûye û belav bûye. Em jî dibêjin ku di nava PKK'ê de sosyalîzmê kapîtalîzm rûxand û belav dike. Dibêjin ku; "Hêzên rizgariya netewî hatine belavkirin û qedandin." Em jî dibêjin ku; "Berovajî yên êrîşî wan dikin rûxiyan û belav bûn." Bi vî rengî pêşbaziyek dîn û har heye.

Ji ber vê PKK, di radeya bêhempa de hem hêza nasnameya netewî, hem jî hêza nasnameya sosyalîst a nav-netewî ye. Berî wê bi ya bîrdozî ve, niha bi asta wê ya şerkerî ve li gorî destpêk û roja me yekbûnek wisa çêkiribû. Kesên ku xisletên PKK'ê esas nagirin, misoger pêwîste yek gavê jî navêjin nava şer. PKK'ê biçûk nebînin, ji ber misoger PKK ne hêzek ku biçûk bê dîtine. Ger hûn dihizirin nûnertiya PKK'ê bi têgehên razber, rastiyên giştî û reftarên ne jidil bikin, ev şaşiyek pir cidî ye. Heta ger hûn dibêjin; "Deka em PKK'ê weke barekê derbas bikin, xwe jî di bin poşiya wê de bidin jiyîn", hûn ê ji bo xwe xirabûna herî mezin bikin. Misoger partîbûna di nava PKK'ê de, destûrê nade ku wisa bê destgirtin.

Pêşketinên dawî yên derve, di asta gerdûnî, nav-netewî û herêmî de PKK'ê neçarî pêşxistina cewhera xwe û berfirehkirina vê dike. Em nikarin ji vê birevin. PKK'yîbûn, di vê wateyê de mezinbûn berçavgirtine. Em ê nebêjin hinek kelhên sosyalîzmê yên girîng, dema navendên tên zanîn dirûxin, bar û erkên PKK'ê hîn zêdetir giran dibe. Em jî pir serfirazin ku xwediyê vê peywirê ne. Lê ji ber van sedemên ku min diyar kirîn, di nava me de xirabûnek heye. Ev xirabûn jî xeteriyek mezine. Em jî li her qadê rawestandina vê xirabûnê peywira xwe dibînin û heta ku em vê peywirê ser nexin, em ji bo peywirên din gavekê jî navêjin. Ev jî ji bo we erkek wisa diyar dike: Hûn nikarin wisa partîbûnê pêş bixin, rolê pêşengiyê xirab bikin û vê jî weke fêrbûnekê di nava PKK'ê de, bi navê PKK'ê bikin, divê hûn bizanin bi vî rengî gavek jî nayê avêtin. Hûn ê bi vê zanebûnê partîbûnê ji bo xwe dahûrînin.

Dijminek wisa ye, ger dibêje; "Em ê PKK'ê ne tenê di eniya şerê gerim de, li hemû cîhanê –heta di rêza yekemîn de- ji rewşa astengbûnê derbixin" û li hemberî vê jî endamên PKK'ê jî îdîa dikin ku dev ji doza PKK'ê bernadin, pêwîste baş bihizirin û tiştek bi pîvan danin pêşberî xwe. Ne raste ku hûn her carê vê peywirê datînin pêşiya min. Ji ber ku herî zêde hûn ê li hember van rewşan biperçiqin. Rastiya PKK'yîbûnê wisa ye. Ez bi kutekî li ber xwe didim daku vî barî rakim. Ji bo min mijara herî girîng berdewamkirina PKK'yîbûne. Wisa xirabkirin û weke we rehet jiyîn danin aliyekê, ev karên min kirin tev jî têra min nakin. Elbet weke we jê narevim, bi temamî henase bi henase li ser kar disekinim û jixwe di vê mijarê de hêjî bi îdîa me. Ger gengaze vê pêvajoyê bi PKK'yîbûnê ve derbas bikin vê pratîk bikin û ji bo xwe, bila helwesta we xwe selmandinê be. Ango vê pêvajoyê bi xapandina derdora xwe û xapandina xwe ve derbas nekin. Mixabin pir xirabe, lê her tim jî wisa diçe. Hêza we ya herî mezin an jî tevkariya we, di vê mijarê de hêza Partîbûnek rasteqîn a bêxwe xapandinê raberkirine. Ev xal ji her demê zêdetir girînge. Ger hûn naxwazin siberojê îxanetek bê esil li armancên xwe bikin û dev ji warên pîroz berdin biçin, ya esas partîbûne. Di vê wateyê de kesên ku partîbûnê nadahûrînin û ji bo xwe pêk nayînin, dê sibe-dizbe

birevin, pir xeternak bin, dê şer bike lê dîsa şêrê wî xeternak be, di nava me de bijî dîsa jî xeternak be.

Pêşengtiya PKK'ê, ti carî girîngiya xwe winda nake, berovajî li hember peywirên giran dibin pêwîstiya bûna dendikek ji pola derdixe holê. Nexwe hûn ê weke gundiyekê biperçiqin û nekarin xwe ji vê çewsîneriyê jî rizgar bikin. Dixwazim hêjî yeqîn bikim ku hêza we ya partîbûnê heye. Ger îdîayek we heye, ger hûn vê wisa watedar nekin, hûn ê dîsa heman rewşan bijîn. Mînak, berpirsyariya min a li hember PKK'ê û rewşa xwe beramber hev bigirin: Hûn ê pir ecêb bimînin ku ez navenda me û pîvana milîtanên PKK'ê çawa dixim rojevê. Tenê behsa rastiyên giştî û quralên kargeriyê nakim, jixwe hûn zêde ahenga van jî pêk nayînin. Bes ez her tim jî tevdîr digirim ku hûn van di hemû şaneyên xwe de weke parçeyek hesinek a ku ji agir sor bûyî di kesayeta xwe de pêk bînin. Ji bîr nekin, ev ê her tim jî wisa be. Heta dibe ku li cihek qet hûn ne li bendê jî, hûn bi êrîşek wisa jî darbe bixwin. Hingê hûn ê bêjin; “Ev êrîşa partiyê ye, ji ber ku min ew ne dahûrand, niha jî partî bi ser min de tê.” Hûn ê vê wisa fêm bikin. Kar evqasî hewcedariya balkêşbûn û şervantiya pratîkek bêhempa derdixe holê.

Neçarim ku van xalan zêde dubare bikim. We nirxa sondê pir xistiye. Dîsa jî ger hûn dixwazin vê şêwaza xwe bidomînin, her tim tika dikim, li benda dawiya min bin. Hemû hişyariyên min li ser vî bingehîne. Heta devjê berdin li gorî hişyariyên min bin, pêwîste hûn hîn baştir bin. Di vê wateyê de ez şahadetên **Kemal Pîr**'an, **Xeyrî**'yan, **Mazlum**'an tînim ber çavên xwe: Wan her tim digot; “Gelo ev tiştên em dikin çiqas li gorî partiyê ne?” û li bendê bûn ku ez bêjim başe. Lê dizaniyan, tiştên ku dikin pir kêmin. Di xeta hemû şahadetên PKK'ê de û di xeta hemû jiyana PKK'yîbûnê de ev xal heye û ev misogere.

Ji ber vê dibêjim: Di nav Komara Tirk de çete, heta çeteyên çeteyan hene. Tovên çeteyan ên ji pola hene. Lewra PKK neçare tovek ji wê jî xurtir be. Nexwe quralên şer siûda bûna cureyek din nade. Ji ber vê nebêjin; “Em ji çiyê hatine, westiyane” yan jî “Ji zindanê, Ewrûpa hatine, texrîb bûne.” Dibe ku hinek sedemên van

hebin; bes çareserî dîsa jî di rastiya PKK'ê de siûda heyî ceribandine. Hûn evqasî geriyan, mixabin we wate neda yek ji van jî. Çeperek min a teng heye, dîsa jî li ber xwe didim. Divê hûn ji xwe bipirsin gelo çima dikarim di nava vê dorpêça teng de evqasî kûr bibim. Ji ber ku ji bilî vê nabe. Gelo hûn bi qasî min nêzî azadiyê ne? Di cîhanê de mirovê herî çeleng ez im, pir herikbarim, bes li cihek pir teng hema digindirim. Elbet ê bigindirê jî nikare gav bavêje.

Hûn dizanin qumandaya ji dûr ve çiye. Niha fûzeyek diçe gezegena Satûrn jî. Me jî di pergala partîbûnê de qumandaya ji dûr ve ava kir. Em ku derê dixwazin dikarin partîbûnê bişînin wê derê. Ev jî şêwazek nû, partîbûnek serdema teknolojiyê ye. Lê hûn hewl didin ji min re bêjin ku mirov dikare bi şêwaza li ser pişta kerê bimeşe jî şer bike. Ev ne gengaze. Di diyardeya Rêbertiyê de lez fikirîn û pêkan tempoyek wisa bidest xistiye, ne bi meşa wisa li ser pişta kerê yan jî hêstirê, hûn li maşînek modela herî dawî jî siwar bibin nikarin bigihinê. Gelo çima şêwaza fûze? Ji ber aliyê beramber jî teknîka herî dawî bikar anî –ez tenê di wateya çors de behsa teknîkê nakim-, ji ber ku di karê têgihiştin û rêxistinkirinê de pir kar kiriye lewra van vedibêjim. Dikarim van biselmînim jî. Jixwe dane li ber çavên we tevane. Nexwe, di şêwaza Rêbertiyê û partîbûnê de tempo di asta herî pêşde ye. Mixabin hûn hêjî li wan çiyan hewl didin li ser pişta hêstirê gerîlatiyê bikin. Hûn bi vî şêweyî ne digihin armancên xwe û ne jî dikarin bersivê bidin.

Ma me çima xebatên qadê evqasî kûr pêş xistin? Belê hûn ji vê re dibêjin şêwaza têkbirin û şêwaza serkeftinê. Ez neçarî vê bûm, ji bilî vê rêyek din nebû. Tişta ku dixwazim vebêjim ev e: Neqeba di navbera me de pir vebûye û cudabûnek mezin heye. Hinek maye hinek li hember vê rewşê bigirîn. Hewceyî vê nîne, qadên we yên xebatê ji yên min berfirehtirin û derfetên we jî zêdetir bûn. Lê we ev xal cidî negirtin dest. We bi kesayeta xwe gundiyê giran an jî bajariyê sexte ve, bi hinek pîvanên civakî yên ne asayî ve hinek tişt ceribandin. Elbet ev wisa nabe. Ji bo we bitirsînim van nabêjim. Di nava we de kesê herî lewaz, mercên wî zehmet, barê wî giran, dijmin û astengiyên pir zêde jî ez im. Lê tevî vê hêjî kesê herî bi

îdîa, gav bi gav serde diçim û bi qasî dikarim ser dixim. Ez kesek wisa me ne îdîaya xwe, ne jî şêwaza xwe qet qut nakim. Mane di hinek lîstokan de dibêjin ku dîn bûye, em jî di van mijaran de tam bûne dînê partî ne. Kesê ku evqasî bilîze dê dîn jî bibe.

Cudabûna xwe ya heyî bi PKK'yîbûnek rasteqîn ve ji holê rakin. Ger hûn sondek rast bidin, bêjin; "Em ê bibin xwediyê feraset, cidiyet û hewldanek têrkar", em ê jî we bipejirînin. Bes ger hûn dîsa weke berê bêjin; "Vale ye, puçe", ti siûda we nîne. Ne wisa hatiye, dê ne jî wisa biçe. Li her derî ev tê gotin, rastiyek ku ji ti kesî re nade gotin; 'wisa hatiye, dê wisa jî biçe.' Ne gengaze ku hûn wisa xwe veşêrin, ji kêlekê ve, pêşve, paşve derbas bibin û ev jî pir xetere. Rêbertî ji xwe zêdetir derfetê dide we. Elbet me yekser asta vê ya siyasî û leşkerî jî pêş xist. Li cem me ya esasî serwestbûn û rêxistinbûne. Ger hûn bi vê re bêjin; "Em ji siyaseta giştî û xebatên leşkerî jî yên giştî re amade ne", ez ê jî vê carê ji we re bêjim; "Bila veguhertinek we ya pir radîkal hebe." Em ê bi we re siyasîbûn, leşkerbûn, bi partîbûnê re jî leşkerbûn, artêşbûn û enîbûnê biceribînin. Bila ezmûnên min tev ên we bin, heta em amade ne zêdetir jî bidin. Lê tişta ku ji we jî tê xwestin, di vê wateyê de qet nebe ji bo tiştên hûn pêdivî pê dibînin hêza girtinê raber bikin.

Ger hûn bal bidinê tenê ez didim. Siyaset dewlemendiyeke, bi qasî hûn dixwazin leşkertî, hêz û qudret, rêxistinbûne, xwe bi hezarî zêdekirine. Bila ev hemû weke heyî ya webin. Ev hemû tiştên başin, tiştên ku ji nan û avê zêdetir hewce ne. Ji ber ku nan û av jî bi temamî bi partîbûnê tên bidestxistin. Ger ew pêk neyê dê gelê vî welatî tev birçî be. Bes ji birçîbûnê zêdetir şûrê dijmin li benda we ye. Ev hemû rastî ne. Me selmand ku ji bilî vê ti derfetê hilbijartina we ya jiyanek din nîne. Kesên li vî welatî, li ser vê axê û di nava gel de dijîn, ango ji bo kesên ku di cîhanê de di rewşa me de ne jî, bi nirxên moral ve girêdayî, karê xwarin û vexwarinê jî misoger bi lêhûrbûna partîbûnê tê bidest xistin. Ez bi xwe hêjî carê serê xwe radikim, ji xwe dipirsim gelo ji bilî vê rêyek din heye yan na.

Weke encam, di mijara partiyê de xala sereke hûn weke hînbûnê bigirin, we zerarek mezin daye partîbûnê, dijberî pêdiviyên partîbûnê ketine, partîbûn cidî negirtiye dest, lê niha hûn hatine xwe sererast bikin û sucên xwe bidin efûkirin. Ji ber vê hûn ê bêjin; "Em ê hem siûda, hem jî derfetê ku ji me re hatiye dayîn binirxînin, heta em vî karî ser bixin em ê henase bi henase kar bikin." Dê her tiştên din jî bi vê re watedar bin. Heta karê razan, xwarin û vexwarinê her tişt dê bi şêwaza ku min bilêv kirî pêş bikeve. Dema ev hemû pêk hatin, vêca tevlîbûna we ya ji PKK'ê re rasteqîne. Ger hûn kevin jî bin, nû jî bin, jin jî bin, zilam jî bin, an jî ji kîjan çand û netewê dibin bila bin, ancex di vê çarçoveyê de beşdarbûna we ya ji PKK'yîbûnê re pêk were. Bi vî rengî hûn ê ji karê cîhanê yê herî girîng re di kesayeta xwe de nasname bidin bidestxistin. Ev jî di cîhanê de bûyera herî xweşik di kesayeta xwe de pêkanîne. Ger kêfxweşî û dilxweşiya ku ev dide min, di heman demê de kûraniya feraset û hêz nebûya min ne dikariya rojekê jî vî barê partîbûnê yê mezin rabikim.

Bersiva evqas hewldan azadiya heta hetayê, ji bo azadiyek heta hetayê jî derfetê xurtbûnek bê dawî, ji bo derfetên xurtbûnek bê dawî jî, dê bi zewqek mezin kar bê kirin. Di roja me de ne tenê li dijî hemû ferzkirinên eniya dijber di çarçoveya netewa xwe de, ji bo mirovahiyê jî bersiva herî xweşik em bidin wisa ye. Ev bersiv di cîh de ye û serkeftî ye. Karê para we jî, berxwedaniyek mezin, weke raveya şêwaza rêbertiyek mezin, ji bo serkeftinê jî ev bûyera ku li pêş we hatiye danîn xwe neqişandin, xwe bi vê ji nû ve avakirin, bi vê silav dayîna jiyanê, bi vê şer de meşîn û bi vê serkeftina mezin bidestxistine.

**13 Çile 1988**

## AZADÎ JI BO HEMÛ CIVAKÊ YA HEWCE ZARVEKIRINE

Heta ku hûn kesayeta xwe ya ferdperest ji pir aliyan ve red nekin, hûn nikarin xwe bigihînin kesayeta partî. Redkirina kesayet pirsgirêkek pir cidî ye. Tevî hewldanên pir mezin, yek ji sedema herî girîng a nepartîbûnê, hûn nikarin di astek têrkar de kesayetê red bikin. Di redkirina kesayetê de tişta em behsê dikin, redkirina kesayeta ku xerîbê hem xweza, hem jî civakê ketiye, ji hêza hilberînê derketiye, xwezayî bîrdozîbûn û pratîkbûn winda kiriye, şûna vê dibe ku ji dervî pîvanên civakê yên hovane jî paşketîtir, sîxurên yekser an jî neyekser ên hêzên serdest –ev li civaka me mêtîngeriyek heta ber bi jenosîdê ve jî diçe- ku di her astê de jiyînê dipejirîne, diparêze û heta dihizire ku dê xwe bi vê kesayetê ve bide jiyîne. Li ser vî bingehî pir vekiriye ku pirsgirêka we tevan a redkirina kesayetê heye.

Tevî van hewldanan hemûyan sedema em nikarin bi we re partîbûnê saz bikin, ji ber hûn nêzî redkirina kesayetê nabin. Elbet bi vê re jî berjewendiyên çîna paşverû, kevneşopî û exlaqên paşverû tên parastin. Lê di encamê de ev hemû jî xizmetê ji dijmin re dikin. Ev di nava partiyê de rê ji her cure nerêxistinbûn, xirabûn, muhafezekarî, ehpap-çawîşî, kariyer, her cure ferdperestiyê re vedike û encam jî tasfiyekarî ye. Di encama polîtîkayê de redkirina vê kesayetê pêk nayê, heta ber bi tasfiyekarî û îxanetê ve dibe. Bes di vir de xala ku divê mirov ecêb bibîne, bi salane me ev bi hemû hêza xwe ve derxist holê û tevî ku ji bo derbaskirina vê her cure derfet hatin dayîn, we qet nekarî vê redkirinê pêk bînin. Ev jî derdixe holê ku hûn dixwazin ji hinek meylên xwe yên çînî re deriyan vekin. Pir negirînge ku hûn vê bi zanebûn an jî bê zanebûn, bi niyetek xirab an jî bi niyetek baş dikin. Keyfa we ji vê re tê. Ji ber hûn wisa hatine mezinkirin û hînkirin. Bes hûn jî neçarin weke navê xwe bizanin ku partîbûn jî xwe bi redkirinê pêk tê.

Dema hewce kir ger êş jî bide, partîbûn çi tiştên ku bi rastiya çînî re ahengê jiyan neke hemû bi têkoşînek mezin derbaskirin û paqijkirine. Ji ber vê jî tenê xisletên ji dervî çînayetî redkirin, rûxandin û derbaskirin jî têrê nake, her wiha pêwîste şerê xwe gihandina pîvanên çînayetî jî pêş bikeve. Partîbûn tê wateya rastiya çîna kedkar an jî çîna me, bi qasî asta bîrdozî ya rastiya me ya civakî, raveya kombûna asta leşkerî, heta nirxên moral û rêxistinbûnê di kesayeta xwe de pêkanîne. Dibe ku hûn di rastiya xwe ya çînayetî de bihêz bin, axayek, karsazek, bîrokratek burjuvaziya biçûk an jî gundiyek pir fêlbaz bin, dibe ku hêza we ya pir xwe dana jiyîn jî hebe. Heta dibe ku hêza we hebe hûn bikarin di nava partiyê de hizban jî ava bikin, heta dibe ku weke gelekan hûn koleyek bêxêr jî bin, bes di encamê de ev hemû jî redkirina xeta çînayetîne, reda xeta PKK'ê ya rasteqîne û li dijî wê şere. Em nikarin vê bi navê partiyê bipejirînin. Ji ber ku tespîta me wisa ye: Heta ku pêşengiya PKK'ê ya çînayetî nebe, ne li Kurdistanê Şerê Rizgariya Netewî, ne jî di her astê de Şerê Azadiya Civakî pêş dikeve. Ger bê pêşxistin jî, ser nakeve yan jî ser bikeve jî dê bi lîstokên çînên din ên dem kin ve ber bi serdestiya çînek din û serdestiya hêzek din ve biçe. Lewra şoreşgertiya çînayetî yan jî her cure xisletên wê yên civakî esasin.

Mixabin di salên dawî de cewhera partî ya çînayetî, hemû daxwazên wê yên siyasî, civakî, leşkerî û pêwîstiyên wê di bin lingan de hatine perçiqandin. Ji ber ku hûn weke gundiyek bêxêr, burjuvaziyek biçûk, axayek feodal, şêx û beg –jixwe di nava me de hema her kes xwe bigek dihesibîne- hatine mezinkirin. We weke kontrayek dijminê dijwar êrîşî xeta partiyê kir. Ev jî xoşa we çû û we xwe bi vê jî hîn zêdetir bihêz dît. Hinek dihizirîn ku dê partiyê desteser bikin û heta yeqîn dikirin ku dê xeta partiyê jî xirab bikin. Hinek kesan gotin; "Ger ez hinekê kar bikim, hinek din xwe ferz bikim, dikarim herêmekê desteser bikim, heta dikarim di navenda PKK'ê de li gorî dixwazim kar bidest bixim, ez ê bikarim li gorî dixwazim jî rastiya Rêbertiyê bikar bînim." Hat qonaxek wisa, tu serê wan jî jê bikî, kesên ku nikarin xwe ji vê evîndariyê rizgar bikin hene. Helwestên wisa di hemû qonaxên girîng de bi şêweyek

xeter derdikevin pêşberî me. Di dîroka partiyê de gelek mînakên vê hene. Hûn ê van rast hîn bibin.

Ya rastî pirsgirêk ne rast hînbûn an jî nehînbûna we ye. Hûn zemîna çîna xwe red nakin, ger red bikin jî zemînê çîna rast esas nagirin. Hemû pirsgirêkên we xwe dispêrin vê rastiyê. Gelo biryara we ya têgihiştin, pejirandin û nûnertiya zemîna çîna PKK'ê heye? Ji ber vê jî gelo hûn dikarin jidil bi têkoşînek mezin û ezametekê reda çînayetî pêk bînin? Ji bo we pirsên bingehîn evin. Ez napejirînim hûn bêjin; "Em wisa çêbûne, wisa mezin bûne." Niha her tişt pir vekirî tê pênasekirin, şêwaza mezinkirina we hema bêjin îflaseke. Hûn jî pir baş dizanin ku, weke kes hûn ne ti tiştin. Hûn nikarin di dozên bingehîn ên netewî û civakî de xwe ji rewşa bûna sîxurek objektîf rizgar bikin.

Di salên dawî de tiştek pêş ketiye, ew jî di xêra PKK'ê de ye. Di xêra rastiya Rêbertiya PKK'ê de çêbûye. Ev jî nayê înkarkirin. Na ger hûn vê jî weke ku we çêkiriye binirxînin, di nava wê de jî kesayetên xwe yên îflas kirî veşêrin û ferz bikin, hûn ê karê ku jê re sîxurtiya objektîf tê gotin pêk bînin. Dê ev jî di encamê de we ber bi sîxurtiya zanebûn ve bibe. Zagonên wisa hişk ên têkoşîna çînî hene. Xwe di vê mijarê de nexapînin û nefikirin ku partiyê jî bixapînin. Gelo we çima evqasî xisletên partiyê yên bingehîn piştguh kirin? Tevî ku me helwest jî danî, we çawa wêrî partiyê di hundur de tasfiye bikin, we hêza vê ji kur girt? Niha jî hûn ê bêjin; "Ez paşverû, muhafezekar, ferdperest bûm, helwestên min ên keyfî, fêrbûn, berjewendî û daxwazên min yên ferdî bûn sedem." Bes her tiştê ku hûn bi van gotinan bilêv dikin jî, tenê israra dijbertiya partiye û wateya vê jî şerê li dijî partîbûnê ye. Heta dema hûn dibêjin; "Ez paşketî me, tiştek ji destê min naye", ji hêla objektîf ve tê wateya ku dijmin cardin hûn şûnve girtine, di halek nekêrhatî de hiştine û hûn jî vê li ser partiyê ferz dikin, ango tê wateya dijminê ku di kesayeta we de pêk tê hûn li dijî partiyê bikar tînin. Ev jî şerê li dijî partiyê ye. Hûn nikarin paşverûtiyên xwe biparêzin, ger hûn biparêzin hûn ê pir vekirî dijminatî ferz bikin. Dema em li dîroka civakî dinêrin, em dibînin ku bi têkoşînên civakî aliyek tim ser ketiye, aliyek jî tim bin ketiye. Têkoşînên civakî, motorên dîroka

zanistê ne. Ev pêşketin rê ji her cure nirxandinê re vedike û civakan jî ev selmandiye. Mixabin hûn dibêjin; “Ji bo me hêza motorên civakî kar nakin, em dişibin vagonên vale yên li ser rayên hesin.” Bes vagonên vale kêrî tişteke nayên û ger di hundurê wan de bar jî hebe dê birize. Misoger înkarkirina zimanê têkoşînê tê vê wateyê.

Di diyalektîka civakan de li gorî qanûnên pêşketina civakî mirov, hebûnek mehkumê pêşketinê ye. Ecêb niha hûn li hember vê jî li ber xwe didin. Li gorî we ji bo me qanûnên pêşketinê zêde nederbasdarin, tişta ji bo me derbasdar tenê qanûnên rizandinê ne. Neku ev tine ye, ev jî di civakan de heye. Bes ev diyalektîka civakên têk diçin, dirizin û tasfiye dibine. Ev di nava me de jî heye, hem jî pir bi bandore. Bes xala ku hûn tê de dixapin: PKK li dijî vê rastiya dînamîka civakî ya têk diçe, dirize û rastiya civaka mehkumî belavbûnê maye, diyalektîkek şere, hêzek şere, însiyatîf, vîn, biryar, rêxistin û artêşa wê ye. Mixabin hûn hêjî hewl didin bê agahiya vê rastiya bingehîn bisekinin. PKK, li dijî rastiya civaka têk diçe, dirize û belav dibe weke alternatîf biryara serxistin, wêrekiya hemû pêwîstiyên wê yên fikrî, vîn, rêxistinî û çalekgerî rave dike, ne tenê di asta gotin de, tevgerek ku hewldana vê dide ye. Pêwîste qadro jî dendika wê ya ji pola be. Di nava PKK’ê de xisletên pêşeng û têgeha qadro wisa ye.

Vêca li xwe binêrin û xwe bi vê re muqayese bikin. Mixabin salane we ji xwe nepirsiye ku hûn dişibin çi? Nexwe hûn kî ne, çi karê we di nava PKK’ê de heye, hûn çima van xalan fêr nabin? Hûn weke sosretên ku derdikevin pêşberî me ne. Hûn dibêjin; “Bûhranê dijîm, serê min naşixule, qet naxwazim xwe bitewînim, nikarim xwe birêxistin bikim.” Tişta hûn şûna vê dikin, di nava PKK’ê de dubarekirina karê dijmine û li gorî vê jî dûvên cur be cur pê ve dikin. Ev hemû jî şaşin. Di ronîkirina hundurê PKK’ê jî wê bê dîtin, hûn mîrate, ango bermahiyên dijmin ên her cureyî ne. Ev ne çarenûseke û hûn sîxurên ku bi destê mirovan hatine avakirin û xwe li rastiya jiyanê ferz dikine.

Cewhera partîbûnê ev hem fêmkirin, hem jî xwe gihandina ya hewce û fermana hatî dayîne. Xisletên vê jî ya herî girîng têkneçûn, ji bo jiyana nû ji van hêlan tevan ve areste bike, bûna

xwediyê vîn û xwedî lêderketine. Yan hûn ê vê bikin, an jî hûn ê bêjin; "Ez ne PKK'yî me" yan jî "Nikarim bibim PKK'yî." Hûn ê bersivê ji pirsa ji bo mirov PKK'yî be çi hewce ye re bigerin. Bi qasî tê dîtin hûn qet vê nakin. Şûna vê hûn fêrbûnên ku dijmin di civakê de dane rûniştandin raber dikin. Hûn ji malbat, derdor û civakê fêr bûne ku bê berpirsyar, bêrêxistin, ferdperest û nezan bijîn. Pêwîste hûn xwe ji vê rizgar bikin. Feraseta weke; "Wisa hatiye dê wisa biçe, em nabin mirov, em nikarin ji bin vî barî rabin", raveya rastiya civaka binketiye. Niha jî hûn vê li ser me ferz dikin. Ev ji nêrînên we heta zimanê we di her tiştî de diyar dibe. Ma ez ê we bi vî halê we ve çawa bipejirînim? Reftarên ji leşkertî dûr jiyîn, serî ji kesayeta dijmin parçe kirî re tewandine. Ev jî pirsgirêka yek-du zanyariyên hêsanin. Mejiyê xwe neguhertin, tê wateya ku poşiyek danîna li ser mejiyê ku dijmin parçe kiriye. Hêza ku têgihiştinê radiwestîne û civakê aresteyî tasfiyekirinê dike dijmine. Jixwe nediyare ku gelek ji we nûnertiya çi dike. Mejî û vîna we parçe bûye. Yên ku zimanê rêxistinê ya baş pêş naxe û rêxistinek baş ava nake hûn in. Yên ku di nava gerîla de jî nikare xwe ji çetegeriyê rizgar bike dîsa hûn in. Êdî ev xal baş tên fêmkirin.

Xala din, rewşa we ya di nava partiyê de ye. Bal bidinê, me nirxên gel ên kedê kom kirin. Weke hûn jî dizanin di civaka me de awarebûn zêdeye, ango kesayetên aware zêdene. Kesayetên aware yan jî ji dervî her cure çînayetî mane, kesayetên diziyêne. Dewlet jî kar nade van kesayetan, di civaka heyî de bêtal mane. Ev di nava PKK'ê de dibînin hinek derfetên raye, madî û manewî kom bûne. Jixwe gelek ji wan jî êrîşî van dikin. Ango hûn tevgerek diziyêne. Jixwe dijmin dibêje; "Ev talankerin" û dixwaze me di asta nav-netewî de jî wisa bide nasîn. Divê hûn bi xwe jî hinek tiştan bibînin û wate bidinê. Ji ber kes nikare hêzên aqilmend û nirxên xwe baş diparêzin tewambar bike. Hûn her roj di nava partiyê de raye desteser dikin û quralan tine dihesibînin. Hevalê me yê niyeta wî herî baş, an bê ku di ferqê de be koleyê quralane, yan jî desteserketê raye û quralane. Min jî tiştek nahesibîne. Ev nêzîkbûn pir xeterin.

Di vê mijarê de jî şêwaza herî zêde derdikeve pêşberî me şêwaza Osmanî'yane. Di nava Osmanî'yan de –jixwe qanûn-nameyên wan jî li gorî wan hene- dibêjin; "Sitûyê min li hember qanûnan tewandiye." Bes kesên ku vê dikin, piştî ku sitûyê xwe xilas dikin, her kesê li hember xwe jî weke sitû tewandî dibîne, gelekan dikuje û serê wan jê dike. Kesayeta we jî ji vê re guncave.

Em ne civakek ku dîsîplîna xwe heyî, li ser siyasetê serwer û bi huquqê tên îdarekirinin. Ji bo pêkana quralên civaka me hêzên ewlekarî tine ne. Ji bo venêrîna karên tên kirin jî, ne îstîxbarat, ne parlemento û ne jî hukumeta wê nîne. Sedema avakirina me ya partî jî, ji hemû xalên ku nîne re, bi rêxistinek têkoşînê ve bersiv dayîne. Ji bo avakirina huquqa gel, hêza biryara gel, hêza hukumeta gel, hêza ewlekarî, venêrîn û parastina berjewendiyên gel, partî hat avakirin. Partî her tim di rêyek amadekarî, rêxistinkirin û şerê vê dagirtî de ye. Lê belê hûn tam weke cahilek çavkor, ev ji bîr kirin. Heta ji vê jî wêdetir we partî anî rewşek arenaya rikên xwe didin jiyîn, destê kî di berîka kî de ye nediyare. Partîbûnek wisa nabe, wisa jî nagihin ti derî. Gelo kî ji we re got hûn dikarin bi valederxisitina partiyê ve hûn dikarin bigihin cihekê? Ev cahiltiya we ya çavkor, hêrsên we û rebentiya we rê ji vê re vekir. Wisa nabe, partîbûn bi we re nameşe û hûn ê li holê bimînin.

Hûn qet di nava partiyê de bikarên ku pêwîste bên kirin ve mijûl nabin, karên vale û heta bikarên xeter ve mijûl dibin. Hûn çawa diwêrin wisa bijîn? Gelo dê halê we çawa be? Berpirsê vê rewşa we dîsa hûn bi xwe ne, ji ber hûn partîbûnê naxwazin. Baldariya we li hember partîbûnê nîne, eleqeya we di derbarê hinek tiştên din de ye. Ger di nava me de komek endamên partiyî hebûna, dibe ku em îro bi gavên ji xwe bawer ber bi serkeftinê ve biçûna.

Fikarên min ên niha ne di derbarê dijmin de ne, di derbarê ku dê niha kî PKK'ê çawa tevlîhev bike yan jî wê min çawa bêwate bikeye. Ez dibêjin wê ji nava we yên herî baş jî kes vê fêm neke, derdora xwe birêxistin neke, bê ku bikeve ferqê her cure xirabûnê

bike û li ser bingeha nerêniyan bê bikaranîn an jî derdora xwe bikar bîne. Hemû fikarên min ên rojane ji ber vê ne. Dê kî di nava partiyê de şerek mezin ku pergala wê heyî birêve bibe? Her yek dibêje; “Ez ê ji vir xirab bikim, ji vir êrîş bikim, ji binî ve birûxînim û ji serî ve biçewsînim.” Vaye ez jî hewl didim vê rawestînim. Li naverastê nirxek moral û wijdanî jî tine ye; ev pir xetere. Ji hêla siyasî ve jî reftar û helwestên herî korin. Ti nirxa vê ya rêxistinî nîne. Tişta herî ecêb jî hûn xwe bi vî halî ve dipejirînin û wisa dihizirin ku bijîn. Hûn dibêjin; “Ma çiyê me kême?” Pir vekirî dikarim bêjim, yeqîn bikin ez bi vî halê xwe ve zorê xwe didim jiyîn. Ger ev gelê belengaz û tiştek wî neyî erka rêbertiyê nedaba min, devjê berdin em bikarin li hember dijmin li ber xwe bidin, me nedikariya em li hember we li ber xwe bidin. Lê her kesî hesaneya xwe girtiye dibêje; “Tu ji me re hewce yî.” Ez jî dibêjim başe, ger hewce me, ez ê hinek din li ber xwe bidim. Çîrok wisa ye. Nexwe dê hûn çi tiştê ku mirov ji cewhera wî qut dike hebe nûnertiya wê dikin. Destpêkê jî xwe tine dikin. Elbet hûn ne di ferqa van de ne. Ji ber ku ji bo hûn di ferqa van de bin, tenê wijdan têrê nake, di asta fikrê ser dixe, vîn û hewldana ser dixe de heta dawî serdeçûnek hewce dike. Piraniya van jî bi we re nîne.

Piraniya we ciwanin û li gel evqas keçên ciwan dimînin; lewra şerme ku hûn xwe nexin dewsa zilaman, dewsa mirovê bi şeref. Ez bi vî halê xwe ve bi zorê xwe weke zilam hewl didim bipejirînim. Ji şêwaza sekna we ditirsim û dibêjim çawa xwe wisa dipejirînin. Ji ber pir kêm aliyên min ên bên pejirandin hene. Xeterî feraseta ku vê wêrekiyê dide we û bi we dide gotin; “Mirov dikare wisa bijî” ye. Ya herî xirab jî, dema hûn xwe bi xwe re dimînin, çi ketîbûnên hûn nekîn û lîstokên hûn pêş nexin tine ye. Hûn weke komek tasfiyekarên jixweberin. Ez bi zorakî we digirim; ger negirim misoger hûn ê xwe bi xwe tine bikin. Gelo di nava we de kî heye xwedî wijdanek mezin be, yan jî di komkirina rêxistinê de biryardar be, bi xeteriyê bihese û li gorî vê jî her tim amade be?” Bila egîdek wisa derbikeve. Egîdî kesê ku dikare di karên gel ên bingehîn de bêje; “Ez heme.” Dema dibêje

ez heme jî hêza pêkana vê raberkirine. Bal bidinê ev bi kesî re nîne.

Di pîvanên Rêbertiyê de egîdî tê vê wateyê: Ger tu bes bî, bihêz bî, xweşik bî rê ji te re heye, nexwe tenê mirov dikare bi te re şer bike. Hûn nikarin bêjin; “Na, ez wisa bûm, guhê min kune, vira min xwehre, min efû bike rêberê min.” Ev hemû teretûre ne. Li naverastê ji bilî partîbûnê şerê Rêbertiyê maye. Jixwe li hember partîbûnê bertekek we ya mezin heye. Bes rikek min jî heye. Kêmek maye ez ji vê re bêjim, bi tena xwe partî, bi tena xwe artêş, bi tena xwe navend, bi tena xwe biryar û bi tena xwe hêza rêvebirinê ye. Ma ev rewş ji hêla dîrokî ve pir hewce bû? Ev kar dikariya bi kesayetên hêzdar re hevbeş jî bihata birêvebirin. Lê belê daxwazkarê vê tine ye. Kes nabe daxwazkarê karê gel, lewma bi tenê mam. Ma kî naxwaze hevalên me yên pir bihêz ên bêhempa parve bikin hebe? Ev rewş xeternake. Gelo siberojê tiştek bi min were hûn ê çi bikin û dê çi bibe? Jixwe ev doz bûye bela serê we. Yan dê gelek ji we bêje; “Em rizgar bûn, em jî para xwe ji pasteyê bigirin” an jî “Belê çîrok evqas bû.” Ne hêjaye ku mirov ji bo we, dozên xilasbûyî rondikê jî bibarîne. Ji ber ku bi we re dilek cidî tine ye; lewma hûn pir rehet dikarin xwe bi ferdperestiyê bixapînin û cuda bidin diyarkirin. Ji ber vê wexta ku hewceye, bîst û çar demjimêrin. Ger hûn berovajî vê îdîa dikin, nexwe kesayeta xwe biselmînin. Dema em pratîka we tevan vekin, hûn ê bibînin ku, rastî wisa ye. Ji ber ku bi sebir beşdarî yek quralê rêxistinê nabin.

Ez ji we re dibêjim rewşê binirxînin, wateya rast bidin karê hewce û cidî bigirin. Bes hûn bê ku şerm bikin xwe ferz dikin. Ev encamên ne redkirina kesayeta xwe û nebûna xwediyê zimanê partiyê ye. Hûn tev weke kurmê darêne, nirxên herî pîroz tine dikin. Belê Kurd wisa ye. Dinya alemê ev hêjayî Kurd dîtiye: “Ji bo van mafê mirovahî û demokrasî derbas nabe, ger komkujiyê bijîn jî ewqas negirînge.” Mixabin rastiya we wisa ye. Qet hewce nake hûn vê înkar bikin. Ji ber ku beriya wan me her cure xirabî li xwe kir. Yek ji vê cahiltiya siyasî ye, yek jî nepêkanîna yek quralê partîbûnê ye. Ger hûn hîn zêdetir kûr bikin, dê kesayetek

kêrî tiştekê nayê derbikeve holê. Kesên ti nirxî di kesayeta xwe de nehewîne, dê agir berdin dara eslê xwe. Ji ber vê ger hinek zimanê we yê xirab ku qet hewce nake û daxwazên we yên jiyana ferdî hebin wan jêkin bavêjin.

Tevî hûn hatine vî temenî, li hember rêxistinbûn û partîbûnê hûn bi temamî winda ne, ti aliyek we bi dest bê girtin nîne. Niha navenda PKK'ê, ketiye şûna saziya herî bibandor a hevdu valederxistinê. Hemû rêveberên herêman jî, rêveberên di asta jêr wan de jî di heman rewşê de ne. Tevî ku rexneyên min li hember we pir hişkin, ji ber hinek hesabên we yên biçûk hûn nikarin bertek raber bikin. Yeqîn dikim hûn jî dihizirin ku li vir xwe derxistina holê li gorî hevsengiya hêzê nabe. Bes hûn li cihên ku kes we nabîne û qaşo xwe hêz dibînin û dibêjin; "Firset ket destê min" ji wan rêbazên xwe yên çewsîneriyê pêk tînin. Ev pehlewaniyek veşartiye, yan jî piştê vê êrîşkirine, jixwe ti eleqeya vê jî bi egîdiyê re nîne. Dibe ku ev jî ji bo we negirîng be. Ji ber ku hûn her tim li hember hêza yekgirtî direvin. Cureya şerê ku hûn heyranin, şerên li ser bingeha ferdperestiyê ne. Min di temenê herî biçûk de jî ev fêm kir: Ger tu hedefekê, heta berjewendiyekê nedî kesê ku dixwazî birêxistin bikî, nikarî biherikînî û karekê jî bi wan bidî kirin. Ez di wî temenî de ji bo vê ewqasî li ber geriyam. Hêjî ew zarok di bîra min de ne. Min tika ji wan dikir, digot were ez ê te bibim vî robarî, binêre li wan deran çi heye. Her tişta min digot hebû û min wisa ew zarok kir hevalbendê xwe yê rê. Min digot were ez ê vê şanî te bikim. Min hemû gotinên xwe jî pêk tanîn. Min hêcetek datîna pêşiya wan û ew zarok ji malê derdixist û diherikandin.

Deka di vê mijarê de vêca li xwe binêrin: Hûn qet hedefên rêxistinê yên saxlem, derfetên di radeya zêrîn de, xwestekên madî û manewî û pêdiviyan qet nabînin, heta rêxistina amade jî ji xwe re weke asteng dibînin. Hûn bê hedefin; pêdiviyan nabînin, tişta ber bi başiyê ve dibe fêm nakin û esas nagirin û li şûna wê jî xwe ferz dikin. Ma çi eleqeya vê bi rêxistinbûnê ve heye? Tişta ku hûn tev di nava partiyê de dikin wisa ye. Deka li dîroka me binêrin: Hûn ê vê rewşa xwe çawa rave bikin? Heq bidin tiştên ku

dibêjim, ango durist û bi namûs bin û bersiva hinek tiştan bidin. Rewşa we dişibe kesên belaya serê kolanê. Weke bêjin; "Dîlawer hat, xwe bide aliyekê!" Ev şêwaz we nagihîne ti derî. Nexwe hûn ê kengê dev ji bûna bela berdin? Hûn ê kengê hewl bidin hinek karan fêm bikin? Jixwe mirov her tim vê pirsê ji xwe dikin: "Ma nabe ez jî xwedî tiştek xweşik bim?" Bes li gorî ku dibînim hûn şûna bêjin ez ê kêrî karekê bêm, dibêjin; "Ma nabe ez vî karî xirab bikim." Ya li ser kesayeta we serwer ev xale. Bi rastî jî we ev xislet ji kur girtiye? Kesayeta we ya we red nekirî, ji ber sedemên cur be cur dibe bela serê we, we dide gotin; "Ma nabe ez vî karî ji vir ve xirab bikim, rêxistinê wisa tengav bikim?" Ev hemû jî jixweber çêdibin, ango kesayeta we jixweber li dijî partîbûnê ye. Hûn bi şêwaz û axaftinên xwe ve li dijî partîbûnê ne. Dema ez partîbûna ku dihizirim û ya we tînim beramberî hev, derdikeve holê ku rewşa we bi temamî bela ye.

## PKK Hêza Xwe Ji Nirxên Ku Pêwîste Berz Bên Girtin Digire

Em rêxistinek şer a cureyek dinin. Bûyera ku em areste dikin, bi rastî jî bûyerek henase bi henase şerê tê meşandine. Tevî ku min dehî caran hûn şiyar kirine, hûn her roj bi tinebûnên xeter re rûbirû dimînin. Hinek jî tewanbarên ku rê ji vê rewşê re vedikine. Ger guncave hinekê jî ji bo fêmkirina vê bihizirin. Kes naxwaze peywirek ku hûn jê re ne amadene û nikarin bikin bide we; bes kes naxwazê jî partiyê bi vî halê we ve birêve bibe. Ez we ne bi berpirsyariyek siyasî û rêxistinî, bi berpirsyariyek exlaqî dipejirînim. Ger van zarokan wisa li naverastê bihêlim dibêjim dê heyf be û we li ser vî bingehî dipejirînim. Lê belê ev jî şaşe. Yekîtî tenê bi rêgeza exlaq û moral ve çênabe. Ji ber vê bi rastî jî hûn ji partîbûnê re amade ne? Gelo hûn dikarin destpêkekê bikin? We di vê mijarê de evqasî xirabî û kêmasî kir, lê ez ê dîsa jî van nekim pirsgirêk. Pirsgirêk ne ew e ku ez bikarim we tevan efû jî bikim, em bi mezinbûnên wisa yeqîn nakin. Mezinbûna ku efû dike nabe. Lê em dikarin sonda sererastkirin û perwerdekirina we bidin. Bes gelo hûn jî dikarin sonda destpêkirinê bidin? Yeqîn dikim ew hêza we jî nîne.

Bi qasî xwe nas dikim her tim zimanê rêxistinê me. **Zimanê rêxistinê** ne bi daxwaz û ferzkirinên şexsî yên kor ve, zimanê her tim ku dikare jidil, dilxwaz û viyan bi hinek din re bimeşê ye. Dikarim bêjim her kesê ku bi min re dikare bi dilxwazî û viyanî bimeşe. Tişta min dike min jî ev rastiye. Kes nikare bêje; “Ne jidil bi te re dimeşim.” Jixwe ne gengaze ku bi kesên ne jidil û ne dilxwaz re bimeşim. Ev pir zelal û vekiriye. Vêca deka li xwe binêrin: Gelo zimanê rêxistinê yên kesên bi we re heye? Dibe ku hinek bi we re bin; lê ev nayê wateya ku jidil û dilxwazin. Hûn van rebenan an bi sipartina raye ditirsînin û zorê, yan jî ne girêdayî hedefên rêxistinbûnê yên hevbeş, li ser bingeha neheqî û ehpab-çawişiyê birêve dibin, ji bo berjewendiyek xwe ji cihekê didizin û

hinek tişt pêşkêşî wan dikin û wisa xwe didin pejirandin. Elbet ev ne ji bo bi hev re rêbikevin, bi hev re rê girtine. Ne zimanekî rêxistinê ye, ger rêxistin hebe zimanê wê valederxistinê ye. Tişta hûn dikin wisa ye. Di nava partiyê de zimanê rêxistinê, zimanê artêş, zimanê siyasî, darbeya yekemîn ku hûn di partîbûnê de lê didin, lê ji bo we diyardeya esasê her tiştî ye. Hûn dibêjin; "Bila li holê zimanê rêxistinê, xwedîderketina rêxistinê nemîne û her kes dengê xwe derbixe." Vaye ev zimanê civaka ketiye, vaye zimanê kesayeta ku dijmin dide axaftin wisa ye.

Berê serdestan ji koleyan artêş ava dikiran, ew ji aliyekê ve bi tirs, ji aliyekê ve jî bendewariyên jiyana madî ve digirtin. Tirs û xofek dijwar ava dikirin peyre jî digotin; "Ger hûn ji vê artêşê derbikevin hûn ê birçî bimînin." Bi birçîbûn û zorê artêşên koledarî, feodal û heta burjuva ava bûn û van di dîrokê de dijwar şer kirin. Lê artêşên azadiyê ne wisa ne. Zimanê we di wateya rêxistinbûn û artêşbûnê de xirab bûye; zimanê hûn bikar tînin zimanê gundî ye, feodal an jî burjuva ye. Bes em nikarin bi vî zimanî bikin. Ji ber ku di vir de nakokiyek heye. Yek dikare bi zorê lê sînordar, ê din jî dikare bi mûçe lê pir kêm têr bike û birêve bibe. Ji ber li gorî xwezaya herduyan jî nikarin zêde gav bavêjin. Ji vê hêlê ve zimanê me, zimanê azadiyê ye. Ji vê re dibêjin zimanê sosyaslîst, ev jî bi wî zimanê we yê xirab bûyî re lihev dikeve û ne li gorî hesabê we ye. Ji ber vê zimanek ku xîtabî hemû civakê bike hewce dike. Mixabin jêhatiya ku hûn vê jî birêxistin bikin tine ye. Ev ne bi zorê dibe, ne jî bi têrkirinê. Ango ev, ne bi tirsandinê, bi daxwaza azadiyê ve dibe. Gelo hûn di vê mijarê de çiqas azadiyê dixwazin? Hemû azadiya ku hûn dixwazin, di sînorên takekesî de mane. Azadiya hûn dixwazin di wateya "Bihêle ez ê li gorî dixwazim azadiyê bijîm"e. Di nava rêxistinê de jî ew tasaruf û çewsîneriya ku hûn behsê dikin, azadiya dibêje; "Bihêle ez ê rêhevalê xwe bikujim"e. Ger hûn bal bidinê ev pir berfireh tê jiyîn. Lê ev ne azadî ye. Azadî ji bo hemû civakê ya hewce dengvedan û dema hewce kir jî şerkirine.

Pêdiviya hemû civakê bi vê azadiyê, heta tîbûna wê ye. Hûn ê jî vê jidil di kesayeta xwe de dengvedin û biselmînin. Ev kar îsyana gelane, rêxistina gelane, artêşa gelane û şerê gelane. Ma hûn

dikarin wisa bin? Heta em vê danin aliyekê, di nava bîrîmek biçûk a rêxistinê de jî we xwe negihandiye zimanek hevbeş. Weke di hesabên mezin de diyar dibe, her kes dixwaze bostek wî ji yê din zêdetir be; ango zimanê we yê rêxistinê evqase. Ji ber vê jî hûn fêrî bûne wisa baxivin. Hewce nake em biselmînin ev hemû şaşin. Ya girîng mirov fêm bike hûn çima wisa mane. Ez di nava PKK'ê de kesên ji me zêdetir fedekarî dikin, xwe dişewitînin, bomba di xwe de diteqînin, xwe bi temamî ji bo armancên rêxistinê feda dikin ser her tiştî re digirim. Baweriya xwe evqasî bi PKK'ê anîn, PKK evqasî bihêz dîtin, di xêra van nirxên ku pêwîste ser her tiştî re bên dîtine. Ger peywirên wan danî ser milê me nebin, hûn jî dizanin em nikarin rojekê jî gav bavêjin. Jixwe girêdan hêza hem li ber xwe danî hem rêvebirin hem jî bilindbûnê ye. Xwedî li bîranîna şehîdan, girêdanên gel û lehengên mînak derketin jî wisa ye. Ev jî dihêle ku em li hember zehmetiyan li ber xwe bidin û têkoşîna xwe serkeftî bikin. Ev jî asta vî karî yê dine. Dema em rastiya PKK'ê rave dikin, em van aliyên PKK'ê zêde nakin mijarên nîqaşan. Ji ber ku li ser van nîqaş nabe. Nirxên bilind nayên nîqaşkirin. Lê tiştên em nîqaş dikin helwestên ku nirxên mezin ber bi texrîbatan ve dibin û pêwîste hûn van nekin.

Hinek dibêjin; "Hûn tim rexne dikin." Elbet aliyên erênî bûne malê dîrokê, erênî berzin û jixwe hatine bidestxistin. Hewce nake li ser van nîqaş bê kirin; pesindayîna serkeftinan nabe. Jixwe ya serkeftî xwe selmandiye. Ma em ê çima bi nîqaşa li ser wê re zimandirêjiyê bikin? Em bi mafdarî li ser her tiştê ku bi van serkeftinan re di nakokiyê de ye û xeternakin qiyametê radikin. Ev jî, zimanê pêşketina PKK'ê ya diyalektîke. Hûn dibêjin; "Ma aliyên me yên erênî tine ye, em her tim wisa ne?" Na, kes nabêje aliyên we yên erênî tine ye, yan jî hûn tenê nesekinîne. Berovajî, em dibêjin hûn çima aliyên erênî bi zimanê zaferê ber bi serkeftinê ve nabin. Pêwîste rexneyên di PKK'ê de wisa bên fêmkirin. Pêwîste ti hevalên me nebêjin; "Van rexneyan ez anîme çi halî" yan jî "Ev rexne ne li gorî min in." Misoger di xalên ku hatine rexnekirin de ez jî di navê de para her kesî heye. Bila kes ne xwe ji dervî rexneyan bibîne, ne jî bi darezînek "Tiştek ji min dernakeve, ez

nesekinîme" nêzî xwe bibe. Di vê mijarê de hinek di vê astê de, hinek jî di wê astê de berpirsyariya her kesî heye. Kî bi rasteqînî nêzî vê bibe, dê ew kes rastiyê pêk bîne. Hêza kes weke heyî xwe danîna holê û helwesta xwe ravekirinê diyar dike.

Ev pirsgirêkên rêbaz ên di derbarê partîbûnê de ne. Pêkana van hêsane. Dema rêbazên nêzîkbûnê wisa tên rêzkirin, hûn dikarin yekser her tiştî çareser bikin. Ji bo we partîbûn ji nan û avê hewcetire. Hûn ê vê teqez hîn bibin. Weke heta niha we kiriye cardin vê mijarê ser guhê xwe re navêjin, li gorî qalibên xwe yên erzan jî fêm nekin. Em bi her awayî bi cidiyetek mezin xwedî li berpirsyariyên xwe derdikevin. Bes divê bersiva vê jî hûn xwe bigihînin kesayeta rêxistinê. Heta ez hebim, ez ê her tim vê berçav bigirim. Peyvên weke nav, şan û qîmet ji bo min tiştekê rave nakin. Ez di vê mijarê de pir dijwar im. Ji bo em kesayetekê bikin mirovê rêxistinê, her tiştî dikim.

Ez di van şahadetên me yên hêja de vê jî dibînim: mînak dema **Xeyrî Durmuş** ji ber kêmaniyekê şehîd dikeve dibêje; "Ev deynê mine." Dizane ku efûkirina wî jî ne karê me ye, lê dîsa jî vê weke wesiyet ji me re dihêle. **Kemal Pîr** jî li nava çavên me dinêre û dibêje; "Me tam şer nekir, qusurên me yên mezin hene û ger gengaz be berdêla vê jî bi navê me bidin." Ziman û çavên wan misoger wisa ye. Min ew baş nas kirin. Mixabin hinek diz jî hene, qaşo dijîn; ew jî li nava çavên min dinêrin, lê dema ez li pişt xwe dizivirim dibêjin; "Gelo em çi desteser bikin û bidizin?" Ez wan jî dibînim. Dema ez ferqa van derdixim holê û bersivê didim awirên wan, gelo awirên din ên xayîn jî ceza nekim û awirên wan ên xirab jî kor nekim? Vêca dê heq û edalet li kur bimîne? Yek lehengê herî mezine, yê din jî bênamûse. Elbet em ê yekê jidil bibîr bînin, yê din jî ji dilê xwe derbixin. Ger adilbûn wisa ye, neçarim vê bikim. Lewra nebêjin; "Çima wisa bi ser min de tên?" Têgeha ku tê gotin edaleta xwedê wisa ye. Ji vê re edaleta bilind tê gotin.

Ger dibe li hember nêrîna rast û dilê rast rêzdar bin. Ji ber ku wan di heman demê de ev gotin: "Me hebûna xwe ya herî hêja canê xwe li dijî vê wehşetê wisa feda kir." Em ê jî ji bo vê her tiştê hêja bikin. Dê hest, fikir û vîn berz bibin. Pêwîstiya girêdana bi wan ve

fermana vê dide. Ev misogere. Hûn her carê behsa hest û heqê dikin. Ger hûn dixwazin bidin diyarkirin ne sextekarin û hinekê jî wijdana we hebe, hestên herî mezin li hember dilên hezaran ên dişewitin, bi parçeyek agirê dilê xwe ve bersivê bide. Kesên ku vê raber nekin, hestên wan tiştekê rave nake. Ji ber vê pêwîste hûn rêzdar nêz bibin ku ger ez qet nirx nadim hestên hinekan. Ji ber ku ji bo min nirxên herî mezin ev şahadetin. Dema li ser van dihizirim dilê min teng dibe. Dengê dilê wan ê dawî, wesiyetên dawî, xwe fedakirin, dilê gelê me yê bi êş, her wiha dîrok û komkujî ger bi dilê we yê dîrokî re nebe yek, tê wê wateyê ku dilek we ya biçûk heye. Ez nikarim di bin berpirsyariya Rêbertiya PKK'ê de li hember wan dilê we yê biçûk rêzdar bim. Ger hûn dibêjin; "Dev ji me berde, em dixwazin hinekê hez bikin, hinekê jî xwe bijîn", bersiva ku ez bidim vê jî ger ez kesayetek dîrokî, gel û şehîdame, ez ê bêjim nabe. Ger hûn jî ne kesayetên bêşerim bin, hûn nabêjin; "De berde em ê hinekê xwe bijîn."

Ev jî pir vekirî derdixe holê ku pêwîste di nava PKK'ê de zimanê dil çawa be. Bes niha gelek ji we weke ku hemû nirx tine ne nêz dibin, xerîzeyên xwe dixin dewsa her tiştî de, wer dizanin ku bi xayîntî bijîn. Ev rewşek pir xirabe. Em ê jî bikevin pey van. Ev pêkanîn heqaretek mezine. Ma em bi qasî wate nedin nirxan lewaz û belengazin ku, hûn vê li ser me ferz dikin? Hûn ê ji vir vê encamê derbixin: Ev zilam bi girêdanên ji jidil şopdarê dilê şehîda ye, dilê hemû mirovên êş dijîne û tola hemû kujerên di dîrokê de çêbûne. Hûn ê bipejirînin ku ev bi me re heye. Ger hûn vê nebînin hûn ê xwe bixapînin.

Em wisa ne dikarin ti wateyê bidin kesên ne xwedî dilek wisa û di nava me de xwe dijîn, ne jî vê dipejirînin. Nêzîkbûna; "Mafên min ên kesî hene, berde hinekê jî xwe bijîm" heqareta li jiyanê ye. Vêca dê mafê mirovên ku henaseya xwe dawî wisa dayîn, di nava êşên giran de dinalin, her tiştên wan nîvçe mayîn û hatine qetilkirin kî bide? Nexwe fermana rêhevaltiya têkoşînê pêşî bûna zimanê wan e. Zimanê rêxistinê wisa ye. Mixabin we di van mijaran de sucên mezin kirine. Ez nikarim zimanê kole, zimanê dizan, piranî jî zimanê dijmin û fikrê teng û dilê kor ê girêdayî vê bipejirînim. Ji

ber ku gel bi min bawere, şehîdan wesiyetên xwe ji min re hiştine û hinek dost jî nirx didin min. Ez nikarim dijberî van bikevim. Gelo hûn dikarin di vê wateyê de min fêm bikin û bi min re bimeşin? Ev pirsgirêka we ya biryarê ye. Ez ne ji we tika dikim, ne lavayî we dikim û ne jî we asteng dikim. Di vê mijarê de hilbijartinê ji we re dihêlim.

Bes pîvanên hilbijartinê jî pir vekiriye. Ger hûn bêjin; "Ez ê xwe veşêrim, xwe bi rengek din ferz bikim", hûn ê di serî de xirabiya herî mezin li xwe bikin. Ji ber ku tevdîrên min hene. Ma hûn ê bi çiyê xwe min bixapînin? Hûn ê vî mirovê ku çil salin bi qasî di dîroka mirovahiyê de ne hatiye dîtin vî karî ve mijûl dibe çawa bixapînin? Di vê mijarê de qet xefletê nejîn. Ji ber ku ne gengaze ez bêm xapandin. Hemû gotinên weke; "Ez li çiyê me yan jî di odeyek her çar aliyê vê girtî de me, min nabîne" vale ne. Tenê li çavên we binêrim fêm dikim we çi kiriye. Ji ber ku ez di vê mijarê de bi qasî hûn dizanin zêdetir şiyarim. Jixwe têgeha xweda û nebî jî di vir de derdikeve holê. Bi me re çavên mezin dibîne, mezin hîs dike pêş ketiye. Jixwe Rêbertî jî ev wate ye. Hûn van tevan piştguh dikin. Di Îslamiyetê de ji kesên van piştguh dikin re kafir, minafik û durû tê gotin. Di zimanê siyasî yê asayî de jî têgeha **oportonîst** jî vê rave dike.

Gelo çima di nava partiyê de ev wisa dibe? Çima bi qasî ti dîrokê de nehatiye dîtin evqasî rexneyan dikim? Elbet ev bi min re jî eleqedere; bi zorê rêve dibim û zorê ava dikim. Ev di nava rastiya me de heye. Rêbertiya ku hatî hilbijartin serxistina van zoriyane. Me bi temamî ev peywir girt. Pêwîste hûn jî van tevan di nava reseniya wê de lêbikolin. Me bi xalên ku hûn di pirtûkan de dixwînin beramber hev negirin. Xweseriya vir heye. Di her asta vê civakê û dîroka wê de xwesertî tê jiyîn. Ev di nava partiyê de jî wisa ye, em vê heta asta rêbertiyê jî diyar dikin û çareser dikin. Nexwe ger hêjî îdîaya we heye, gelo hûn dikarin ji bo partîbûnek wisa wêrektiya xwe bikar bînin? Ma hûn dikarin vê fêm bikin û xwe tevlî bikin? Gelo hûn dikarin jidil li xwe mikur bên û biryara xwe bidin? Bes divê ev biryar hem watedar be, hem jî bi qasî hûn bikarin hewldanê piştewan bin xurt be. Ger ev nebe, ez ê jî heta

temenê we bibe heftî salî jî bi ser we de bêm. Qanûna vî karî rastiya Rêbertî û girêdayî partîbûnê ye. Li hember yek ji we tikayek min a weke li gorî min bin, ma hûn nabînin bi tenê me û tengaviyê de me, hinekê mezinê xwe ve girêdayî bin tine ye. Tişta ku dixwazim bêjim pir cuda ye. Ez di mijara ku bi hêza xwe ya cewherî li ser lingê xwe bisekinim, bimeşim û kar bikim de pir bi îdîa me. Hema bêjin ji ber vê çêbûme û xwe ji nû ve ava dikim. Tiştên tên gotin ji bo we ne.

Bav zarokên xwe di temenê herî biçûk de ji me direvînin û digotin; “Kurê min, karê te bi wî nîne” û tevdîrên taybet digirtin. Elbet peyre Komara Tirk jî got; “Ew xetere, dê hemû zarok biçin cem wî” û tevdîr li pey tevdîr girtin, hêjî digirin. Heta yên di nava me de jî propagandeya, “Ev zilam jiyana me ji me distîne” dikirin. Hêjî gelek ji we di bin bandora vê propagandeyê de ne. Jixwe ji ber vê hûn nikarin bihêz beşdarî nava partiyê bibin. Ger tişta em li vir dibêjin bê fêmkirin, hingê hûn dikarin bi rêbertiyê re bimeşin. Diyare dê meşek çawa bê kirin. Bes meşa we ya heta niha weke şêwaza belavkirinê ye. Ger hûn bal bidinê ji bo em we ji rewşa belavkarî yan jî bûna qov derbixin, me sebrek mezin raber kir. Îsyana me ya destpêkê li gund destpê kir û ev jî ji bo em wê qovbûnê ji ser pişta xwe rakin bû. Ji bo kesên ku bikarin li ser lingê xwe bi me re bimeşin, ez soza heta dawiyê alîkirinê didim. Na ger hûn dibêjin; “Dev ji me berde, ez ê li pişta te siwar bibim, tu jî her tim min rake”, wê demê hûn ê bibin dijminê ruhê min. Di rastiya min de ne li hinekan siwarbûn, ne jî hinek li xwe siwarkirin û rakirin heye. Lê bihizirin, we bi vî halê xwe ve yan rêxistin, ango Rêbertî tenê kiriye şûna hemalekî, yan jî we xwe kiriye di rewşa hemaltî de. Hinek li we siwar dibin, vêca hûn jî dixwazin li hinekan siwar bibin û biçin. Ev helwestek şaşe û divê hûn yekser biterikînin.

Di rêhevaltiya me de qetiyen ferzkirinên wisa tine ne. Bi qasî tu dibînî lê dinêrî, bi qasî tu dikarî jî dest bi meşê dikî. Tu dikarî bi qasî rastiyan bî û bi qasî serkeftinan bijî. Rêbertî wisa ye; nexwe Rêbertî ne bavek, reîsek û karsazeke. Ti eleqeya Rêbertî bi van şêwazan re nîne. Rêbertî îlahîbûn û înkarê jî napejirîne; weke ku destûra bikaranînê nade, bikar jî nayîne. Xweziya hêza we hebûya û we

gotiba; “Ev diyardeya rêbertiyê çiye ka em hinekê fêm bikin û binirxînin.” Mixabin bi qasî di partîbûna gelemperî de diyar dibe, di nirxandina Rêbertiyê de jî hûn nerasteqînî ne. Hûn bi moral jî nêzî vê mijarê nabin. Ango hêza we ya nêzîkbûna hem felsefî, hem zanistî, hem jî siyasî sînordare. Ger hûn di vê mijarê de ne bi rasteqînî bin, dê li naverastê şopdarên weke we pir paşde mayî bimînin. Jixwe şopdarên paşde mayî jî dijmin digire û wan dikuje. Nebêjin; “Pirsgirêka min a şêwaz û tempo heye.” Gelo dema artêşa Tirk a weke cinawirekî xwe bigihîne we dê çi ji we bike? Hûn jî di wateya çors de vê baş dizanin. Ji bo mirov ji vê rizgar bibe, pêwîste hûn lez bihizirin, lez bikin û lez baxivin. Dê pirsgirêka tempo ya bi navûdeng a di nava PKK’ê de jî wisa çareser bibe. Bi zimanek, “Di encamê de min rastî dît, dîsa jî dimeşim”, şêwaza fikir nabe. Lezgînî, li gorî xwe gihandina dijmin û hedefê tê amadekirin. Ev jî karek pêwîst bû we ji mêj ve fêm kiriba.

Hûn dibêjin; “Em ê piştî sedsal şûnde bigihijin hedefê.” Li cem me ti hedef li gorî tempoyek piştî sedsal şûnde nayê bidestxistin. Dîsa li cem me ji destpêkê ve feraseta “Ez xwedî niyetek başim, dimeşim, kengê bigihijim hedefê dibe” mehkumê serûbinbûnê ye. Hemû hedef ancex bi lezgîniyek misoger ve tê bidestxistin. Ev di şêwaza xebatê û şêwaza jiyana di nava partiyê de wisa ye. Ev jî aliyên partîbûnê yên dine. Ango hûn neçarin fêm bikin ku di partiyê de şêwaza xebatê, di partiyê de tempo, di partiyê de rastiya şer û jiyanê ya li gorî hedefê hatiye amadekirin -helbet di piştê de li gorî dijmin jî hatiye amadekirin-, di nava partîbûnê de xalên herî girîngin. Xwe di vê mijarê de binirxînin. Lê we ji mêj ve girêdana xwe ya bi van têgehan ve qut kiriye. Paşê jî hûn dibêjin; “Min evqasî ked daye, jiyana xwe feda kiriye.” Bes hewldana we û jiyana xwe fedakirin jî têrê nake. Seknek li gorî hedefê û leza dijmin hewce dike. Ger ev çênebe hûn ê serserkî bikevin.

Asta we ya paşketî dibe sedem ku em têgehên bingehîn dubare bikin. Pêwîste hûn vê rewşê lezgîn derbas bikin. Tevî hemû rexneyên me, hêjî em li bendê ne ku hûn gelek karên girîng bikin, bibin xwediyê kesayetên wisa ku bikaribin karê partîbûn û artêşbûnê bicîh bînin. Vê ser guhê xwe re ne avêjin, bê wate nekin û bêcidî nêz

nebin. Hema bêjin hûn ji devê şêr hatine derxistin, li ser vî bingehî em dixwazin we li vir bikin pola. Hêjî em dixwazin di şer de cîh bidin we. Ev pirsgirêkek cidî ye; henase bi henase xwe bidin vî karî. Li gorî ez dibînim daxwaza we ya şerkirinê nîqaş li ser nabe, di asta niyet de hûn wêrek û fedekarin jî. Lê belê tişta em dixwazin we li vir tevlê bikin hunera wê ye. Ev huner pêşxistina şêwaza dijmin binxistin, dema hewce kir kesayetên we li gorî wê ji nû ve avakirin, aliyên asteng dikin înkarkirin, aliyên kêm temamkirine û ev jî karê me ye. Hûn ê jî bi dilxwaziyek mezin beşdarî vê bibin.

Em ê her tim vî karî ronî bikin. Em ê vê weke karê bingehîn binirxînin û henase bi henase kar bikin. Jixwe dê encamê de ev jî ber bi avakirina kesayeta ferman dide, pêşbîniyê esas digire û bin dixe ve bibe. Wê ev kesayet jî we di her kêlî û li her cihî hem ber bi asta jorîn, hem jî quralên rast ên jêrîn, rêxistinbûnek exlaq, vîn û aqilmend, ew jî her ku biçe ber bi kesayetek partiyê ve bibe. Me bi tena xwe dest bi vî karî kir. Ger em vî karî heta roja îro bi serkeftinek mezin rêve dibin, ti hêz nikare xwe li hember vê yekîtiya hêza yekbûyî, bi hezaran qadroyên di nava partiyê de, deh hezaran sempatîzan û pişgiriya milyonan gel ku ava dibe li ber xwe bide. Ger ev yekîtî li ser vî bingehî bimeşe, serkeftina wê nayê astenkirin.

**14 Çile 1998**

## PKK RASTIYA YÊN MILÎTANIN

Dema em hewl didin rastiya we ya ji civakbûnê dûr ketî dahûrînin, dîsa li gel biryara dijmin a misoger valederxistina berxwedaniya ku em dimeşînin, vê zemîna we dahûrînin û derbas bikin, em weke kes jî we yek bi yek lêkolîn dikin, weke bi salane tê kirin, derdikeve holê ku hûn ne yê xwe ne. Bes zêde nevekiriye ku hûn dixwazin bibin çi. Hûn bi rewşek wisa re rûbirû ne, bi we re tiştek bi navê kesayet nemaye.

Me hinekê jî çavsoriya ber bi îxanetê ve dikeve parçe kir, bes hêjî hûn negihane asta jiyanek ku li gorî pêdiviyên mirovahiyê. Ev jî vê qada me ya xebatê ji her demê zêdetir tengav dike. Ya herî xirab jî, ez fêm nakim hûn çima ji vî halê xwe şerim nakin. Diyare hûn ne serkeftî ne. Ji kesayeta we fêm dibe ku hûn nikarin çareseriyek cidî pêş bixin. Bi qasî hûn hestek berpirsyariya herî biçûk jî nehesin, hûn xeteriya li ber serê xwe jî nabînin, xwe di nava jiyanek zorakî de digirin û bêarbûna we dibe rastiyek ku gef li jiyana min jî dixwe. Tevî ku li hember zextên dijmin ên dijwar pir bi rêgez û pir jî pratîkvaniyek serkeftî didomînim, ji ber vê rastiya we ya tine bûyî dijmin qat bi qat me zêdetir tengav dike.

Gelo çima kes nêzî Rêbertiyê nabe? Ma çima her kesê tê xwe difiroşe pênc quruşan? Hûn xwe firotina erzan, heta ku nikarin bifiroşin jî weke reftarek herî baş dipejirînin û diçin. Qet nebê pêwîst bû kesê ku naxwaze xwe bixe di nava zehmetiyên mezin de dîtiba rêbertiyek bi rêgez li ser vê rastiyê ferzkirin ne karek aqilmediyê ye. Rewşa we ne tê lêdan, ne mirov dikare dûjînan bike, ne jî tê hezkirin. Ango kêrî tiştekî nayê, tenê dikare bimire. Kesên ji destpêkê ve winda kirîn, anîna rewşa milîtaniya doza mezin ancex bi hewldanên min tên rêvebirin. Hemû bê cidiyeta we jî girêdayî vê ye. Ev sekna we weke ku ji nêz ve girêdayî lewaziyên we ne, ji nêz ve bi şêwaza min ve jî girêdayî ye. Amûra we ya herî mezin a parastinê, hûn nêzî fêmkirinê nabin. Hûn di sînorên nefêmkirinê de,

di mirinê de israr dikin û dibêjin; "Ger dê jiyan hebe bila di wî sînorî de be, ger dê mirin jî bê bila di wî sînorî de be." Dibe ku hûn bikarin hêştir bi ser xendekê re derbas bikin, lê mixabin zehmete ku mirov xentekê li ser rastiya we re biqevizîne.

Nirxandinên ku dijmin herî dawî girêdayî pratîka vî Zekiyê "navdar" di derbarê me de pêş xistîn, ya rastî mirov pir dide fikirandin. Dibêje; "Ger em bikarin Amed'ê bigirin, dê rûxandina van zûtir çêbe." Di kesayeta wî de rastiya we pir baş lêkolîn kirine. Rewşa min cuda ye, tevdîrên ku min girtine kar cuda birêve dibe; bes raste ku ew bi temamî xwe dispêre kesayeta we û wisa dahûrînan dike. Bi amadekariyên zirav ve ya rastî dizane ku hûn ê çibin, hûn ê ber bi çi ve biçin. Dijmin dibêje; "Plansaziyên me encam dan û dê kom li pey hev werin." Dibe ku di kesayeta Kurd de ji hêla fîzîkî ve hinek rikên li gorî xwe, hinek ferasetên namûsê hene, lewma yekser kom bi kom hûn neçin, lê ez di astek bilind de, di rastiya we de revê dibînim. Dijmin jî hewl dide vê fêm bike, elbet ez jî hewl didim çareser bikim.

Ev rastiya we ya wisa di navbera şoreş û şoreşa dijber de tengav bûye, we dem bi dem ber bi Komara Tirk ve, dem bi dem ber bi mirinê ve diherikîne, hinek deman jî hûn bi hewldanên me di nava me de man. Diyare rewşek we ya baş nîne. Ev jî ne pirsgirêka niyeta xirab an jî hewldanê ye. Civakê tiştek ne daye kesayeta we, potansiyela we tine ye. Dema civakê jî potansiyel ne daye we, paşve kesayetek we tenê îskelet maye. Divê mirov vê valehiyê bi şoreşê dagire. Di vê mijarê de niyeta we weke ya min di derbarê xwe ji nû ve avakirinê de nîne. Tişta herî zêde hewl didim bikim, dawî li xapandina jiyanê anîn, ji we re bidim diyarkirin ku hûn êdî nikarin bi xwe xapandinê ve bijîn, we ji zimandirêjiya şoreşgerî dûr bixim, an jî bi hinek rastiyan re rûbirû anîne. Wê demê jî hûn dikevin rewşek pir xirab û belengaz. Dilê mirov bi halê we dişewite û nikare li we binêre.

Tiştek zêde em ji mirovên din re bêjin tine ye, heta em pêwîst nabînin ji gel'ê xwe re jî bêjin. Lê dema kesên di rastiya şoreşê de, çembera şoreşê de cîh digirin dibin mijara gotinê, pêwîste mirov li ser raweste. Heman weke çawa nexweşek li ser maseya ameliyatê

ye û teqez pêwîste mirov tiştekê bike, divê di navenda partiyê de jî operasyonên herî kûr bên pêşxistin. Em jî hewl didin vê ji her hêlê ve bikin. Bi rastî jî dibe ku nexweşiyek polîtîk, leşkerî, bîrdozî, rêxistinî, çandî, kurtasî ji her hêlê ve komple be. Qet nebe dibe ku çend kesên dikarin bêjin; "Ez baş bûm û dikarim hinek karên nexweşiyê re mijûl bibim" derketiban pêş. Bes nexweşiyên her ku diçe kûr dibin derxistina holê zêdetir tiştek xwe bide der nîne. Kî li we binêre bila be, dibêjin; "Ew nexweşin." Em dikarin ji vê rewşa we re bêjin kesên lenetiya sedsalê, civakek ji nijadên reş xirabtir û paryayên (kesê ji derî sîstema qesta li Hîndîstanê mane) dervî çînayetî yên sedsalê mane. Serdemekê paryayên sedsalê wisa dihatin fêmkirin. Dixwazim bêjim ku tevî van hemûyan hûn pir xirabin, pir bi zanebûn li pey xirabiyan baz didin. Lê hûn nikarin wê jî bikin. Mirov dikare bêçaretiya we hinekê jî wisa rave bike. Dijmin pir mezine, hûn bi dijminek wisa re rûbirû anîn dibe ku dê bibe bêrehmiya herî mezin, bes li gorî min ev ne raste. Felseya min, pêwîste kesên ku dijminê xwe bin nexê bimire. Kesê nezane pêwîste bi dijminê xwe ve mijûl bibe, ti heqê xwe tine ye, nikare yek gotinê jî vale baxive. Ji destpêkê ve cewhera çalekiya min wisa ye.

Kesên nizanin dijminê xwe bin bixin, li cem min her tim ketî, bênamûs û bêşerefin. Ev kesayetên kirêt û mirov stara xwe jê bikine. Felsefeyek min a wisa heye. Kesê ku di her astê de têkbirina dijmin, di serî de di asta fikir û moral de domdar neke û vê gav bi gav nexê meriyetê ne ti tişte. Niha jî li we dinêrim: Dijmin li kure, hûn li kurin? Hûn li hember dijmin weke berxê qurbanê ne. Heta ji hêla objektîf ve, weke leşkerên dijminin. Ya rasteqîn jî hûn weke cinan belengazin. Hûn dara bin xwe jê dikin. Hûn ne tenê dijmin bin naxin, li cem we bi navê dijmin li xwe xistin zêdetire.

Tiştek din a kesayeta Kurd dixwaze bike jî, xwe kirina şûna zilamê sexte de ye. Wer dizane ku kar dike, ked dide û dijî. Bes van tevan jî ji bo dijminê xwe dike. Ev tiştek pir xeternake. Zehmete ku hûn beşdarî pergala ku ez li ser we ferz dikim jî bibin. Hûn bi vî halê xwe ve her yek weke kontrayekê ne. Pergal li kur, sekna we li kur? Cidiyeta zarokan jî bi we re tine ye. Li gorî pergala min jiyîna

we, bûna milîtan û li hember zehmetiyan li ber xwe dayîn pir zehmete. Di vê rewşê de ferdperestiya her yeke ji we derdikeve holê. Ger em rêbazên taybet ên îdarekirinê li aliyekê bihêlin, tiştek li naverastê namîne. Hûn bi vê kesayeta xeflata kûr dijîn ve du hefteyan namînin, tine bibin. Jixwe rastiya Kurd di vê mijarê de jî pir xirab bin ketiye.

Hemû tişta min kirî, bikarim li gorî vê şêwazê jiyana we bi we bidim redkirin û pêşî lê bigirim. Ev jî we pir tengav dike. Dema mirov li rûyê we dinêre, em mirovên ku dibêjin; “Dev ji me berde, em hinekê jî diwazin xwe bixapînin û wisa bijîn” dibîne. Hûn hemû jî dixwazin cixareyekê bihejînin, xwe jî pê re berdin û wisa henase bigirin. Halê we tevan wisa ye. Kêm maye hûn bigirîn. Ya rastî rewşek tam jî Komara Tirk li bendê ye tê jiyîn. Zekî’yê ‘navdar’ hûn baş dahûrandine, rêbertiyek jî tam li gorî we ava kiriye. Pêwîste mirov di vê mijarê de heqê wî nexwe. Ger min ew serbest berda, difikirim gelo dê çi bibûya? Ya rastî Zekî’yê navdar tam li gorî we bû, her tişt li gorî we baş amade kiribû û di vê mijarê de jî pir serkeftî bû. Elbet ji bo bikare van bike, pêwîst bû pêşî min ji holê rabike. Her çendî xwest min ji holê rake jî, ditirsiya, ne dikariya henase bigire. Ev xisletek giştî ye û rewşa gelek ji we jî wisa ye. Niha jî li hemû Kurdistanê wisa ye. Hinekê jî dixwazin pala xwe bidin me û wisa bi ser we de werin. Niha serfermandarên paya bilind ên Tirk jî di vê rewşê de ne. Hemû jî dixwazin min eyar bikin, ji hêla taktîkî ve plansaziyek takekesî û civakî pêş bixin.

Zekî’yê navdar jî wisa bû. Zekî li ser we bibandor bû û tam li gorî we bû. Zilam her cihê ku çûyiyê du hefteyan de eyar dikir. Ev keç û xort hemû li hember hevdu eyarkirinê de pir serkeftî bû. Jixwe ev derket holê jî. Fermandarê we wisa bû, lê kêmasiyek wî hebû: Ji bo bikare van tevan bike, pêwîst bû xwe bispêrê min. Dema min jî piştewaniya xwe jê kêşa, yekser ket erdê. Divê hûn vê dahûrînin û fêm bikin ku xwe sipartina min ne tiştek raste. Mixabin we li hember nefêmkirinê berxwedaniyek ecêb plan kiriye. Ev rewşa we derbaskirin, hêştir ji xentekê derbaskirinê zehmetire. Li gorî Îslamê rewşa we dişibe sofiyên hişk ku ti duayan fêm nakin.

Pir ecêbe, lê pêwendiya di navbera min û we de hinekê jî wisa ye. Weke şêwaza sofiyên herî hişk ên di çanda ol'î de tên jiyîne.

Komara Tirk pir ji xwe bawere. Ji ber ku hûn hinekê ketiyê ruhê xwe ne, elbet jiyanek bi îşkence ne başe. Pêwîste nezehmet be hûn vê fêm bikin: Ber bi me ve hatin, weke kesek ku ji koleyên serdema destpêkê begê xwe ve girêdayî ber bi azadiyê ve bazdane. Lê ger ew kole wateya vê azadiyê jî nezane û nirxê wê pîroz neke, vêca rewşa wî koleyî hûn bifikirin. Rewşa we jî dişibe vê, heta ji vê jî xetertire. Begê we ji begê serdema destpêkê dijwartire û tevdîrên wî zêdetirin. Niha bizanin spartekûsbûn û berxwedaniya min jî li gorî xwe xwesere, li gorî xwe pergelek heye. Hûn ne di ferqa wê jî de ne. Lewra meşa we ya azadiyê dişibe, maceraya Mecnûn a azadiyê. Ya rastî yeqîn nakim ku hûn ji azadiyê jî tiştekê fêm dikin. Gelek ji we ji ber ji malê aciz bûye, lewma tevlî têkoşînê bûne. Hûn di zanebûna qutbûna ji malê, navendekê û koletiya kûr de ne. Heta hestên we yên wisa jî tine ne. Tenê hûn aciz bûne, ewqas; ancex ev jî têrê nake.

Hûn jî dizanin, Roma hemû îsyankar li çarmixê ve girêdan. Ev heman ji bo we jî tê fikirîn. Hûn ji her hêlê ve ber bi Amed'ê ve bi sitûnan ve tên bizmarkirin. Ji ber ku hûn bê xemin vê jî nabînin. Divê hûn vê dahûrînin. Zekî'yê navdar hêjî di hewayek fermandarê navdar de ye. Bes dê bi guhên wî re bigirin û bibin Amed'ê. Ew wisa dizane ku hêj li pey karên mezin de ye. Heman weke we. Bes min hûn hemû eyar kiribûn. Hûn hemû jî xwedî heman derûnî, heman felsefeya jiyanê, heman pêşnûmeya fikrê ne. Lê Zekî fêlbazê we tevane û herî çavsor bû. Di herî jor de ma. Ev jî dahûrîna Komara Tirke. Ez jî we di vê mijarê de agahdar dikim. Xwe di vê mijarê de dahûrînin û danin holê.

**Şoreş**, di wateya wêrekî, fikir û rêxistina binxistina dijminê xwe ye. Ev raveyek bi sê gotina ye. Bes rastiya we van tevan der dike. Ango hûn di qonaxek wisa de ne, tevî perwerde, nîqaş û biryarên mezin hene, hûn nikarin van her sê peyvan dahûrînin û li gorî van her sê peyvan xwe amade bikin. We çima artêşbûn çênekir? We çima partîbûn pêş nexist? Ji ber hûn di şoreşê de li gorî hedefên hatîn destnîşankirin nehizirîn, bi vîn û birêxistinbûn

nebûn. Ger niha reformekê çêkim, dê ev ji bo we bibe reforma çi? Dê bibe reforma Zekî'yê bi navûdeng. Reforma Zekî'yê bi navûdeng jî li ser destan li ser rêya Amed'ê ve çûyîne. Ez ê çi ji vê reformê bikim? Lê ev reforma hûn dixwazine. Niha jî di hemêza kontra û polîsên Komara Tirk de mûçe bidan we, dê me ew jî bipejiranda. Ji ber ku ez dijmin baş dinasim dizanim, wê jî nadin we. Dijmin bi derewên; "Ez ê zagona poşmaniyê derbixim, we bidim jiyîn" ve gotinan dike. Ger dijmin gelê xwe birçî hiştiye, dê çawa tiştekê bide we? Ev negengaze. Hemû karker û heta karmendên wî jî li hember îsyanê dikin. Ev pir vekiriye, lê ji ber ku hûn çavsor û înkarvanin naxwazin vê rastiyê bibînin. Dijminek wisa ye artêşa xwe ya milyonan karmend di sînorê birçîbûnê de fetisandiye. Ma dê kesên weke we evqasî rê ji zerarê re vekiriye efû bike? Hûn ji bo dijmin zilamên tirsnakin.

Dijmin bê sebep ev pêş nexist. Şertê sereke hûn hêza ku vê napejirîne raber bikine. Dijmin salane plan dike û got; "Ger bibe dê fermandarê herî mezin Zekî be." Van emperyalîstan jî bi temamî xwestin wisa şîrove bikin. Bi plansaziyek li gorî vê û herî dawî jî ger ev plan ser bikeve, hizirîn ku pêşî min ango APO ji holê rakin. Gelo ez çima nikarim xwe bi we bidim fêmkirin? Ez pir hêrs dibim ku hûn xwe dispêrin min û vê rezaletê dijîn. Dihizirim ku ev zilamên kêrî tiştekê nayên çawa çêbû li derdora min tije bûn. Min dizaniya ku emperyalîzmê û Komara Tirk bi avakirina vî zilamê sexte ve, van karan plan dike, lewma min her tim dişopand û salane tevdîrên xwe digirt. Ji bo ji wan re bidim diyarkirin Zekî çi male min ew şand ber destê wan. Ev karên ez bikime. Bes hûn li gorî çi ne û çawanin?

Niha aliyê ecêb jî, kêm-zêde hûn xwe dispêrin min û wisa dimeşin, qet agahiya we ji pergala min tine ye û hewl didin min bikar bînin. Lê belê di vê cîhanê de zilamek ku neyê bikaranîn hebe, ew jî ez im. Ev nakokiyek tirsnake. Zilamê bi serê derziyê bîran dikole û wisa nirx ava dike bikaranîn, yeqîn dikim karê cîhanê yê herî zehmete. Hûn jî rêya herî hêsan dixwazin min bixapînin. De vêca we re hem di kêliya jiyînê hem jî ya şer de vî karî çareser bike! Hinde hûn xwe hêsan dixapînin, min di nava we

de yek zilamê cidî nedît. Ger ew Zekî'yê bi "navûdeng" di mijara wê çawa min bikar bînê de serketî bûya, evqas dilê min pêne dişewitî. Lê ev jî tine ye. Di şerên wisa de ger zilamek saxlem li te bixe hêja ye, wê tu bêjî kesayetek kêsê li min xistî hebû. Qet nebe bê ku me bixapînin bikarin li me bixin û bikariyan yek-du salan li dijî dijmin li ber xwe daban, dê me ev fêm kiriba; ancex ev jî tine ye. Paşê jî ji hinekan re dibêjin; "Zilamên bi navûdeng." Navê hinekan jî wisa derketiye. Jixwe ev nav jî li ser we bûye bela. Neçarim ku van tevan ji bo we bêjim. Hûn bi rêgez û pergalê lîstin. Kesên bi rêgezê dilîzin jî dixwazin biçin kur bila biçin. Wisa nabe, dema nabe jî hûn ê teqez biçin dojehê.

Tişta ez dixwazim bikim, cudabûna di navbera artêşa leşkerên dijmin û artêşa me de sazkirin û qet nebe kesayeta ku li ser dijminê xwe kar nake derxistina holê ye. Tam jî di vê xalê de cewazî ji holê radibe, weke margîse her renk tê dayîn. Hemû rêgez hatine binpêkirin û weke hûn jî dibînin ev jî heta îxanetê dibe. Bes yek jî rengê xwe diyar nake, yan jî reng xirab nabe. Van ji bo vê dibêjim: Ma ji nava we egîdek dikare derbikeve û bêje; "Ez ji van karan re heme." Mirovek wisa tine ye. Lê di nava we de axaftinên vale û daxwazên vale zêdene û bê ku hûn şerim bikin dixwazin wisa sexte bijîn.

Hûn dixwazin li cîhanê bigerin û li welat digerin. Ev 18 sale min serê xwe ji vê çeperê dernexistiye, newêrim gavekê jî dervî vê çeperê bavêjim. Hûn cîhanê geriyane, hêjî dibêjin; "Ez dixwazim cihên cuda jî bibînim." Tevî ku 18 salin di çeperekî de bi tena xwe hewldanê dikim, newêrim weke vê meşa we ji milyonan yek gava we bavêjim. Dev ji kuştina dijmin berdin, hûn kuştina me hedef dikin, şerê me dikemirînin û her roj vir û wir de me tengav dikin. Hûn wer dizanin ku ev canê we ye. Hûn dihesibînin çek di destê we de ye hinekê li dijmin didin û hinekê jî azad dibin. Ev neraste. Ez vê jî ji we re vedibêjim, bes nêzî fêmkirinê nabin. Belê, can ê we ye, bila çek jî ya we be, bes ev şer ne weke hûn dihizirîne.

## Gerîlayên PKK'ê Îdeolojîk, Polîtîk û Rêxistinî Ne

Di pirsgirêka têkîliyan de hinek tişt diyarkirin dibe ku rewşê hinek din karîkatûre bike yan jî hinek din balkêş rave bike. Mînak şêwaza têkîliya vî Zekiyê "navdar" ji ya xayînekî xetertire. Keç û xortên ku di rewşa herî ketî de bikar têne hene. Dema em jî li hember vê helwest raber dikin, xof jiyan kir û reviya. Li hember me weke çûkekî direcifî. Ez bi gefan ser mirovan de naçim; di şêwaza min de her tim kûraniya fêmkirinê esase. Min bikarê vegotinê hîs kir ku ev kesayet di çi rewşê de ye û heman weke min li dijmin kirî ew jî bin xist. Bes ji bîr nekin, Zekî û kesên weke wî hûn ji ketiyekî xirabtir bikar anîne û jin qetil kirine. Em alîgirê ***Zîlan***'in, di şêwaza me de aliyên Zîlan zêdetirin. Lê li gorî şêwaza wî, mînak odeyek jina ku li kerxanê heye, dema zilamekî dipejirîne pereyan digire, li gorî xwe pergalek rehet heye. Vêca gelo ev qerecî pergalek weke vê dide vê keçê? Ne odeyekê, ne jî quruşek pere dide, dê wê qetil bike. Ev jî tiştek tirs û xofe. Gelo çima keçek bi aqil derneket û ev pirsgirêk çareser nekir? Ya rastî pê re tiştek nebû; ne şer, ne azadî, ne bedewbûn, ne azwerî û ne jî dildarî hebû. Zilam hêza paşverûtî ya mezin û kesayetek feodal bû. Kesayet, fêlbazî û kirêtiya wî ya dijmin kirî bijî, hinekê jî şêwaza bikaranîna PKK'ê serve kiriye. Zilam jî bikar aniye, gelek ji wan jî kuştiye. Ev şêwazek tirsnake, mixabin hûn ne di ferqa vê de ne. Ger van tevan vebêjim hûn ê ji xwe birevin, lewra naxwazim zêde vebêjim. Ji ber ku hêza we ya li ber xwe dayînê nîne.

Azadî, rêxistinbûn û milîtanî nediyardeyên hêsanin. Ger hemû rêgez, hêza rêxistinê, bîrdoziya wê û hêza Rêbertiya PKK'ê rast têbigihijin, dê ev hemû rastî pêk werin. Ji ber ku Zîlan ev fêm kir, ew derketina pêş jiyan kir. Berxwedaniya wê, li hember Komara Tirk zêdetir li hember hundur bû. Ger weke çavdêrek baldar ew name bên xwendin, wê bê dîtin ku ji sedî dehê vê berxwedaniyê li dijî emperyalîzmê û Komara Tirke, ji sedî notê wê jî li dijî paşverûtiya hundur a jiyana paşketî, bê çalekî, bê bîrdozî, bê

rêxistinî û bê polîtîka ye. Ev pir zelale. Bes ji ber ku hêza we ya têgihiştin û hîskirinê tineye, hûn nikarin vê têbigihijin. Pirsgirêk wisa ye: Gelo dê ji nava we şervanên azadiyê derbikevin? Qinyata min bi vê nîne. Ji ber ku ji nava we kesek çavsor û gotinek rast bêje dernakeve. Yek ji we li hember şaşiyan deng dernaxe. Hûn nikarin bêjin; "tu derewan dikî, li vir dijminatiyê pêş dixe, keviran dihejîne, tu pergalê xirab dikî, raweste!" Hemû dengên bilind dibin li ser bingeha xirabkirinê ne. Lê şoreşgerî beriya her tiştî **parastina cewherî** ye. Nûbûna şoreşgeriyê heye. Şoreşger kesayetek, her rêgeza şoreşê pêk tîne û li gorî pêdiviyên wê dijî, bi çalekiyê û rika xwe ya mezin ve dizane paşverûtiyê bişkîne, bi israr yekbûna rêgez, sekin û pratîka **Mazlum**'an, **Kemal**'an, **Xeyrî**'yan, **Egid**'an ava dike û devjê bernade. Ya rastî hûn îxanetê li van jî dikin û qet nêzî fêmkirinê nabin. Her çendî hûn pir behsa van bikin jî, di kesayeta we tevan de dûrbûnek ji van heye. Di demên dawî de ev pir tê dîtin. Hûn ber bi taktîkên Zekî ve baz didin. Mînak bi we re feraseta Zekî ya "mafê we yê jiyanê heye, bijîn" serwere. Hîleyê pir baş dibînim. Mînak ji kesek herî xeter, erzan nêz dibe jin û zarokên ku qet eleqeya wan bi dijmin re nîne dikuje. Jiyanek erzan tê ferzkirin. Ji keçê re dibêje; "tu bi vî fermandarî re bijî", ji fermandar re jî dibêje; "vê keça ku te di xewnên xwe de jî ne dîtî bigire û bijî." Ev jî eleqeya we geş dike.

Rêgez û pratîka şoreşgerî di vê xalê de ber bi îxanetê ve çû, mixabin hûn ne di ferqa vê jî de ne. Paşê jî zilam we tevan weke nexweşan avêt ser çavên me. Lewma Komara Tirk dibêje; "wê kom bi kom werin." Ji ber ku zagonên Komara Tirk bi gumanin û tevdîrên ku min girtine ev wisa çênabe. Wê ji vir şûnde taktîkên min hinek din giran û bi bandor bin. Şûna bişînim mirinek wisa erzan, an jî di bin navê şoreşgerî de şûna wisa erzan bidim hejandin, betalkirina hebûna we dibe ku rewşa heyî pak bike. Dibe ku ev çareseriyek baştir be. Ger hûn nebin şoreşger, betalkirina we li gorî min dibe ku çareseriyek be. Divê ez di vê mijarê de çareyekê bibînim. Qetiyen naxwazim vale bijîm. Hûn weke koma kavilên ku Komara Tirk û Zekî hesaban li ser we dikine. Di encamê de ev

wisa derxistina holê, dibe ku rastiya em xwe diwestînin watedar bike. Di pergala rapora Rêbertiyê de, rapora min wisa pêş dikeve.

Di PKK'ê de hinek mirovên hêja hene. Jixwe di vê wateyê de PKK'ê înkar nakim. Di PKK'ê de gotin bi gotin kesên ku ji min zêdetir girêdayî hene û jixwe ez jî ji bo wan dijîm. Ew hene û weke wan jiyîn girînge. Gelo niha hûn dikarin hinekê dest bidin xwe? Gelo hûn ne bi şêweya "cihê min, fermandariya min", dikarin bêjin; "sondên min, gotinên min?" Dibe ku hûn hesabê partî û artêşê nekin, heta dikarin bêjin eşkiyane –ya rastî ti aliyek me bişibe eşkiya jî nîne- bes kesek ji rêzê jî, gelo dikare weke kesek ku dixwaze hinek tiştan bike me fêm bike û dixwaze bimeşe? Ya misoger ez bi rêxistinkirinê ve dixwazim bijîm. Her tiştê min avakirina armanc û bi rêxistinê re kar dana meşandine. Fêmkirina vê jî bi zorê yan jî pereyan çênabe. Tiştên ez dikim bi teşfîk û xelatan ve jî çênabe. Nexasim bi wê jiyana ku hûn hêjayî xwe dibînin ve qet çênabe. Rewşa min wisa ye. Ji bo hûn tengav nebin û nekevin rewşên xirab hewldana fêmkirinê kûr bikin.

Dayîk li gorî zarokê hêj deh salî pir bihêze; nexasim ger weke dayîka min şerker, rikdar û kesek ji zilam re jî serî netewandî be ev pir watedare. Dayîka min digot; "Kes nikare bi te re mijûl bibe, nikare te." Elbet ne di wateya xirab de, lê dîsa jî min ew diteqand, lê ne di wateya xirab de. Wê demê jî min karên mezin dikir. Dawiya min weke wê digot bû, kesî nekarî min. Hemû karmendên Komara Tirk jî ev gotin kiribûn. Ez nedahûrandim, fêm nekirin û nekarîn min li gorî xwe pêş bixin. Mixabin hûn weke zarokan bixapînin, hewl didin min bixapînin. Rastiya min cewaze. Dijmin ti carî nêz nebû ku bi min re lihev bike. Mixabin wer dizanin ku hûn ê çipeçip ber bi wan ve bazdin. Gelo kî ev ji we re got? Ya rastî ez dixwazim vê rastiyê çareser bikim. Tişta hûn nûnertiya wê dikin, yeqîn dikim hemû gemartiya cîhanêye, yan jî bênaverokiya ferdperestiyê ye û xwe sipartina encama herî kirête. Tişta herî zêde bi we re tê dîtin ferdperestiye, ji ber ev nîqaşên we tev vê didin destnîşankirin. Hûn hemû jî di asta bêhempa de ferdperestin. Dibe ku hûn bi vê ferdperestiyê ve, di wateya kapîtalîst de hinek tiştan bidest bixin. Bes gelo niha we bi vê ferdperestiyê çi bidest xistiye?

Di ferdperestiya we de hêz tineye, feyde tineye, kapîtal tineye, ger hebê ferdperestiya bêhêzî, xirabûn, îxanet û revê heye.

Niha hûn hewl didin rehetiya ku we li malê, li cem bav û hevserên xwe nedîtiye, li cem min bibînin. Ev pir bi nakoke. Ma kî vê ji we re dibêje? Wisa yeqîn dikim, her kes bi tinebûna kesayeta Kurd ve serê xwe girtiye û hatiye. PKK bûye rêxistinek kombûna kesên têkçûyîn û xwe tiştekê dihesibînin. Di nava wê de bi qasî kesayetên di nava civakê de kar nedîtine û nekarîne tiştekê bînin ba hev hene, ewqas jî kesayetên durist, tîpên weke firîşteyan, sernerm û mazlûm jî hene. Elbet ev pir ecêbe, ev pêkhatiyek tevlîhev û pêşketinek ecêbe.

Hûn behsa konferans û biryarê dikin. Bes hûn ê çiqasî cidî bin? Ya rastî dixwazim gelek tiştên cur be cur bikim. Lê hêza we ya karên baş pêkanînê nîne. Hûn ê avê derbas bikin, an jî biçin qadên peywirên xwe lê hûn ê bi ser nexin. Meşek we ya saxlem tineye. Hûn tenê dikarin çawa hatine kuştin, çawa bi we dilîzin û çawa digirîn bidin diyarkirin. Mixabin dema hûn firsendê jî dibînin xwe dijîn. Karê şoreşgerî, lêhûrbûnek hûrûkûr û karek mezin a artîstiyê ye. Lê hûn van tevan tavêjin aliyekê. Nexasim ên li çiyan –dem bi dem taybet li ser pratîka wan dihizirim- pêşî dev ji rêgezan, hemû esasên pratîka şoreşgerî berdane û di bin navê azadiyê de xerîzeyên xwe yên paşketî gur kirine. Ji bilî xwe her tişt binpê kirine, ji bo wan fikrên wehşî û xerîzeyên herî paşverû serdest bikin durûtî û fêlbaziyek dijwar pêş xistine. Yek-du çalekiyên sexte jî bi serê wê ve kirine û rêxistinê ji bo vê jî diçewsînin. Di nava vî karî de girî, nalîn, entrîka, xirabûn û bi kurtasî her tişt heye. Bes yek kesê ku bêje; “Pratîkek li gorî rêgez wisa dibe” jî nîne. Kurdê tine bûyî, ya rastî Kurdê ku dijmin weke wehşiyan hiştî bi şêweyek vekirî wisa xwe li ser min ferz dike. Hûn jî weke Zekî tenê dikarin bêjin; “Ez nikarim tiştekê bikim, tenê dikarin bigirîm û erzan bijîm, dema firsendê dibînim jî vê dikim.” Jixwe tişta hûn her tim dikin jî wisa ye. Yên li Ewrûpa jî wisa ne, Ewrûpa şeweyek cuda ya weke li vire.

Rica dikim hîn ez sax, van rewşan talok bikin. Ji ber ku zehmete hûn van bi min bidin bawerkirin û jixwe rewşa min jî ji

van re ne guncave. Hemû plansaziya jiyana xwe, heta plansaziya şerê xwe talokî piştî min bikin. Heta ez hebim, ez ê seknek henase bi henase raber bikim. Hûn nikarin xwe bidin axaftin, ji ber ku hêza we têra vê nake. Jixwe tevdîrên min hene. Ez kesek wisa me hinek karan bi şêwaza serê derziyê vedikim, derdixim û wisa kar dikime. Hûn ê çawa ji destê min xwe xilas bikin? Gelo dê kesên xwedî van helwestan ji destê min xilas bibin? Heta hûn dibînin niha Komara Tirk jî çawa tengav bûye. Hûn ê bêjin; "Em zarokên bavê xwe yên başin, tu bavî, bav jî ji zarokên xwe pir hez dike yan jî tu xweda yî, xweda jî merhametê dide evdê xwe." Na, zilamek wisa me, min ev hemû jî binpê kirine. Ez mirovek wisa me, hesab ji hemû bavan, reîsan, hevjîn, hevseran dixwazim, hemû jî binpê kirine. Hûn ê xwe bispêrin ku derê? Rastî wisa ye. Qaşo Rêbertiya hûn bi navê wê tevdigerin, kesê berpirsyar, ma min ji we re name nivîsand û got werin cem min? Min her tim banga xwe kir. Ji ber ku hûn jî di valehiyê de bûn, an jî li gorî bangê hatin cem me. Min kes bi zorê ne anî vir.

Hûn ê xwe ji min jî baştir perwerde bikin. Ji ber ku min karê fêrbûnê temam kir. Ev kar ji bo min hatiye dahûrandin. Ji bilî vê rêyek din nîne. Hûn ê ji min zêdetir di xeta rêxistinê de bimînin. Na, ger hûn dibêjin hûn ê zêdetir bikar bînin û bixapînin, jixwe ew jî ne gengaze. Ger hûn dibêjin; "Nexwe ez ê jî weke Zekî birevim", vêca em ê hesab ji hev bixwazin. Komara Tirk vê sibehê dahûrand û çend navên din da. Wê we tevan baş dahûrînin û hûn xistine rêzê. Dibêje; "Dê filankes di filan dîrokê de bê, kesê din jî di filan dîrokê de." Ev tenê plansaziya wî ye, ez nabêjim dê wisa be. Lê ji bo xefleta we hinek din ji we re rave bikim dibêjim. Plansaziyên dijminê we di derbarê we de wisa ne, hûn di nava van plansaziyan tevan de ne. Ger hûn ne di ferqa plansaziyên dijmin de bin, vêca milîtaniya we li kure?

Ez nikarim ji ber vê we bixim dewsa jin û mêrtiyê. Ma keçînî û xortbûna kesên ku di bin piyonê dijmin de dimînin? Kesek piyon an jî koleyê dijmin, nikare heqê hezkirin û hatina hezkirinê bidest bixe. Yê dest bixe dê weke sîxur be, jixwe wisa jî bû. Hûn nikarin quralên min ên jiyanê binpê bikin. Hûn dibêjin; "Me

dixwest hez bikin, bila jina me, mêrê me, keça me, hevserê me hebe." Min ev binpê kirin. Rastî wisa ye. Min lêkolîn û fêm bikin. Fêr bibin û li gorî vê têbikoşin. Bêjin; "Me biryar da" yan jî "Em ê ji cem vî zilamî birevin." Lê belê vê bi şêweyek xeternak nekin. Kar cidî ne. Ger fermandarê bi navûdeng wisa li we tevan dike, dê leşkerên ji rêzê yên vî fermandarî çawa bin? Hûn ê niha bêjin; "Em ne wisa ne." Ger hûn ne wisa ne, nexwe xwe biselmînin. Egîdî bi gotin, girî yan jî mirinê ve nabe.

Em dixwazin jiyanê bi çend derfetên xweşik û şanaz ve danin pêşiya we. Her tişt ji bo vê ye. Bes nabe mafê jiyanek ku dijmin ji me dixwaze bê xwestin. Dijmin dijmine. Dijmin hêj navê me napejirîne. Parçeyek ax nade me. Yek ji tiştên ku gelên cîhanê weke maf bi dest xistiye, ji bo me di asta peyv de jî naxwaze bêje. Rewş wisa ye. Ev rastî bi xwe ye. Bê ku hûn vê biqetînin û derbas bikin –ev di axaftinê de jî nabe-, hûn partî dikujin û piştre jî dibêjin; "Em li dijmin didin." Hûn dibêjin; "Ez şer dikim, dixwazim şer bikim; ev kar zehmetin, me nedizaniya rastiya Rêbertiyê wisa ye." Ez ê çi bikim, rastiya şer wisa ye. Egîdî nehêsane, hêj ez jî xwe egîd nabînim. Lê hewl didim tevgerek bi îdîa pêş bixim. Ev pir zehmete. Bes hêjî derfetek min heye û hewl didim wê binirxînim.

Ger hûn şerm nekin dê ji çaran sê ji we bêje ku; "Ez di vî karî de cîh nagirim." Qaşo konferansa biryarê pêş dixe, hûn dixwazin pêncî biryaran bigirin. Hûn li kur û biryar girtin li kur ma? Mirov li şêwaza we dinêre, dihizire ku li gorî evqas biryar digirin bi têkoşînê yeqîn dikin. Hûn duristin jî. Bes ger hinek din rastiyan bêjim, dê ji çaran sê ji we jî di vî derî re derbikeve bêje; "Ez di vî karî de cîh nagirim." Tewanbarê vê rewşê jî hûn bi xwe ne. Ji ber we sal xirab derbas kirin. Ez di vê çepera ku ti derfet lê neyî de hejde salin nirxan ava dikim. Hêjî xwe weke kesek baş serketî nabînim. Bihizirin, tiştên ku min di hejde salan de kirîn nekêmin. Bi tena xwe di vî çeperî de ne tenê karek, min bi tona kar kir, lê dîsa jî têr nabim. Mixabin we sal berhewa kirin. Ji ber vê cihek ku hûn biçinê jî nîne.

Ev nirxandin hemû ne ji bo xirabkirina moralê we û ji we re biselmînim ku tiştek tineye tên kirin. Em ê tevî vê cardin milîtantiyê bidomînin. Lê dîsa jî rastiyê şanî we bikim. Gelo hûn ê çi ji kesayeta ku dijmin pala xwe didiyê bikin? Hem hûn ê bêjin em şoreşgerin, hem jî dê dijmin evqasî pala xwe bide we tiştek pir xirabe. Qaşo hûn zilamin, şerkerin, fermandarin; mixabin dijmin jî pala xwe daye we. Van biqetînin û biselmînin ku rastî ne wisa ye. Yên herî baş erzan dimirin. We xwe ji vê re amade kiriye û salên xwe vale derbas kirine. Hêjî hûn xwe dispêrin min û xwe dixapînin. Her tim "navdarên" weke Zekî sextekar derdikevin, we tevan erzan dibin cem dijmin, bes hûn nakevin ferqa vê jî. Ma li van herêman yek ji nava we derketa û gotiba; "Weke me bi te re lihev kirî jiyan kir" dê miriba? Çima yek kes ji we wisa naxivî? Ji ber ku hûn her tim li xwe fikirin. Le belê ez jî li vir we difikirim. Li holê ye ku kî xwediyê sonda xwe ye. Dema hûn tev ferdperestî û ezezîtiyê dikin, ez parastina rêxistinê dikim.

Bila nexasim hevalên durist û ciwan bi van mezinan û şêwazên fermandeyên sexte neyên xapandin. Bes ciwan jî zêde ne bi îdîa ne. Lê ger hûn zêde li ser min nîqaş bikin, dibe ku hinekê fêm bikin. Elbet em ti caran mirina we ya erzan napejirînin. Serkeftin ne bê derfete. Mixabin tişta niha hûn dikarin bikin, mirina hêsan û selmandina serkeftinê nepêkane. Ev ne erka we ye, karê dijmine. Gelo hûn ê ji vir şûnde bikarin hinekê bihizirin? Gelo hûn ê ji vir û şûnde bikarin vê şana xwe rast binirxînin? Bi rastî jî baweriya we bi nirxên weke Azadî û Rizgarî tê? Gelo hinek rêgezên we yên netewî û çînayetî yên cuda hene? Gelo hûn ê bikarin li gorî wan bijîn? Gelo hûn di vê mijarê de durist û bi pîvanin?

Dema em cîhana hinek hevalan a biçûk bi serê wan de tînin xwarê, ne li gor dilê wane û moralê wan pir xirab dibe. Ma ez çi bikim ev cîhan li gor wane? Dijmin ev cîhan li gorî me çênekiriye. Dijmin ji bo we vê cîhanê tîne rewşek neyê jiyîn. Hûn jî li hember vê tenê weke zarokan digirîn. Ez jî dema deh salî digiriyam. Dibe ku wê demê zêde wateyek vê hebe. Dema deh salî bûm min zêde tiştek nedixwest. Tişta min dixwest ne deh

quruş pere jî bû, tenê parçeyek nanê gerim bû, min ji malbatê tiştek din nedixwest. Niha jî me gelek tişt da we, heta me her cure çek kir destê we; lê hêjî hûn nizanin çi dixwazin. Hûn pîvanan zêde derbas dikin. Bi tiştekê têr nabin û nizanin bixwin jî. Ev nexweşiyeke. Cîhan ti carî ne li gorî çînên navber û burjuvaziya biçûke. Cîhan her tim an li gorî daxwazên çînek serdeste, yan jî li gorî yên li dijî wê şer dike. Cîhanek li gorî yên di navbera van herduyan de dimîne nabe. Rewşa we jî yên weke **xeta navîn** an jî kesayeta çîna navberê xirabtir di navberê de –marjînal- maye. Hûn di vir de hatine çikandin. Bes cîhan li gorî we nabe. Bi rastî jî felsefeyek we pir biêş heye. Du rêyên vê hene; yan hûn ê çar bi çar weke yên xwe li gorî dijmin amade dikin bin, an jî hûn ê weke min bin. Çareyek vê ya din nîne. Pirsgirêk tev wisa ye, hûn ê çawa dev ji vê navberê berdin. Ev **cihê navberê**, cihê Kurde. Cihê navberê, cihê kesên reben, betal û bêhêz an jî bi her tiştî razî bûye. Ev cîh hilberînê çênake, li vir tiştek nayê pêşxistin.

Ez bi kesayetên çîna navîn ên sehimkar re şer dikim. Min bi du peyvan dest bi vî karî kir. Wê lez û şêwazî ez anîm heta vir. Rastî wisa ye. Bila kes xwe di vê mijarê de nexapîne. Zanebûna we bêhempa ye, mixabin hûn nikarin yekbûna bi pratîkê re pêk bînin. Hûn pir zêde dev ji xwe diberdin. Girêdayî asta zanebûna we, ger hûn bêjin; “Ez ê afirîner bim û bi dîtinê ve li gorî rêgezên xwe bijîm” û salên xwe rast bijîn, hûn ê destanan ava bikin. Pir ecêb dimînim hûn çima di navbera rêgez û pratîkê de evqasî qutbûnê dijîn. We çawa ev pejirand? Ev bi salane hûn dibêjin; “Ez nizanim, ez fêm nakim.” Ger li tiştên we kiriye binêrin çiqas li gorî rêxistinê, li gorî çiyan, li gorî taktîk û li gorî şerin, hûn ê fêm bikin.

Fermandar kiye? Fermandaran di kesayetan de nebînin. Vaye fermandarê herî mezin ez im. Ma fermandarek ji me zêdetir karbidest û bi bandor heye? Ez ji yek-du fermandaran dipirsim, hûn çima evqasî serî ditewînin, dibêjin; “Keyfa me tê.” Nexwe tişta ku bi keyfa we ye, mirine. Bi hezaran, deh hezaran şehadet û derfetên serkeftinê yên ne di cîh de hatin pêşkêşkirin. Ez xizmeta we dikim. Bes ger hûn vê kesayeta xwe ya bê ruh û keyfî terk

nekin, ez ê we bêxêr îlan bikim. Ev jî biryareke. Gava xwe li gorî vê bavêjin. Zêde çareya we tineye, hêza dijmin a we bide jiyîn jî tineye. Ferasetek we ya azadiya xeyalî û di artêşbûnê de jî meşek we tije şaşî heye. Van derbas bikin.

Heq çiye? **Heq**, li gorî rêgezên rêxistinê pêşxistina civîn, ferman, rapor, plansazî û taktîkin. Heqê we yê pêşî sepandina vane û bi kesên van xirab dikin re mijûlbûne. Mixabin hûn van heqên xwe bikar nayînin. Peywir heqe. Dema te peywira xwe pêk anî tu bidest dixî, dema te bidest xist jî, tu bihêz dibî. Dema tu bihêz bûyî jî, wê tu welatê xwe û azadiya xwe jî bidest bixî, heta tu birçî jî namînî. Heqê xwarin û vexwarinê jî wisa ye. Bes dema we peywirên xwe bicîh anîn ev dibin.

Ez dixwazim her tiştê ku hatiye berovajîkirin rast bikim. Hinek kesên ku hişk bûne bi israr bêxêriyên xwe ferz dikin. Li gorî min an hûn van xalan pir balkêş fêm dikin, an jî newêrin fêm bikin. Hûn di navbera fêmkirin û pêkanê de biryara rast nadin. Nexwe fêmkirin kar pir hêsan kiriye. Tewana nefêmkirina we, hûn in.

Ya rastî dixwazim tiştên hîn girîngtir vebêjim. Bes rastiyên we min tengav dike. Niha em ê li dijî dijminê xwe pêngavekê pêş bixin. Di vê mijarê de bi me re paşketin çênabe. Lê divê hûn ji vir û şûn de tevlîbûna xwe ya ji vê re bilindtir bikin. Hûn ê vî siûdî xirab bikar bînin û bêjin; “Çawa dibe rewş başe”, li ser jî bijîn. Dê hinek jî li ser pişta me razin. Di rastiya gelek kesên ku di nava PKK’ê de dijîn ev tê dîtin. Ger niyetek we ya revê hebe, vê niha bikin. Em dikarin kesên direvin bigirin, bes feraseta van a jiyanê reve. Hişê xwe bînin serê xwe. Ev siyasete, ziraviyên siyasetê jî hene. Şer wisa nemeşînin, ji ber ku ziraviyên şer jî hene. Hûn her tim behsa “Rêveberî û Fermandarî” dikin, şertên vê jî yên nebe nabê hene. Van tevan esas bigirin û ji vê konferasê derbikevin beşdarî vê pêvajoyê bibin. Em di vê mijarê de zorê nakin. Ger ji nava we kesên ku dixwazin kar bikin hebin, em ê wan li aliyekê, di karekî de bidin karkirin. Wê di xebata hilberînê de cihê xwe bibîne, qet nebe nareve û nabe xayîn.

Em wisa bi çavsorî çûna şer û mirinê napejirînin. Pêwîste di xeta PKK'ê de **şêwaza Egîd** bê fêmkirin. Egîd her tim wisa bû. Pirsgirêk ne ewe jî, bi hezaran şervanên PKK'ê yên wisa hene. Jixwe PKK bi xwe, rastiyek wisa ye. PKK bi xwe, bîrdozî ye. Gerîlayên PKK'ê, gerîlayên bîrdozî ne. Di nava PKK'ê de gerîlayên ji bîrdozî qut bûyî nabe. Gerîlayên PKK'ê, ji serî heta dawî bîrdozî, polîtîk û rêxistinî ne. Belê, vaye we ev Zekî'yê qaşo fermandar jî dît. Niha ew zilam bi dijmin re kar dike. Zekî, bîrdozî, polîtîka, quralên rêxistinê û jiyana milîtaniya rast înkar kir. Belê ev jî, rastiya dijmine. Ev jî ji bo we rehet bû. Di şer de rehetî tineye, dema tu rehet bî wê tu bin bikevî û bibî amûrê dijmin, her wiha wê tu vê jî ferq nekî. Hûn dibêjin; "Hinek wisa bi me didin kirin." Hûn milîtanê PKK'ê ne, bi bîrdozî ne, rêxistinî ne, bi quralin û bi rêgezin. Kes nikare vê bi we bide kirin. Ez jî nikarim wisa bidim kirin, ji ber ez jî yek ji gerîlayên PKK'ê me. Neferek wê artêşê me. Ma ji bilî kontra kî li ser vê dimîne? Ew jî dijminê me ne.

Encam ewqas vekiriye û ti aliyê vê yê neyê fêmkirin nîne. Hûn jiyana xwe feda dikin; li hember serma, germa û karesatan li ber xwe didin, fedekarin. Hûn ê vê veguherînin milîtantiyek PKK'ê ya rasteqînî. Hûn dibêjin; "Karê me zehmete." Ger karê we zehmete, pêşî wî şerî bimeşînin. Wî şerî bimeşînin, da ku siûda we ya şerê din jî çêbe. Ger ev nebe, ez ê dev ji we berdim. Ez nikarim bibim berpirsê şervantiya ku hûn hêjayî xwe dibînin. Ji ber ku di dawiya vê şêwaza şer de mirin heye û mirin jî min tengav dike. Ma ez ê çima her roj li ser mirinên we moralê xwe xirab bikim? Ez milîtanek wisa me, her tim hewl didim moralê xwe baş bigirim. Dev ji dayîna windahiyekê berdin, naxwazim qusurek peyvekê jî bikim. Ji ber ku ez şerker im. Kesên şerker, dema gotinekê jî dikin, qusurê nakin. Mixabin ti cihê we yê ne qetiyayî û şaşî neke nemaye. Vêca de werin fermandariya vê bikin!

## Me Li Ser Van Axan Biharên Hêjayî Mirovê Azad Ava Kirin

Me biharek ter û teze da we. Weke hûn dizanin ev kar ne hêsanin. Li qadan milyonan kes navê we naqîrin. Lê navê min çima diqîrin? Ji ber ku ew dizanin ez îxanetê li wan nakim û dizanin min biharek baş daye wan. Me biharek baş da we jî. Hûn çi dibêjin bêjin, tevî van xirabûnên we, me biharek nêzî azadiyê da we. Hemû biharên min dayîn wisa bûn. 25 Bihar tev jî rengbireng bûn, hemû jî tije hêvî bûn, hemû jî bi rastî biharên ku ji vî gelî re bê dayîn û li ser van axan hêjayî mirovê azad bûn.

Vêca hevalên me ji Zagrosan heta Munzuran, ji wir jî heta Torosan ku biharên herî xweş lê tên jiyîn, çi ji min re şandin? Bihar zivirandine zivistanê; bihara ku dişewitîne –jixwe ev jî ne bihar zivistane- dişînin. Kesayetên we ne yê biharê ne, **kesayetên zivistana** hişkin. Em ê kesayeta biharê bidin we tevan û mizginiya hatina biharê bidin, hûn ê jî kesayeta zivistanê ferz bikin. Ma di vir de tiştek bê pejirandin heye? Çima yek ji yên li wan çiyan biharekê naşîne ji min re? Ji ber ku ne egîdin, ji ber ku her kes nabe egîd. Mirovek egîd şehîd jî bikeve, pêwîste li pey xwe ne zivistan, biharekê bihêle. Rastî wisa ye. Min her tim, her roj weke rojên biharê anîn. Lê ji bîr nekin, peywirên we jî yên wisa hene. Cihên herî xweşik ên bihar lê bên jiyîn zivirandina zivistana hişk, bi yek gotinê kirêtî ye û parastina vê jî nabe. Ma wê çima biharek xweşik a her yeke ji we nebe? Ev gengaze. Sedemên vê asteng dike ji holê rakin. Dijmin vir jî dorpêç dike û her roj dixwaze êrîşî me bike. Lê tevdîrên me jî hene. Tevdîrên min jî, karên ku bi salane dikime. Ne gengaze ku dijmin bê vir veguherîne zivistanê. Nikare vir veguherîne zivistanê, ji ber ku ez kesek li hember partiyê berpirsyarim. Ev ji bo we tevan derbasdare. Tenê ez biharê tînim; mixabin hûn jî her tim zivistanan û sir û seqema hişk tînin.

Bihar anîn tiştek xweşike. Gelo hûn çima ji vê ditirsin û jê direvin? Hûn çima dev ji rengîniyê diberdin û kirasê cinezayan li ber xwe dikin? Şûna mirov gerim be, hûn çima seqema hişkin? Çi

feydeya vê ji we re heye? Şûna serkeftinbûnê, hûn çima bi şaşiyek biçûk ve dimirin? Ez bi vî halê xwe ve hêjî dikarim bihar li ser biharan bînim. Hûn di temenê herî ciwan de ne, em çekên PKK'ê yên bihêz jî dixin destê we û bi dilê xwe û bi qasî dikarin bikin. Kes ji we re nabêje xwe feda bike. Ji bo azadiyê gava herî aqilmend û di cîh de kîjane wê bavêje. Şêwaza herî rast û hûn ê bikarin ser bixin çawa ye, hûn bi xwe wê bibînin. Di vê mijarê de ferzkirinek nîne. Şûna mirinek dijmin a kirêt, ji bo jiyanek xweşik çi hewce ye wê bikin. Evqas ji min tê, weke din hûn temam bikin. Ev ne ferzkirineke; hinek din ferz dikin, dijmin ferz dike. Em we nêzî azadiyê dikin. Aqilmend bin, bi plan û xwedî tevdîr bin. Pir bihizirin, paşê jî gav bavêjin. Ev tişt tên fêmkirin. Ger ên din jî we bi zorê didin şerkirin vê nepejirînin. Kesên we bi zorê didin şerkirin re bêjin; "Rêberê me yan jî serfermandarê me wisa dibêje." Ji van netirsin. Ger we biçewsînin ez heme. Em ji dijmin natirsin. Ma em ê çima ji rezîlê nava xwe bitirsin?

Hûn milîtanê PKK'ê ne. Milîtanên PKK'ê natirsin. Milîtanên PKK'ê navê xwe li cîhanê belav kirine, natirsin, xwedî ferasetin û jêhatî ne. Zilamê ku vê xirab dike û kesayetên ku zilamê xirab dike xirab kirîn jî li holê ne. Lê em jî li holê ne. Tişta pêwîste hûn bikin, bi duristbûn em esas girtin, heta dawî bi ramanê xwe bawerkirin, heta dawî bûna xwediyê hêza têkbirinê û heta dawî gavên serkeftinê pêşxistine. Em wisa ne, ger hûn jî wisa bin, ez bi we re me. Ger hûn ne wisa ne, hûn ne li naverastê ne, bi dijmin re ne. Vaye mînaka vê jî derket holê. Ez salan bi tena xwe jî we re kar bikim, ji yek we aciz nabim. Lê belê rastî jî evqasî vekirîne. Hûn jî dikarin di radeyek girîng de vê fêm bikin.

Me partîbûn, artêşbûn, jiyan, xweşikbûn, azwerî, evîn, ango rastiya her tiştî pir balkêş danî holê; me bihar jî danî holê. Ma hûn ê çima bi van bilîzin, hûn ê çima xwe veguherînin dojehê? Di şerkertiya PKK'ê de xalên pir zirav hene; xalên **Mazlum**'an û **Egîd**'an hene. Hûn ê van tevan yek bikin. Vê li vir bihizirin û biryara vê bidin. Dê kesek bi zorê tiştekê li ser we ferz neke. Hûn ê van ferz bikin. Ev fermandarên navdar li kurin bibînin û bi guhê wan re bigirin bêjin; "Ez ê vê rastiyê bixim çavên te de, ev jî

fermana hevale.” Ew min nas dikin. Yek ji wan nikare li dijî we derbikevin. Bes bizanin durist girêdayî bin. Ger hûn wisa di navberan de nelîzin, li vê cîhanê ti zilamê ku bikare li hember me li ber xwe bide tine ye. Qet ne gengaze ku kes bi min bilîze. Ev sonda mine û min ev sonda xwe jî pêk anî. We ji dijmin re rê vekir ku, ew jî wisa min hêsan binirxîne. Nexwe min ji mêj ve dijmin qedandibû û eyar kiribû. Di nava PKK’ê de sedema pirsgirêkan ya girîng, ne pêkanîna we ya vî şêwazî ye û we qet nekarî hûn hêza meşa bi me re raber bikin. Ev jî hûn helikandin. Ez van ne ji bo xwe, ji bo vî halê we yê bi êş dibêjim. Ji ber di encamê de hûn pir xirab dimirin. Ji ber ku ew mirinên we ne xwezayî ne. Em ti carî mirina wisa napejirînin. Ger hûn ê wisa bimirin, tevlî vî şerî nebin. Ger hûn ê tevlî bibin, pêwîste hûn bizanin divê hûn weke volkanekê biteqin. Kî we asteng dike, bi ser de biçin. Na ger astengî hûn bi xwe ne, pêşî xwe sererast bikin.

Ev hemû esasên PKK’ê ne. Esasa PKK’ê ya leşkerî jî wisa ye. Ger we ev xal girt, bêjin; “Em temamin, her demî, li her cihî jêr heta jor em ji her peywirî re amade ne û em ê van peywiran ser bixin.” Nexwe hûn weke din nikarin PKK’ê û şerkertiya PKK’ê ji me re şîrove bikin û bikin biryar. Rastiya PKK’ê wisa ye. Ger hûn bi vê bilîzin, hûn ê bikevin rewşek pir xirab, dê jiyana we hişk bibe, ji hezkirin û rêzgirtinê mehrûm bimînin. Ji ber ez rastiya xwe binpê nakim. Sonda min sonde, biryara min biryare û hewldanên min bêhempa ne. Bi navê şer û bi navê evînê çi hewce dike heta dawî wê dikim. Jixwe li holê ye ku vê jî pir xweşik dikim.

Bi min re bûyîn, bi wisa parkirina nirxan ve dibe. Misoger heta dawî li ser vî bingehî bi we re me. Misoger ez yê hemû keçame. Vêca hûn ê çima bi qereçiyekê re birevin? Misoger me ji bo we kesayetên serkeftinê mêrxasan jî çi hewce kiriye daye. Nebin amûrê dek û dolaban. Ev rastiya hemû şehîdên PKK’ê û bûne milîtanên PKK’ê ye. Heta ev rastiya we ye jî. Hewce bike heta ku hûn encam digirin nîqaş bikin; lê bi qasî hûn ê pêk bînin û di pêkanê de jî serkeftinê bidest bixin xwe bi biryar bikin. Hûn têra erk girtin û fermandarbûnê dikin. Dema hewce kir -jixwe bi rastî jî di nava me de sosyalîzm serwere- kesê bi keda xwe herî serkeftî

kiye, dê ew li ser karan bisekine. Ger ev hemû rast bin, nexwe dawiya vê jî serkeftine.

Em rastiya vê konferansa xwe jî qet nebe di asta biryar de nêzî serkeftinê dikin. Bi qasî di mijara hemû dîroka me de, di mijarên partîbûn û artêşbûn, dîsa şêwaza jiyana YAJK'ê û xalên şerê taktîk ên bingehîn de jî hûn gihan biryardariyê. Vêca ev xayîn derketiye, xeta navîn derketiye. Xwe bi sond û ehdek nêzîkbûna milîtanî ku hûn wan ji cihê derketî bişînin dojehê bi biryar bikin. Ev hemû di rastiya Rêbertiyê de zelalin. Ya pey wê re meşa azadiyê ye, di meşa azadiyê de jî, meşa serkeftinê ye. Dibe ku li ser vî bingehî hinek şahadet jî bên jiyîn. Hema em bêjin ez jî ji vir derketim, ketim û dilê min sekinî; ev nayê wateya ez bin ketime. Her hevalek dikare ya mayî temam bike. Ev hem hatiye selmandin, hem jî wêrekiya PKK'ê ya mezin ev pêk aniye.

Hinek bi vê dilîzin, hinek ji ne dîtî ve tên, hinek jî li ser van hesabên xirab dikin. Jixwe hûn dibin zemînê wan jî. Bila ne ew derbikevin pêş, ne jî hûn hêz bidin wan. Dê li ser vî bingehî misoger meşa we hem di jiyanê de bibe meşa azadiyê, hem jî di şer de bibe meşa serkeftinê. Ev kirina malê xwe di vê cîhanê de tişta herî bi nirxe. Tenê ev siûd heye û tenê rêya rast jî ev e. Ji bilî vê, ti karek we ya din ku me mijûl bike nabe.

Ger em xwe sexte bikin, ti kes nirxek hêjayî pênc quruşan jî nade me. Jixwe, dijminê me jî me ti caran efû nake. Em ê dijminê xwe bin bixin. Em ê li ser bingeha wekhevî û azadiyê jiyana bi gelan re –ev gelê Tirkiyê jî dibe, gelên din jî dibe- esas bigirin. Ev rêgeza herî bingehîn a PKK'ê ye. Ji bilî vê, em ê şer carek din heta serkeftinê, jiyana azad a herî pîroz pêk were bimeşînin. Me li dijî jiyana paşverû ji mêj ve şer îlan kiriye. Jixwe fermana şehîdên PKK'ê jî ev in. Di vir de kêmbûn an jî zêdebûna hêza me ne diyarkere. Ya girîng, milîtantiya wê ya biryardare. Selmandina vê jî serkeftin û azameta meşên heta niha ne. Ger em xwe dijwar bi vê rastiyê ve girê bidin, dê pey re serkeftin bê û zafer bê.

# PIRSGIRÊKÊN PARTÎBÛNÊ Û PEYWIRÊN ME

**24 Adar 1998**

## YÊN DEWLEMENDIYA WAN A BÎRDOZÎ NEBE DEWLEMENDIYA WAN A PRATÎKÎ JÎ NABE

Yên dewlemendiya wan a bîrdozî nebe, dewlemendiya wan a pratîkî jî nabe. Yek ji pêdiviyên herî bingehîn a tevgera me ya qada çalekiya pratîkî, ev dewlemendî ye. Hesabên takekesî yên pir çors û dibin sedema pirsgirêkan ên nebesî, tengbûn, çînên cuda û heta di bin bandora rastiyên biyanî yên di asta bîrdozî de, fikrên parçe yên tevlîheviya pratîkî zêde dikin, weke pêşketinek bîrdozî nayên dîtin. Heta pêwîste ev bên derbaskirin. Xeta PKK'ê bi bîrdozî destpê kiriye û xetek bi wê pêş ketiye. Di destpêka wê de ya diyarker bîrdozî ye. Pratîk ancex li ser vî bingehî pêş ketiye û ger bi şêweyek pir baldar girêdayî birdozî pêş bikeve dê encam bigire. Lewra qutbûna di navbera çalekî û bîrdozî de weke yek ji pirsgirêkên me ya herî bingehîn berdewam dike. Rastiya kesayet ziwa, seresere û zêde şêwaz ava nake, misoger çavkaniya xwe ji bê bîrdozî, nebesî yan jî şaşiyê digire. Heta ev neyê derbaskirin, çalekiya qadro û fermandariya we ti wateyê rave nake.

Aliyê herî xirab jî, tevî ku bi qasî nan û avê pêdivî pê heye, ji bîrdoziyê **rev** bûye fêrbûnek. Ger em bîrdoziyê, encamên zanista şoreşên cîhanê afirînerî û serkeftî bi rastiya xwe re nekin yek, zehmete em di vî karî de serkeftinê bidest bixin. Bes ev kesayeta zemîna çînayetî rûxiyaye, heta ji çînayetî derketiye, di astek girîng de heliya ye, îdîaya xwe winda kiriye û di astek bêhempa de dijmin dijî, qabîliyeta xwe ya berxwedanî nemaye, ger hebe jî ji îsyanek çors derbas nake, zehmete ku xwe ji hêla bîrdozî ve kom bike. Ji ber ku zehmete jî, hewldanên me yên di refên me de ji xebatên dijmin zêdetir tengav dike. Asta paşverûtiya civakê weke heyî di nava partiyê de jî dana jiyîn, têkçûn û ji hêzketina civakê, nexasim rastiya ji rêxistinbûnê direve di nava partiyê de, hem jî bi derfetên partiyê li ser partî ferzkirin bûye fêrbûnek jêveneger. Hûn heyranê vê ne, yan jî evîndarê vê şêwazê ne. Vekirî dikarim bêjim ku, ev bi

awayek objektîf bi şêweyek pir xeter dijmn di nava partiyê de dana ferzkirine. Niha jî li hemberî me ev xeterî heye.

Dema em rika rastiya we ya çînayetî û civakî berçav digirin, her wiha weke ku di nava partiyê de mafek û fazîleteke, heta weke xisletek we ya başe hûn difikirin ku bi vê re dijîn û ser dixin, xeteriyê mezintir dike. Asta bê berpirsyarî pir mezin bûye. Fikra serkeftina di pratîkê de nemaye. Yekser ji her xirabûnê re bibê zemîn jî fikaran nake. Ya girîng di asta hest de jî berpirsyariya xetê jî tine ye. Firsendan dinirxîne, derketina pêş û diziya ku berê di nava civakê de erzan dikir, vêca di nava partiyê de dike û vê jî ji xwe re heq dibîne. Niha ev jî dibe encamek civakî ya pir xeternak ku di nava me de tê jiyîn. Pir hêsan ev kesayeta xwe li ser partiyê ferzkirin, dibe ku ji ber fêrbûnan xoşa we jî diçe. Mixabin ev xirabûna herî mezine, oportonîzma herî mezine û ji hizipkariyê jî wêdetir paşverûtiyek pir ecêbe. Hûn xwe naşidînin, bi bîrdozî nakin, bi xet nakin, elbet birêxistin nakin û wisa jî ya herî hêsan ji xwe re dibînin. Bi rastî jî ger niyeta we ya şoreşgeriyê hebe, navenda partiyê û rola xwe ya di vê navendê de derbixin zanebûnê û pêwîste hûn fêrbûnên xwe derbas bikin.

Ev kar bi van ferzkirinên we ve nabin. Kesayeta we ya di civakê de têk çûyî, di nava partiyê de pir xeternak dibe. Ev kesayeta we ne tenê rê ji têkçûn û windabûnan re vedike, kedê vale dirdixe. Ji ber agahiya we ji polîtîkayê nîne, nexasim bi temamî ji şêwaza serkeftinê dûrin, karesatê zûtir mezin dikin. Di vê wateyê de em jî ji vê kesayeta we ya paşketî re dibêjin, kesayeta kontra. Bes di wateya serwextbûnê de ev wê jî derbas dike. Ya rastî kontrayên bi zanebûn kar dikin, heta bi wan re hizipkarî tê dîtin û mirov dikare li hember wan tevdîr bigire. Mixabin ev şêwaza we ya şemîtok, kêr nayê, bê îdîa û ji her tiştî re vekirî zehmet dike ku pirsgirêk bên dîtin û di derbarê wan de tevdîr bên girtin. Lewra hûn tam dibin belaya serî. Hûn dibêjin; “Ez wisa me, evqas ji min tê, ger hûn bipejirînin wisa me.” Hûn di her tiştê ku dizanin de wisa ne. Mînak tevî ku derfeta serkeftinê ya herî hêsan heye, hûn li hember wê keyfî ne yan jî dema xeteriyek pir mezin hebe jî, hûn li hember wê jî keyfî nêz dibin. Lê ger hûn piçek berpirsyarî bigirin,

hûn ê mezin bidest bixin. Ger hûn piçekê şiyar nêz bibin, hûn ê bikarin îmhabûnê jî asteng bikin. Mixabin hûn di van mijaran de qet ne baldarin. Belê, rastiya we wisa ye. Hûn dibêjin; "Niyeta min başe, destê xwe dirêjî kar nekir, lê ne kesayetek bi pirsgirêkim. Min dikariya bidest bixim, lê hewce nedît. Min xeterî dît, lê ji ber niyeta baş min got ne erka mine û ji bin derketim." Di polîtîkayê de nêzîkbûnek bi qasî vê xeternak, nexasim di qada leşkerî û qada şer de ji vê texrîpkartir tine ye. Mixabin feraseta bi we re serwer wisa ye.

Mirov ji we ditirse. Bi vî şêwazî ne fermandariya xetê, hûn ê ji dijminek zanebûn zêdetir zerarê bidin. Yeqîn nakim yekî bi zanebûn wisa tevlîhev bike xirabtir zerarê bide. Bi kurtasî ev kesayeta we pir xetere; hûn çi dikin bikin, pêwîste vê kesayeta xwe derbas bikin. Kes vê kesayeta we di polîtîkayê de napejirîne. Jixwe bi vê kesayetê ne polîtîka, ne jî leşkertî nayê birêvebirin. Rewşek pir cidî ye û bala her kesî dikişîne. Bala gel jî dikişîne, di asta qadro de her kes dibêje ku ev ne PKK'yîtî ye û her kes li PKK'ya rasteqîn digere. Hûn hemû jî vê dizanin. PKK'ya ku her kes lê digere hûn wisa berovajî dibêjin; "Ez PKK me" ferz dikin û ev jî rê ji gengeşeyek mezin re vedike. Berê ev nêzîkbûnên we ne dihatin dîtin. Lê niha derdikevin holê û ji ber ku tevger mezin dibe, sînorên tehemûlê jî tengav dike.

Kes ne neçare ku we bi vî halê we ve biecibîne. Gel rêberê cidî dixwaze. Hêzên nav-netewî rêberên cidî û bê qusur dixwazin. Elbet her kesî xwe pêş xistiye. Mijara Rêbertiyê jî wisa ye, Rêbertî jî xwe pêş xistiye. Lê hûn, bi salane weke zarokan di cihê xwe de dijmêrin. Min gelek caran ev şîrove kir. Hinekan ev tam ji xwe re kiriye şêwazek. Di nava van de yên çil salî jî, yên nû jî hene. Vêca de werin ji bin pirsgirêkên ku wan ava kirine rizgar bibin! Dibe ku keyfa we ji polîtîkayek wisa erzan kirinê re bê, dibe ku we têr bike, heta bi qasî we di xewnên xwe de jî ne dîtî dibe ku serkeftî jî be. Ev hemû jî gengazin. Bes dema em peywirên li pêş tevgera me, asta wê ya berpirsyarî û bendewariyên girîng tînin beramberî hev, hûn tam di rewşek nakok de ne.

Gelek ji van mînakan di dîroka partiyê de jî hatin dîtin. Hûn

zemînê xirabûna herî cidî, binketin, tasfiyê û belavbûnê vekirî dihêlin û wî zemînî her tim pêş dixin. Ev ne di xema we de ye. Hûn dibêjin; "Niyeta min başe, pir kar dikim." Şêwaza we ya parastinê jî evqase. Mixabin hûn pirsa ma ev ji bo xetê bese, bersivê dide xetê qet ji xwe nakin. Hûn her tim dibêjin; "Hinek din xirab dikin, ma ez ê çi bikim, ev me eleqeder nakin." Lê tişta ji me re hewce jî têrbûna di xetê de ye, di derve û hundur de hêza pêşxistina xetê ye. Vêca hûn çima xwe nagihînin vê? Sedema xwe negihandina vê bi pêwîstiya bîrdozî ve girêdayî ye. Kesê ku evqasî ji bîrdozî direve nikare ji xetê re bibe bersiv. Gelek pratîkên evqasî teng, ziwa, seresere û piraniya wan ji windahiyan re rê vedikin, pratîkên pêwîste di asta kujeriyan de bên lêpirsîn. Dema pratîka kujerî bi paşverûtiyek bîrdozî ve yekbûn çêkir, vaye ev rewşa we ya pir sosret derdikeve holê.

Ger şêwaza me ya Rêbertiyê nebe, dê ev ferzkirinên we rê ji çi re vekin gelo? Hûn jî pir baş dizanin, wê di nava bîst û çar saetan de rê ji parçebûn, belavbûn û gelek ji we bikeve bin bandora hêzên cur be cur û windakirina her tiştî re veke. Xala ku ecêb lê dimînim, gelo çima fikarên we yên rêxistinê evqasî lewazin? Kesek ku pêdiviya xwe bi serkeftinê heyî, dê xwedî fikarek cidî ya rêxistinê be. Ger fikarên we yên cidî yên rêxistinê hebin, hûn ê nexwin, venexwin, ranezin, hûn ê serê xwe bixin navbera herdu destên xwe de û heta sibehê li pey çareseriyê bigerin. Qadroyê berpirsyar wisa ye. Mixabin qadroyê niha, dihizire ku dê bi kîjan yetkî çav berdê cihê kî, kî biçewsîne, kî lihev bîne hesabên van dike. Hinek jî niha bi şêweyek ku kontra jî derbas dike, xwe ferz dikin û karê wan belavkirina hêzê ye. Ya rastî şêwaza sekin a ku pêwîste di asta herî giran de bê cezakirin jî ev rewşe. Bes ji ber sedemên siyasî em jî nikarin vê bikin. Xala herî bingehîn pêwîste hûn bizanin ev e. Partî darezînê çêdike, dijmin çêdike, jiyan bi xwe çêdike, lê teqez çêdike. Ger hûn berpirsyariya mezin a polîtîkayê nejîn, hûn ê di rewşa tawanê de bijîn, ger hûn vê rewşa xwe jî derbas nekin, dê misoger karesatek bê serê we.

Xalek din a em ecêb dimînin, tevî vî hukmê bi êş hûn çima evqasî rehetin û her tim ya xwe dikin? Ger bêrêziya we li hember

jiyanê evqasî pêş ketibe, nexwe we ji destpêkê ve winda kiriye. Her çendî şaşiyên we yên kûr jî hebin, ger hêzek we hebe pêşî wê derbas bikin. Ji nû ve beşdarî partiyê bibin û qet nebe xwe perwerde bikin. Kurdê xwedî hêcet û sersar serê xwe girtiye dimeşe, hema bêje li her derî jî xwe wisa ferz dike. Ji asta herî jor heta hemû şervanan qaşo çav diberdin qadên erkan, lê pêdiviyên vê jî qet nakin. Ez jî di nava bendewariyekê de me, lê bendewariyên min mezinin. Her wiha xebata min a ji bo van jî pir mezine. Bes kesên di vê rewşê de tenê li benda kêliya rêxistinê ya lewazin. Weke objektîf bi vê kêliya lewaz re, li bendê ne ku bi ruhê rêxistinê bidin. Ger van tevan bi zanebûn bikin, dibe ku baştir be. Ji ber mirov wê demê wan bişopîne, mixabin hemû jî tiştên ku dikin bi navê niyeta baş dikin. Tevan jî ev di bin navê; "Ez mafdarim, ez şervanê sala me" de kirin. Hûn şervanê salane, gelê me jî gelê herî kevin ên salane. Lê niha ev gel ji dervî dîrokê ye. Hûn kedkarin, lê keda we di rewşa dijberî partiyê de ye. Pir xetere ku hûn doza partiyê wisa hêsan digirin dest. Tevî hemû israr û derfetan, ger hûn nikarin di doza partiyê de pêşve biçin û bêçare dimînin, ji hêla we ve xirabûna herî mezine.

Ger em hinekê bi Komara Tirk ve qiyas bikin, çawa ku di Komara Tirk de tê gotin; "Civak qirêj bû, polîtîka qirêj bû, hemû sazî qirêj bûn", di nava PKK'ê de jî qirêjiyek wisa pêş ketiye. Nexasim qirêjiya bi qadro û feraseta qadro ya peywiran de, ne kêmî ya çeteyên Komara Tirke. Divê misoger hûn vê derbixin zanebûnê. Çawa ku Komara Tirk hewl dide xwe ji çeteyan pak bike, em ê jî xwe ji çeteyan pak bikin. Gotinek çeteyên Komara Tirk a wisa heye, dibêjin; "Me her tişt ji bo welat kir û her tişt ji bo welat bû." Ma rewşa we jî hema naşibe vê? Hûn jî dibêjin; "Her tişt ji bo PKK'ê bû." Bes hûn jî vê xeta PKK'ê, qural û zagonên PKK'ê yên rasteqînî serûbin dikin û wisa gav davêjin. PKK'yîbûnek wisa nayê pejirandin. Çetebûna di nava me de, dibe ku ya Komara Tirk derbas dike. Lê cewaziya we di vir de ye: Ew derbeyên mirinê lê didin, hûn nikarin vê jî bikin. Dibe ku hûn feqîr bin û jixwe ji vê hêlê ve jî hûn xetertirin. Ji ber ev we bi şêweya; "Ma min çi kir, min tenê salên xwe feda kirin" ve ber bi parastina xwe ve dibe. Mixabin tişta

hûn dikin **çetegerî** ye. Ango rewşek qural û xetê tine ye. Jixwe rastiya civakî jî her tim vê rewşê xwedî dike. Li ser zemîna objektîf a nepêşxistina rêxistinbûnê, kesayeta çete derdikevin holê.

Cewhera vê jî xwe bi çend ehbap-çawîşan ve sînordarkirine. Mînak fermandarê tabûrê ye, yan jî rêveberê qadekê ye, sê-çar ehbap-çawîşên wî hene, mixabin li wir esasên xet û kargeriya rêxistinê tine ye. Vaye çetegerî di vir de ye. Ango rastiya wî ya objektîf wî derbas nake, hêza wî tenê evqase. Jixwe civaka me bi temamî zemînê çetegeriyê ye. Her kes li cihekê çeteyeke. Ev rewş derbasî nava partiyê jî bûye û niha jî herî zêde ev gefan li partiyê dixwe. Em li vir mebestan nagerin. Em dibêjin li vir kesayeta xetê, kûraniya wê ya bîrdozî û vîna pratîkî pir lewaze. Ya ku li ser vî bingehî pêş dikeve kesayeta komên biçûke. Van kesayetan di civakê de winda kirine, tiştek wan tine ye, niha jî hatine wisa xwe avêtine nava partiyê.

Ez nikarim vê partîparêziya we bipejirînim. Ez gelek caran dihizirim çawa çêbû evqas bi vî şêwazî li çiyan –Ewrûpa jî di navê de- di nava PKK'ê de tije bûn. Em vê napejirînin. Ez jî ji kesayetek teng ê gundî hatim. Bes hêjî hewl didim xwe di asta bîrdozî de xurt bikim. Tevî ku çavên min, min pir tengav dikin, hêjî hewl didim xwe perwerde bikim. Çavên wî saxlemin, lê tiştekê ji jiyanê fêm nake; hêjî pêwîste nabîne ku xwe bigihîne ferasetek rast. Ma ez ê çi ji we bikim? Ger hûn dibêjin; "Ez hemalim, ez ê xwe bifiroşim", biçin hemaltiya xwe li cihek din bifiroşin. Vaye ev ji leşkertiya bi pere xirabtir paşverû ye. Leşkertiya bi pere tiştek başe; tu pereyan didî, ew jî pir baş şer dike. Di wir de tenê ji bo ziktêrkirinê leşkertiya bi pere dikin û pir jî bê baldare. Ji ber ku quralan pêk nayîne. Xweziya hûn bikarin bi pereyan leşkertiyek baş bikin, mirov bikare hinek mûçe bidê we, bes hûn bikarin weke leşkerên Afrîkî yên bi pere çar bi çar şer bikin! Mînak em dikarin tabûrekê wisa weke leşkerên bi pere bidin karkirin. Lê em di vê mijarê de jî ditirsin ku hûn ê bikin an na. Ji ber ku wê dijmin zêdetir pereyan bide û xwezayî bêçaretiya xwe hûn ê ber bi wir ve bazdin. Kurtasî leşkertî û şoreşgeriyek xwezayî ya girêdayî ziktêrkirinê heye.

Em we bi rêbazên taybet îdare dikin. Ji aliyekê ve bawerî û

moral didin, ji aliyê din ve jî tevdîrên rêxistinî pêş dixin, bi şêweyek ku mejiyê we tengav neke bi zorê we dixirikînin. Rewş wisa ye. Hinek vê diqetînin diçin îxanetê, hinek dibin kontra, hinek dibin bela, hinek jî ji ber feraseta namûsê ya feodalî dimînin. Lê di wateya cidî de bi partîbûnê re derbaskirina pêvajoyê di rewşa niha de lewaze. Niha ev tespît heye. Li gorî vê tespîtê pêwîste hûn pêdiviya xwe ya bîrdozî û sererastkirina pratîkî baş bibînin. Dema siberojê rêxistin pêşve çû, em têkoşînê hinek din pêşve bibin, dema ev kesayet bi ser we de hatin, wan bê bandor bikin.

Mînak ez rojan dijmêrim gelo îro wisa li hinekan bikim an jî sibe. Mixabin ew jî xwe rêber dihesibînin. Tenê sedema hinek hesaban ez wan ji nav partiyê navêjim. Bes ew hêjî weke rêhevalên hezkirî yên Rêbertiyê li xwe dinêrin, di nava me de cîh digirin û dibêjin; "Cihê min tenge, cihek hîn firehtir dixwazim." Ev bi niyeta xwe ya sûbjektîf û har ve, zilamên her kêlî xwe dixapînine. Lewra teqez divê hûn partîbûnê pêk bînin. Ger hêza we têra vê nake weke sempatîzan bimînin. Ger hêza we heye bibin qadroyek bi bandor. Bes hûn bi seknek qadroyek bi bandor nêzî perwerdeyê nabin. Ji bo mijarên herî dîrokî ji we re vebêjim min xwe parçe kir. Ez hêjî di bin bandora vê de me. Mixabin we qet nexwest vê fêm bikin. We kombûna xwe ya biçûk û ehbap-çawişiya xwe berdewam kir.

Şêwaza we ya şerkirinê pir xirab û fesadî ye. Di nava partiyê de hewl didim vî şerê we yê ketûber asteng bikim. Hûn bertek û hêrsa me ya li hemberî vê dibînin. Ji bo em vê derbas bikin zemînê rêxistinê hîn kûrtir dikin û berfireh dikin. Em hewl didin qadroyên nû pêş bixin û di nava pêvajoyê de rêyên vê xeternakiyê derbas bikin dihilbijêrin. Em pirsgirêkan rasterast ne li dijî beramber, hewl didin li ser bingeha pêvajoyekê çareser bikin. Dixwazin fêm bikin, dixwazin fêm nekin, bes şer wisa ye. Ev şer ji hêla me ve wisa tê dîtin û meşandin. Vekirî dikarim bêjim ku, ger em we bîst û çar saetan bi şêwaza we re bihêlin û bi rastî jî ger hûn bixwazin sîxurtiyê jî bikin, yeqîn nakim di civakê de jî bixwazin we xwedî bikin. Hûn di deryaya xeyalan de xwe dixapînin. Ger hûn di şoreşê de serkeftinê bidest nexin û xwe ji sîxurtiyê re jî amade bikin, hûn nikarin tiştekê heta ruhê xwe jî rizgar bikin. Lê hûn rik digirin vê

rastiyê jî nebînin. Di vê mijarê de çeka we ya herî mezin cahîltiya we ye. Gotin û nirxandinên **Hz. Muhammed** ji bo **Ebû Cehîl** kirîn hene. Ebû Cehîltî di nava me de jî zêde ye. Ebû Cehîlên nûjen bûyîn hene.

Em li hember niyeta we ya baş rêzdarin, lê bi vê re xwe ji aliyên têrê nake û heta we ber bi xirabûnan ve dibin dûr bixin. Ger hêz û îdîaya we hebe, di vê çarçoveyê de partîbûnê biherikînin. Mirov bi sonda xwe ve bi şerefe, dema dibe xwediyê sonda xwe hêja ye. Kesayetek evqasî dijberî sonda xwe dikeve, kesayetek ji nemerdiyê jî xirabtire, tine ye û ne xwediyê sonda xwe ye. Nexasim ma dibe mirov nirxên şoreşê emanetî wan bike?

Hûn ê partîbûnê durist û hîn vekirîtir nîqaş bikin, wisa pêk bînin. Hûn ê xwe bigihînin yekbûna bîrdoziyek têrkar û pratîkek rast. Ger ev pêk neyê hûn ê sucê xetê bikin û ev jî suca herî mezine. Hûn ê li ser vî bingehî bi vê yan jî wê şêweyê tasfiye bibin. Ya rastî xeterî pir cidî ye. Di nava rêxistinê de li mirovan nayê xistin. Zimanê têkoşînên siyasî cewazin. Di rastiya PKK'ê de jî xweseriya vê hîn zêdetire. Neçare ku ez di nava PKK'ê de têkoşînê pir cuda bimeşînim. Ji ber ku ger hûn nekarin di rastiya Kurd de vê cewaziyê ava bikin, dev ji rêvebirina rêxistinê berdin, zehmete ku em bikarin du kesan bînin cem hev. Ji ber ku yekem care şêwazek rêxistinê ya nû hatiye avakirin û yekem care me avakirina rêxistinek wisa qelebalix ser xistiye, têkoşîna vê ya hundurîn û rêveberiya vê ya hundurîn dê ji hêla min ve pir xweser, pir cewaz û heta bi şêweyek pir hostane bê birêvebirin. Ji ber ku yekemîne, heta niha jî ti mînaka vê tine ye.

Weke hûn dihizirin bi we re şer nakim. Mînak Komara Tirk diteqe dibêje; "De APO, tu li kurî, were vir, tu çima dernakevî holê." Ya rastî bi şêweyekî ev ji bo we jî derbasdare. Şêwazek we ya şer heye û hûn dixwazin me jî tevlî wê bikin. Şêwazek min jî a şer hêj min di heft saliya xwe de li gund pêş xistî hebû. Şêwaza min a şer, şêwaza quralên civakê ya wî demî dataniya aliyekê. Niha jî hatime vî temenê xwe: Bi vê ezmûna xwe ve nakevim nav şêwaza şerê we. Hûn ê li hember şêwaza şerê ku em ê li dijî we bimeşînin ve bê ku hûn bikevin ferqê –me li hember Komara Tirk jî wisa kir-

têk biçin, heta hûn ê ti carî nezanin çawa têk çûne û wisa bin bikevin. Hinekê jî rewşa we wisa ye. Heman weke rewşa Komara Tirke. Ji ber Komara Tirk naxwaze şerê em li dijî wî dimeşînin fêm bike û şaşiyan dike. Di encamê de diyare li ber çavên cîhanê ketiye çi rewşê. Heman tişt ji bo we jî derbasdare. Şêwazek şerê we ya hûn dixwazin ferz bikin heye. Heman weke Komara Tirk hûn dibêjin; "Were min bikuje, derkeve em li hev bixin." Bes Rêbertiyek ku bi vê bê xapandin tine ye û partiyek bi vê şêwazê bê xapandin jî tine ye. Ma ez zarokim, bikevim nav vî şerê we yê bê kesayet û kêrî tiştekê nayê? Hûn ê di şer de encama ku heq dikin bidest bixin.

Vekirî dibêjim, ez di vî şerî de her cure rêbazî bikar tînim. Di şerkeriya me de rêbazên me pir dewlemendin. Çawa bi me re bîrdozî pir dewlemende, pratîkên wê jî bi me re dewlemendin. Hûn weke kes wisa dihesibînin ku, di nêvengek şerê pir giran de ne. Ev ji hêla me ve tên pêşxistin, ango ne ku jixweber çêdibin. Ez li rûyê mirovan nakenim, hewce nabînim bikenim jî. Hinek hevalên me bîst-bîst û pênc salin şerên xwe ferz dikin. Ez jî şerê xwe ferz dikim. Ew di sifrê de ne, bes ez xwedî desthilatdarî me. Ew aqilê xwe bikar nayînin. Ger ne wisa ba ma dikarin wisa rawestin? Ez di vir de pir bi wijdanim. Ger hinek kes di nava partiyê de rêbazên destwerdana çors bidin meşandin, dê yekser we bikujin. Tenê cewaziyek me heye, ew jî em qîmetê nadin vî rêbazî. Dîsa jî şer heye. Fîşek carekê dikuje, lê rêbaza me dibe ku her kêliyê bikuje. Ev tengasiyên ku hûn dijîn, encama şêwaza em li we dixîne. Hûn tawanbarin û tengaviyê de ne. Ji ber ku hûn şerkeriyek xirab ferz dikin. Em ê çil sal din jî we wisa bigirin. Dema hûn herî dawî gihiştin asta ku nekarin li ser lingê xwe bisekinin, hûn ê weke gêjên li ser dika boksê xwe bi xwe li erdê bikevin. Em ê kulma kuştinê ya dawî jî li we nedin. Hûn ê gêj bibin û wisa bikevin erdê, heta fêm nekin ku çawa jî ketine.

Dibe ku hûn jî li gorî xwe bêjin; "Min jî kuşt, vaye tola xwe rakir." Ji ber vê siûdê nedim we, min şêwaza xwe kûrtir kir. Bi Rêbertiyê re ev hemû hene. Hûn hebûna van jî ji rastiya rêxistinbûnekê fêm dikin. Gelo ez vê rêxistinbûnê çava pêk tînim?

Ma çima ti kes nikare rêxistinbûnek wisa birêve bibe? Ev girêdayî şêwaze. Hinek ji we dixwaze bi duristî û girêdana xwe bi partiyê ve hin tiştan bike. Hinek ji we tam nermikin an jî minafiqin, dihesibîne ew jî tişteke. Heta hûn dihesibînin ku we xwe ferz kir wisa hatin qada me, li vir jî we xwe zirav kir û wisa derketin û heta we hêz girtiye. Dibe ku gelek ji we wisa jî çûn. Dibe ku hûn xwe li ser vî bingehî pêş jî bixin, mixabin ev beyhude ne.

Pêşniyara min ji we re nirxê şerê pir pîroz bikin. Weke her carê diyar dikim, ger hûn ê komplo jî li min bikin, pir bi hostane bikin. Nexwe bi rastî jî hûn bi vê şêweya çors ve fîşekekê jî heq nakin. Deka li xayînê bi navûdeng binêrin, ne hêja ye ku mirov fîşekekê jî li kesên teslîm bûyîn bixe. Carina ev şêwaza girêdanê me aciz dike. Girêdana wisa nabe. Ji ber girêdana we pir paşketiye, pir bê pratîke, binkeftî ye û bê naveroke. Ger li gorî we ye hûn ê bi vê rastiya Rêbertiyê re bimeşin.

Dema van tevan vedibêjim, nabêjim ez ê we bitirsînim û wisa birêve bibim. Bes hinek şaşiyên we hene û hûn nikarin bi wan ve bimeşin. Dê hinek xeyalên we yên erzan jî bi serê we de bên xwarê. Xetere ku hûn xwe tiştek dihesibînin. Kes li vir kesayeta we texrîp nake, biçûk naxe; tenê hûn têrê nakin û di nava şaşiyek mezin de ne, ger gengaz be vê derbas bikin.

Erka we ya xwe terbiyekirinê pir girînge. Zehmete ku em we bi vî halî ve partîbûyî bipejirînin. Ger pir hişk li we nadin, nayê wê wateyê ku cezaya we sivike, lê dide diyarkirin ku têkoşîn bi zimanek din tê meşandin. Ez neçarim vê têkoşînê birêve bibim. Ji ber ku ne gengaze rêxistin bi cureyek din bê birêvebirin û serxistin. Ji ber vê heta dawî fêrî têkoşîna nava partiyê bibin, fêrî şêwaz bibin, asta têrbûnê kontrol bikin û li gorî wê helwest raber bikin.

Min rêyên berxwedanê jî destnîşan kirin. Ji bo we şertê esasî kûrbûna bîrdozî û sererastbûna di pratîkê de ye. Dîsa şertê esasî dîsîplîn, dilnivzî, sebir, li ser van serwerî, li gorî pêwîstiyên kêliyan ji rastiyê re bêjin raste, ji şaşiyê re bêjin şaşe, di rêbaz de ji bîrdozî û rêgezan tawîz nedin û di polîtîkaya pratîkî de jî nerimbûnê pêk bînin. Van jî tevlîhev nekin. Hişkbûna di rêgez û nerimbûna di polîtîkayê de li hev neguherînin û mafê hemûyan jî tam di cihê wê

de bidinê. Ev jî bo bûna milîtan û rêveberî hewce ne. Hûn ji bo van fêr bibin li virin.

Ger hewce bike hezar carî ji bo pratîka xwe ya rabirdo tobe bikin û efûyê bixwazin. Weke hûn ji rastiyan re di tiştên baş de îbadetê bikin û zikir bikin, xweş û jidilbûnek mezin beşdarbûnê raber bikin. Ev nebin nabe. Nexwe hûn nikarin bibin leşkerên bi pere tên girtin jî. Weke din jî negirîn, halê we pir bi êş û girî ye. Pir hêrs dibim ku, ti xisleta kesayeta we ya rakêşwer tine ye. Hûn her tim digirîn, her tim weke sitiriyan xwe ferz dikin. Vê derbas bikin. Rêheval mirovên herî rakêşwer û bandorkerên bêhempa ne. Ger derdor ji we hez nake, suc ne li derdor, li xwe bigerin. Ger sûdmendiyek we ya mezin naxwiyê, dîsa suc bi xwe re bibînin. Hinekê di van mijaran de cidî bin. Rastiya we ya herî mezin hûn derdora xwe tawambar dikin. Gelo hûn kî tawambar dikin? Mirovê tawambar dike, di rastiyê de sucê xwe derdixe holê. Ji ber ku mirovê sucdar dike, pêwîste pêşî ji xwe bipirse ku çima ev rewş di destpêkê de derbas nekiriye û çima nêvenga sucê ne daye guhertin. Hûn di vê mijarê de tiştekê nakin, xwe tine dihesibînin û bi qasî dikarin derdor tawambar dikin. Ev durûtî ye.

Xwe di van hemû mijarên rêbaz an jî bê rêbazî de sererast bikin. Nebêjin; “Me heta niha îdare kir, ka çibû?” Raste we îdare kir, lê dosya we ya tawanê pir tije ye. Li cem me qadroyên serkeftinê neçar dike, yan jî çav diberde serkeftinê tine ne. Dibin belaya serê cihê ku diçinê. Ev jî tê wateya zêdebûna dosya tawambariyê. Berê zarok ji bo şîr bigirin digiriyan, niha jî hûn digirîn. Ti halê we ji bilî benda şîr mayînê tine ye.

Ji van hevalên me yên herî kevin re dibêjim, şûna ku hûn evqasî erzan baxivin, ka ji xwe bipirsin we çima deh mirovên ku girêdayî partiyê û xetê, di pratîkê de serkeftî ava nekir. Her tişt amade ye, me endam jî dan û navend jî xweşike. Ma hûn rêberên çawa ne, salane hûn nikarin deh mirovan perwerde bikin? Vêca ez ê bi çiye we bawer bikim? Hûn fermandarin, bes hûn nikarin li derdora xwe sê alîgirên xwe ava bikin. Vêca ez ê çawa bi vê fermandariya we bawer bikim? Ti feydeya we ya xwe weke tawambarekî ferzkirinê zêdetir tine ye. Gelek fermandar û

rêvebirên wisa hene. Ez ê çi ji van fermandaran bikim? Ger we nekariye du kesên li cem xwe bikin mirov, gelo hûn endamên partiyê yên çawa ne? Deh sal derbas bûne, we tenê kariye navendê belav û xirab bikin. Mirov ji xwe dipirse; "Gelo min çima komek heval pêş nexist?" Di nav rêxistinan de qurale; kar û barê nûnerekê amadekirina endamên baş û tevlî rêxistinê kirine. Mixabin nûnerên me şervanên herî baş dervî refê dihêlin. Dê ji hemû fermandarên wisa hesab bê pirsîn û tê pirsîn jî.

Dê êdî li ser vî bingehî bi sererastkirinên pratîkî ve bersiva pirsgirêka bê dayîn, dema we di çareseriyê de zehmetî jiya, hûn ê bîrdoziya partiyê hemêz bikin. Baweriyên we hene, we kesayeta xwe daniye holê, hûn ji min zêdetir fedekar û wêrekin. Vêca hûn ê encama hewldanên xwe bigirin. Nexwe em ê her kêlî we weke kesên durû, ketî û xwe dixapînin mehkum bikin. Hûn ê gumanên partiyê hêsan negirin dest, cidiyeta wê xirab nekin, bizanin ku ev xisleta me ya herî bingehîne û pêşî jî em bi vê dijîn. Hûn ê bizanin xala ku Rêbertî herî zêde berçav digire wisa ye, hûn ê nêzîkbûn, girêdan û rêxistinbûnên xwe li ser vî bingehî pêk bînin.

**9 Îlon 1998**

*"Azadî, rêxistinbûn û milîtanî ne diyardeyên hêsanin.
Ger hemû rêgez, hêza rêxistinê, bîrdoziya wê û hêza
Rêbertiya PKK'ê rast têbigihin,
dê Partîbûn pêk were. Zîlan jî ev pêk anî.
Şoreşgerî beriya her tiştî parastina cewherî ye.
Nûbûna şoreşgeriyê heye.
Şoreşger kesayetek, her rêgeza şoreşê pêk tîne û li gorî pêdiviyên wê dijî, bi çalekiyê û rika xwe ya mezin ve dizane paşverûtiyê bişkîne,
bi israr yekbûna rêgez,
sekin û pratîka Mazlum'an, Kemal'an, Xeyrî'yan, Egid'an
ava dike û devjê bernade"*